# YEK XWEDA YEK PEYAM

## NEPENÊ KİFŞ BİKE
## DEST Bİ RÊWÎTİYÊ BİKE



**P. D. Bramsen**

# Ma tu jî wisa difikirî?

Silav,Ez ji vê bawer dikim ku Îsa weke Mesîh hat, lê tu carî Wî negot ku Ew bi xwe Xweda ye. Tu carî Mesîh li çarmîxê nehat xistin. Heke Îsa li xaçê hatibûna xistin jî ev tu carî naye wateya ku gunehên mirovan hatine paqijkirin(jêbirin). Li gorî min tiştekî wisa ecêbiyek e. Ya ku ez pê dizanim û ez jê bawer dikim ew e ku piraniya Pirtûka Pîroz hatiye xerakirin û sexte ye. Ji ber ku hîle tevlî hemû pirtûkên Pirtûka Pîroz hatine kirin. Bimînin di xweşiyê de,
Ahmed

- ***Gelo Pirtûka Pîroz ku li cîhanê ya ku herî zêde tê firotin hatiye xerakirin?***
- ***Gelo tişta dihêle gazî û çîroka Pirtûka Pîroz li cîhane ya herî zêde tê firotin ewqasî bi sir bibe û lê dîsa jî dike ku li serê nîqaş bên kirin çi ye?***
- ***Gelo di nav bi hezaran bawerî û olên cîhanê de bijareya me ya tekane têkilheviya mêjî û hiş e?***

***Ji bo tu bi ser bersivên van pirsan ve bibî derkeve rêwîtiyeke herheyiyê ku ji zemên dest pê dike.***

***... helbet beriya mirinê.***

**P. D. Bramsen** û xanima xwe li keviya Sahrayê li welatekî ku nifûsa wê misilman e jiyan. Li wê derê xebitîn û zarokên xwe li wir mezin kirin. Nivîsên Bramsen bi dildarî û azweriya ku ew ji Nivîsên Pîroz re hîs dike dagirtiye. Û nivîsên wî bi hezaran diyalogên ku bi heval û hogirên xwe yên misilman re kirine vedihewînin. Wekî din Bramsen nivîskarê bernameya radiyoyê ya kronolojîk a bi navê 'Riya Rastiyê' ye ku ji 100 xelekan pêk tê û herwiha li 70 zimanan zêdetir li Efrîqa, Asya û Rojhilata Navîn hatiye wergerandin û hê jî tê wergerandin.

ISBN 978-1-62041-027-1

9 781620 410271 >

www.one-god-one-message.com

# Yek Xweda Yek Peyam



**NEPENÊ KİFŞ BİKE**

**DEST Bİ RÊWÎTİYÊ BİKE**

# Yek Xweda
# Yek Peyam


**P.D. Bramsen, nivîskar**
**D.C. Bramsen, resam**






ROCK INTERNATIONAL

**Yek Xweda Yek Peyam**
Mafên wê aîdê ROCK Internationalê ne, 2007, 2024

Kurdish Kurmanji Edition of
ONE GOD ONE MESSAGE
by P. D. Bramsen
Copyright © 2007, 2024 by ROCK International
ISBN 978-1-62041-027-1

ROCK International
P.O. Box 4766, Greenville, SC 29608, USA
www.rockintl.org • resources@rockintl.org

**www.one-god-one-message.com**
pdbramsen@rockintl.org


"Mizgîniya xêrê ya
ji welatekî dûr tê,
ji bo canê tî wek
ava hênik e."
Pêxember Silêman
(Şîretên Silêman 25:25)

# Naverok

Pêşgotin . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 1

**BEŞ I**
**AMADEKARİYA RÊWÎTİYÊ**
*RÛBİRÛBÛNA Bİ ASTENGİYAN RE*

1. Rastiyê Bikire . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 7
2. Ji Heqê Astengiyan Derketin . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 19
3. Hat Guhertin An Hat Parastin? . . . . . . . . . . . . . . . . . 35
4. Zanist Û Pirtûka Pîroz . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 49
5. Mohra Xweda . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 59
6. Şahidiya Hevgirtî . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 71
7. Bingeh . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 82

**BEŞ II**
**RÊWÎTÎ**
*VEDÎTINA TIŞTA KÛ NAYÊ ZANÎN*

8. Xweda Yekî Çawa ye? . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 91
9. Tu Kes Naşibe Wî. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 107
10. Aferîdeyekî Taybet . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 123
11. Destpêka A Xerab. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 136
12. Zagona Guneh Û Mirinê . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 146
13. Dilovanî Û Edalet. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 155
14. Lanet . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 162
15. Aciziya Duhêl . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 170

16. Ezbeta Jinekê . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 183
17. Dibe Kû Ev Kes Kî Be?. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 193
18. Pêşnûmaya Bêdawî Ya Xweda . . . . . . . . . . . . . . . . . 212
19. Zagona Qurbanê . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 221
20. Qurbaneke Girîng. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 231
21. Xwîna Kû Bêtir Dirije . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 242
22. Berx . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 253
23. Pêkhatina Nivîsên Pîroz. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 266
24. Hemû Hat Dayîn. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 276
25. Mirin Têkçû . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 288
26. Dîndarî Û Dûrmayîna Ji Xwedê . . . . . . . . . . . . . . . . . 300

## BEŞ III
## DAWIYA RÊWÎTİYÊ
*BEROVAJÎKIRINA LANETÊ*

27. Qonax 1: Bernameya Xweda Ya Berî Ya Niha. . . . . . 320
28. Qonax 2: Bernameya Xweda Ya Niha . . . . . . . . . . . . . 341
29. Qonax 3: Bernameya Xweda Ya Bê . . . . . . . . . . . . . . . 361
30. Beşên Kû Ji Bihuşta Dahatûyê Hatine . . . . . . . . . . . . 380
Gotina Dawî . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 395
Têbinî. . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . . 398



# Pêşgotin

Kalemêrê kû yek ji rûsipiyên gund bû, ji hevalê min re got: **“Ji ber karên xwe yên qenc tu heq dikî biçî bihuştê, lê ji ber peyama kû tu weaz dikî cihê kû tu heq dikî biçê dojeh e!”**

Hevalê min û xanima wî ji jiyana xwe deh sal li gundê vî zilamî yê li qiraxa Sahraya Mezin, buhurandibûn. Li wir him projeyeke avdanê disepandin him jî li klînîkeke tibbê ya kû wan ava kiribû, nexweş rihet dikirin. Di heman demê de ji bo hemû kesên kû xwestibûn guhdar bikin peyamên pêxemberê xwe rave kiribûn.

Li gorî fikra kalemêr ji bo kû hevalê min “çûna bihuştê heq bike” çi kiribû? “Karên qenc” kiribûn.

Û ji bo “çûna dojehê heq bike” çi kiribû? Li gorî Pirtûka Pîroz “peyama” peyxemberan hîn kiribû. Gelo kalemêrê gundî di teqdîra xwe ya derbarê karên hevalê min û mesaja wî de mafdar bû? Nîvenîv mafdar bû? An na bi temamî şaş bû?

Heger hûn ji fikra xwe ya li ser vê mijarê ne ewle bin, ev pirtûk ji bo we hatiye nivîsîn.

## Lİ KÛ DERÊ

Ez li Emerîkayê ji dayik bûm, lê ev pirtûk li Efrîkayê hat nivîsandin.

*Cih:* Sahel[1] li Senegala li Efrîkaya Rojava herêmek.

*Hawir:* Banga nimêja sibehê qediya. Tîrêjên kinûş û porteqalî yên serê sibehê, silûeta asoyeke bi darên bixîz û bikelem xemilî, xêz dikin. Hewa vêga bi awayekî nuwaze hênik e, lê bîsteke din dê ev rewş biguhere. Ez li sifika mala me ya gund tevî kompîtera li ser çongên xwe rûniştî me. Banda şefaf ya plastîk ya li ser

klavyeya min, wê ji toza Sahraya Mezin ya kû li hewa daliqî disekine, diparêze. Ji xeynî dengê kerekî kû bîstê carekê dizire û yê dîke kî kû bang dide gund bi temamî bê deng e. Niha dengê kû guhên min dibihîzin tenê dengê tiktikîna tiliyên min ên li ser klavyeyê ne kû fikiran vediguherîne peyvan û peyvan jî vediguherîne nivîsê.

## ÇİMA

Ez dinivîsim, lewre yê kû ez bi jiyan, kêfxweşî, tendurustî û armancê bi bereket kirim, mijarek da min da kû ez binivîsim.

Ez bi taybetî bi dilekî ji bo dostên min ên Misilman ên li Senegalê, kû min û jina xwe me zarokên xwe li wir xwedî kirin û beşeke dirêj ya jiyana xwe ya gihîştî li wir derbas kir, tije hezkirin û hurmet dinivîsim.

Ez dinivîsim, lewra di van salên dawiyê de ji Misilmanên li hemû derên dinyayê zêdeyî hezar posteyên elektronîk ji min re hatin. Divê ramanên wan, şîroveyên wan ên kû mirov dixin tevgerê û pirsên wan girîng bên dîtin.

Ez ji ber empatiya xwe ya bo pêşewayên dîn ên betilî û bêzar ên kû ji gotin û kilîşeyên çivanokî yên wekî “Pirtûka Pîroz rast e, lewra ew rasteqînîya xwe vedibêje!” an jî “Qur’an rast e, lewra tu kes nikare pirtûkeke wisa binivîse!” zêdetir tiştinan pêşkêş dikin, dinivîsim.

Ez dinivîsim, lewre ez marûzî derbên dilê mirovan bûm, dilê kû ji xeynî peyama hevgirtî ya Xwedayê yek û rast meyla wî li ser baweriya her tiştî ye.

## Çİ

YEK XWEDA YEK PEYAM şansa herî mezin ya kû wê di jiyana we de bê pêşiya we, pêşkêşî we dike: derketina rêwîtiyeke bêtelaş bi rêberiya pirtûka kû li cîhanê di hemû deman de herî zêde hatiye firotin û kifşkirina peyama pêxemberê kû ev pirtûk nivîsiye. Ji bo kesên kû wê beşdarî vê rêwîtiyê bibin wê

fersendên; ji heq derketina astengiyên bêhed (Beş I), nifûzkirina li herêmên nayên zanîn (Beş II), û ji nişkê ve ketina qiraliyeteke biheybet ya dîmenên giştî yên bê hempa û fersenda rastiya têrker (Beş III) bên dayîn.

## Jİ BO KÊ

Ev rêwîtî di serî de ji bo kesên yekxwedaperest- kesên kû ji yek xwedayî bawer dikin- hat sêwirandin. Lê tevî her tiştî em dîsa jî kesên pirxwedaperest, qamûxwedaperest, humanîst ûxwedênenas[2] jî bi sipasdariya ji bo kesên kû ji yek xwedayî bawer dikin, pêşwazî dikin û ji wan re jî dibêjin'hûn bi xêr hatin'. Serpêhatî, ji bo hemû wan kesan e kû bo wan cihê kû wê bêdawîtiyê lê derbas bikin girîng e û ji bo vê yekê jî difikirin kû veqetandina dozdeh saetên xwe bo xwendina vê pirtûkê wê sûdewer be. Ev pirtûk bi dengê bilind nêzî dozdeh saetan dikare bê xwendin.

Paşeroja we, tiştên kû hûn jê bawer dikin an bawer nakin her çi be bila bibe, hûn jî vexwendiyê beşdarbûna vê rêwîtiya destanî ya seranserê Pirtûka Pîroz in kû gelek gelek kes dibêjin kû ew hurmetê didinê, lê ji van pir kêm kes biryara li ser fikirînê digirin.

Pêxemberekî, berî niha bi sê hezar salan bo Afirîner û Xwediyê gerdûnê ev dua pêşkêş kir: **"Çavên min veke da kû, ez bikaribim nuwazeyên di zagona te de bibînim."** (Mezmûr 119:18)

Dibe kû kêfa me ji hemû tiştên kû em dibînin re neyê, lê dîsa jî em derheqê dîtinê de neserketî nebin.

Hevalê we yê rêwîtiyê,
*P. D. Bramsen*

# BEŞ I
# AMADEKARİYA
# RÊWÎTİYÊ

## RÛBİRÛBÛNA Bİ ASTENGİYAN RE




1 - Rastiyê Bikire

2 - Ji Heqê Astengiyan Derketin

3 - Hat Guhertin An Hat Parastin?

4 - Zanist Û Pirtûka Pîroz

5 - Mohra Xweda

6 - Şahidiya Hevgirtî

7 - Bingeh



# 1

# Rastiyê Bikire

*"Rastiyê bikire û nefiroşe..."*

— Pêxember Silêman (Şîretên Silêman 23:23[3])

Di hişê xwe de bisêwirînin kû hûn bi meşê dikevin cihekî dan û standinê kû qelebalix e û bi milyaran mirovan tije ye.

Erê, bi milyaran.

Li pêşiya we bi qasî kû bi çavan neyên dîtin dûr, bi deh hezaran mexaze û firoşgeh hene. Dengê firoşkarên bixîret ji her derê digihê we; bang dikin, diqîrin, distrên, nîqaş dikin, lava dikin, dua dikin-hin ji wan bêyî kû biqîrin bi dengekî nermik, hin ji wan jî bi rêya hoperlorê angaşt dikin kû tiştê kû hûn ji bo kirîna wî hatine tenê li cem wan e:

***Rastî!***

Nekenin. Weşanxaneya Zanîngeha Oxfordê ansîklopediyek weşand. kûTê de tê diyarkirin kû li ser rûyê cîhanê *deh hezar* dînên cuda hene. Û ev hejmar, bi hezaran terîqet û mezhebên di nav van dînan nahundirîne.[4]

Di vê rewşê de divê em çi bikirin? Em ji kê bawer bikin wê rast be?

Heger bi tenê yek Xwedayê rast hebe û heger wî rastiya derheqê xwe de û sêwirîna xwe ya li ser mirovatiyê aşkere kiribe,

dê çawa kûmimkin çêbe kû em bi wî û plana wî bihesin?

Berî niha bi çar hezar salan Eyûb Pêxember pirseke wekî vê pirsî:

> *“**Zanatî li kû peyda dibe? Cihê aqil kû ye?** Mirov bi qîmetê wê nizanin ... Berdêla wê bi zêrê safî nayê dayîn, qîmetê wê bi zîv nayê pîvan ... Qîmetê Zanatiyê ji micewher bilindtir e.”* (Eyûb 28:12-13,15,18)

Wexta kû em li jiyanê rê dikûdînin ma em neçar in kû bi hişekî tevlihevbûyî di nav nepenîtiyan şaşo maşo bibin, an na? em dikarin zanatî û rastiya Xwedayê yek û rast bizanin?

Em dikin bersiva vê pirsê hîn bibin.

## PİRTÛKA PİRTÛKAN

Bêjeya *Pirtûka Pîroz (Bible),* ji bêjeya *Biblia* ya Grekî tê, kû wateya wê *“pirtûka pirtûkan”* an jî *“pirtûkxane”* ye.



Xweda, piştî kû zêdeyî du hezar salan bi devkî û bi rêya kesên wekî Adem, Nûh û Birahîm axivî, da kû peyama wî tomar bikin di demeke zêdeyî 15 sedsalan de nêzî 40 kes bi kar anîn. Ev rewanên han, wekî pêxember an jî qasid hatin binavkirin. Wateya yekeyek ya bêjeya *pêxember* “kesê kû eşkere, bi dengê bilind dibêje” ye, wateya bêjeya *qasid* jî “xeberguhêz” e. Îro, tiştên kû van kesan nivîsîne bi awayê yek cîldê di destê me de ye- Pirtûka Pîroz. Vegotinên wekî *Nivîsên Pîroz, Nivîsên Pêxemberan û Peyva Xweda,* di heman demê de têkilî Pirtûka Pîroz jî tên bikaranîn. *Tewrat, Mezmûr û Mizgînî* beşên taybet ên di hindurê Pirtûka Pîroz de ne. Di Erebî de ev Nivîsên Pîroz, wekî *el-Kitab-el-Mûqaddes* tên binavkirin kû wateya wê Pîrtûka Pîroz e.

Bi sedsalan e, bi salan e, Pirtûka Pîroz ji hemû pirtûkên din ên li cîhanê bêtir tê firotin. An hinek beşnên nivîsên Pirtûka Pîroz

an jî temamê wê li 2400 zimanan hat wergerandin, hîn jî li 1940 zimanî tê wergerandin.[5] Tu pirtûkên din di vê mijarê de nikare nêzî Pirtûka Pîroz bibin.

Tevî kû Pirtûka Pîroz vê xwesteka bêhempa dibîne dîsa jî di dîroka mirovatiyê de pirtûka herî zêde tê biçûkdîtin û jê tê tirsîn e. Bi sedsalan rêvebirên cîhanê û pêşewayên dunyewî an jî dînî, pirtûka kû di hemû deman de herî zêde hatiye firotin, *Qedexe* kirine û bi welatiyên xwe yên xwediyê vê pirtûkê êşkence kirine û heta ew kûştine.[6] Hin netewe van polîtîkayên xwe hîn jî didomînin. Heta li welatên[7] "Xirîstiyan" jî xwendina Pirtûka Pîroz li pol û saziyên eydî gel, hatiye qedexekirin.

## ÊŞKENCE PÊ BÛ

Di ciwaniya min de bi navê Richard hevalekî bavê min hebû, Richard, di girtîgehên komunîst ên li Ewropaya Rojhilat de tam çardeh salan maye, tim û dayim bê xew û birçî hatibû hiştin, li serserê xwe hatibû daliqandin û lêdan xwaribû, di hicreyeke cemidî de kilîtkirî hatibû girtin, bi singên pizotî yên sor hatibû şewitandin û laşê wî bi kêran hatibû veroştin. Min bi çavên xwe, hin şûnên birînên xedar û kûr ên laşê Richard dîtin. Di heman demê de hevjîna Richard jî hatibû girtin û ji ber heman çalakiya kû mêrê wê pê hatibû "sûcdarkirin" li kampeke mehkûman cezayê xebata neçarî lê hatibû birîn.[8]

Sûcê kû van hevjînan li dijî rêveberiya xwedênenas kiribû, çi bû?

Dema kû Pirtûka Pîroz hînî mirovan dikir, hatibûn girtin.

## TÊKİLİYA WÎ Bİ MALBATA WÎ RE QOT BÛ

Serê hevalê min Elî di derdekî mezin de bû. Bavê wî civîneke kû wê mêrên malbatê tê de bihatina ser hev, li dar xistibû.

Apê mezin jî hat civînê.

Birayên wî yên ciwan ên mêr jî hatin vexwendin.

Dûre jî Elî kû lawê mezin ê malbatê bû, li ortê li cihekî hat rûniştandin.

Bavê Elî axaftineke kelecanî kir kû bi gotinên “Te malbata me fedîkar derxist! Te xiyanetê Olê me kir! Divê tu malê biterikînî û tu carê din venegerî. Divê ez tu carên din rûyê te nebînim!” qediya.

Ap, beşdarî vê axaftinê bû û wisa got: “Belê, û heger heta sibehê tu ji malê veneqetî, ez ê têkberên te bavêjim kûçeyê!”

Ev hêrs Ji ber çi ye?

Elî, piştî kû nêzî salekê Pirtûka Pîroz xwendibû biryar dabû kû baweriya xwe pê bîne.

## KELAMA JÎNDAR

Tişta kû Pirtûka Pîroz wisa kiriye pirtûkeke xwedî dijmin, çi ye?

Sedema kû rêvebir vê pirtûkê qedexe dikin; sedema kû dê û bav zarokên xwe yên baweriya xwe bi vê pirtûkê tînin, red dikin çi ye? Hêza kû bi milyonan kesên yekxwedaperest tevî berdêla bi xwedênenasan re parvekirina heman rêgezê, ber bi biçûkdîtina vê pirtûkê ve dehf dide çi ye?

Gelo ji ber kû Pirtûka Pîroz Peyva Xwedê ya jîndar, çalak û dilgir e, ev yek hemû diqewimin?

> *“Peyva Xwedê jîndar û bi bandûr e. Ji her şûrê dudev hê tûjtir e. Û heta can û ruh, hem jî movik û mejî ji hev veqetîne, lê diçe; dîwana niyet û ramanên dil dike.”*
>
> (Îbranî 4:12)

## PEYİKANA PİRTÛKÊ

Min, hevjinamin û zarokên me yên kû vêga mezin bûne, me beşekî mezin yê bîst û pênc salên xwe yên dawî li Senegala li Efrîkaya Rojava derbas kir. Hema hema hemû cîranên me pêgirtiyên dînê Îslamê bûn. *Îslam* tê wateya *teslîm bûn* an jî *serî tewandinê* û wateya peyva *Misilman, kesê teslîmbûyî* ye. Pirtûka kû ji aliyê misilmanan hurmetê dibîne, *Qur’an* e (wekî Kûran jî tê nivîsandin). Çavkaniya nivîsên min axaftinên takekesî ne kû

min bi nas û dostên li Senegal û hemû cîhanê ne kirine.

Tevî kû min gelek wextê xwe daye hem xebata Pirtûka Pîroz hem jî xebata Qur'anê, wê YEK XWEDA YEK PEYAM li ser Pirtûka Pîroz kûr bibe. Berî niha bi salan min û dostekî xwe yê Senegalî, me bi zaravayê Wolof yê zimanê Senegalê bernameyeke 100 beşî ya radyoyê amade kir.[9] Her beşekî vê bernameyê li ser çîrokek û peyameke eydî peyxemrekî di Pirtûka Pîroz de bû. Hin guhdaran ev pirsa han pirsîn: "Hûn çima di heman demê de Qur'anê jî hîn nakin?". Bersiva kû min dabû vê pirsê ev e:

> Li vî welatî dema kû zarok dibin sê an jî çar salî dest bi jiberkirina Qur'anê dikin. Mimkindibe kû meriv li her semtê mamoste û dibistanên Qur'anê bibîne, lê belê kî dikare û dixwaze çîrok û peyamên di Tewratê, Mizgîniyê û Mezmûran de nivîsî hîn bike? Wekî kû hûn dizanin, Qur'an diyar dike kû ev pirtûkên kû di Pirtûka Pîroz de ne, ji aliyê xwe ji bo hemû mirovatiyê wekî "***hîdayet*** û ***nûr***… û ***şîretekê***" hatin dayîn (Sure 5:46[10]). Di Qur'anê de ev vegotin jî heye: *"Heger tu ji tişta kû me ji te re şand bi guman bî, ji kesên kû **berî te Pirtûk** (Tewrat) **xwend** bipirse"* (Sure 10:94[11]). Û ji bawermendên Pirtûka Pîroz re wisa dibêje Qur'an: *"**Ey ehlê pirtûkê!** Heta kû hûn **biTewratê, Încîlê û bi** ya kû ji xwedayê we ji we re daketiye (Qur'an) **emel nekin** hûn ne liser tu tiştî ne"* (Sure 5:68). Ez wekî yekî ji *Ehlê Pirtûkê* yê kû Pirtûkê dixwîne û zêdeyî 30 salî ye *pê emel dike,* diyarkirina peyam û çîrokên peyxemberên kû we pir kêm bihîstine, ji bo xwe wek îmtiyaziyekê dibînim. Ev Nivîsên Pîroz yên kû hin ji wan berî Quranê zêdeyî 2000 salî hatine nivîsandin, rastiya kû li tu derên din peyda nabe di nava xwe dedihewîne.

## ÇÎROKA WÎ

Dê û bavê we tu carî ev şîret li we kir? “Tu carî bi yekî biyanî bawer nebin!” Ew bi mafdarî dizanin kû ji bo kû hûn bi yekî bawer bibin wê rast be kû hûn pêşiyê derbarê çîroka wî tiştinan bizanin.

Çend kesên kû hûn bi wan bawer dibin, bifikirin.

Hûn çima bi wan bawer dibin?

Hûn bi wan bawer dibin, lewre piştî pêvajoyekê hûn hîn bûn kû ev kes *bawerbar* in. Wan xerabî bi we nekirin, qencî bi we kirin. Dema kû soza kirina tiştekî dan, li ser soza xwe man. Hûn dizanin kû ew bawerbar in, lewra hûn bi *çîroka* wan dizanin.

Pirtûka Pîroz cih dide bi sedan çîrokên kû qal dikin bê xweda çawa bandor lı ser mêr, jin û zarok kirin e. Her çîrok, fersendeke bêhempa pêşkêş dikin da kû hûn pêrgî afirînerê erd û ezmanan bibin, peyvên ‘wî’ bibihîzin û karên kû dîroka mirovatiyê di bin şert û hawirên bi hezar salan de kiriye bibînin. Belê, EW mezin e, lê bi çi awayi mezin e? Xweda, hevgirtî(bênakokî) ye? Ma bi zagonê xwe re dikeve nakokiyê? na tu carî! Wehdên xwe bi cih tîne? Dikare me bixapîne? Em dikarin bi xwedê bawer bibin?

*Çîroka wî,* van pirsan hemûyan û hîn bi hezarên wek van dibersivîne.

Pirtûka Pîroz ne pirtûke ke dîrokî ye kû Xweda tê de bi tenê wêneyê mezin yê *dîroka mirovatiyê* rave dike; Pirtûka Pîroz **çîroka WÎ** pêşkêş dike.

## LÎSTİKA ŞANOYÊ YA DAWÎNÎ

Tu kesê kû ji çîrokeke xweş hez neke tune ye.

Pirtûka Pîroz bi sedan çîrokan dihewîne kû ev çîrok hemû dibin yek û *çîrokekê tenê*-ji nav çîrokên kû heta niha hatine vegotin ya herî kêşîner pêk tînin. Çîroka Pirtûka Pîroz ya derbarê Xweda û mirov, ji nav lîstikên şanoyê ya xwediyê nepena herî raser e. çîrokeke hezkirin û şer, qenc û xerab, pêvçûn û serfiraziyê ye. Ev çîrok, ji serî heta dawî bersivên bimantiq û têrker dide pirsên girîng yên jiyanê. Xwediyê lûtke û dawiyekê ye kû tu pirtûkên din ne xwediyên wan in.

Çend sal berê li mala me ya li Senegalê piştî kû min vegotina çîroka Xweda, ji bo komek jin û mêr qedand, xanimek ji nav guhdaran bi çavên tijî hêsir wisa got: "Çi çîrokeke nuwaze! Mirov ji Xweda bawer nekin jî divê bi kêmanî li xwe mikûr bên kû ew nivîskarê senaryo ya herî baş ê hemû deman e!" Di mêjiyê jina kû şîrove dikirî de ji nişka ve roniyeke derbarê ahenga navbera parçeyên Nivîsên Pîroz, ahenga ji bo pêşkêşkirina lîstika şanoyê ya serdeman ya kû hem Nivîskar û hem jî lehengê wê Xweda bi xwe ye, vêketibû.

## PEYAMA HERÎ MEZİN

Pirtûka Pîroz, ji naveroka çîroka herî kêşîner ya kû heta niha hatiye vegotin pir bêtir tiştandi nav xwe de dihewîne. Di hundirê çîrokên wê de *peyameke ji Xweda* hatî veşartî peyama herî dijwar ya kû heta niha diyarbûye.

Di hemû salên borî de min peyama Pirtûka Pîroz bi hezaran Misilmanan re nîqaş kir. Gelek ji van Misilmanên qalbûyî hevalên min ên takekesî bûn, min kesên din jî tenê bi riya postaya elektronîk nas kiribû. Em dikarin di her du rewşan de jî gewhera gelek nîqaşan, bi pirsekê tenê deynin holê:

**Peyama Xwedayê yek û rast, çi ye?**

## POSTEYA ELEKTRONÎK

Ev pirs bi gelek awayan pakêtbûyî tê.

Posteya elektronîk ya jêr ji min re, ji Rojhilata Navîn, ji hêla mêrekî kû em ê jê re bibêjin Ehmed, hat şandin.[12]

> Posteya Elektronîk
>
> Merheba. sa wekî Mesîh hat, ez ji vê yekê bawer dikim, lê belê wî tu carî negot kû ew Xweda ye. Berî kû Mihemed (Dua û silameta xwedê li ser wî be.[13]) bê, ew rêya ber bi xwedê bû, lê belê piştî kû Mihemed hat diviyabû hemû Xirîstiyan bibûna Misilman; lewra dema kû Mesîh di dawiya cîhanê de vegere, ne li gorî Peymana Nû ya kû we wê guhertiye, li gorî Quranê jî wê serwerî bidome.

Mesîh tu carî li çarmîxê neket. Heger kû hûn bixwazin maqûl bin, wê kûmimkinçê bibe kû hûn vê yekê fam bikin: kû ew li çarmîxê ketibûya jî, wê ev rewş tu carî nehata wateya kû gunehên mirovan sirf ji ber vê yekê hatiye şuştin. Ez vê ramana we pir eletewş dibînim. Ji bilî vê yekê, heger hûn angaşt bikin kû Xweda lawê xwe yê tenê û bêhempa qurban kiriye, hingê ez ê jî ji we re vê yekê bibêjim: ma qey Xweda bi qasî kû daxwaza xwe ji mirovan re bibêje û bi qasî kû bêyî kû "xwe yê delal" wekî qurban pêşkêş bike û êşkencê pê bike gunehên mirovan bişo, ne mezin e???! Ev ramanên we yên derbarên gunehan hemû ji bo min tu tiştî vegotin nakin.

Ji nav dînên kû heta niha ji mirovan re hatine şandin, ê bêhempa tenê Îslamiyet e û lewma ez neçar im kû bifikirim kûÎslamiyet rast e û dînê herî dawî yê kû diviyabû Xweda ew bişanda ye. Tek dînê kû çareseriyan ji bo hemû pirsgirêkên kû di jiyanê de tên pêşiya mirovan tîne, Îslamiyet e. Heger hûn bawermendên vî dînî bin di tu mijaran de hûn neçarî texmînkrina fikira Xweda nabin.

Quran, mûcîzeya herî mezin ya kû heta îro ji pêxemberekî re hatiye şandin e! Heger hûn berovajî vê yekê difikirin, hingê ayeteke kû dişibe ayetên Qur'anê an jî wateya wê nêzî wan, biafirînin!! Heger hûn yekî kû dikare Erebî bi asta herî bilind û herikbar bipeyive bin jî hûn ê nikaribin tu carî di vê yekê de biserkevin…

Her wiha, di orîjînala Pirtûka Pîroz ya we de ji bo hatina Mihemed pêşdiyar hene…

Ez vêga bawer dikim kû hîle tev li hemû pirtûkên Pirtûka Pîroz bûne, gelekê Pirtûka Pîroz sexte ye û hatiye guhertin û dizanim kû di vê mijarê de ne şaş im…

Dostê min, da kû hûn bizanin ez dinivîsim, min Peymana Nû xwend. Sedema xwendina min helbet ne lêgerîna rastiyê bû min ji ber eleqeya takekesî xwend, û ne carekê jî, du caran… û min ev yek fam kir: tu tişta vê cîhanê nikare nêzî mezinbûna Qur'ana ji Mihemed re şandî bibe û heger hûn dikarin dijbera van gotinên min biçespînin hingê vê yekê bikin. (bi heman awayî hatiye girtin[14])

Bimînin di xweşiyê de, "Ehmed"

Divê qaqibokirina Ehmed û şîroveyên wî hindik neyên dîtin.

Afirînerê me tiştên wisa hindik nabîne û divê em jî bi heman awayî tevbigerin. Xweda, di nivîsên kevin ên pêxemberan de ji bo her mijara kû Ehmed qal kiriye, bersivên famkirina wan hêsan dane, lewre her mijar, bi nêzîkahî têkilî vê pirsa xwedî girîngiya bêhed e:

*Peyama Xwedayê yek û rast* ***çi ye?***

Pêxember Eyûb, du pirsên mîna vê pirsîn:

*"Zanatî li kû peyde dibe?"* (Eyûb 28:12)
*"Li ber Xweda mirov çawa dikare mafdar derkeve?"* (Eyûb 9:2)

## RÊWÎTÎ

Li cîhaneke kû ji ber bi hezaran bersivên binakok hişê wê aloz bûye, armanca min ne ev e kû li aloziya heyî fikir an jî bersivên xwe zêde bikim. Berovajî vê yekê, ez we dawet dikim kû ji bo kifşkirina bersivên di Pirtûka Pîroz de veşartî yên pirsên jiyanê yên nîhaî, hûn bi dil û mejiyê xwe, di rêwitiyeke di Pirtûka Pirtûkan de bibin rêhevalên min. Di rêwitiya xwe deem ê li gorî Nivîsên Pîroz bibînin bê rastî çi ye? em ê li ser bersivên pêxemberan yên pirsên kû Ehmed û kesên din meraq dikin, bisekinin.

Piştî kû em li hawireke nû baniyan, li cihê kû Pirtûka Pîroz dest pê kir rêwitiya me jî wê bi awayekî fermî dest pê bike: dema kû berbanga dîroka cîhanê zelal bû. Bi pêdeçûna ji vê nuqteyê, em ê di nav demê re ber bi bêdawitiyê rê bikûdînin (Beş 2&3: mijar 8-30).

Wê rêwîtî, bi serdaneke nav bihuştê bi dawî bibe.

## Dİ DEMA RÊWÎTÎYÊ DE BİJARTİNÊN PÊKAN

YEK XWEDA YEK PEYAM, dikare wekî sê pirtûkên hundirê pirtûke kê bê dîtin. *Beş I,* li dijî astengiyên kû gelek kesan ji kifşa

Pirtûka Pîroz digire, disekine. *Beş II,* peyama esas ya çîroka herî xweş ya kû heta niha hatiye vegotin, radixe ber çavan. *Beş III,* derbasî paşxaneya bûyeran dibe da kû nêztir li armancên nuwaze ên kû xweda ji bo mirovan sêwirandiye, bê nihêrîn.

Wê gelek rêwî bifikirin kû beşa yekê ji bo amadekariya rêwîtiyê gelekî kêrhatî ye. Lê dîsa jî heger hûn jixwe dizanin kû Nivîsên pêxemberan bawerbar in, yan jî kû hûn bi tenê dixwazin li çîroka WÎ guhdar bikin û bêyi wendakirina wext peyama wî fam bikin, ji rasterast derbasbûna *Beş II* yan venekişin. Piştî kû we hemû rêwîtî temam kir, hûn dikarin li *Beş I* ê vegerin.

Heger hûn rêwîtiya bi gavên bêtelaş tercîh bikin, hingê hûn dikarin 30 mijarên pirtûkê li mehekê belav bikin û bixwînin, bi vî awayî hûn ê her rojekê li ser mijarekê hûr bibin.

Heger hûn Misilmanek bin, belkî jî bê hişê we kû hûn di 30 rojên Remezanê de vê rêwitiyê bikin. Ji ber van peyvên kû di Qur'anê de nivîsî divê hûn di ewlehiyê bi rê ve biçin: *"Di dîn de zorlêkirin tune ye. Lewra rastî, bi têra xwe ji rêşaşiyê veqetiyaye."* Û *"Ey Misilmanino, bibêjin kû, 'Me bi Xweda, bi ya kû ji me re daketî (Qur'an), bi yên kû ji Birahîm, Simaîl, Îshaq, Yaqûb û ji kûrên Yaqûb re daketî, bi yên kû bo Mûsa û Îsa dayî (Tewrat û Încîl) û bi yên bo hemû pêxemberên din ji aliyê Xweda dayî, îman anî. Em ji wan tu ye kî ji yên din cudatir nakin û em kesên teslîmbûyê wî ne.'"* (Qur'an Sure 2:256,136 Picktall[15])

Hûn kîjan rêgehê hildibijêrin bibijêrin, ha ji we re şîreteke girîng ya rêwîtîyê: piştî kû we carekê dest bi rêwîtiyê kir, *di ser tu beşên rêwitiyê re gav nekin.*

Her qonaxeke nû li ser qonaxa berî xwe ava dibe. Heger hûn hemû tiştên kû dîbînin tavilê wê gavê fam nekin jî, xwendinê û fikirîna li ser tiştên xwendî heta rûpela dawî bidomînin. Wê hin beşên rêwîtiyê xerîb bin û wê qaqibo bikin, lê belê li seranserê rê ji bo vehesîna we wahe hatine amadekirin.

Hejmara astengiyên kû wê bên pêşiya we çi dibe bila bibe, rêwîtiyê bidomînin.

## RASTÎ

Gelek kesên li her derê cîhanê difikirin kû tu kes nikare bizane bê di bersivên pirsên mezin ên jiyanê yên wekî 'Ezbeta mirovatiyê li kû derê dest pê kir?' 'Ez çima li vê rûzemînê me?' 'Dawiya min kû der e?' 'Rast çi ye û çewt çi ye?' de çi rast e, çi sexte ye.

Îro, li Rojava daxuyaniyên wekî 'Her tişt îzafî ye.' an jî 'Çewt e kû mirov bifikire kû mirovek dikare rastiya mûtleq bizane!' helwesteke pir bi raxbet e. Ji bo kû mirov xwezaya van daxuyaniyên wisa ya kû bi hev re di nakokiyêde ye bibîne, ne hewce ye kû li ser mantiqê doktora kiribe. Heger rastiya mûtleq tune be hingê kesên xwediyê dîtinek wisa çawa dikarin li ser 'her tiştî' bibin xwedî angaşt an jî di 'çewtiya' tiştekî de çawa dikarin ev qas israr bikin?

Mala Xweda ava be kû Afirînerê gerdûnê, yê kû rastiya xwe ya kû jiyanê diguherîne, ji mirovatiyê re rave kir, wisa nafikire. Ew ji hemû kesên kû bi dilekî safî li wî digerin, wisa dibêje:

*"**Hûn ê rastiyê bizanin,** û wê rastî we azad bike."*
(Yûhenna 8:32)

## BİJARTİNA RAST

Berî niha bi sê salan cîranekî 79 salî û nexweş ê bi navê Mûsa, ji min xwest kû ez hefteyê sê caran wî ziyaret bikim û jê re Pirtûka Pîroz bixwînim. Mûsa di hemû jiyana xwe de Qur'an Xwendibû lê tu carî ji bo xwendina Tewrata Mûsa, Mezmûrên Dawud û Mizgîniya Îsa-Pirtûkên kû Qur'an li hemû Misilmanan ferman dike kû ji wan bawer bikin û wan bipejirînin- bixwîne wext veneqetandibû.[16]

Dema kû me bi rêzeke kronolojîk çîrokên mifteyî rave dikir û hîn dibûn kû gunehkarên gemarîbûyî çawa dikarin ji aliyê Afrirîner û dadgerên xwe rast bên îlankirin, bi baldariyeke xurt zêde guhdar dikir. Carekê Mûsa ji min re got: "Piştî her axaftina me, li ser tiştên xebitî, tenê bi fikirînê qîma xwe naynim herwiha *bi kûrahî li ser diponijim jî!"*

Rojekê, piştî kû Mûsa rastiyeke din ya girîng ya di Nivîsên Pîroz de ravekirî hîn bû, bi vegotinyeke kû diyar dikir kû miradê

wî di ber de mabû, ji jin û keça xwe ya li cem wî rûniştî re, wisa got: “Çima heta niha tu kesan ev hînî me nekirin?”

Dû re, dema kû cîranê Mûsa pê hisiyan kû Mûsa bi yekî biyanî re li ser Pirtûka Pîroz dixebite, dest bi paşgotiniya wî kirin. Zext ewqasî zêde bûn kû dostê min ê kal ji min xwest kû ji bo wextekê ez wî ziyaret nekim û wisa got: “Ez rastiyê red nakim, lê zexta li ser malbata min giha asta dawî.”

Piştî nêzî şeş heftan em man (ji bo kû paşgotinî bisekinin), min û hevjîna xwe me Mûsa û malbata wî ziyaret kir. Wan me pir bi dilgermî pêşwaz kirin û pirsên kû pir li ser fikirîbû pirsîn. Berî kû ez ji cem wî veqetim jî ev şîrove kir: “A girîng ew e kû berî mirina xwe ez bijartina rast bikim!”

Mûsa fam kir kû *“kirîna rastiyê û ... nefirotina wê”* çiqas girîng e. [17] Dostê me yê delal piştî çar mehan mir.

Dema kû wextên min yên bi wî re bihurî bên bîra min, ez ê bersiva wî ya ji bo vê pirsê tu carî ji bîr nekim: “Mûsa heger tu îşev bimirayî, te yê bêdawîtî li kû bibuhiranda?”

Piştî senidîna bîstekê pirsa min bersivandibû: “Ez ê biçim bihuştê.”

Min pirsîbû: “Tu ji kû dizanî?”

Bi her du destên xwe hişk bi Nivîsên Pîroz girt û wisa got: “Lewre ez ji vê bawer dikim!”

## WEHD

Ez vê rêwîtiya kifşê ji bo we kû hûn dixwazin mîna Mûsa berî mirinê bijartina rast bikin, nedir dikim. Bila Xwedayê yek û rast bi destê we bigire, ji bo qevaztina hemû astengiyan alîkarî we bike û berê we bi derekê de da kû hûn têbigihên bê ew kî ye û ji bo we çi dike.

> *“Hûn ê li min bigerin, dema kû hûn bi hemû dilê xwe li min bigerin hûnê min bibînin.”* (Yeremya 29:13)

Peyvên Xweda yên derbarê vê mijarê de wehdeke teqez e kû ew dide we.



# 2

# Ji Heqê Astengiyan Derketin

*“Berî hûn* ***nezaniyê*** *binasin, ew ê we bikûje.”*
— Wecîzeya Wolofan

Xweda nêzî sê hezar salan diyar kir: *“Gelê min* ***ji nezaniyê*** *tune bû.”* (Hoşea 4:6) Heta îroj mezûnên zanîngehan jî tê de, gelek mirov derbarê nivîsên pêxemberên Pirtûka Pîroz bê agahî dijîn û dimirin.

Dema kû em kêmanî û bandora kû Pirtûka Pîroz dihêle, li ber çavan bigirin, ma kûmimkin e kû yekî li ser Pirtûka Pîroz nexwediyê feraseteke bingehîn, wekî yekî “baş perwerdebûyî” bê binavkirin?

Çawa kû serjimara cîhanê bi hezaran dîn derxistin holê, ji bo kû girîngiyê bi Nivîsên Pîroz nede jî bi hezaran sedem berpêş kirine. Em ê di vê beşê û beşa bê de ji van sedeman li ser deh heban bisekinin. Û heger me carekê dest bi rêwîtiya xwe kir, em dikarin pêrgîbûna li gelek astengiyên din û jiheqderketina wan bipên.

## DEH "SEDEMÊN" MİROVAN ÊN REDKİRİNA PIRTÛKA PÎROZ:

### 1. "EFSANE"

Li neteweyên dinyewîbûyî yên Rojhilat û Ewropayê gelek kes, diyar dikin kû Pirtûka Pîroz ji koleksiyoneke efsaneyên kelecanî hinekî bilindtir e û difikirin kû Pirtûka Pîroz peyvên xweş ên mirovan îcadkirî dihewîne. Gelek kesan ev raman bêyî kû tu carî li ser Pirtûka Pîroz lêkolîneke objektîf bikin, pejirandine.

Di kilasîka honakî ya Sir Arthur Conan ya bi navê *Bûyerên Navdar ên Sherlock Holmes*de, alîkarê dedektîf Dr. Watson derbarê bûyereke kûştinê ya taybet vê pirsê dipirse ji Holmes:

"Hûn çi encamê ji vê yekê derdixin?"

Holmes vê pirsê bi gotina "Ez vêga nexwediyê tu agahiyan im" dibersivîne. "Xeletiyeke girîng e kû yekî nexwediyê agahiyekê be teoriyan çêke. Ji dêvla kû teorî li gorî rastiyan bibin,da kû rastî li gorî teoriyan bibin kes, bêyî kû hay jê hebe dest bi berovajîkirina rastiyan dike.[18]

Derbarê Nivîsên Pîroz gelek kes heman "xeletiya girîng" dikin. Bêyî kû agahiyên besbar di dest wan de hebe digihên encamekê û li gorî rayên xwe yên cîhanê ji bo kû rastiyan, li teoriyên kû awayên wan yên jiyanê aciz neke biguncînin, rastiyan berovajî dikin.

### 2. "ŞÎROVEKİRİNÊN ZÊDE YÊN NEHEWCE"

Hin mirov Nivîsên Pîroz naxwînin, lewre dibihîzin kû komek dibêje "Pirtûka Pîroz vê yekê dibêje!" lê dîsa dibihîzin kû komeke din dibêje "Naxêr, tişta kû qesd dike ne ev e! Esas ew vê yekê dibêje!". Rawêja kû derbarê nefambariya Nivîsên Pîroz tê berpêşkirin, ne surprîzek e.

Ligel kû Pirtûka Pîroz li ser hin mijarên jiyan destûrê dide dîtinên cuda, lê dema kû mijar dibe bêdawîtî,[19] şîroveyên cuda qebûl nake. Famkirina pirtûk û peyama Xweda, bi şertê kû tenê em bala xwe bidinê bê peyam çi dibêje, mimkin dibe.

Sherlock Holmesê efsanewî her wiha ji Watson re wisa got: “Tu dibînî, lê belê bala xwe nadê. Ferqa navbera her duyan pir eşkere ye. Mînak, tu derenceyên ji holê ber bi vê odeyê her tim dibînî.”

“Her tim.”

Holmes pirsî: “Tu bi çi qas wext û navberê dibînî?”

Watson ev bersiv dayê: “Çend sed caran dibînim.”

“Çend heb? Nizanim.”

“Ez li benda vê bersivê bûm! Te bala xwe nedayê, lê dîsa jî te dît. Aha tişta kû dixwazim ji te re vebêjim, tam ev e. Ka îcar em bên ser min. Ez dizanim kû hivdeh pêlik in, lewra min hem dît û hem jî bala xwe dayê.” [20]

Wekî vê mînakê gelek kes di Pirtûka Pîroz de vegotinên curbicur *dibînin*, lê pir kêm kes li ser *bala xwe didin* wateya wan ya rastîn. Di encama vê yekê de jî nabe surprîz kû kes şîroveyên cuda bikin.

Ha ji we re pirseke kû dikare vê rewşê ronî bike: Ez *dixwazim* peyama Xweda fam bikim? Ez amade me kû bi heman azwerî û nijdîtiyeke ji bo gencîneyeke nepen, li rastiya Xweda bigerim? Qral Silêman ev nivîsandin: “*Heger tu bangî aqil bikî, ji dil gazî wî bikî, wekî kû li zîv bigerî li wî bigerî, mîna kû li gencîneyekê bigerî bi pey aqil bikevî:* ***hingê tu yê Xweda ji nêz ve binasî****.*”(Şîretên Silêman 2:3-5)

## 3. “KESÊN XİRÎSTİYAN”

Tiştekî din kû ji bo gelek kesan dibe sedema redkirina Pirtûka Pîroz, xerabiyên wan kesan in kû berpêş dikin kû Pirtûka Pîroz dişopînin. Ew dipirsin, dibêjin “Divê mirov ji bo qetilkirina ‘bêîmanan’ ya di bin navê senceqa çarmîxê de çi bibêje? “Hûn ê ji bo Engîzîsyonê çi bibêjin?” “Lê neheqiyên kû ji aliyê kesên kû angaşt dikin kû ji Pirtûka Pîroz bawer dikin, tên kirin?” Rastî ev e: hemû kesên bi navê Xirîstiyan (bi wateya yê kû dişibe Mesîh) yên derbarê vediyardina hezkirin û dilovaniya Mesîh neserkeftî, ne mînakeke zindî ya tiştên kû Îsa ji bo wan bû mînak û ew hînkir, e. Îsa wisa got ji şagirtên xwe re: “*We bihîst kû tê gotin, tu yê ji*

*cîranê xwe hez bikî û ji dijminê xwe nefret bikî. Lê belê ez ji we re dibêjim kû,* ***ji dijminê xwe hez bikin û ji bo kesên kû zulmê li we dikin duayan bikin****."* (Matta 5:43-44)

Herçî kesên din in, pirseke wisa dipirsin: "Ji bo Xirîstiyanên kû di jiyana xwe de cih didin sextekarî, serxweşî û bêexlaqiyê divê çi bê gotin?" Yekî kû jiyaneke bêexlaq dijî, rasterast bi bêîtaetiya Nivîsên Pîroz yên kû jiyaneke berovajî vê diyar dikin, dijî: "*Ma hûn nizanin kû gunehkar nikarin Serweriya Xweda mîrat bigirin. Nexapin. Wê ne fuhûşkar Serweriya Xweda bigirin, ne pûtperest, ne zînêkar, ne qûnde, ne hetîwbaz, ne diz, ne çavbirçî, ne araqvexur, ne kûfurbaz, ne jî şêlankar. Hin ji we wisa* ***bûn*** *lê we xwe şuşt, hûn hatin pîrozkirin û bi rêya Ruhê Xwedayê me hûn* ***pak bûn****.* (Korîntiyên 1., 6:9-11) '*Pakbûn'* tê wateya *rast îlanbûnê*. Dû re di vê rêwîtiya me ya nav Nivîsên Pîroz de, em ê kifş bikin bê gunehkar çawa dikarin bên bexşandin û ji hêla Xweda rast bên bangewazkirin.

Kesên pirsên wekî "Ji bo Xirîstiyanê kû xwe li ber heykelan ditewînin û ji Meryem û ezîzan re dua dikin, çi tê fikirîn?" dikin jî hene. Ev pirs bi kurtî dikare wisa bê bersivandin: kesên kû pêkanînên wisa dikin, ji dêvla şopandina hînkariya Peyva Xweda, kevineşopiyên dêrê dişopînin. Jixwe Peyva Xweda wisa dibêje: "*Hûn ê pûtan çênekin. Hûn ê pûtên qewartî an jî sitûnê kevir danînin. Ji bo pê perestinê hûn ê kevirê qewartî yên kû pûtan remz dikin, nexin welatê xwe. Lewre Xwedayê we REB ez im*" (Leviyî 26:1). Xwe tewandina li ber heykelan, girtina karbidestiya mirovan di ser a Xweda re, bêyî nasîna Xwedayê yek û rast bi awayekî mekanîk kirina duayan; ev hemû, peyikanên şêweyên pûtperestiyê nîşan didin. Hişê gelek kesan aloz dibin, lewre zen dikin kû peyvên *Xirîstiyan* û *Qatolîk* vegotinên hemwate ne. Lê ew di şaşiyê de ne. Peyvên *Xirîstiyan* û *Protestan* jî ne hemwate ne. Ketin û derketina dêrê kesî nake Xirîstiyan.

## 4. "KESÊN DURÛ"

Sedema kû kesin, ji bo kû Pirtûka Pîroz nexwînin berpêş dikin jî bela "hemû kesên durû ye". Gelek kesên berpêş dikin kû baweriya xwe bi Pirtûka Pîroz tînin, mixabin li gorî gotina xwe najîn. Peyama Pirtûka Pîroz ditewişînin û ji bo mexsedên xwe yên xwebîn ji bikaranîna navê Xwedê venakişin. Gelek waîz bi muptelatiya bo daxwazên xwe û bi bêexlaqiya xwe re tên pêşberî hev. Herçi hinên din in, dibêjin kû heger hûn ji wan re pereyan bişînin wê Xweda we bi tenduristî û dewlemendiyê bi bereket bike! Pirtûka Pîroz van kesan wekî *"kesên kû dibêjin qey rêya Xweda rêya peran e, fikirên wan çilvirî û rastî wendakirî"* bi nav dike û şîret dike kû hûn ji kesên wisa dûr bikevin. (Timoteosê 1., 6:5)

Îsa, neçar ma kû wisa xîtabî pêşewayên dîn yên serdema xwe yên kû berjewendiyên xwe derdixistin pêş, bike:

> *"Ey **Durûno!** Ev gotina pêxemberî ya Yeşeya ya ji bo we çiqas li cî ye: 'Ev gel **bi lêvên xwe** min zikir dike lê **dilê wan ji min dûr in**. Belasebep bi min diperesin. Lewra tiştên kû ew hîn dikin tenê fermanên mirovan in.'"* (Matta 15:7-9) *Û Îsa ji şagirtên xwe re jî ev peyv kirin:dema kû we dua kirin, nebin mîna **durûyan**. Lewra ew, da kû herkes wan bibîne zewqê distînin kû li kenîşteyan û li serê goşeyên kolanan bisekinin û dua bikin."* (Matta 6:5)

Em rastiya kû me her yekî bi awayekî sûcê durûtiyê kiriye (em angaşt bikin kû tiştekî me nekiribe, kiriye), li ber çavan bigirin, ma qey divê em destûrê bidin kû durûtiya kesekî din me ji nasîna Afirînerê me bide alî, ma qey em ê destûrê bidin kû ev yek me ji guherîna li gorî Peyva wî ya bawerbar ya kû dixwaze em bibin mirovên kû wî armanc kirine, bide alî?

## 5. "NÎJADPERESTÎ"

Ji ber kû hinek kes difikirin kû Pirtûka Pîroz beşek mirov di ser yên din re digire, ev yek jî dibe sedemeke redkirina Pirtûka

Pîroz. Em gelek li ser mijarên wekî nîjadperestî an jî baweriya kû nîjada me ji ya mirovên din çêtir e, di astên cuda de sûcdar in; peyva Pirtûka Pîroz a li ser vê mijarê eşkere ye: *"Xweda, di nav mirovan de cudatiyê nake."* (Karên Şandiyan 10:34)

Mînak, hûn dizanin kû Mûsa bi yeke Etîyopyayî re zewiciye?[21] We çîroka kû vedibêje bê Xweda çawa bi navbenda pêxember Êlîşa, fermandarê artêşa Sûriyê Neman- piştî kû li ber Xweda xwe pîs kir, nexweş ket ji kotîtiyê xelas kir, xwend?[22] An jî hûn çîroka kû Xweda ferman li pêxemberê Cihû Ûnis kir, da kû biçe bajarê Nînewayê (Iraq?) û peyama wî bibe ji bo tobekirin û xelasbûna gelê bajêr, dizanin? Ûnis ji gelê Nînewayê nefret dikir û dixwest kû Xweda wan tune bike, lê belê Xweda ji Nînewayiyan hez dikir û dilovaniya xwe nîşanî wan da.[23] Hûn jê hayedar in, bê dema kû welatê Persan (îran) çîroka pêkanîna rizgariya cîhanê ya Xweda vedigotin, çi qasî bi roleke girîng rabûbûn?[24] We çîroka şaşwazker ya kû Îsa peyama jiyana bêdawî bi jineke gunehkar a Samîriyeyî re par ve kir, xwendiye? – Tevî kû Cihûyan Samîriyeyî dereke dikirin û ew mirdar didîtin Îsa, peyama jiyana bêdawî ragihandibû wê jinê.[25]

Cîhana me marûzî tengasiyên kû nîjadperestî dibe sedema wan, lê belê Afirînerê me ne nîjadperest e. Di çavên wî de nîjad, tenê nîjada mirovatiyê ye.

> *Xwedayê ku dinya û hemû tiştên ku tê de ne çêkiriye, ewê ku Xudanê erd û ezmên e, di perestgehên ku bi destê mirov hatine çêkirin de rûnane. Wek ku ew hewcedarê tiştekî be, bi destê mirovan ji wî re xizmet nayê kirin; çimkî yê ku jiyan, hilm û her tiştî dide hemûyan, ew e. Ji bavekî, wî hemû miletên dinyayê afirandin û zemanên wan û sînorên dera ku ew lê dijîn, kifş kir ku ew li ser hemû rûyê erdê rûnin. Wî ev yek kir ku ew li wî bigerin û eger îmkan hebe bi destpelînkê wî bibînin, lê ew ji tu kesî ji me ne dûr e. Çimkî em bi wî dijîn, bi wî dilivin û bi wî hene. Çawa ku hin ji hozanên we jî gotine: ‹Em jî ji dûndana wî ne.* (Karên Şandiyan 17:24-28)

Rastiya gotina kû Xweda mirov ji yek bavî afirandiye, ji aliyê zanista modern jî ve, bi vê daxuyaniyê tê piştrastkirin: “Koda genetik ya mirov, an jî genome, ji bo hemû mirovên cîhanê bi rêjeya %99 eynî ye. Derbarê rêjeya mayî berpirsiyara cudatiyên me yên takekesî DNA ye- mînak cudatiya rengê çavan an jî xetere ya nexweşiyê.”[26]

Xwedî û Afrînerê “*erd û ezman*”, “*ê kû ji me tuyan ne dûr e*”, bi min û we re bi awayekî takekesî eleqedar dibe û dixwaze kû em li *“Reb bigerin”* û peyama WÎ fam bikin. WÎ hemû kitekitên derbarê jidayikbûna we, sererast kiriye. Ew ji mirovên hemû neteweyan bêyî cudakariya ziman, çand û reng bike, hez dike û wan vedixwîne kû bi zimanê xwe yên dil Navê WÎ bang bikin.

## 6. “XWEDAYÊ PİRTÛKA PÎROZ KUŞTİNÊ PESEND DİKE”

Ev posteya elektronîk, ji xwedênenase kî (an jî bi gotina kû wî tercîh dikir kû xwe pê bi nav bike ji *humanîstekî dunyewî*) hat:

Posteya Elektronîk

Pirtûka Pîroz dibêje kû Xweda wisa dibêje: “Ez, Reb Xwedayekî tije hezkirin û dilovanî me, zû hêrs nabim û hezkirin û dilsoziyeke mezin nîşan didim.” Dema kû xwe dipesinîne, peyvên kû bi kar tîne xweş in, lê belê tu peyv ji van peyvên wî bi tevgerên wî re hevdu nagirin. Di kanûna 2004’an de dema kû Xweda di karesata tisûnamiya li başûrê rojhilatê Asyayê de destûra mirina du sed û pêncî hezar kesî da, bi qasî kû digot dilovan nedixuya… Dema kû dikeve diyarê Kenanê yê navborî, Xwedayê Pirtûka Pîroz kuştina mêrên aram û masûm, kuştina jin, zarok û pitikan pesend dike… Sedema kû hezkirina yekî wek min fanî, ji ya “Afirînerê” qalkirî bêtir e, çi ye? Heger hêza min têra astengkirina hemû pêvçûn, nefret, şer, kuştin, karesat, birçîtî, xemgînî û sefaletiyên cîhanê bikira, min ê tu carî destûr neda van yekan tuyan!

Gelek kes vê pirsê dipirsin: “Heger Xweda hem baş e û hem

jî hêza wî têra her tiştî dike, *hingê çima xerabiyan bi dawî nake*?" Tişta balkêş ev e kû pir kêm kes pirseke wisa dikin: "Heger Xweda hem baş e û hem jî hêza wî têra her tiştî dike, dema kû ez xerabiyan dikim *çima* ***min*** *nasekinîne*?" Em dixwazin kû Xweda xerabiyê bidarizîne, lê em naxwazin kû EW me bidarizîne.

Piştî kû me bal kişand ser vê nakokiyê, ka em qebûl bikin dostê me yê humanîst qaqibo anine hişk kirin. Di vê mijarê de bersivên hêsan tune bin jî yên tetmînker hene. Paşê, wexta kû em di rêwîtiyên Nivîsên Pîroz de bi kesayetiya Xweda û bi encamên gunehan ên kû dirêjî dahatûyê dibin re rûbirû bimînin, wê bersivên kû Xweda derbarê vê pirsê didin, zelal bibin. Hey dora wê hatiye, dema kû xweda destûrê dide karesatên kû dawî li jiyana mêr, jin, zarok, pitikan tîne û hetta van karesatan ferman dike, sê rêgez hene kû wê me ji darizandina Afirînerê me biparêzin, ka em qala van *sê rêgezan* bikin:

1) ***Mirov tenê parçeyekî dibînin, lê ya kû Xweda dibîne, temamê wêne ye.***

Mirov, "goriyên masûm" "dema kû bêyî kû wexta wan tije bibe dimirin" van mirinan wekî "trajediyên nedadmend" diserifînin, lê belê Xweda bûyeran ji riwangeya bêdawîtiyê dibîne. Ew, îlan dike kû hebûna mirovekî ya demekî û derkî, tenê destpêkeke bûyera esas e.[27] Jiyan, ji tiştên kû bi çavan tên dîtin, pir zêdetir e. Mînak, em cenînekî di zikê dêya xwe de, bînin ber çavên xwe. Heger li ser temelê bisînor ê dîtina cîhanê, karîbûya li gorî mantiqê rave bikira, belkî jî ev tiştên han ji Xweda re bigota: "Ma ji bo kû ez kilîtbûna di vî torbeyê embrîyonê de heq bikim, min çi kir? Dengê lîstik û kenê zarokên derve tên min, lê ez li vê cîhana tarî û tije av, heçko di gorê de me! Ev rewş qet ne adîl e! Sedema kû hezkirina min, kû tenê cenînek im, ji ya Afirînerê min zêdetir e, çi ye?"

Temet em dizanin pitikên kû hîn ji dayik nebûne, bi vî awayî qaqiboyê li Afirînerê xwe nakin, lê belê yên bîrbir qaqiboyê li Xwedayê xwe dikin. "*Lê belê ho mirovo tu kî yî kû, bersivêdidî Xweda? Ma yê kû şêwe girtiye, ji yê kû şêwe daye wî re dibêje, 'çima te ez wisa çêkirim?'*" (Romayî 9:20)

**2) *Ne hewce ye kû wan tiştên mirov çewt dibîne, Xweda jî çewt bibîne.***

Ew Xwedayê kû çavkaniya jiyanê ye û jiyanê didomîne, di heman demê de xwediyê mafê bidawîkirina jiyanê ye jî. Eyûb pêxemberê kû di encama karesatên li pey hev ên siruştî, hemû tiştên xwe û deh zarokên xwe wenda kir, ji dêvla kû li Xweda qaqibo bike, jê re serî tewandibû û wisa gotibû: *"'Ez tazî hatim vê cîhanê, ez ê tazî biçim. Reb da, Reb sitend. Pesin li ser navê Xweda bin!' Tevî van bûyeran gişan Eyûb guneh nekir û Xweda sûcdar nekir."* (Eyûb 1:21-22)

Rêwîtiya me ya kû heta vêga gihîşt astekê, wê ji bo hin xalên li paşperdaya bûyeran kû bi me ecêb tên, lê tevî vê dîsa jî gelaleyên zanatiya Xweda ne, têgihîştinê pêk bîne.[28] Em ê pêrgî Rêveberê Serwer ê gerdûnî bên, ê kû ji bo kû jê hez bikin û jê re teetê bikin zorê nade mirovan. Û di heman demê de em ê fam bikin bê çima cîhan niha di vê rewşa erjeng de ye.

**3) *Wê Xweda, a soxî edaleta kû ji bo herkesî mukemel e, pêk bîne.***

Dema em hewl didin kû wateyê bidin bûyerên rabirdûyê û yên îroyîn, wê kêrhatî be kû em bînin bîra xwe kû Afirînerê mirov derbarê her canî xwediyê agahiya bêkêmanî ye: ê kû xwediyê agahiya bêkêmanî ye, ew e, ne em in. Xweda ne bi pîvanên me yên exlaqî kar dike, bi yên xwe dike. Em nikarin jê re bibêjin bê çi rast e, çi çewt e; EW ji me re dibêje. Tevî kû Xweda, derbarê biryarên mirovan ên kû kesên din bi neyinî bandor dike, destûrê dide wan, lê ber xerabiyê tu carî ne laqayd e. Rojeke darazê ya kû wê Xweda her jinê, zarokî, mêrî li gorî rastiya pîvana xwe bidarizîne tê. Dereceyên nîhaî yên hezkirin û edaleta WÎ bê sînor in.[29] *"REB Xwedayê dadmend e; çi xweş ji bo yên kû bi bêrîkirin li benda WÎ ne!"* (Yeşeya 30:18)

Heger hûn jî wek wî dostê me yê kû me bi rêya posteya elektronîk ji hev re nivîsî, "xwe ji Afirînerê xwe dilovantir dibînin", hingê xwendinê bidomînin. Xweda, razên xwe ji bo kesên bi qasî kû peyvên WÎ bibihîzin dilnizm û bisebir in, eşkere dike.

*"Tiştên veşartî yên Xwedayê me Xudan in, lê tiştên hatin eşkerekirin her û her ên me û yên zarokên me ne ku em hemû gotinên vê Şerîetê pêk bînin.* (Duberakirina Şerîetê 29:29)

## 7. "PİRTÛKA XWEDA MİJARÊN WEKÎ … DİHEWAND NAHEWÎNE"

Kesên hewl didin kû sedemên xwe yên redkirina Pirtûka Pîroz bi van peyvan mafdar derxin: "Heger Pirtûka Pîroz îlhama Xweda bûya, hingê di hundirê wê de cih nedida çîrokên kesên zinêkar, yên bi xizmên xwe re dikevin têkiliyê, xayin, pûtperest û kesên kiryarê xerabiyê kerax ên mîna van. Li gorî têgehên îlham û ravekirina kesên wisa, diviyabû naveroka pirtûka Xweda tenê bi veguhastina rasterast a peyvên Xweda bimaya.

Lê belê dîsa jî, ji ber kû Nivîsên Pîroz armanc dikin kû mirovan di bin banê dîrokê de teqdîmî Afirînerê wan bike, divê wekî surprîzekê neyê dîtin kû Pirtûka Pîroz tenê ne kar û peyvên Xweda, di heman demê de guneh û şaşiyên mirovan jî tomar kiriye. Ma mafê Xweda tune ye kû li hember paşperdeya reş a têkçûna mirovatiyê, bilindî, saftî, dilovanî û dilsoziya xwe rave bike? Ma em dikarin biwêrin dîkteyî yê kû Hêza Wî Têra Her Tiştî Dike, bikin bê divê Xwe û peyama xwe çawa rave bike an çawa neke?

*We her tiştî serobino kir! Ma cerçêker bi gilê re yek e? Ma avahî ji bo kesê ku ew çêkiriye dikare bibêje: "Ma wî ez çêkirime?!" Ma tiştê ku şikil lê hatiye dayîn, Dikare ji bo kesê ku şikil daye re bibêje: "Ma ew ji tiştekî fêm nake?!"* (Yeşaya 29:16)

Pirtûka Pîroz gelek bûyerên dîrokî yên kû Xweda wan pesend nake, lê destûrê dide wan tomar dike. Xwedayê rast û jîndar, Yekî wisa ye kû zewqê distîne kû rewşeke xerab veguherîne tiştekî baş. Belkî we çîroka Yaqûb ê yazdemîn Ûsiv, bihîstiye (Afirîn 37-50). Deh kekên Ûsiv hebûn û ji wî nefret dikirin; bi xerabî pê emel kirin û a soxî ew wekî kole firotin Smaîlzadeyan. Tevî kû tu

gunehê wî tune bû Ûsiv ket zîndanê, lê belê ya rastî Ûsiv bi rêya vê rewşa xerab rabû textê Misirê ji hêlî Xweda û bi vê yekê kekên xwe, Misirî û welatên cîran ji mirina ji ber birçîbûna xelayê xelas kir. Dûre di dilên kekên Ûsiv de guherîneke tundraw qewimî û hingê Ûsiv ji wan re wisa got: *“Hûn* ***li dijî min li xerabiyê*** *fikirîn, lê belê Xweda, wekî kû îroj diqewime,* ***ji bo parastina jiyana gelek gelan****, ew xerabî veguherand* ***qenciyê****.”* (Afirîn 50:20)

## 8. “PİRTÛKA PÎROZ TİJE NAKOKÎ YE”

Gelek kes derbarê mijara kû Pirtûka Pîroz tije nakokî ye, israr dikin, lê dîsa jî pir kêm kes wexta xwe vediqetînin da kû bi nêrîneke bêalî lêkolinê li ser bikin. Ma tevgereke adîl e kû mirov Nivîsên Pîroz li ser hîmê gotinên yekî din ên ji bo wê bidaraze? Ma pirtûkek tenê bi xwendina çend beşên wê dikare bê famkirin? Ma divê pirtûkeke girîng tenê ji bo lêgerîna şaşiyên çapê û nakokiyên metnan bê xwendin? Em hêvî dikin kû divê ne wisa be. Lê belê dîsa jî gelek kes Pirtûka Pîroz wisa dixwînin.

Berî niha bi salan ji yekî posteyeke elektronîk hat ji min re; lîsteya dirêj ya kû ji min re şandibû ji malperekê kopî kiribû û di vê lîsteya dirêj de şaşî û nakokiyên kû tê angaştkirin kû di Pirtûka Pîroz de ne, rêzkirî bûn. Ez hin jêgirtinên vê lîsteyê veguhêzim:

> Posteya Elektronîk
>
> Pirtûka Pîroz a we bi xwe re dikeve nakokiyê. Mînak:
>
> - Roja destpêkê Xweda ronî afirand, dûre ronî ji tariyê veqetand (Afirîn 1:3-5). Tava kû şev û rojê ji hev vediqetîne heta roja çaran nehat afirandin (Afirîn 1:14-19).
> - Roja kû Adem fêkiya qedexe bixwara wê bimira (Afirîn 2:17). Adem 930 sal jiya (Afirîn 5:5).
> - ***Îsa nadarizîne (Yûhenna 3:17; 8:15; 12:47). Îsa didarizîne (Yûhenna 5:22, 27-30; 9:39; Karên Şandiyan 10:42; Korîntiyên 2., 5:10)***
> - Hwd...
>
> Vêga dixwazim pirsekê ji we bikim: Dînê we destûrê dide kû pirsê bikim û berî kû vê pirsê qebûl bikim mejiyê

> xwe bi kar bînim? An jî min dixwaze kû çavên xwe bigirim û nehêlim kû mejiyê min pirsan hilberîne? Lewra, ez ji xwe dipirsim bê mimkin e kû Xweda di pirtûka xwe de ev qas şaşiyan bike, û bi sirûştî bersiva 'NA' didim vê pirsê!? (ji parçeyê veguhastî 'bi heman awayî' hatiye girtin)

Belê, Xwedayê kû dibêje "*Ka werin, vêga em **doza xwe bibînin***" (Yeşaya 1:18), ji min dixwaze kû "pirsan bipirsim û mejiyê xwe bi kar bînim". Xweda me her yekî dawet dike kû em li ser Peyva WÎ ji bo xwe bifikirin. Kopîkirina lîsteya nakokiyan ya kû yekî din amade kiriye, wê ne bes be. Silêman got kû *"Kesê kawik ji her peyvê bawer dike, lê yê bisemt jî her gava xwe dihesibîne"* (Şîretên Silêman 14:15).

Dema kû em li rêya xwe ya em ê di Nivîsên Pîroz de bidomînin, bifikirin, wê bersivên "nakokiyên" xwediyê posteya elektronîk derkevin holê.[30] ***Lê belê dîsa jî belkî em hemû dikarin ji bo vê gavê li ser fikirekê li hev bikin: jiyan, ji bo kû em lêkolîna xwe ya hundirîn bikin zêde kurt e, lê bêdawîtî jî zêde dirêj e.***

Heger we mêweya biekl û biav a mangoyê xwaribe, hûn ê bizanin kû hewldana binavkirina tahma vê mêweyê ji yekî din re wê ne bes be. Divê ew kes bi xwe mangoyê tahm bike. Bi heman awayî gotinên yekî din yên derbarê Peyva Xweda wê ji bo we ne bes be. Divê hûn bixwe Peyva Xweda tam bikin.

> *"**Tam bikin û bibînin** ka Xweda çi qas baş e!"*
> (Mezmûr 34:8)

Bûyîna şagirtê şiyarbin baldar û bi îhtimam a Nivîsên Pîroz, mijareke rêjerast e bi eleqa we ya takekesî a kû hûn didin bêdawîtiyê – *"yê meqbûl, ew kesê kû danezana rasteqîniyê rast bi kar tîne"*. (Timoteosê 2., 2:15) Ji şert û derdorê re kû naverok tê de cih digire (hemû beşên kû nakokî tê de tê angaştkirin) re şiyarbin nekirin, ji bo rast bikaranîna Peyva Rast ne riyeke lêhatî ye.

Ji bo ravekirinê mînakek bidim: di Pirtûka Pîroz de wekî kû ayetên nedarizandinê kû ji me re tên fermankirin hene, ayetên darizandinê kû ji me re tên fermankirin jî hene.[31] Gelo ev ayet di

nav xwe de *di nakokiyê de ne?* Na, hev û du ***temam*** dikin. Pirtûka Xwedê ji aliyekî ve ji min re dibêje kû, wekî mexlûqekî kû zanîna wî bisînor e divê ez motîf û tevgerên kesên din, bi baweriya xwe, bi giyanekî kû şaşî dibîne nedarizînim (tawanbar nekim). Lê ji aliyekî din ve jî, bi esasgirtina gotinên Nivîsên Pîroz, ji min re darizandin hatiye fermankirin kû rastiyê ji şaşitiyê û rastiyê ji derewê veqetînim.

Hingê derheqê nakokiyên kû dibêjin di Pirtûka Pîroz de ne, divê mirov çi bibêje?

Min wekî takekesî ji bo van hemû cureyên "nakokiyan" çareseriyên kû mirov têr dike, dîtin. Û di heman demê de min ev jî dît: heya kû mirov *bixwaze* Nivîsên Pîroz fam bike, çawa kû *"nakokiyên"* wan ên kevin bigihîje encamekê, wê "nakokiyek" nû bibînin dîsa.[32]

Hûn *dixwazin* peyama Xwedê fam bikin? Naxwe ji bo dîtina fikra *xwe* pirtûka Xwedê nexwînin; ji bo kû famkirina fikra Wî Pirtûka Xwedê bixwînin. Li ser her pirtûkên Pirtûka Pîroz cuda cuda bixebitin. Ji bo şîrovekirina cihên kû hûn dixwînin zêde nexebitin. Bihêlin bila Pirtûka Pîroz bixwe xwe şîrove bike. Nîvîsên Pîroz ên kû bi gelek sedsalan, ji hêla gelek pêxemberan ve hatine nivîsîn, şîrovekarên xwe yên herî baş in.[33]

> *"Tiştên kûr û veşartî derdixe holê; dizane di tarîtiyê de çi heye; derdora WÎ bi roniyê hatiye dorpêçkirin."*
>
> (Daniel 2:22)

## 9. "EZ, Jİ PEYMANEKE NÛ BAWER NAKİM"

Demeke berê, min ji xanimekê ev posteya elektronîk girt:

> Posteya Elektronîk
>
> Baweriya min bi peymana nû tune ye. Tenê ji peymana kevin bawer dikim. Ez bawer nakim kû gotinên Xwedê ji bo dema nû bên guhertin û ji nû ve bên nivîsîn. *(rasterast hatiye veguhestin)*

Wekî gelek kesên din, ev kesa kû ev peyama elektronîk şandiye jî hê fam nekiriye ka çima di pirtûka Xwedê de Peymaneke Kevin û Peymaneke Nû heye. Di Nivîsên Pîroz de hebûna van du beşên bingeh, nayê wê wateyê kû Peyva Xwedê "hatiye guhertin an jî ji nû ve hatiye nivîsîn". Lê berevajî vê, Xwedê vê plana kû *berê hatiye ragihandin û tê cih* ji bo mirovan sêwirandiye.

Bûyerên kû di dîrokê de bûne, bi navbeyna demê ya kû derketine holê tên xuyakirin. Mînak, tê gotin kû jidayîkbûna Birahîm Pêxember, **B.M *nêzî sala 2000an pêk hatiye, lê Quleyên Cêwî yên New Yorkê,* P.M** di sala 2001an de bi êrîşekê hatine hilweşandin.[34] Dîroka cîhanê du beş e. Pirtûka Xwedê jî bi heman awayî du beş e.

Peymana Kevin û Peymana Nû ya Pirtûka Pîroz heye. Peyva "peymanê", *tomara zagonî, kontrat an jî muqawele –wekî biryareke kû di navbera du kesan de tê girtin*, peyvek e kû di mijaran de dikare bê bikaranîn.[35] Niha, em li du beşên Nivîsên Pîroz bi awayekî serabera dinêrin. Gava em di navbera Peymana Kevin û Nû de rêwîtî bikin, dê armanc û hêza van du beşan zelal be.

**Beş I: Peymana Kevin.** Nivîsên Peymana Kevin kû bi Îbrankî û Aramkî hatine nivîsîn, bi sê beşan kû wekî *"Zagona Mûsa* (di heman demê de Tewrat jî tê gotin), *"Pêxember û Mezmûr"* hatine diyarkirin, pêk tên. (Lûka 24:44) Xwedê, di demeke ji hezar salan zêdetir de ev nivîs ji nêzî sih pêxemberan re neqil kirine. Ev nivîs ji afirandina Adem heya dema Împaratoriya Persan (B.M nêzî 400), tomarek dide nîşan bê Xwedê ji dîroka mirovahiyê re çawa mudaxile kiriye.

Peymana Kevin, bi vegotineke kû aîdê zimanê pêxemberan e, ji korîdora demê bi nêrîna ber bi jêr re, bi sedan bûyerên dîrokî beriya kû hê pêk nehatine, tîne zanîn û dawiya dinyayê dibîne.[36]

Peymana Kevin, peymana kû Xwedê beriya jidayîkbûyîna Îsa Mesîh (B.M) pêşkêşî mirovan kiriye, rave dike. *Mesîh*, kû di zimanê ***Îbrankî*** de tê wateya 'Kesê Meshkirî' an jî 'Kesê Hilbijartî' beramberê peyva Mesîh a Grekî ye. Ev Nivîsên Pîroz,

ji berê ve haypêxistina bûyerên bingeh ên girîng, ji bo kû mirovan ji guneh û encamên gunehan rizgar bikin, berê wan dane Mesîhî. Peymana Kevin di heman demê de ev soza girîng jî dihewand:

*"'Rojên kû ez ê peymaneke nû çêkim tên' dibêje Xwedê."*
(Yeremya 31:31)

**Beş II: Peymana Nû.** Nivîsên Peymana Nû kû di zimanê Grekî de hatine nivîsîn, di heman demê de wekî *Mizgînî* (an jî bi Erebî *Incîla* bi wateya "Nûçeya Baş") tên binavkirin. Peymana Nû ya kû P.M bi domahiya sedsala destpêkê herî kêm ji hêla heşt kesan ve hatiye nivîsîn, cara destpêkê hatina Mesîh a serzemînê tomar kiriye. Di heman demê de der heqê Nivîsên Peymana Kevin de şîroveyeke Xwedayî dike û ji berê de dibêje ka dê dinya çawa bi dawî bibe. Hemû pêxemberiyên Peymana Nû bi pêxemberiyên Peymana Kevin re di ahengeke nuwaze de ne.

Peymana Nû ji mirovan re, pêşeka kû Xwedê wekî encama hatina Mesîh (P.M) dabû, rave dike. Ev nivîs, bi sedan bûyerên mifte kû ji aliyê pêxemberan ve berê hatibûn gotin nîşan didin kû wekî dîrokî pêk hatine, û *demên berê* ***nîşan dikin.***

Peymana Nû, di heman demê de wekî Peymana Kevin roja vegera Mesîh a rûzemînê re jî nîşan dide. Gava Mesîh ev peyv digotin, rastiya girîng a kû me behs kir vedigot: *"Nefikirin ku ez hatime Şerîetê û nivîsarên pêxemberan ji holê rakim. Ez nehatime ku ji holê rakim, lê ez hatime ku temam bikim."* (Matta 5:17)

Di navbera Peymanên Kevin û Nû de qet nakokî tune ye. Wekî tovekî kû bi zîldayînê hêdî hêdî şîn dibe û ber bi dareke gihiştî ve diçe, plana kevin a kû Xwedê ji bo mirovahiyê sêwirandiye, di Peymana Kevin de kok berdaye û di Peymana Nû de gihiştiye. Her beşa pirtûka Xwedê, peyama kû Ew dixwaze em fam bikin nîşan dide.

Xanima kû ji min re postaya elektronîk nivîsîbû, di baweriya xwe ya *"Peyvên Xwedê nikarin bên guhertin û ji bo demên paşî jî nikarin ji nû ve bên nivîsîn"* de mafdar e. Cihê vê xanimê fam nekiriye ev e kû, *"Peyvên Xwedê" wê bêne cih û wê pêk bên,"* e.

## 10. “PİRTÛKA PÎROZ HATİYE GUHERTİN”

Heya vê gihanekê, me der heqê neh astengên kû nahêle mirov Pirtûka Pîroz bixwîne û baweriya xwe pê bîne de axivî. Lê dîsa jî, me behsa liberrabûna herî belavbûyî ya kû heya niha min ji hevalên xwe yên Misilman bihîstiye, nekir. Ehmed, ev liberrabûn berê di postaya elektronîk de anîbû zimên:

Posteya Elektronîk

Tişta kû ez bawer dikim û dizanim ev e: Beşeke mezin a Pirtûka Pîroz bi rewşa xwe ya îro, ji ber kû ji her pirtûka wî re hîle hatiye tevlihevkirin, sexte ye û hatiye guhertin…

Gelo Ahmed mafdar e? Orîjînala Nivîsên Pîroz hatine guhertin? Beşa din bersiva van pirsan dide.



# 3

# Hat Guhertin An Hat Parastin?

*"Giya ziwa dibe, kûlîlk* ***diçilmise****,*
*Lê peyva Xwedayê me,her u her dimîne."*
— Pêxember Yeşaya (Yeşaya 40:8)

Postaya elektronîk a kû li jêrê hatiye diyarkirin, ji parçeyên kû ji çar cihên cuda yên cîhanê hatine hilbijartin û fikrên kesên kû ji mîlyarek zêdetir in li dinyayê dijîn, tîne vegotin ziman:

**Posteya Elektronîk**

Em ji hemû Nivîsên Pîroz ên Xwedayî bawer dikin, lê ji yên kû orîjînal in.

**Posteya Elektronîk**

Ji bîr nekin kû hûn xwedî peymaneke kevin û peymaneke nû ne kû peyvên tê de cih digirin hatine guhertin. Peyvên kû di Qur'ana Pîroz de cih digirin bi salan e eynî ne.

**Posteya Elektronîk**

Pirtûka we ya Pîroz ji nû ve hatiye nivîsîn, hin tişt li ser hatine zêdekirin, û ji ber kû bi baweriya we ya nexweşok re li hev bê, metneke di serî de ji nû ve hatiye sazkirin, û hatiye guhertin e.

Posteya Elektronîk

Ez bawer dikim kû Pirtûka Pîroz bi salan e, heta bi hezaran sal e hatiye guhertin û ez wisa difikirim kû ne bi temamî jî be, beşeke mezin a Peymana Nû bitemamî metneke nehêja ye kû ji hêla pêxemberekî sexte yê bi navê Pavlûs ve hatiye afirandin. Ji ber vê yekê, jêgirên kû hûn ji Pirtûka Pîroz digirin ji bo min wendakirina wext e û/an jî ji bilî peyvên kû diêşînin tiştek din vegotin nake.

Gelo ev angaşt bikêr in? Xwedayê bêdawî ji mirovê bêdawî re destûr daye kû, berî demeke dirêj, ji Nivîsên kû ji pêxemberên xwe re rave kiriye, re hîle tevlî bikin û van Nivîsan biguherînin.

## PEYVEKE KESANE KÛ Jİ BO MİSİLMANAN TÊ GOTİN

Li vir, ez dixwazim rasterast dengê xwendevanên xwe yên Misilman bikim.

Wekî îhtîmaleke mezin e kû hûn dizanin, Qur'an bi awayekî zelal dibêje kû Nivîsên Pirtûka Pîroz—*Torah (Tewrat), Mezmûr (Zebûr) û Mizgînî (Încîl)*—ji hêla Xwedê ve, ji bo kû ***"rêberî û nûr" bînin, hatine dayîn*** (Sure 5:44-51)***. Di Qur'anê de, di heman demê de ev vegotin cih digire:*** *"(Ya Mihemed!) Me ji bo te jî ew Pirtûk (Qur'an) heq,* ***pirtûkên li ber te*** *(Pirtûka Pîroz)* ***rastker, me ew wekî çavnêr daxistin****"* (Sûre 5:48). Û *"Beriya te jî me ancax hin mêrên kû me ji wan re wehî kir, wekî* ***pêxember*** *şand. Kû hûn nizanin ji* ***kesên xwedî ilm*** *(Pirtûka Pîroz)* ***bipirsin****."* (Sûre 21:7) Qur'an di heman demê de vê hişyariyê jî dike: *"Ew kesên kû pirtûk (Qur'an) û* ***tiştên kû em ji pêxemberên xwe re dişînin****, derew derdixin ... wê di agirê de bêne şewitandin."* (Sûre 40:70-72)

Qur'an her tim[37] wisa daxuyanî dide, ew kesên pirtûkên Pirtûka Pîroz yên kû ji hêla Xwedê ve hatine wehîkirin red dikin, dê biçin cehenemê. Ev peyv, peyvên Qur'anê ne.

Ev peyvên Qur'anê, ji bo Misilmanên kû li hemû welatan dijîn mamike ke cidî derdixe holê, lewre Pirtûka Pîroz û Qur'an ji bo

kesayetiya Xwedê û ji bo armanc û planên kû ji bo mirovahiyê çêkiriye, di bingehê de du peyamên yekcar ji hev cuda pêşkêş dikin.

Gelek Misilman ji ber vê ye kû encama tehrîfkirina Pirtûka Pîroz derdixin holê. Pirsên jêrê ji gelek kesê re alîkarî bûye da kû li ser vê encamê bifikirin.

## ÇEND PİRSÊN KÛ Jİ BO MİSİLMANAN HATİNE AMADEKİRİN

- Hûn bawer dikin kû *hêza* Xwedê ya parastina Nivîsên Xwe heye?
- Kû hûn bawer dikin, hûn difikirin ka *dixwaze* Nivîsên Xwe biparêze?
- Kû hûn bawer dikin kû Nivîsên pêxemberan hatine guhertin:
    - o *Kengî* hatin guhertin?
    - o *Li kû* hatin guhertin?
    - o *Kê* ew guhertin? Kû hûn difikirin kû Xirîstiyan an jî Yahûdî ev Nivîs guhertin, naxwe hûn çima difikirin kû ev qas kesên kû dixwazin di ber parastina van Nivîsan de bimirin, pirtûkên pîroz diguherînin û xira dikin? [38]
    - o Di vê mijarê de delîlê we yê hûn bikaribin pêşkêş bikin ***çi ye***?
    - o Ew ê kû Hêza Wî Têra Her Tiştî Dike, *ji bo çi* ji mirovên fanî re destûr daye kû bila tomarên hatine nivîsîn û raveyên wan biguherînin?
- Kû Xwedê destûr dide kû pirtûkên Mûsa û Dawud pêxember bên guhertin, hûn ***çawa*** dizanin kû ev pirtûka kû baweriya we pê tê jî rastî vê bêhurmetiyê nehatiye?

Armanca vir, ne ew e kû bi van pirsan re bêhna mirovan teng bikin, lê gelek kes ji vê "tawanbarkirina guhertinê" bawer dike û ji ber kû ev mijar xwedî girîngiyeke bêdawî ye, em pirsek din bipirsin:

- Hûn difikirin kû Nivîsên Pirtûka Pîroz, **beriya** şandina Qur'anê hatine guhertin û xirakirin an **piştî *wê?***

Beriya xwendinê ji bo dîtina ka hûn ji bo pirsa *“berê an piştre”* çawa bersiv didin hinek bisekinin. Belkî beriya xwendinê hûn ê bixwazin bersiva xwe binivîsin.

## BERÊ?

Ger bersiva we ew e kû metnên Pirtûka Pîroz *beriya nivîsîna Qur’anê* hatine guhertin—naxwe çima Qur’an wisa dide ragihandin kû ev Nivîs ji bo mirovahiyê ne xapandinek e lê belê “*rêber*”ek e, ne tarîtî ye lê belê “*nûr*”ek e? Qur’an ji bo çi dibêje *“Bila Încîl bi daxistina xwe ya di ehlî Xwedê de hukm bike”*? (s: 42) (Sûre 5:47) Û dîsa Qur’an çima daxuyaniyek wisa dide?: *“Di peyvên Xwedê de qet guherînek tune ye.”*

Ger kû ji Nivîsên Pirtûka Pîroz nayê bawerkirin, naxwe Qur’an çima ev ferman da?: *“Ger ji tiştê kû me daxist şika te hebe, ji kesên kû beriya te ew Pirtûk (Tewrat) xwendin bipirse”* (Sûre 3:78)[39]

## PİŞTRE?

Ger kû hûn dibêjin metnên Pirtûka Pîroz *piştî nivîsîna Qur’anê* hatine guhertin, naxwe dê ev mijar derkeve holê kû divê bê diyarkirin: Îro Pirtûkên Pîroz ên kû di destê me de ne, ji destnivîsên kevin ên bi dîroka gelek sedsalên beriya daxistina Qur’anê bo zimanê me hatine wergerandin.

Dema Qur’an ji ber dihat xwendin, jixwe Nivîsên Pîroz berê li Ewrûpa, Asya û Afrîkayê hatine belavkirin û ji bo gelek zimanên wekî Latînî, Suryanî, Kiptî, Gotîk, Etiyopya û Ermenkî hatibûn wergerandin.[40]

Li ser vê mijarê bifikirin. Çawa dibe kû komeke mirov “guhertin” xistibûn nava pirtûkên kû ev qas navdar bûn? Ev pirtûk ji bo gelek zimanan hatin wergerandin, ji aliyê bi milyonan kesan ve hatin kopîkirin û di nava cîhana kû haya wê ji van pirtûkan hebû, bilezûbez hatin belavkirin. Vê xîret û hewldanên kû ji bo van hemû kopyayên bi zimanê orîjînal, bi wergerên kû

nayên jimartin re bînin ba hev, bînin ber çavê xwe—û îro ji bo afirandina hemanbûna van wergerên kû di destê me de ne, hewldana guhertina her yekê wan dê peywireke bêderfet bûya ji bo pêkanînê.

Encam zelal e:

- Angaştkirina Pirtûka Pîroz a kû *berê* nivîsîna Qur'anê hatiye guhertin, nakokiyek e bi dozîneyên ayetên Qur'anê re.[41]
- Angaştkirina Pirtûka Pîroz a kû *piştî* nivîsîna Qur'anê hatiye guhertin, nakokiyek e bi delîlên arkeolojîk û dîrokî yên kû pişta xwe didin bihezaran tomarên kevin ên destnivîs.

Ev encam, rêzek pirsên nû derdixe holê.

Ev bihezaran tomarên destnivîs û werger ên kû aîdî Pirtûka Pîroz in, ji kû hatin?

Nivîsên *orîjînal* li kû ne?

## NİVÎSÊN ORÎJÎNAL Û "CİSNÊ" WAN

Ji ber rastiya kevinbûn û viritîna her tiştê li serzemînê kû pirtûk jî tê de ne, destnivîsên *orîjînala* Pirtûka Pîroz (ev di heman demê de wekî *autograf* jî tên binavkirin), êdî di dest de nemaye. Lê dîsa jî bihezaran *kopyayên* ***pêşîn ên kû ji "cisnê" orîjînalên kû pêxember nivîsîne tên, li dinyayê li gelek muze û zanîngehan tên parastin, hene.***

Hemû tomarê orîjînal ên der heqê Tewrat, Mizgînî, fîlozof Arîsto, dîrokvan Flavîus Josephus an jî Qur'an[42] a xwedî dîrokeke nêzîktir de, hatine xurimîn û wenda bûne. Ev rewş ji bo hemû pirtûkên aîdê serdema kevin eynî ye. Yên mayî tenê tomarên kû "cisnê" orîjînalên wan tên, in.

Piraniya mirovên Senegalê wisa bawer dikin kû Pirtûka Pîroz hatiye guhertin. Baweriya wan bi Pirtûka Pîroz tune ye. Bêyî mantiqê, ji *grîotên* xwe bawer dikin. Grîot dîrokvanekî *devkî* ye kû peywira wî ya bingeh jiberkirina dîroka malbat, cisn û gundê wan e û bi devê xwe vegotina wan e. Grîotekî kû di hişê xwe de agahiyeke kitekit a der heqê malbata xwe de bigire û vê agahiyê


bi mîsogerî ragihîne, bandorker e. Ew grîot di peywirên xwe yên kû pêk tînin de çi qas baş jî bin, ew qethîtî û kitekit di demê de wenda dibin. Di nav mirovan de bi awayê devkî rêbaza parastina rastiyê, bi rastî û ewledarbûna rêbaza nivîskî re nayê rûberkirin.

***Çima gava gelek mirov di mijara bibawerbûna şahidiya devkî*** de dilezîne, di mijara bibawerbûna ***şahidiya nivîskî*** ya Xwedê de hêdî diçe?

Gelo ev tevgereke zanakî ye?



*"Em şahîdiya mirovan qebûl dikin, lê belê şahîdiya Xwedê serdesttir e… kesên kû baweriya wan bi Xwedê nayên Wî derewker derdixin, lewre ji şahîdiya der heqê Xwedê de bawer nekiriye."*
(1. Yuhanna 5:9-10)



## TOMARÊN PARŞOMEN Û NIVÎSVAN

Nivîsên Pîroz dema kû kaxez, weşanxane û kompîtur di holê de tunebûn, beriya demeke dirêj hatin nivîsîn. Pêxemberan peyvên Xwedê li ser tomarên kû bi çermên heywanan an jî bi papîrusan hatine çêkirin nivîsîn. Piştre ev tomarên orîjînal ji aliyê nivîsvanan ve bi destan hatin kopîkirin. Nivîsvan kesên bijare û profesyonel ên dinyaya kevin bûn kû dikarîbûn bixwînin û binivîsin, tomarên qanûnî sererast bikin û sûretên wan derxin. Hin nivîsvan di heman demê de sûretên metnên Pirtûka Pîroz jî derxistin. Armanca wan ew bû kû van nivîsan birêkûpêk kopî bikin. "Nivîsvan di dawiya hin pirtûkan de hejmara peyvên pirtûkê dida û diyar dikir ka kîjan peyv di orta pirtûkê de ye, wisa kû, nivîsvanên paşînî ji bo kû bawer bibin kû tîpek jî derbas nekirine bi her du awayî jî bikaribin bihejmêrin."[43]

Lêkolînvan, xetayên kopîkirinên nemuhîm ên metneke kevin

a dinyewî an jî pîroz tu car wekî pirsgirêk nedîtin. Rastiya der heqê van guherînên kû di metnên bi destan hatine nivîsîn de mane, fikra der heqê neguhertina Nivîsan de xurt dike. Berevajî Qur'anê, di dîroka Pirtûka Pîroz de tu kes hewl nedaye kû "kopyayeke mukemel" çêke û piştre destnivîsên mayî bişewitîne.[44]

Lêkolîneran di tekstên pîroz an jî yên sekuler ên kevnar de şaşiyên kopîkirinê yên bêqîmet weke pirsgirekekê nedîtine. Di van metnên ku bi destan hatine zêdekirin (kopîkirin) de hebûna van cure varyasyonan (guhertoyan) îdîaya xeranekirina (tehrîfnebûna) Pirtûka Pîroz hêzdar dike. Di rabirdûya Pirtûka Pîroz de berovajî Qur'anê, kesên ku piştî çêkirina "kopyayeke bêkamesî (mikemel)" destnivîsên mane neşewitandine.[45]

Xwedê peyama xwe ji bo me parastiye. Lê em çawa jê bawer dikin kû Nivîsên îro orîjînala nivîsên kû pêxember û elçiyên wan nivîsîne, ne?

## TOMARÊN BEHRA MİRÎ

Heya demên dawî, kopyayên herî kevin kû tên zanîn, yên Nivîsên Peymana kevin (ya kû di navbera salên B.M 1500 û 400an de ji aliyê pêxemberan ve hatiye nivîsîn) dîroka sala P.M nêzî 900ê hildigirin. Rexnegirên kû demeke dirêj di nav kopî û orîjînalan de mane, wisa angaşt kirin kû ji ber kû ev metnên kevin bi sedsalan e ji yekcarê zêdetir hatine kopîkirin, ne kû mimkin e kû bê zanîn ka pêxember çi nivîsîne.[46]

Piştre Tomarên Behra Mirî hatin kifşkirin.

> *Sal:* 1947
>
> *Cih:* ***Kîrbet Kûmrana nêzî Behra Mirî***
>
> *Agahiya Destpêkê:* Kurekî şivan yê kû Bedewî ye, gava li bizina xwe ya wenda digere, rastî şikeftekê tê kû nava wî bi kûsikên kû ji gilkê hatine çêkirin tije ye û di nav wan de gelek nivîsên kevin kû bi zimanên Îbranî, Aramî û Grekî hatine nivîsîn hene.

Di navbera 1947 û 1956an de li yazdeh şikeftan de ji 225an zêdetir tomarên destnivîs ên kû aîdî Pirtûka Pîroz in hatin dîtin.

Zanyar wisa biryar dan kû ev tomar di navbera salên B.M 250 û P.M 68an de hatine nivîsîn. Destpêkirina nivîsîna piraniya van tomarên destnivîs 2000 sal berê bû. Çi kifşeke girîng!

Tomar, P.M nêzî sala 70an de (sala kû Roma Yeruşalimê wêran kir) ji hêla Esseniyan ve –komeke tarîkata Musewî ya kû hinek berî û piştî mîlatê li Filîstînê jiyane– yên kû wekî Cihû tên zanîn, li şikeftên Kûmranê hatibûn veşartin. Ne xema wan kesan bû ka dê çi bihata serê wan, lê li gorî baweriya wan diviyabû ev nivîs ji bo nifşa paşerojê bihatana parastin. Digel Cihû bi kuştin an jî bi mişextan hatin belavkirin, nivîsên wan hatibûn parastin. Ev parşomenên papîrus, nêzî bi 1900 salan li îklîma zuwa ya herêma Behra Mirî ya kû ji bo parastina wan îdeal bû, di nav kûsikên gilk de hatin veşartin.

Dema li cîhanê cara destpêkê nûçeya der heqê kifşa van tomarên kevin de derket, gelek kes fikirîn kû cudahiyeke girîng heye di navbera van tomaran û tomarên dawî yên kû ji wan hezar sal nûtir in. Bi vî awayî, belkî angaştya "guhertina Pirtûka Pîroz" dê bihata pesendkirin!



Tomarên Behra Mirî:
B.M 250 – P.M 68



Destnivîsên berê yên kû
destpêkê car dihatin zanîn:
P.M 900



Pirtûka Pîroz a îro:
**Nehat guhertin.**

Kesên şikber di ber de man. Tenê di şeklên rastnivîs û rêzimanê de cudahiyên negirîng hebûn. Ev tomarên destnivîs, bi Pirtûka Pîroz a îro re heman peyvan dihewandin.

Biryara fermî ya li ser fikra lêkolînvanên Tomarên Behra Mirî ya der heqê xirabûn an jî guhertina van Nivîsan çi ye? *"Delîla dîrokî derdixe holê kû guherînek wisa pêk nehatiye."*[47]

## Dİ DÎROKÊ DE PİRTÛKA BAŞTİRÎN HATİYE PARASTİN

Gava em li ser Peymana Nû bisekinin, ji 24.000an zêdetir tomarên kevin ên destnivîs hene kû di nav wan de 5300 tomarên kû bi zimanê Grekiya orîjînal hatine nivîsîn û 230 hebê wan aîdî dîroka sedsala şeşemîn in. Ev tomar, Peymana Nû wekî metna herî baş a kû di dîrokê de hatiye tomarkirin, saz dikin.

Ji bo hevrûkirinê li nivîsên fîlozof Arîstoyê Yewnanî yê kû di navbera salên B.M 384 û 322yan de jiyaye binêrin. Arîsto bîrmendê herî bandorker ê hemû deman e. Lê dîsa jî çavkaniya bi dîroka herî nû ya kû tiştên kû em derheqê fikr û mantiqa wî de dizanin, hin tomarên destnivîs ên sala P.M 1100 e – digel kû di navbera dîroka nivîsên orîjînal de 1400 sal heye, dîsa jî tu kes der heqê rastbûn an jî parastina peyvên wî napirse.

Zanist, ji bo bi hezaran tomara destnivîs a Peymana Nû re wek îlawe, di metnên Pirtûka Pîroz de yên kû P.M di 325an (dîroka destnivîsa herî kevin a bêkêmasî ya Peymana Nû kû li ser piyan maye) de hatine nivîsîn, bi hezaran jêgir ên kû ji Peymana Nû hatine girtin, dîtine. Ev jêgir ew qas pir û kûr bûn kû, hema hema hemû Peymana Nû dikarîbû bi van nivîsan ji nû ve bihata çêkirin.[48]

Delîl wisa didin nîşan kû Peymana Nû di nav metnên demên berê de baştirîn hatiye parastin.

## PİRTÛKÊN PÎROZ ÊN CÛDA?

Belkî yek dibêje "Lê ew qas Pirtûkên Pîroz ên cûda hene kû! Kîjan rast e?"

Famkirina cûdahiya navbera *destnivîsên* Pirtûka Pîroz a kevin û *wergerên* cûda yên van nivîsan girîng e. Ev destnivîs, berê demeke dirêj –bi sed salan berê Qur'anê- ji hêla nivîsvanan ve hatin kopîkirin. Pirtûkên Pîroz ên çapkirî yên îro ji van metnên kevin hatine *wergerandin*[49] Hin beş an jî tevahiya Pirtûka Pîroz ji zimanên xwe yên orîjînal (Îbrankî, Aramî û Grekî) ji 2400an zêdetir, ji bo zimanên *cûda* hatine wergerandin.

Îngîlîzî yek ji van zimanan e.

Pirtûka Pîroz bi Îngîlîziyeke nuwaze hatiye nivîsîn, li bazarê bi navê *wersiyonan* (lêanîn), wekî *werger* bi dozîneyan hene. Her yekê wersiyonên Îngîlîzî ji hev hinek cûda hatine tomarkirin; sedema vê ew e kû gava ji zimanekî ji bo zimanekî din werger tê çêkirin, di navbera peyvan de cûdahiyên biçûk ten çêkirin. Peyvên kû wergêr ji bo wergerandinê hildibijêrin dibe kû cûda bin, lê gava bi awayekî durist tên wergerandin, wate û peyama peyvan naguhere.

Wergera pêşkî ya di vê pirtûka kû hûn dixwînin de hatiye bikaranîn wersiyona *New King James Version* e (NKJV). Ev wersiyon wergereke hûrbijer û yek û yek e kû bi Îngîlîziya îro hatiye çêkirin. Di hin cihên pirtûkê de jî, ji ber kû carinan famkirina wê hêsantir e, *New International Version* (NIV) jî hat bikaranîn.

Em li ayeta jêrê kû bi van du wersiyonan hatiye nivîsîn binêrin:

> *NKJV: "Bi serde, dema hûn rojî digirin, wekî kesên durû yên kû xwe wekî xemgîn nîşan didin, nebin. Lewre ew, ji bo kû rojîgirtina xwe ji mirovan re aşkere bikin vegotina rûye xwe diguherînin. Ji we re rasterast dibêjim kû, wan xelatên xwe girtine."* (Matta 6:16)

> *NIV: "Dema hûn rojî digirin, wekî durûyan mehdê xwe tirş nekin, lewre ew, ji bo kû rojîgirtina xwe nîşanî mirovan bikinrûyê xwe diguherînin. Ez ji we re rastiyê bêjim, wan xelatên xwe başebaş girtine."* (Matta 6:16)

Digel kû peyv guherîne, wate heman in.

## XWEDÊ MEZİNTİR E

Angaşta mirovan a guherîna Peyva Xwedê belkî jî bi awayekî henekî derewxistina wê, li hemû cîhanê her roj ji mizgeftan tê daxuyankirin.

Min evgotina xwe vê sibê bihîst.

*"Ellahû Ekber! Ellaaaaahû Ekber!"*
(Xwedê mezin e! Xwedê mezin e!)

Belê, *Xwedê mezin e*—ji mirovan û ji pêvajoyên dirêj ên demê mezintir e. Xweda yê kû ji bo bereketa mirovan û ji bo navê Xwe rast e û dijî, Peyama xwe ji bo hemû nifşan parastiye.

Xwedê ne tenê Afirîner û Peyda erê dinyayê ye; Ew Nivîskar û Panêrê Peyva xwe ye.

*"Ya Xwedê, peyva te heya bêdawiyê li ser ezmanan e."*
(Mezmûr 119:89)

## ASTENGİYÊN BÊDAWÎ

Di vê gihînekê de, fikra wan kesên kû ji bo rêwîtiyê xwe amade dikin, ji astengiyên kû ji bihîstina Peyva Xwedê wan dûr dixin, ji heq derkevin wê pir xweş bûya. Lê ceribandin destûr nade kû em wisa bifikirin. Ji bo gelek kesan li rêya rastiyê wê her tim astengeke din, û yekê din û dîsa yekê din hebe.[50] Çendek berê ji min re ev posteya elektronîk hate şandin:

> Posteya Elektronîk
>
> Spas ji bo bersivên we. Ev peyvên Xwedê kû li cihek gotibûn tê bîra min: "Em ê mirovê wekî ME çêkin." Min her tim meraq kiriye ka ev peyva "ME" tê çi wateyê. Wersiyonên cûda yên Pirtûka Pîroz tune ye? Ji van wersiyonan kîjan rast e? Ji adetê der dîn tune ye? Kû dîn tunebûna, dê bircên cêwî hê li ser piyan bimana? Xirîstiyanî ne ji gelek mirinan berpirsiyar e? Û çima ji tiştê kû hûn bawer dikin, guman nakin, çima ji baweriya xwe bawer in? Çima? Çima? Çima?

> Çima? Em dikarin efsaneyekê heya dawiyê vepirsin û ji bo kû pere bê em dikarin wekî gelek waîzan bersiv li hev bînin. Û kê Xwedê afirand? Min ji bîr kiriye. Spas.

Gava pirtûka Xwedê ji bersivên vî kesî re bersivên tetmînker dibîne, kesên beriya biçin mezelê kû dixwazin rastiya bêdawî kifş bikin, piştî demekê divê *dev ji pirsa "çima" berdin û divê êdî li ser* ***peyvên*** *Xwedê bifikirin.*

## SEDEMÊN RASTÎ YÊN GUHNEDANA MİROVAN Jİ PİRTÛKA PÎROZ RE

Pirtûka Pîroz sedema rastî ya redkirina rastiya Xwedê rave dike. Min ji van sedeman sê heb rêz kirin li jêrê:

### 1. DİLÊN XETÎŞBÛYÎ

Sedema hin kesên kû li ser Pirtûka Pîroz nafikirin tenê ev e kû *naxwazin* Afirîner û Xwediyê xwe *nas bikin.*

Li vegotina Nivîsên Pîroz kû nirxa dilê (ne agahiya der heqê avêtina damarên dil – agahiya der heqê can kû navenda kontrola hundir e) mirov diyar dike ev e: ***"Mirov xira bûn…*** *Xwedê, ji ezmanan li mirovan dinêre ka kesekî biaqil û Xwedê digere heye an na.* ***Hemû rêşaş bûn, hemû xetîş bûn…"*** (Mezmûr 14:1-3)

Tu eleqeya mirovan a redkirina Pirtûka Pîroz bi Nivîsên guherî re tune ye; hemû pirsgirêk ji ber dilên mirovan ên xetîşbûyî ne.

Em nivîsên Silêmanê Qral bixwînin: *"Xwedê mirovan rast afirand, lê ew hê jî* ***çareseriyên tevlîhev*** *digerin."* (Waîz 7:29) Dema me ji bo dilxaziyên xwe yên xwezayî berdidin, em riya xwe hildibijêrin, em serî li çareseriyên xwe yên tevlihev didin û di dînê dê-bavê xwe de tên dinyayê û di dînê wan de dimirin. Ji bo kû em Xwedê nas nekin, ji bo kû li Wî *negerin* em didin dû gelek sedeman. Piştî demeke kin a rêwîtiya me ya Nivîsên Pîroz em ê bibînin ka em çima wisa tevdigerin. Ji bo niha têra we ye kû hûn bizanibin hişyarkirina me ya bi rêya peyvên kû her tim di pirtûka

Xwedê de tên dubarekirin rast e û di cî de ye: “Kesê kû guhê wî heye bila bibihîze!” (Matta 13:9) [51]

## 2. FİKAR Û DEWLEMENDÎ

Hin kes tu car li ser pirtûka Xwedê naxebitin, lewre bala wan li ser vê dinyaya niha ye. *“Fikarên dinyewî yên der heqê vê jiyanê de û peyva xapandina dewlemendiyê mirov dixeniqîne.”* (Matta 13:22)

Îsayê Nasirayî di hemû jiyana xwe de çîroka wî zilamê dewlemend yê kû guh nedaye pêxemberan got. Wî zilamî belkî jî wijdanê xwe rihet kiribû bi angaştkirina pênebawerbûna Nivîsan. Rewşa wî çi be bila bibe, ew zilam di dawiyê de mir û xwe di dojehê de dît. Xwedê ji vî zilamî re, kû dixwest kesên dijî agahdar bike, destûr da kû bila bi Birahîm Pêxember -yê kû di cenetê de ye- re axaftineke biçûk bike. Zilamê dewlemend ji bo kû zimanê xwe hênik bike, av xwest, lê jê re av nehat dayîn. Gava mirov êdî fam kir kû hêviyê xwe heya dawiyê wenda kiriye, ji Birahîm wisa lava kir:

> *“Ji van miriyan kesekî bişîne kû bila pênc birayên min ên kû dijîn agahdar bike, bila ew jî nekevin vê cihê bikeser!”*

Bersiva Birahîm aşkere û zelal bû:

> *“Li cem wan peyvên Mûsa û pêxemberan hene, bila **guhdarî wan bikin**” got.*
>
> *“Zilamê dewlemend,“Na, bavo Birahîm, guhdarî nakin!” got. “Kû kesek ji nav miriyan biçe, dê tobe bikin.”*
>
> *“Brahîm gotê,**‘Kû guhdarî peyvên Mûsa û pêxemberan nekin, yek ji miriyan vejî jî qeneh nabin.’**”*
>
> (Lûka 16:27-31)

Xwedê Peyva xwe ya Nivîskî ji bo kû Rastiya Wî bila ji vexuyanên mûcîzewî û kerametan zêdetir qeneh bibediyar kir.

Xwedê Nivîsên pêxemberan ji bo me peyda kir û *parast* ***û li bendê ye kû em*** *"Nivîsên pêxemberan bibihîzin"*.

## 3. TİRSA MİROV

Hin kes qet li ser Pirtûka Pîroz naxebitin, lewre gava vê tiştê dikin ji gotinên mirovên din *ditirsin*.

Wextekî cîranekî min ji min re wiha got: "Kû ez ji malbata xwe netirsiyama, min ê Pirtûka Pîroz bixwenda!" Lê di vê navberê de Pirtûka Pîroz ji min re wisa dibêje: ***"Tirsa ji mirovan xapandinek e, lê kesê kû baweriya xwe bi Xwedê tîne di ewlehiyê de ye."*** (Şîretên Silêman 29:25) Li gorî nêrîna Xwedê, ji bo guhdayîna Peyama Wî, sedemeke bimantiq tune ye.



# 4

# Zanist Û Pirtûka Pîroz

*“Ew dinyayê dialiqîne Li ser **tunehiyê**.”*
— Eyûb Pêxember (Eyûb 26:7)

Çend sal berê ez û hevjina xwe, di bin şikeftekê de çûne gerê. Xanima rêber gava teraşên bandorker ên wekî pîjik û bizmilûgan nîşanê me dida, got: “her tişt bi dilopeke avê re dest pê kir. 330 mîlyon sal berê, behreke hundirîn a tenik vê herêmê bi avê re wergirt û di dawiyê de ev qatên xilte yên kû bûn berespî û piştre hişk bûn derketin holê….”

Ev gotin, ew qas zanistî xuya dikirin, çawa kû mirov di serî de wekî çavdêrekî bû li wir. Dema xanima rêber diaxivî, di hişê min de peyvên Xwedê yên kû ji Eyûb pêxember re gotibûn olan dan: *“Dema min bingeha dinyayê vedida tu li kû bû? Kû tu fam dikî bibêje.”* (Eyûb 38:4) Dema gera me ya nav şikeftê qediya, min ji rêberê re spas kir ji bo kû em gerandin û min jê pirs kir ka jeolog çawa dizanin ev şikeft aîdî mîlyon salan berê ye. Wê jî ji min re got dibe kû jeolog vê tiştê baş nezanibin û piştre got, “Min ji we re tenê tiştên kû min di perwerdehiyê de dîtin, vegotin.”

## ZANİSTA RAST

Peyva *zanistê* ji peyva *scientia* ya kû Latînî ye, tê û wateya wê ***zanîn*** e.[52] *Zanîn bêyî gumanekê, rasterast qebûlkirin e.*

Zanyarekî dikare biryara dirûvkirina hîpotezek an jî teoriyekê wekî *“zanist”* bide, lê vê hîpotezê an jî teoriyê zanist çênake.


Di nav salên 1970an de bijîşkê Frensî Maurice Bucaille, yê kû bijîşkê taybet ê Qral Faysal bû, li ser navê *Pirtûka Pîroz, Qur’an* û Zanistê pirtûkek nivîsî. Ev pirtûk –Li pirtûkxane û mizgeftên cîhana Misilmanan de wekî berbiçav hat pêşan dan– wisa angaşt dike kû di Pirtûk Pîroz bi zanista modern re nakokî hev dibe. Bucaille pêşber dike kû çîroka di beşa destpêkê a Pirtûka Pîroz de hatiye tomarkirin îhtimaleke mezin e kû ji efsaneyekê hatiye wergerîn, lewre bi teoriya mirov kû der heqê orîjîna gerdûn ya kû diguhere, ne di heman xêzê de ye.[53] Wekî piraniya kesên din, Bucaille jî di wekhevkirina *zanist* û teoriya *peresandinê*[54] de, di şaşiyê de ye.

Famkirina vê girîng e kû Nivîs ne ji bo hînkirina *zanista fîzîkî* lê belê ji bo ravekirina *zanista giyanî* hatine dayîn. Sedema dayîna Pirtûka Xwedê ew e kû bide nîşan ka ew *kî ye, çawa ye û ji bo me çi kiriye*. Di heman demê de Xwedê Pirtûka xwe ji bo hînkirina *em ji kû hatin, em çima li ser dinê ne û em ê biçin kû,* da. Agahiyeke wisa li laboratuareke lêkolînê nayê kifşkirin û rastiya wê nayê îspatkirin. Dîsa jî ji ber kû Pirtûka Pîroz bi hemû beşên jiyanê re eleqedar e, gava Pirtûka Pîroz hate nivîsîn û di heman demê de, ji ber kû agahiya der heqê dinyaya xwezayî ya kû ji hêla mirovan ve nedihat zanîn, werdigirt, divê agahiyeke wisa wekî surprîz neyê famkirin.

## DESTPÊKÊ XWEDÊ EV AGAHÎ GOT

Em li ser **heftmînakên** nîşandide kû, Pirtûka Xwedê ji kifşa zanyarên îro demeke dirêj berê doneyên zanistî tomar kiriye, bifikirin. Piştre gava em li ser rêya xwe ya Nivîsên Pîroz bifikirin, em ê di Pirtûka Pîroz de der heqê zanistê de rastî mînakên din ên bandorker bên.

1. **DİNYAYA GİLOVER.** Piraniya pirtûkên dîrokî yên modern wisa hîn dikin kû Grek B.M sala 500an de “kesên



teoriya giloverbûna rûzemînê cara destpêkê derxistine, ne”. Di heman demê de ramanwerên Grek jî bi zor gihiştin encama giloverbûna serzemînê, lewre li gorî fikra wan, ‘şekla herî seraza’ ev bû.[55] Lê belê ji hezar salan zêdetir berê Eyûb pêxember vê rastiyê vegotin kiribû: *“Xwedê* ***dinyayê dialiqîne li ser tunehiyê..Sînoran xêz dike*** *li ser avê, li cihê kû vediqetin ji hev ronî û tarîtî”* (Eyûb 26:7, 10) Û 40 sal beriya Grekan Silêman Pêxember diyar kiribû kû Xwedê *“behrên bêserûber bi aso re* ***dorpêç*** *kiriye”*. (Şîretên Silêman 8:27) ***Di sala 700an de beriya kû ramanwerên Grek ev fikr derxistin 200 sal berê Yeşaya ev danezan dabû:*** *“Yê kû li ser* ***saca ezmanî rûdine Xwedê ye.”*** (Yeşaya 40:22) Peyva *daîre* ya zimanê Îbrankî, di heman demê de dikare wekî *saca ezmanî* an jî *gilovertî* bê wergerandin. Naxwe ew ê kû der heqê gilovertiya rûzemînê diaxivî, kî bû – Grek an jî Xwedê? Belê, Xwedê bû, avahîsazê Rûzemînê, Xwedê!

2. **ÇERXA AVÊ.** Eyûb di pirtûka xwe de behsa dewra hîdrolojîk jî dike: ***“Av dilopên xwe dikêşe jor, ji hilma wê dilopên baranê çêdike.*** *Ewr nema xwe dirêjîne, li ser mirovê baraneke zêde diniqutîne. Kî fam dike ka çawa ewran belav dike, çawa ji avahiya xwe ya ezmanî gurmînî dike?”* (Eyûb 36:27-29) Bi vî awayî Pirtûka Pîroz çêbûna baranê rave dike: destpêkê buxar çêdibe, piştre ew buxar di nav dilopikên şile yên kû di nav ewran de ne sift dibin û piştre ev dilopik dibin dilopên mezin û dikarin li hemberî kêşandina jor xwe bigrin. Eyûb, mîqdara avê kû wekî siftbûna nava

ewran tê dîtin jî, nîşan dide: *“Av belav dike nav ewran de, ew naçirin di bin giraniya wan de.”* (Eyûb 26:8)[56]

3. **NİFŞA HEVPAR.** Mûsa pêxember sê hezar û pêncsed sal berê ev nivîsîn: *“Adem navê hevjina xwe kir Hewa, lewre **ew dayîka hemû mirovan bû**.”* (Afirîn 3:20) Li gorî Pirtûka Pîroz hemû mirov wekî nifş ji dayîkekê tên. Zanyar peresendî heya 1987an der heqê vê rastiyê de îqna nebûn. Piştî analîza kûr a mitokondrial DNA (parçeya koda genetîk a kû bêyî xirabûn ji dayîkê derbasî zarok dibe) ya kû ji her plasentayên hemû derê dinyayê girtin, lêkolîn gihişt vê encamê kû hemû mirov ji *“ezbeteke hevpar a mê”* tên.[57] Piştî çend salan, lêkolîn ev tişt jî derxistin holê kû hemû mirov ji dêbavekî hevpar tên.[58] Haya lêkolînvanan jê tunebû kû hemû ked û xercên wan ji bo rastkirina Pirtûka Pîroz xîzmetek bû!

4. **XWÎNA KÛ JÎN DİDE**. Musa di heman demê de ev jî nîşan da: *“Ew ê kû jîn dide Zindiyan, **xwîn** e.”* (Leviyî 17:11) Têgihiştina vê rastiya kû ji hêla civaka kû heya sedsala 19. teknîka kujer a “xwîn rijandin” hebû tedawî dike, bi zorî di demên dawî de pêk hatiye.[59]

5. **RÛZEMÎNA KÛ HER DİÇE HÊDÎ DİBE.** Dawud pêxember sê hezar sal berê nivîsî kû dê dinya rojekê **“qir bibe”** û dê **“kevin bibe”.** (Mezmûr 102:25-26) Dema zanista modern dibêje gerdûn hêdî dibe, rûpîvana manyetîk a serzemînê qels dibe û tebeqeya ozon a parêzger zirav dibe, bi Dawud re heman fikrê de ye.

6. **ERDNÎGARİYA OKYANÛSÊ**. Dawud der heqê *“riyên behran”* de jî nivîsî (Mezmûr 8:8-wergera kevin). Va ye ev peyv ji Amiral Matthew Fontaine Maury re bû îlham kû jiyana xwe ji bo kifşkirin û ttomarkirina van herkên okyanûsê da. Kû Xwedê behsa *“riyên behran”* dike, fikirî kû nexşeya van riyan dikare bê xêzkirin û divê ew bi xwe vê tiştê bike. Maury, tişta kû di fikra wî de derbas dibû çêkir û wekî “bavê erdnîgariya okyanûsê” hat nasîn.[60]

7. **ASTRONOMÎ.** Nêzî 2000 sal berê Pavlus ê Şandî wiha nivîsî: *"Îhtişama rojê cuda, îhtişama heyvê cuda, îhtişama stêrkan cuda ye. Ji hêla îhtişamê* ***stêrk ji stêrkê cuda ye."*** (Korîntiyên 1. 15:41) Dema mirov bi çavê tazî binêre hemû stêrk pir dişibin hev. Lê îro astronom bi teleskopên xurt û bi analîzên tayfa ronî re tesdîq dikin: "Stêrk ji hêla reng û roniyan ve ji hev pir *cuda* ne, hin stêrk mîna rojê zer in, lê yên din bi rengê şîn an jî sor dibiriqin"[61] "Her stêrk tena serê xwe *bêhempa* ye."[62] Pavlûs P.M di sedsala yekemîn de çawa dibû ev tişt dizanîbû?

## ÎMANA KORKORANE

Digel kû der heqê "di Pirtûka Pîroz de zanist" de gelek mijar dikare bê rêzkirin, sedema hilbijartina tenê van heft mînakan ev e: Tevî kû Pirtûka Pîroz ne pirtûkeke zanistî ye, tiştên kû der heqê zanist de diaxive misoger û rast e.

Hin kes baweriya Pirtûka Pîroz wekî "îmana korkorane" diwesfînin. Ev angaştên wan rast in? An *îmaneke biaqil* e kû xwedî delîlekê ye kû îtiraz qebûl nake?

Ji ber kû doneyên zanistî her tim bi nivîsên Pirtûka Pîroz re li hev tên, gava em van Nivîsan rast -tevî kû tiştên em baş nikarin rave bikin an jî îspat bikin hîn dikin- qebûl dikin, gelo em bêaqilî an zanakî tevdigerin?

Xwedê ji me xwekuştineke zîhnî naxwaze. Xwedê ji me re *"gelek delîlên bawerker"* pêk aniye.

## DÎROK, ERDNÎGARÎ, ARKEOLOJÎ

Di beşa dawî de, me hin delîl nîşan dabûn kû Peymanên Kevin û Nû pirtûkên dema kevin ên baştirîn hatine parastinin, vekola. Lê der heqê rastiya agahiya kû Nivîs di nav xwe de dihewînin çi dikare bê gotin? Gelo bawerî bi vê agahiyê tê?

Pirtûka Pîroz ji zanyar û şikberan, ji bo kû bawerîbûna wan kontrol bikin bi hezaran derfet pêk tîne. Lewre hema hema di her rûpelekê de navê kesekî, cihekî an jî bûyerekî dîrokî derbas dibe.

Tiştên kû dîrok, erdnîgarî û arkeolojî rave dikin çi

ne? Bi sedsalan e gelek mirov hewl dane kû ji hêla dîrokî pênebawerîbûna Pirtûka Pîroz îspat bikin. Sir Walter Ramsay (1851-1939) ê kû yek ji van şikberan bû, yek ji arkeologên mezin ên hemû deman bû û di sala 1904an de, di beşa kîmyayê de Xelata Nobelê girtibû. Ramsay di dema xwe ya ciwaniyê de, baweriya xwe bi neewlebûna Pirtûka Pîroz re anîbû. Lê kifşên wî fikrên wî guhertin û wî bi neçarî nivîsandina van rêzikan kir, "Lûka dîrokvanekî girîng û serdest e; vegotinên wî yên der heqê rastî de ne tenê ewledar in… Divê navê wî bi dîrokvanên herî mezin re bê bîranîn." [63]

Lûka, doxtorek, dîrokvanek, şopînerekî Îsa bû, hem li gorî *Lûka* nivîskarê pirtûkên *Mizgînî* û hem jî ya *Karên Şandiyan* bû. Ev du pirtûkên kû aîdî Pirtûka Pîroz in, bi 95 derawayên erdnîgarî (32 welat, 54 bajar û 9 girav) re gelek kes û bûyerên dîrokî nîşan dide. Rexnegir pir hewl dan kû di navbera nivîsên Lûkayî û arkeolojî, erdnîgarî û mijarên kû dîrok bêyî Pirtûka Pîroz rave kiriye, de neliheviyek bibînin. Lê di dawiyê de armanca wan di ber wan de ma. Rastbûna hemû madeyên nivîsên Lûkayî hatiye îspatkirin. Ji bo kû ji gotinên me re bibe mînak em li hevokeke Mizgîniya Lûkayî binêrin. Ev hevok ji bo sazkirina hawira dîrokî ya der heqê xizmeta Îsayê Nasirayî ya li rûzemînê hatiye sêwirandin.

> *"Panzdeh saliya serweriya* ***Sezar Tiberius*** *bû. Li Cihûdayê* ***Pontius Pilatus*** *walîtî dikir. Hirodes Celileyê, birayê Hirodes herêma İtureya û Trahonitisê,* ***Lisanias*** *Aviliniyê bi rê ve dibir. Hana û* ***Kayafa*** *kahînên sereke bûn. Wê demê Xwedê deng li Yahya yê , Zekeriya kû li çolê bû, kir."* (Lûka 3:1-2)

## GELO LÛKA MAFDAR BÛ?

Piraniya nav û kitekitan normal e kû bi me pirsa "Nivîsên Lukayî rast bûn?" dide kirin. Bi sedema kontrolkirinê, em li jêgira berê navên çar kesan kû bi pûntoya reş hatibûn nivîsîn vekolin.

Lûka destpêkê behsa Împaratorê Romayê *Sezar Tiberius*

*û waliyê herêmê Pontius Pilatius* dike. Ev her du di dîrokê de jiyane? Serdema serweriya wan yek bû? Li Sezariyeyê, li herêma kû tîyatroya Herodî lê hatiye restorekirin (Di heman demê de di Karên Şandiyan 12:19-24 de ji hêla Lûkayî ve hatiye qalkirin), di 1961an de, kevirek bi qasî metroyek dirêj hatiye kifşkirin kû nivîsteka li ser dide nîşan kû Pontius Pilatus di dema Împaratoriya Sezar Tiberiusî de bi rastî walîtî kiriye. Dîrokvan Josephus (P.M 37-101) kû eleqa wî qet bi Pirtûka Pîroz re tune ye jî navên van heman kes, cih û bûyeran tomar kiriye.[64]

Nivîsên Lûkayî rast bûn.

Lûka di heman demê de, ji Lisaniasê kû Avilini yê kû eyaletekî Sûrî ye bi rê ve dibe, wekî rêveberekî pêgirtî (waliyê kû ji çaran yekê eyaletê bi rê ve dibe) behs dike. Zanyar bi salan "ji bo îspatkirina şaşitiya Lukayî, xeletiyekî kû ji bûyerekî kû ew nizanin tê" bi kar anîn; lewre Lisaniasekî kû dîrokvan dizanin, rêveberê Chalcisê kû li Yunanîstanê bû, hema hema 60 sal beriya dema nivîsîna Lukayî (P.M nêzî 27) hatiye kuştin. Heya kû dîrokvan P.M di navbera salên 14 û 29an de nivîsekek kû dîrokek hildigire nêzî Şamê dîtin, der heqê *Lisaniasê kû rêveberê Aviliniya* ***Sûrî bû tiştek nizanîbûn. Li ser nivîsekê hatibû dîtin, ev nav hatibû kolandin: "Walî Lisanias."***[65] Wekî kû tê famkirin bi navê Lisanias du rêvebir hebûn.

Nivîsên Lûka rast bûn.

Lûka behsa *Kayafayê* kû dema Îsa li rûzemînê dijiya yek ji du kahînên sereke bû li perestgeha Cihûyan de, jî kiribû. Di Berfanbara 1990an de, gava karker li nêzî başûra Yeruşalimê rê saz dikirin, bi tesadufî mezela malbata Kayafayî derxistin holê. Arkeolog hatin gazîkirin. Di nav gorê de danzdeh heb cihê kû hestiyan veşartibûn (qutiyên hestiyan kû ji berespiyan hatine çêkirin) dîtin. Di nav van qutiyan de kû hestî hatine veşartin, li ser ya herî xweş hatibû dekorekirin navê "Yusuf Kayafa" hatibû nivîsîn. Ev nav, tam navê kahînê sereke bû kû Îsa derdest kiribû.[66] Di nav qutî de hestiyên zilamekî şêst salî hebûn, hema hema teqez e kû ev zilam Kayafayê Peymana Nû ye.[67]

Nivîsên Lûka rast bûn.

Arkeologê navdar Nelson Glueck ev çavdêrî kirin: “teqez dikare bê vegotin kû wekî kategorîk, kifşên arkeolojîk ên heya niha hatine kirin bi tu referansên Pirtûka Pîroz re nakokî hev nabin. Gelek kifşên arkeolojîk hene kû xetên bingehîn an jî hûrguliyên vegotinên dîrokî yên Pirtûka Pîroz rast derdixin.”[68] Ji bo pirtûkên din kû ji hêla dînên cîhanê ve rêz tên girtin, heman tişt nikare bê gotin. Wekî mînak, kifşên arkeolojîk nîşan nekirine kû bi dîrok û erdnîgariya Pirtûka Mormonê re li hev tên.[69]

Arkeolog Joseph Free yê kû serokê beşê yê Koleja Wheatonê ye, bi van gotinan dawî li pirtûka xwe ya bi navê *Arkeolojîû Dîroka Pirtûka Pîroz* tîne: “Ji ber kû pir dixwînim, min dît kû her yekê pêncî beşên pirtûka Afirînê kû hema hema kevin bûye, bi kifşên arkeolojîk agahiyên an ronî lê hatine girtin an jî hatine erêkirin dihewînin – ez wisa difikirim kû ev tişt ji bo Peymana Kevin û Nû ya Pirtûka Pîroz û ji bo pirtûkên mayî jî wisa ye. [70]

## ZANİST DİKARE Çİ ÎSPAT NEKE?

Agahiya rast a arkeolojîk, tevî kû her tim ewlebûna Pirtûka Pîroz wekî tomareke dîrokî ya terwende erê dike, arkeolojî sirûşa Xwedayî *nikare îspat bike*. Û di Pirtûka Pîroz de vegotinên zanistî yên bandorker hebe jî, zanist *nikare îspat bike* kû tu pirtûk Peyva Xwedê ye. Diviyabû ev bihata diyarkirin, lewre hin mirov ji bo kû pirtûka wan a pîroz hin vegotinên kû ji hin guhan re zanistî tên, dihewînin, hewl didin mirovên din qeneh bikin kû ev pirtûk ji Xwedê îlham girtiye.

Rastiya *giyanî* bi kifşên *zanistî* nikarin bên îspatkirin, bi vî awayî rastiyên nav pirtûke kê de jî îspat nake kû ew ji Xwedê hatiye. Şeytanê kû demeke dirêj e li derdor digere, der heqê zanistê de gelek tişt dizane. Em ê li destpêka rêwîtiya xwe ya Nivîsên Pîroz de, rastî Îblîsê kû berê milyaketekî asîmanî bû û piştre bû dijminê Xwedê, û niha jî wekî Şeytan tê binavkirin, bên. Niha bila di mêjiyê we de tenê ev hebe: Şeytan pir zîrek e û ewqas xurt e kû dikare ji bo kû tiştên bandorker binivîsin ji mirovan re îlham jî bide.

Daniel pêxember mirovekî zana bû kû Xwedê yek ji pirtûkên herî dirêj a Nivîsên Pîroz bi wî dida nivîsîn, lê dîsa jî gava mijar kapasîteyên xwezayî be, Şeytanê kû li hemberî rastiya Xwedê tê *"ji Danielî zanatir e"* (Hezekiel 28:3). Şeytan zîhna hosta ya pişta dînê sexte ye û di hunera xapandinê de pispor e. Wateya peyva şeytên "tawanker" an jî "yê kû îftira dike" ye.

Wecîzeyeke Erebî, xetereya kû em behs dikin wisa kurte dike: *"Bişiyarbin bin! Hin derewker rastiyê dibêjin."*

## HELBEST DİKARE Ç ÎSPAT NEKE?

Hin dîn pêşber dikin kû pirtûkên wan ji hêla Xwedê ve hatine îspatkirin, lewre pirtûkên wan bi uslûbeke nivîskî hatiye nivîsîn kû tu mirov nikare hilberîne.[71] Wekî kû Ehmed di posteya xwe ya elektronîk de wiha nivîsiye:

> Posteya Elektronîk
>
> Qur'an mucîzeya herî mezin e kû heya niha ji pêxemberekî re hatiye şandin! Baş e, kû hûn dijberê wê difikirin, naxwe ayeteke kû dişibe ya Qur'anê biafirînin!! Kû hûn erebiyeke herikbar jî biaxivin, hûn tu car nikarin vê tiştê bikin… li cîhanê tu tişt tune ye kû nêzî berzîbûna Qur'anê bibe. Û ger kû hûn bikaribin dijberê vê îspat bikin, naxwe werin îspat bikin.

Bingeha qaqibokirina Ehmed, ayeteke sûreya duyemîn a Qur'anê ye: *"ger hûn der heqê tiştê kû me ji evdê xwe re şand biguman in, **de haydê sûreyeke mîna wê bînin**…"*(Sûre 2.23)

Dijwariya vê îdiayê ev e kû dê neyê îspatkirin û çewtiya wê dê neyê nîşandan.

Kû em mînakek bidin, em bifikirin kû ez organîzeya pêşbaziya wêneyan dikim; ez bi tabloya kû min çêkir tevlî vê pêşbaziyê dibim, ez dibim hakemê pêşbaziyê, xwe yekemîn derdixim û ji pêşbazên din re wiha qaqibo dikim: "Tu kes nikare wekî min wêne xêz bike. Kû hûn biguman in kû di cîhanê de wênesazê herî baş ez im, naxwe tabloyeke kû dişibe ya min çêkin!"

Ev rewş dikare îspat bike kû tabloya herî baş ya min e? An jî dikare îspat bike kû wênesazê herî baş ez im? Na. Lê belê, digel vê tu kes nikare îspat bike kû ez xelet im! Çima nikare? Bedewî di çavên wî/wê de ye kû dibîne.

Heman rewş ji bo bedewiya rîtmîk û edebî jî heye. Ev mijar, mijareke subjektîf e.

Pirtûka Pîroz di warî helbesta xwe ya Îbrankî ya bandorker û bi gelek hejmarên pergala şekla xwe ya kû ji tirsa zihîn re dibe sedem de pir dewlemend e.[72] Lê dîsa jî Xwedê ji ber bedewiya xwe ya edebî ji me bawerbûna Peyva Wî hêvî nake.

Çawa kû zanist nikare îlhama Xwedayî îspat bike, rastnivîseke kû ji guhê me re xweş tê jî nikare îspat bike kû pirtûka Xwedê ye.

Tevgereke zanyarî ye kû em di hişê xwe de bigirin kû zarîkerê mezin ê Şeytan jî bi helbesta xwe ya wekî kû hîpnotîze dike û "*peyvên xweysazî"* (Yahuda 16) îlham digire.Nivîsên Pîroz me di mijara *"kesên saf kû dilê wan bi gotinên xweş dikare bê xapandin"* (Romayî 16:18) de agahdar dike kû em jî wisa nebin; bi taybetî jî peyvên wisa bi pêşnûma û peyama Afirîner ya kû ji destpêka demê ve daye zanîn re nakokî hev be, divê em pir bişiyarbin bin û neyên xapandin.

Zanist, arkeolojî û helbest nikarin îspat bikin kû tu pirtûk Peyva rast a Xwedê ye. Îspata qethî ya îlhama Xwedayî, divê li ser bingeha qada darazê ya bilindtir —xurttir, îspateke kû nîqaşa wê ne kû mimkin e- bê avakirin.

Em ê niha li vê îspata qethî binêrin.




# 5

# Mohra Xweda

*“Bila hemû netewe ... bibihîzin û bêjin ‘**Rast e**’”*
— Xweda (Yeşaya 43:9)

Piraniya tomarên zagonî divê xwedî mohrek bin. Nivîsên Peymana Kevin û Nû yên kû wisa tê îdiakirin kû tomar û peymanên rayedar ên Xweda ne, ne xwedî mohra kû bi pênûsekê ve tê kirin in, xwedî mohreke kû wekî *pêxemberiyên kû têne cih* hatine binavkirin û ya bêhempa ne.



*“Xwedê dibêje... ‘Yê Pêşî û Dawî Ez im, ji xeynî min Xweda tune ye. Yê wekî min heye? Bila cab bide. Ji dema kû min gelê xwe yê ezelî afirand çi bû, çi nebû û dê çi bibe **bila bêje**. Belê, **bila bûyerên dahatûyê bide zanîn**! ... **Kî ye kû ji berê de agahiya van tiştan da û da zanîn?** Ez REB, min neda zanîn?’”* (Yeşaya 44:6-7; 45:21)

Em di mijara famkirina mantiqa Xweda têk neçin.

Sedema kû em dizanin em dikarin ji daxûyanên Pirtûka Pîroz a der heqê niha û pêşerojê de bawer bikin ew e kû, hemû pirtûk bi pêxemberiyên bihûrgulî yên kû bi yeqînî hatine cih ve tijî ne.

## DELÎLÊ ERÊNÎ

Dîrokê, ya kû Ya Heyî ya tenê li derveyî demê, dikare beriya pêkhatina dîrokê bide zanîn û binivîse.

Zilam û jinên fanî, di demên diyar de der heqê dahatûyê de texmînên kû li ser perwerde dîtine kirin, lê belê tenê Xweda dikare dahatûyê ji niha de wekî pêk hatiye bibîne. Tenê Xweda dizanê dê hezar sal şûn de çi bibe. Bêyî ravekirina Xwedayî ne mirov, ne milyaket, ne Şeytan, ne jî cîn dikarin bûyereke pêşerojî bi awayekî rayedar bidin zanîn.

Hin mirov dikarin vê pirsê bikin, “Lê medyûm, sêrbaz û falbaz hene, hûn ê der heqê wan de çi bibêjin? Ew pêşerojê didin zanîn!”

Destpêkê famkirina vê girîng e: Şeytan *“ji bo kû daxwazên wî bînin cih, ji kesên kû dîl girtiye”* re dikare derbarê dinyayê de agahiyeke zêde û hêz bide. (Timoteosê 2., 2:26)

Ya duyemîn, Şeytan — zarîkerê hosta û psîkolog yê kû bi hezar salan e çavdêriya dîroka mirovahiyê dike- di mijara mohrkirina sexte ya Xwedê de pisporekî ye.

Ya sêyemîn, Şeytan di kiryara agahîdana encamên hin bûyêran de pir baş e. Bi giştî hatiye îspatkirin kû “pêxemberiyên” Şeytên xelet in. Û di ser de, ev “pêxemberî” nediyar û ximamî ne. Mînak, falbazekî ji jineke ciwan re dikare wiha bêje: “Di çend salên pêşiya me de tu yê bizewicî û tu yê hezkirina rast bibînî.” Hûn jî ez jî dizanin kû îhtimaleke mezin e kû “pêxemberiyek” wisa heye û ji ber vê dê pêk bê. Gava em behsa *pêxemberiyên Pirtûka Pîroz yên kû pêk hatine* dikin, tiştê kû em dibêjin, ne texmînên wisa nediyar û ximamî ne.

Niha em li **sê mînakên kû me ji pêxemberiyên Pirtûka Pîroz girtin**, binêrin — der heqê cihek, gelek û kesek de.

## PÊXEMBERİYÊN DER HEQÊ CİHEKÎ DE

B.M derdora sala 600an Hezeikel pêxember li bajarê Sûrê yê kû aîdî Fenikeyê ye, pêxemberî kir. Bajarê Sûrê kû li perava behrê li cihekî nêzî Lûbnanê hatiye avakirin, ji du hezar salan zêdetir paytexta cîhanê bû. Ev bajar wekî *keybanûya behran*

dihat nasîn. Lê dîsa jî gava bajar xwedî hêza xwe ya herî zêde bû, Xwedê ji Hezekiel re got bila der heqê hilweşîna bajarê ya ji ber encama xirabî û quretiya Sûrê ya li hemberî Xwedê pêxemberiyek daxuyanî bike û bila vê pêxemberiyê binivîse.

Hezekiel pêxember ev pêxemberî kir:

1. *Dê gelek netewe êrîşî bajarê Sûrê bikirana.* (Hezekiel 26:3)
2. *Dê destpêkê Qralê Babîlê Nebukadnessar êrîşê bajêr bikira.* (ayet 7)
3. *Dê dîwarên Sûrê bihatana hilweşandin, dê bircên wê bihatana wêrankirin.* (ayet 4,9)
4. *Dê gelê Sûrê bidana ber şûran.* (ayet 11)
5. *Dê kevir, kereste û axa bajêr biavêtana behrê.* (ayet 12)
6. *Dê axa bajêr bihata kolandin û maliştin û dê bajêr bibûya 'zinarekî tazî'.* (ayet 4)
7. *Dê bajêr di nava behrê de bibûya cihekî kû masîgir 'torên xwe zivêr dikin'.* (ayet 5,14)
8. *Dê bajarê Sûr ê Mezin tu car dîsa nehata avakirin,* ***lewre Rebê serwer got.*** (ayet 14)

Dîroka dinyewî tomar dike kû heşt pêxemberî bi tevahî pêk hatine:

1. *Gelek netewe êrîşî bajarê Sûrê kirin.*
2. Neteweya yekemîn a êrîş kir *Babîlê kû Qral Nebukadnessar bi rê ve dibir bû.*
3. Piştî dorpêçkirina (B.M 585-572) kû sêzdeh sal dom kir, Nebukadnessar pêxemberiya pêxember Hezekiel pêk anî û *dîwar û bircên Sûrê yên kû li ser parzemînê ne hilweşand.*
4. Nebukadnessar gelê bajarê kû nekarîn birevin kaleya giravê ya Sûrê, ya kû li Behra Spî, ji peravê nêzî kîlometreyek dûr hatiye avakirin, *da ber şûran*.
5. Dîroka dinyewî B.M di sala 332an de bûyerên kû pêk hatin wiha tomar dike: "Îskenderê Mezin kesê yekemîn bû kû beşa giravê ya Sûrê feth kir. Îskenderê Mezin destpêkê parzemîna bajêr hilweşand û moloz û kevirên

cihê kû hilweşand ji xwe re rêyek çêkir kû bigihije giravê û serkeftî bû."[73] Bi vî awayî, haya wî jê tune bû lê beşa din a pêxemberiya *"dê kevir, kereste û axa we bavêjin behrê"*pêk anî. Fetha Îskenderî, dawiya qethî anî kû dê Împaratoriya Fenike êdî tu car nehata avakirin.[74]

6. Bajar wekî *'zinarekî tazî'* hat kolandin û maliştin.
7. Bajar bû *'cihê kû tor tên zivêrkirin'*.
8. Di salên piştî vê bûyerê de, ji bo ji nû ve avakirina bajarê Sûrê, pir gelek cehd hat kirin. Lê ev cehd ji bo dîsa hilweşîna bajêr nekarî bibe asteng. Îro li Lûbnanê bajarekî modern a bi navê Sûr heye, lê bajarê kevin ê Fenike kû Hezekiel lê pêxemberî kir tu car nehat avakirin. Kovara National Geographic li binê wêneyekî kû peyarêya kevir dida nîşan vê sernûçeyê nivîsiye: "Bajarê Sûrê kû îro aîdî Fenikeyiyan e, di binê van kevir û stûnên peyarêyan kû aîdî paytexta Romayê ne, hatiye veşartin. Bi kolaneke biçûk, kû mimkin e mirov bigihije dinyaya Fenikeyiyan a wenda."[75]

Wekî mirov Hezekiel, dema kû dijiya bi nêrîna bajarê Sûrê, bi zanabûna xwe, ji bo agahkirina van heşt pêxemberiyan xwedî gumaniyek çawa bû?

Ji ber kû beriya kû dîrok pêk bê tenê Xwedê dikarîbû ew bidîta, tenê Xwedê dikarîbû ev agahî bidaya Hezekiel.

## PÊXEMBERİYÊN DER HEQÊ GELEKÎ DE

Pirtûka Pîroz der heqê bihejmaran gel û neteweyan de bi sedan pêxemberiyên kû biqethî û zelal hatine vegotinkirin dihewîne: Misir, Etîyopya, Erebîstan, Îranê kevin, Rûsya, Îsraîl û gelek ji van.

Beriya kû em derbasî mînaka pêxemberiya kû pêk hat bibin, em bînin bîra xwe kû armanca me ne ew e kû em van pêxemberiyan wekî em dixwazin bibihîzin bidin zanîn an jî bi alîkariya wan rojeveke polîtîk an jî dînî pêk bînin. Armanca me ew e kû em tiştên di Pirtûka Pîroz de tê daxûyankirin, hîn bibin.

Em ê li vir bûyereke pêxemberî kû der heqê neteweyeke diyar

de pêk hatiye binêrin kû şîrovekirina wê hêsan e lê qebûlkirina wê ji hêla gelek kesan ve zor e.

B.M nêzî sala 1920an de Xwedê ji Birahîm re ev wehd kir: *"Ez ê van axan bidim nifşa te."* (Afirandin 12:7)

Xwedê piştre ev wehd da Îshaq û Yaqûb.[76]

Nifşa Birahîm, Îshaq û Yaqûb piştre wekî *Îbranî,* Îsraîlî û di dawiyê de jî wekî *Cihû* hat binavkirin.

Xwedê bi sedan sal piştî van wehdan, ji Mûsa re agahî da, ger kû jê bawer nekin û jê re îtaat nekin dê çi bê serê wan:

> ***"Ez ê we di nav neteweyên din de belav bikim, bi şûrê xwe bikevim dû we. Dê welatê we wêran bibe, dê bajarên we kavil bibe."*** (Levîyî 26:33)

> *"Neteweyên kû dê Reb we mişextî nav wan bike, dê şok bibin ji ber tiştên kû hatine serê we;* ***dê we bêrûmet bikin, dê bi we re henekên xwe bikin…*** *di nav wan neteweyan de, hûn ê ne di* ***xweşiyê*** *de bibin ne jî dê cihê we yê rihetbûnê hebe. Li wir dê Reb ji we re dilê lerizî, bêhîvîtî û çavên ji nêrînê westayî bide."* (Dubareya Şerîetê 28:37, 65)

Peymana Kevin wekî van gelek pêxemberiyan dihebîne.

P.M nêzî sala 30an, Îsayê Nasirayî bi erêkirina peyvên pêxemberan re hilweşîna Yeruşalimê ji berê de da zanîn: *"Îsa nêzî Yeruşalimê bû, bajar dît, girî û wisa got: '... Dê ji bo te rojên wisa bê kû, dê dijminên te, te berbeng bikin, dê te* ***dorpêç*** *bikin û ji her alî ve bişidînin. Dê te jî, zarokên li ber singê te jî li erdê bidin.* ***Dê kevir ser kevirê nehêlin****. Lewre te ferq nekir gava Xwedê hat alîkariya te."* (Lûka 19:41-44) Îsa bi behskirina perestgehê, ev peyv gotin: *"Dê rojên wisa bên kû,* ***dê kevir li ser kevirê nemîne****, dê hemû hilweşe!"* (Lûka 21:6)

Çil sal bi şûn de ev bûyer pêk hatin.

Flavius Josephusê kû P.M di sala 37an de hate dinyayê, bûyera kû ew bi xwe şahid bû, tomar kir. Artêşa Romayê P.M di sala 70an de Yeruşalimê dorpêç kir, derdora bajêr bi *berbendan pêça* û piştî

dorpêçkirina kû sê sal dom kir, artêşê Yeruşalim *têk bir*. Digel fermana Sezar ya ji liqên siwariyan re kû bila perestgehê wêran nekin, leşkerên hêrs ên Romayê Cihûyên kû tê de xwe veşartibûn, kuştin û perestgeh dan ber êgir. Zer û zîvên perestgehê heliya û di nav keviran de herikî. Perestgeh wekî kû Îsa agahdar kiribû, hat hilweşandin: *"Dê kevir ser kêvir nehêlin."*[77] Û wekî kû Mûsa û pêxember berê gotibûn, Cihû di nav neteweyên din ên dinyayê de hatin *belavkirin*. Du hezar sal bi şûn de dê dîrok bûya şahidê pêkhatina van pêxemberiyan: Cihûyê gerok, bû kesek wisa kû *hemû netewe ew bêrûmet kirin û pê re henekên xwe kirin, cihê wî yê xwe rihet bike nema êdî.*

Hestên me yên kesane çi be bila bibe, di vê pêxemberiya Pirtûka Pîroz de hêlek heye kû tu kes nikare înkar bike. Xwedê di heman demê de ji pêxemberan re got, digel newekheviyan dê Cihû di nav neteweyan de wekî gelekî cuda bêne parastin û dê rojek dê Birahîm, Îshaq û Yaqûb vegerin welatê xwe yê kû Xwedê dabû wan.

Mûsa ji *Îsraîliyan* re pêxemberî kir, got: *"Xwedayê we Reb, dê we ji nav neteweyên kû we belav kir,* ***ji nû ve kom bike****."* (Dubareya Şerîetê 30:3). Pêxember Amos ev pêyv li ser pêxemberiya Mûsa zêde kir: *"Ez ê gelê xwe yê Îsraîlê kû hatibû mişextkirin dîsa bînim;* ***dê bajarên wêranbûyî selihînin*** *û dê li wir bijîn…* ***ez ê wan li ser axa wan biçînim*** *û dê car din ji axa kû min da wan nebin."* (Amos 9:14-15)

Şebekeya weşanên nûçeya dinyayê, agahdarî didin kû ev bûyer pêk hatine.

Di dîroka cîhanê de bûyereke wisa kû hatiye ser gelê Cihûyan, nehatiye dîtin. Ev rewş ji ber sedemekê, ji zagona bişaftinê re rasterast mixirkiyê derdixe. Lewre ev zagon dide zanîn kû, ger neteweyek ji hêla neteweyek din ve bê fethkirin û ji nav van kesan kû dibin welatê xwe kesên hê dijîn, piştî çend nifşan dişibin wê neteweya kû tê de ne. Di navbera her du neteweya cuda zewac çêdibin, ziman û çanda nû tê pejirandin –bi vî awayî mirovên gelê kû hatiye fethkirin, piştî çend nifşan nasnameya xwe ya netewî

wenda dikin. Lê belê ev zagona bişaftina li Cihûyan nehatiye. Bi milyonan Cihû di nav bêçariyê de, digel hewldana wan a bişivîn û tevlîbûna neteweya kû tê de ne, nekarîn serkeftî bibin.[78]

Famkirina gelek kesan kû digel qebûlkirina van gotinan dê çima biêşin, ne zor e. Çend roj berê, hevalekî min ê kû li Lûbnanê dijî, ev peyv nivîsîn: *"Der heqê pêkhatina pêxemberiyan de (der heqê soza Xwedê kû wê Yahudiyan dîsa bîne welatê wan), ez nikarim tuwancên der heqê qebûlkirina baweriyeke wisa de piştguh bikim. Qebûlkirina vê baweriyê, dê zerarê bidaya armanca min."*

Em bi awayekî zelal biaxivin. Li ser piyan mayîna Cihûyan a wekî gel û netewe û ji nû ve pêkhatina wan qebûlkirin, nayê wê wateyê kû divê em polîtîkaya rêveberiya Îsraîlê bipejirînin. Ez hevalê xwe yê Lûbnanî fam dikim û kêfa min jê re tê. Malbata diya wî û cîranên wî, di sala 1948an de bi gelek kesên din re ji malên xwe hatin derxistin. Welatê wî dûçarî gelek êşan ma. Digel van hemû tiştan, fikra kû divê bê têgihîştin, ev e: peyvên pêxemberên Pirtûka Pîroz li ber çavê me dikevin.

Îro rastiya kû di bin redkirina Cihûyan a peyama pêxemberên xwe kû li gorî îdiakirina wan rêz digirin radizê, di heman demê de dide nîşan kû peyvên kû di ayeteke din de ne, pêk hatine. Çavê *giyanî* ya neteweya Cihû nabîne: *"Îro jî gava nivîsên Mûsa (Tewratên wî!) tên xwendin, xêliyek dilê wan tê dipêçe"* (Korîntiyên 2., 3:15). Heya kû roja wan a tobekirina wekî netewe (ya kû di zihn û dilê xwe xwediyê ne ) û bawerkirina wan a peyama Xwedê ya dema kevin bê, dê di jiyana wan de bereketa Xwedê ya rast neyê dîtin.[79]

Gava em di Pirtûka Pîroz de digihîjin dawiya rêwîtiya xwe, em ê bibînin ka ev bûyer bi bernameya Xwedê, ya kû ji bo demên dawî sêwirandibû çi qas li hev tê. Di heman demê de em ê pêxemberiyên der heqê bereketên kû Xwedê ji bo Rojhilata Navîn û hemû dinyayê amade kiriye bibihîzin.

*“‘Ez pêşnûmayên kû min ji bo we amade kiriye dizanim’ dibêje Rab. ‘Ne pêşnûmeyên xirab in, ev pêşnûmeyên* ***silametiyê ye kû dê ji we re pêşerojeke bihêvî bîne.****’ ”*
(Yeremya 29:11)

## PÊXEMBERİYÊN DER HEQÊ KESEKÎ DE

Di tevahiya Peymana Kevin de bi sedan pêxemberî hene der heqê Mesîh-Rizgarker de kû Xwedê wehd dide bişîne dinyayê. Tomarên Behra Mirî erê dike kû ev Nivîs bi sedsalan sal beriya jidayîkbûna Mesîh hatine nivîsîn. Ez li jêrê bijareyeke pêşkêş dikim kû ji van daxûyaniyên pêşî hatine çêkirin.

- *Pêxemberiya kû ji Brahîm re hatiye dayîn, B.M 1900:* **dê Mesîh ji nifşa Brahîm û Îshaq bihata dinyayê** (di Afirandin 12:23; 22:1-18. Matta 1ê de pêk hat.)
- *Pêxemberiya kû ji Yeşaya re hat dayîn, B.M 700***: Mesîh bêyî bavekî bîyolojîk a erdîn, dê ji dûşizeyek (bakîre) bihata dinê.** (di Yeşaya 7:14; 9:6. Lûka 1:26-35, Matta 1:18-25an de pêk hat.)
- *Pêxemberiya kû ji Mika re hat dayîn, B.M 700:* **Mesîh, Rizgarker dê li Beytlehemê bihata dinyayê.** (di Mîka 5:2. Lûka 2:1-20; Matta 2:1-12an de pêk hat.)
- *Pêxemberiya kû ji Hoşea re hat dayîn, B.M 700:* **Dê ji Misirê bihata gazîkirin.** (di Hoşea 11. 1. Matta 2. 13-15an de pêk hat.)
- *Pêxemberiya kû ji Malakî re hat dayîn, B.M 400:* **Dê nûçevanê Mesîh berê bihata şandin.** (di Malakî 3:1; Yeşaya 40:3-11. Lûka 1:11-17; Matta 3:1-12an de pêk hat.)
- *Pêxemberiya kû ji Yeşaya re hat dayîn, B.M 700:***Dê pêk bianiya kû kesên kor bibînin, yên ker bibihîzin, yên quliming bimeşin û dê nûçeyên baş bigihanda feqîran.** (di Yeşaya 35:5-6; 61:1. Lûka 7:22; Matta 9 û beşên din de pêk hat.)
- *Pêxemberiya kû ji Yeşaya re hat dayîn, B.M 700:* **Dê ji hêla gelê xwe bihata redkirin.** (di Yeşaya 53:2-3an de; di heman demê de: di Mezmûr 118:21-22. Yuhanna 1.11; Markos 6:3; Matta 21:42-46; û beşên din de pêk hat.)
- *Pêxemberiya kû ji Zekeriya re hat dayîn, B.M 500:* **Ji ber kû zevî bistînin, dê ji bo sih zîvan ji Mêsîhî re îxanetê**

**bikirana.** (di Zekeriya 11:12-13. Matta 26:14-16; 27:3-10an de pêk hat.)

- *Pêxemberiya kû ji Yeşaya re hat dayîn, B.M 700:* **Dê Mesîh bê redkirin, dê belasebeb bihata tawanbarkirin, dê ji hêla Cihû û Neteweyan ve bihata darizandin û kûştin.** (di Yeşaya 50:6; 53:1-12an de; di heman demê de: di Mezmûr 2 & 22; Zekeriya 12:10. Yuhanna 1:11; 11:45-57; Markos 10:32-34; Matta 26 & 27an de pêk hat.)
- *Pêxemberiya kû ji Dawud re hat dayîn, B.M 1000:* **Dê dest û piyên wî bê qulkirin, kesên kû dê temaşa wî bikin, dê jê re bikenin û dê ji bo kincên wî zarê biavêtana.** (di Mezmûr 22:16,8,18. Lûka 23:33-37;24:39an de pêk hat.) (Di hişê xwe de bigirin ev pêxamberî gelek beriya darexaçiyê kû wekî cezayê mirinê pêk anîn, hatibû gotin.)
- *Pêxemberiya kû ji Yeşaya re hat dayîn, B.M 700:* **Digel kû dê wekî sûcdarê herî xirab bihata kûştin, dê di mezela zilamekî dewlemend de bihata veşartin.** (di Yeşaya: 53:8. Matta 27:57-60an de pêk hat.)
- *Pêxemberiya kû ji Dawud re hat dayîn, B.M 1000:* **Dê bedena Mesîh di mezelê de neriziya, dê Ew zora mirinê bibira.** (di Mezmûr 16:9-11an de; di heman demê de bnr: Matta 16:21-23; 17:22-23; 20:17-19 û beşên din. Lûka 24; Karên Şandiyan 1&2an de pêk hat.)

Zagonên îhtimalan rave dike kû kesekî pêxemberiyên ev qas taybet û rastiya wê dikare bê îspatkirin “nepêkan” e. Lê dîsa jî ev hemû pêxemberî pêk hatin.

Piştre belkî hûn ê bixwazin Pirtûkeke Pîroz bistînin û li vê lîsteyê vegerin û bi xwendina her pêxemberiya Peymana Kevin, hûn ê bikarin binêrin ka pêkanîna vê di Peymana Nû de çawa hatiye tomarkirin.

## SEMBOL Û MÎNAKÊN TAYBETMENDİYA PÊXEMBERİYÊ

**Li her cihê Nivîsên Pîroz de ji xeynî *bisedan* pêxemberiyan, dîsa bi sedan *sembol* û *mînak* (ev sembol û mînak dikarin *wekî tuwanc, teswîr, xeyalên kû di pêşerojê de pêk bên û raveyên kû bi wêneyan tên terîfkirin* jî bên nîşankirin) cih digirin.**

Xweda her yekê van alîkarên dîtbar ji bo kû plana der heqê Xwe û mirovahiyê de ji dinyayê re hîn bike, sêwirand.

Hûn ê di rêwîtiya me ya Nivîsên Pîroz de, bi gelek sembol û mînakan re rû bi rû bimînin. Mînak, *sembola* herî girîng a kû li ber çav dikeve *berxikeke kû tê qurbankirin* e, kû ji beşa 19. a pirtûkê dest pê dike û heya beşa 26an bi awayekî zelal tê ravekirin.

Em ê di beşa 21an de der heqê konekî taybet kû Xwedê ji gelê xwe re ferman kiriye kû ji bo *mînakek* bila *perestgehek guhêzbar* ava bikin, agahî bistînin. Her tiştê der heqê vê perestgeha guhêzbar alîkarên xurt ên dîtbar in kû ji mirovan re bide nîşan ka Xwedê çawa ye û gunehên wan dê çawa bêne efûkirin û ji bo kû heya bêdawîtiyê bi Wî re bijîn divê wesfên xwe çawa bi dest bixin, fam bikin.

Hevrûkirineke kû dê di jiyana Yusufê Yaqûb û Îsayê Nasirayî de bê kirin, mînakeke bandorker e ji bo *ravekirinên kû bi wêneyan tên terîfkirin* a kû di Nivîsan de ye. Di navbera jiyana Yusuf û Îsa de ji sedan zêdetir wekhevî hene. Xwedê jiyana Yusuf ji bo wêneya Îsa kû dê 1700 sal ***şûn de bê dinyayê xêz ke, bi kar anî.***[80]

Ji bo mînak û pêxemberiyên wisa tenê raveyek bimantiq divê: Xweda.

## ARMANCA PÊXEMBERİYÊ

Dema Mesîh li rûzemînê bû wiha got:

> *"Ez ji we re ji niha de, **beriya kû ev pêk bên** dibêjim kû **gava pêk bên** hûn jê bawer bikin kû Ew ez im."*
>
> (Yûhanna 13:19)

Gava bûyerên pêşerojê ji berê de tên agahdarkirin û piştre di dîrokê de pêk tên, rêyeke Xwedê ye kû pejirandina nûçevan û peyamên xwe dide nîşan. Xwedayê rast û kû dijî, ji bo kû baweriya me ya ji Peyva Wî re xurt bike wiha dibêje: ***"Yê kû dawiya wan bûyeran kû hê pêknehatine ji berê de dide zanîn**, û yê kû dibêje 'dê Sêwir pêk bê' ez im."* (Yeşaya 46:10)

Rêwîtiya kû em ê di Nivîsên Pîroz de bikin, dê ji pirtûka

destpêkê —*Afirandin*— a Pirtûka Pîroz, ya kû destpêka dinyayê dinivîse, dest pê bike. Dê rêwîtiya me li pirtûka dawî —*Wehî*— ya Pirtûka Pîroz a kû bûyerên dawî yên dîroka cîhanê dide zanîn, biqede.

Em çawa dikarin ji paşeroja Pirtûka Pîroz a kû dikare bê îspatkirin û ji rastbûna vegotinên der heqê pêşeroja kû ji berê de nayê dîtin, bawer bibin? Em dikarin bi mantiqê bawer bibin kû dê roj sibê derkeve, em dikarin bi heman mantiqê ji vê mijarê jî bawer bibin. Dizgeya me ya rojê, bi hezaran salan e xwedî rtomareke bêhempa ye. Rûzemîn di zivirîna xwe ya li ser tewereyê (eksen) tu car têk neçûye. Roj bi awayekî domdar derdikeve û diçe ava. Heman tişt ji bo pêxemberiya Pirtûka Pîroz jî derbas dibe. Pirtûka Xwedê, di her mijarê de kû rastiya wê dikare bê îspatkirin, xwedî rtomareke bêhempa ye.

## MEYDANKİRİNA XWEDÊ

Hin kesên oldar pêşber dikin kû di pirtûka wan a pîroz de jî hin pêxemberî pêk hatine. Ger kû hûn bibihîzin yekî tiştek wisa dibêje, bi awayekî rêzdar vê ricayê jê bikin: "Tu dikarî ji min re lîsteya sê çar heb pêxemberiyên qanehker derxî ji pirtûka xwe ya pîroz?" Nikare lîsteyek wisa bide, lê gava bide divê hûn lêkolînê bikin ka bûyerên kû ev pêxemberî *beriya* pêkhatinê hatine nivîsîn an na. Piştre van pêxemberiyan ji bo pejirandina pêkhatina wan, bi dîroka cîhanê re bidin ber hev. Min di dawiya ceribandinên xwe dît kû ger ev pêxemberî hene an pir kêm in an jî nediyar in.

Xwedayê rast ê kû dijî, meydankirina xwe ya jêrê pêşkêşî hemû dînan û xwedayên kû di mêjiyan de çêbûne, dike:

> *" 'Doza xwe pêşkêş bikin, delîlên xwe derxin' dibêje Rab… Pûtên xwe bînin kû bila* ***bûyerên kû dê çêbibin pêşkêşî me bikin****.* ***Bila her tiştî ji me re bêjin*** *kû em bifikirin û* ***encama wan bizanibin****. An jî bila* ***bûyerên dahatûyê*** *pêşkêşî me bikin. Ya Pût, ji me re* ***tiştên kû dê ji niha û pê de çêbibin*** *bêjin kû em jî bizanibin kû hûn îlah*

*in. Haydê, qenciyek an jî xirabiyek bikin kû em jî bitirsin û şok bibin. Hûn jî, kirinên we jî ji hîçîtiyê xirabtir in, yên kû we dipejirînin bêmirz in.”* (Yeşaya 41:21-24)

Di mijara mînakanîna der heqê pêxemberiyên kû yeqîn pêk hatine de, Pirtûka Pîroz yek e.

Xwedayê rast ê kû dijî rastiya Peyama xwe beriya kû dîrok pêk hat, bi nivîsîna wê dîrokê îspat kir.

Pêxemberiya kû pêk hat, **mohra WÎ ye.**



# 6

# Şahidiya Hevgirtî

*"Heger kû hûn bixwazin bizanin av çawa çêdibe, **ji masiyê nepirsin**."* — gotinên pêşiyan ên Çînî

Vê mijarê bînin li ber çavên xwe.

Li rojeke pir germ, gava hûn li qeraxa çêm dimeşin, kêfa diçe avjeniyê. Lê dîsa jî hûn meraq dikin ka dê ava çêm biçe xeşa we an na. Gelo birha avê pir xurt e? Gelo av zêde sar e? An jî hemû merc musaîd in?

Gotina pêşiyan a Çînî vê şîretê dike: *"Ji masiyê nepirsin."*

Ew masiyên kû di nav çêm de dijîn çima ne xwedî wê wesfê ne kû bêjin ka "*av çawa ye"* (ji bilî kû zimanê we naaxivin!)

Sedema wan masiyan ka çima nikarin agahiyeke wisa bidin we hêsan e; ji xeynî wan sînoran kû hebûna wan tenê di nav wê avê de ye, ne xwedî referansek in. Tişta kû dizanin ew cîhana bisînor û şêlo ye.

Bi heman awayî, kû em dixwazin cîhana kû em tê de dijîn û çima em li vir in bizanin, divê ev agahî ji derveyî nêrîna bisînor bide dayîn.

Agahiya baş jî ew e kû Xwedayê Ezmanan kî dixwaze jê re daye ev agahî.

*"Nivîsên Pîroz bi tevahî îlhama Xwedê ye û ji bo hînkirin, tedîpkirin û ji bo dayîna perwerdehiya rastiyê sûdewar e."* (Timoteosê 2., 3:16)

Em ê çawa bizanibin ka Nivîsên Pîroz ***îlhama Xwedê*** ye, ango ji hêla Xwedê ve ji bo îlhamê hatiye dayîn? Me di beşa berê de dît kû Afirîner bi sedan pêxemberiyên pêkhatî xist nav Pirtûka Pîroz û ewlebûna wê mor kir.

Tenê Xwedê ji berê de dikare pêşeroja dûr çendî caran û %100 biyeqînî bide zanîn.

Xwedê di heman demê de, ewlebûna Raveya xwe bi sedan salan ji gelek pêxemberan re rave kiriye û bi vî awayî bingeha xwe ava kiriye.

## YEK ŞAHİDÎ TÊRÊ NAKE

Xwedê ji Musa re wiha got: "*Derbarê sûcek an jî gunehekî de **yek şahidî têrê nake** ji bo sûcdarkirina yekî. **Her pirsgirêk bi şahidiya du-sê kesan ve zelal bibe**.*" (Dubareya Zagonê 19:15)

Ev rêgez li hemû cîhanê tê qebûlkirin. "Di dozeke dadgehî de, ji bo diyarkirina rastiyê ji yekê zêdetir şahid tê xwestin. Ji bo kû ev îdia rast bê qebûlkirin, divê ji hêla çavkaniyên ewledar ên cur bi cur bê îspatkirin.

Xwedê bi ravekirina rastî de, zagona xwe ya kû *"Şahidek tenê têrê nake"* vegotin dike, nedanî aliyekî. Nivîsên Pîroz vê daxûyaniyê didin: *"Xwedayê kû erd, ezman, behr û tiştên kû di nav van de dijîn afirand ... Destûr da kû her netewe di rêya xwe de bimeşe. **Dîsa jî xwe bêşahid nehişt**."* (Karên Şandiyan 14:15-17)

Binemalên herî dûr ên kû li cîhanê dijîn jî xwedî ***şahidiya derveyî ya*** afrîner (bi dîtina afirandinên afirîneran) û ***şahidiya hundirîn a wijdanê*** (hesta zikmakî ya agahiya rastî, çewtî û bêdawîtî) ne. Ji hemû mirovên serzemînê re hinek ronî—hinek rastî hatiye dayîn. Ji ber vê Xwedê xuya dike kû *"tu qisûra wî"* tune ye.[81] Tevî vê yekê Xwedê wehd dike kû dê ji bo kesên kû bixîret dixebitin ji bo dîtina Afirînerê xwe û naskirina Wî, zêdetir ronî bide.

## ŞAHİDİYA DOMDAR

Xwedê tu car xwe bêşahid nehişt.

Di hezar saliya destpêkê a dîroka mirovahiyê de, Xwedê bi mirovan re an rasterast axivî an jî rastiya xwe bi alîkariya ***şahidiya devkî*** ya mirovên destpêkê da zanîn.

Adem, yê kû mirovê yekemîn e, heya sala 930an jiya. Kesên kû di hezar saliya destpêkê a dîroka mirovahiyê de jiyabû, nikarîbûn mahneyek bigotana der heqê nezanbûna rastiya Afirîner-Xwedayê wan de, lewre ji bo hînbûnê dikarîbûn ji Hewa û Adem yên kû ***şahidên orîjînal bûn, bipirsiyana.***[82] Emirdirêjiya mirovên destpêkê wekî kû Xwedê piştre sererast kiriye û wekî kû di vegotinê de jî hatiye diyarkirin, *"emrê me heftê sal dom dike, herî zêde heştê, ew jî kû tenduristiya me baş be."* (Mezmûr 90:10) Ji emrê îro yanzdeh car zêdetir bû.

B.M nêzî di sala 1920an de, Xwedê yekî kal kû navê wî xist Birahîm hilbijart. Xwedê ji Birahîm re wehd kir kû dê *neteweyek* ava bike kû ji wan re der heqê plana Xwe û mirovan de dersên taybet hîn bike. Xwedê di heman demê de bi rêya vê neteweya hilbijartî, dê *pêxember û Nivîsên Pîroz* **pêk bianiya û dê** *Mesîh* bişanda dinyayê. B.M nêzî sala 1490an, Xwedê mirovekî kû di nav vê neteweyê de bû peywirdar kir kû bibe Berdevkê Wî. Navê vî zilamî *Mûsa* ***bû.***

## ŞAHİDİYA NİVÎSKÎ

Xwedê ji Mûsa re îlham da kû bila *Tevrat* a kû beşa destpêkê a Nivîsên Pîroz e, binivîse. Armanca Wî ew bû kû rastiya Afirînerê Ezman û Rûzemînê, heya dawiya demê ji bo nifşa pêşerojê, *bi awayekî nivîskî* bikaribe bide peydakirin. Peyvên kû diviyabû bihata nivîsîn xist mêjiyê Mûsa. Xwedê rastiya Peyva xwe, bi *mucîzeyên* xurt ên kû bi destê Mûsa pêk anî, ji neteweyan re rast derxist. Xwedê di heman demê de *bûyerên pêşerojê*, yên kû Mûsa ji Misirî û Îsraîliyan re da zanîn, rave kir. Her tişt wekî kû Mûsa ji berê de dabû zanîn, pêk hat. Xwedê ji tu gumanên kû piştre mantiq derxe holê re cih neda.

Gumanbarên herî hişk jî neçar man îtîraf kirin bikin kû Xwedayê kû bi rêya Mûsa diaxive, Xwedayê rast û jîndar e.[83]

Mûsa pêxemberê în bû kû Peyva Xwedê ji panzdeh sedsalan zêdetir tomar kir.[84] Pêxember ew kes bûn kû paşeroja wan ji hev cuda bûn. Hinek ji wan perwerdehiya fermî nedîtibûn. Û digel kû nav nifşên cuda de jiya bûn, nivîsên wan peyamek pêşkêş dikir kû ji serî heya binî lihevhatineke bêhempa bû.

Xwedê Mûsa, Dawud, Silêman û nêzîkî sih kesên din hilbijart kû Nivîsên Peymana Kevin binivîsin. Û Peyva xwe, bi wehd, pêxemberî û nîşanên mucîzewî re rast derxist.

Di Peymana Nû de, kok, jiyan, peyv, kar, mirin û vejîna Mesîh ji hêla çar kesan ve hatiye tomarkirin: Matta, Markos, Lûka û Yûhanna. Van çar mirovan bi nivîsîna Mizgîniyê (di erebî de wekî *Incîl* tê binavkirin) ji cîhanê re çar şahidiyên cuda anîn. Xwedê, di heman demê de armancên niha û dûmayîkê yên kû ji bo gelê xwe fikiriye, ji bo kû bi awayekî bêhempa rave bikin, ji Petrûs, Yaqûb û Yahûda (zirbirayên Îsa) û Pavlûs (zanyarekî û terorîstekî kevin) re îlham da. Yûhannayê Qasid pirtûka dawî ya Pirtûka Pîroz nivîsî kû dê dîroka cîhanê wekî grafîkî—wekî kû em dizanin—çawa bi dawî be, dide zanîn.

## ŞAHİDİYA HEVGİRTÎ

Xwedê ji bo kû ravekirinên Wî tomar bike, ji panzdeh sedsalan zêdetir nêzî çil zilaman bi kar anî. Digel kû piraniya van şahidan tu car hev û du nas nekirine, tiştên dinivîsin kû şêwe bidin çîrok û peyama dawînî li hev dikin.

Kê dikarîbû şahidiyeke wisa hevgirtî bikira, ji xeynî Yekî kû kurtbûna qewlê jiyanekê nikare asteng bike?

> *"Lewre tu peyva pêxemberiyê ji daxwaza mirov derneket holê.* ***Mirovên kû ji hêla Ruhê Pîroz hatin birêvebirin, peyvên Xwedê ragihandin.****"* (Petrûsê 2., 1:21)

Gelek mirov bi sedsalan êrişî Peymana Nû kirin, bi taybetî jî

li nivîsên Pavlûsî êrîş hatin kirin..

Qasid Petrûs ji me re şîretan dike kû em girîngiyê bidin nivîsên Pavlûs:

> *"Di heman demê de Pavlûs jî bi zanebûna kû Xwedê dabûyê ji we re nivîsî ... Di nameyên wî de ji bo famkirinê cihên dijwar hene kû, kesên nezan û bêbiyar wekî **Nivîsên Pîrozên din**, van jî berevajî dikin û hilweşîna xwe amade dikin."* (Petrûsê 2., 3:15-16)

Her tiştê kû Qasid Pavlûs nivîsî, bi nivîsên pêxemberan re li hev tê. Wekî kû Pavlûs bixwe jî şahidiyê kir, *"Lê heya îro Xwedê alîkarî min kir. Ji ber vê ez li vir disekinim, ji her kesî re—mezin, biçûk—şahidiyê dikim. **Tiştên kû ez dibêjim, ji bûyerên kû pêxember û Mûsa berê agahî dabûn ne cudatir in … tu ji peyvên pêxemberan bawer dikî?**"* (Karên Şandiyan 26:22,27)

## HEVGİRTÎ AN HEVNEGİRTÎ?

Ewlebûna şahidekî, ne bi pîvanga rastî kû şahidiya wî kesî dihewîne, bi hevnegirtiyeke kû di şahidiya wî de tune ye tê kontrolkirin. Em bi çîrokeke biçûk mînak bidin vê mijarê:

> Çar xortên xwendekarê lîseyê, li rojeke tavîn li ber xirandina kû neçin dibistanê, nesekinîn. Roja din gava çûn dibistanê, dema hewce bû kû vebêjin ka çima roja berê neçûn dibistanê, derew kirin kû lastîka ereba wan teqiyaye. Mamoste, bi bişirîneke kû dilê her çar xwendekaran rihet kir, got: "Min duh ezmûneke nivîskî çêkiribû, hûn negihiştinê." Lê piştre berdewam kir: "Rûnin cihê xwe, pênûs û kaxez derxin. Pirsa yekemîn: Lastîka kû teqiyabû kîjan bû?"[85]

Bersivên hevnegirtî, çîroka wan a lihevnehatî diyar kir. Berevajî şahidiya van çar xortan kû li hev nagire, şahidiya

Xwedê hevgirtî ye. Afirînerê me bi domahiya nifşên bêmijar, bi bikaranîna bidozîneyan nivîskar û şahid, Xwe û plana xwe bi hevgirtiyeke bêqusûr rave kiriye.

Xwedê di okyanûsa pêldar a okyanûsa felsefe û dînên dijber ên mirovan de, ji bo kû em canê xwe rihet bikin li ser wê okyanûsê zinareke kû naheje çêkiriye û ew parastiye.

Ev zinar, gotina WÎ ye.

> *"**Gotinên pêxemberan** ji bo me bû **mîsogeriyeke** mezintir, kû hûn guh bidinevan peyvan kû dişibin çiraya kû di tariyê de ronî dide, hûn ê baş bikin ... Lê**di nav gel de pêxemberên sexte** hebûn, çawa kû dê di nav we de jî kesên kûagahiyên çewt belav bikin, hebe ... dê gelek kes jî tevlî kêfdarî wan bibin, ji wan dê bihekimin ji rêya rastî re. **Ji ber peyvên xwe yên derew ên kû ji ber çavbirçîbûna xwe dikin, dê we bimêjin**."*
>
> (Petrûsê 2., 1:19-2:1-3)

## PÊXEMBERÊN SEXTE

Wekî tê dîtin, Peyva Xwedê li hemberî çavbirçiyan *"kesên kû dê bi peyvên çewt we bimêjin"*, pêxember û mamosteyên kû ji bo menfeata xwe tevdigerin, hişyarî dide.[86] Pirtûka Pîroz der heqê kesên kû bi navê Xwedê dipeyivin, lê esas *"giyaneke kû derewan dike"*, gelek çîrok dihewîne di hundirê xwe de. (Qralên 1., 22:22)

Nivîsên Pîroz ji dewra Îlyas ê kû di dîroka Îsraîlê de, li hemberî 850 pêxemberên sexte, pêxemberê rast bû, qal dikin. Gava 7000 Îsraîlî dilsoz in li hemberî Xwedayê rast, kesên din ên kû bi milyonan in, bawerbûna ji şahidên sexte yên kû ji wan re xizmetê kiribûn, çêtir dîtin.[87]

> *"Reb dibêje kû, '**Ya pêxemberên kû gelê min ji rê derxistin,** hûn ji kesên kûwe têr dikin re silametî dixwazin, lê êrişî kesên kû we têr nakin, dikin.'"* (Mîka 3:5)

Rêya kû dîrokê şopand ev e; Îsa ji ber vê, ev hişyarî kir:

> *"Deriyê kû dibe hilweşînê* ***fireh*** *e û rê* ***berfireh*** *e. Kesên kû ji vî dêrî derbasdibin* ***gelek*** *in. Lê deriyê kû dibe jiyanê teng e, rê jî dijwar e. Kesên kû vê riyê dibînin kêm in.* ***Ji pêxemberên sexte dûr bikevin!*** *Ew xwe bi* ***postên berxikan dipêçin*** *û xwe nêzîkê we dikin, lê esas* ***gurên dirende*** *ne. Hûn ê wan ji fêkiyên wan nas bikin. Ji giyayên derzok tirî, ji strîmişkan hejîr tê berhevkirin? Mîna vê, her dara baş fêkiyê baş dide û her dara xirab fêkiyêxirab dide. Dara baş fêkiyê xirab nade û dara xirab jî nikare* ***fêkiyê baş bide****."* (Matta 7:13-17)

Pêxemberên sexte û mamosteyên bêhejmar, bi sedsalan hebûna xwe domdar kirin. Hinek ji wan bi sedan û hezaran kesan xistin bin bandora xwe, hinek ji wan jî bi mîlyonan heta bi milyaran kesan xistin wê riyê kû ew birin *"hilweşînê"*.

Ger hûn dixwazin ji wan "*pirjimarên"* ***kû pêxemberê sexte di*** *"riya hilweşînê"* de korkorane dişopînin birevin, naxwe hînkirina wî kesî ji mevsika vê pîvanê derbas bikin:

> *Peyama pêxemberekî rast, her tim bi Nivîsên pêxemberî yên beriya wî, yên kû hatine pejirandin re li hev tê.*

**Li rewşa van sê kesên** jêrê yên kû dibêjin em pêxemberên Xwedê ne, binêrin. Ev kes pêxemberên rast an sexte ne?

## LÊKOLÎNA I: "MESÎHEKÎ" VEŞARTÎ

Dîrok der heqê gelek kesên kû piştî dema Mesîhî jiyane û xwe wekî pêxember û Mesîh angaşt dikin, agahî dide.[88] Yek ji van kesan Ebû Îsa ye.

Ebû Îsa nêzî dawiya sedsala 7. li Împaratoriya Pers jiya. Kesên kû ew dişopandin jê bawer kirin kû ew Mesîh e, lewre wî got kû dê wan kesan bigihijîne serfiraziyê û tevî kû xwendin û nivîsîn nizanîbû, li gorî rîwayetê pirtûk nivîsîn. Lê peyama vî zilamî bi Nivîsên Pîroz re li hev nedihatin.

Ebû Îsa ji wan re hîn kir kû bila rojê heft caran dua bikin û ji wan re parastineke xwedayî wehd kir û bang li wan kir kû bi hev re biçin şer. Tevî her tiştî, Ebû Îsa li şer mir û piştî veşartina wî nekarî vegere jiyanê, kesên kû jê bawer dikirin neçar man kû îtîraf bikin kû ew ne Mesîh bû.

Demeke dirêj beriya Ebû, Îsa kesên kû guhdarî wî dikirin hişyar kir:

> *"Dê Mesîhên sexte, pêxemberên sexte derkevin; dê ev elamet û mucîzeyên mezin çêkin. Wisa kû ji destê wan bê dê kesên hilbijartî jî ji rê derxin.* ***Va ye ji berê de ji we re dibêjim.****"* (Matta 24:24-25)

## LÊKOLÎNA II: "PÊXEMBEREKÎ" XWEKÛJİYÊ

*Jim Jones,* terîqeteke bi navê *Perestgeha Gel*ava kir. Di serê 1970an de Jim li Kalîforniya San Franciscoyê waîzekî nîşandana miletê bû. Bi hunera xwe ya kû gelek kesê ji bo alîkariya polîtîka û feqîran tevger dikir, dihat nasîn. Jim xwe wekî "Pêxember" da nasîn û wisa îdia kir kû xwedî hêzek e kû dikare nexweşên pençeşêrê baş bike û dikare miriyan vejîne.

Di dawiyê de Jim Jones kesên kû jê bawer dikirin qeneh kir kû bi wî re biçin Başûrê Amerîkayê û "Jonestown" ê kû li Guyanayê ye. "Pêxember Jim" ji piştevanên xwe wehd kir kû dê li vê civata nû jiyaneke biaram û kêfxweş dom bikin. Lê ev pêyv dereweke mezin bûn.

Jim gurekî dirende bû kû xwe bi postê berxikan pêçabû. *San Francisco Chronicle* ev nûçe belav kir: "18 Berfanbar 1978: Jones ji qewteyê xwe re ferman kir kû bila bi siyanûrê xwe bikûjin û bi vî awayî bila xelat bidine xwe. Ji kesên kû siyanûrê red kirin re, bi zorî jehr hat dayîn. Zarok bi derziyan hatin kûştin. Di dawiyê de, li Jonestownê 914 cendek hat dîtin kû yê Jones jî tê de bû."[89]

## LÊKOLÎN III: "PİRTÛKEKE PÎROZ" YA KÛ HATİYE PEJİRANDİN

*Joseph Smith* di 1805an de li Bakûrê Amerîkayê hate dinyayê. Smith ê kû di nav xizaniyê de û bi baweriya tewş mezin bûye, gava bû xortekî, ji mirovan re got kû pêxemberê Xwedê ye. Îdia kir kû Xwedê jê re bi riya milyaketekî roniyê bi navê Moroni hin bînahiyan daye û pê re axiviye.

Joseph ev nivîsîn: "Ez bi hêzeke hatim zebtkirin kû yekcar ez têk birim. Bandora vê hêza li ser min ew qas mezin û bandorker bû kû min nedikarî biaxivim. Derdora min tarî bû û ji bo demekê ez fikirîm kû rastî laneta hilweşîneke nişkav hatim." Smith piştre qal dike ka çawa li ser serê wî "stûneke roniyê xuya kir û ev roniya kû wekî rojê dibiriqî çawa hêdî hêdî hat li ser wî sekinî".[90] Joseph da zanîn kû Xwedê ji bo wî pirtûkeke pîroz a nû rave kir —*Pirtûka Mormonê.* Ji alîgirên xwe re got kû ev Pirtûka Pîroz ji Xwedê hatiye, lê ev pirtûk ravekirina Xwedê ya dawî ye. Joseph ji mirovan re jiberkirina duayê, rojîgirtinê, sedeqedayînê, başbûnê û qebûlkirina wî ya wekî pêxemberekî hîn kir. Di vê navberê de wî jî berjewendiyên xwe derxist pêş û jiyaneke bişehwet jiya û wî ev jiyan meşrû kir.


Tevî kû raveyên Joseph Smith ji hêla şahidên din nehat pejirandin (digel kû wî îdia dikir kû sê şahidên wî hene) û rastiya pirtûka wî kû bi Pirtîka Pîroz, dîrok û arkeolojî re li hev nayê,[91] îro bi mîlyonan kes girêdayî dînê *Mormonizm**ê ne. Dêrê Mormonê Dewlemend mîsyonerên xwe dişîne her derê dinyayê û her roj bi sedan kes dibin*** *Mormon*(wekî *Latter-day Saints* jî tên binavkirin). Piraniya Mormonan kesên jidil û dirust in, lê kû hûn peyama "Pêxember Joseph" bi peyama kû pêxemberên Pirtûka Pîroz dabûn zanîn û nivîsîbûn re bidin berhev, hûn ê bibînin kû du peyamên yekcar ji hev cuda ne.

Ne tevgereke zanakî ye—tevî kû ev peyam birêkûpêk girêdayî hev jî be an jî peyameke jîrekane jî be—kû em qedera xwe ya bêdawî ji bo peyamên nakokî û nepejirandî ên pêxamberên kû xwe dane sehkirin, bavêjin xetereyê. *"Lewre Şeytan wî dike wekî milyaketê roniyê."* (Korintiyên 2., 11:14)

## PEYAMEKE PEJİRANDÎ

Di dinyayekî kû hişê wî tevlihev de, gelek kes kû *“der heqê Xwedê de li şûna rastiyê, derew xistine”*(Romayî 1:25), Xwedayekî rast, rastiya xwe ji van gelek dengan kû li hemberî vê rastiyê disekinin, bi awayekî net cuda kiriye.

Rêya kû Xwedê Peyama xwe pejirandiye, ev e: raveyeke domdar kû bi domahiya gelek nifşan ji gelek pêxemberan re, bi hevgirtineke nuwaze dikin. Nivîskarê kû tenê bêyî demê heye, dibe kû ji ravekirineke wisa îlham girtibû.



*Çilmirovên* vê mînakê nûçevanên kû peyamên hilbijartî û hevgirtî yên Xweda kû bi domdariya panzdeh sedsalan ve di Nivîsên Pîroz de tomar kirine, temsîl dikin.



*Yek mirov* nûçevanekî kû bi peyameke piştre lihevnehatiye û nehatiye pejirandin derhetiye holê, temsîl dike.

Di çend beşên berê de em rastî gelek delîlan hatibûn kû dida nîşan Pirtûka Pîroz Peyva Xwedê ye. Ev û delîlên din çi qas qanîker bibin jî, tomarkirina Peyama Xwedê kû beriya her tiştî divê bê çêkirin, bi bihîstin, famkirin û qebûlkirina pêyamê re pêk tê.

Rêzên bûyerên pirtûka Xwedê kû bi hûrguliyan tên agahdarkirin, tiştê kû bi awayekî bêdawî ji hêza xeyala me wê de ye, rave dike. Dide nîşan kû xwezaya Afirînerê me xwedî dengeyekî bişeml û nuwaze ye. Mirovan ji tirsa mirinê difilitîne

û hêvîya yeqîn a jiyana bêdawî dide wan. Karakter û helwesta mirovan diguherîne. Aliyê wan dide Xwedayê yek û rast.

Ne Şeytan ne jî mirov nedikarî peyameke wiha pêşkêş bikira.

Lê hûn ji min bawer nekin.

*“**Her tiştê biceribînin**, tiştê baş bi hişkî bigirin.”*
(Selanîkiyên 1., 5:21)



# 7

# Bingeh

*“Mirovekî biaqil…*
*mala xwe li ser **zinêr** ava dike.”*
(Matta 7:24)

Îsayê Nasirayî, Weaza xwe ya li ser Çiyê bi van gotinan bi dawî anî:

> *“Va kesên kû van peyvên min dibihîzin û dipeyikînin, **dişibin mirovê biaqil ê kû mala xwe li ser zinêr ava dike**. Baran dibare, lehî radibe, ba dibe, êrîşî malê dike, lê **mal hilnaweşe**. Lewre li ser zinêr hatiye avakirin. Kesên kû van peyvên min dibihîzin lê napeyikînin, dişibin **wî kesî xêtik kû mala xwe li ser qûmê ava dike**. Baran dibare, lehî radibe, malê dilerizîne. Mal hildiweşe; hilweşîna wê jî ecêb dibe.”* (Matta 7:24-27)

Cudahiya di navbera van her du malan kû yek li hemberî bahozê li ser piyan ma û ya din hilweşiya çi bû?

Bingeh.

Mirovê biaqil mala xwe li ser zinêr ava kir; mirovê xêtik jî mala xwe li ser qûma kû cihê xwe diguherîne, ava kir.

Xwedê di Nivîsên Pîroz de, ji bo kû her kes Peyama wî ya dixwaze bibêje fam bike, bingeheke qewîm ya wekî zinêr ava kir.

Ev bingeh, *Tewrat e.* (di heman demê de *Zagona Mûsa wekî pênc pirtûkên pêşîn ên Peymana Kevin* ***tê zanîn).***

## PİRTÛKA DESTPÊKAN

Tewrata Mûsa pênc pirtûkên pêşîn ên Nivîsên Pîroz dihewîne. Navê pirtûka destpêkê **Afirîn** (Genesis) e. Wateya wê *'destpêk'* e. Afirîn *PirtûkaDestpêk*a Xwedê ye kû binyata rûzemîn, jiyan, mirov, zewac, malbat, civak, netewe û zimanan dide zanîn. Afirîn ji sirên herî mezin ên jiyanê re dibe bersiv. Xwedê çawa ye? Mirov ji kû hat? Em çima li vir in? Çavkaniya xirabiyê çi ye? Mirov çima tengasiyê dikişîne? Xwedayekî nuwaze çawa dikare mirovên biqusûr qebûl bike?

Di Nivîsên Pîroz de ji van re û ji pirsên din ên girîng re piştre bersivên zelaltir bê dayîn jî, Afirîner bingeha Bersivên kû dabû di pirtûka Afirînê de avêtiye. Destpêkê pirtûka Pirtûka Pîroz, bingeha hemû pirtûkên paşiniyê ye.

## ÇÎROKA XWEDÊ

Di Pirtûka Pîroz de bi sedan çîrok hene kû di hezar salê de pêk hatine. Ev çîrok, ji van çirokên kû nav hev de heya niha hatine qalkirin ***çîroka*** baştirînpêk tînin. Xwedê *peyameke bingehtenê* xistiye nav vê çîrokê –ev peyam, nûçeya herî baş a heya niha hatiye dayîn, dihewîne di hundirê xwe de.

Di çîroka dramatîk a Xwedê de, gelek nuqteyên hişk hene. Gava em di rêwîtiya xwe ya Nivîsên Pîroz de dimeşin, em ê di tomarên *Mizgînî*de rastî tapikeke (zîrwe) bilind bên. Tapikeke din a balkêş kû dê di pirtûka dawî ya Pirtûka Pîroz de kû bi navê "Rakirina Perdeyan" tê zanîn û tê wateya *Wehî* de derkeve pêşiya me.

Digel rastiya Xwedê kû plana xwe rave kiriye, ev plan dê pirî caran ji bo mirovan bibe sir.

## MİJARÊN PÊŞDETİR DI SERÎ DE NE

Pirtûka Afirînerê 50 beşa 1.,189 beşa Pirtûka Pîroz dihewîne.[92] Kû we di carekê de tevahiya Pirtûka Pîroz ji serî heya binî bixwenda, ji bo qedandinê diviyabû we sê roj û sê şev bixwenda.

Di rêwîtiya me ya kû berdewam dike de, em ê bi neçarî ji cem gelek çîrokên kû di Pirtûka Pîroz de ne, derbas bibin; em difikirin kû çîroka mifte ya gelek klasîkên kû "wêneya mezin" a plana metelhişt a kû Xwedê sêwirandiye, rave dike ziyaret bikin. Wextekî me yê mezin kû me ji bo rêwîtiyê veqetandiye, dê di çar beşên pêşîn a Pirtûka Pîroz de derbas bibe, lewre ev rûpelên destpêkê rastiyên mezin ên kû ji xeynî Peyva Xwedê, li tu derê nayê dîtin, rave dike.

Girîngiya çend beşên pêşîn ên Pirtûka Pîroz, tu car têra xwe nayê diyarkirin.

Gava em ji zarokekê/î re çîrokek vedibêjin an jî dixwînin, em ji kû dest pê dikin? Em ji nîvê çîrokê dest pê dikin û piştre yek-du rêz dixwînin û piştre derbasî dawiya çîrokê dibin? Na, em ji serî de dest bi çîrokê dikin. Lê em dibînin kû piraniya xwendevanan destpêka Nivîsên Pîroz ên kû em qal dikin naxwînin. Gelo çîroka Xwedê ji bo kû rûpelên serî tên îhmalkirin e kû ji bo wan wekî sirekê dimîne? Rewşeke metelhişt e kû gelek kes di posteya xwe ya elektronîk de, bi hevoka Ehmed *"ev mijara der heqê gunehkaran de ji bo min tu tişt vegotin nake"* kû nivîsiye re di heman fikrê de ne? (Beşa 1)

Ger kû der heqê destpêka çîroka Xwedê de qet fikrekê me tune be, nirxandina dawiya çîrokê dê zor be ji bo me. Lê carek, kû em çend beşên pêşîn fam bikin, dê wateya beşa dawî mezin bibe.[93]

## AXA TOVEKÎ

Em tovekî genimê wekî mînak bigirin. Dibe kû tovê genimê girîng xuya neke, lê di nav vî tovê kû hêsan xuya dike de koda kompleks û hêza kû nayê xuyakirin hewce ye kû nebateke gihayî ya bi tov re hatiye dorpêçkirin,hilberînin. Di Nivîsên Pîroz de, pêvajo wiha tê sêwirandin:

> *"Ax bixwe zad dide… **destpêkê zîl dide, piştre** serî dide, di **dawiye** de jî libên kû seriyê wî dadigirin dide."*
> (Markos 4:28)

Xwedê tov, fêkî û sebzeyan wisa nesêwirand kû zû bi zû bigihin, bi heman awayî çîrok û peyama xwe jî wisa plan nekir kû ji nişka ve rave bike. Xwedê çawa kû ji bedenên mirov re xwarinên kû bi rêya nebatên kû di demê de mezin dibin, peyda dike, xwarina kû ji bo canê mirov jî hewce ye mîna vê, bi rêya *rastiya kû di demê de tê ravekirin* pejirandiye.

> *"Hemû gotinên wî ferman **li ser** fermanê, ferman li ser fermanê, distûr **li ser** distûrê, distûr **li ser** distûrê, hinek ji vir, hinek ji wir."* (Yeşaya 28:10)

Pirtûka Afirînê, wekî axeke berdar e kû Xwedê "*tovên*" xwe yên rast biîhtimam diçîne. Peyama Wî bi van rastiyan tov dide û di pirtûkên din ên Nivîsên Pîroz de, bi raberkirina jiyan û tezetiyê digihîje.

## EMBRİYOYEK

Bi saya teknolojiya modern, tiştên kû wextekî veşartîbûn, niha tên dîtin. Mînak, îro em dikarin embrîyoyeke mirovekî bi awayekî zelal temaşe bikin. Fewqalade! Bizrê zarokê kû di malzaroka dayîkê de ber digire, di nav heşt hefteyan de bi qasî mezînayî zirfistiqê dibe bebek; ev bebek bi çav, guh, poz, dev, mil, dest, ling û piyên xwe tam e. Şûna tiliya wî/wê jî heye. Tevî kû bi temamî şekla xwe negîrtiye, xwedî hemû parçeyên bedena xwe ye.

Bi heman awayî, em jî îro dizanin kû hemû rastiya elzem a Afirînerê me ya der heqê plana Xwe û mirovahiyê de kû rave kiriye, di pirtûka Afirînê de wekî embriyonîk cih digire. Lê belê dîsa jî bipêşveçûna *"Pêşnûma Xwedê ya nepenî"* (Wehî 10:7) di tevahiya Nivîsên Pîroz de pêk tê.

Heya îro kesayetî û armancên Xwedê ji bo gelek kesan wekî

sir maye, lê ne hewce ye kû wisa be, lewre *“sira (nepenî) kû ji dem û nifşên berê hatiye veşartin ... **niha hatiye diyarkirin.**”* (Koloseyî 1:26)

Xwedê dixwaze kû em sira WÎ fam bikin. Lê divê em jî *bixwazin* Wî fam bikin.

## PARÇEYÊN BİÇÛK

Pirtûka Pîroz hinek dişibe mamika (tiştonek) kû perçeyên wê yên texte bi bireka qewar hatiye birîn.

Hin perçe diyar in wê çawa bên cem hev, lê kesê kû mamikê çêdike ji ber hin perçeyên kû ne diyar in ka dê çawa bên cem hev, dibe kû zehmetiyê bikişînin. Ji bo temamkirina mamikê divê mirov sebir bike û li ber xwe de. Bi heman awayî, çûyîna tevliheviya mêjî û pêkhatina plana Xwedê ya lihevhatî, tenê dikare bi wext veqetandina ji bo kû li ser Peyva Xwedê bifikire, pêk tê.

Di demên dawiyê de, ez xwedî wê îmtiyazê bûm kû, min bi nûçevanekî kû li Lûbnanê dijî û hedefa wî bilind e re têkiliya xwe danî. Tevî kû me hê hev û du nedîtiye, em bûn heval. Di postaya xwe ya elektronîk de kû cara yekem şand ev nivîsî bû:

> Posteya Elektronîk
>
> Ez der heqê rastiya dawînî de bawer dikim kû ne mimkin e mirov bigihîje encama delîlekî yeqîn.

Min hevalê xwe yê Lûbnanî teşwîq kir kû bila hemû pêşdaraziyên xwe bihêle li hêlekê û bila Pirtûka Pîroz ji bo xwe bixwîne. Min jê re got, bila bihêle kû Pirtûka Pîroz li ser navê xwe biaxive. Wekî kû di peyama elektronîk a jêrê jî xuya dibe, hevalê min dest bi xwendina Pirtûka Pîroz kir:

> Posteya Elektronîk
>
> Min Peymana Nû bi erebî xwend û niyeta min ew e kû ez dest bi Peymana Kevin bikim. **Min berê ji Pirtûka Pîroz tenê perçeyên biçûk xwendibûn**. Niha min bersivên pirsên xwe di van rûpelan de dîtin… Min bi vê xwendinê çi bi dest

xist? Ez ji bo peyama Pirtûka Pîroz rêzeke kûrtir digirim. Ez vê pêyamê wekî kû dikare jiyana kesekî biguherîne, dibînim. Ev peyam dikare di her mirovî de guherînek çêke. Bi rastî peywirên kû ji qaydeyên hişk tên, nikarin mirovan biguherînin. Belkî jî ji bo kû em jê bawer bin kû di destê me de ye, min ferq kir kû ji bo vê divê rêyeke me hebe.

Çend roj berê gava ji min re nivîsî, nêrînên xwe şandin:

Posteya Elektronîk

Min gavek avêt kû diviyabû min beriya demeke dirêj biavêta. Min fam kir kû ne bes e mirov bibêje "Min Pirtûka Pîroz xwend"; **ew pirtûkeke wisa ye kû divê mirov her tim bixwîne.** Pir ecêb e kû gelek pirsên min di bin siya vê pirtûkê de wenda bû.

Peyama Xwedê ji bo vê kesê derdikeve holê.

Rêwîtiya kû em ê di Nivîsên Pîroz de bikin, dê parçeyên herî girîng ên mamika mezin a dîrokê bîne cem hev û dê çîrok û peyama Xwedê ya metelhişt zelal bibe û bê famkirin.

Kû em Nivîsên Pîroz *"hertim"* bixwînin ji bo xwe, em ê bibînin ka *"perçeyên"* din tebayî kû tên.

## NAMEYÊN HÊZDARİYÊ

Çîroka leşkerekî kû evîndarê xanimekê ye tê qalkirin. Leşker ji bo xanimê hezkirineke kûr dihewîne, lê ne diyar e ka xanim çi hîs dikir. Gava wext hat, leşker hate şandin li welatekî dûr. Tevî kû bersiv nedistend, leşker bidilsozî berdewamî nivîsîna nameyên xwe kir.

Di dawiyê de ew roja kû leşker vegeriya hat. Gava gihişt, karê wî yê destpêkê ziyareta wê kesê kû jê hez dikir bû. Gava çû mala xanimê, ew li malê dît. Xanima ciwan wisa dida nîşan kû ji bo dîtina leşkerî kêfxweş e, lê qutiya tozgirtiya kû li quncikê odê bû, hestên rastî yên dilê wê dida nîşan.

Qutî bi nameyên nevekirî yên kû wî leşkerî şandibû re dagirtîbû.

## Jİ EZMÊN HEYA RÛZEMÎNÊ

Nivîsên Pîroz dişibin wan nameyên Xwedê kû ji we re nivîsîbûn. Afirîner û Xwedayê ezman û rûzemînê, di Nivîsên xwe de, Xwe bi we dide naskirin, Hezkirina xwe vegotin dike, û ji we re rave dike ka hûn ê çawa, li mala Wî bi Wî re bi îhtişam û kêfxweşî bijîn.

Em li jêrê parçeyek ji "nameya" Xwedê kû 2700 sal berê şandibû, pêşkêşî we dikin:

*"Ya ew kesên kû tî bûne, werin avê;*
*Yên kû perê wan tune ye, werin, bistînin, bixwin…*
*Werin bistînin bêbedêl, şîr û şerabê.*
*Hûn çima didin perê xwe, ji yê kû nanê wî tune*
***Çima didin ji yê kû keda we têr nake re?***
*Baş gundarî min bikin kû, ya baş bixwin.*
***Û kû li kêfa zêdeyiyê binêrin!***
*"guhbidine min, werin.*
*Guh bidin kû hûn bijîn.*
*Ez jî bi we re peymaneke bêdawî çêkim…*
*"Lewre, çawa kû ezman bilind e ji erd,*
*Riyên min jî ji riyên we,*
*Ramanên min jî ji ramanên we bilindtir e."*

(Yeşaya 55:1-3,9)

*Hezkirin,*
***Afirînerê we***

We nameyên kû Xwedê ji we re nivîsî, vekirin? We ew xwendin? We bersiva wan da?

Bila rêwîtî dest pê bike.



# BEŞ II RÊWÎTÎ


## VEDÎTINA TIŞTA KÛ NAYÊ ZANÎN


8 - Xweda Yekî Çawa ye?
9 - Tu Kes Naşibe Wî
10 - Aferîdeyekî Taybet
11 - Destpêka A Xerab
12 - Zagona Guneh Û Mirinê
13 - Dilovanî Û Edalet
14 - Lanet
15 - Aciziya Duhêl
16 - Ezbeta Jinekê
17 - Dibe Kû Ev Kes Kî Be?
18 - Pêşnûmaya Bêdawî Ya Xweda
19 - Zagona Qurbanê
20 - Qurbaneke Girîng
21 - Xwîna Kû Bêtir Dirije
22 - Berx
23 - Pêkhatina Nivîsên Pîroz
24 - Hemû Hat Dayîn
25 - Mirin Têkçû
26 - Dîndarî Û Dûrmayîna Ji Xwedê



# 8

# Xweda Yekî Çawa ye?



**R**êwîtiya destpêka pirtûka Xwedê, bi bangewaziya herî mezin a hemû deman dest pê dike:

> ***"Di serî de Xweda erd û ezman afirand."*** (Afirîn 1:1)

Ji bo îspatkirina hebûna Xweda, tu pêngav nayê avêtin. Hebûna Xwedê rastiyeke diyar e û li holê ye.

Ger hûn li sîlekaneke xalî bimeşin, hûn rastî şopa cotek pê ya nû bên, hûn ê bixwe hîs bikin kû hûn ne tenê ne. Ev şopa cotek pê, bixwe xwe neafirandin. Hûn dizanin kû ba û av çênekir. Yekî bûye sedem kû ev şopên piyan çêbûne.

Hûn dizanin kû wiha ye.

Lê gelek kes dibêjin, *nizanin* kû Yekî bûye sedem ji qûma kû şopa piyan re û ji hebûna wî mirovî kû ji van şopên piyan re bûye sedem, re. Mirov di mijara ravekirina aferîdeyê ya bêyî Afirîner de, gelek teoriyên hûrgulî derxistine; hinek ji wan rêzên sedeman kû bi milyaran sal paş de diçe, xeyal dikin. Lê gava carek digihîjin wê xala kû jê re dibêjin "destpêk", nêzî xala kû ji mijara orîjînal re bibe bersiv, nabin: *Tişta kû ji aferîdeyê re dibe sedem çi ye?*

*Nivîsên Pîroz wiha dibêje:* “Der heqê Xweda de tiştên kû têne zanîn çi hebe, li ber çavên te ne; Xweda hemû daniye li ber çavên te. Wesfên Xweda yên kû nayên dîtin –hêza Wî ya bêdawî û Xwedatiya Wî– ji dema kû dinya hatiye afirandin û pê de ***bi kirinên Wî tê famkirin, bi awayekî aşkere tê dîtin***. *Ji ber vê qusûrên wan tune ne.”* (Romayî 1:18-20)

Mantiq hêsan e: ji bo sêwirek divê sêwirînerek hebe.

Heman tişt çawa ji bo tiştên wekî şopên piyan, erebe û kompîtur kû ji hêla mirovan ve hatine çêkirin derbasdar e, bi heman awayî ji bo pê, hucre û mekanîzmayên wekî koma stêrkan derbasdar e. Bila bi çavên tazî an jî bi mîkroskop, teleskopê bê raçavkirin, ji bo tevliheviya gerdûnê kû nikare bibe halê kû tê xwestin û pergala wê ya kû famkirina wê zehmet e, divê Afirîner û Peydekerek hebe.

Çawa kû ji bo şopa piyekê divê yekî hebe kû wê çêke, gerdûnek jî bi heman awayî Afirînerê Gerdûnê divê.

> *“Ezman îhtişama Xwedê diyar dike, saca ezmanî berhema destên wî diyar dike.”* (Mezmûr 19:1)

Naxwe, ew kesê kû vê Gerdûnê-Afirandiye kî ye? Em ê çawa bizanibin ka kesekî çawa ye? Em dikarin *bizanin,* lewre Wî, Xwe daye *zanîn*.[94]

## BÊDAWÎ

Me berê vê posteya elektronîk a kû yekî bi awayekî tinazker pirs kiribû, xwend: “Kî Xweda afirand? Min ji bîr kiriye.” Em bersivê bidin: *Tu kes.* Xweda bêdawî ye. *“Di serî de **XWEDA***ji me re hîn dike kû, Afirînerê me naşibe tu tiştî û tu kesî.

> *“Hê çiya çênebûne, hê gerdûn û cîhanê neafirandiye, **ji ezelîtiyê heya bêdawîtiyê Xweda tu yî.**”* (Mezmûr 90:2)

Paşeroj, niha û pêşeroj li ber Xweda wekî tu tiştekî ye. *Reb-*

*Xwedaya kû dikare her tiştî bike, yê kû* ***Hebû**, **heye** û dê **hebe**!”* (Wehî 4:8)

Ew bêdawî ye, bi demê re ne bisînor e û eqlê mirov nagihîje Wî.

Ne mimkin e heyînekî kû hatiye afirandin der heqê Xweda de her tiştî bizanibe û dê tu car nezanibe. Ew, *“Bilind e, bihişmet e û li **bêdawîtiyê dijî**.”* (Yeşaya 57:15)

Xweda tu car naguhere. *“Lê tu her tim eynî yî, dê salên te neqedin..”* (Mezmûr 102:27)

## MEZİNTİR

Xweda ji hemû tiştên kû em xeyal dikin mezintir e. Ji ber kû hebûna Wî diyar e, çawa kû yê bêdawî ji bo îspatkirina Hebûna xwe tiştek nake, bi heman awayî ji bo diyarkirina Hebûna xwe jî tiştek nake, lewre hişê me yê bisînor ji xeynî zeman, cih û madeyê nikare tiştek fam bike.

Dema ez zarokekî biçûk bûm, tê bîra min kû min li ezman dinêrî û min digot kû ez têra xwe derkevim jor û rêwîtiya dûr bikim, ez ê di dawiyê de bikarim bigîhîjim arîkan û ez ê bigihîjim dawiya gerdûnê. Xetaya min a di vê xeyalê de ew bû kû min bala xwe nedidayê kû li hemberî wan arîkên kû min xeyal dikirin valahiyeke bêdawî heye!

Hin tişt tenê bi bawerbûna gotinên Afirîner tê famkirin.

Îmana ji Peyva Xwedê ya hevgirtî û çespandî, mifteya gihîştina asta herî bilind a zanatiyê ye.

> *“Bêyî îmanê ne mimkin e kû em Xwedê razî bikin, lewre kesê kû nêzî Wî dibe divê ji hebûna Wî re û ji baweriya xelatdayîna ji kesê kû li wî digerin re, îman bikin…* ***em bi saya îmanê fam dikin*** *kû gerdûn bi fermana Xweda hatiye afirandin, bi vî awayî tiştên kû xuya dibin bi yên nexuyayî pêk tên.”* (Îbranî 11:6,3)

Zanista modern *“tiştên kû xuya dibin bi yên nexuyayî pêk tên”* dipejirîne. Fizîkzan ji me re dibêjin kû, made ji atomên nexuyayî

pêk tên, atom ji elektronê pêk tên, ev elektron li dora dendikekê kû ji proton û notronan çêbûye, zûka dizivire, ev proton û notron ji yek ji sê cure zereyên kû hinekî bi elektrîkê re barkiriye û wekî bingeha madeyê tê hesibandin, pêk tê, yek ji van sê zereyan çawa çêdibe…? Mirovahî gelek tişt kifş kiriye, lê dîsa jî em kêm tişt dizanin! Mirovên zana, sînorên hişê mirov dibînin.

Tişta kû dê zanist tu car nekare îspat bike an jî bikare îspat neke *"gerdûn bi fermana Xwedê hatiye afirandin"* e. Em vê rastiyê tenê dikarin bi seheka şeşemîn, ango îmana kû Xwedê daye me dikarin *bizanin*.

Em mijar û pirsên herî girîng ên jiyanê *"bi saya îmanê **famdikin**"*. Sedema vê diyar e:

*"Xweda ji mirov **mezintir** e."* (Eyûb 33:12)

Em lê binêrin ka Ev ê bihişmet der heqê xwe de wekî din çi gotiye?

## BÊSÎNOR

Ew, Ew Kes e kû Hêza Wî Têra Her Tiştî Dike. *"Ya REBê Serwer! Te bi hêza xwe ya mezin, bi qudreta xwe erd û ezman afirand. Tişta kû tu nekarî bikî tune ye."* (Yeremya 32:17) Afirîner li ser aferîdeyên xwe ye. Ew li ser her tiştê kû em difikirin e û jê wêdetir e.

Ew, Ew kes e kû her tiştê dizane. *"Tu rabûn rûniştina min dizanî, tu nêta min ji dûr ve fam dikî..."* (Mezmûr 139:2) Afirîner her tiştî dizane—paşerojê, îro û dahatûyê. Zanabûna Wî bi demê re zêde nabe. *"Xweşbîniya Wî **bêsînor** e."* (Mezmûr 147:5)

Hebûna Wî li her derê ye. *"Ez dikarim biçim kû ji Ruhê te, dikarim birevim kû ji hizûra te?"* (Mezmûr 139:7) Yê bêsînor, gava bi we re ye, di heman demê de dikare bi me re jî be. Gava li bihuştê bi milyaketan re diaxive, dikare li rûzemînê bi mirovan re jî biaxive.

Ew bêsînor e.

## RUH

Em der heqê yê kû bêsînor e agahiyeke din a girîng bidin:

*"Xweda **Ruh** e.."* (Yuhanna 4:24)

Xwedê Ruhekî bêsînor û kesanî ye kû li her derê ye, lê xuya nake. Tevî kû pêdiviya Wî bi bedenê tune ye, dikare Xwe çawa bixwaze wisa bide nîşan, têra xwe heye û azad e. Nivîsên Pîroz, demên cuda yên kû Xweda ji mêr û jinan re bi şeklên kû dikare bi çav bê dîtin, xwe nîşan dide, dinivîse—*"çawa kû yekî bi hevalekî/e xwe re rû bi rû diaxive"* (Ji Misirê Derketin 33:11)

Xwedayê kû Ruhê raser e , dixwaze kû heyînên giyanî yên kû Wî afirandin, bila li gorî armanca afirîna xwe Wî nas bikin, bila jê bawer bikin û bila Wî biperêsin.

*"Bav li wan kesên kû wî wisa diperêsin, digere. Xweda Ruh e,Yên kû Wî diperêsin jî, bila di ruh û rastiyê de biperêsin."* (Yuhanna 4:23-24)

## BAVÊ RUHAN

Yek ji nasnavên Xwedê *"Bavê ruhan"* e. (Îbranî 12:9)

Xweda beriya kû rûzemînê afirand,[95] ji bo kû bi Wî re li mala Wî ya ezmanî bijîn, bi milyonan, *heyînên ruhî* yên nuwaze yên kû wekî *milyaket* tên bi navkirin, afirand. *Milyaket* tê wateya *"nûçevan"* an jî *"xizmetkar"*. Xwedayê kû armanca wî ew e kû xwedî qraltiyek bibe da kû bila nîştevaneke dilovan bijî li wir û bi wan re bikaribe bêdawîtiyê parve bike. Û Xwedê ew afirandin kû Wî nas bikin, Wî biperêsin, jê re îtaet û xizmetê bikin û heya bêdawîtiyê bila jê kêfê bigirin.

*"Min li der û dora text, aferîde û ixtiyaran bi **hejmaran** milyaket dîtin… hejmara wan bi hezaran hezar, bi deh hezaran deh hezar bû…"* (Wehî 5:11)

Ji bo kû ji nû ve neyên hilberandin, Xwedê di serî de bi qasî dilê xwe milyaket afirandin. Tevî kû bi Afirînerê xwe re heya pîvanekê dişibîna hev, ev milyaket bi tu awayî bi Xwedayê xwe re ne wekhev bûn. Xwedê asteke bilind a jîrahiyê da wan. Û di heman demê de hest, vîn û zerengî da kû bi Wî re bikaribin têkevin têkiliyê. Milyaket jî mîna Afirînerê xwe, ji xeynî kû ji bo peywirekê dîtina wan ne hewce be, ji hêla mirovan ve nayên dîtin.[96]

Xweda li qraltiya xwe ya kû heyînên ruhî yên hatine afirandin li wê ne, nehatiye afirandin, ew Ruhekî bêsînor e kû, hêza Wî têra her tiştî dike û her tiştî dizane.

## RASERÊ HER TİŞTÊ YE

> *"Ruh yek. Reb yek.* ***Raserêher*** *tikştê, Xwedayê her kesî û Bavê Wî yek e."* (Efesî 4:4-6)

Tevî kû raserê her tiştê ye, bi zeman û cih re ne bisînor e, li gerdûnê cihekî Wî yê diyar heye kû avahî ava kiriye û bi rê ve dibe. *"REB textê xwe li ezmanan ava kiriye, serdestiya Wî her derê dipêçe."* (Mezmûr 103:19) Qral Silêman, gava der heqê mezinahî û nezikahiya Xwedê difikirî, ji Afirînerê xwe re bi van gotinan dua kir:

> *"Bi rastî jî Xwedê li rûzemînê dijî? Tu nikarî li ezmanan, li* ***ezmanên ezmanan*** *jî bi cih bibî."* (Qralên 1., 8:27)

Pirtûka Pîroz ji sê *ezmanên* cuda behs dike. Du hebê van ji hêla mirovan dikare bê dîtin; yek ji wan nayê dîtin.

*Ezmana atmosferîk*—ezmana şîn a li ser serê me.

*Ezmana kû aîdê dûrîngên navbera stêrakan e*—valahiya tarî ya kû Xwedê gerestêrk û stêrkan bi cih kiriye li wir.

Û ezmanên ezmanan—cihê gelek biriqî ya kû Xwedê avahî ava kiriye li wir. Ev mala asîmanî ya Xwedê û ev cihê kû milyaket li wê ne, di heman demê de wekî *ezmanên herî bilind, ezmana sêyemîn, mala Bav, avahiya Wî, Bihuşt* û tenê bi awayekî hêsan

wekî *Ezman* jî tê binavkirin.[97]

> *"Reb ji* ***ezmanan*** *dinêre, hemû mirovan dibîne. Ji cihê kû* ***rûdine****, çavdêriya her kesî kû li rûzemînê dijîn dike. Yê kû dilê her kesî afirand, hemû tiştên kû afirand dipîve, Ew e."*
> (Mezmûr 33:13-15)

## XWEDA YEK E

Ayeta destpêkê a Pirtûka Pîroz, dipejirîne kû tenê yek Xweda heye: *"Di serî de* ***Xweda****."*

Hem Nivîsên Peymana Kevin û hem yên Nû, vê pêşkêş dikin: *"Xwedayê me Reb,* ***yekReb*** *e."* (Dubareya Zagonê 6:4) ***"Xweda yek e."*** (Romayî 3:30)

Xweda YEK e.

Hemberê (raqîp) Xwedê tune ye. Wekhevê Xwedê tune ye.

Ev mijar bi têgihên teolojîk wekî *monoteîzm* tê binavkirin: tenê ji Xwedayekî bawerkirin. Monoteîzm, bi *polîteîzm* (ji gelek xweda û xwedawendan bawerkirin) û *panteîzm* re dijberê hev e. Polîteîst û panteîst cudahiya navbera Afirîner û aferîndeyên Wî de şêlo dikin. Û wekî encameke vê, înkar dikin kû Xweda ne kesayetiyekî xwedî taybetiyên karakterî ye.

## YEKBÛYÎ

Vegotina ayeta *"Di destpêkê de* ***Xweda****"*, rastiyeke pêşîn e, lê *nerastiyekexwerûye*.

Yê bêsînor, ne hêsan e. Xwedê hevedûdanî ye. Yekbûna Xwedê, yekîtiyeke pir bizereng e. Di rêzimana wî de şeklên navî yên yekjimar (yek), cot (tenê du heb), û pirjimar (sê an jî zêdetir) hene. *Elohim* li gorî rêzimanê pirjimar e, lê xwedî yek wateyê ye.

Xwedayê rast a yek, ji hêla zerengiyên (kapasîte) xwe, yekbûyî û bêsînor e. Sê ayetên destpêkê ên Nivîsên Pîroz dibêjin:

> *"****Xwedê*** *di serî de (navê pirjimar) asîman û erdê* ***afirand*** *(kişandina lêkera yekjimar). Erd vala bû, şeklên rûzemînê*

*tunebûn; bi tarîtiyên mezin re girtîbûn.* ***RuhêXweda*** *li ser avê pêl dida. Piştre* ***XWEDA, FERMANA*** *'bila ronî çêbibin' da û ronî çêbû."* (Afirîn 1:1-3)

Bi vî awayî, gotina destpêka Pirtûka Xwedê, rê me dide ka karê afirînê çawa çêkiriye. Xwedê çalakiya xwe ya afirînê bi rêya *Ruh* û *Peyva* Xwe qedand.

Destpêkê Ruhê Xwedê yê Bixwe, ji bo kû fermanên Wî bîne cih, ji asîman hate şandin. Wekî kevokekê kû li ser hêlîna xwe melûl dibe, *"**RuhêXweda**"* li ser dinyaya kû nû çêdibû *"**pêldida**"*. Di Îbrankî de peyva kû ji bo *"Ruh"*ê tê bikaranîn, *"ruah"* e; *ruh* tê wateya *hilm* an jî *enerjiyê.* Ev *"Ruhê Xwedê"* hebûna Wî ya kû enerjî dide.

*"Dema **ruhê** (ruah) wan dişînin, çêdibin."*(Mezmûr 104:30)

Piştre *Xweda axivî.* Beşa destpêkê a pirtûka Afirînê deh caran qala heman vegotiniyê dike: *"Xweda **ferman** da…"* gava Xweda axivî, tişta kû ferman da pêk hat.

*"Ezman **biPeyvaReb** re û cîsmên ezmanê bi **hilma** (ruah) kû ji devê Wî derket re hat afirandin."* (Mezmûr 33:6)

Xwedê dinyayê, bi rêya Peyv û Ruhê xwe afirand.

## YÊ KÛ TÊKİLİYÊ ÇÊDİKE

Rastiya kû Xweda her tiştê bi *axaftinê* afirand, der heqê Xweda de me hînê tiştek din jî dike.

Xweda têkiliyê çêdike.

Beriya kû afirîn pêk hat, têkilî hebû.

*"Di serî de **Peyv** hebû. **Peyv** bi Xwedê re bû û **Peyv** Xwedê bû. **Di serî de Ew bi Xwedê re bû.**"*(Yuhanna 1:1-2)

Ev *"Peyv"*, ji peyva *logos*a Yewnanî tê, wateya wê; *vegotina*

*ramanê ye.*[98] Di Nivîsên Pîroz de *Logos* yek ji nasnavên Xwedê ye. *Peyv,* bi Xwedê re yek e.

Her tişt bi rêya *Peyv*ê hat afirandin.

Xweda, tenê bi *fikirînê* dikarîbû dinyayê biafiranda û her tişt dikarîbû ji nişka ve çêbûya û bimeşa. Lê Xweda wiha nekir. Wî, ramanên xwe *vegotin kirin.* Xweda *axivî.*

*Peyv,* bi axaftinê, dinyayê di pergaleke şeş rojan de ava kir.

*Pêdiviya* Yê kû Hêza Wî Têra Her Tiştê Dike bi şeş rojan hebû kû peywirê pêk bîne?

Na, yê kû bi zeman re ne bisînor e, pêdiviya wî bi mîqdara zeman re tune ye. Lê dîsa jî, Xwedê bi afirîna dinyaya me ye bi vî awayî, tenê hefteyeke heftrojî çênekir,[99] di heman demê de ji me re wê têgihiştinê da kû em kesayetî û kesayetiya Wî nas bikin. Ev dana Wî girîng e, lewre bawerî bi Xwedayekî kû nayê naskirin, nayê, îteat nayê kirin û nayê perestin.

Niha em li çîroka afirînê kû Afirîner bixwe rave dike, binêrin, em guh bidinê û em ji Wî hîn bibin.

## ROJA 1.: RONÎ Û ZEMAN – XWEDA PÎROZ E

> *“Xwedê ferman kir got “bila ronî çêbe” û ronî çêbû. Xwedê dît kû ronî baş e, ew ji tarîtiyê veqetand. Ji ronî re got “Roj” û ji tarîtiyê re jî got “Şev”. Bû êvar, bû sibe û roja yekemîn çêbû.”* (Afirîn 1:3-5)

Li roja yekemîn Xwedê ronî anî li ser dîka afirînê. Bi vî awayî zeman jî çêbû, dinya dest bi dewra xwe ya bîst û çar saetan kir: seate astronomîk a kû şev û rojê saz dike. Lê Xweda, heya roja çaran roj (tav), heyv û stêrkan neafirand.

Li demekê, zanist nîqaşê dikirin kû li gorî zanistê, bêyî *rojê* (tav) ne mimkin e kû *ronî* çêbe. Lê belê êdî ev nîqaş bi dawî bûye. Îro zanistên kû baweriya wan bi tomarên der heqê afirînê de nayê jî, dibêjin rûzemîn beriya rojê û bi awayekî serbixwe hebû.[100]

Afirîner beriya kû *ronî-hilgiran*(ragir) (roja 4.) afirand, *roniyê* afirand (roja 1.) kû bide nîşan kû Ew Çavkaniya neafirandî

ya fîzîkî û ruhî ya roniyê bû. Kû ew nebûya dê tenê tarîtî hebûya.

Gava em di Nivîsên Pîroz de berdewamê rêwîtiya xwe dikin, em ê her tim rastî Çavkaniya Roniyê bên û ev rasthatin dê bigîhije asta herî bilind kû em li Bihuşta kû dê Xwedê ji gelê xwe re *" pêdiviya dê wan bi roniya çirayê û bi ya tavê nebe, lewre dê Reb Xweda ji wan re roniyê bide,* binêrin, em ê bibînin. (Wehî 22:5)

Ronî, ji bo zihnên kû herî bai difikirin, dê wekî tiştê nayê zanîn bimîne. Fîzîkzan hinek dizanin ka ronî çi *dike*, lê pir kêm fam dikin ka ronî çi ye. Ji bo zanistê ronî mutlaq û bêdawî ye. Di saniyekê de bi leza 300.000 kîlometre (186.000 mîl) re diçe. Gava fîzîkvanê navdar Albert Einstein $E=mc^2$ (enerjî beramberê kûtle caran leza kareya roniyê ye) dît, dema nukleera atoma ecêb û sawder dest pê kir. Derdora kû ronî lê ye, bandorê lê nake. Dikare li ser qutiya çopa kû bêhna wê ne xweş e, bibiriqe, lê ronî bixwe tevî derdora xwe paqij dimîne. Ronî bi tarîtî re nabe. Raserê tarîtiyê ye.

Xwedayê kû Çavkaniya Roniyê ye, *mutlaqa dawînî û bêdawî ye*. Hebûneke kû ji bo kû di hizûra Wî de bijî nehatiye tewizandin, îhtişama Wî ecêb û muthîş dibîne.

Xweda xwerû û pîroz e.

Wateya peyva *Pîroz*ê, *hatiye veqetandin* an jî cuda ye. Xweda, yê Cuda ye. Wekî Wî tune ye. Milyaketên kû derdora textê Wî yê cinetê girtine, wiha diqîrin: *"REB, pîroz, pîroz, pîroz e!"* (Yeşaya 6:3). Pîrozî, taybetiya tenê ya Xwedê ye kû di Nivîsan de ji bo kirpandinê li dû hev, sê caran tê dubarekirin. Ew Pîroz e, *"bi roniya kû nêzîkbûna wê ne mimkin e, rûdine."* (Timoteosê 1., 6:16)

Xweda bi yê xerab re, li cem hev nabe. Ew roniyê ji tarîtiyê vediqetîne. Tenê hebûnên xwerû û rast dikarin bi Wî re rûnin.

> *"**Xweda ronî ye.** Di Wî de tu tarîtî tune ye. Kû em bibêjin hempariya me heye bi Wî re û em di tarîtiyê de bimeşin, em ê derewan bikin, em ê bi rastiyê re li hev neyên."*
> (Yuhannayê 1., 1:5-6)

Roja destpêkê a Afirînê daxuyanî dide kû Xweda *pîroz e.*

## ROJA 2.: HEWA Û AV – XWEDA EW E KÛ HÊZA WÎ TÊRA HER TIŞTÊ DIKE

*"Xweda ferman da kû 'Bila di nav avan de qubeyek hebe, bila avan ji hev veqetîne'. Û wisa çêbû. Xweda qubeya (saca) ezmanî afirand. Bû êvar, bû sibe û roja duyemîn pêk hat."* (Afirîn 1:6-8)

Roja duyemîn a afirînê li ser du unsûrên kû hemû organîzmayên zindî girêdayîne, disekine: hewa û av.

Peyva *qubeya* (*saca*) *ezmanî* ya Îbrankî, qada fireh a bikembera mezin a li ser serê me ye kû li wir atmosfer û ewr hatine bicihkirin û stêrk têne dîtin, nîşan dide. Li ser oksîjen û nîtrojenê, buxara avê û karbondîoksîtê, ozon û wekî yên din li ser pêkhênana gazê ya atmosferê kû bi awayekî nuwaze hatiye terazkirin, bifikirin. Çawa kû hûn vê têkelê biguherînin, em ê bimirin. Xweda dizanîbû ka çi dikir.

Giraniya bi trîlyonan buxara avê ya kû li ser me, di atmosferê de aliqî maye, bînin bîra xwe. Kîjan zanatî û hêz dikarîbû tenê bi axaftinê, ev pêkhênana hewa û avê ya bêqusûr biafiranda û biparêza?

*"**Dema Wî got, her tişt pek hat;** dema Wî ferman da her tişt diyar bû."* (Mezmûr 33:9)

Wekî hemû rojên din ên afirandinê, roja duyemîn jî rê me dide kû **hêza Afirînerê me têra her tiştê dike.**

## ROJA 3.: AX Û NEBAT – XWEDA BAŞ E

*"Xweda ferman da kû 'Bila avên di bin ezmanê de li cihekî kom bibin, bila axa zuwa xuya bibe' û wisa çêbû… û Xweda dît kû ev baş bû. Xweda ferman da kû 'Bila rûzemîn nebat, giyayên kû tov didin, li gorî cisnê xwe bila darên fêkî yên kû tovên wan jî di fêkiyên wan de ne, hilberîne'… û Xweda dît kû ev baş bû."* (Afirîn 1:9-12)

Xweda li roja sêyemîn axê ji avê veqetand û ferman da kû bila hemû nebat çêbin. *"Û Xweda dît kû ev baş bû."* Wî li gerestêrka me ava kû çi qas têrê dikir, bi cih kir. Ji wê rojê û heya îro hewce nekir kû dîsa li ser wê av bê zêdekirin.[101]

Xweda her nebat û darê ji bo kû tov bide û li gorî cisnê xwe zebze an jî fêkî bide, çêkir. Xweda van hemû xwarinan ji bo çi çêkir? Wî ev xwarin çêkirin, lewre *"ji bo kû li ser bê jiyîn, şekl da dinyayê."* (Yeşaya 45:18) Rûzemîn di nav pergala rojê de bêhempa ye. Rûzemîn gerestêrka tenê ye kû ji bo kû piştgîriyê bide jiyanê û wê dewlemend bike, hatiye sêwirandin.

Mînak, hin mehsûlên sûdewer ên kû em ji nebatan bi dest dixin, bifikirin: oksîjena kû ji bo jiyanê pêwîst e, zebzeyên xwedîker, fêkiyên tehmxweş, siyên daran kû di germahiyê de me diparêze, daristanên sûdewer, dermanên pêwîst, kûlîlkên rengîn û bêhnxweş, dîmenên xweşik û gelek tiştên din.

Kû em bên mijara xwarinê, Xwedê ji bo xwarina me dibe kû tenê çend tişt afirandibû – wekî mûz, fasûlî, û birincê. Me dikarîbû bi van xwarinan jiyana xwe berdewam bikira. Lê Xweda wisa nekir. Zanist dibêjin kû li rûzemînê du milyon nebat hene kû ji bo xwarin û êmê ajalan tên bikaranîn.

Di beşa 1ê ya pirtûka Afirînê de, Xweda heft caran dibêje kû aferîndeyên Wî "*baş* e". Di Nivîsên Pîroz de jimara heftê bêqusûriyê sembolîze dike. Her tişta kû Xweda çêkir, bi awayekî nuwaze baş bû.

Lewre Xweda bi awayekî nuwaze baş e.

> *"Xweda ... ji bo kû em jê zewqê bistînin, her tiştê zêde zêde* ***dide*** *me."* (Timoteosê 1., 6:17)

Roja sêyemîn, hînê me dike kû Xweda **baş** e.

## ROJA 4.: RONİYÊN KÛ YÊN EZMANÊ NE – XWEDA DİLSOZ E

> *"Xweda wiha ferman da: 'Bila li qubeya ezmanê roniyên kû rojê ji şevê vediqetîne, û ronahiyê dide rûzemînê, hebe. Bila xuyanî, demsal, roj û salan nîşan bide.' Û wisa çêbû. Xweda stêrk û du roniyên mezin kû ya mezin ji rojê re û ya biçûk ji şevê re serweriyê dike, afirandin."*
> (Afirîn 1:14-16)

Roja çaremîn ji me re Xwedayê pergalekê nîşan dide. Ew Xweda ye kû *"ji bo kû biroj ronî be rojê (tav) çêkir, ji bo kû bişev ronî be heyvê çêkir, û stêrkan xist pergalekê"* (Yeremya 31:35). Bişevan pergala stêrkan ji wan kesên kû li erd û behrê de rêwîtî dikin re, dibe nexşeyeke ewledar. Birojan jî tav wê roniyê dide kû baweriya ji roj û salan re çêdibe.

Wekî roj û stêrkan, heyva rûzemînê jî her tim şahidî dike kû baweriya mirov dikare ji Afirînerê wê re bê. Xweda heyvê wekî *"li ezmanan şahidekî ewledar"* (Mezmûr 89:37) bi nav dike. Heyva gerestêrk ji her aliyê rûzemînê, her tim li rûzemînê dinêre, tu car pişta xwe nadê wê aliyê.[102] Bi rêkûpêkiya saetekê, mezin dibe û biçûk dibe. Heyv dilsoz e, lewre yê kû ew afirand dilsoz e.

Ji ber kû Xweda dilsoz e tiştek e kû *nekare* çêke heye. Li dijî xwezaya xwe tevnagere û ne mimkin e kû guh nede zagonên xwe. *"Em dilsoz nebin jî dê ew dilsoz be, lewre li dijî xwe tevnagere… ne mimkin e kû Xweda derewan bike."* (Timoteosê 2., 2:13; Îbranî 6:18). Gelek kes wisa difikirin kû, ji ber kû Xweda pir mezin e dikare li dijî Kesayetiya xwe tevbigere an jî dikare ji peyva xwe vegere. Lê Xweda "mezinahiyê" wiha nasêwire.

Di kesayetiya Xweda de çarpînetî (bêhawatî) tune ye. *Dilsozî* heye. Wekî pergala sabît a gerestêrk û komstêrkên me, Afirîner û Peydakerê me Pêbawer e.

Hûn dikarin baweriya xwe Pê bînin.

> *"Hemû nîmet, hemû diyariyên nuwaze, ji jor, ji wî* ***BavêRoniyan*** *tê kû di Wî de siya* ***guherîn*** *û çarpînetî tune ye."* (Yaqûb 1:17)

Roja çaremîn a Afirînê ji **dilsoziya** Xweda re şahidiyê dike.

## ROJA 5.: MASÎ Û ÇÛK

Xweda li roja pêncemîn bi zanatî û hêza xwe ya bêsînor, ji bo kû li behrê û ezmanê bijîn, hemû cisnên hebûnê afirand û wan arastek kir ji bo kû li derdora kû aîdê wan e, bijîn – ji masiyên kû di nav avê de ne kerik û perik da û ji çûkan re jî hestiyên sivik û pûrt da.

> *"Xweda ferman da kû 'Bila av bi aferîndeyên zindî re tijî be, bila li ser dinyayê, li ezmanan çûk bifirin'. Xweda cinawirên mezin ên deryayê, zîruhên kû di nav avê de li hev dikin û zîruhên cuda cuda* (li gorî cisnê xwe) *yên kû difirin, afirandin. Dît kû ev baş e.'"* (Afirîn 1:20-21)

Bala xwe bidin gotina nivîskî ya hevoka *"Bila av bi zîruhan re li hev bike". Lihevhatin* tê wateya *"pir tijî, heya serî dagirtî"*. Mîktobiyolojîst ji me re dibêjin kû dibe kû di dilopekî ava birkê de bi milyonan mîkroorganîzmayên zindî hebe û piraniya van dibe kû bi qasî heywanên mezin tevlihev bin! Xureka balînaya şîn kû di pergala nuwaze ya okyanûsê de, ji aferîndeyên herî mezin e, plankton e — nebat û ajalokên biçûk kû di deryayê de avjeniyê dikin.

Okyanûs koleksiyoneke mezin a Xwedê ye kû mucîzeyên Wî yên zindî tê de ne.

Heman tişt ji bo çûkên cur be cur ên kû li ezmanê difirin, û mirovê metelhiştî dihêlin jî derbasdar e.

Di heman demê de, bala xwe bidin peyva *"cur be cur"* jî. Ev peyv, di beşa destpêkê a pirtûka Pîroz de, bi diyarkirina pergela hemû cisnê organîzmaya zindî, deh car tê dubarekirin.

Nivîskarê Jiyanê, ferman da kû divê her nebat û aferîde *"li gorî cisnê xwe"* zêde bibe. Teoriya peresendî ya mirovê, li dijî vê zagona xwezayî ya nayê guherîn e. Digel kû di hemû zindiyên kû dijîn de veguherîn, guherîn û lêanîn çêbe jî, tu hebê wan ji xeynî sînorên kû Xweda danîbûn nikarin "werar bibin". Tomarên der heqê fosîlan de ji vê re şahidiyê dikin.

Çavkanî û Peydakerê vê enerjiya bêhempa ya kû wekî *jiyan* tê binavkirin, tenê Xweda ye. Kû ew nebe, tişta kû heye mirin e.

> *"Her tişt bi Wî re çêbû, tu tiştên kû hene bê Wî çênebûn.*
> ***Jiyan di Wî de bû**."* (Yuhanna 1:3,4)

Aferîdeyên zindî yên bihejmaran kû di roja pêncemîn de hatin afirandin, ji me re hîn kirin kû Xweda **jiyan** e.

## ROJA 6. : AJAL Û MİROV – XWEDA HEZKİRİN E

Afirîner di destpêka roja şeşemîn de, bi deh hezaran heywanên guhandar, xuşînok û kêzikên bandorker afirandin:

> *"Xweda cur be cur (li gorî cisnê xwe) ajalên hov, kedî û guhandar afirandin. Dît kû ev baş e."* (Afirîn 1:25)

Xweda hinek ji wan biçûk, hinek ji wan mezin afirand û ji her yekê re ji bo kû bijîn û tevkariya dinyaya xwezayî bikin, zanista sehekî da wan; dê her yekê wan nifşa xwe berdewam bikirana û dê bi têjikên xwe re eleqedar bûna.

Gava Xweda qraltiya hewyanan afirand her tişt *"baş bû"*. Di holê de tu xirabî tune bû an jî hê tu xwîn nehatibû rijandin. Wisa hatibû sêwirandin kû heywan tenê bi xwarina zebze û fêkiyan, dê jiyana xwe berdewam bikirana.

Xweda digot, *"Ez ji hemû heywanên hov, çûkên kû li ezmanê difirin, xuşînok—ji hemû heywanên kû nefes distînin—re wekî xwarin gîyayên şîn didim."* (Afirîn 1:30) Zincîra xwarinê kû aferîde-aferîdeyê dixwe, hê çênebibû. Dijmintî û tirs nedihat

zanîn. Di her tişta kû hatibû afirandin de şewqa başbûna Xweda hebû. Şêrekî xwe bi berxikekê dida û diçû, kêfa pisîkek dihat gava li cem çûkekê bû. Di cîhanê de xweşiyeke bêqusûr hebû.

Gava Xweda afirandina ajalan qedand, dor hate afirandina seresera Wî: *jin û mêr.* Plana Xweda ew bû kû bila mirov di qraltiya hezkirinê ya biîhtişam, kêfxweş û bêdawî de, bila wekî rajêriya kû Jê re hatiye nezirkirin, bijîn.

Hezkirin, ji bo Afirînerê me ji çalakiyek wêdetir e. Hezkirin ew *Bixwe* ye.

> *"Xweda* ***hezkirin*** *e."* (Yuhannayê 1., 4:8)

Çalakiyên afirînê yên Xweda kû li roja şeşemîn dikirin, wisa didin xuyakirin kû Ew **hezkirin** e.

## "EM BİAFİRÎNİN"

Ji ber kû Xweda hezkirin e, ji mirovên kû armanc û wergirên hezkirina Wi ne, dinyayeke xweşik ava kir. Û bi avayî li roja şeşemîn:

> *"Xweda got: 'Em mirovê di xuyanga xwe de, mîna xwe biafirînin.'"* (Afirîn 1:26)

Ka bisekinin! Bisekinin! Ev çi ye? Xweda bi rastî jî got *"Em mirovê di* ***xuyangaxwe*** *de biafirînin"*?

Ji ber kû Xweda YEK e, naxwe peyvên "EM" û "YÊ ME" kî nîşan dide?

Xweda bi kê re diaxivî?



# 9

# Tu Kes Naşibe Wî

***“Xwedayê we Reb**... Xwedayê mezin, xurt, biheybet e.”*
Mûsa Pêxember (Dubareya Zagonê 10:17)

**HIŞYARÎ:** Ev asta din a rêwîtiyê, dê rêwiyan ji cihê wan ê rihet derxe. Dê hiş bi vekêşandinê dirêj bibin û dê dil bêne kontrolkirin. Lê digel her tiştê, kesên kû vê beşa rêwîtiyê bi awayekî serkeftî biqedînin, dê li hemberî meydankirinên din ên kû dê bên beriya wan xwedî arastekek mezin bin.

## XWEDA, XWEDA YE

Piraniya me baweriya ‘Xweda ji têgihiştina me ya xwezayî pir mezintir e’, hevpar dike.

Niha ev jidiliya baweriya me dike bê kontrolkirin.

Li roja şeşemîn a afirînê, Xweda piştî kû afirîna qraltiya heywanan qedand, wiha got: *“Em mirovê bi xuyanga xwe, mîna xwe biafirînin.”* (Afirîn 1:26)

Em ê li beşa din, li ser hin riyên kû der heqê mêr û jina destpêkê de kû ji bo xweza û şibandina Xweda bidin hisandin hatine afirandin, kûr bifikirin. Lê em ê beriya vê li ser pirseke din a kû divê bê bersivîn, bisekinin.

Xweda Yek e, naxwe çima got *“**Em** biafirînin”*? Çima negot

*"Ez ê mirovê di xuyanga**xwe** de, mîna **xwe** biafirînim"*? Çima Xweda carinan der heqê xwe de bi peyvên wekî *Ji Me Re, Yê Me û Em* diaxive?[103]

Hin kes dibêjin peyvên *Yê Me* û *Em* ên kû Xweda bi kar tîne, wekî qralekî kû gava qala xwe dike dibêje "em", nasnaveke mirêsî kû xwediyê ye, vegotin dike. Rast e kû Xweda der heqê hêz û îhtişamê de xwedî heybeteke kû nayê hevberkirin e, lê rêzimanê Îbrankî, der heqê ravekirina "cînavka kesê pirjimar" kû "nasnava mezinahiyê" diyar dike de, bingeheke qewî pêşkêşî me nake.

Yên din jî, gava Xweda dibêje *"Em mirovê mîna xwe biafirînin",* digel kû di metnê de ji milyaketan behs nake û însan mîna milyaketan nehatiye afirandin, wisa bawer dikin kû Xweda xîtabê milyaketan dike.

Dema Nivîsên Pîroz ji rêzê bê xwendin û rêziman bê lêkolînkirin, em ê bi awayekî zelal bibînin kû Xwe bi pirjimarî lê dîsa jî bi uslûbeke yekjimarî diyar dike.

PIRJIMAR: *"Xweda got **em mirovê mîna xwe biafirînin**."*

YEKJIMAR: *"Bi vî awayî Xweda mirovê **di xuyanga xwe de** afirand."* (Afirîn 1:26-27)

Ravekirina Xwedê ya der heqê Xwe de hem pirjimarî hem jî yekjimarî, bi nasnameya niha û ya her demê re li hev tê.

Ravekirina Xwedê ya der heqê Xwe de hem pirjimarî hem jî yekjimarî, bi nasnameya Wî ya niha û ya her demê re li hev tê.

Tevlihevî û nuwazebûna yekbûna Xweda, rastiyeke ji diyarkirina serobero û serkî ya gelek kesan a der heqê peyva "yek"ê wêdetir e. Yê Bêsînor, dê nekeve qaliba têgihîna mirov.

Xweda, xweda ye.

*"Ji berê heya bêdawiyê, **Xweda Tu yî.**"* (Mezmûr 90:2)

## TEKÎTİYA XWEDÊ YA TEVLİHEV

Pirtûka Xweda bi van peyvan dest pê dike:

*"Di serî de **Xweda** (Elohim — navê nêr ê pirjimar)… afirand*

*(kêşandina lêkera yekjimar)... **Ruhê Xwedê** li ser avê pêl dida. Piştre **Xweda fermanda*** kû 'bila ronî çêbe' û ronî çêbû."[104]

XWEDA, her tiştê bi Peyv û Ruhê xwe afirand.

> *"Ezman bi peyva **Reb** û cismên asîmanî bi hilma kû ji devê Wî derket, hatin afirandin."* (Mezmûr 33:6)

## PEYVA XWEDÊ

Nivîsên Pîroz, ji her kesê kû dixwazin der heqê Afirînerê yekbûyî de xwedî agahiyê bibin re, agahiyeke fireh dide. Mînak: Mizgîniya Yuhanna bi van peyvan dest pê dike:

> *"Destpêkê **Peyv** da.*
> *Peyv **bi Xwedê re bû,***
> *Û Peyv **Xwedê** bû.*
> ***Ew,** bi Xwedê re bû,*
> *Her tişt bi navbeynkariya**Wî** çêbû..."* (Yuhanna 1:1-3)

Wekî kû me li beşa berê jî lêkolîn kir, *"Peyv" gotina derveyî ya ramanên hundirîn ên Xwedê ye.* Çawa kû hûn bi fikr û peyvên xwe re yek kes in, Xweda jî bi heman awayî bi Peyva Xwe re Yek e. "Peyv", hem wekî *"Bi Xwedê re" (Ji Wî cuda)* hem jî wekî *"Xweda"* (Bi Wî re) tê daxuyankirin.

Di heman demê de, dê baş be kû em li cînavkên kesane yên *"Ew"* û *"Bi Wî re" binêrin,* gava ji *"Peyvê"* re îşaret dikin.

## RUHÊ WÎ

REB çawa Peyva Xwedê cuda û bi awayekî kesane bi nav dike, *Ruhê Xwe* jî bi heman awayî cuda û kesane bi nav dike.

> *"Dema **Ruhê** Xwe dişînî çêdibin, Û **Tu** jiyan didî cîhanê."* (Mezmûr 104:30)

> *"Ezman **bi hilma Wî vedibin**."* (Mezmûr 26:13)

*"Ez dikarim biçim kû ji* ***RuhêTe****? Dikarim* ***birevimkû*** *ji huzûra Te?"* (Mezmûr 139:7)

*"****RuhêPîroz*** *...* ***Ew*** *ê her tiştê hînê we bike."* (Yuhanna 14:26)

**RuhêPîroz** (yê kû fermanên *Peyvê* pêk tîne) jî wekî Peyvê (çawa kû bi alîkariya Peyvê afirîn pêk hat) bi Xwedê re bi awayekî nuwaze Yek e.

## XWEDA MEZİN E

Pirsgirêka piraniya tekperestan (monoteîst) di mijara qebûlkirina parçeyeke hilbijartî ya yek ji duayên Qral Dawud kû hatine tomarkirin de, tune ye: ***"Tu Mezin î, Ya Rebê Serwer. Yekê mîna te tune ye, ji xeynî te Xweda jî tune ye!*** *Me ev bi guhêxwe bihîst."* (Samuelê 2., 7:22)

Lê gelek kesên kû di pejirandina rastiya "Xweda Mezin e! Xweda Xweda ye, mîna Wî tune ye!" de pir zû kirine, di mijara redkirina ravekirina Xwedê ya der heqê xwezaya Wî ya pirjimar lê dîsa jî yekjimar de, bi heman awayî pir zû tevdigerin.

Li gorî "Mîna Wî tune ye", Yê kû Hêza Wî Têra Her Tiştê Dike, kû rave bike bêje, Ew ji têgihiştina xeyala me ya xwezayî mezintir û tevlihevtir e, divê em matmayî bimînin? Xweda israr dike kû em der heqê Wî de bi ramanên rast bifikirin.

*"Te ez wekî xwe hesibandim; ez pê te de dikim!"* (Mezmûr 50:21)

## XWEDA YEK E

Yahudiyên Ortodoks duayekî kû di Îbrankî de wekî Şema tê zanîn, birêkûpêk dubare dikin; ev peyv vê vegotinê diyar dike. *"Adonay Eloheynu, adonay ehad,"* wateya wê wiha ye: *"Xwedayê me Reb e, Reb Yek e."* Ev dua ji Tewratê hatiye girtin: *"guhdarî bike (Şema) ya Îsraîl! Xwedayê me REB (YHVH) yek (ehad) Reb e!"* (Dubareya Şerîetê 6:4)

Peyva kû yekbûna Xweda diyar dike *“ehad”* e. Ev peyv pi gelemperî mîna *gûşiyekî* tiriyê, ji bo *yekîtiyeke piralî* diyar bike, tê bikaranîn. Li beşên din ên Nivîsên Pîroz, *ehad* wekî *“yekîtiyek”*e kû fermandar û leşkerên xwe îşaret dike, tê wergerandin.[105] Li beşa din gava mêrê destpêkê bi jina xwe re dibe *ehad,* ango gava tê diyarkirin kû bûne *“**yek** beden”* (Afirîn 2:24) dê dîsa derkeve holê. Dema em li ayetên din ên kû ev heman peyva Îbrankî hatiye bikaranîn dinêrin, xuya dibe kû ev peyva kû ji bo yekbûna Xwedê hatiye diyarkirin, heyînên ji yekê zêdetir jî dihewîne.

Di Peymana Kevin de gelek ayet hene kû yekîtiya Xwedê ya pirjimar tuwanc dike û dipejirîne.[106] Em der heqê vê mijarê de mînakek bidin:

> *“Ji serî de. **Ez** li wir im. **RebêSerwer** niha **Min** û **Ruhê** xwe dişîne.”* (Yeşaya 48:16)

*“**RebêSerwer**” kî ye?*

*“**Ruhê**” Wî kî ye?*

*“**Min**”* ê kû ji hêla *“**Ez**”* û *“Reb Xweda û Ruhê Wî”* hatiye şandin, kî ye?

Ev pirs kû li ser rêya me ya Nivîsên Pîroz bêne fikirîn, dê bi awayekî zelal bêne bersivandin.

## SÊ-YEKÎTİYA KÛ ME PEJİRANDİYE

Peyva “yekîtî” yê kû bi Îngîlîzî bi kar tînin, ji peyva *unus*ê Latînî tê, wateya wê “yek” e. Gelek kes digel kû têgîna der heqê Xwedê ya sê-yekîtiyek bêdawî ye red dikin, tenê hin kes dikarin di yekê de-sê yekîtî yê kû di jiyana me ya rojane de ye, înkar bikin.

Mînak, têgîna **demê** bi diyardeyên *paşeroj, niha û pêşeroj* re cureyeke yekîtiya sêmend teşe dike.

**Fezaya** kû *bilindî, dirêjayî û firehî*yê dihewîne, mînakek din e.

**Mirovek** pêkhênanek e kû ji *ruh, can û bedenê* pêk tê.

Di heman demê de roj(tav) jî **yekîtiyeke sêmend e.** Tevî kû rûzemîn xwedî yek tavê ye, em vê

*hebûnaesmênwekî* **tav**,
*roniya* wê wekî **tav**
û *germahiya* wê jî wekî **tav** bi nav dikin.

Ev rewş tê wateya kû sê tav hene? Na. Tav ne sê heb e, yek e. Di navbera yek an jî yekîtiya sêmendbûna rojê de tu nakokî tune ye. Çawa kû roniya rojê û germahiya wê ji rojê derdikeve, bi heman awayî *peyva Xwedê û Ruhê Xwedê* jî ji *Xwedê* derdikeve. Lê wekî rojê kû yek e, ew jî yek in.

Bê şik, hemû mînakên erdîn kû ji bo ravekirina yekbûyiya Xwedê tên dayîn, dê bi temamî têrê nekin. Xweda Hebûnekî ye kû naşibe roje, kesane, dilovan û tê zanîn e. Lê dîsa jî ev hemû mînakên wisa ji bo kû di afirînê de hebûna yekîtiya sêmendiyan û fikra piraniya Afirîner raserê ên kû Aferideyên xwe ne qebûl dikin, divê me beralî bingeheke gelemperî bikin.

*"Yê kû mal çêdike, ji malê zêdetir rêz digire. Lewre çêkerê her malekê heye, çêkerê her tiştê jî Xweda ye."*
(Îbranî 3:3-4)

Ger afirîna Xweda bi yekîtiyên yekbûyî re dagirtî ye, divê me matmayî bihêle kû Xwedê Bixwe yekîtiyek yekbûyî ye. Ger em digel hemû agahiyên kû em xwedî ne, em nekaribin dinyaya kû em lê dijîn diyar bikin, em ê çawa Yê kû vê dinyayê afirandiye diyar bikin?

Xweda Xweda ye.

***"Hûn dikarin sirên (tiştên kû nayên zanîn) kûr ên Xwedê fam bikin?*** *Hûn dikarin bigihîjin sînora Yê kû Hêza Wî Têra Her Tiştî dike? Ew bi qasî ezmanan bilind in,* ***dikarî çi bikî?*** *Ji warên miriyan kûrtir in – tu yê çawa fam bikî? Pîvanên wan ji rûzemînê dirêjtir, ji deryayê firehtir in."* (Eyûb 11:7-9)

Gava em li ser *sirên Xwedê lêkolînê bikin,* em ê xwedî îmtiyazeke bibin; em ê yek ji taybetiyên nuwaze ya xwezaya Wî ya bêdawî kifş bikin û em ê biceribînin.

> *"Xweda* ***hezkirin*** *e."* (Yuhannayê 1., 4:8)

## XWEDA Jİ KÊ HEZ KİR?

Hezkirina Xweda hezkirineke wisa ye kû ji dilê Bav diherike û hezkirinek e kû xwe bi riyên pratîk vegotin dike ûew qas kûr e kû nayê famkirin.[107] Ji ber kû Xweda *hezkirin* e, hezkirina Wî ne girêdayî wê şert û mercê ye kû, kesê kû jê hezdike bila yekî kû jê tê hezkirin be.

> *"**Bavê** me ji me ew qas **hezdike** kû, ji me re 'zarokên Xwedê' tê gotin."* (Yuhannayê 1., 3:1)

Li vir xaleke heye kû divê li ser bê fikirîn. Ji bo hezkirinê, wergirek hewce ye. Ez tenê nikarim bêjim "hez dikim", lê ez dikarim bêjim "ji hevjina xwe hez dikim, ji zarokên xwe, ji cîranên xwe hez dikim".

Ji bo hezkirinê divê objeyek hebe.

Naxwe Xweda wekî objeyên hezkirina Xwe, beriya kû hebûnên zindî yên taybet afirand, ji kê hez kir? *Pêdiviya* Wî bi afirandina milyaket û mirovan hebû? Na. Afirînerê me têra *xwe* dike. Wî hebûnên ruhî û mirovan ji bo kû pêdiviya wî bi wan hebû neafirand, ji ber kû wan dixwest ew afirandin. Li vir, ev cudahiya kû tê qalkirin, girîng e.

Wekî kû em berê jî hîn bûn, Xweda **diaxive**.

Axaftin tenê dikare di nav şert û derdora têkiliyekê, bi awayekî watedar hebe. Beriya kû *milyaket û mirov* afirandin, **Xwedê bi kê re axivî?** Ji bo kû Peyva Yekî fam bike, **pêdiviya Wî hebû kû** hebûnên din jî biafirîne? Na, hemû "tiştên" kû pêdiviya Xwedê pê heye, di nav Wî Bixwe de ne. Pêdiviya Wî bi tiştekê tune ye. Xweda têra xwe dike û bi xwe re tatmîn dibe. Lê

dîsa jî di xwezaya Wî de parçeyek wisa heye kû, dixwaze biaxive û bi Wî re biaxivin, dixwaze hez bike û bê hezkirin.

Ev rastî me beraliyê rastiyeke din dike: **bi Xweda re têkilî dikare bê dayîn.**

Hezkirin û axaftin, tenê dikarin di nav şert û derdora têkiliyekê, bi awayekî watedar hebin. *Xweda beriya kû hebûnên din afirandin,* ***ji têkiliya kê kû pê re jiya, zewqê girt*****?** Bersiva vê pirsê di nav yekîtiya yekbûyîna Xweda de ye.

Xwedayê me kû pê re têkilî dikare bê dayîn, di bêdawiyê de, beriya kû milyaket û mirov afirandin, zewqa têkiliya nêzîk a hezkirin û têkiliyê, di nav xwe de bi Peyva kesane û Ruhê xwe yê kesane re jiya.

## QEŞARTİNA TEBEQEYAN

Li hemberî ramanên kûr ên der heqê xwezaya sê-kes a pirjimar a Xweda, yekî ev posteya elektronîk şand:

> Posteya Elektronîk
>
> Xweda ji bo kû me bide zanîn kû yek û tenê ye, pêxember şandin. Naxwe hûn çima guh nadin peyva Wî û qebûl nakin? Hûn çima her tebeqayê wekî yek heb naynin cem hev lê hûn **her tebeqeyê yek û yek diqeşêrin û ji wan re yek û yek nasname didin?**

Digel kû em nikarin tiştên kû divê der heqê Afirînerê me yê bêsînor de bê zanîn, em ê tu car tênegihîjin, dîsa jî Xweda ji ber kû di nivîsên pêxemberan de der heqê Xwe de gelek rastiyên mezin rave kiriye, ne hewce ye kû em ji bo famkirina van rastiyan bixebitin? Ger em der heqê Xweda de bifikirin, divê em vê bişiyarbin û bi awayekî paqij bikin. Piraniya me qebûl dike kû Xweda YEK e, lê ev XWEDAYÊ YEK der heqê Xwe de çi gotiye? "Gava em her tebeqeyê biqeşêrin" em ê di Nivîsên Pîroz de der heqê Wî de çi bibînin?

Dê Xwedayê kesane û pêbawer yê kû em ê Wî bi YEKbûna *Peyv* û *Ruhê Wî bikaribin nas bikin,* derkeve pêşiya me.

Xweda di mezinahiya xwe ya bêsînor de, xwe wekî ***Bav,*** Peyva xwe ***Kur,*** û Ruhê xwe wekî ***Ruhê Pîroz*** diyar kiriye. Bav, Kûr û Ruhê Pîroz, di nav Xwedayê yek û rast de sê cudahiyên kesane ne. Em niha li çend ayetan binêrin kû "qalika vê rastiyê diqeşêre".

**XWEDA**

Nivîsên Pîroz, *Peyv*a kû di serî de bi Xweda re yek e, di heman demê de didin zanîn kû Xweda wekî *" Xweda" yê yek û yekta* tê binavkirin.

> *"Di serî de Peyv hebû û* ***Peyv bi Xwedêre bû****. Û Peyv* ***Xweda bû****... Tu carî tu kesî Xweda nedît.* ***Yê kû di singê Bavo de ye*** *û* ***yekane kû Xweda ye****, Ew da naskirin... Yê kû jê re îmanê dike, nayê darizandin, yê kû îman nake jî jixwe hatiye darizandin, lewre bi navê* ***yekane yê Xweda*** *îman nekiriye."* (Yuhanna 1:1,18;3:18)

Li Senegalê, mirov carinan ji bo gotina *" Xweda"* bersiva *"Estaxfîrula!"* didin. Ev peyva Erebî vê ramanê nîşan dide: *"Xweda ji bo vê dijûna we, we efû bike!"* (dijûnkirin dikare wekî *"Heneka bi Xwedê re"* bê diyarkirin.) Min ji bo peyvên wan wekî bersiv, ji wecîzeyek kû aîdê wan e hevokek got: "Divê hûn fam bikin ka şivan çima beriya kû difikîne, li devê xwe dide." Kenîn û piştre min jî ji wan re wiha got: " Beriya redkirina gotina *' Xweda',* divê hûn li ser lêkolînê bikin ka Xweda der heqê vê de çi dibêje."

Di nivîsên Pîroz de ji sedan zêdetir ayet hene ji bo gotina Xweda, kû rasterast wê nîşan didin. Lê dîsa jî ev ayet hem wekî hin kesên kû dixwazin vê vegotiniyê şîrove bikin kû "ji yekê zêdetir Xweda heye" îma nakin û hem jî nadin zanîn kû "Xweda xwediyê hevser û kûrekî ye". Ramanekî wisa ne tenê dijûn e; di heman demê de tevgera req a der heqê Nivîsên Pîroz rave dike.[108]

Xweda gazî me dike kû em wekî fikrên Wî bifikirin.

> *"Lewre çawa kû asîman ji erdê* ***bilindtir*** *e, riyên min jî ji riyên we, fikrên min jî ji fikrên we* ***bilindtir*** *in."*
> (Yeşaya 55:9)

Çend sal berê karsazekî navdar ê Senegalî, qeza kiribû û miribû. Rojnameyeke netewî ya Senegalê nivîsiye kû du hezar karkerên vî zilamî "wekî n wî" bûn û Wî wekî ewladekî mezin ê Senegalî bi nav kiribûn, û wisa pesna wî dabû. [109] Ev peyv dihatin wê wateyê kû têkiliya Senegalê bi jinekê re hebû û ji wê jinê kûrekî wî çêbibû? Bêguman na! Tu pirsgirêka gelê Senegalê kû nasnavekî dabûn welatiyê xwe yê kû jê hez dikirin, tune bû. Fam dikirin ka gotina " Senegalî" dihat çi wateyê. Bi heman awayî dizanîbûn ka bi vê peyvê çi alaz nedikirin.

Gotina "Kur"ê bi çend awayê tê bikaranîn. Gava Qur'an û Ereb ji *kesekî kû rêwîtî dike* wekî 'di rê de maye' *'ibn el-sebil'* (Sûre 2:177, 215) behs dikin, em dizanin ka dixwazin çi bêjin. Gava Yê kû Hêza Wî Têra Her Tiştî dike ji *Peyva* xwe wekî *Xwe* behs dike, divê em bizanibin ka dixwaze çi bêje.

Em bi nasnav û vegotinên û Afirînerê me berbilind dike henekên xwe nekin:

> *"****Xweda*** *di demên kevin de bi rêya pêxemberan, gelek caran bi riyên cuda bang li kalikên me kir. Di vê serdema dawî de jî* ***bi xwe*** *kû ew wêris kir û bi riya wî gerdûnê afirand,* ***bang li me kir.*** *Kûr, biriqîna berbilindiya xwe, xuyaneka hebûna zatê Wî ye. Bi peyva xwe ya* ***xurt****, her tiştî berdewam dike."* (Îbranî 1:1-3)

Xweda dixwaze em bizanibin kû Ew *"Bi rêya Xwe bi me re diaxive"*. Ew di heman demê de dixwaze em têgihîjin kû bi rêya Wî erd û ezman hatine afirandin û ev jî *Peyva* kû tê berdewamkirin, e. Di wergerên Erebî yên Pirtûka Pîroz de, nasnavê yê kû *"Peyva Xweda"* ye, bi nasnavê *"Kalimat Ellah"* tê wergerandin kû etfên hem Pirtûka Pîroz û hem jî Qur'anê ye ji Mesîh re. Em ê li astên din ên rêwîtiya xwe, vê mijarê ji nêzîktir bikolin.

## RUHÊ XWEDA

Çawa kû Xweda bi *Peyv-* xwe re Yek e, bi heman awayî bi *Ruhê Pîroz* re jî Yek e.

Ruhê Pîroz ê Xwedê hem di afirandina dinyayê de hem jî di wehîkirina Peyva nivîskî ya Xwedê de, peywir girt. Gava li hevoka duyemîn a Pirtûka Pîroz qala afirandina Xwedê ya dinyayê tê kirin, vê daxuyaniyê dide: *"**RuhêXweda** li ser avê pêl dida.."* Û Nivîsên Pîroz piştre vê nîşan didin: *"Tu peyva pêxemberiyê ji ber daxwaza mirovan çênebû. Mirovên kû ji hêla **RuhêPîroz** ve tên birêvebirin, peyva Xweda ragihandin."* (Petrûsê 2., 1:21)

Hin kes wisa hîn dikin kû Ruhê Pîroz, milyaketê Cibraîl e. Yên din jî xwe wisa pêbawer kirine kû Ruhê Xwedê pêxemberekî ye. Ev encam, ji ber Nivîsên pêxemberan e. Milyaket û însan hebûynên hatine afirandin in. Lê Ruhê Pîroz, *"Ruhê bêdawî"* yê kû nehatiye afirandin, e (Îbranî 9:14). [110]

Ruhê Pîroz *"Ruhê rastiyê ye."* (Yuhanna 14:17), Xweda armancên xwe yên kû ji bo dinyayê sêwirandine, bi rêya Ruhê Pîroz pêk tîne. Ruhê Pîroz ji bo kesên kû baweriya wan bi peyama Xweda heye re dibe *"Alîkar"* kû bikaribin Xwedê ji nêzîk de biceribînin. (Yuhanna 14:16) Îro gelek kesên li cîhanê Xweda nas nakin, tenê xwedî agahiya *der heqê* Xweda de ne. Agahiyek wisa ne têra Xweda dike ne jî têra mirov. Ruhê Pîroz e kû dihêle bila însan bi Xweda re têkiliyek kesane bijîn û jê zewqê bistînin.

Em ê der heqê Ruhê Pîroz ê Xwedê de, di pêşerojê de hê hînê gelek tiştan bibin.[111]

Rêwîtiya we çawa diçe? We hinek difetisîne? Ev raman, me ramanên wisa ne kû mirov bi hêsanî têgihîje. Hin dibêjin, divê diyarkirinên der heqê Xweda û dînê wan de, rast be, "lewre mijarên wisa hêsan in." Diyarkirinên der van kesan ên der heqê Xweda de dibe kû basît be, lê Xweda ne basît e.

> *'Fikrên min ne fikrên we ne, riyên we ne riyên min in.' Dibêje Reb.* (Yeşaya 55:8)

## HEYA BÊDAWİYÊ YEK

Wateya Nivîsên Pîroz zelal e. Di hemû bêdawiyê de demek wisa pêk nehatiye kû Bav, Kur û Ruhê Pîroz nebûye.[112] Ew her tim YEK bûne. Nivîsên Pîroz di nav şert û derdora dîroka mirovê de Wî wekî Yekî wisa rave dikin kû *Bav ji ezmanê diaxive, Wî li rûzemînê û Ruhê Wî yê Pîroz ji dil re diaxive.*[113] Her yek, ji ber rola xwe ji yên din cuda ye, lê dîsa jî YEK in.

Mirov ji ber dewlemendiya YEKê kû hezkirin e û kû Hezkirina xwe bi riyên pratîk nîşan dide, gava di agahiya Xwedayê kû der heqê Xwe de dibêje mezin dibe, êdî zewqê distîne.

Hezkirin, tenê di nav şert û derdora têkiliyekê de dikare bi awayekî watedar hebe. Bav, Kûr û Ruhê Pîroz, ji têkiliya nêzîk a hezkirin û yekîtiya nuwaze, her tim zewqê stendiye. Em di beşên din ên Nivîsên Pîroz de van peyvên Kûrî dibihîzin: *“Ez ji Bav **hezdikim**”* û *“Bav jî ji Kûr **hezdike**.”* Nivîsên Pîroz di heman demê de daxuyanî dikin kû *“Fêkiya Ruhê Pîroz **hezkirin** e.”* (Yuhanna 5:20; 14:31; Galatyayî 5:22)

Têkiliyên mirovan ên herî baş—yekbedenbûna mêr û jinê, têkiliya di navbera bav, dê û zarok de—***hezkirina***kû bi Xweda re dagîrtî ye. Têkiliya erdîn a herî baş kû qala wê tê kirin jî, tenê vebeyîna çilmisokî ya hezkirin û yekitiya Xweda ye kû nefsbiçûkiyê dide. Afirînerê me çavkanî, mînak û armanca orîjînal a her tiştê baş e.

*“Xweda **hezkirin** e.”* (Yuhannayê 1., 4:8)

Hêla herî baş a gotina*“Xweda hezkirin e.”,* Ew bang li me dike kû hûn û ez bi Wî re di têkiliyeke kû dê heya bêdawiyê berdewam bike de, bi Wî re zewqê bistînin! Ew ne temamî bikaribe bê ravekirin jî, tişta kû ji me dixwaze pawerbûna Wî ye.

## XWEDA EWLEDAR E

Em li roja şeşemîn a Afirînê binêrin û tiştên kû me der heqê Xweda de çavdêriyê kirin, bifikirin. Kû em vê bikin hevkêşeyek (denklem) matematîkî, dê dîmenek wiha derkeve pêşiya me:

Roja 1. : Xweda pîroz e
+ Roja 2. : XwedaYêkûHêza Wî Têra Her Tiştî Dikeye
+ Roja 3. : XwedaBaş e
+ Roja 4. :Xweda dilsoz e
+ Roja 5. : Xweda Jiyan e
+ Roja 6. : Xweda Hezkirin e
= XWEDAYÊ PÊBAWER

Baweriya mirov ji wan kesên kû ne xwedî van taybetiyan in zû bi zû tê, lê ne ecêb e nedaxwaziya me ya kû em ji Wî yê kû xwedî karaktereke nuwaze ye, re didin nîşan?

Gava ez nameyek davêjim qutiya nameyan, baweriya min bi wê serwîsa postayê heye kû dê nameya min bigihîne cihê wê. Naxwe divê baweriya min zêdetir bi Afirîner-Peydaker û Xwedayê gerdûnê re bê, der heqê pêkanîna wehdên Wî de!

> *"Em şahidiya mirovan qebûl dikin, lê belê şahidiya Xweda ra hişk e. Yê kû baweriya wî bi Xweda nayê, Wî derewker derdixe. Lewre Xweda ji şahidiya der heqê xwe de bawer nekiriye."* (Yuhannayê 1., 5:9-10)

## NAVÊ KESANE YA XWEDA

Xwedê dixwaze em Wî nas bikin, jê bawer bikin û Wî bi navê Wî gazî bikin.

> *"**Yên kû te nas dikin, baweriya wan bi Te tê**, lewre te ew kesên kû beraliyê te ve hatin, terk nekirin, ya **Reb**."*
> (Mezmûr 9:10)

Gelek kes wisa difikire kû navê Xwedê tenê *"Xweda"* ye— *Elohim* (Îbrankî), *Ellah* (Erebî[114]) *Alaha* (Aramkî), *Dieu* (Frensî), *Gott* (Almanî) an jî di zimanê kû diaxivin de, kîjan peyvê bi kar tînin êdî…

Bi rastî jî Xweda Xweda ye (Hebûnê Herî Raser). Lê *navê* Wî Xweda ye?

Ev rewş naşibe wê rewşê kû ez dibêjim navê min "Mirov"

e? Ez mirovekî me, lê di heman demê de xwedî navekî jî me. Xweda Xweda ye, lê di heman demê de xwedî wan navên kû xwe rave dike ye û bi rêya van navan me vedixwîne kû em wekî Kesekî dengê Wî bikin.

Gelek kes, difikirin kû Xweda çavkaniyeke enerjiya nezan e, wekî kû "Hêz"di fîlmên aşopiya zanist ên erdkêşî û ba de tê karakterîzekirin. Têgîna Xweda kû di Pirtûka Pîroz de tê zanîn, ne têgîneke wisa ye kû ramanên wisa dihewîne.

Xweda Kesayetiyekî Dawînî ye kû dixwaze hûn Wî bi awayekî takekesî bizanibin.

Têgîna Xweda, ne tenê kesayetiyekî Pirtûka Pîroz e, di heman de li gorî hişê mirov e jî. Çawa kû mirov ne tenê gilokên enerjiya kozmîk in, bi heman awayî, yê kû her tiştê Diafirîne jî ne wisa ye. Ew Hebûnekî Kesane ye kû navekî Wî heye.

Navê Kesane ya destpêkê a Xweda, di beşa duyemîn a Afirînê de cara destpêkê tê daxuyankirin.

> *"Çîroka afirîna erd û ezmanê: **REB** Xweda gava erd û ezman afirand ..."* (Afirîn 2:4)

We bala xwe da navê kû Xweda Xwe diyar kir?

Navê Wî *"REB"* e. Qet nebe, bi vî awayî hatiye wergerandin. Ez jê re spasdar im, Ji ber kû Xweda hemû zimanan bi awayekî herikbar diaxive û ji me naxwaze kû em bi zimanekî diyar dengê Wî bikin. Tu giringiya dem, cih û aliyê tune gava me dawet dike kû em bi zimanê xwe yê dayîkê re biaxivin, ji bo Wî tişta girîng ew e kû em bi Wî re bi zimanê dil biaxivin.

## EZ İM

"REB" kû navê kesane ya Xwedê ya destpêkê ye, di zimanê Îbrankî de bi çar tîpên dengdar tê nivîsîn: **YHVH**. Gava tîpên dengdêr li van çar tîpên dengdar zêde dibin, peyv wekî YaHVeh an jî YeHoVa tê bilêvkirin. Ev nav ji lêkera alîkar a "in" a Îbrankî zêde bûye û wateya wê rasterast wekî **"EZ IM"** an jî **"EW E"**

ye. Em bi vê ravekirinê hînê vê dibin: Xweda *Bixwe Çêbûye, Yê Bêdawî ye.* Ev navê kesane ya Xwedê, di Peymana Kevin de ji 6.500 caran zêdetir derbas dibe û ji navên din zêdetir tê bikaranîn.

Mûsayê kû li Misirê Pirxwedayî mezin bûye, gava ji Xweda pirsa navê Wî dike, guh bisin ka çi bersiv dayê:

> *"Xweda ji Mûsa ra got, 'Ez **Ezim**'. 'Ji Îsraîliyan re jî got 'Yê kû ji min re got Ez **Ezim**, Ez şandim vir'."*
>
> (Ji Misirê Derketin 3:14)

Tenê hebûneke kesane dikare bêje "ez..im". Xweda ji me dixwaze, em fam bikin kû ew Kesê Dawînî ye.

EW, EW Kes e KÛ EW E.

Paşeroj, niha û pêşeroj ji bo Wî ne tiştek e. Hebûna Wî raserê dem û valahiyê ye.

Ew bixwe têra xwe dike.

Hewcedariya Min û We bi hewa, av, xwarin, avahî û unsûrên din heye ji bo jiyînê, lê Ew, pêdiviya Wî bi tu tiştê tune ye. Ew bi hêza xwe mantiqa xwe bi kar tîne Ew heye. Ew, Mezin EZ IM e – Ew, REB e. (Şiyarbin: gava di Pirtûka Pîroz a Îngîlîzî de peyva REB bi temamî bi tîpên mezin tê nivîsîn, di Îbrankî de peyva orîjînal a kû tê wateya REBê, YHVH ye kû tê wateya *Yê kû Bixwe Tê Afirandin, Yê Bêdawî.)*

Xwe peywira danasîna xwe nedaye mirovan. Ew, Ew Kes e kû Xwe dide Nasîn.

## Bİ SEDAN NAV

Hebûna bêdawî ya kû REB wekî Bav, Kûr û Ruhê Pîroz xwedî ye, bi sedan nav û nasnav hildigire. Navên Xwedê karakterên Wî didin hisandin. Armanca her nasnavê kû aîdê Xweda ne, ji bo alîkariya me bike der heqê Wî de ka kî ye û çawa ye? Mînak, bi van navan tê binavkirin:

> *Afirînerê erd û ezmanê, Nivîskarê Jiyanê, Yê Raser, Roniya Rast, Yê Pîroz, Dadgerê Edaletperwer, Xwedayê Peydaker,*

*Xwedayê kû Şîfa Dide, Rebê kû Rastiya me ye, Rebê kû Xweşiya me ye, Şivanê Min Reb, Xwedayê Hezkirin û Xweşiyê, Xwedayê Çavkaniya Qenciyê, Nivîskarê Rizgariya Bêdawî, Rebê kû her tim Nêzikê me ye v…*

Der heqê Afirînerê me de fikra me ya niha çi be bila bibe, divê em her yek bidilnizmî îtiraf bikin kû ***Ew Xweda ye û tu kes naşibe Wî.***

Digel nemimkin e kû Xweda bitemamî bê ravekirin an jî bê têgihiştin, Ew dixwaze kû em navê Wî bizanin, jê bawer bikin, em jê hez bikin, heya dawiyê bi Wî re bijîn. Xweda armanca xwe ya kû di hişê xwe de sêwirandiye, wiha vegotin dike:

*"Em mirovê bi xuyanga xwe, wekî xwe biafirînin."*
(Afirîn 1:26)

Xweda bi van gotinên xwe xwest çi bibêje? Mirovê kû bi çavan dikare bê dîtin, çawa dibe kû xwedî xuyanga Xweda kû bi çavan nayê dîtin, bibe?



# 10

# Aferîdeyekî Taybet

Em du beş berê, li ser daxuyana mezintirîn a hemû deman, sekinîbûn: *"Di serî de Xweda erd û ezman afirand."* (Afirîn 1:1) Em li ser vegotineke din a girîng jî bisekinin kû Xweda daxuyan kiribû:

***"Xweda mirov di xuyanga xwe de afirand."*** (Afirîn 1:27)

Xweda, mirov ji bo kû bibin taca Afirîna Wî, sêwirandin.

## Dİ XUYANGA XWEDA DE

> *"Xweda got 'Em mirovê **di xuyanga xwe de, wekî xwe** biafirînin.' 'Bila ji masîyên kû di deryayê de ne, ji çûkên li ezmanan e, ji heywanên kedî re, ji xuşînokan re, ji hemû cîhanê re bibe **serwer**.' **Bi vî awayî mirov di xuyanga Xweda de hate afirandin. Mirovan wekî nêr û mê afirand**."* (Afirîn 1:26-27)

Xweda mirov *"di xuyanga xwe de afirand",* lê ev nayê wê wateyê kû mirovên destpêkê bi her awayî dişibin Xweda. Xweda bêhempa ye.

Gotina *"Xweda mirov* ***dixuyanga xwede*** *afirand",* tê wê wateyê kû dê mirov *bibin şirîkê xwezaya Xweda.* Mirov hat afirandin kû kesayetiya Xweda bide hisandin. Xweda ji jin ê

mêrê destpêkê re ew wesf dan kû bila ji têkiliya watedar kû dê bi Wî re deynin, zewqê bistînin.

Xweda ji mirovan re ew huner dan kû bikarin pirsên girîng bikin, daraziyên bimantiq bikin û rastiya kûr a der heqê Afirînerê wan de fam bikin, û ew bi jîrahî (zeka) bereket kirin.

Xweda ji mirovan re *hest* dan kû bikaribin hestên wekî hezkirin û empatiyê biceribînin.

Xweda di heman demê de, ji mirovan re der heqê encama bêdawî de ji bo kû bikaribin hilbijêrînê bikin, îradeyek da kû hem azadî hem jî berpirsiyariyê dihewîne.

Li ser van danan, ji wan re hunera têkilî-axaftin, jest û stirandinê da. Di heman demê de ji wan re hunera çêkirina planên demdirêj da û bi vî awayî dikarin van planan bi awayekî afirîneke bandorker pêk bînin. Ya herî girîng jî, ji wan re *can û ruhekî bêdawî* da kû bikaribin Afirîner-Xwedayê xwe biperêsin û Jê zewqê bistînin.

Ev kapasîteyên kû ji mirovan re hatine bexşandin, wan ji heywanan vediqetîne.

Xweda, mirov *jiboXwe* afirandin. Xwedayê kû *"Hezkirin e"* (Yuhannayê 1., 4:8), jin û mêr ji ber kû *pêdiviya* Wî bi wan heye neafirandin, ji ber kû ew *xwestin* afirandin. Mirov dê bûna wergirên Wî û dê Ew bidana hisandin.

## BEDENA MİROV

Beşa destpêkê a pirtûka Afirînê, çîrokeke têrwate pêşkêş dike der heqê Xweda de ka dinyayê çawa afirand, beşa duyemîn jî bi taybetî derbarê afirîna mirovan de bi hurgûliyan re tijî ye.

> *"REB Xweda, Adem ji axê afirand û ji pozê wî re hilma jiyanê pif kir. Bi vî awayî Adem bû hebûnekî kû dijî."*
>
> (Afirîn 2:7)

REB tevî kû erd û ezman ji tunebûnê afirandin, wisa xwest kû mirovê yekemîn ji axê biafirîne. Biyologên îro vê rastiyê dipejirînin: "Beden wisa xuya dike kû hema hema qet ne

bandorker e. Nêzî bîst unsûrên ji rêzê kû bedena mirov çêdikin, di *axa* zuwa ya rûzemînê de hene.”[115]

Tevî kû bedena mirov bi mewqî ji endamênxwar hatiye çêkirin, parçeya mucîzewî ya karekî bihuner e kû nêzî heftê û pênc trîlyon (75.000.000.000.000) hucreyên zindî anîne cem hev. Her yekê van hucreyên zindî, rola xwe ya taybet dike.

Hucre yekîneka bingeh a jiyanê ye. Hucreyek ew qas biçûk e kû, dîtina wê tenê dikare bi mîkroskopeke xurt pêk bê. Digel vê, hucreyek dîsa jî bi milyonan beş ên kargîn ve tijî ye. Her hucre, parçeya biçûk a DNAyê dihewîne - koda genetîk a taybetiyên bingeh ên mirov e û dirêjahiya wê du metre ye - kû bi mîkroskopê dikare bê dîtin.

Programsazê navdar Bill Gates, ev daxuyanî da: “DNAya mirov wekî programa kompîturê ye, lê ev ji programên kompîtirê kû heya niha hatine afirandin, zêdetir pêşde ye.”[116] Di bedena mirov de herî kêm ji du sedan zêdetir ji hev cuda cureyên hucreyê hene. Hinek ji van cureyên hucreyan şileyiyên mîna xwînê pêk tînin; yên din jî raçîngên (Tevn) nerm û organan diafirînin, hinek ji wan jî tên cem hev kû hestiyên hişk çêkin. Hinek hucre beşên bedenê girêdayî hev dikin, yên din jî fonksiyonên bedenê yên wekî sîstema dehandin û zêdebûnê organîze dikin.[117]

Li ser binyat û sîstemên kû dişixulin, bifikirin: îskeleta kû bi 206 hestiyan ve pêk hatiye û bi girêdanên kû hestî û organên din pê hev ve dikin, tendon, lemlate, çerm û por re hatiye girêdan û pêçandin; an jî xwîn, damara xwînber û damarên sîstema gerandinê kû madeyên kû aîdê jiyanê bixwe ye, radigihîne. Em di vê navberê de li hebûnên mîde, rovî, gurçik û pisika reş jî binêrin. Di heman demê de sîstema rehikan (sinîr) jî heye kû bi mêjiyê we re di têkiliyê de ye û bi têlên tevlihev re girêdayî ne. Û pompeya dilsoz kû wekî dil tê binavkirin, an jî çav, guh, poz, dev, ziman, girşên dengê, papîlla û diranên kû Xweda daye we, ji bîr nekin! Dest û pê jî pir sûdewer in! We qet spasiya Xweda kir kû tiliya serî daye we? Gêzik an jî çakûçekî bêyî tiliya xwe ya serî bi kar bînin! Ev neynokên kû hûn xwedî ne jî pir sûdewer in…

Divê mirov bi van peyvên kû Pêxember Dawud nivîsîne, şaş nemîne:

> *"Ez pesnên xwe pêşkêşî te dikim, lewre ecêb û nuwaze hatime afirandin. Çi karên te yên nuwaze hene! Ez vê pir baş dizanim."* (Mezmûr 139:14)

## CAN Û RUH

Bedena mirov çi qas nuwaze hatiye afirandin bila bê, sedema mirovan kû ev qas taybet in ne beden e. Bedena metelhiştî ya heywanan, çûkan û masiyan jî heye. Bêhempabûna mirov, *ji ber canê wî yê mirov û ruhê wî yê bêhempa ye.*

Tişta kû mêr û jina yekemîn kû *"di xuyanga Xweda de"* hatine afirandin ji aferîdeyên din vediqetîne, can û ruhê wî ye.

Piştî kû Xweda ji axê şekl da bedena mirov, ji *"pozê mirov re hilma jiyanê pif kir û bi vî awayî mirov bû hebûnekî zindî."* (Afirîn 2:7)

Bedena kû Xweda ji bo Adem afirand, bedena kû Xweda ruh û canê Adem tê de bi cih kir, ji bo mirov tenê malek û konek bû.

Xweda beden da mirov kû haya wî ji dinyayê, can da kû haya wî ji hebûna hundirîn û ruh da kû haya wî ji Xweda çêbe.

Dê can *bedenê,*
Ruh *canî* bi rê ve bibe.
Û *ruh,* dê ji hêla Xweda Bixwe bihata birêvebirin.[118]

> *"**Xweda Ruh** e, û kesên kû Wî diperêsin divê **di ruh û rastiyê de** Wî peresin."* (Yuhanna 4:24)

## JÎ BO ARMANCEKÊ AFÎRAND

Hostayê jêhatî ji bo kû mirov bibe cureyekî yekîtiya-sêmend, *"ruh, can û bedenê"* girêdayî hev afirand. (Selanîkiyên 1., 5:23) û wisa pêk anî kû bila mirov ji têkiliya bi Xweda re zewqê bistînin. Xweda jiyan dabû mirov û niha kû mirov ji bo zewq û pesndana Afirîner-Xwedayê xwe bijiya, dê ev bûya dê ev berbijariya bilind a mirov bûya.

> ***"Her kesê kû min ji bo gewretiya xwe afirand, şekil da wan û bi navê min tên gazîkirin …*** *Ev gelê kû min* ***ji bo xwe*** *şekil da wê, dê pesnên kû aîdê min in bide zanîn."*
> (Yeşaya 43:7,21)

Mirov, ji bo gewretiya Xweda hatin afirandin.

Rûzemîn ji bo mirovahiyê hat afirandin, lê mirovahî ji bo Xweda hat afirandin. Gava Afirîner mirovên destpêkê afirandin armanca Wî ew bû kû bila mirovên destpêkê Wî nas bikin, jê zewqê bistînin û ji Wî heya bêdawiyê hez bikin. Xweda heman tiştê ji bo we û ji bo min jî kiriye mebest.

> *"Tu yê ji* ***Xwedayê*** *xwe* ***REB*** *ji* ***dil****, bi hemû* ***canê*** *xwe, bi* ***hişê*** *xwe û bi* ***hêza xwe hezbikî****."* (Markos 12:30)

## DERDOREKE NUWAZE

Piştî kû Xweda Adem afirand, bi navê *Aden* baxçeyek bibereket sêwirand û Wî, ev baxçe danî.

> *"Reb Xweda, li Adenê—li rojhilatê—baxçeyek danî. Ademê kû afirand danî wir. Li baxçê, darên xweşik ên cur be cur ên kû fêkiyên baş didin afirandin. Di navenda baxçê de dara jiyanê û dara zanîna başî û xirabiyê hebû. Ji Adenê çemekê dihat, baxçê av dida û li wir dibû çar şeq û ji hev vediqetî."* (Afirîn 2:8-10)

Cihê Adenê, îhtimaleke mezin e kû wekî Iraq,[119] tê zanîn, baxçeyeke mezin bû kû tê de dîmenên nuwaze, deng û bêhn, û xweşikiyên bêsînor hebûn. Çemekê kû gava diherikî dibiriqî, baxçê av dida. Darên fêkî yên tamxweş li keviya çêm rêz bûbûn. Ji bo jê tam bê girtin fêkiyên cur be cur ên kû nayên gotin, kûlîlkên bêhnşêrîn ên metelhişt, mêrgên bitam ên kû çav nikarin lê binêrin, çûk û kêzikên kû divê bên lêkolînkirin, daristanên nepenî yên kû divê bên kifşkirin, zêr û kevirên kû divê bêne derxistin, li vê baxçê hatibûn dayîn. Xweda bi rastî jî ji bo kû Adem *"jê zewqê*

*bistîne, her tiştê zêde zêde dabû.”* (Timoteosê 1., 6:17)

Xweda di heman demê de du darên taybet jî danîn orta baxçê: dara jiyanê û dara zanîna başî û xirabiyê.

Aden tê wateya *kêf*ê. Xweda ev hêlîna nuwaze ji bo kû mirov jê zewqê bistîne, afirandibû. Lê ji bo mirov kêfa herî mezin, dê zewqa kû ji hempariya bi Afirînerê xwe distand, bûya.

Tişta herî xweş nasîna Xweda ya kesane ye û bi Wî re bûn e. *“Kêfxweşiyeke zêde heye* ***di huzûra te de; ji destê te yê rast*** *bextewarî kêm nabe.”* (Mezmûr 16:11)

## PEYWİREKE TÊRKER

Piştî kû amadehiya baxçê qediya, REB mirov xist baxçê. Xweda ji Adem nepirsî ka dixwaze li vê baxçê bijî an na. Xweda Afirînerê mirov bû û ji ber vê Xwedayê mirov bû. REB dizane ka ji bo mirov çi baş e û der heqê kirinên xwe de ne neçar e ji tu kesî re bersiv bide.

> *“REB Xweda, Adem danî wir kû li baxçeyê Adenê binêre û biçîne.”* (Afirîn 2:15)

Xweda ji Ademî re du berpirsiyarî dan, li hêlîna xwe ya nû.

Berpirsiyariya yekemîn ev bû: dê Adem baxçê “biçanda”. Lê gava vê peywirê pêk bîne, dê xwêdan nedaya, zehmetî nekişanda û newesta. Ji ber kû her tişt baş bû dê ji vê peywirê zewqê bistanda. Li baxçê striyên kû di mirov de diçin û diêşînin tune bûn, û giyayên xerîb jî tune bûn kû mirov derxista û bavêta.

Berpirsiyariya duyemîn a kû ji Adem re hatibû dayîn *“xwedî derkina”* baxçê bû. Ev gotina dawî gelo dida nîşan kû li gerdûnê tiştek xetere û xirab hebû û kozik danîbû?

Dê bersiva vê pirsê gava hewce bû bê dayîn.

## RÊZİKEKE HÊSAN

Ji ber kû mirov ne bûko ke ye lê şexsekî ye, Xweda di heman demê de ji Adem re rêzikeke famkirina wê hêsan da kû îtaat bike.

> *"Jê re ferman da kû 'Li baxçê kîjan fêkî dixwazî, **dikarî bixwî**.' 'Lê ji dara zanîna başî û xirabiyê **nexwe**. Lewre roja kû te ew xwar, tu yê bimirî."* (Afirîn 2:16-17)

Xweda ev ferman beriya kû jinê afirand da mêr. Xweda biryar dabû kû dê Adem bibûya serokê nifşa mirovan û ji Adem re tenê rîayetkirina vê berpirsiyariyê dabû.

## JİNA PÊŞÎN

Xweda piştre jin afirand. Û jin aferîdeyeke pir taybet bû!

> *"Piştre, got 'Ne baş e kû Adem tenê bimîne'. 'Ez ê alîkareke anegora Wî biafirînim'... REB Xweda xeweke kûr da Adem. Gava Adem radiket, Xweda yek ji hestiyên Wî yên parsûyê hilda û şûna wê bi goşt re girt. Ji hestiyê kû ji parsûyê Ademî girt, jinekê afirand û ew da Adem. Adem got 'Va ye ev hestî ji hestiyên min, ev goşt ji goştên min hatine girtin'. 'Dê jê re jin bê gotin, lewre ew ji mêr hate girtin'. Ji ber vê, dê zilam dê û bavê xwe berde û dê girêdayî jina xwe be, dê her du bibin yek beden. Adem jî jina wî jî tazî bûn, hê nedizanîbûn şerm çi ye."*
> (Afirîn 2:18,21-25)

Bi vî awayî Xweda çalakiya xwe ya yekemîn pêk anî, ji hestiyên parsûyê Adem hevsereke bedew û nazenîn afirand û ew taqdîmê Adem kir.

Adem ji ber vê hevser û *"alîkarê"* kû Xweda da wî, pir kêfxweş bû! Rehmetî Matthew Henry kû yek ji lêkolînvanên Pirtûka Pîroz bû, wiha nivîsîbû: "Jin ji hestiyê parsû yê Adem hat afirandin; ji ber kû li ser Adem serweriyê neke ji serê wî nehat afirandin û ji ber kû Adem wê nexe bin piyên xwe, ji piyên wî nehat afirandin, ji bo kû wekhev be ji hestiyê wî yê parsû, ji bo kû bê parastin ji binê milê wî û ji bo kû bê hezkirin ji rexê dilê wî hat afirandin."[120] Jin jî wekî mêr *di xuyanga Xwedê de û mîna Wî* hat afirandin. Ji bo kû kesayetiya Xweda bide hisandin û bi Wî re

ji yekîtiya ruhî zewqê bistîne, hat afirandin. Afirîner, ji bo mêr û jinê pergaleke qethî û rolên cuda diyar kir; wisa daxuyan kir kû ew derbarê nirx û girîngiyê de wekhev in.

Îro, li dijî armanca Xweda, gelek civak ji jinên xwe re wekî parçeyeke mal tevdigerin. Min mirovên wisa dîtin kû gava zarokekî kûr tê dinyayê şa dibin û gava keç tê dinyayê bêhna wan teng dibe. Hin zilam ji heywanên xwe yên zindî re ji jinên xwe zêdetir eleqe û girîngî didin. Civakên din beraliyê serekî din ê rapir bûne û girîngî nadin rola mêr û jinê kû Xweda daye wan û berpirsiyariyên kû Xweda ji her yek zayendê re daye, red kirine. Her du seriyê rapir jî jinê ji xwe kêmtir dibînin.

## MEHRA PÊŞÎN

Bala xwe bidin ka kê cara destpêkê merasîma dewetê bi rê ve biriye.

Yê kû bi rê ve bir, REB bû. Nivîsên Pîroz wiha dibêje: *“**Xwedê** ew ji bo Adem anî.”* Afirîner, hê ji serî de, rasterast tevlî jiyana mirovên kû afirand kir. Yê kû ev daxuyanî da Xweda ye: *“Dê mêr dê û bavê xwe berde û dê girêdayî jina xwe bibe û dê her du bibin **yek**beden.”* Peyva “Yek” di Îbrankî de wekî “ehad” tê bikaranîn. Ev peyv, yekbûn û yekîtiyê dide nîşan. Xweda cota (jin-mêr) pêşîn afirand kû bila heya bêdawiyê ji hev zewqê bistînin, bila ji hev re xizmetê bikin, bila ji Wî zewqê bistînin û bila ji Wî re xizmetê bikin. Wî xwest kû bila jin û mêr, di jiyana xwe ya bi hev re an jî takekesî de, Afirîner — Xwedayê xwe bikin navenda jiyana xwe.

Li cîhana îro, gelek kes bi awayekî trajîk guh nadin plana orîjînal a Xweda ya der heqê zewacê de û haya wan jê tune ka têkiliya navbera mêr û jinê de çawa gava sal derbas dibin, xweştir dibe. Di encama vê guhnedana wan de, di mijara nîşandana têkiliya kû Reb ji serî de ji bo mêr û jin sêwirandiye kû bila dilovan, dilsoz bin, xweparêz nebin û hev û du têxin nav dilê xwe de, serkeftî nabin.

Ji ber kû Afirîner nivîskarê zewaca navbera mêr û jinê

ye, dilê hezkirinê ya Xweda kû pîvana wê ne mimkin e dide hisandin. Armanca Xweda ya bi girêdana zewacê, ev mînak e: Xweda mirovan dawetê wê zewqê dike kû niha û di bêdawiyê de bila bi Wî re bikevin têkiliyeke *ruhî* kû ji têkiliya navbera mêr û jinê nêzîktir û xweştir e.

We bala xwe dayê ka Nivîskarê Zewacê, zewac çawa nîşan da? *"Ji ber vê dê zilam dê û bavê xwe berde û dê **gîrêdayî** jina xwe bibe, dê her du **bibinyek** beden."* Û Nivîsên Pîroz ev zêde dike li ser vê vegotinê: *"Adem jî jina wî jî tazî ne, hê **nedizanîna ka şerm çi ye**."*

Plana Xwedê ya zewac e ew e kû, jin û mêrekî bêyî zanîna şermê di armanca û bedenên xwe de bibin yek. Jê wêdetir, armanca Xwedê ew e kû li asteke ji vê bilindtir, bila mirov heya bêdawiyê, bêyî şermkirinê bi Wî re zewqê bistînin di yekîtiya *ruhî* de.

## Jİ MİROV RE SERWERÎ HAT DAYÎN

Piştî Xweda jin bir cem mêr, rasterast û bi awayekî kesane xîtabê wan kir. Ji ber kû Nivîsên Pîroz behsa *"REB Xwedayê kû li baxçê **dimeşe**"* (Afirîn 3:8) dikin, em fam dikin kû Xweda ji mêr û jinê pêşîn re xwe daye xuyakirin.

Niha em xeyal bikin kû Reb mêr û jina wî biriye ser çiyayekî bilind kû ji wir dikarin li afirîna mezin û xeranebûyî ya Afirînerê binêrin…

> *"Wî ew pîrozandin û got **'berhênandar bibin, zêde bibin'.Rûzemînê tijî bikinû têxin bin venêrîna xwe;** ji masiyên kû di deryayê de ne, çûkên kû li ser ezmanê ne û hemû zindiyên li ser cîhanê ne re **serweriyêbikin**. Va ye ez hemû giyayên kû tov didin, her dara fêkiyê kû tova wê di fêkiya wê de ye, didim we. Dê ev ji we re bibin xwarin."*
> (Afirîn 1:28-29)

Xweda Adem û Hewa[121] û nifşên wan serwer kir li ser Afirînê. Ji wan re wê îmtiyaz û berpirsiyarî da kû "cota destpêk" a nifşa

mirovan bin. Li ser hemû Afirînê *"serwerî"*yê bexşand. *Serwerî* tê wateya *"raye"* û *"venêran (kontrol)"*ê. Dê Adem, Hewa û nifşa wan ji rûzemînê zewqê bistandana, dê xwedî lê derketana û dê ew bi zanatî bi rê ve bibirana. Rûzemîn ji wan re hat dayîn ne kû zerarê bidinê, lê ji bo kû wê bi kar bînin.

Afirîner, ji bo kû bi mirovahiyê re li hev bên afirîn sêwirand. Rûzemîn, di serî de bi her tiştê kû mirov dixwaze û pêdiviya wî pê heye re hevkariyê kir. Adem û Hewa tu car meraq nekirin ka dê xwarinên wan ên din ji kû bên. Tişta kû diviyabû bikirana, destê xwe dirêjî darekê bikin û fêkiya wê jê kin. Westandin, axa bi sitrî û devî, nexweşî û mirin tune bû. Her derê afirînê li ber Adem û Hewa sitûyê xwe xwar kiribû. Mirov serwer bû.

Afirîn dê sitûyê xwe li ber mirov xwar bikira heya kû mirov li ber Afirînerê xwe sitûyê xwe xwar bikira.

## XWEDA Û MİROV Bİ HEV RE

Armanca REB Xweda, ji serî û pê de ew bû kû bila mirov bi Wî re di nav hevpariyeke nêzîk û şêrîn de bijîn. Sedema ka çima Xweda *hiş* û *dil* (jîrahî û hest) da Adem û Hewa kû Wî fam bikin û jê hez bikin û çima azadiya *hilbijartinê* da wan kû bila bixwe biryara pêbawerbûn û îtaatkirina Wî bidin, ev bû. Ji ber kû hezkirina û dilsoziya rastî bi zorî nabe, hêmana hilbijartina yeqîn diviyabû hebûya. Rebê Serwer, dê Adem û Hewa ji ber bijartina wan berpirsiyar bigirta.

Ji kerema xwe re, di vê mijarê de nekevin şaşitiyê: Digel kû pêdiviya Afirîner û Xwedayê gerdûnê bi tu kesî û tu tiştê tune bû, Xwedayekî wisa ye kû dixwaze têkiliyeke kûr çêke.

Çawa kû em dixwazin bên nasîn û hezkirin, bi heman awayî Xweda jî ji hêla mirovên kû ji bo Wî hatine afirandin dixwaze bê naskirin û hezkirin. Daxwaza Wî ya hevaltiyê ya bi kesên kû *di xuyanga xwe de afirandin* re, bi dereceya dilê dixwaze, parçeyeke xwezaya Wî ya bêdawî ye.

Ez dibihîzim kû mirov dibêjin *"Ez evdekî Xweda me û ne ji vê zêdetir im"*. Ez qebûl dikim kû rûmeteke mezin e kû mirov wekî

xizmetkarekî jidil ji bo Xwedayê xwe xizmetê bike, lê vegotinên Nivîsên Pîroz ên der heqê vê mijarê de pir zelal in: Xweda tu car nesêwirand kû mirov bibe *evd*, li dijî vê her tim xwest kû bibe *ewladekî.* (Galatyayî 4:7) *"Xulam ne endamekî domdar a gelê malê ye, lê kûr her tim endamê malê ye."* (Yuhanna 8:35) Xweda daxwaza dilê xwe li gorî mirovteşetiyê (têgînên mirovê) vegotin dike û ji bo kesên kû jê bawer dikin re dibêje ka plana Wî çi ye:

> ***"Ez ê ji we re bibim Bav û hûn bibin keç û n min."***
> (Korintiyên 2., 6:18)

Xweda hezkirina xwe tenê naşibîne ya dê û bavan kû ji zarokên xwe hez dikin, di vê mijarê de mînakeke din dide; şibandina xwe derbasî asteke din dike, kûratiya hezkirina xwe û girêdana hezkirina xwe ya mirovan, bi hezkirina bavekî kû ji bûka xwe re hîs dike, dide berhev.

> *"'Û dê ew roj bê' dibêje Reb, 'Tu yê ji min re bêjî **Mêrê** min, êdî nebêjî Begê min. **Ez ê heta hetayê te wekî hevjina xwe bistînim.** Ez ê bi bingeha rastî, edaletperwerî, evîn û dilovanî bi te re bizewicim. Ez ê bi dilsozî bi te re bizewicim. Û tu yê **Reb nas bikî**.'"* (Hoşea 2:16, 19-20)

Têkiliya her têrker a du ferdan kû li cîhanê dijîn, xeyal bikin û li ser vê mijarê bifikirin: têkiliya kû Xweda em vexwendin kû em bi Wî re biceribînin, ji têkiliya kû dibe kû li cîhanê hebe, bi awayekî bêsînor xweşiktir e.

Kû hûn bi Afirînerê xwe re nekevin têkiliyeke takekesî, dê di jiyana we de kêmasî hebe û hûn ê di jiyana xwe de tişta kû we têr dike nebînin. Mîqdara milkê erdîn, zewq, şahî, prestîj, mirov an jî dua dê têrê nekin kû hûn valahiya canê xwe dagirin. Odeya vala ya kû Reb di dilê we de ji bo xwe sêwirandiye, tenê dikare Ew Bixwe dagire.

***"Ew tîbûna canê dişkîne, canê*** *birçî bi başiyan re dadigire."* (Mezmûr 107:9)

Li vir xaleke heye kû divê em bala xwe bidinê: Xwedayê rast ê Yek, ji *merasîmêndînî* hez nake, lê bi kesên kû jê bawer dikin re *têkiliyeke jidil* dixwaze û ji vê zewqê distîne.

Xweda, bi kesên jêrê kû di astên cuda de ne, ji hevpariyê hez kiriye û dê heta hetayê jê hez bike:

- BI XWE RE. Di bêdawîtiyê de di navbera Bavê Bêdawî,Bêdawî û Ruhê Pîroz ê Bêdawî de evîn û hevparî herikiye. Mînak, Nivîsên Pîroz van gotinên kû Kur ji Bav re gotiye, tomar dikin, *"Bavê min. Te beriya destpêka dinyayê ji min hez kir."* (Yuhanna 17:24)
- BI MILYAKETAN RE. Xweda milyaket afirandin kû Wî nas bikin, ji Wî hez bikin û îhtişama Wî ya kû bi nefsbiçûkî re dagirtiye û dê heta hetayê bidome, teqdîr bikin. *"Bila hemû milyaketên Xwedê Wî biperêsin."* (Îbranî 1:6)
- BI MIROVAN RE. Xweda mirov afirandin kû bila ji Afirînerê xwe ji yê milyaketan zêdetir zewqê bistînin û bila ji yê milyaketan zêdetir xwedî têkiliyeke nêzîk bibin bi Afirînerê xwe re. Em nivîsên Qral Dawud bixwînin:*"Dema ez temaşe ezmana kû berhema destên te ye dikim, û li heyv û stêrkên kû te xistin wir dinêrim, ez ji xwe dipirsim: 'Mirov çi ye kû tu wê bi bîr bînî, an jî beşer çi ye kû tu pê eleqedar bibî?' Te hema hema ew kir Xwedayek, te bilindahî û tacek danî ser serê wî."* (Mezmûr 8:3-5) Xweda xwest kû bi gelê xwe re be. Lê dîsa jî divê ji mirov re ezmûn bê çêkirin.

## ROJA 7: AFİRÎN QEDİYA

Çîroka afirînê bi agahiyeke girîng bi dawî dibe:

*"Xweda li yên kû afirandin, nêrî û dît kû her tişt* ***pirbaş e.*** *Bû êvar, bû sibe û roja şeşemîn pêk hat. Erd û ezman bi hemû unsûrên xwe ve* ***temambûn****. Gava roja heftemîn*

*hat, Xweda karê xwe qedand. Wê rojê bêhna xwe da ji karê xwe."* (Afirîn 1:31; 2:1-2)

Çalakiya Xwedê ya afirînê qediya. Êdî wext bû kû ji her tiştê kû dikir zewqê bistîne. REB, li roja heftemîn bêhna xwe neda ji ber westana xwe. Yê kû Bixwe çêdibe û navê Wî Ez be tu car naweste. Xweda bêhna xwe da –dawiya xebatê anî– lewre çalakiya afirînê **bi dawî bû.**

REB Xweda razî bû.

Her tişt pir baş bû.

Dinyayeke nuwaze xeyal bikin kû tê de du kesên nuwaze yên kû ji wan re îmtiyaza hevaltiya bi Afirînerê wan ê Nuwaze re hatiye dayîn. Rewşa serî ya gerestêrka me ev bû.

Lê belê, mixabin ev rûzemîna kevin îro pir dûrî nuwazebûnê ye. Îro bûye rûzemîneke kû xirabî û bêexlaqî, êş û keder, feqîrtî û birçîtî, nefret û şîdet, nexweşî û mirin tê de cihê xwe girtine.

Çi bû ji dinyaya nuwaze ya Xwedê?

Bersiva vê pirsê beşa din a çîrokê pêk tîne.



# 11

# Destpêka A Xerab

*“Pesna REB bide hey canê min, tu* ***qenciyên*** *Wî ji bîr neke ... Pesna REB bidin, ey hûn,* ***milyaketên Wî …*** *Yên kû* ***peyvên*** *Wî bi cih tînin.Pesna REB bidin ey hûn, hemû* ***artêşaWîyaezmanî*** *... Yên kû* ***daxwaza*** *Wî bi cih tînin. Pesna REB bidin, ey hemû* ***aferîdeyên*** *li wê cihê kû* ***Ew serwere****.* Qral Dawud (Mezmûr 103:2, 20-22)

Beriya kû Xwedê mirov afirandin, hebûnên ruhî yên kû nedihatin hejmartin afirandibûn kû wekî *milyaket* dihatin binavkirin. Milyaket *“Hemû artêşên* ***Wî*** yên ezmanî bûn”, bi armanca ji bo kû Afirîner-Xwedayê xwe heta hetayê nas bikin, bilind bikin, jê zewqê bistînin, jê re xizmetê bikin hatibûn sêwirandin. Xwedê, milyaket ji heywanên kû di bingehê de, bi xweajoya xwe dijîn cudatir afirandin. Xweda bi mirovan re, ji milyaketan re jî mecburiyeta exlaqî ya kû di mijara îtaatkirina Peyva Wî, pêkanîna tiştên kû dixwaze û pesndayîna Wî de li gorî xwe biryar bidin, da wan.

## MİLYAKETÊN DİBİRİQÎ

Hebûna ruhî ya herî xurt kû xwedî îmtiyaza herî mezin e wekî *Lusifer* hat binavkirin, wateya navê wî *“yê dibiriqe”*[122] bû. Ev milyaketê kû bi çirsçirsokî dibiriqî *“di bêqusûriyê de mînak*

*bû, zanatî û bedewiya wî bêkêmasî bû."* (Hezekiel 28:12)

Digel kû Xweda hemû hûrguliyan diyar nekiriye, em dizanin kû xerabî û qusûrî cara yekem bi hebûna vî milyaketê nuwaze ket vê gerdûnê.

Em tiştên kû Xweda der heqê Lusifer de nivisiye bixwînin:

> ***"Tu ji roja kû hatî afirandin heya kû xirabî bi te de xuya bû, bêqusûr bû! …*** *Ji ber bedewiya te dilê te bi fêzê hat pêçandin ... Lewre te ji dilê xwe re wiha got:*
>
> *'Ez ê derkev**im** ser ezmanan,*
> *Ez ê textê xwe ji stêrkên Xweda jortir deyn**im**, Li çiyayên kû Îlah kom bûne,*
> *Ez ê li gopika Safonê rûn**im**.*
> *Ez ê derkev**im** ser ewran.*
> *Ez ê xwe bi Raserê Raseran re wekhev bik**im**' "*
>
> (Hezekiel 28:15,17; Yeşaya 14:13-14)

Li şûna kû pesna Xwedê bide û jê re îtaat bike, Lusifer pênc caran got ***"Ez ê çêkim, ez ê bibim!"*** Lusifer dixwest xwe bi Raserê Raseran re wekhev bikira.

Bedewî û jîrayiya kû jê re hatibû dayîn çavên wî kor kirin û ji bîr kir ka tiştên kû xwediyê ye KÊ da wî. Ev hebûna kû milyaket e, fikirî kû ji Xweda zanatir e û xwe bixwe xapand. Ji artêşa milyaketan xwest kû li şûna Afirînerê wan kû ew tenê layiqê pesndan û perestinê ye, pesna *wî* bidin.

Lusifer di heman demê de ji bo kû tevlî serhildana wî ya li hemberî Xwedê bibin, ji her sêmilyaketan yek ên cinetê îqna kir û tevlî xwe kir.[123] Bi vî awayî, *milyaketê kû dibiriqe* wisa sêwirand kû serweriya Xweda hilweşîne û rûne ser textê cinetê. Guneh ketibû nav gerdûna Xwedê.

## GUNEH ÇÎ YE?

Nivîsên Pîroz gunehê ji me re wiha rave dike.

- *"Yê kû guneh dike,* ***li dijî zagonê tê.****"* (Yuhannayê 1., 3:4)
- *"Her* ***xerabî*** *guneh e."* (Yuhannayê 1., 5:17)

- *“Guneh ew e kû mirov tişta baş bizanibe lê* ***neke****.”* (Yaqûb 4:17)
- *“Guneh hemû* çavbirçîtî *derxistin.”* (Romayî 7:8)
- *“Guneh ji mezinahiya Xweda* ***pêmanmayîn*** *e.”* (Romayî 3:23)

*“Mezinahiya Xwedê”* safîtiya mayinde û nuwazebûna paqij a Xweda dide nîşan. *“Bêpar mayîn”* lêneketina “navenda hedefê” ya kû li ser hedefa rastiya nuwaze ye.

Guneh ew e kû bi xwezaya pîroz û daxwaza Xwedê re lihevhatin, lê di mijara jiyîna wê de serneketîbûn e.

Bi wateya xwe ya xwerû, **guneh**, hebûneke bêdawî ya wekî milyaket an jî mirov, li şûna kû rêya Xwedê bilind bike û bişopîne, xwe bilind dike û *“vegerîna ser rêya xwe”* hildibijêre. (Yeşaya 53:6)

Bêyî Xwedê fikirîn an jî tevgerîn **guneh** e.

Rêya kû Lusîfer û milyaketên kû jê hez dikirin ev bû. Li şûna kû girêdayî afirînerê xwe bibin, di dilê xwe de tevlî fêzê bûn û vegeriyan ser riya xwe.

> *“Reb* ***ji wî kesî kû dilê wî bi fêzê re girêdayîye, dikerixe,*** *bizanibin kû kesên wisa bê ceza namînin.”*
> (Şîretên Silêman 16:5)

*Kerixîn* peyveke xwedî wateyeke pir xurt e; wateyên wekî *“objeyeke nefretê, çalakiyeke kerixîner, pîsîtî an jî putperestî”* dihewîne. Xweda ji fêza egoîstîk nefret dike. Lewre ev guneh e.

Di Huzûra Xwedê de destûra ji gunehê re, rewşeke ji bizava we ya kerixîner a kû hûn li mala xwe cendekê berazekî yê rizî bibînin bêmirztir e. Çawa kû ez dilopeke jehra di nav çaya xwe nikarim qebûl bikim, bi heman awayî Xweda jî qet guneh qebûl nake.

Çima em nikarin li mala xwe cesedeke rizî, bêhngirtî an jî di çaya xwe de dilopeke jehrê qebûl nakin?

Tiştên wisa ne li gorî xwezaya me ye.

Guneh jî ne li gorî xwezaya Xwedê ye; wî qebûl nake.

> *“Ya REB, Xwedayê min ê Pîroz! Ne Tu yî kû ji mêjveyî ve heyî? ... çavên Te ew qas safî ne kû nikarin li xirabiyê binêrin, tu nikarî li neheqiyê bigîrî.”* (Habakkûk 1:12-13)

## ŞEYTAN, CİN Û DOJEH

Ji ber kû Lusîfer xwest bilindahiya Xwedê bidize û karbidestiya Wî bişêlîne, Xweda ew û milyaketên kû xwestin bi wî re bibin ji cihê xwe yê herî bilind der kir. Navê Lusîfer bi Şeytan, Şeytan, ya kû tê wateya *“**dijmin**”* hat guhertin. Di heman demê de wekî Îblîs kû tê wateya *“**tawanker**”* jî tê zanîn. Milyaketên ketî wekî ruhên xirab an jî wekî *cin* têne zanîn; peyva cinê tê wateya *“**yênkûdizanin**”*.

Şeytan û *cinên* wî dizanin ka Xwedê kî ye û li ber Wî diricifin, lê dîsa jî ji destê wan çi tê dikin ji bo kû Wî têk bibin.

Lê belê, wê tu car nekarin zora Wî bibin.

Nivîsên Pîroz, pêş agahiyên kû dibêjin dê di roja kû berê hatiye diyarkirin de Şeytan û cinên Wî bêne avêtin *“Agirêvenamire kû ji bo Îblîs û milyaketên wî hatiye amadekirin”* (Matta 25:41), dihewîne. Ev *“agirê bêdawî”* kû qala wî tê kirin, cihekî rast e kû her tiştên kû bi xwezaya Xwedê re li hev nayên, dê ji hêla Xwedê ve heya bêdawiyê bêne avêtin.

Di Peymana Nû ya Grekî, yek ji navên cihê kû Şeytan û alîgirên wî bêne avêtin *‘gehenna’* ye, bi gelemperî wekî *“cehenem”* tê wergerandin.[124] Yek bi yek wateya vê peyvê *“sergoyek kû dişewite”* ye.

Li Senegalê, nêzî cihê kû min û hevjina min, me zarokên xwe gihandin, sergoyek hebû kû mirov çop û bermayiyên xwe diavêtin. Kesên kû li derdor rûdiniştin ji ber bêhna wê ew dişewitandin, ev jî dibû sedem kû dûyê tund ê kû mirov dixeniqîne derdiket. Mirov tiştên kû bêqîmet didîtin diavêtin nav vî agîrê kû nermenerm dişewitî.

Dojeh (cehenem) cureyeke *‘sergo’* ye kû kesên bi gunehê xwe re dimirin di nav wê de têne sekinandin. Rojekê Şeytan, cinên wî û kesên kû li dojehê dimînin dê li cihê darazê bêne avêtin, yê kû wekî *gola agir û zirnîxê tê binavkirin.*[125]

Dê guneh nekare gerdûna Xwedê heya bêdawiyê qirêj bike.

## ARMANCA ŞEYTÊN

Kû em li Şeytan û cinên wî binêrin, ew hê ne di gola êgir de ne. Li dinyaya me de ne û vala nasekinin. Nivîsên Pîroz, Şeytên wiha diyar dike: *"serwerê hikûmraniya hewayê, ango, ruhê serdest ê kû **niha**li ser mirovên kû bi gurê nakin."* (Efesî 2:2)

Digel hêza Şeytên, girîng e kû mirov fam bike kû ne xwedî *hemû hêzan* e. Ew hebûnekî hatiye afirandin e û ketiye. Şeytan tu car nikare bibe gavberê REB. Şeytên wekî *"xwedayê vê demê"* jî tê binavkirin. Armanca wî ew e kû bi nasîna Xwedê de ji mirovan re bibe asteng û nehêle armanca wan a afirandinê bipejirînin.

> *"Mizginiya (xebera baş a Xwedê ya der heqê rizgariyê de) kû me belav kiriye kû pêçayî ye, ji bo wan kesên kû mehf bûne, pêçayî ye. Ji bo kû roniya Mizginiyê li ser bêîmanan hilneyê, îlahê vê demê hişê wan kor kiriye."*
> (Korintiyên 2., 4:3-4)

Armanca Şeytên çi ye? Ew dixwaze hişê mirovan kor bike û ji mirovan re dibe asteng kû peyamên Xwedê seh nekin û jê bawer nekin. Şeytan di êrîşê de ye bi Xwedê re. Ev êrîşeke wisa ye kû dê Şeytan nekare têk bibe, lê ew dîsa jî çi destê wî tê dike ji bo kû gelek mirovan jî bi xwe re beraliyê mehfbûnê ve bibe. Û hêvî dike kû hûn jî di nav van kesên kû dê mehvbibin, bin.

Ji ber kû Şeytan dizane Adem û Hewa ji bo bilindahî û zewqa Xwedê hatine afirandin, xwest kû hevaltiya navbera Xwedê û mirov de xera bike. REB Xwedayê kû *"nehêniyên dilan dizane"* (Mezmûr 44:21), bêguman plana Şeytên û tiştên kû dikira pêk bihata, dizanîbû.

Plana Xwedê jî hebû.

## YEK FERMAN

Xwedê ew azadî da mirov kû bila hezkirin an nekirin, pesndan an nedan, îtaatkirin an nekirina Xwedê bixwe hilbijêre. Hezkirina rastî bi zorî nabe an jî ji berê de nayê plankirin. Hezkirin hiş, dil

û îradeya yekê werdigîre. Digel rastiya kû Xweda li ser gerdûna kû afirandiye Qralê Serwer e, bi heman awayî rast e kû Xweda mirov berpirsiyar kiriye, ji bo kû der heqê mijarekê kû bandora wê heya bêdawiyê berdewam dike de hilbijartinek bike.

Xweda hê jin neafirandibû, ji mêr re fermanek da. Ji ber kû dê Adem bûya serê nifşa mirov, Xweda ceribandinek danî li ber wî.

> *REB Xweda, ji bo kû xwedî li baxçeyê Aden derkeve û ew biçîne, Adem danî wir. Jê re ferman da 'Li baxçê kîjan fêkîya darê dixwazî, dikarî bixwî.' 'Lê ji dara zanîna başî û xirabiyê nexwe, lewre roja kû tu wan bixwî tu yê teqez bimirî.'* (Afirîn 2:16-17)

Bala xwe bidin fermanên hêsan ên Xwedê. Adem dikarîbû ji xeynî darekê, li baxçê bi awayekî azad ji hemû fêkiyên bitam ên her darekê bixwara. Xweda ji berê de ji Adem re got kû îtaat neke dê çi bibe. *"Kû tu ji wê bixwî* ***tu yê teqez bimirî****."*

Derketina derveyî vê xêzê, dê li *dijî zagonê* bûya; li dijî zagonê hatin, vegotinkirina din a peyva gunehê ye.

Wekî Lusîfer, serîhildana li hemberî REBê gerdûnê, dê bi pirsgirêkên cidî bi dawî bûya.

Mirovê pêşîn, digel kû nuwaze bû, di kamilbûnê de ne nuwaze bû. Bi vê yek fermanê re, ji mirov re ew derfet hatibû dayîn kû bila bi têkiliya xwe ya bi Xwedê re mezin bibe. Xwedê ji Adem xwest kû bila bi dilekî hezkirin û spasdarî jê re îtaat bike. Kû tiştên kû Xwedê ji Adem kirine bê li ber çavan, dê bê bîra mîrov kû îtaatkirina Adem pir hêsan e.

Bifikirin! Xweda ji Adem re beden, can û ruhek dabû. Ji wî re ew berbijariya hisandina xwezaya dilovan û pîroz a Afirînerê wî da û ew bi bereket kir. Ew xist baxçeyeke bihişmet û ji wî re her tişta baş a kû tê bîra mirov da kû jiyana wî kêfxweş û têr bike. Xweda di heman demê de ji wî re azadî û zerengî da kû bila hilbijartinên kû tê de berpirsiyarî hene bipejirîne. Ji Adem re hevsereke şêrîn da û çavdêrî û telbeya dinyaya kû afirand da Adem û hevjina wî. Di nav van de ya herî baş jî ew bû kû REB

Bixwe ji bo kû bi Adem û Hewa re bimeşe û biaxive hat baxçê. Xwedê ji wan re ew derfet da kû bila Afirîner-Xwedayê xwe ji nêzîk de nas bikin. Dinya, dinyayeke nuwaze bû.

Pişre rojekê, mar derket holê.

## "XWEDA Bİ RASTÎ JÎ GOT?"

Di dîroka mirov de bûyera herî trajîk û bandorker di beşa sêyemîn a pirtûka Afirînê de hatiye tomarkirin.

Rojekê gava Hewa û Adem li cem dara qedexekirî sekinîne, Şeytan di şeklê marekî de xuya bû ji wan re. Em dizanin ev mar Şeytan e, lewre piştre Nivîsên Pîroz ew wekî *"Îblîs an jî Şeytan, wî marê kevin kû hemû dinyayê ji rê derxist"* (Wehî 12:9) diyar dike.

Çawa kû planeke Xwedê heye ji bo mirovahiyê, bi heman awayî planeke Şeytên jî heye ji bo mirovahiyê.

> *"Ji heyvanên kûvî yên kû Xweda afirandin, yê herî xasûk mar bû. Mar ji jinê pirs kir: **'Bi rastî jî Xwedêgot** 'Fêkiyên tu darên baxçê nexwin.'?"* (Afirîn 3:1)

Şeytên xwest bi jinê re biaxive, ne bi mêr re. We bihîst tişta pêşîn kû ji Hewa re got çi ye?

> *"Xweda bi rastî jî ... **got?"***

Şeytên xwest kû bila Hewa ji **peyva Xwedê** bawer neke. Armanca wî bû kû bila Hewa zanatî û karbidestiya Xwedê vepirse. Tişta kû wî gava Lusîfer bû kir, xwest bila Hewa jî bike û ji Afirînerê xwe re meydan bike. Şeytan ji wê rojê ve li hemberî rastiyê şer dike, lewre rastî wî biçûk dixe û bêhêz dike. Çawa kû ronî tarîtiyê wenda dike, Peyva Xwedê jî bi heman awayî derewa Şeytên wenda dike.

Şeytan di heman demê de bi teşwîqkirina Hewa kû ji **qenciya Xwedê** bikeve şikê, êrîşê kesayetiya Xwedê jî kir.

> *"Bi rastî jî Xwedê got 'Fêkiyên **tu** darên baxçê nexwin.'?"*

Şeytan bi Adem û Hewa re wisa axivî, çawa kû Xwedayê comerd kû ji wan re jiyan û ji xeynî darekê azadiya xwarina ji fêkiyên hemû daran daye, dixwaze başiya dawînî ji wan texsîr bike. Bi vî awayî peyva Xwedê berevajî kir.

## "HÛN TEQEZ NAMİRİN!"

> *"Jin bersiva mar wiha da, 'Em dikarin ji fêkiyên darên baxçê bixwin". Lê Xweda got 'Fêkiya dara kû li navenda baxçê ye nexwin, naxwe hûn ê bimirin.' Mar got,* ***'Hûn teqez namirin'.*** *Lewre Xweda dizane, kû hûn fêkiya wê darê bixwin dê çavên we vebin, hûn bi zanîna başî û xirabiyê bibin wekî Xweda."* (Afirîn 3:2-5)

Şeytên tenê nedixwest bila Hewa ji peyv û başitiya Xwedê bikeve şikê, armanca wî ew bû kû bila **jirastiya Xwedê** jî biketa şikê; kû Hewa ji fêkiya qedexe bixwara, dixwest bifikire kû dê Xweda bi rastî cezayê mirinê ya kû dê bidaya Hewa, pêk neaniya.

Lê Xweda bi awayekî zelal diyar kiribû:

> *"Roja kû te ew xwar tu yê teqez* ***bimirî****!"* (Afirîn 2:17)

Şeytên bi gotina xwe ya "Hûn teqez **namirin**!", peyva Xwedê înkar kir.

Rêbaza bingeh a Şeytên neguheriye. Dê hê jî peyama Xwedê berevajî û înkar bike. D*ixwaze kû em ji Peyv, başitî û rastiya Xwedê bikevin şikê.*

Şeytan dixwaze em jê bawer bikin kû pêbawerî bi Xwedê nayê û Ew bi rastî ne yekî kû dibêje ye.

## ŞEYTAN PİR OLDAR E

Şeytan ji dînê zêde hez dike. Ji ber vê ye kû îro li ser dinê ji deh hezaran zêdetir dîn hene. Bala xwe bidin ka gava Şeytan ji Hewa re dibêje *"****Xweda dizane****, kû hûn fêkiya darê bixwin dê çavên we vebin"* çawa Peyva Xwedê berevajî dike.

Şeytan pir hez dike kû teqlîda Yê kû Hêza Wî Têra Her Tiştê dike, bike. Pir jêhatî ye gava rastiya Xwedê hildide û bi derewên xwe re tevlihev dike. Teqlîtkarekî kû rêgezên ji hev cuda girêdayî hev dike ye û rûreş e. Di sîstemên baweriyên herî ecêb ên dinyayê de jî der heqê rastiyê de qerîne hene. Ev qerîneyên der heqê rastiyê de ne kû van sîstemên baweriyê têxin wê rewşê kû bawerî pê bê. Wecîzeyeke Ereban ji vê rewşa kû tê qalkirin re dibe mînakeke baş: *“Hişyar bibin: hin derewker rastiyê dibêjin!”*

Şeytên di ceribandina xwe ya destpêkirina dîneke sexte de, ji Hewa re got: *“Hûn ê bi zanîna başî û xirabî re bibin wekî Xweda”*. Şeytên gava ji Hewa re got, *“Hûn ê bibin wekî Xweda”*, derew kirin, lewre yê kû guneh dike ne wekî Xweda ye, wekî Şeytan e kû dixwaze karbidestiya Xweda bi dest bixe. Lê dîsa jî gava Şeytên got *“Hûn ê başî û xirabiyê bizanibin”* rastiyê got, lê ji wan re behsa xemgînî, bêhntengî û mirinê kû dê hevaltiya vê agahiyê bike, nekir.

Bala xwe bidinê kû gava Şeytan behsa Xwedê dike, tenê bi gelemperî peyva *Xwedê* bi kar tîne. Kû hûn wisa têgihijin kû Xweda pir dûr e û nasîna Wî ne mimkin e, baweriya we ya ji yek Xwedê re Şeytên kêfxweş dike.

> *“Tu jê bawer dikî kû Xweda yek e, tu baş dikî. Cin jî ji vê bawer dikin û diricifin!”* (Yaqûb 2:19)

Hemû şeytan û cin monoteîst in kû li ber Yê kû Hêza Wî Têra Her Tiştê Dike diricifin. Ev rastî dê li çend beşên din bi awayekî metelhiştî bê diyarkirin. Şeytan û milyaketên Wî yên ketî dizanin tenê Xwedayekî heye û ji Wî çawa nefret dikin!

Ew naxwazin *hûn* Afirîner-Xwedayê xwe nas bikin, jê hez bikin, Wî biperêsin û jê re îtaat bikin.

## HİLBİJARTİN

Ew dem hatibû kû Adem û Hewa di navbera peyva Xwedayê xwe yê dilovan û ya dijminê xwe yê sereke hilbijartinekê bike.

Formula kû serkeftinê pêk dianî diyar bû: *Baweriya xwe bi zanatiya Afirînerê xwe bîne!* Çi formuleke hêsan! Tişta kû diviyabû Adem û Hewa bikin, bi dubarekirina Peyva nexelitî ya Xweda “Reb ji me re ferman kir kû *“Hûn ê ji dara zanîna başî û xirabiyê nexwin’* bigotana. Em ê fêkiya vê darê nexwin! Xal.”

> *“Jinê dît kû dar xweşik e, fêkiya wê ji bo xwarinê ye û ji bo zanatiyê balkêş e. Fêkî jê kir û xwar. Da mêrê xwe, wî jî xwar.”* (Afirîn 3:6)

Jinê fêkî xwar. Mêr fêkî xwar.

Li şûna kû sitûyê xwe li ber peyv û daxwaza Afirînerê wan ê dilovan û Pîroz bitewînin, sitûyê xwe li ber dijminê Xwedê tewandin. Ketin herêma qedexe û li dijî zagonê derketin.

Çawa kû Adem fêkiya qedexe tam kir, encamên nişkav derketin.

> *“Çavên her duyan jî vebûn. Fam kirin kû tazî ne. Ji ber vê bi pelên hejîran ji xwe re bersing dirûtin. Bi vî awayî, di hênikahiya rojê de dengê REB Xwedayê kû li baxçê dimeşiya bihîstin. Ji Wî reviyan û xwe di nav daran de veşartin.”* (Afirîn 3:7-8)

Bala xwe bidin guherînê. Gava REB hat dîtina wan, li şûna kêfxweşiyê, tirsiyan û fedî kirin.

Ev hebûnên kû bi Xwedê re di têkiliyeke nêzîk de bûn, ji ber çi bibûn kesên kû dixwazin ji Rebê xwe yê dilovan birevin? Çi ji wan re dida fikirîn kû dikarîbûn ji Xwedayê kû dikare her tiştê bibîne, xwe veşêrin? Dê-bavê me yê pêşîn çima hewcedariyek wisa dîtibûn kû bedenên xwe bi pelan bipêçin?

Lewre guneh kiribûn.



# 12

# Zagona Guneh Û Mirinê

*“Her kesê kû gunehdike* ***xulamê gunehê ye****.”*
Îsayê Nasirayî (Yuhanna 8:34)

Adem û Hewa ji Afirîner-Xwedayê xwe re bêîtaetî kiribûn. Wekî Şeytên, wan jî girêdanên xwe yên bi Xwedê re wenda kirin û bûn xulamê gunehê. Wekî zarokên kû li fermana diyar a bavê xwe îtaet nakin, Adem û Hewa jî êdî nexwestin bi Wî Kesî kû ji wan hez dike û bi wan re eleqededar dibe re bibin. Li şûna hestên wan ên zewq û pêbaweriyê niha tirs, qirêjayî û fedî hebû.

*“Bi vî awayî, di hênikahiya rojê de dengê REB Xwedayê kû li baxçê dimeşiya bihîstin. Ji Wî reviyan û xwe di nav daran de veşartin.”* (Afirîn 3:8)

Adem û Hewa niha bi gunehê hatibûn qirêjkirin û guneh bibû sedema wan kû xwe ji Afirîner û Mîrê xwe veşêrin. Wijdanên wan ên kû nû bi dest xistibûn, ji wan re ji navajo hîn kiribû kû di huzûra Xwedayekî pîroz de tenê dikare mirovên pîroz bijîn û bi vî awayî hebûna tegînên başÎ û xirabiyê da zanîn. Adem û Hewa êdî li ber Xwedê safî nebûn û wan ev dizanîbûn. Girêdana nêzîk a navbera Xweda û mirovê de şikest.

Têkilî mir.

## ÇİQLEKÎ ŞİKESTÎ



Rojekê, di bin darekî kû nêzî mizgeftekê bû, min bi çend mêran re suhbetê dikir, suhbet beraliyê guneh û mirinê ve çû.

Min çiqlekî darê şikand û ji wan pirs kir: "Ev çiqil mirî ye an zindî ye?"

Yek ji wan got, "Çiqil dimire".

Yekî din got, "Çiqil mirî ye".

Ez li dijî gotina wî derketim û min got: "Tu çawa dibêjî çiqil şikestî ye? Tu nabînî çi qas şîn e?"

Zilam ev bersiv da: "Wekî zindî xuya dike, lê ji ber kû ji çavkaniya kû jiyana xwe jê distend veqetiya, a rast mirî ye."

Min ji wan re got: "ev gotina te pir rast e. Te bi gotinên xwe re terîfa kû di Nivîsên Pîroz de der heqê MIRINê de tê kirin, got. MIRIN ne wendabûn e; VEQETÎNA ji Çavkaniya Mirinê ye. Ji ber vê gava yekê kû em jê hez dikin dimire, beriya kû bedena wî tê veşartin, em der heqê wî de dibêjin "çû". Ji ber kû em dizanin ruhê wî ji bedena wî veqetiyaye, em bi vî awayî diaxivin. *Mirin* tê wateya *veqetînê.*

Piştre min ji van kesan re behsa fermana kû Xwedê ji Adem re daye, kir. Û min ji wan pirs kir: "Xweda ji Adem re got, kû li hemberî Wî guneh bike dê çi bibe. Xwedê jê re got kû fêkiya qedexe bixwe divê merasîmên dînî bike, dua bike, rojî bigire, dehanî bide û dest bi çûyîna dêr an jî mizgeftekê bike?"

Gotin "Na", "Xweda got dê Adem bimire".

"Rast e. Xweda bi awayekî zelal ev got; dê cezayê gunehê bûya MIRIN. Lê ez ji we dixwazim kû hûn bersiva vê pirsa min bidin: Adem û Hewa piştî kû ji Xwedê re bêîtaetî kirin û fêkiya qedexe xwarin, di heman rojê de mirin?"

"Na!"

“Naxwe, gava Xweda ji Adem re digot, ‘Roja kû tu vê fêkiyê bixwî tu yê teqez bimirî’ mebesta Wî çi bû?”

Min ji vê destpêkê ji wan kesan re terîfa Xwedê ya der heqê mirinê de kir: veqetîneke sêber a kû bi bêîtaetiya mirovan a li hemberî Xwedayê xwe derdikeve.

## VEQETÎNA SÊBER A KÛ GUNEH JÊ RE DİBE SEDEM


### 1. Mirina ruhî: *VEQETÎNA ruh û canê mirov ji Xwedayê xwe*

Adem û Hewa roja yekemîn kû li hemberî Xweda guneh kirin, ji hêla *ruhî mirin.* Têkiliya nêzîk a Adem û Hewa ya bi REBê xwe re, wekî çiqlekî kû ji dara xwe hatiye jêkirin, miribû. Û agahî xirabtir dibin. Her kesê kû ji nifşa Adem û Hewa tên, parçeya vê “çiqla” mirî ya ji hêla ruhî ne.

***“Her kes çawa kû di Adem de dimire …”***

(Korintiyên 1., 15:22)

Digel hînkirina zelal a Nivîsên Pîroz, gelek kesên kû qebûl dikin nifşa mirovan ji Adem hatiye, di heman demê de israr dikin kû bebekên kû nû hatinê dinê bi xwezayeke saf û bêguneh hatine dinyayê. Em li ser çiqlê kû ji darê hatiye jêkirin dîsa bifikirin.



Beşeke darê ye kû jê hatiye veqetîn, lê kîjan beşa çiqlî “mirî ye?” Şûlikên biçûk ên li ser wî jî tê de, çiqil bi temamî mirî ye. Kû ev şûlik û pel bikarîbana biaxivin, belkî dê tiştên mîna

vê bigotana: "Niha bîstek bisekinin! Ne xeletiya me ye kû çiqil ji darê hatiye şikestin! Tişta kû yekî din kiriye li ser me bandorê nake!" dikarin wiha bibêjin, lê a rast ew e kû, tişta yekî din din bandorê li ser wan dike. Bi heman awayî Peyva Xweda dibêje kû hemû nifşa mirov *"di Adem de ye"*. Em her yek parçeyeke heman "çiqlê" kû ji darê veqetiya ye, ne û em êşa encama vê dikişînin. Li we xweş bê neyê gava Adem guneh kir xwe lewitand û rastiyek e kû hemû malbata mirov ji nifşa wî hatiye.

Ava gundê kû ez lê dijîm, ji Çemê Senegalê kû bi kîlometreyan pêş de ye, tê. Li gundê me bîrekê heye lê tu kes nikare ji ava wê vexwe. Ava vê bîrê bixwê ye. Her dewlika avê kû ji vê bîrê tê kişandin, bi xwê qirêj bûye. Dilopeke vê avê jî ne safî ye, her dilopa wê bi xwê qirêj bûye.

Bi heman awayî her kesê kû ji Adem çêbûye, bi gunehê qirêj bûye. Sedema zarokên biçûk jî kû guneh dikin, ev xwezaya bi guneh e. Guneh, parçeyeke xwezaya wan e. Ji bo kû mirov baş û nazik bibe, divê hewldaneke hişmendî û têkoşîn hebe. Lê belê ji bo xweperestî û êşandina mirovan, hewldaneke taybet ne hewce ye. Pêxember Dawud rave dike ka çima em bi xweajo guneh dikin:

> ***"Di nav sûcê de*** *hatim dinyayê,* ***di nav gunehê de*** *bihemle bû diya min."* (Mezmûr 51:5) *"Yên xirab hê* ***di malzaroka diya xwe de*** *derdikevin rê, çawa tê dinê bi derewan ji rê derdikeve."* (Mezmûr 58:3) *"****Hemû*** *ji rê derketin.* ***Hemû*** *xetîş bûn. Kesê kû qenciyê dike* ***tune ye, kesekî jî!****"*
> (Mezmûr 14:3)

Gelê Wolof ê Senegalê, xwedî çend Şîretên xweşik in kû ji hin kesî re di famkirina rastiyê de alîkar bûne. Mînaka yekemîn wiha ye: *"Koremişkekî nifşeke kû nakole naqewimîne."* Bi heman awayî Ademê kû bi gunehê hatiye lewitandin, nikare nifşeke kû guneh nake biqewimîne.

Wecîzeyeke din jî wiha ye: *"Nexweşiyeke şov, xwe bi kesê kû nexweşî pê ve girtiye re bisînor nake."*

Pir xemnak e lê rast e. Wekî qusûreke kû bi zayînê re çêdibe

an jî wekî nexweşiyeke têger, xwezaya biguneh a Adem jî derbasî me û zarokên me bûye.

> *"Guneh **bi rêya mirovekî**, mirin jî bi rêya gunehekê kete dinyayê. Bi vî awayî **mirin** belavî **hemû kesan** bû. Lewre **hemû guneh kirin.**"* (Romayî 5:12)

Bala xwe bidin gotina destpêkê: *"Guneh bi rêya **mirovekî** hat."* Û em li ser gotina dawî bisekinin: *"**Hemûyan** guneh kirin."* Em hemû bi rêya zayîn û çalakiyê re gunehkar in. Em nikarin ji ber gunehên xwe Adem tawanbar bikin.[126]

Nivîsên Pîroz wiha dibêje:

> *"Lê sûcên **we**, **we** ji Xwedayê **we** dûr xist; û ji ber gunehên **we**, we êdî **nema** rûyê Wî dît."* (Yeşaya 59:2)

Gava mirove kî tê wê emrê kû êdî dikare rastî û xeletiyê ji hev veqetîne, Xwedê wî bi gunehên wî berpirsiyar dike.[126] Hemû "çiqlê" mirov ji Afirînerê wî veqetiyaye. Mirov wekî ruhî, *"ji ber sûc û gunehên kû tê de dijî, **mirîye**."* (Efesî 2:1)

## 2. Mirina fîzîkî: *VEQETÎNA ruh û canê mirov ji bedena xwe.*

Gava Adem û Hewa guneh kirin, tenê bi *ruhî* nemirin, di heman demê de bi *fîzîkî* jî dest bi mirinê kirin. Çawa kû pelên çiqlekî şikestî zû bi zû ziwa nabe, bedenên Adem û Hewa jî bi heman awayî roja kû guneh kirin nemirin. Lê dîsa jî bedenên wan, bi mirinê kû dijmineke jê nayê revîn bû, hatibû dagirkirin.

Ji bo Adem, Hewa û nifşên wan, bidestxistina ji hêla mirina fîzîkî li hemanan bû. Yek ji Şîretên Ereban dibêje: *"Mirin li deveyê kû zû diçe, siwar dibe."* Tu kes nikare ji mirinê bireve. Peyva Xwedê jî vê wiha tîne ziman:

> *"Carekê mirin û piştre jî bê darizandin, qedera mirovan e."* (Îbranî 9:27)

### 3. Mirina bêdawî: *VEQETÎNA ruh, can û bedena mirovekî ji Xwedayê xwe heta hetayê.*

Hatiye sêwirandin kû çiqlekî zindî dê pel, kulîlk û fêkî hilgire. Çiqlên mirî tînin cem hev û têne şewitandin. Gava Adem li hemberî Xweda guneh kir, mafê xwe yê îmtiyazê kû ji bo wî hatibû sêwirandin –Bilindkirina Xwedê û heta hetayê bi Wî re jiyîn- bi cezayê re wenda kir. Mirovê kû ji bo kû heya bêdawiyê bijî hatibû afirandin, ji Afirîner-Xwedayê xwe yê bêsînor re bêîtaetî kiribû. Cezayê vê bêîtaetiyê, *hetahetayê* ji Xwedê dûrketin bû.

Kû Reb bi rehma xwe ji bo guneha Adem û Hewa çareseriyek nedîta, gava bedenên Adem û Hewa carekê mirin, dê bi şoka mayîna li "sergo"ya kû ji bo Şeytan û cinên wî hatibû amadekirin, rû bi rû bimaya. Pirtûka Pîroz vê wekî *"mirina duyemîn"* bi nav dike, lewre ev mirin piştî mirina fîzîkî derdikeve holê. Navekî wê yê din jî *"cezayê kû heya bêdawiyê didome"* ye.[127] Fikra cihekî kû dê mirov ji bo maweyeke demborî lê cezayê gunehê xwe bikişînin û dê rojekê jê rizgar bibin, cihekî ye kû mirov bixwe derxistine.

Ger kû *"cezayê kû heya bêdawiyê didome"* neadil an jî bêmantiq xuya dike, sedema wê belkî jî ew e kû di mijara famkirina xwezaya Xweda, erdkêşiya gunehê û têgîna bêdawiyê de neserkeftîbûna me ye.

Piştre em ê li ser safîtiya Xwedê û qirêjiya gunehê bisekinin.

Kû em bêne mijara têgîna bêdawiyê, em dikarin vê îtiraf bikin: peyva *bêdawî*yê bixwe jî ji zerengiya me ya zîhnî zêde ye, lewre çarçoveya referansa me *dem (Zeman)* e.

Di bêdawiyê de *dem* tune ye.

Kû em bifikirin kû dê mirovekî li cehenemê bi milyaran sal derbas bike, dê ev fikra me şaş be. Bêdawî ji salan pêk nayê. Bêdawî, *nihayeke bêdawî ye.* Mirov dema bikevin vê herêma jênerevîn, dê mantiqa wê ya giran fam bikin. Çîroka (Beşa 3.) zilamê dewlemend ê kû diçû cehenemê tê bîra we? Ev zilamê dewlemend hê li wir e.

Xweda, daxwazên kû ji bo Bihuştê pêwîst in, bi awayekî zelal diyar dike:

*"Dê tu tiştên qirêj, kesên kû tiştên pelos û xapînok dikin* ***tucar*** *nekevin wir."* (Wehî 21:27)

Di vê mijarê de dê bi tu tiştê ve neyê berdan. Çawa kû zagonên xwezayî yên Xweda ji bo mirin an jî hişkbûna çiqlekî kû ji darê xwe tê jêkirin, dibe sedem, zagonên ruhî yên Xwedê jî bi heman awayî dixwazin kû guneh bila bi *ruhî, fîzîkî û bi* ***veqetîna*** bêdawî bêne cezakirin.

## GUNEH Û FEDÎ

Niha wext hat kû em vegerin cihê kû me Adem û Hewa herî dawî dîtin – di nav darên baxçê hewl didan kû xwe ji Xwedê veşêrin.

Beriya kû Adem û Hewa guneh kirin, bi bilindahî û nuwazebûna Xwedê hatibûn pêçandin. Di huzûra Afirînerê xwe de yekcar rihet bûn. Lê gava kû zagona Xwedê binpê kirin, xwe bi awayekî din dîtin. Û aciz bûn – sedema acizbûna wan ne tenê tazîbûna wan a fîzîkî bû, di heman demê de ji ber kû haya wan ji tazîbûna *ruhî* jî çêbibû, riheta wan xera bibû.

Adem û Hewa, beriya kû zagonê binpê kirin, xwedî hişmendiya Xwedê bûn û *"qet fedî nedikirin"* (Afirîn 2:25). Niha bi awayekî nexwezayî haya wan ji wan çêbû û li ber Xwedayê Pîroz xwe qirêj hîs kirin. Adem û Hewa bûn tam dijî Afirînerê xwe. Niha pîroz *nebûn.* Êdî nexwestin kû li huzûra saf û biriqî ya Xwedê bibin. Wekî zirqîtikên kû gava ronî dibe, ji bo kû xwe veşêrin bilez direvin, *"li şûna roniyê ji tarîtiyê hez kirin, lewre kirinên wan xirab bûn.* Kesên kû xirabiyê dikin ji roniyê nefret dikin û **ji bo kû kirinên wan dernekevin holê**, *nêzî roniyê nabin.* (Yuhanna 3:19-20)

Adem û Hewa derketin holê û fedî kirin. Wisa hîs kirin kû baxçeyê nuwaze li wan nayê. Gava dengê Xwedê bihîstin, şok bûn. Êdî nexwestin bi Afirînerê xwe yê pîroz û dilovan re bin. Lê digel her tiştê, Ew ji bo kû li wan bigere hat baxçê.

*"Lêgerîn û filitandina yê wenda" parçeyeke xwezaya Xwedê ye.* (Lûka 19:10)

## XWEDAYÊ KÛ LÎ MÎROV DÎGERE

> *"REB Xweda bang li Adem kir, got,* ***'Tu li kû yî?'****. Adem got, 'Dema min li baxçê dengê te bihîst, ez tirsiyam. Lewre ez tazî bûm. Ji ber vê min xwe veşart'. REB Xweda jê pirs kir, 'Kê got kû tu tazî yî? Te ji fêkiya dara kû min got nexwe, xwar?'* (Afirîn 3:9-11)

Bala xwe bidine pirsa yekemîn a tomarkirî ya Xwedê kû ji Adem pirs kir.

***"Tu li kû yî?"***

Xweda bi vê pirsa xwe ya dilovan û kû li dilê mirov rûdine re xwest kû bila haya Adem jê hebe ka guneh ji wî û ji jina wî re çi kiriye. Xweda xwest kû bila binpêkirina zagonê îtiraf bikin. Xwest bila fam bikin kû guneh ketiye navbera wan û REBê wan ê Pîroz.

Sedema vê rewşa wan, ew guneh bû kû kiribûn. Sedema fedîkirin û xweveşartina bin dar û pelên hejîran, gunehên wan bû. Lê Adem û Hewa nedikarîna xwe ji Xwedê veşêrin, ji rastiya Wî û darizandina Wî ya kû her tiştê dizane, nedikarîna birevin.

## HEQÊ GUNEHÊ MÎRÎN E

Gava Xwedê agahiyan dida Adem, henakan nedikir: *"Roja kû tu ji wê bixwî, tu yê teqez* ***bimirî****."* (Afirîn 2:17) Em dizanin, kesên kû di kûrahiya dilê xwe de li hemberî Afirînerê xwe serî hildidin, divê ji Wî veqetin.

Piraniya me ew fîlm temaşe kirine kû tê de "zilamên xirab" dimirin û "zilamên baş" têk dibin. Em ji bo "zilamên xirab" xemgîn dibin? Na, em difikirin kû çi heq kirine wê girtine. Rastiya cidî jî ev e: di çavê Xwedê de hemû nifşa Adem "zilamên xirab in".

> *"****Hemû*** *ji rê derketin,* ***hemû*** *xetîş bûn. Kesê kû qenciyê dike* ***tune ye, kesekî jî!****"* (Mezmûr 14:3)

Li gorî pîvana edaleta Afirînerê, em hemû cezayê mirinê heq dikin. Pirtûka Xwedê vê pîvana edaletê wiha diyar dike:

***"Zagona guneh û mirinê."*** (Romayî 8:2)

*Zagona guneh û mirinê,* dixwaze kû her çalakiya bêîtaetiyê kû li hemberî Xwedê tê kirin, divê cezayê wê veqetîna ji Xwedê be. Awarte tune ye. Guneh mirinê tîne.

Sedema pejirandina Xwedê ya vê zagonê, kesayetiya Wî ya pîroz û dilsoz e. Kalikên me yên pêşîn, bi çalakiya gunehekê re xwe ji qraltiya rastî û jiyan a Xwedê veqetandin û xwe xistin nav qraltiya guneh û mirinê ya Şeytên.

Hema li wir bi ***ruhî***mirin—wekî çiqlekî darê yê jêkirî. Têkiliya wan a bi Xwedê re mir.

Di heman demê de dest bi mirina ***fîzîkî***jî kirin—wekî çiqlekî hişkbûyî. Vegerîna bedena wan a axê, tenê pirsgirêka demê bû.

Ya herî xirab jî ew bû kû REB ji bo guneh û fediya wan çareseriyek nedîta, dê ***hetahetayê*** di şoka mirinê re rû bi rû bimana – di nav agirê bêdawî kû ji bo Şeytan û cinên wî hatibûn amadekirin de, ji Xweda heta hetayê dûr biketana.

Nivîsên Pîroz ev mijar bi awayekî zelal anîn zimên:

*"Yê kû dê* ***bimire****, ew kes e kû* ***gunehkiriye****."* (Hezekiel 18:20)
*"Lewre heqê* ***gunehê mirin*** *e."* (Romayî 6:23)
*"Gava* ***guneh*** *digihîje jî* ***mirinê*** *tîne."* (Yaqûb 1:15)

Xweda mafdar e kû vê rastiya cidî wekî ***zagona*** *guneh û mirinê* bi nav dike. Ev rastiya cidî, ZAGON E.

Divê cezayê gunehê bê bicîhanîn.

Û dê ev ceza bê bicîhanîn.



# 13

# Dilovanî Û Edalet

Mirov dikare çi bike kû
Xwedê nikare bike?
Pirtûka Xwedê bersiva vê mamikê dide:

> *“Xweda ne mirov e kû* ***derewan*** *bike. Ne ji nifşa mirov e kû* ***fikra xwe bi guherîne****. Qey Ew dibêje lê* ***nake****? Soz dide lê pêk nayîne?”* (Hejmartina li Çolê 23:19)

Mirov her roj derewan dikin, fikrên xwe diguherînin û peyvên xwe pêk nayînin. Xweda tiştên wisa nake. Yê kû Bêsînor û Nuwaze ye, li dijî kesayetiya Xwe tevnagere.

> ***“Ew nikare xwe înkar bike.”*** (Timoteosê 2., 2:13)

Min demeke berê ev posteya elektronîk girt:

**Posteya Elektronîk**

Hûn dibêjin kû Xweda li gorî kêfa xwe nikare bibexşîne. Hûn behs dikin kû destên Xwedê ji hêla zagonên wî hatine girêdan. Hûn wiha dinivîsin: “Xweda dikare her tiştê bike, lê nikare xwe înkar bike û nikare guh nede zagonên xwe.” Xwedayê me kû xwedî dilovaniya herî mezin e, çima xwe ji bexşkirina evdên xwe yên dixwazin wan bibexşîne ragire? Çima dilovaniya xwe bi vî awayî bisînor ke? …hûn nabînin ka

> tevgereke wiha ne maqûl e? Ger kû Wî zagonek wisa çekiribe jî, dikarîbû betal bikira, lewre hêza Wî têra her tiştê dike! Xwedayê kû xwedî hêzeke dawînî ye, dê bêmantiq bûya kû me li ser bisînorbûna Wî nîqaşê bikira. Ger kû Wî bixwesta, dê bikarîba me hemûyan biavêta nav agirê cehenemê, lê Ew, Yê dilovan e û her tim dixwaze evdên xwe bibexşîne, wisa kû gava evdên Wî bêne darizandin, bila serkeftî bibin. Xwedê bila ji me hemûyan re bexşandina xwe bibexşîne û roja kû em hemû ji bo darizandinê bêne cem hev, bila li me bê rehmê!

Li beşa dawî, di roniya mijara kû me lê nêrî de, pirsgirêkeke der heqê darizandina wî kesî de heye? Afirînerê me di guhnedana zagonên kû Wî çêkiribûn de û di nelihevhatina Wî ya bi kesayetiya Xwe ya pîroz de, azad e?

## DİLOVANİYA BÊEDALET

Saloneke rûniştinê ya dadgehê bînin li ber çavên xwe.

Dadger li kursiyê rûdine. Li ber wî sûcdarekî heye kû bi şêlankeriya bankayê û bi kûştina mirovekî ya bi awayekî xwînsar disekine. Salon bi şahidan re tijî ye. Jin û malbata wî kesê kû hatiye kûştin û personelê wê bankayê kû hatiye şêlandin jî li salonê ne. Qerebalixeke rojnamevanan jî li wir in kû ji bo nûçeçêkirinê amade ne.

Dê ji vî kujerî re kîjan ceza bê dayîn? Cezayê mirinê? Cezayê hepsê ya heta hetayê ya bêberdan?

Ji her kesê kû li salonê ne dibêjin kû bila rabin li ser piyan.

Dadger, li nav çavên sûcdarî dinêre û wiha dibêje: “Min dît kû di dayîna dehanî de û di duakirina birêkûpêk de tu dilsoz î. Tizbîkişandina te bandorker e. Ji bilî vê, min dît kû tu mîhrîvanekî baş î kû her tim amadeyî ji bo kû xwarina xwe bi biyaniyekî re parve bikî. Pir zor bû kû te xwe ji vê rewşê xilas bikira, ji ber kû tiştên te yên baş ji yên xirab zêdetir in, ez li te tême rehmê. Tu hatî bexşandin û niha dikarî biçî.”

Dadger ji bo bide zanîn kû doz qediyaye, mîrkûta xwe li masê dide.

Salon bi hilmên kesên kû şok bûne û bi xurmîniyên hêrsokî tê dagirtin…

Heya niha senaryoyeke dozê ya wiha nehatiye bihîstîn. Ji bo kû pîvandina sûcdariya yekî bê sembolîzekirin, mêzîneke dikare bê bikaranîn, lê piştî kû ew kes sûcdar tê dîtin, tişta kû êdî divê bê kirin, cezayeke li gorî wî ye. Eleqeya wî bi cezadanê re tune ka yê sûcdar “karên baş” kirine an na. Em hemû vê rastiyê dizanin.

Di vê rewşê de, sîstema “karên baş-karên xirab-jê dibe” tu car li dozên herêmî nayê bikaranîn, mimkin e kû heman sîstema bêedaletî li dadgeha ezmanî ya Xwedê bê bikaranîn?

## DADGERÊ ADİL

Xwedê ne wekî wî dadgerî ye kû me li jorê xeyal kir. *“Dadgerê**adil**”* (Timoteosê 2., 4:8) *yek ji nasnavên Wî ye.* Brahîm Pêxember bi hezaran sal berê ev tişt pirs kir: *“Rebê kû hemû dinyayê didarizîne, ne hewce ye kû **adil** bibe?”* (Afirîn 18:25)

Xweda ji bo kû dilovaniya xwe bide nîşan, tu car edaletê nahêle li aliyekî. Kû vê bike, dê bingeha textê xwe yê adil bixurimîne û dê şana navê xwe yê pîroz bilewitîne.

> *“Textê te **li ser edalet û rastiyê hatiye avakirin; hezkirin û dilsozî** li ber te diçe.”* (Mezmûr 89:14)

Wekî wî hevalî kû posteya elektronîk şandibû, fikirîna Xwedê kû “hêza xwe ya dawînî” ji bo guhnedana zagonên xwe bi kar tîne, tê wê wateyê kû *“Yê Kû Dadgerê Rûzemînê ye”* ji gunehên kû dê darizînê kêmtir adil e.

Digel kû em mirov ji zayînê xwedî hestê edaletê ne, çi ecêb e kû em li ber rastiya zelal a kû Afirînerê me jî xwedî heman hestê edaletê ye li ber xwe didin! Em hemû jî di kûrahiya dilê xwe de dizanin kû dadgerekî kû yê xirab ceza nake ne “baş” e.

Yeremya pêxember wiha nivîsî:

> ***Dilsoziya te mezin e!*** *'Yê kû dikeve para min Reb e' dibêje canê min, 'ji ber vê hêviya min ji Wî heye.'*
> (Zebûr 3:23-24)

Bala xwe bidinê kû pêxember nabêje, "Tişteke mezin e kû tu nikarî ji berê de agahî bidî! an jî, "Çarpînetiya te mezin e!" Me yê ji Xwedayekî wisa xwedî fikrên ecêb an jî bikaprîs çi hêvî bikira? *Dilzosiya* Xwedê mezin e. Gelek kes ên kû hîn bûne wekî *"Dilovan û Mîhrivan"* dengê Xwedê dikin, ji bîr dikin kû Ew di heman demê de *"dilsoz û adil e"* (Yuhannayê 1., 1:9).

Nêrîneke yekalî, der heqê Xwedê de dibe sedema nêrîneke berevajî.

## XWEZAYA BİTEWŞ A XWEDÊ

Kîjan bask pêwîst e ji bo kû çûk bifire? — baskê çep an baskê rast?

Diyar e kû ji bo çûk bifire her du baskên wê jî pêwîst in! Kesekî kû dibêje çûk dikare bi baskekî bifire, guh nade xwezaya çûkan û zagonên wan ên erdkêşî û aerodînamîkê.

Bi heman awayî, kesekî kû qebûl dike Xweda edaletê dihêle li aliyekî û tê rehmê, guh nade xwezaya Xwedê û zagona guneh û mirinê.

*Dilovanî û edaleta* Xwedê her tim di nav ahengeke nuwaze de ne. Qral Dawud wiha nivîsîbû:

> *Ez ê* ***dilovanî*** *û* ***edaleta*** *te bi newayan bi bîr bînim; ez ê pesna te bi îlahiyan bidim, ya REB!* (Mezmûr 101:1)

Dawudê kû hin gunehên kirêt kirine, dizanîbû kû dilovaniya Xwedê heq nake. Di tarîfa dilovaniyê de *heq nekirin* heye.

***Edalet*** girtina cezayê kû em heq dikin, e.

**Dilovanî***,* negirtina cezayê kû em heq dikin, e.

Sedema Dawud kû ji Xwedê re îlahiyên pesndanê dibêje ew e kû, ew dizane Xwedê rêyekê wisa çêdike kû ji gunehkarên kû heq nakin re edaletê nahêle li aliyekî lê li wan tê rehmê.

Bexşandina gunehê, ji Xwedayê me ne mijareke hêsan e. Xwedê tu car gunehkarekî nabexşîne heya kû li gorî sûcê wan, wan nedarizîne û ceza nede. Ger kû yekî neheqiyê li me bike, em dikarin wekî hebûnên mirovî jê re wiha bibêjin:

"Temam. Em ji bîr bikin. Ne hewce ye kû em tiştên qewimîne ew qas mezin bikin." Em dikarin bi qencîkeriya xwe kesekî bi vî awayî bibexşînin, lê Dadgerê kû di pîroziyê de bêsînor e wiha tevnagere.

Dilovaniya Xwedê tu car edaleta Xwedê betal nake. Xweda tu car nabêje, "Ez ji te hez dikim, ji ber vê ez ê gunehên te nedarizînim." Xwedê ji gunehkaran hez dike, lê gunehên wan cuda digire û wan ceza dike.

Ger daxwaza Xwedê ev be, wê demê mimkin e kû li gunehkarên sûcdar bê rehmê?

## EDALET Û DİLOVANÎ

Em rewşa Adem û Hewa dîsa bifikirin.

Ji ber kû *Xweda* ***dilovan û birehm*** *e* nexwest bila Adem û Hewa ji Wî veqetin. Xwest kû bila heta hetayê bi Wî re bijîn û di agirê bêdawî de mehf nebin.

*"Reb… naxwaze bila tu kes mehf bibe."* (Petrûsê 2., 3:9)

Lê belê, ji ber kû Xweda ***rast û adil*** *e* nedikarî guh nedaya gunehên Adem û Hewa. Diviyabû gunehên wan ceza bikira.

*"Çavên Te ew qas safî ne kû nikarin li xirabiyê binêrin."*
(Habaqûq 1:13)

Di vê rewşê de, dê Xwedê çi bikira? Rêyekê hebû kû bila gunehê bêyî cezakirina gunehkarî ceza bikira? Qirêjiya gunehê ji gunehkarî çawa dihat dûrxistin û safîtiya nuwaze çawa ji nû ve dihat restorekirin? Ji bo pirsa Eyûb Pêxember bersiveke têrker heye? *"**Mirov** çawa dikare **mafdar** derkeve li ber Xwedê?* (Eyûb 9:2) Şikir ji Xwedê re kû bersiveke têrker a vê pirsê heye.

Nivîsên Pîroz diyar dikin ka Dadgerê Adil ji bo kû gunehkarên sûcdar ên wekî Adem û Hewa, wekî we û min ***"biedalet fihil bike"*** çi dike (Romayî 3:26). Hûn dizanin Xweda ji bo kû li we bê rehmê, bi edaleta xwe çi dike?

Bersiv li pêşîyê, li benda me ye. Em berdewamê rêwîtiya xwe bikin.

## NE SÛCÊ MİN E

Em niha guh bidin axaftina kû navbera kalikên me yên kû bi gunehê hatine lewitandin û Afirînerê wan ê kû bûye Dadgerê wan, derbas dibe binêrin:

> *"Piştre REB Xweda ji Adem re got 'Tu li kû yî?' Adem got, 'gava min li baxçê dengê te bihîst ez tirsiyam. Lewre ez tazî bûm, ji ber vê min xwe veşart.' REB Xweda got, 'Kê ji te re got tu tazî yî?' Adem bersivand, 'Jina kû te danî cem min, fêkiya darê da min, min jî xwar.' REB Xweda ji jinê pirs kir, 'Ev çi ye te kir?' Jinê, 'Mar ez xapandim, ji ber wê min xwar' got."* (Afirîn 3:9-13)

REB çima ji Adem û Hewa pirsyariyê kir?

Çawa kû dê-bavekî digel kû dizane zarokê wan ê bêîtaet çi kiriye, dîsa jî ji wan dipirse, bi heman awayî Xwedê jî ji Adem û Hewa pirsyariyê kir. Xweda xwest kû bila haya Adem û Hewa ji gunehên wan hebe. Lê digel vê, li şûna kû gunehê xwe îtiraf bikin, hev û du sûcdar kirin.

Adem, Xweda û Hewa sûcdar kirin: *Ne sûcê min e! Sûcê wê jinê ye kû te danî cem min!*

Hewa, mar sûcdar kir: *Mar ez xapandim!*

Adem û Hewa ne robotên hatine programkirî bûn; ji ber kû mirov bûn Xweda ew bi hilbijartina wan sûcdar kir. Kesekî kû diviyabû bihata sûcdarkirin, ew bixwe bûn.

> *"Kesê kû ji rê hatiye derxistin bila nebêje, 'Xweda min ji rê derdixe'. Lewre Xweda ji ber kû bi xirabî ji rê dernakeve, bixwe jî tu kesê ji rê dernaxe. Her kes bi* ***daxwazaxwe*** *tê xapandin û ji rê tê derxistin. Piştre daxwaz bihemle dive û gunehê dizê. Gava* ***guneh*** *mezin dibe wê demê jî* ***mirinê*** *tîne."* (Yaqûb 1:13-15)

Adem û Hewa li şûna kû plana Afirînerê xwe bişopînin, *"daxwazên xwe"* yên kû ew beraliyê ***guneh û mirinê***kirin, şopandin.

Hewa ji hêla Şeytên ve ji rê hat derxistin û *hat xapandin.* Adem jî kû Reb jê re ferman kiribû kû ji dara zanîna başî û xirabiyê nexwe, *bi daxwaza xwe* bêîtaetkirina ji Afirînerê xwe re hilbijartibû.

> *"Yê kû hatibû xapandin* ***ne*** *Adem* ***bû****, jin hate* ***xapandin*** *û sûc kir."* (Timoteosê 1., 2:14)

Ji rê hatin derxistin an jî hatin xapandin, her du jî sûcdar bûn. Lê belê piştî kû Adem fêkiya qedexe xwar, Nivîsên Pîroz ev daxuyanî dan: *"****Piştre çavên her duyan jî*** *vebûn."* (Afirîn 3:7)

Xweda berpirsiyariya derxistina mirov ji qraltiya rastî û jiyanê û xistina serweriya guneh û mirinê neda Hewayê, lê da Adem. Xweda ji Adem re wê îmtiyazê dabû kû bibe serê hemû nifşa mirov, lê ev îmtiyaza mezin bi xwe re berpirisiyariyeke mezin jî dianî.

Guneha Adem me hemûyan lewitand, lê ji hilbijartinên xwe em nikarin wî tawanbar bikin.

> *"Dê* ***her yekê me*** *li ser navê xwe ji Xwedê re hesab bide."* (Romayî 14:12)



# 14

# Lanet

Dema veşartin û mahneyan derbas bibû. Adem rêya xwe hilbijartibû, lê dê encamên vê riyê hilnebijarta. Gava Dadgerê Adil daxuyaniya lanet û encamên kû dê bi gunehên mirov re bihata, bidaya dê hemû afirîn bêdeng bimana.

**MAR**

Reb, destpêkê hukma kû der heqê "*mar"* de daye, da zanîn:

> *"Li ser vê REB Xweda ji mar re got, 'Ji ber vê kirina te tu yê bibî heywanê herî lanetkirî di nav hemû heywanên kedî û kûvî. Tu yê li ser zikê xwe bi erdê re kaş bibî, di hemû jiyana xwe de axê bixwî. Ez ê tu û jinê, nifşa wê û ya te bikim dijmin ji hev re.. dê nifşa wê serê te bipelixîne, tu yê êrîşê pehniya wê bikî."* (Afirîn 3:14-15)

Ev *marê* kû Xweda pê re axivî bû kî bû? Xwedê ji xuşînokekî re hêrs bibû?

Peyvên Xwedê yên Nivîsên Pîroz carinan di nav xwe de bi taybetî di şibandin û pêşdanezanan de peyamên du-ast dihewînin. Ya destpêkê *wateya serkî* ye kû diyar e û ya duyemîn jî *wateya kûr* e kû kêmtir diyar e. Hukma Xwedê kû dide zanîn xwedî dîmeneke du-ast e.

Laneta kû hatiye serê mar **xwedî** du ast e.

## ASTA 1: RAVEKİRİNEKE DOMDAR

REB destpêkê bi lanetkirina mar (hukma der heqê wî de da zanîn), dersa îbretê ya domdar didanî li ber mirovahiyê. Xuşînokê kû Şeytan ji bo xapandina mirovan bi kar anîbû, êdî dê li ser zikê xwe bi erdê re kaş bûya. Dê hemû mar xwedî vê heman taybetiyê bûna. Beriya kû Adem û Hewa guneh kirin, belkî piyên maran jî hebûn wekî xuşînokên din. Heya îro, hatiye dîtin kû li ser hestiyê piyê jor ê hin maran wekî pîton û boxemar, hin parçeyên jêmayî hene.[128]

Guneh, bi heman awayî, ji ber sûc û sûcdariyê jêmayiyan derdixe kû serê wan heta dûredestê dirêj dibe. Sedema *"nalîna hemû afirînê"* (Romayî 8:22), guneh e. Cîhana heywanên bêguneh jî bandor ji gunehê girtiye.

Hilbijartina mirov a der heqê gunehkirinê de wekî ***Ketin*** hatiye binavkirin û ev navekî li cih e.

## ASTA 2.: MEHKÛMİYA KÛ DÊ BÊ SERÊ ŞEYTÊN

Pirtûka Pîroz dide zanîn kû *"Tu peyva pêxemberiya Nivîsên Pîroz ji ber daxwaza mirov nehatine nivîsîn"* (Petrûsê 2., 1:20). Şîroveya Nivîsên Pîroz, Nivîsên Pîroz dike. Daxuyaniyên Xwedê yên der heqê laneta *"mar"* kû di beşa duyemîn de dike, me neçar dike kû em der heqê Nivîsên Pîroz de lêkolînên kûrtir bikin.

> *"Ez ê tu û jinê, nifşa wê û ya te bikim dijmin ji hev re... dê nifşa wê serê te bipelixîne, tu yê êrîşê pehniya wê bikî."*
> (Afirîn 3:15)

Marê kû Xweda pê re diaxive kî ye? Nivîsên Pîroz ji bo vî marî dibêjin milyaketê bifêz yê kû *li erdê dikeve* (Yeşaya 24:12). Ew *"**Marêkevin** ê kû jê re* Îblîs *an jî* Şeytan tê gotin e kû hemû dinyayê xapandiye". (Wehî 12:9)[129]

Mar, ji xeynî Şeytan ne kesekî din bû.

REB li gorî zimanê marekî, hilweşîna Şeytan û yên kû wî dişopînin îlan dikir. Dê di navbera *"**tovê**"* (ezbet) Şeytên û

*“**Tovê**”* (Ezbet) jinê de *“dijmintî”* (dijmintiya kû nikare li hev bê) hebûya. Dê di dawiyê de “Tovê wê” “serê” mar bipelixanda.

Ev hemû gotin dê li gorî lêrastanîna Xwedê pêk bihata.

## DU “TOV”

Mebesta gotinên kû der heqê van du *tovan* de tê kirin, çi ye? Bi gotinên *tovê mar û Tovê jinê* kî tê nîşankirin?

***Tovêmar,*** kesên wekî Şeytên serî hildidin, nîşan dike. Kesên kû derewên Şeytên dişopînin, wekî rûhî, *zarokên îblîs in.*

> *“Hûn ji bavê xwe Îblîs in û hûn dixwazin daxwazên bavê xwe bînin cih. Ew, ji serî de kûjer bû. Girêdayî rastiyê nebû. Lewre di wî de rastî tune ye. Normal e kû derewan dike. Lewre ew derewker e û bavê derewê ye.”*
>
> (Yuhanna 8:44)

Naxwe **Tovêjinê** kî ye?

Ev vegotin têgîneke bêhempa ye. Di temamiya dîroka Pirtûka Pîroz de, nifşa kesekî her tim li jinê nehatiye bar kirin, li mêr hatiye barkirin. Lê belê roja kû guneh kete dinyayê Xweda behsa *ezbeta jinekê* kir.

Çima?

Ev agahiya Xwedê, pêxemberiya yekemîn bû kû Mesîhê kû dê ne ji mêrekî lê ji jinekê bihata dinyayê, nîşan dikir. Rasterast wateya peyva *Mesîh*, *Yê hatiye Meshkirin* an jî *Yê Bijartî* ye. Di temamiya Pirtûka Pîroz de, kesekî gava ji hêla Xweda tê hilbijartin da kû bibe rêberê gel, kesekî rayedar, wekî pêxemberekî, ji ber kû bide nîşan ew ji hêla Xwedê ve ji bo peywireke taybet hatiye hilbijartin, ew mesh dikir (ji serê wî rûn dirijand).[130]

Lê Mesîh dê ji yên din cuda bûya. Dê ew bûya *Yê Meshkirî.* Gava li dîrokê ew dema rast hat, Bijareyê Xwedê dê biketa dinyayê da kû *“yê xwedî hêza mirinê ye, ango îblîs **bêtesîrbike** û yên kû ji ber tirsa mirinê di hemû jiyana xwe de bûne xulam, rizgar bike.”* (Îbranî 2:15)

Xweda roja kû guneh kete nav nifşa mirov, digel kû hemû

Plana xwe diyar nekir, vê pêşagahiya negihiştî ji Adem û Hewa û ji nifşa wan re wekî roniya hêviyê da. Ev wehda pêşîn, bi hejmaran rastiyê dihewîne kû dê pêxemberiyên Xwedê piştre bi awayekî hûrgulî bi pêş ve bibin.[131]

## LANET

Xweda piştî kû bi uslûbeke pûtepêder agahiya pêxemberiya der heqê *Tovê jinê* kû dê serê mar bipelixîne, Adem û Hewayê derbarê hin encamên pratîk ên kû ji ber gunehên wan derketin, agahdar kir. Ev encam bi navê **Lanetê** têne zanîn.

> *"REB Xweda ji jinê re got, 'Dema tu zarok bînî ez ê êşeke zêde bidim te. Tu yê bi êş bînî zarokên xwe. Tu yê mêrê xwe bixwazî, dê ew te bi rê ve bibe..' REB Xweda ji Adem re got, 'Ji ber kû te guh da jina xwe û ji fêkiya dara kû min got nexwe, xwar, ax ji ber te hat lanetkirin. Tu yê di hemû jiyana xwe de bêyî keda xwe nekarî xwarin peyda bikî. Dê ax ji te re stirî û devî bide, tu yê giyayê yawan bixwî. Heya vegerî axê tu yê nanê xwe bi keda serê xwe bi dest bixî, lewre tu ax î. Tu ji axê hatî afirandin û tu yê dîsa* ***vegerîaxê****."* (Afirîn 3:16-19)

Hilbijartina Adem û Hewa ya der heqê serhildana li hemberî Afirînerê xwe, bedêleke ecêb derxist holê.

Dê ji kêfxweşiyên bi xwedîbûna malbatekê re niha zehmetî û êş tevlî bûna. Ax niha li şûna kû bi awayekî xwezayî dexl, fêkî, zebze bide, ji ber kû hatiye lanetkirin, wekî encama vê lanetê dê êdî giyayê yawan, stirî û devî bidaya. Dê li şûna rihetbûn û kêfê, têkoşîn û zehmetî bigirta. Ya kû ji van hemûyan xirabtir ew bû kû, dê emrê mirov ê kû lezelez derbas dibû êdî bi zordestekê kû navê wê *Mirin* e bihata tarîkirin.

Mirov serweriya kû Xwedê dabûyê, wenda kiribû. Guneh lanetê anîbû.

## GELO MİRİN NORMAL E?

Kesên kû guh nadin Nivîsên Pîroz, meyldar in kû bifikirin zehmetî, acizî, wendayî, têkiliyên xirabe, nexweşî, kalbûn û mirin *normal* e. Famkirina rastiya der heqê laneta gunehê de, yek ji mifteyan e kû em fam bikin ka li gerdûna me ya kû dinale çi dibe. Gelek mirovên zîrek, wisa difikirin kû sedema rewşa dilsoj a mirovahiyê delîla tunebûna Xwedê ye. Ji ber kû haya wan ji ketina gunehê ya dinyayê û ji bandorên wê tune ye, bi mantiqeke wisa difikirin.[132]

Li Senegalê mirov carinan (bi piranî li teziyeyan) wiha dibêjin: "Xwedê beriya jiyanê, mirin afirand." Piraniya van kesan, di vê felsefeyê de aramiyê dibînin. Fikreke wiha kû hem mantiqê hem jî mirinê wekî *"dijminê dawî yê divê ji holê bê rakirin"* (Korintiyên 1., 15:26) dibîne, bi Nivîsên Pîroz re li hev nayê.

Xirabî, şîn, zehmetî, acizî û mirin dikare normal xuya bike. Lê unsûren wisa dagirker wekî hucreyên pençeşêrê kû ji bo bedena mirovekî bisihet in, normal in.

Stiriyên dara gulê ya bêhnxweş, keda kû ji bo çinîna mehsûlekê pêwîst e, inyada zarokên biçûk ên şêrîn, mêrekî kû ji jina xwe ya xweşik re nebaş e, êşa kû tevlî mucîzeya zayîna zarokekî dibe, nexweşiyên kû pergala bexşangê ya benedekê wêran dike, zalimtiya kalbûnê, rastiya hişk a mirinê û vegerîna bedena me ya axê — ev ne parçeyeke plana orîjînal a Xwedayê ne.



Xwedê afirandinê wisa nesêwirand kû bila bi xwe re şer bike.

Beriya kû guneh kete dinyayê, mirov li ser afirînê xwedî serweriyê bû. Her tişt li ber Adem û Hewa bi awayekî nuwaze situyê xwe ditewandin. Piştre kalikê me yê pêşîn di rêya guneh û mirinê de meşiya û nifşa mirovan a kû qirêj bû û mir, bi wî re meşiya.

## BANDORÊ Lİ HEMÛ AFİRÎNÊ KIR

Kesekî dikare bibêje, "Lê ev ne adil e, mirovekî çima neçar e ji ber gunehê yekî din biêşe?"

Em her yek hilbijartina xwe bixwe dikin û Xwedê me ji van hilbijartinan berpirsiyar digire, lê di heman demê de rast e kû em li dinyayekê kû hatiye lanetkirin, dijîn. Rastiya li pişta wecîzeya Wolof e zelal e:

*"Nexweşiyeke şov, xwe bi kesê kû nexweşî pê ve girtiye re bisînor nake."*

Xwezaya gunehê jî wiha ye. Jiyan êdî ne adil e. Wekî encama wî yek gunehê Adem, *"hemû afirîn heya niha bi hev re dinalin û êşa zayînê dikêşin."* (Romayî 8:22)

Ji ber laneta gunehê her tişt bandor jê girt.

Agahiya baş ew e kû, Afirînerê me ji serî de xweyî planeke rizgariyê ya wêrek e. Çêkerekî saetê zendê, mekanîzmayek dixe nav saetê û ev saeta zendê dikare wisa bê eyarkirin kû bikaribe li hemberî hêzên kû dema (Zeman) şaş nîşan dide, derkeve. Bi heman awayî Afirînerê gerdûnê jî ji bo kû ji dinyaya xwe re dengeyek çêke, li ber hêza wêranker a Şeytan, guneh û mirinê "mekanîzmayek" ava kir. Xwedê gava ji serî de destûr dida kû guneh bikeve dinyayê, xwedî *armanc*ekê bû kû bikaribe laneta gunehê vegerîne û Lufta xwe nîşanê her kesê kû Jê bawer dikin, bike.

Di destpêka çîroka Xwedê de çawa kû xemgînî, êş û mirin tune ye, di dawiya çîrokê de jî xemgînî, êş û mirin tune bû. Dê rojekê guneh û laneta gunehê bê betalkirin. *"Dê Xwedê ji çavên wan **hemûhêstiranjêbibe**. Dê êdî **mirintunebe**. Dê êdî **ne şîn, ne girîn, ne jî jan** hebe. Lewre pergala berê ji holê rabû… dê êdî **tulanet** nemîne."* (Wehî 21:4; 22:3) Em ê der heqê vê pêşeroja bihişmet de, di dawiya rêwîtiya xwe de agahî bigirin.

## KEREMA XWEDÊ

Piştî kû Adem û Hewa ji dara zanîna başî û xirabiyê xwarin çi kirin, tê bîra we?

Ji bo xwe ji pelên hejîrê rûpişt çêkirin. Ev tevger, pêngava

destpêkê bû ji bo kû mirov guneh û sûcê xwe veşêre. Xweda hewldanên Adem û Hewayê qebûl nekirin. Û ji bo wan Xwedê tiştek kir:

> ***“Reb Xweda ji bo Adem û jina wî ji çermê kinc çêkirin, ew li wan kirin****.”* (Afirîn 3:21)

Xweda ji bo Adem û Hewq kincên kû ji cermên heywanan hatine çêkirin, peyda kirin. Ji bo vê xwîn hate rijandin.

Bînin li ber çavên xwe kû REB du pez an jî heywanên din hilbijartin, ew qurban kirin û piştre ji wan heywanan ji Adem û Hewa re *“kincên çerm”* çêkirin. Xwedê ji wan re dersên girîng didan ka gunehkarên kû ne li gorî xwezaya Wî ya pîroz û li gorî Wî ne çawa bêne qebûlkirin.

Gava Afirîner ji Adem û Hewa re ev kinc peyda kirin, ji wan kesên kû li hemberî Wî serhildanê kiribûn, re Keremê xwe nîşan dida. Qenciya Xwedê heq nekiribûn, lê jixwe wateya keremê ev e: *qenciya**nehatiyeheqkirin***.

***Edalet,*** girtina yê kû me heq kiriye, ye
(=cezayê bêdawî).
***Dilovanî,*** negirtina yê kû me heq kiriye, ye
(= ceza tune ye).
***Kerem,*** **girtina** yê kû me heq nekiriye, ye
(= jiyana bêdawî).

## RASTİYA XWEDÊ

Xweda ji bo Adem û Hewa heywanan kûşt, ji wan xwest kû bila fam bikin kû Ew ne tenê “*Xwedayê qenciyê (kerem) ye”* (Mezmûr 86:15), lê belê *“Xwedayê adil e* (Mezmûr 7:9) jî. Guneh divê bi mirin re bê cezakirin. Bifikirin ka ji hişê Adem û Hewa çi derbas bûye, gava xwîna kû ji van heywanên şêrîn, masûm wekî hilavêtina nebzê herikiye, dîtine. Xwedê mînakeke pir bandorker danîbû li ber Adem û Hewa: *cezayê* gunehê wan *mirin* bû.

Xwedê Bixwe hilbijartibû qurbana pêşîn a kû xwîna wê

herikîbû. Dê bi mîlyonan qurban bihata li dû vê.

Bala xwe bidinê kû dîsa REB e kû çermên heywanan *"li wan dike".* Adem û Hewa hewl dabûn kû gunehên xwe bipêçin, lê ew hewldanên wan Xweda têr nekiribû. Yê çareseriyeke bidîta ji bo pirsgirêkên gunehê, tenê Xwedê bû. Xwedê xwest kû bila Adem û Hewa vê rastiyê fam bikin. Dixwaze em jî heman rastiyê fam bikin.

## GUNEHKAR Jİ BAXÇÊ HATİN DERXİSTİN

Beşa 3. A pirtûka Afirînê bi ayetên li jêrê diqede:

> *"REB Xweda piştre got, 'Adem bi zanîna başî û xirabiyê bû wekî yek ji me. Êdî divê destûr neyê dayîn kû xwe dirêjî dara jiyanê bike, fêkiya wê bixwe bibe nemir.' Bi vî awayî REB Xweda, Adem ji baxçeyê Adenê kû ji bo çinîna wî afirandibû, derxist. Ew der kir. Ji bo venêrîna rêya dara jiyanê jî Keruv* (Milyaketên taybet ên kû li derdora textê ezmanî yê Xwedê) *danîn li rojhilata baxça Adenê û şûrekî bipêt kû li her derê dizivire, danî wir.*
>
> (Afirîn 3:22-24)

Wekî Lusîfer û milyaketên wî kû li hemberî daxwaza Xwedê derketibûn û li gorî daxwaza xwe tevgeriyabûn piştre jî ji ber van gunehên xwe ji Cinetê hatibûn derkirin, Adem û jina wî jî gava li dijî daxwaza Xwedê tevgeriyan, ji cineta erdîn hatin derxistin.

Bi vî awayî, huzûra pîroz a Xwedê û *dara jiyanê (bila bi dara zanîna başî û xirabiyê re neyê tevlihevkirin)* ji mirov re hate qedexekirin. Ber bi dawiya rêwîtiya me ya Nivîsên Pîroz, em ê rastî dîmeneke din a vê dara taybet a Bihuştê bên. Dara jiyanê, ji kesên kû ji Xwedê û Plana Wî bawer dikin re, diyariya jiyana bêdawiyê sembolîze dike.

Adem û Hewa bi xwarina ji dara zanîna başî û xirabiyê, rêya jiyana bêdawî terk kirin û rêya mirina bêdawî pejirandin. Girêdana bikêf a navbera erd û ezmanê ji ber gunehê hate birîn.

Adem û Hewa rastî pirsgirêkeke cidî hatibûn. Em jî wisa.



# 15

# Aciziya Duhêl

Sernivîsa rojnameyeke meha Gulanê ya 2006an ev nûçe dabû:

**Mehkûmekî piştî kû 38 sal revî, dîsa hate girtin.**

Mehkûmekî bi navê Smith kû ji ber şêlankariyê di girtîgehê de bû, di 1968an de ji girtîgeheke kû li Kalîforniya ye revî.

38 sal, bi bikaranîna paşnavê diya xwe, her tim cihê xwe guhert, di dawiyê de biryara xwe da kû li Amerîkaya Navîn, li herêmeke kû li wir darên gur hene, di nav romorkekê de bijî. Rayedar ew li wê herêmê bi dest xistin.

Dedektîfê Buroya Şerîf ê Navçeyê der heqê bûyerê de wiha got: “Demeke kin li erdê nêrî û piştre serê xwe rakir û ji min re wiha got: ‘Erê, ew kesê kû hûn lê digerin, ez im.’ Nefikirîbû kû dê mirov bi demeke ew qas dirêj lê bigeriyana.” [133]

Smith kû nekarî ji hêza biisrar a zagonê bireve, kesekî kû guh nade zagonên Xwedê jî dê nekare ji qada ragihanî ya bêsînor a Zagonkerê Adil û Dadger bireve.

Û niha em binêrin ka kî ye guh nade vê zagonê:

> *“**Her kesî kû guneh kiriye li dijî zagonê hatiye**; lewre guneh li dijhatina zagônê ye.”* (Yuhannayê 1., 3:4)

Her kesî kû li hemberî zagonên nuwaze yên Xweda bêîtaetî kiriye, li hemberî zagonê hatiye. Lusîfer jî wisa kir. Yê kû Adem

û Hewa jî kirin ev bû. Me jî heman tişt kir.

Hemû guneh li hemberî Xwedê ye. Gelek kes gunehên xwe girîng nabînin, lê di çavê Xwedê de hemû gunehkarên kû tobe nekirine û nehatine bexşandin—çi qas baş an jî oldar bibin jî—kesên sûcdar in kû li hemberî zagonê hatine.

## TEMAŞEKARÊN XWEŞBÎN ÊN LEYLANÊ

Demeke berê cîranekî min wiha got: "Ez xweşbîn im; ez bawer im ez ê biçim bihuştê."

Gava wextê darizandinê bê, xweşbînî û hewldanên ciranê min dê bikaribe wî ji cezayê bêdawî xilas bike?

Carekê gava min li Geliyê Mirî yê Kalîforniyayê (yek ji çolên herî germ ên rûzemînê) rêwîtiyê dikir, min li dûr cihekî dît kû dişibiya goleke biriqî, lê gava ez nêzîk bûm "gol" ji ber çav wenda bû. Gava min li pêş nêrî, min cihekî din jî dît kû dişibiya "gol"ê. Lê ev "gol" jî bi heman awayî wenda bû.

Yên kû min dîtin leylan bûn.

Leylanek, bi tîrêjên roniyê kû bi rêya tebeqeyên tîn û siftî ya hewayê dişkên, çêdibin. Gol wekî rast xuya dibûn, lê ne rast bûn. Bi heman awayî, gunehkarekî jî dikare di mijara çûyîna bihuştê de xwe xweşbîn hîs bike, lê Nivîsên Pîroz rastiyê bi awayekî zelal derdixin holê. Nifşa Adem ***"ne xwedî wê hêzê"*** (Romayî 5:6) ye kû xwe ji êgir xilas bike.

Wekî kesekî kû li çolekê qemirî kû hemû ava xwe rijandiye û wenda bûye, mirovahî jî neçar e kû jiyana xwe ya kû ji ber gunehê wenda kiriye bi dest bixe.

> *"Teqez em ê hemû bimirin, em wekî avê ne kû li axê dirije lê car din nikare bê berhevkirin."* (Samuelê 2., 14:14)

Kesê wenda jidil dikare ji wehaya kû dê jiyana wî xilas bike, bawer bike, lê "weha" dibe pelên germ ên kû dibin sedem kû beden zêdetir av kom bike. Kesê neçar û bêav heya bimire nav leylanan de bi zehmetî dimeşe.

Heman rewş ji bo helwesta xweşbînî, jidilî û hewldanên gunehdarekî jî derbasdar e.

> *"Rêyek wisa heye kû ji mirov re **wekî rast (dûz) xuya dibe**, lê dawiya wê **mirin** e."* (Şîretên Silêman 14:12)

Îro li dinyayê bi milyaran kes hewl didin kû bi rewşên xwe yên qirêj ji heq derkevin, *li rêya kû ji wan re rast xuya dike* dimeşin. Merasîmên dînî çêdikin, bi awayekî mekanîk dua ji ber dikin, bi merasîman bedenên xwe paqij dikin, ji hin xwarinan xwe dûr dixin, sedeqe didin, mûmê pêdixin, tizbî dikişînin, rêzikan dubare dikin, û tiştên kû jê bawer dikin "karên baş" in, dikin. Hinekê wan jî bala xwe didin sitûxwarkirina li ber rêberê xwe yê ruhî û hinek jî wisa hêvî dikin kû dê ji bo sedemeke kû dizanin qey pîroz an jî adil e şehîd bibin û dê wê mafê bigirin kû bikevin cinetê.

Gelo mimkin e bi tevgerîna bi vî awayî, li dû leylanekê direvin?

## DER HEQÊ XWEBÛNÊ DE NÊRÎNEKE RAST

Wecîzeyeke Wolofê dibêje, *"Rastî, îsoteke tûj e."*

Digel kû em ji vê aciz dibin, Xwedê der heqê me de rastiya zalim dibêje. Me vedixwîne kû em der heqê gunehên xwe de bi Wî re bi awayekî durist tevbigerin. Kû em ne xwedî jidiliyeke wiha ne, em ê bibin wekî cîranekî kû ez û hevjina min nas dikin, kû nexweşiyeke wî ya cidî heye. Ev cîran nexwest kû bizanibe hewcedariya bijîşkekî baş e û biisrar digot qey dê baş bibe. Çend hefte bi şûn de mir.

Mesîh gava li rûzemînê bû, ji komeke rêberê dînî yên kû ji rastiyên xwe bawer dikirin re got:

> *"Ne yên baş, lê hewcedariya yên nexweş bi hekîmê heye. Ez nehatim kû gazî kesên rast* (kesên kû jê bawer dikin kû têra xwe baş in) *bikim, ez hatim kû gazî gunehkaran bikim."*
> (Markos 2:17)

Digel gotina zelal û net a Nivîsên Pîroz, îro rayedarên gelek dêr, mizgeft û sînagogan ji mirovan re dibêjin divê çi qas bş bibin an jî divê hinek din hewl bidin. Ev rayedar ji mirovan re der heqê rastiya xirabnebûyî ya Xwedê û encama cidî ya gunehê de hewisandin nadin.

Mizgeftekê kû li Kanadayê ye, li afîşa kû li ser deriyê de bû ev peyam dida:

"EM HER KESÎ QEBÛL DİKİN Û Jİ TU
KESÎ RE NABÊJİN GUNEHKAR E"

Xweda li afîşa xwe ya kû danîbû serdestpêka cinetê, peyameke cuda dabû:

*"TİŞTA QİRÊJ DÊ TU CAR NEKEVEVİR"*
(Wehî 21:27)

Nivîsên Pîroz wiha dibêjin: ***"Her kes** guneh kir û ji mezinahiya Xwedê bêpar ma."* (Romayî 3:23) Xwedê *tukesî* li gorî hewldan an jî karên wan qebûl nake û dibêje kû ***her kes*** gunehkar e.

Dê tenê kesên paqij ên kû bikaribin têra pîvana edaleta nuwaze û safîtiya nuwaze ya Xwedê bikin, bikaribin têkevin cinetê.

## DER HEQÊ XWEDA DE NÊRÎNEKE TEQEZ

Ji Yeşaya pêxember re rojekê, bînahiyeke der heqê safîtiya mayinde a Xwedê û mezinahiya Wî ya kû tirseke dide mirov, hat dayîn. Û Yeşaya ev nivîsî:

> *"Sala kû Uziyya mir, min Rebê bilind û bihişmet dît; li textê rûdinişt, pêşa kincê Wî perestgehê dipêça. Li ser Seraf disekinîn; şeş baskên her yek hebûn; bi du heban rûyê xwe, bi du heban piyên xwe dipêçan û du heban jî difiriyan. Ji hev re wiha digotin:* ***"Rebê kû Serwerê Her Tiştê ye pîroz, pîroz, pîroz e!*** *Mezinahiya Wî hemû cîhanê dadigire. Ji dengê Serafan şîpaneyên deriyan*

*hejiyan, perestgeh hemû bû dûman.Min got,* ***'Xwelî li serê min, ez mehf bûm! Lewre ez zilamekî lêvqirêj im. Ez di nav gelekî lêvqirêj dijîm. Digel vê min Qral, Rebê kû Serwerê Her Tiştê ye bi çavên xwe dît."*** (Yeşaya 6:1-5)

Hişmeta bipêt a Xwedê kû textê Wî yê bihuştê dorpêç dike ew qas bilind e kû, milyaketên kû di safîtiyê de nuwaze ne jî rûyê xwe û piyên xwe dipêçin. Ev milyaket, li hemberî pîrozî û bilindiya Xwedê ketine nav tirseke ew qas mezin kû, nikarin di Huzûra Wî de rûnin. Li şûna kû rûnin, li derdora textê Wî difirin û ji hev re wiha dibêjin: *"Rebê kû Serwerê Her Tiştê ye, pîroz, pîroz, pîroz e! Mezinahiya Wî hemû cîhanê dadigire".*

Çima gelek mirov nikarin rûyê rast ê gunehê bibînin?

Sedema vê belkî jî ew e kû tu car nekarîne bibînin ka Xweda Kî ye. Li ser safîtiya Wî kû pêt direşîne, tu car nefikirîne. Yeşaya yek ji pêxemberên Xwedê bû, lê dîsa jî bînahiya kû der heqê bihişmetiya pîroz a Reb de jê re hatiye dayîn, jê re bû sedem kû fam bike ka çi qas qirêj e. *"Xwelî li serê min, ez mehf bûm! Lewre ez zilamekî lêvqirêj im!"*got. Yeşaya dizanîbû kû, bixwe û hemû gelê Îsraîlê kû bi Reb re bihatana hevberkirin, dizanîbû kû rewşeke neçar de ne!

Yeşaya piştre ev nivîsî: ***"Em hemû*** *wekî pezan ji rê derketibûn;* ***her yekê me*** *vegeriya* ***ser riya xwe… em hemû bûn wekî kesên qirêj û hemû karên me yên rast wekî cawa adetê ya qirêj e."*** (Yeşaya 53:6; 64:6) Yeşaya dizanîbû kû xweşûştinên merasîmî û hewldanên mirovan çi qas bibe jî, nikarîbûn li ber Reb safî bibin.[134] Li ber Afirînerê Pîroz ***"em hemû dişibin yên qirêj".***

Eyûb pêxember rewşa vê qirêjiya mirov, bi vê pirsê diyar dike: ***"Li ber Xwedê mirov çawa dikare mafdar bibe?" …****Ez bi gîyayê sabûnê xwe bişom, destên xwe bi ava xweliyê re paqij bikim, tu yê dîsa min binoqînî nav gemariyê, bîzê kincên min jî ji min tê.****"*** (Eyûb 9:2, 30, 31)

Û pêxember Yeremya van peyvên Xwedê nivîsî: *"Tu bi sodaya cilan xwe bişo, gelek ava xweliyê jî bi kar bînî, sûcê te li ber min wekî lekeyek disekine' dibêje REBê Serwer."* (Yeremya 2:22)

Der heqê Xwedê de xwedîbûna nêrîneke teqez, dibe sedem kû em der heqê xwe de xwedî nêrînekê bin. Ger kû fikrên me yên der heqê Afirînerê me de ne teqez e, wê demê tê wateyê kû em ê der heqê xwe de xwedî fikrên bifêz bibin.

Yekî kû li ser wî kincên qirêj û bimîkrop û qerpal heye, dikare xwe paqij û guncaw bibîne, lê ew fikr wî kesî paqij û guncaw nake. Bi heman awayî, gunehkarekî dikare xwe rast bibîne, lê ev fikr nayê wê wateyê kû ew rast e.

Karên me yên herî baş, gava bi hişmet û rastiya Xwedê re tên hevrûkirin, wekî *"cawa adetê ya qirêj e."*

## DERSEKE KÛ DİVÊ HER KES HÎN BIBE

Yek ji armancên Xwedê kû neteweya Îsraîlê afirand ew bû kû ji ***hemû*** neteweyan re hin dersên girîng hîn bike. REB digel kû her tim ji Îsraîlê re dilsoz ma, gelê Îsraîlê her tim Ew îhmal kirin. Xweda dixwaze kû em ji tevgerên Îsraîliyan dersê bigrin. *Ev bûyer ji bo dersdayîna me çêbûn kû em jî wekî wan bêriya ji tiştên xirab nekin."* (Korîntiyên 1., 10:6)

Mûsa di pirtûka duyemîn a Tewratê ya bi navê Ji Misirê Derketin de dinivîse kû Îsraîlî di mijara dîtina gunehê de wekî Xwedê ne bi serkeftî ne. Xwedê bi milên xwe yên xurt ew ji koletiya çarsed salî rizgar kiribûn. Lê dîsa jî der heqê REB û kesayetiya Wî de gelek tiştên kû fam nekiribûn, hebûn. Îsraîlî fikirîn kû ji bo kû ji darizandina Xwedê birevin dê bikarîbûna têra xwe biîtaet bûna.

Ew qas baweriya gelê Îsraîlê ji xwe dihat kû, hemû gel tev de karî ji Mûsa re ev peyv bigota:


*"Em ê **hertiştê** kû REB gotiye, **bikin**."* (Ji Misirê Derketin 19:8)

Xwe wekî neçar û gunehkar nedîtin û tênegihiştin kû daxwaza Xweda rastiya bêqusûr e. Ji bîr kiribûn kû sedema kû Adem û Hewa ji Xwedê veqetandibû tenê gunehekî bû. Ji bo kû gunehê xwe bibînin û ji vê şerm bikin, Xwedê ji Îsraîliyan re ezmûneke kû bi deh xalan pêk tê, çêkir.

Nivîsên Pîroz rave dike ka Reb çawa bi hêz û hişmet daket ser Çiyayê Sînayê. ***“Bû xurmîna ezmanan û birûsk lêdan.*** *Liserçiya* ***ewrekî tarî*** *hebû. Bi vî awayî,* ***dengekî xurt ê boriyê*** *hat.Li artêşgehê her kes* ***ricifî.”*** (Ji Misirê Derketin 19:16) Piştre dengê Xwedê kir gurînî û ev deh xal dane zanîn;

**DEH FERMAN**

1. ***“Dê ji xeynî min Xweda tune be.”*** Ji xeynî REB perestina yekî din guneh e. Guneh e kû em li her dema her rojê ji Xwedê bi dil, hiş û hêza xwe hez nekin. (Ji Misirê Derketin 20) [135]
2. ***“Tu yê pûtekî kû dişibe zindiyê çênekî … tu yê li ber wan xwe netewînî, tu yê wan neperisînî.”*** Ev ferman, bi netewandina li ber pûtekî an jî bi rêzgirtina objeyekê re ne bisînor e. Tiştekî kû dikeve şûna Xwedê, tê wê wateyê kû guh nade vê zagonê.
3. ***“Tu yê belasebeb navê REB Xwedayê xwe tênexî devê xwe.”*** Ger hûn angaşt dikin kû li ber yek Xwedayê rast sitûyê xwe ditewînin, lê hûn naxwazin Wî nas bikin û ji Peyva Wî re îtaet bikin, wê demê tê wê wateyê kû hûn Navê Wî yê pîroz belasebeb dixin devê xwe.



4. ***“Roja Şabatê wekî pîroz bihesibîne û bîne bîra xwe … wê rojê hûn ê tu kar nekin.”*** Xweda ji Îsraîliyan xwest kû, ji bo kû Wî rûmetdar bikin bila roja heftemîn a hefteyê tu kar nekin.
5. ***“Ji dê û bavê xwe re rêz bigire.”*** Îtaeta bêqusûr guneh e. Zarokekî kû ji dê û bavê xwe re rêz negire, an jî li hemberî wan xirab tevbigere, tê wê wateyê kû guh nade vê fermanê.

6. ***“Tu yê tu kesî nekûjî.”*** Xweda di heman demê de dibêje, ***“Yê kû ji birayê xwe nefret dike, mêrkuj e.”*** (Yuhannayê 1., 3:15) Nefretkirin û mêrkûjî heman tişt e. Xwedê li dil dinêre û dixwaze di dil de her tim hezkirineke ne xweparêz hebe.
7. ***“Tu yê zîna nekî.”*** Ev zagon tenê bikaranîna bedenê ya bi awayekî bêexlaqî nîşan nade, di heman demê de daxwazên kû saf in û di zihn û dil de ne vegotin dike. *“Zilamekî kû bi şehwet li jinekê dinêre, di dilê xwe de bi wê jinê re zîna dike.”* (Matta 5:28)
8. ***“Tu yê nedizî.”*** Ji heqê xwe zêdetir stendin, di bêşdayîn an jî ezmûnê de hîle nekirin, an jî ji bo kardarê xwe bi dilsozî nexebitîn, cureyên diziyê ne.
9. ***“Tu yê ji bo cîranê xwe şahidiyeke derewîn nekî.”*** Der heqê yekî an jî tiştekî de, gotina tam ne rast guneh e.
10. ***“Tu yê li tu tiştê cîranê xwe çav bernedî”*** Mirov tişta kû ne aîdê wî ye pir bixwaze guneh e. Divê em bi tiştên kû xwedî ne têr bibin.

## SÛCDAR!

Piştî kû REB ev deh rêzik daxuyan kir, Nivîsên Pîroz wiha rave dikin ka Îsraîlî çawa tirsiyan: *“Gava gel gurminiya ezman, dengê boriyê bihîst û birûsk û dûmana li ser çiya dît,* ***jitirsanricifî û lidûrsekinî****”*(Ji Misirê Derketin 20:18)

Êdî pesna xwe nedidan kû dikarin ***“Her tişta kû Xwedê dibêje”*** bikin.

Ji ezmûnê derbas nebibûn.

Rewş ji bo we çawa ye? We di ezmûnê de çi kir?

Ger we her tim deh rêzikan bêkêmasî nekariye bi cih bînin, (ango îtaeta bêqusûr a kû 24 saetê rojê, 7 rojê heftê, roja kû hûn hatin dinyayê û heya niha) wê demê hûn jî wekî Îsraîliyan û wekî min ji ezmûnê derbas nebûne.

> *"Kesek, kû hemû gotinên zagonê pêk bîne jî, di yek mijarê de jê veqete,* ***li hemberî hemû Zagonê sûcdar*** *dibe."*
> (Yaqûb 2:10)

Di beşa yekemîn a vê pirtûkê kû we xwendiye de, me bala we kêşabû kû Pirtûka Pîroz ne tenê pirtûka kû li cîhanê herî zêde tê firotin e; Pirtûka Pîroz di heman demê de li cîhanê pirtûka herî zêde jê tê revîn e. Yek ji sedemên kû nayê daxwazkirin ev e kû gunehê me derdixe holê û di me de xurûr nahêle. Pirtûka Pîroz der heqê me de wiha dibêje: *"Tu dibêjî 'Ez dewlemend im, dewlemend bûm, pêdiviya min bi tu tiştê tune ye', lê tu nizanî kû tu di rewşeke* ***belengaz, reben, feqîr, kor û tazî yî"*** û dibêje: ***"Li rûzemînê kesekî rast tune ye kû*** *her tim qenciyê dike û tu car gunehnake."* (Wehî 3:17; Waiz 7:20)

Zagona Xwedê me bi me baş hîskirin nade.

## DEH FERMAN Jİ BO Çİ HAT DAYÎN?

Naxwe armanca van fermanan çi ye? Ger tu kes nagihije pîvana Xwedê, çima Xwedê zehmetiya daxuyandina van fermanan kêşa?

Yek ji sedemên diyar ên dayîna van fermanan ev e, Xweda xwest kû ji mirovahiyê re di jiyana wî ya civakê de ji bo kû bigîhije pergalekê, pîvaneke zelal a exlaqê bide. Her şaristaniyê kû der heqê rastî û şaşiyê de wekhev nafikire, dê li hêla anarşî an jî zordestiyê bê kontrolkirin. Xweda dizane kû mirovahî di civakê de hewcedariya rêzika zagonê ye. Lê dîsa jî sedemên ji vê girîngtir hebûn di dayîna Deh Fermana Xwedê de.

Reb, Zagona xwe da, wisa kû,*"bila her dev bê girtin, bila hemû cîhan hesab bide Xwedê. Ji ber vê bi pêkanîna pêwîsitiyên Zagonê, dê li cem Xweda tu kes pak nebe. Lewre* ***bi saya Zagonê guneh bi bîr te."*** (Romayî 3:19-20)

## SÊ ERKÊN DEH FERMANÊ

**1. Zagona Xwedê dengê kesên kû bi rastiya xwe pêbawer in dibire.** *"Bila hemû dev bêne girtin û bila hemû cîhan **sûcê** xwe yê cem Xwedê qebûl bike."* Deh Ferman, ji me re dibêje, "Hûn çi qas bifikirin jî kû hûn pir baş in, hûn ê tu car pîvana rastî ya nuwaze ya Xwedê nekarin bi cih bînin. Hûn ji ber kû guh nadin zagonê, sûcdar in. Dev ji pesndana xwe berdin! [136]

**2. Zagona Xweda gunehê me derdixe holê.** *"Lewre bi saya zagonê guneh **bibîrtê**."* Zagon mîna haceteke rontgenê ye. Radyografî dikare hestiyekî şikestî derxe holê, lê nikare wî baş bike. Bi heman awayî, *"Bi pêkanîna pêwîstiyên zagonê, dê li cem Xweda tu kes pak nebe* (dê bêsûciya wî neyê gotin)." Ji bo kesê kû rûyê wî qirêj e neynik tê çi wateyê, Deh Ferman jî ji bo gunehkarekî tê heman wateyê. Neynik dikare qirêjayiya rûyê mirov bide nîşan, lê nikare wî paqij bike. Zagona Xwedê guneh û qirêjiya me diyar dike, lê nikare van ji me dûr bixe.

Çend sal berê, min li Senegalê ji mamosteyê matematîk ê dibistana Roman Katolîkê re zagona Xwedê rave kir. Mamoste li hemberî vê ravekirinê şok bû. Ji dengê wî diyar bû kû şok bibû û got: "BAŞ E, Deh Ferman dibêje kû em li cem Xwedayê kû pîroz e û Yê kû divê gunehê darizîne neçar û gunehkar in, û ji me re hîn dike kû em ê bi saya karên me yên baş, bi duayên xwe û bi rojiyên kû em digirin nekarin xwe xilas bikin. Naxwe em çawa dikarin li cem Xwedê guncaw BIBIN? Çare çi YE?"

**3. Zagona Xweda ji me re çareseriya Xwedê nîşan dide**. Çawa kû li heman nexweşxaneyê teknîsyenê rontgenê ji nexweşê kû piyê wî şikestiye re navê bijîşkekî pispor yê kû dikare wî hestiyê baş bike, dide, Zagon û Pêxember ji me re yek "Bijîşk"ê kû *"dê bikare me ji laneta Zagonê bifilitîne"*, nîşan didin. Em ê çendek bi şûn de der heqê vê Bijîşkê de zêdetir agahî bigirin.[137]

## HAWAR!

Kû hûn di rewşa xeniqînê de bûna û kesekî kû dikare we xilas bike nêzî wir bûya, hûn ê ji bo kû alîkariya we bike ji bêr

fêza (xurûr) xwe gazî wî nekira?

Ne têkçûnek e hûn têgihijin kû hêza we tune ye kû we ji cezayê mirinê xilas bike; gava pêşîn e kû ji bo serkeftinê tê avêtin. Pêdiviya mirov bi alîkariyê heye—û tenê Xwedê dikare vê alîkariyê pêk bîne.

Belkî we jî ev wecîze bihîstiye: "Xweda ji kesên kû alîkarî Wî dikin re, alîkarî dike." Digel kû ev wecîze dikare li hin cihên jiyanê bê pêkanîn, gava kû rastiya me ya biguneh û mirina me ya ruhî mijara çêlê be, dijî vê wecîzeyê rast e: Xwedê ji wan kesên kû *dizanin nikarin alîkariya xwe bikin* re alîkarî dike.

Xwedê ji wan kesên kû îtîraf dikin pêdiviya wan bi Xelaskerekî heye re alîkarî dike.

Wecîzekeye Afrîkî ya kû pir tê ecibandin wiha dibêje: *"goncikekê gava bi demeke dirêj li ser avê bimîne û şil bibe jî, dê tu car nebe tîmseh."*

Bi heman awayî mirov jî xwezaya xwe ya qirêj nikare biguherîne û nikare xwe rast bike.

## QİRÊJ

Em vegerin û dîsa Adem bifikirin. Xweda ji wî re yek rêzik tenê dabû:

*Ji dara zanîna başî û xirabiyê nexwe!*

Ger kû Adem û Hewa ji Afirînerê xwe re îtaet bikirana, dê bi wî re di têkiliyeke nuwaze de mezin bûna û heta hetayê jiyana xwe domdar bikirana. Lê wisa nebû.

Kalikên me ev rêzik bi cih neanîn û têkiliya wan a bi Xwedê re xira bû. Êdî ji ber kû gunehkar bûn, hewl dan kû xwe ji Xwedê veşêrin. Fedî kirin û tazîbûna xwe bi pelên hejîrê re veşartin. Lê belê Xwedê ew bernedan û da dû wan, ji wan re ji bo demeke kin Dilovanî û Edaleta xwe nîşan da, piştre ew ji Huzûra xwe derxistin. Kû Xwedê di vê mijarê de çareseriyek nedîta, dê heta hetayê ji Huzûra Xwedê dûr biketana. Li ber Afirîner û Dadgerê

xwe yê pîroz qirêj û sûcdar man.

Li vir divê pirseke girîng bê kirin: beriya kû Xweda wan ji Baxçeyê Adenê ya nuwaze derxe, diviyabû Adem û Hewa çend guneh bikirana?

Yek guneh bes bû.

"Qenciyên" wan ên berê an jî hewldanên wan ên paşî, dê nekariya vî gunehê wan ji holê rake.

"Başî" pîvana Xwedê ya *normal*e. Gava Adem guneh kir, li gorî pîvana nirxandina Xwedê êdî ne "baş" bû. Çawa kû yekî dilopeke siyanurê dixe nav îskanekê avê û wê qirêj dike, Adem jî wekî encama yek gunehê qirêj bibû. Ger kû destê we de îskaneke avê ya bijehr hebe, hûn hewl bidin û ava safî li ser zêde bikin, dê jehra wê wenda bibe? Na. Bi heman awayî em çi qas qenciyê bikin jî, em nikarin pirsgîrêka guneha xwe çareser bikin. Û ger kû karên baş bikaribana gunehê dûr bikin, dîsa jî rastiya kû em ne xwedî "ava safî" ne kû li ser xwezaya xwe ya biguneh zêde bikin, ango rastiya nexwedîbûna me ya karên rast dê neguheriya.

Li gorî pîvana nirxandina Xwedê, hewldanên me yên herî baş jî bi qasî şibandina *"cawa adetê ya qirêj"* qirêj in.

Wekî yê Hewa, canê Adem jî bi guneh lewitîbû. Û bi heman awayî canên me jî qirêj in. Em hemû ji heman çavkaniya qirêj tên. Dawud pêxember ji me re hukma Xwedê bi van peyvan dibêje:

> *"REB êdî ji ezmanan li mirovan dinêre ... **Hemû** ji rê derketin, **hemû** xetîş bûn. Kesê kû qenciyê dike **tuneye, kesekîjî**."* (Mezmûr 14:2-3)

## ACİZİYA ME YA DUHÊL

Der heqê zilamekî de kû sed sal berê li girtîgeha Îngîltereyê mehkûmê mirinê bibû, tê qalkirin. Rojekê deriyê hucreya vî mehkûmî bi hejandineke vedibe û gardiyan dikeve hundir:

"Derbasî be! KralÎçe tu bexşandî" dibêje.

Gava zilam hestên xwe qet diyar nake gardiyan metelmayî dibe û diqîre:

“Hey, ji te re dibêjim, derbasî be!” û tomara kû di destan de ye rê wî dide, “Va ye efûnameya te. Qralîçe tu bexşandî!”

Li ser vê zilam êşlika xwe derdixe û girêbaya (tumor) kû li ser bedena wî ye pir xirab xuya dike rê gardiyan dide û dibêje, “Ez ketim nexweşiya pençeşêrê kû dê min di nav çend roj an jî çend hefteyan de bikuje. Ger kû Qralîçe nekare min ji vê nexweşiyê bifilitîne, bexşandina min qet kêrê min nayê.”

Zilam dizanîbû kû ji *bexşandina* sûcên wî, pêdiviya wî zêdetir bi tiştek din hebû; pêdiviya wî, *jiyana nû*bû.

Her endama nifşa Adem, dişibe vî zilamî kû mehkûmî cezayê mirinê bûye.

Em ên kû hem gunehkirinê dipejirînin û hem jî gava hatin dinyayê jixwe gunehkar bûn, bi du zehmetiyan re rû bi rû ne: pêdiviya me hem bi bexşandina sûcên kû me li hemberî Xwedê kirine *hem jî*bijiyana rast û bêdawî kû dê ji me re ji hêla Xwedê ve bê dayîn heye kû dê ji me re şarezatiyê bide da kû em li huzûra Wî ya pîroz bikaribin bijîn.

Aciziya me ya duhêl ev e:

- **GUNEH:** Em *gunehkarên sûcdar in,* Kesekî tenê heye kû bikaribe *me* ji gunehê *paqij bik**e*** û me ji cezayê gunehê kû dê heya bêdawiyê bidome xilas bike, Xwedê ye.

  Pêdiviya me ***bi bexşandina*** *Xwedê* heye.
- **FEDÎ:** Em bi *ruhê tazî ne.*Tenê Xwedê dikare Rastiya xwe li me ke û dikare Jiyana xwe ya Bêdawî bide me.

  Pêdiviya me bi ***nuwazebûna*** *Xwedê*heye.

Ji bo guneh û fediya me pêdiviya me bi şîfayeke duhêl heye kû em nikarin peyda bikin.

Agahiya baş jî ew e kû Xweda vê şîfaya duhêl peyda dike ji me re.



# 16

# Ezbeta Jinekê

Li şeveke mijdar û sar du zarokên biçûk ketin nav çaleke kûr û şemitok. Her du jî birîndar bûn, tirsiyan û neçar man. Ji ber kû di heman rewşê de bûn, nekarîn hev û du xilas bikin. Kû ji derveyî çalê alîkariyek nehata, dê mirinê di demeke kin de ew bi dest xistina. Piştre sê mêr ew zarok dîtin. Yek ji wan bi tayekî daket nav çala tarî, nemdar û zeloq. Zarok ji çalê hatin derxistin.

Rizgariya wan ji jor hat.

Gava Adem û Hewa guneha pêşîn kirin, bûn wekî van her du zarokan. Di mijara derketina ji nav çala gunehê de neçarb bûn. Kû diviyabû ji mirina bêdawî bên xilaskirin, ev rizgarî diviyabû ji bilî nifşa mirov bihata; diviyabû rizgarî ji jor bihata.

Di vê mijarê de nexapin. Rewşa mirov, ew qas cidî ye kû bixwe nikare çareser bike. Bi sedsalan, bêîstisna hemû nifşa Adem—yên kû ji mêr û jinê hatin dinyayê—mîrasa xwezayekê kû ji hêla gunehê ve hatibû girêdan, girt. Hemû di bin laneta gunehê de hatin dinyayê.

Xwedê wisa plan kir kû ji bo kû gunehkaran ji lanet û encama gunehê bifilitîne, Zilamekî bêguneh şand kû kesên kû dixwazin ji çala gunehê derkevin, xilas bike.

Dê Xwedê ev plan çawa pêk bianiya? Dê yekî, bêyî girtina mîrasa xwezaya biguneh a Adem, çawa ji malbata mirov bihata dinyayê? Xweda roja pêşîn a kû guneh tevlî ezbeta mirov bû, der

heqê plana xwe de delîlek da.

REB, “Mar” ango “Şeytên” ji berê de hişyar kir:

> *Ez ê te û jinê, **Ez betawê** û ya te bikim dijmin ji hev re ... dê nifşa wê serê te bipelixîne, tu yê êrîşê pehniya wê bikî.”*
> (Afirîn 3:15)

REB bi bikaranîna *“ezbeta jinê”*,ji berê de agahî dida kû dê rizgarî bi rêya kûrekî kû dê ji jinekê bihata dinyayê pêk bihata û dê Wî gunehkar rizgar bikirana û dê Şeytên bi dawînî bipelixanda û dê xirabî ji holê rakira. Ev pêşagahî, ji sedan pêxemberiyan tenê ya pêşîn bû kû, dê piştre bihata zanîn, û her yek bi zelaliya di dîroka kû dê Xelasker-Mesîh dinyayê ziyaret bikira de, pêk bihata.

## ÇİMA “EZBETA JİNÊ”?

Mesîh dê çima ji ezbeta mirov re wekî ***“ezbeta jinê”*** biketa? Çima diviyabû *ne ji mêrekî, lê **“ji jinekê** bihatadinyayê**”?*** (Galatyayî 4:4)

Bersiva vê pirsê ev e: Xilaskerê gunehkaran dê ezbeta gunehkar a Adem wekî însanekî ziyaret bikira û diviyabû ji derveyî çala gunehê bihata. Dê ji jor daketa jêr.

Xweda der heqê *Ezbetajinekê*de agahiya xwe ya pêşîn daxuyan kir û gelek bi şûn de, pêxember Yeşaya ev nivîsî:

> *“REB bixwe dê ji we re nîşaneyek bide: **Va dê keçik bihemle be û dê Kurekî bîne dinyayê** û dê navê wî bike Immanuel* [tê wateya ‘Xwedê bi me re ye’]” (Yeşaya 7:14)

Xilasker, dê bi rêya malzaroka jineke ciwan a kû bi tu mêrekî re neketiye têkiliya fîzîkî, bihata dinyayê. Bi vî awayî Mesîh, bêyî girtina mîrasa xwezaya biguneh a Adem, dê bikarîba nifşa Adem a ketî ziyaret bike.

Yekî dikare wiha bibêje: “Lê ka bisekine, Jin jî gunehkar in. Gava Mesîh ji jinekê bi awayekî bêhempa bê dinê, dê bi rêya xwezaya biguneh a Diya xwe qirêj nebe?”

Em ê du sê rûpel bi şûn de bibihîzin ka Ruhê Pîroz yê Xwedê Bixwe çawa ev Zarokê pîroz bi awayekî mucîzewî xistiye nav malzarokê. Lê dîsa jî em di plana Xwedê ya kû bêguneh di malzaroka bakîreyekê de bîne dinyayê de, li ser hin unsûrên kû kêmtir diyar in, bisekinin. Mesîh çawa bû kû bi gunehê kû belavî hemû nifşa Adem bûye qirêj nebû û hate dinyayê?

## Bİ GUNEHÊ NELEWİTÎ

Wekî kû em berê jî di beşa 13an de hîn bûn, Xwedê ji berîalîkirina mirovan a serweriya guneh û mirin a Şeytên, *Adem*berpirsiyar kiribû.ya hatibû xapandin Hewa bû, ne Adem. Jin jî wekî mêranbi xwezayeke gunehkar bêne dinyayê jî, Nivîsên Pîroz diyar dikin kû sedema hatina me ya dinyayê ya bi xwezaya gunehê, girêdana me ya bi Adem re ye.[138]

Di Îbrankî de rasterast wateya *Adem (Adamah)* "axa sor" e. Xwedê bedena Adem ji axa erdê pêk anî. Piştî kû Adem guneh kir, Xweda jê re got: ***"Tu ax î û tu yê dîsa vegerî axê."*** (Afirîn 3:19)

Li dijî vê, *Hewa* tê wateya "jiyan"ê, lewre ***"ew diya hemû mirovan bû."*** (Afirîn 3:20) Roja kû guneh kete nav dinyayê, Xweda plana xwe ya der heqê çareserkirina pirsgirêka me ya gunehê û bi rêya *"ezbeta **jinê"*** (Afirîn 3:15) kû dê ji dinyayê re jiyana bêdawî bîne, diyar kir.

Dê Mesîh bi bedeneke kû ji goşt û xwînê pêk tê bihata niximandin, lê dê ji nifşa Adem a kû tevlî gunehê bûye, nehata. Dê ew bi gunehê nehata lewitandin.

Ez dixwazim bi ser de zêde bikim kû, yekcar li gorî nêrîneke biyolojîk, îro zayenda zarokekî ne bi "tov"ê (bizrê zarok) diya wî, lê bi "tov"ê (sperm) bavê wî diyar dibe. Di heman demê de em dizanin kû bebekî kû di malzaroka diya xwe de ber girtiye, xwedî pergaleke xwîngerînê ya cuda ye ji ya diya xwe. Zanista tibî ji me re ev daxuyanî dide: "Plasenta, gava dihêle xwarin û oksîjen derbasî embriyoyê bibin, di heman demê de astengeke bêhempa jî çêdike kû bila xwîna dayîkê ji ya embriyoyê cuda bê girtin."[139]

Xweda hê mirovê pêşîn neafirandibû, hemû hurgûliyên hatina Mesîn a dinyayê plan kiribû.



Mînaka çiqlê kû ji darê hatibû birîn bînin bîra xwe. Mîna vî çiqlê mirî yê ji darê veqetiyaye, malbata mirov jî ji ber kû ji Çavkaniya Jiyanê veqetiyaye, bi ruhî mirî ye. Xilaskerê gunehkaran jî, digel kû dê di nav malbata Adem ya kû bi ruhî miriye û bi gunehê hatiye lewitandin de bijî, dê ji vê malbatê nehata. Dê Ew Çavkaniya Jiyanê bûya *"mêwa rastî"* (Yuhanna 15:1)

Dê ew *nuwaze* bûya.

"Nuwazebûna" Wî nedihat wê wateyê kû dê li ser bedena Wî tu car pizrik, birîn an jî xêzik tune bûya. Dê xwedî xwezaya bêguneh bûya. Dê Zagona Xwedê tu car binpê nekira. Dê Ew bûya *"pîroz, bêsûc, paqij, ji gunehanveqetiyaye, ji ezmanan zêdetir bilind bûye"* (Îbranî 7:26)

Binavkirina Mesîhê bêguneh a wekî *"mirovê **duyemîn"*** û *"Ademê **dawî"*** dibe kû surprîz be?

## MİROVÊ DUYEMÎN

> *"Wiha hatiye nivîsîn: **Mirovê pêşîn Adem** bû canê zînde. **Ademêdawî** jî bû ruhê kû jiyan dide. Destpêkê yê ruhî nehat, yê xwezayî hat. **Mirovêpêşîn** ji erdê ye, ango ji axê ye. **Mirovê duyemîn** ji ezmanê ye."* (Korîntiyên 1., 15:45-47)

*"Mirovê pêşîn"*çawa kû hemû serjimara mirov beraliyê wirêjayî û qraltiya tarî ya mirinê kir, bi heman awayî *"mirovê duyemîn"*jî dê gelek mirov ji qraltiya Şeytên derxistana û wan ber bi rastiya Xweda û qraltiya bihişmet a jiyana Wî ve bibirana. REB, ji ber vê roja kû nifşa mirov lewitî, bi Şeytên dabû zanîn kû dê rojek Ezbetekî jinê bê dinyayê ji bo kû wî birîndar bike û serê wî yekcar bipelixîne.

Pêxember Mîka der heqê Xilasker ê kû tê wehd kirin de nivîsî:

> *"Lê tu, ya* **Beytlehem** *Efrata, digel kû tu nav ezbeta Yahuda de negirîng î, yê kû Îsraîlê bi navê min bi rê ve bibe, dê ji te derkeve,* ***koka Wî digihije ezelî û destpêka zemanê…*** *dê hemû cîhan mezinahiya Wî qebûl bike, dê ew silametiyê bîne ji gelê xwe re."* (Mîka 5:2,4-5)

Mîka ji berê de tenê agahiya Mesîh a kû dê li bajarê *"Beytlehem"* ê[140] bê dinyayê neda, di heman demê de hebûna Xilasker jî wekî *"ezelî, ji destpêka demê"*diyar kir.

Yê Ezelî û Bêdawî, dê ji bêdawîyê derketa û têketa nav demê.

## Jİ HÊLA PÊXEMBERAN VE Jİ BERÊ DE HAT AGAHDARKİRİN

Pêxemberên kû didin zanîn dê Mesîh li bajarê Beytlehemê, ji bakîreyekê bê dinyayê, di heman demê de ji nûçevanekî kû dê hatina Wî ji berê de bidaya zanîn, qal kirin. Pêxember behs kirin kû dê Bijareyê Xwedê bi nasnavên *Xwedê* û *Kurê mirov* bihata zanîn. Pêxember ji berê de dan zanîn kû dê ew wisa bike kû dê kor bibînin, ker bibihîzin û seqet bimeşin. Dê siwarî kerekî biba û têketa Yeruşalimê û dê ji hêla gelê xwe bihata redkirin. Dê tinazên xwe pê bikirana, tû bikirana bi ser Wî de, dê Wî şelaq bikirana û dê Wî li çarmixê bixistana. Dê tu gunehê Wî tunebûya, lê dê ji bo gunehê yên din bimiraya. Dê li gora zilamekî dewlemend bihata veşartin, lê dê bedena Wî ya mirî neriziya. Li dijî vê, dê mirin têk bibira, vejîna xwe rê bida û dê vegeriya ezmanên kû jê hatibû.[141]

Di dîrokê de yê kû hatiye nivîsîn û li gorî vê profîlê ye, kî ye?

Heman Kes salnameya dinyayê kir du beş.

Navê vî Kesî Îsa ye.

## XWEDA SOZÊ XWE DİGİRE

Xweda wehd kir kû dê Xelasker bi rêya malbata Birahîm, Îshaq, Yaqûb, Dawud û Silêman bişanda dinyayê. Mizgîniya Matta kû pirtûka pêşîn a Peymana Nû (Încîl) ye, bi van peyvan dest pê dike:

> ***"Tomara ezbeta Îsa Mesîhê Birahîm, Dawud wiha ye**: Birahîm bavê Îshaq bû, Îshaq bavê Yaqûb bû, û Yaqûb bavê Yahuda bû…"*

Berdewama van rêzikan lîsteyeke dirêj a ezbetê pêk tîne; lîste cih dide gotina *"Qral Dawud bavê Silêman bû"* jî û bi van rêzikan bi dawî dibe: *"Yaqûb bavê Yusufê mêrê Meryem bû, ji Meryem Îsayê kû wekî Mesîh tê zanîn, çêbû."* (Matta 1:1-2, 16). Peyva *Hristo* ya Grekî, beramberê peyva Mesîh a Îbrankî ye û tê wateya *Yê Meshkirî (Yê Bijartî).*[142] Ev secere mafê zagonî yê Îsa yê kû xwedî textê Qral Dawud e, tomar dike û dide nîşan kû Îsa ji ezbeta Brahîm, Îshaq û Yaqûb hatiye. Xweda soz dabû kû dê bi rêya vê ezbetê Bereketên xwe bidaya hemû mirovên li cîhanê.

Dema pêkanîna plana Xwedê ya rizgariyê hatibû: *"Xweda vê Mizgîniya der heqê Xwe Rebê me Îsa Mesîh de, di Nivîsên Pîroz de bi rêya pêxemberên xwe wehd kir…"* (Romayî 1:2)

## YÊ HERÎ BİLİND

Beşa yekemîn a Lûka, çîroka balkêş a milyaket Cebraîl a kû Zekeriya ziyaret kiribû, dinivîse; Zekeriya li perestgeha Yeruşalimê de kahîniyê dikir. Zekeriya û jina wî Elizabet, digel kalbûna xwe kû nedikarîn zarok çêkin, Cebraîl ji Zekeriya re ragihand kû dê kurekî jina wî çêbe, û got divê navê wî bike Yahya. Ev kesê bi navê Yahya, dê bûya nûçevanê Mesîh.

Ev rêzikên bûyeran, piştre bi ziyaretkirina Cebraîl a keçeke ciwan a bi navê Meryem, berdewam dike:

> *"Xweda milyaket Cebraîl şand bajarekî bi navê Nasira. Ew şand cem keçekê kû bi zilamekî bi navê Yusuf re destgirtî ye, ê kû ji ezbeta Dawud e. Navê keçikê Meryem bû. Milyaketê kû çû cem wê, 'Selam, ya keçika kû gihiştiye kerema Xwedê! Reb bi te re ye' got.*
>
> *Meryem bi van gotinan metelhiştî ma, fikirî ka wateya vê silavê çi bû. Lê milyaket jê re got, 'Netirse*

*Meryem. Tu gihaştî kerema Xwedê. Binêre,* ***tu yê bihemle bibî, kurekî bînî dinyayê û navê wî Îsa danî.*** *Ew ê mezin bibe, dê ji wî re bibêjin* ***'Mezinê Mezinan'****.*

*Reb Xweda dê jê re textê Dawud bide. Dê ew jî heta hetayê li ser ezbeta Yaqûb serweriyê bike, dê dawiya serweriyê neyê.'*

*Meryem ji milyaket pirs kir,* ***'Ev çawa dibe? Ez bi zilamekî re nebûm!'*** *Milyaket ev bersiv da:* ***'Dê Ruhê Pîroz bê ser te, dê hêza Mezinê Mezinan bibe sî ji te re. Ji ber vê dê ji yê kû bê dinyayê re bibêjin pîroz û Xwedê … lewre tu tişt tune ye kû Xweda nekare bike."***

(Lûka 1:26-37)

## RİZGARKERÊ GUNEHKARAN

Çend meh bi şûn de Yusûf hîn bû kû destgirtiya wî Meryem bihemle ye. Û ket wê xeletiyê kû fikirî Meryem ne dilsoz e. Biryara xwe da kû bêhis ji Meryem veqete.

*"Ji ber kû Yusûf zilamekî rast bû, nexwest wê li ber her kesî bixe şermê, ji ber vê nêta wî ew bû kû bi awayekî bêhis jê veqete. Li ser fikra wî, milyaketekî Reb di xewna wî de xuya bû û got: 'Yusûfê Dawud, ji stendina Meryem wekî hevjina xwe netirse, lewre yê kû di malzaroka wî de çêdibe ji Ruhê Pîroz e. Dê Meryem kurekî bîne.* ***Tu yê navê wî bikî Îsa. Lewre dê Ew gelê te ji gunehan rizgar bike."***

(Matta 1:19-21)

Wekî kû di beşa yekemîn a pirtûka Afirînê de hatiye daxuyankirin, *Ruhê Pîroz* Xweda Bixwe ye.[143] Yê kû *Peyva xwe ya Bêdawî* bi awayekî serxwezayî xistiye malzaroka Meryem, *Xweda* ye.

Peyva ***JESUS*** a Îngîlîzî, bermaberê peyva *IESOUS* a Grekî ye û ji peyva Îbrankî ya *YEOŞUA*ya bi awayî kûrt a *YEŞU*tê.

Ev nav tê wateya ***REB xelas dike***.

*“Ev hemû ji bo kû ev peyva Reb ya bi rêya pêxemberan ragihand* ***pêk bê****, çêbûn: ‘Va ye, dê keçik bihemle be û kûrekî bîne dinyayê; dê navê wî İmmanel deynin.’ Wateya İmmanuelê,* ***Xweda bi me re ye****, ye.*

*Dema Yusuf şiyar bû guh da fermana milyaket û Meryem wekî hevjina xwe anî cem xwe. Lê heya kû xwe bîne dinyayê, Yusûf destê xwe nedayê. Navê hate dinyayê ÎSA danî.”* (Matta 1:22-25)

## PEYVA XWEDÊ YA PÊKHATÎ

Xweda roja kû guneh kete nava dinyayê, Plana xwe ya kû daxuyan dikir, pêk dianî. *“Ezbeta Jinê”*dikir bihata dinyayê!

Me çend rûpel berê pêxemberiya Mika ya der heqê Mesîh de kû dê li kû bê dinyayê, xwend. REB ji berê de got dê li ***Beytlehem***ê bê dinyayê — Beytlehem, bajarê Qral Dawud ê kû lê hatibû dinyayê, bû.

Lê pirsgirêkek hebû.

Meryem û Yusûf li Nasirayê dijiyan û ji bajarê Nasirayê heya Beytlehemê diviyabû çend rojan rêwîtî bihata kirin.

Dê pêxemberiya Mika çawa pêk bihata?

Ev rewş tu pirsgirêk dernedixist.

Xweda ji bo kû alîkariya pêkhatina vê pêxemberiyê bike, dê Împaratoriya Romayê lebitanda.

*“Li wan rojan, Sezar Avgustus fermanek derxist kû bila li cîhana Romayê hejmartina gelhe bê kirin. Hejmartina pêşîn li dema Kirinius a kû wê demê parêzgarê Surî bû, hat çêkirin. Her kes ji bo nivîsînê çû bajarê xwe.*

*Bi vî awayî, ji ber kû Yusuf jî ji nifşa Dawud û ji neviyên wî bû, ji bajarê Nasira yê Celîlêyê çû herêma Yahudiyan, û çû bajarê Dawut Beytlehemê. Li wir dê bi destgirtiya xwe ya bihemle, Meryem, re bihata nivîsîn. gava ew li wir bûn dema zayîna Meryemê hat û* ***xwe***

> ***yê yekemîn** anî dinyayê. Ew xist nav qûndaxê û li afirê razand. Lewre li qonaxê cih tune bû.”* (Lûka 2:1-7)

Mesîhê wehdkirî, li şûna kû li qesreke rihet û bihişmet bê dinyayê, li bereqeyeke zelane hate dinyayê û li afirekî heywanan hat razandin. Sedema zayîna wî ya li cihekî wiha ew bû kû bila kesên herî feqîr û ji rêzê jî bêtirs bêne cem Wî.

## DAXUYANA MİLYAKETÊ

> *“Li heman herêmê, ji bo kû li cem garanên xwe nobetê bigirin, şivanên kû şeva xwe li guherê derbas dikirin, hebûn. Milyaketekî Reb li wan xuya bû û **hişmeta Reb derdora wan ronî kir**. Pir tirsiyan. Milyaket gote wan, **“Netirsin!”. ‘Ez mizginiya agahiyekê didim we kû dê hemû gel pir şa be: îro li bajarê Dawud Xelaskerekî hat dinyayê ji bo we. Ev Mesîh e kû Reb e.”** Va ye ji we re nîşaneyek: Hûn ê li afirê bebekekî kû bi qundaxê hatiye pêçandin bibînin.*
>
> *Ji nişka ve li cem milyaket komeke kû ji artêşên ezmanî pêk tên, xuya kirin. Bi pesndayîna Xweda, **“Li herî bilindiyê, bila ji Xwedê re îzet bibe, bila li rûzemînê ji mirovên kû Wî kêfxweş kirin, sihetî bibe!’** gotin.*
>
> (Lûka 2:8-14)

Di dîroka cîhanê de demeke pir girîng bû.
Berbendiya dirêj bi dawî bibû.

*“û Meryem **xwe** yê yekemîn anî dinyayê ...”* (Lûka 2:7)[144]
Ezbeta jinê hatibû. Her tişt wekî gotina pêxemberan, li gorî plan û dema Xwedê bêqusûr pêk dihatin.[145]

Xweda, ji bo daxuyanîn û pîrozbahiya zayîna Îsa tenê milyaket neşandin, di heman demê de ji bo rûmetkirina vê bûyera kêfxweş, bişev stêrkek taybet jî danî ser esmên. Komeke stêrzan a kû ji rojhilatê hatibûn û mirovên zana li çavnêriya vê stêrkê kirin û ew şopandin. Ji Îrana kevin a pir dûr hatibûn û rêwîtiyeke

westîner bû; ev mirovên bijare çûn cem Qral Hirodes[146] ê Yeruşalimê. Jê pirseke wan hebû:

> *"Zarokê kû wekî Qralê Yahudiyan hatiye dinyayê* ***li kû ye?*** *Me li rojhilatê* ***stêrka wî*** *dît û em hatin kû wî* ***biperêsin****."*
> (Matta 2:2)

**KESÊ Dİ BEBEKÊ DE**

Ev zarokê kur kû li bereqeyekê hate dinyayê, li afirê heywanan hat razandin, ji hêla pêxemberan ve hatina wî ji berê de hate zanîn, agahiya wî ji hêla milyaketan ve bi mizginiyan hat dayîn, bi stêrkekê hat rûmetkirin û ji hêla mirovên zana hate perestin kî bû?

Niha em dîsa guh bidinê ka milyaket ji şivanan re çi gotibûn:

> *"Netirsin!" Ez mizginiya agahiyekê didim we kû dê hemû gel pir şa be: îro li bajarê Dawud Xelaskerekî hat dinyayê ji bo we.* ***Ev Mesîhê Reb e."*** (Lûka 2:10-11)



Ev kesê di bedena biçûçik de **Rebbû**.



# 17

# Dibe Kû Ev Kes Kî Be?

*“Xezalên kû bi lotikan diçin, nifşeke kû bi kolandina tunelê Hêlîna xwe çêdikin, nikarin* ***bînin*** *dinyayê.”*

—Gotinên Pêşiyan a Wolofê

Çawa kû xezal nifşeke kû taybetiyên wê aîdê xelazelekê ye çêdikin, bi heman awayî yên gunehkar jî, nifşeke kû taybetiyên wan ên gunehkaran hene, çêdikin. Gava mirov bi tena serê xwe tê hiştin neçar e; nikare vê çemberê gunehê bişkîne. Û yên kû em dibînin jî delîlê vê rastiyê ye.

## YÊN BİGUNEH

Em li ser endustriya fîlmê ya Amerîkayê bifikirin. Hollywood her sal fîlmên kû tê de xweparêzî, bêexlaqî, xerifîbûn, axaftinên bidijûn, hovîtî, tol û hîle hene û lehengên jin û mêr ên kû di rola sereke de dilîzin, çêdikin û ev fÎlm ji welatên din re tên firotin. Nivîskarên senaryoyê di fîlmên xwe de çima bi zanebûn cih didin taybetiyên biguneh ên “zilamên baş” ên kû portreya wan xêz dikin? Çima fîlmên wisa çênakin kû “lehengên” wan rola kesên rast, nazik, ne xweperest, mîhrîvan û dilovan nalîzin? Çênakin, lewre guneh tevlî nifşa mirov bûye. Karakterên herî baş ên xeyalî yên kû mirov çêkirine jî biqusûr in. Û ev xirabiya nifşa mirov bi tenê ne bi lehengên Hollywood re bisînor in.

Xwezaya mirov a meyldarê gunehê, xwe bi gelek şeklên veşartî derdixe holê. Mînak, ger hûn yekî aîdê cîhana Ereb in, hûn bi îhtimaleke mezin Juha yê kû fîgura wêjeyê ya xwedî paşerojeke sedsalekê ye, nas dikin. Em gava çîrokên gel ên der heqê Juha û kerê wî de dixwînin, dibişirin. Der heqê vî karakterê biaqil ê kû bi gotin û tevgerên xwe bi zeka û mîzah –di heman demê de xweperestî, ruhekî kû heqaret dike, fikrên qirêj, tol, hîle û wehdên kû nayên pêkanîn– tê karakterîzekirin de bi sedan pêkenok hatine nivîsîn. Bifikirin! Lehengên xeyalî yên kû hûn pir jê hez dikin jî, xwezayeke xirabe pêşkêş dikin! Ez ê ji we re pêkenokeke kû der heqê Juha de hatiye nivîsîn, mînakeke kû vê xwezaya xirabe nîşan dide, bêjim:

> Hevalekî wî tê cem Juha.
>
> "Te soz dabû kû te yê ji min re hinek deyn bidaya." dibêje, "ez niha ji bo vê perê hatim."
>
> Juha ji hevalê xwe re dibêje, "Hevalê min, ez ji tu kesî re deyn nadim, lê ez ji te re dikarim peyvên kû dê dilê te xweş bikin, bidim!"[147]

Em jî dişibin vî lehengê gel ê xeyalî Juha. Lewre dibe kû me jî wehdên wisa dane kû me pêkanîna wan qet nefikiriye. Ji ber xwezaya me ya mirovê ketî em jî wekî Juha tevdigerin.

Lê digel her tiştê, di dîrokê[148] kesekî heye kû hemû Wehd bi cih anîne. Wî her tim rastî got. Tu car nexapand, heqaret nekir, gefa neda an jî li dû tolhildanê neçû.

Navê vî Kesî Îsa ye.

> *"Wî **guneh nekir**, ji devê Wî **peyvên bifend derneketin**. Gava jê re çêr dikirin, **bi çêran bersiv neda**, gava diêşa **gefa xwe li tu kesî neda**."* (Petrûsê 1., 2:22-23)

## YÊ BÊGUNEH

Jiyana Îsa bi çandên kû guneh serweriya dinyayê dike re di tevliheviyeke xurt de ye. Ew tenê ye kû bêguneh hatiye dinyayê. Ew *"di her mijarê de wekî me hatiye ceribandin, lê **guneh nekiriye."***

(Îbranî 4:15). Ji hişê Wî tu car fikreke qirêj derbas nebû. Ji lêvên Wî tu car peyveke hişk derneket. Gava Îsa li Nasirayê li maleke zelane bi zirbirayên xwe re mezin dibû,[149] ***bi awayekî xwezayî*** rajêriya Deh Ferman û zagonên din ên Xwedê –hem di bedenê de, hem di hişê xwe de– kir. Îsa wekî ya me xwedî bedeneke fîzîkî bû, lê wekî ya me xwezayeke wî ya meyldarê gunehê tune bû.

> *"Mesîh ji bo kû gunehan rake derket holê û **di wî de guneh tune bû**."* (Yuhannayê 1., 3:5)

Îsa gava bû sih salî, bi awayekî fermî dest bi peywira xwe ya cîhanê kir.[150] Şerê di navbera Xweda û Şeytên de dikir gur bûya. Şeytan dizanîbû Xwedê ji bo pelixandina wî hatiye, lê nizanîbû dê Îsa vê çawa bike.

Şeytan, mirovê nuwaze yê pêşîn ji bo kû guh nede Zagona Xwedê xapantibû, û niha dê hewl bidaya kû heman tiştê ji bo Mirovê Nuwaze yê duyemîn bike kû li dijî Zagonên Xwedê derkeve.

> *"Piştre Îsa ... Bi beralîkirina Ruhê, çil roj li çolê hat gerandin û ji hêla Îblîs hat ceribandin. Li wan rojan tu tişt nexwar. Ji ber vê di dawiya vê demê de birçî bû.*
>
> *Li ser vê Îblîs jê re got, **'ger tu Xwedê yî**, ji vî kevirî re bêje bila bibe nan'. Lê Îsa got, **'wisa hatiye nivîsîn, 'Mirova tenê bi nên najî'**"* (Lûka 4:1-4)

Bala xwe bidin kû Şeytan ji Îsa re tu tiştê "xirab" nade kirin. Îblîs (ji wî kesî kû serweriya "wî" dagir kiriye re) dixwest kû ev Mirovê bêguneh bêyî Bav Xwedayê li ezmanan tevbigeriya, lewre wekî kû me berê li beşa 11an dît, *bêyî Xwedê fikirîn an jî tevgerîn **guneh e.***

Li vir fikra kû li ser tê sekinîn ev e: ger Mesîh gunehekî bikira, dê nekariya peywira xwe ya rizgarkirina nifşa lanetkirî ya Adem ji zagona guneh û mirinê, pêk bianiya.

Çawa kû mirovekî deyndar nikare deynê kesekî din bide, bi heman awayî gunehkarekî jî nikare cezayê gunehên gunehkarekî

din bide. Lê tu deynê *Xwedê* yê *Kurê mirov*[151] tune bû. Ji ber kû ji gunehê azad bû, dikarîbû mirin bixista li hêlekê, lê wekî kû em ê bibînin plana Xwedê ne wisa bû.

Di vê navberê de, Şeytan hewl da kû Îsa bixapîne kû bêyî plana nuwaze ya Xwedê tevbigere û guneh bike. Îsa ji bo her hewldana xapandina Îblîs ji Nivîsên Pîroz bersiv da.[152]

> *"Piştre Îblîs Îsa derxist jor û di carekê de hemû welatên dinyayê rê Wî dan. Jê re got, 'Ez ê rêveberî û dewlemendiya van hemûyan bidim te. Ev hemû radestî min kirin, û ez dikarim kê dixwazim bidim wî. Kû tu min biperêsî, dê ev hemû yên te bibin.' Îsa jê re ev bersiv da: 'Wiha hatiye nivîsîn,* ***'Tu yê Xwedayê xwe Reb biperêsî, tenê bibî evdê Wî'*** *"* (Lûka 4:5-8)

Xweda ji Adem re li ser hemû afirînan serweriyê dabû, Şeytan jî niha bi heman awayî, "serweriya" kû gava Adem xwest wî bişopîne bi dest xistibû, niha pêşkêşî Îsa dikir.[153]

Îsa wekî Adem **nekir**.

Peyva Xwedê kiribû beden.

## TEMAŞEKARÊN ÎSA

Gava Îsa dest bi xizmeta xwe ya fermî kir demeke kin û bi şûn de, li her derê kû diçû ji bo rêhevaltiya wan deh mêr hildibijartindi ji xwe re. Di heman demê de gelek jin jî li pey Îsa diçûn. Ev jin û mêr bûn şahidê gotin û tevgerên Îsa.

> *Îsa bi* ***dozdeh xwendekarên*** *xwe re li gund û bajaran geriya. Serweriya Xwedê radigihand û mizginiya Wî dida.* ***Hin jinên*** *kû ji ruhên xirab û nexweşiyan difilitîn ... û gelek ji wan bi derfetên xwe alîkarî Îsa dikirin."* (Lûka 8:1-3)

Îsa ji mêr, jin û zarokan re hêman rêz girt. Di Încîl de gelek çîrok hene derbarê Îsa de kû ji jinan re ji çanda Cihû û Romayê wê demê zêdetir rêz û nazikî dide.

Îsa ji her kesî kû li rûzemînê ne re girîngiyek mezin da. Lê tu car ji bo tu kesî zordestiyê nekir, ji bo kû guh bidine Wî, jê bawer bikin an jî li pêy Wî biçin. Wî, berdêla wî çi be bila bibe, hez dikir bi kesên kû hiş û dilên wan meyldarê bihîstîn û pejirandina rastiyê ye, wext derbas bike.

## PIRSEKE DERÎVEKER

Gelek mirovên ji rêzê li pey Îsa çûn, lê rêberên dînî yên Cihû li pey Îsa neçûn.

Rojekê, Îsa ji wan pirseke girîng kir:

> ***"Hûn der heqê Mesîh de çi difikirin? Ew kê ye?"***
> (Matta 22:42)

Wan bersiv dan û gotin Mesîh kesekî dê ji nifşa Qral Dawud bê, ye. Îsa pêxemberiya Dawud anî bîra wan kû Rizgarker hem *erdîn ê Dawud e* hem jî *Xwedê yê ezmanî ye.*[154]

Îsa berê ji xwendekarên xwe pirseke mîna vê kiribû:

> ***"Gel dibêje kurê mirov kî ye?*** *Xwendekarên wî ev bersiv dan, 'hinek ... dibêjin yek ji pêxemberan e'. Îsa ji wan re got,* ***'Hûn çi dibêjin? Li gorî we ez kî me?'*** *Simun Petrûs got, 'Tu Xwedê Mesîh î kû dijî.' Îsa jê re got, 'Bijî, Simunê Yunus ... Yê kû ev sir ji te re got ne mirov (goşt û xwîn) e, Bavê min e li ser ezmanan e.'"* (Matta 16:13-17)

Zû dereng divê em hemû bersiva vê pirsê bidin:

Hûn der heqê Îsa de çi difikirin? Îsa kê ye?

## GOTİNÊN HİNEKAN

Ji bo gelek Rojavayiyan, Îsajipeyveke lanetê kû hîn bûne, ne zêdetir tiştek e.

Hinek jî dibêjin Ew tenê mamosteyê exlaqê ye.

Cihûyên Ortodoks navê Îsa jî bi lêv nakin. Û ji Wî tenê wekî "ew zilam" behs dikin.

Yên Hîndû, Îsa wekî kesekî kû di nav xweda û xwedawendan de şikleke xwedayî girtiye, dibînin.

Cîranên min ên Misilman jî der heqê vê mijarê de wiha dibêjin: “Em qebûl dikin kû Îsa pêxemberekî mezin e û rêz digirin jê re, lê ne Xwedê ye.” Yekî kû peyama elektronîk şandiye der heqê Îsa de wiha dinivîse:

> Posteya Elektronîk
>
> Ez li Suudî Erebîstanê dijîm. Em jê bawer nakin kû Îsa Xwedê ye, lê em bawer dikin kû tenê pêxemberekî ye. Îsa nehat kûştin. Dê dîsa vegere û dê her kes bibîne ka aîdê kÎjan aliyê ye. Ji ber kû hûn jî ji dînê me yê xweş bawer bikin û roniya rast bibînin, ez hêvî dikim kû gava hûn dijîn bila bê.

Û fikra Malezyayiyek kû em ji hev re dinivîsin wiha ye:

> Posteya Elektronîk
>
> Ez jê bawer dikim kû Xweda Yek e û tu car bawer nakim kû mirov e an jî dişibe mirovê… ger yekî hebe kû bawer dike Xweda dişibe mirovê, ew kes dijûnkerekî mezin e.

Çavkaniya van ramanan ragihandinên Qur’anê yên der heqê Îsa de ne.

## QUR’AN Çİ DİBÊJE?

Qur’an her tim dibêje Îsa *“bi tenê pêxemberekî ye”* (Sûre 4:171-173; 5:75; 2:136). Digel her tiştê pirtûka kû Misilman rêz digirin, di heman demê de ji ber kû bavê wî yê biyolojîk tune ye, wî di nav pêxemberan de bêhempa dide nîşan û Wî wekî Îsa ibn Meryem, *“Îsayê Meryem”* bi nav dike (Sûre 19:34). Qur’an gunehên pêxemberan nîşan dide, lê tu car guneh li Îsa bar nake. Ji Wî wekî *“Pîroz”* tê qalkirin.[155] Qur’an di heman demê de dibêje kû Îsa yek pêxemberê xwedî wê hêzê ye kû dikare çavên yên kor veke, yên gulîgirtî baş bike, miriyan vejîne û biafirîne jî.[156] Û Qur’an nasnavên mezin ên wekî *El Mesîh* (Mesîh), *Rutullah* (Ruhê Xwedê) û *Kelamullah* (Peyva Xwedê) tenê li Îsa bar dike.[157]

Piştî van biwêjên der heqê bêhempabûna Îsa de, divê mirov bibêje portreya Qur'anê ya der heqê *"Mesîh, Îsayê Meryem"* ji ya Pirtûka Pîroz yekcar cudatir e. Mînak, heman ayeta Qur'anê kû van nasnavên jorê li Îsa bar dike, van dibêje:

> *"Îsa Mesîh ê Meryem bi **tenê pêxemberê Xwedê** ye, ji **peyva** kû ragihand (yê kû bi fermana xwe di wê de çêkir) Meryem û **ruhekî ji xwe ye**. Naxwe ji Xwedê û pêxemberên Wî re îman bikin, nebêjin **'(Xwedê) sê ye'**. Ji bo qenciya xwe, vê **bidawî bikin**. Xwedê tenê yek îlah e. **Ew dûrî xwedîbûna zarokê ye.** Hemû tiştên li esmên, hemû tiştên li erdê yên Wî ne."* (Sûre 4:171)

Li Senegalê hem zarok hem jî mezin gava dibêjin "Îsa ne Xwedê ye! Xwedê *tune ye!"* ne tenê ecele dikin, gava cara destpêkê dibêjin "Îsa nehatiye çarmixkirin" bi heman baweriyê didin zanîn.

Ji kû hîn bûne kû Îsa nehatiye çarmixkirin?

Çavkaniya vê fikrê ev ayetên Qur'anê ne: *"Me dilên Cihûyan ji ber şemartin û bêbextiya wan a kû ji Meryem re kirin û ji ber gotina wan a'Me pêxemberê Xwedê, Îsa Mesîhê Meryem kuşt', muhr kir;* ***lê belê ew nekuştin û ew nealiqandin.*** Lê ji wan re wisa hat nîşandan. Yên kû der heqê wî de li hev nayên, di vê mijarê de nav şikeke yeqîn de ne. Di vê mijarê de tu agahiya wan tune ye. Tenê di bin şikê de ye. ***Ew bi awayekî yeqîn nekuştin.*** Lê Xwedê ew hilkişa jor. Xwedê bilind û bihêz e, xwedî hukm û hîkmetê ye." (Sure 4:156-158)

## PİRTÛKA PîROZ Çİ DİBÊJE?

Beriya nivîsîna Qur'anê bi sedan sal berê, çil pêxemberên kû Peymana Kevin û Nû nivîsîn, der heqê elçî Mesîh û Peywira Mesîh de portreyeke cuda xêz kirin.

Ji sê salan zêdetir e, Yuhannayê kû bi Îsa re dimeşe û pê re diaxive, der heqê nasnavê Îsa yê " Xwedê" de ev şahidî kir:

*"Îsa li ber xwendekarên xwe, nîşaneyên serxwezayî yên din ên kû di vê pirtûkê de nehatiye nivîsîn, pêk anîn. Çi be jî tiştên hatine nivîsîn, ji bo îman bikin kû Îsa Mesîhê Xwedê ye û biîmankirinê,* ***bi navê Wî*** *bigihîjin jiyana bêdawî, hatine nivîsîn."* (Yuhanna 20:30-31)

Elçî Yuhanna di heman demê de ev nivîsîn:

*"Di serî de* ***Peyv*** *hebû.* ***Peyv bi Xwedê re bû*** *û* ***Peyv Xwedê bû****. Di serî de Ew bi Xwedê re bû. Her tişt bi rêya Wî çêbû, tu tiştên kû çêbûn bêyî Wî çênebûn ...* ***Peyv bû mirov û di nav me de jiya.*** *Me bilindahiya Wî—kerema kû* ***ji Bav hat*** *û bilindahiya* ***yekane*** *yê kû bi rastiyan re tijî ye—dît."* (Yuhanna 1:1-3,14)

Çend sal berê hevalekî min ê Misilman baweriya xwe bi min anî û ev sir da min: "Qur'an ji Îsa re nasnavên ***Kelamullah*** (Peyva Xwedê) û ***Ruhullah*** (Canê Xwedê) dide. Kû Îsa ***Peyv û Canê*** *Xwedê*be, naxwe Îsa Xweda ye!"

Piştre hin kes wî hevalê min bi dijûnkerî û *hevberiyê (şirk,* bi Erebî *Hevberiyê Xwedê kirin)*[158] tawanbar kirin. Qet nebe kû hevalê min bi hevalên baş re bû! Rêberên dîn ê Cihû yên dema Îsa, Îsa jî bi heman awayî tawanbar kiribûn.

Îsa wiha got:

*"****Ez û Bav, em yek in****.*

***Rayedarên Cihû ji bo kû wî bidin ber keviran, ji erdê dîsa kevir girtin.***

*Îsa ji wan re got, 'Min gelek karên baş rê we dan kû ji Bav hatin. Hûn ji bi kîjan karî min didin ber keviran?'*

*Cihû wiha bersiva Wî dan, 'Em te ne ji ber karên te yên baş,* ***ji ber dijûnên te*** *didin ber keviran.* ***Tu mirov î lê tu xwe wekî Xwedê pêş dixî."*** (Yuhanna 10:30-33)

Cihû, Îsa bi heman tiştê kû Lusîfer kir tawanbar kir: Têna

şêlandina rewşa bilind û bêhempa ya Xwedê! Wan Îsa bi *xwe xistina li şûna Xwedê* tawanbar kir.

## BEDEN GİRTİN! NE XWEDAKİRİN E!

Ne Îsa ne jî pêxember hîn nekirin kû *mirovek dikare bibe Xweda.* Li dijî vê, Nivîsên Pîroz bi awayekî zelal diyar kirin kû *Xwedê dê mirov bibe.* Mînak, 700 sal beriya zayîna Mesîh, pêxember Yeşaya ev nivîsîn:

> *"Gelê kû di tarîtiyê de dimeşe dê roniyeke mezin bibîne; dê li ser yên kû li diyarên kû mirin siya xwe daniye ser, ronî bibiriqe... lewre dê ji me re* ***zarokek çêbe****, dê ji me re* ***kûrekî bê dayîn****. Dê rêvebir li ser milên Wî bin. Dê navê Wî bibe, Şîretkarê Nuwaze,* ***Xwedayê Bihêz****, Bavê Ebedî, Rêberê Sihetê."* (Yeşaya 9:2,6)[159]

Yeşaya di heman demê de der derheqê Mesîh ê kû dê bê de ev nivîsî:

> *"Ya yê kû ji mizgînî anî Yeruşalimê! Dengê xwe bilind ke, biqîre, dengê xwe bilind ke, netirse. Ji bajarê Yahuda re:* ***'Va ye Xwedayê we!'*** *bibêje."* (Yeşaya 40:9)

*Girtina bedenê* (Xweda xwe diniximîne bedena mirov), ji serî de di nav plana Xwedê de bû, lê *xwedakirin* (mirovekî kû xwe dixe li şûna Xwedê) tu car di nav planên Xwedê de cih negirt. Mirovekî kû xwe wekî Xweda pêşkêş bike, ev dijûn e, lê dîtina *Peyva bêdawî mirov e,* pejirandina plana Xwedê ye.

## Lİ SER KAXEZÊ AN RÛ Bİ RÛ?

Ger hûn bixwazin yekî nas bikin, rêbaza baştirîn kîjan e?

- Têkiliya xwe bi nameyên nivîskî sînorkirin.
- An jî bi demekê ji yekî re name şandin û stendin û piştre bi wî re rû bi rû bûn û bi hev re wext derbas kirin.

Nivîsên Pîroz çi qas nuwaze bibin bila bibin, di demekî de

Xwedayê kû bi Adem û Hewa re dimeşiya, bi wan re diaxivî û wisa disêwirand kû dê nifşa wan Wî bi takekesî nas bikin, tu car nefikirî kû têkiliya xwe bi *kaxezê* sînor bike. Ji serî de sêwirand kû bi me re wekî **Kesekî** bikeve têkiliyê. REB ê kû bi sedsalan e Peyva xwe bi rêya pêxemberan li ser tomarên papîrusê û çermên *heywanan* dide nivîsîn, wehd kir kû Xwe ji mirovan re di nav çermêmirovde rave bike. Xwedê wisa nesewirand kû peyvên xwe tenê di nav *pirtûkekê*de bide me, dê Peyva xwe di heman demê de di **bedenekê** de jî bidaya me.

> *"**Mesîh** dema tê dinyayê wiha dibêje: 'Te ji min re **bedenekê** amade kir."* (Îbranî 10:5)[160]

> *"Bê şik sira rêya Xwedê mezin e: Ew di **wê bedenê** de xuya bû."* (Timoteosê 1., 3:16)

## LÎ HÎŞMETA TE NAYÊ?

Digel kû Xweda bi hezar caran dibêje dê di bedena mirov de avahî çêke, ez van gotinên mirovan dibihîzim: "Gotina divê Xwedê mirov be, li hişmeta Wî ya kû ji her tiştê mezin e, nayê!"

Têgina girtina bedenê digel kû têgîneke mêjiyan ditirsîne, ye, bi rastî jî li dijî mezinahiya hişmeta Xwedê ye? An ev têgîn parçeyeke pêwîst a plan û xwezaya aîdê Xwedê ye kû bi mirovên kû ji bo Xwe afirandine re têkiliyeke nêzîk çêke?

Di jiyanê de, kesên kû em herî zêde xwe nêzî wan dibînin, bi gelemperî tiştên kû me jiyane, wan jî jiyane. Yên kû dilmînî û alîkariya herî baş bide, ew kes in kû ji têkoşîn û aciziyên wekî yên me derbas bûne. Afirînerê me, Dilmînîkerê Dawînî ye.

> *"**Ji ber kû ev zarok ji goşt û xwînê ne Îsa… bi wan re heman binyata mirov girt…** Lewre ji ber kû ew bixwe hat ceribandin û êş kêşa, dikare ji yên kû hatine ceribandin re alîkarî bike ... lewre kahînê me yê sereke di tengasiyên me de ne wisa ye kû nikare xwe nêzî me bike;*

> *li dijî vê* ***di her mijarê de wekî me hatiye ceribandin, lê guneh nekiriye.****"* (Îbranî 2:14,18; 4:15)

Ji serî de plana Xwedê ew bû kû sînor û aciziyên bedenekê kû ji goşt û xwînê pêk hatiye hilde ser xwe; qirêjbûna nava neynokên Wî, birçîtî, êş û tiştên kû em jiyane. Yên kû ji yê vir hewisandineke cuda didin, tenê pêxember û plana Xwedê red nakin, di heman demê de xweza û tevgerên Xwedê jî red dikin. Ev kes, li şûna kû Xwedê wekî Afirînerê dilsoz û dilovan ê kû dixwaze mirov Wî wekî takekesî nas bikin, qebûl bikin, Wî wekî nayê naskirin û nayê zanîn nîşan didin.

Bi armanca xizmetkirin û bereketkirinê, der heqê bêdilbûna ji bo daketina asta kesekî din de tiştê "bihişmet" tune ye. Afirînerê me di dîrokê de tu car ramana daketina asta me biçûk nedîtiye. Daketina asta me plana Wî bû bi daxwaza xwe ev kir.[161]

> *"Ji bo kû hûn bi feqîrtiya Wî dewlemend bibin,* ***digel kû dewlemend bû*** *di ber we de* ***feqîr bû.****"* (Korîntiyên 2., 8:9)

Peyva Bêdawî –wekî kes- gerestêrka me di ber we de û di ber min de ziyaret kir. Afirînerê gerdûna kû ji hêla hişmet û rûmetê *"dewlemend"* e, kete şûna evdekî û *"feqîr bû".* Vê tiştê ji bo kû em dewlemend bibin, kir. Em qala dewlemendiya pere an jî madî nakin.Mebesta me bi dewlemendiyê bexşandin, rastî, jiyana bêdawî û hemû bereketên ruhî yên wekî dilekî kû bi hezkirin, silametî, daxwazên Wî yên pîroz hatiye dagirtin, e.

## PÊNASA MEZİNAHİYÊ

Gelek kes wisa difikire, Xwedê *ewqas mezin* e kû bi girtina bedeneke kû ji goşt û xwînê pêk tê, nikare bê rûzemînê. Gelo sedema vê ew e kû pênasa *mezinahî*ya van kesan û pênasa *mezinahî*ya Xwedê ji hev cuda ye?

Îsa mezinahiya rast ji xwendekarên xwe re wiha rave kir:

> *"Hûn dizanin kû, yên wekî rêberên neteweyan tên hesibandin, dibin serwerê wan, yên rûspî jî giraniya*

*bi wan didin hisandin. Dê di nav we de wisa nebe. Yên nav we de kû dixwazin* ***mezin*** *bibin, bila* ***xizmetkarê*** *yên din bibin. Yên nav we de kû dixwazin bibin* ***destpêkê,*** *bilabibe evdê we hemûyan.****Lewre Kurê mirov jî ne ji bo kû jê re xizmet bikin hat, ji bo xizmetkirinê û ji bo canê xwe ji gelek kesan re fidye bide hat.”*** (Markos 10:42-45)

Yê kû xwe herî nizm dike û ji yên din re xizmeta herî baş dide, yê herî mezin e.[162]

## MÎRÊ BA Û PÊLAN

Rojekê Îsa û xwendekarên Wî li ser Gola Celîleyê di şikefa masîvanan de bûn.

*“Ji nişka ve* ***bahozeke mezin*** *rabû li golê. Wisa kû pêl radibûn ser şikefê. Îsa wê demê radiket.*

*Xwendekar çûn ew şiyar kirin, ‘Ya Reb, me xilas bike, hekena em ê bimirin’ gotin.*

*Îsa got, ‘Hûn çima ditirsin hey îmankêm?’ Piştre rabû bi ba û golê re hêrs bû. Derdor* ***aram*** *bû.*

*Hemû heyirîn.* ***‘Ev zilamekî çawa ye kû ba jî gol jî guhdarî Wî dikin?’*** *gotin”* (Matta 8:24-27)

## “EV ZİLAM DİBE KÎ BE?”

Zelal bû kû Îsa mirovekî bû. Li şikefê raket; Wî dizanîbû westan, birçîtî û tîbûn çawa ye. Lê piştre şiyar bû, rabû ser piyan û bi bahoz re hêrs bû. Bayê tund wê demê sekinî û pêlên kû rabûne aram bûn.

Divê mirov bi vê pirsa xwendekaran neheyire:

*“Ev zilam dibe kî be?”*

Salek beriya vê bûyerê, Mezmûr wiha nivîsîbû:

> *“**Ya Reb**, REBekî wekî te bihêz heye**? …Tu li ser deryayên har serweriyê dikî û pêl çi qas har bin tu wan disekinînî.**”* (Mezmûr 89:8-9)

*“Ev zilam dibe kî be?”* Mizgînî di heman demê de behsa Îsayê kû li ser deryayê dimeşe, dike.[163] Xwendekarên Îsa car din *“pir heyirî mabûn”* (Markos 6:51). Lê Îsa ji bo metelhiştina mirovan li ser deryayê nemeşiya; ji bo alîkariya xwendekarên xwe bike kû fam bikin Ew kî ye, meşiya.

Pêxember Eyûb du hezar sal berê gava der heqê Xwedê de diaxivî, behsa vê mijarê kiribû:

> *“**Ew e kû bi tena serê xwe** ezmanan vedikêşîne û **li serpêlên deryayê dimeşe.**”* (Eyûb 9:8)

*“Dibe ev zilam kî be?”* Xwedê me vedixwîne kû em xalan bi cih bikin û têgihîjin ka berê û niha Îsa kî ye. Lê mixabin û çi heyfe kû gelek kes tu car vê tiştê nake.

> *“Ew li cîhanê bû, cîhan bi rêya Wî çêbû, lê **cîhan Ew nas nekir.**”* (Yuhanna 1:10)

***“Dibe ev zilam kî be?”*** Rojekê Îsa Bixwe, gava bi komeke dîndar a dijmin diaxivî, bersiva vê pirsê da.

**“EZ IM”**

> *“Îsa dîsa bang li gel kir û wiha got: **‘Ez roniya cîhanê me.** Yê kû li dû **min** tê tu car di tarîtiyê de namîne, xwedî roniya jiyanê dibe... **Yê kû guh bide min dê tu car mirinê tam neke.’** Piştre Cihû jê re gotin: ‘Em niha fam dikin kû cin li te xistiye ... Brahîm mir, pêxember jî mirin. Lê tu dibêjî ‘Yê kû guh bide min dê tu car mirinê tam neke’. Qey tu ji bavê me Brahîm bilindtir î? Ew mir, pêxember jî mirin. **Tu xwe kî dihesibînî?**”*

*Îsa ev bersiv da: 'Ji ber kû bavê we Brahîm dê roja min bidîta ji kêfan firiyabû. Dît û kêfxweş bû.'*

*Cihû gotin, 'Tu hê ne pêncî salî yî jî. Te Brahîm jî dît?' Îsa,* ***'Ez ji we re rastiyê bibêjim, beriya zayîna Brahîm EZ HEME'*** *got.* ***Wê demê ji bo kû Îsa bidin ber keviran, rahiştin keviran,*** *lê Wî xwe veşart û ji perestgehê derket."* (Yuhanna 8:12,52-53,56-59)

Cihû çima hewl dan kû Îsa bidin ber keviran? Lewre Îsa got, *'Yê kû guh bide min dê tu car mirinê tam neke'*û ***'Beriya*** *zayîna* ***Brahîm, EZ HEME'.*** Îsa tenê rayeya xwe ya li ser mirinê û bi hebûna xwe ya beriya Brahîm (1900 sal berê miribû) angaşt kiribû û di heman demê de bi gotina ***'EZ HEME'*** navê Xwedê ya takekesî bi kar anîbû. [164]

Guhdarên Îsa têgihiştin ka dixwaze bibêje çi. Ji ber vê Ew bi dijûnkirinê tawanbar kirin û ji bo lêxistina Wî ji erdê rahiştin keviran.

## TENÊ XWEDÊ BİPERÊSIN

Îsa her tim hîn kir kû xwe tenê şayanê Objeya perestina me ya Xwedê dît. Îsa ji ber vê got, ***'Tu yê Reb Xwedayê xwe*** *biperêsî û* ***tenê*** *ji Wî re bibî evd'* (Matta 4:10). Lê digel vê, bêjeyên kû di Mizgîniyê de dinivîsin kû mirov li ber Îsa sitûyê xwe xwar dikin û Wî diperêsin, ji dehan ne zêdetir e.

Rojekê, *'yekîbicûzamhat' û got, 'Ya Reb, kû tu dixwazî tu dikarî min paqij bikî' û* ***Ew perest.*** *'*[165] *Piştre Îsa destê xwe dirêjî zilêm kir, destê xwe dayê, 'Ez dixwazim, paqij bibe!' got. Zilam di demê de ji cûzamê paqij bû."* (Matta 8:2-3) Îsa bi zilamê bicûzam ji ber kû xwe avê piyên Wî û Ew perest, hêrs bû?

Na, tenê destê xwe dayê û ew baş kir.

Îsa piştî kû ji mirinê vejiya, xwendekarekî Wî yê bi navê Tomas li ber Wî xwe avêt erdê û ji Wî re *"Rebê min û* ***Xwedayê min!****" got.*Îsa bi ew bi dijûnkirinê tawanbar kir û pê re hêrs bû?

Na, Îsa tenê wiha got: *"Tomas, ji ber kû te ez dîtim te*

*îman kir. Bila her bijîn ew kesên kû bêyî dîtinê îman dikin!"* (Yuhanna 20:28-29)

Ev biwêj der heqê nasnameya Îsa de çi hînê me dike?

## HÛN Ê BİRYAR BİDİN

Hilbijartina me ya kesane ye em her yek der heqê nasnameya Îsa de biryara çi didin, lê tu kes bila der heqê Wî de nirxandineke kû bi ya wî re li hev nayê, nepejirîne. Ger Îsa, "pêxemberekî mezin e" wekî cîranên min kû ji min re dibêjin, ji ber kû pêxember bû di heman demê de Kesê kû wisa angaşt dikir jî bû: *Peyva Dawî ya Xwedê û Wî.* Gotina "Îsa ne jixeynî pêxemberekî kesekî din e", hem şahidiya Îsa hem jî peyama pêxemberan înkar dike.[166]

Berê, C.S Lewis ê kû septîkekî (gumankar) û yek ji entelektuelên sedsala bîstemîn bû, der heqê Îsa de ev nivîsî:

> "Ez li vir dixwazim biwêjeke kû mirov der heqê Wî de dibêjin û bi rastî jî biwêjeke ehmeqî ye diyar bikim û ez bi vê bersivê dixwazim gotina kesekî ya vê biwêjê asteng bikim: "Ez amade me kû Îsa wekî mamosteyekî mezin ê exlaqê bipejirînim. Lê ez angaştya Wî ya kû xwe Xwedê dihesibîne qebûl nakim.' Ev peyv, peyvên kû divê em nebêjin, in. Tenê yekî kû mirov be, kû biwêjên wekî yên Îsa bibêje, ne mimkin e kû mamosteyekî mezin ê exlawê bibe. Yekî wisa an dîn e an jî Şeytanê Dojehê ye. Divê hûn biryara xwe bidin. Ev zilam an Xwedê bû an jî Wî ye; an jî yekî dîn û har bûye an jî ji vê xirabtir e. An hûn dikarin Wî wekî ehmeqekî bipejirînin, hûn tû bikin, bêjin cinekî ye û Wî bikûjin; an jî hûn dikarin xwe bavêjin piyên Wî, jê re wekî Reb û Xweda xitab bikin û dikarin xwe bavêjin piyên Wî. Lê em Wî bi wê xelifiyê kû mirov e an jî mamosteyekî mezin e, kêm nebînin. Destûr nedaye kû em vê bikin. Wî gava xwe diyar kir, mebesta Wî ne ev bûn.[167]

## "Jİ ME RE Bİ AWAYEKÎ ZELAL BİBÊJE"

Her tim kesekî derdikeve û dibêje, "Ji me re di Pirtûka Pîroz de beşên kû Îsa dibêje 'Ez Xwedê me' derxe. Rêberên dîn ên dema Îsa jî zordestiyê kirin li ser Wî kû bêje ew Xwedê ye.

> *Îsa wiha got:* ***"Derî Ez im.*** *Kesekî bi rêya* ***min*** *têkeve hundir xilas dibe." ...Rayedarên Cihû derdora Wî girtin û gotin, 'Tu yê çi qas me bihêlî nav gumanê de? Kû tu Mesîh î,* ***ji me re bi awayekî zelal bibêje.****"*
>
> *Îsa ji wan re got. 'Min ji we re got, lê hûn îman nakin. Tiştên kû ez bi navê Bavê xwe dikim ji min re şahidiye dikin...* ***Ez û Bav yek in.****'*
>
> ***Rayedarên Cihû dîsa ji bo kû Wî bidin ber keviran rahiştin keviran****.*
>
> *Îsa ji wan re got, 'Min gelek karên baş ên kû ji ber Bavê min çêbûn, rê we dan. Ji bo kîjan karî hûn min didin ber keviran?'*
>
> *Cihû wiha bersiv dan:* ***'Em te ne ji ber karên baş, ji ber kû tu dijûnan didî te didin ber keviran. Tu mirovî lê tu dibêjî tu Xwedê yî."*** (Yuhanna 10:9, 24-25, 30-33)

Ev koma dîndar çima xwest Ew bide ber keviran?

Lewre Îsa gotibû, *"Ez û Bav* ***yek in".*** Gava Îsa digot bi Xwedê re yek e, li gorî rikra wan dijûnan dida. Lê digel her tiştê Cihû birêkûpêk bi gotinên *'Adonay Eloheyn u Adonay* ***ehad'*** kû tê wateya *'Xwedayê me Reb,* ***yek e'*** (yekîtiya pirjimar) îmana xwe ya ji Xwedê re diyar dikin. Îsa her tim Xwe wekî Xwedê kû bi Xwedê re yek e, diyar dikir.[168] Sedema Cihûyan kû Ew bi dijûndanê tawanbar dikirin, ev bû.

Îsa bi xwedîbûna hebûna xwe ya bêdawî ya wekî Peyv û Xwedê, tu car xwe qure nekir an jî bi vê hebûnê re şanîdanî nekir.

Li derdor wekî "Ez Xwedê me! Ez Xwedê me!" negeriya. Li dijî vê, jiyana xwe ya li cîhanê çawa kû dixwest bila hemû mirovahî bijîn—bi nefsbiçûkiyeke nuwaze û li ber Xwedê bi

awayekî jidil sitûyê xwe xwar dike — bi wî awayî domand.

Îsa yek kes e kû dikare bêje, ***“Ez ne ji bo daxwaza xwe bînim cih, ji bo daxwaza yê kû ez şandim bînim cih****, ji esmên daketim.”* (Yuhanna 6:38) Hişmeta jiyana Îsa yê kû *Xweda*yê hatiye bilindkirin, ji bo ***Kurê mirov*** bûnê Xwe nizmkirin e.

Dema Îsa ji yên din re xwe rave dikir ka Kî ye, pejirand kû ev ravekirin bi dilnizmî lê bi awayekî xurt bike.

Rojekê zilamekî ciwan ê dewlemend hat cem Îsa û jê re wekî *“Mamosteyê* ***Baş”*** xitab kir. Li ser vê Îsa ji zilêm ev pirs kir, *“Çima ji* ***min*** *re dibêjî baş? Yekî Baş tenê heye; Ew jî* ***Xwedaye****.”* (Lûka 18:19)[169] Ev zilamê dewlemend jê bawer nekir kû Îsa Xwedê ye, lê Îsa — başîtiya xwedayî ya kesanekirî — ew zilêm vedixwend kû bila parçeyên mamikê bîne cem hev û têbigihije ka Ew Kî ye.

Îsa dixwaze em jî fam bikin ka Ew Kî ye.[170]

## GOTİN, Bİ KARÊN ÇÊKİRÎ PEJİRANDİN

Mucîzeyên bêhejmar ên xurt kû Îsa çêkirin, raye û hêza Wî ya li ser her unsûrê ketî û bi gunehê hatiye lanetkirin, derxist holê. Wî zanî mirov çi difikirin, guneh bexşandin, ji bo kû bi hezaran kes bixwin nan û masî zêde kirin, bahoz sekinandin û ferman kir kû bila ruhên xirab biçin. Bi peyvekê an jî destdanekê xewweş baş kirin, wisa kir kû seqet meşiyan, kor dîtin, ker seh kirin û mirî vejiyan. Mesîh wekî heman pêxemberên kû berê ragihandibûn, *“Milê REBê yê rûzemînê bû.”*[171]

Hişmeta Îsa ya ji her tiştê mezin e, ji bo yên kû xwedî çavên dibînin, in ji her derê Hebûna xwe biriqî. Karên Îsa delîlê rastbûna peyvên Wî bûn. Mînak, wekî kû me berê jî xwend, Îsa got Ew *“Jiyan”*e. Wî delîlê vê îdiayê çawa derxist? Îsa gotina xwe ya “Jiyan”ê bi vejandina miriyan îspat kir.

Reb Îsa rojekê, li cem gora zilamekî bi navê Lazar ê kû çar roj berê miribû, bû. Bedena Lazar di nav gorekê kû ji kevirê hatiye qewartin de bû. Îsa ji xwişka Lazar re got bila negîrî, dê birayê wê dîsa bijî:

Xwişka Lazar ji Îsa re got, *"Roja dawî, roja vejînê ez dizanim dê dîsa vejî".*

Îsa jê re got, ***"Vejîn û Jiyan Ez im.*** *Yê kû ji min re îman dike, bimire jî dê bijî."* (Yuhanna 11:24-25)

Îsa piştre ji bo îspatkirina gotina xwe, *"bi dengekî bilind qîr kir,* ***'Lazar, derkeve derve!'*** *û destên wî yên* ***mirî****, piyên wî yên pêçayî û rûyê wî bi pêjgirê re pêçayî, derkete derve.*

*Îsa ji kesên li derdor re got, 'Wî vekin, bihêlin bila biçe'.*

*Wê demê gelek kesên Cihû tişta kû Îsa kir dîtin, jê îman kirin. Lê hinek ji wan çûn ji Ferîsiyan tişta kû Îsa kir gotin ... bi vî awayî* ***ji wê rojê pêv ji bo kuştina Îsa dest bi planan kirin … kahînên sereke jî kuştina Lazar sêwirandin,*** *lewre ji ber wî gelek Cihû ji Îsa re îman dikirin."* (Yuhanna 11:43-46, 53; 12:10-11) [172]

Dilê mirov çi qas hişk e!

## DİLÊN HİŞK

Piştî gotinên Îsa û îtîbara Wî, rêberên dînî û polîtîk ên Cihû, bi hêrsa kû di dilê wan de zêde dibû, hatin cem hev: Diviyabû dengê Îsa bihata birîn! Ji bo kûştina wî li sedemeke sûcê – hema sedemeke wisa- digerîyan, lê nedidîtin. Yekê kû wekî yek Mirovê nuwaze hatiye dinyayê, çawa dikarîbû bihata sûcdarkirin?

Li rojekê Şabatê Îsa li sînagogê fêr dikir …

> *Li wir zilamekî destê wî seqet hebû. Hinekan ji bo sûcdarkirina Îsa, ka dê li roja Şabatê bikaribe nexweş baş bike, çavdêriya Wî dikirin. Îsa ji zilamê destê wî seqet re got, 'Rabe, derkeve pêşiyê!' Piştre ji kesên li sînangogê re got, 'Li gorî Zagona Pîroz, li Roja Şabatê qencîkirin rast e an xirabîkirin? Canê yekî xilaskirin rast e an canê yekî stendin?' ji wan deng derneket.*
>
> *Îsa bi hêrs li yên derdor nêrî.* ***Bêhestiya dilê wan Ew xemgîn kiribû.*** *Ji zilêm re got, 'Destê xwe dirêj bike!' zilam destê xwe dirêj kir, destê wî dîsa sipîsax bû.*

***Li ser vê Ferîsî derketin derve, ji bo wendakirina Îsa zû bi zû bi alîgirên Hirodes*** *(partiya polîtîk)* ***re hevdîtin çêkirin.***

*Lê Îsa bi xwendekarên xwe re çû perava golê… qerebalixeke mezin da dû Wî… ji ber kû gelek kes baş kiribûn, yên kû bi nexweşiyên cuda girtine ji destê xwe bidin Wî, bi ser Wî de diçûn. Ruhên xirab gava Ew didîtin xwe diavêtin piyên wî, diqîriyan,* ***'Tu Xwedê yî!'***

(Markos 3:1-11)

## TÊGİHÎNA RUHÊN XİRAB

Ruhên xirab dizanîbûn vî Yê Şîfa Dide Kî ye, ji ber vê bi nasnavê Wî yê rast kû xwedê ye xitabî Wî dikirin, *'Tu Xwedê yî'*.

Ev hemû milyaketên ketî ji paşeroja berê ya Îsa agahdar bûn.

Bi hezaran sal berê, Wî gava ji ezman û erdê re ji bo hebûna wan ferman kir, ev milyaketên ketî bibûn şahidê hêza Wî ya biqudret û zanatiya Wî ya kû ji mêjiyan wêdetir bû. Bi xişma Wî ya mafdar, gava wê roja kû ji bo li hemberî Wî derkevin, Şeytên pejirandibûn û ji esmên hatibûn derkirin dihate bîra wan, ji tirsan diricifîn! [173] û Ew niha li vir, di nav mirovên kû li rûzemînê bûn, dijiya!

Ev rewş nîşaneya xetereyê bû û neserketîbûna wan nîşan dida.


Rayeya efendiya wan hildiweşiya.

Laneta gunehê çep vedigeriya.

Bêdawî kû Ezbeta jinekê bû, Bixwe serwerî bi dest xistibûn. Ji ber vê ruhên xirab, *"li ber Wî xwe diavêtin erdê, û diqîriyan* ***'Tu Xwedê yî!'"*** Di vê navberê de rêberên dînî *"ji bo wendakirina* Wî *dest bi planan kirin"*.

Carekê, piştî kû min ev çîrok ji hin mêvanên xwe re vegot, mêrekî ev şîrove kir: "Tişteke jê nayê bawerkirin! Ruhên xirab ji Îsa re ji rêberên dînî zêdetir rêz girtine!"

Belê, jê nayê bawerkirin! Lê rast e.



# 18

# Pêşnûmaya Bêdawî Ya Xweda

*“Rebê kû* ***ji serî de*** *van agahiyan dide, va ye wiha dibêje.”*
(Karên Şandiyan 15:18)

Beriya despêkirina demê, di hişê Xwedê de planeke zelal kû ji bo mirovan amade kiribû, hebû. Di heman roja kû guneh malbata mirov lewitand, REB dest bi agahdarkirina vê planê kir, lê ev agahî bi awayekî zelal neda, bi awayekî girtî da. Nivîsên Pîroz ji vê planê wekî *“**Sira** Xwedê”* (Wehî 10:7) behsdikin.

Heya îro plan û armanca Xwedê ya der heqê mirovahiyê de, ji bo piraniya mirovan wekî sirek maye, lê ev rewşeke nepêwîst e, lewre *“**sira** kû ji wext û nifşên berê hatiye veşartin ... **niha hatiye diyarkirin.”*** (Koloseyî 1:26)

## Jİ PÊXEMBERAN ZÊDETİR XWEDÎ BERBİJARİYÊ YE

Em li vir rastî fikreke kû mirov heyirî dimîne, tên. Gava mijar famkirina çîrok û peyama Xwedê be, hûn û ez ji pêxemberên kû Nivîsên Pîroz nivîsîne, zêdetir xwedî berbijariyê ne.

Em xwedî hemû ravekirinên Xwedê ne; ew xwedî nebûn. Em dikarin dawiya pirtûka Xwedê bixwînin; wan nekarî.

> *"Pêxemberên kû ji we re behsa kerema kû dê bê bexşkirin, kirine, der heqê vê rizgariyê de lêkolînên bişiyarbin kirin. Ruhê Mesîh ê kû di nav wan de bû, gava ji êşên kû dê Mesîh bikişanda û ji mezinahiyên kû dê piştî van êşan bihata, şahidî kirin, lêkolîn kirin ka Ruh kîjan demê an jî heyameke çawa nîşan dide.* ***Niha bi rastiyên kû ji we re hatine ragihandin re bi awayekî zelal hat diyarkirin kû ji xwe re xizmet nekirin, lê ji we re kirin.*** *Yên kû bi hêza Ruhê Pîroz Mizgînî dane we, ev rastî ji we re ragihandin.* ***Milyaket jî di wê hesretê de ne kû van rastiyan ji nêzîk ve bibînin."*** (Petrûsê 1., 1:10-12)

## XWEDA PLANA XWE ÇİMA VEŞART?

Dibe hin kes ev pirs kirine: "Xweda tişta kû sêwirand, çima ji mirovahiya ketî re di demê de negot? Xweda çima peyama xwe wekî sireke veşart?"

Digel kû qet deynê ravekirinê yê Xwedayê Serwer ê gerdûnê tune ye ji me re, Ew nazik tevgeriyayê û ji me re hin agahî dane der heqê veşartina Plana xwe ya kû ji bo mirov e. Sê sedema Xwedê heye ka çima Plana xwe hêdî hêdî û bi awayekî rastbîn diyar kiriye:

Wekî kû Xweda destpêkê di beşên pêncemîn û şeşemîn de rave kiriye, Plana xwe hêdî hêdî diyar kir û ji bo kû nifşên pêşerojê peyama Xwedê yeqîn bizanibin, *pêxember û sembolên* kû ji mirovahiyê re pêyamên Wî dipejirînin û şahidên kû banga Wî ***dipejirînin***pêk anîn.

Xweda wekî duyemîn rastiya xwe wisa diyar kir kû tenê ew kesên kû *hewl didin* Wî *bigerin*, dê bikarin kifş bikin. *"Em Xwedê ji bo tişten Wî yên veşartî, qral jî ji bo* ***aşkerekirina*** *wan bilind dikin."* (Şîretên Silêman 25:2). Sedema gelek kes a kû nikarin rastiyê bibînin, bi sedema polîsekî kû nikare dizekî bibîne re heman e; naxwazin bibînin.[174]

Sedema sêyemîn veşartina Xwedê ya plana xwe ye; lewre xwest plana xwe ji Şeytên û alîgirên wî ***veşêre***.

> ***Em ji zanatiya veşartî ya Xwedê bi awayekî nepenî*** *behs dikin. Beriya destpêka zemanê,* ***zanatiya kû Xwedê ji bo bilindahiya me diyar kir, tu rêberên vê demê fam nekir. Kû fam bikirana dê Rebê bilind li çarmixê nexistana."***
> (Korîntiyên 1., 2:7-8)

Kû Şeytan û alîgirên wî plana Xwedê ya wan têk bibe fam bikirana, dê Îsa li çarmixê nexistana. Xwedê plana xwe wisa sêwirand kû, yên kû dixwestin ji plana Wî re bibin asteng, ev plan anîn cih!

Ev plan çi bû?

## RİZGARKİRİN!

Xwedê soz da kû ji bo rizgarkirina ezbeta bêdawî ya Adem ya serhişk û guh nadin zagonê, dê Rizgarkerekî *–wekî Ezbeta jinekê-* bêguneh bişanda dinyayê. Gava di dîroka mirovahiyê de wextê rast hat, Xwedê wehda xwe pêk anî.

> *"Lê dema wext qediya, Xwedê ji bo* ***azadî bide*** *ji yên di bin Zagonê de ne, xwe yê heq ê kû di bin zagonê de hate dinyayê, şand."* (Galatyayî 4:4-5)

*Rizgarkirin* bi dayîna heqê tiştekê kû tê xwestin, *dîsa stendin e*.

Ez wekî kûrekî kû li Kalîforniyayê mezin bûm, kûçikeke min a biçûk hebû. Min ev kûçika mê xwedî dikir, pêdiviyên wê pêk dianî û pê re dilîst. Ew jî her tim li derdora min digeriya û gava ji dibistanê diçûm malê biheyecan dibû. Carinan li semta kû ez lê dimam, derdiket derve û dimeşiya, lê her tim vedigeriya malê. Lê rojekê venegeriya.

Ez ji dibistanê hatim malê, lê kûçika min ez pêşwazî nekirim. Wextê razanê hatibû lê me hê jî ew li tu derê nedîtibû. Roja din bavê min pêşniyariyek kir, got li stargeha heywanên herêmî bigerin; ev cih pisîk û kûçikên kû ji mala xwe direviyan, heya demekê dihewandin. Heywanên kû heya dawiya vê demê kû nedihatin gerandin, bêyî êş dihatin kûştin.

Min li stargeha heywanan geriya. Belê, li wir kûçikeke li gorî terîfa min hebû. "Komkara kûçikan" ew dîtibû. Kûçika min ew qas neçar bû kû nedikarî xwe bifilitanda. Kû yekî ew rizgar nekira, dê berdêla wendabûna xwe bi jiyana xwe bidaya.

Ez çûm stargeha heywanan. Min dikir kûçika xwe dîsa bistanda! Lê memûrê li buroya pêşîn ji min re got, ji bo standina kûçika xwe divê perê cezayê xwe bidim. Li dijî zagonê bû kû kûçikekê bê xwedî li kolanan bigere. Min perê kû dihat xwestin da û kûçika min azad bû. Ji ber kû ji wê qefesa ecêb xilas bibû û gihaştibû wî kesî kû pê re eleqedar dibû, ew qas kêfxweş bû! *Hatibû rizgarkirin.*

Ceribandina min a zarokatiyê kû min kûçika xwe ya serhişk dîsa stand, ji me re der heqê rewşa me de fikrekê dide. Em yên kû serhildêr û gunehkarên sûcdar in, tu çareya me tune kû em xwe bifilitînin. Xwedê heqê xwe yê heq da û ji bo rizgarkirina me ew şand dinyayê. Ev berdêl ew qas bilind bû kû tu kes nedikarî bidaya.

> *"Tu kes nikare* ***berdêla****jiyana kesekî din* ***bide****, tu kes nikare* ***fîdye*** *bide Xwedê—****Lewre berdêla jiyanê mezin e*** *... Lê dê Xwedê min ji diyara miriyan* ***bifilitîne*** *..."*
>
> (Mezmûr 49:7, 15)

Wê demê berdila rizgarkirina me çi bû?

## PÊXEMBER RAGİHANDİN KA BERDÊL Çİ YE

Di beşa sêyemîn a pirtûka Afirînê de, me pêxemberiya veşartî û hê negihayî ya der heqê plana Xwedê ya kû dê gunehkaran ji destê Şeytên rizgar bikira, dît. Niha em dîsa guh bidinê ka Xwedê ji Şeytên re çi gotiye:

> *"Ez ê te û jinê, nifşa wê û ya te ji hev re bikim dijmin. Dê nifşa wê serê te bipelixîne, tu yê êrîşî pehniya wê bikî."*
>
> (Afirîn 3:15)

Xweda bi rêya van gotinan, li gorî Xwezaya xwe ya pîroz, xetên bingeh ên Plana xwe ya dê li hemberî Şeytan û gunehê bisekine, da destpêkirin. REB da zanîn kû dê ji mirovahiyê re Rizgarkerekî-Mesîh bîne kû *"serê"* Şeytên bipelixîne û wî têk bibe. Pêxemberî di heman demê de digot dê Şeytan êrîşî *"pehniya"* Mesîh jî bike.

*"Dê Ew (Mesîh)* ***serê*** *te (Şeytan) bipelixîne*
*û tu yê jî êrîşî* ***pehniya*** *Wî (Mesîh) bikî."*

Dê ezbeta jinê serê Şeytên çawa *bipelixanda*? Peyva *pelixînê* kû ji Îbrankî hatiye wergerandin tê wateya *"êşandin, şikandin, birîndarkirinan jî acizkirin"*. Li gorî vê daxuyaniya destpêkê a pêxemberiyê, dê hem Şeytan hem jî Mesîh bihatana "pelixandin", lê tenê yek ji du birîndaran kûjende bûya kû vegera wê ne kûmimkin bû. Serekî kû tê pelixandin bi mirinê re bêdawî dibe, lê ji bo pehniyeke pelixandî heman tişt nayê gotin.

Xwedê digel rastiya Rizgarkerê kû hatiye wehdkirin dê ji hêla Şeytên û alîgirên wî bê "birîndarkirin", dihat zanîn kû dê di dawiyê de Şeytan têk biçe.

Xwedê piştre ji Dawud pêxember re îlham da kû bila van peyvên Mesîh binivîse:

*"**Destên min, piyên min qul dikin**."* (Mezmûr 22:16)

Dawud di heman demê de vê pêxemberiyê dide, digel kûştina Mesîh, dê bedena Wî di gorê de nerize:

*"**Tu nahêlî bila bedena evdê te yê dilsoz birize**."*
(Mezmûr 16:10)

Rizgarkerê wehdkirî, dê li ser mirinê serkeftî bûya.

Pêxember Yeşaya, armanca êş, mirin û vejîna Mesîh ji berê de da zanîn:

***"Ji ber serhildanên me, bedena Wî hat qulkirin, ji ber serhildanên me Wî tehde dît…*** *çi ye kû, Reb binpêkirina Wî rast dît.* ***Kû canê xwe wekî unsûrekî sûcê pêşkêş bike, dê kesên kû ji ezbeta Wî tên*** *bibîne û dê rojên Wî dirêj bibe. Dê daxwaza Reb bi rêya Wî pêk bê."*

(Yeşaya 53:5, 10) [175]

Dê Şeytên mirov îqna bikira kû ji Mesîhê kû ji hêla Xwedê hatiye şandin, îşkence bikin û Wî bikûjin, lê dîsa jî dê her tişt li gorî plana kû pêxember dabûn zanîn, pêk bihata. Encama dawînî, dê ji bo Reb û *Yê Meshkirî* serkeftineke teqez bibûya.

## PEYVÊN ZANATÎ Û HIŞYARÎ

Hezar sal beriya jidayîkbûna Mesîh, Dawud ev nivîsîn:

***Ev tevliheviya navbera neteweyan de çi ye, çima gel pergalên vala ava dikin****? Qralên dinyayê ref digirin, hukûmdar yek dibin.* ***Li hemberî Reb û Qralê kû Mesh kir…*** *Rebê kû li ser ezmanan rûdine, dibişire, bi wan re şa dibe. Piştre bihêrs wan hişyar dike. Bi xişma xwe wan ditirsîne. Û dibêje, 'Min Qralê xwe li ser çiyayê xwe yê Pîroz Siyonê da rûniştandin'. Ya Qral, biaqil bin! Ya rêberên dinyayê, ders bigirin! Ji Reb re bi tirs xizmetê bikin. Bi ricifîn, şa bibin.* ***Kur maçî*** *bikin kû bila hêrs nebe, hekena hûn ê di rêya kû hûn diçin de mehf bibin. Lewre hêrsa Wî ji nişka ve pêt digire.* ***Bijî yên kû jê bawer dikin û xwe li cem Wî dispêrin!"***

(Mezmûr 2:1-2,4-6,10-12)

Li Senegalê kû gulaş lê werzîşeke adetî ye, wecîzeyeke gel heye:

*"Divê hêkekê bi zinêr re gulaşê negire."*

Çima divê hêkekê bi zinêr re gulaşê negire? Lewre ne

kûmimkin e kû hêk ji vê gulaşê serbikeve! Bi heman awayî, *"yên kû li hemberî Reb û Qralê kû Mesh kiriye yek dibin"* tu car serkeftî nebin. Li hemberî plana Xwedê derketin, *"belasebeb planeke bi nêta xirab çêkirin e."*[176]

Wecîzeyeke din a Senegalî jî heye:

> *"Yê kû daran dibire, bi zanebûn dara kû lê dicivin nabire."*

Li vî cihî ziwa yê dinyayê, piraniya gundan xwedî vê dara mezin a bi sî ne li navenda gund. Ev "dara cihê civînê", ji bo kesên kû ji germa nîvro direvin dibe stargehekê. Mirov li vir bêhna xwe didin, suhbet dikin û çayên xwe vedixwin. Kû, yê kû daran dibire dest bi birîna "dara cihê civînê" bikira, dê gundî çi bikirana, bifikirin! Dê hêrseke mezin bi wan bigirta û dê di demê de karê birînê bidana sekinandin!

Her kesê kû li hemberî plana rizgarî ya Xwedê derdikevin, dişibin wî kesî kû bivir li dara berdil a gundiyan dide.

Dê tu car serkeftî nebin.

> *"Ya qral, biaqil bin!... Kûr maç bikin kû hêrs nebe. Hekena hûn ê di rêya kû diçin de mehf bibin. Bijî yê kû jê bawer dike û xwe li cem Wî dispêrin!"* (Mezmûr 2:10-12)

## NEDÎTİNA PLANA XWEDÊ

Îsa li hefteyên dawî ya peywira xwe ya serzemînê, ji xwendekarên xwe re der heqê vê mijarê de agahî dan: rêberên polîtîk û dînî li şûna kû Wî wekî Qralê xwe qebûl bikin, dê kûştina Wî bixwestana. Kesên kû kûştina Îsa plan nabînin kû esas ew bixwe bûn kû dê tiştên pêxember ên ji berê de gotibûn, pêk bianîna: dê dest û piyên Mesîh, wekî parçeyeke plana Xwedê ya kû ji bo ezbeta serhişk û neçar a Adem ji destên Şeytên bifilitîne, bihata qulkirin.

*"Îcar Îsa ji xwendekarên xwe re dest bi vegotinê kir kû divê biçe Yeruşalîmê, ji destên kahînên sereke û zanayên dînî pir bikişîne, bê kûştin û roja sêyemîn divê dîsa vejî.*

*Li ser vê Petrûs Ew kêşa hêlekê û jê re hêrs bû, got, 'Xwedê biparêze, ya Reb! Dê tu car tiştek wisa neyê serê te!'*

*Lê Îsa li Petrûs vegeriya û got,* ***'Here wê de, Şeytan! Tu ji min re dibî asteng.*** *çimkî tu ne tiştên xwedayî, lê tiştên mirovî difikirî.»' "* (Matta 16:21-23)

Ramana Petrûs dişiba vê biwêjê kû min ji nîqaşkerekî navdar bihîstîbû, "Mesîhekî çarmixkirî dişibe ezebekî zewicî!"

Mîna vî nîqaşkerî, Petrûs jî plana Xwedê hê fam nekiribû. Petrûs fikirî kû bêyî sitûyê xwe li ber biçûkxistina çarmixkirina rêveberiya hemû dinyayê ya kû ji Mesîh re hatiye wehdkirin, lezelez saz bike!

Petrûs mafdar bû gava plana Xwedê ya kû dê Îsa wekî Rêvebirê Serwer bîne ser cîhanê difikirî, lê şaşî dikir gava difikirî kû dê Mesîh êş û şerma xwe li hêlekê bihêle. Petrûs dê piştre plana Xwedê fam bikira û bicesaret dê rastî bida zanîn: *"Pêxemberan ... şahidî kirin ji êşên kû dê Mesîh bikêşe re û ji bilindahiyên kû dê pey van êşan bê!"* (Petrûsê 1., 1:10-11) [177]

Çarmixkirina Mesîh dê pîşadek nebûya. Destpêkê Xwedê tevgeriya û ev di *bêdawiyê* de plan kir. Pêxemberan ev plana rizgariyê ji berê de dan zanîn. *Ezbeta Jinê* ji bo kû vê planê bîne cih, hat.

Demeke berê ji min re ev posteya elektronîk hat şandin:

Posteya Elektronîk

**Hûn ew qas kor in kû**, ji vê jî bawer dikin kû **dê Xwedê nekare xwe yê heq ji çarmixê xilas bike**. Hûn bi vê baweriya xwe nîşan didin kû Xwedê bi destûrdayîna xwe kû ji hêla mirovan tê biçûkxistin û kûştin, bisînor û zeîf e. **Xwedê xwedî hêza dawînî ye**. Ew yekane ye û tu tişt bi Wî re nikare bê wekhevkirin.

Ellahuekber.

Wekî kû Petrûs jî berê fam nekiribû, wî kesî kû ev peyama elektronîk şandibû jî hê fam nekiribû ka Mêsîh çima *“**diviyabû** bê kuştin û roja sêyemîn vegeriya jiyanê”.*

Çima planeke wisa ecêb diviyabû bihata cih? Çawa kû wî kesî ji me re peyama elektronîk şandibû, bi awayekî mafdar nîşan dida, *“Xwedê xwedî heza dawînî ye.”* Wê demê çima Xwedê Şeytên neavête dojehê û çima rave nekir kû nifşa biguneh a Adem hatiye bexşandin? Xwedê tenê bi rêya Peyva xwe cîhan afirand, ango bi axaftinê afirand, naxwe çima dîsa bi heman awayî, bi axaftinê cîhan xilas nekir?

Çima diviyabû Afirîner-Peyv mirov bûya? Xweda çima di plana xwe de ji Mesîhekî kû diêşe, xwîna Wî dirije û dimire, re cih da?

Asta din a rêwîtiya me bersiva van pirsan dide.



# 19

# Zagona Qurbanê

*"Xwîn ji dêla jiyanê* ***guneh dide bexşandin****."*
—Reb (Leviyî 17:11)

Dîroka malbata pêşîn di beşa çaremîn a pirtûka Afirînerê tomar kiriye. Em cara destpêkê li vir hîn dibin kû gava Adem û Hewa ji Baxçeyê Aden a pastoral hatin derkirin, hemû ezbeta mirov jî hatin derkirin. Her kesê kû ji ezbeta Adem û Hewa tên, dê li dinyayeke lanetkirî a kû di bin kontrola dijmin de ye, bihatana dinê û dê li vir mezin bûna.

## GUNEHKARÊ KÛ DESTPÊKÊ HATE DİNYAYÊ

> *"Adem bi jina xwe Hewa re raket. Hewa bihemle bû û* ***Kayîn*** *anî dinyayê. 'Min bi alîkariya REB kûrekî anî dinyayê' got.* (Afirîn 4:1)

*Kayîn* têwateya *bidestxistin, qezenckirin.* Di nav êş û heyirîna zayîna zarokê pêşîn de Hewa got, '*Min ji REB kûrikek qezenc kir!*' Belkî jî fikiriye kû Kayîn ew Rizgarkerê wehdkirî yê kû dê ji hêla Xwedê ve bê şandin kû wan ji encamên kûjende yên gunehê rizgar bike.

Hewa mafdar bû kû bawer dikir dê Rizgarkerê wehdkirî *"ji Reb bê"*. Di heman demê de mafdar bû kû bawer dikir dê Mesîh

ji jinekê bê, lê kû fikiriye kû ezbeta mêrê wî Rizgarkerê wehdkirî ye, ev fikra wê şaş bû.

Adem û Hewa hê pir derbas nebibû fam kiribûn kû wan ê destpêkê ê biçûk ji afirînê ve xwedî xwezayeke gunehkar e. Kayîn *bi awayekî xwezayî* guneh kir. Wekî Şeytan û dê-bavê xwe, fêza xwe û îradeya xwe pêşkêş kir. Kayîn ne Rizgarkerê kû hatibû wehdkirin, bû. Tenê gunehkarekî din bû kû pêdiviya wî bi rizgarbûnê hebû.

Heya kû wan ê duyemîn hate dinyayê, Adem û Hewa der heqê rewşa mirov de xwedî nêrîneke rasttir bibûn.

*"Hewa piştre birayê Kayîn,* ***Habîl*** *anî dinyayê."* (Afirîn 4:2)

Adem û Hewa ji xwe yê duyemîn re navê Habîl danîn kû tê wateya *tiştê vala* an jî *tu tişt.* Ne mimkin bû kû zarokekî bêguneh, rast bînin dinyayê. Rizgarkerê wehdkirî yê gunehkaran, nikarîbû ji nifşa Adem bihata. Zarokên kû dê Adem û Hewa bi hev re çêkirina, ancax dê wekî wan gunehkar bûna. Kû Mirovekî hewce bû kû wan ji cezayê gunehê bifilitîne, diviyabû ew Kes ji REB bihata.

Wekî kû em li beşa destpêkê a pirtûka Afirînê hîn bûn, mêr û jina pêşîn di *xuyangaXwedê de û mîna Wî* hatin afirandin. Ev berbijariya kû mirov heyirî dimîne, bi xwe re berpirsiyariyên cidî yên wekî bijartinên rast jî dianîn. Xwedê ji Adem, Hewa û nifşa wan dixwest kû xwezaya pîroz û dilovan a Xwedê bidin hisandin. Lê dîsa jî gava Adem û Hewa xwestin kû ji Afirîner-Xwedayê xwe re bêîtaetî bikin, dirûvîna Wî nekarin bidin hisandin. Gava ketin gunehê ji Xwedaperestî derketin û bûn xweperest. Û zarokên wekî xwe anîn dinyayê.

*"Kur û keçên Adem ên* ***di xuyanga wî de çêbûn.****"*
(Afirîn 5:3)

Em wecîzeya Wolofê bi bîr bînin: *"Xezalên kû bi lotikan diçin, nifşeke kû bi kolandina tunelê hêlîna xwe çêdikin, nikarin bînin dinyayê."* Dê-bavên gunehkar jî nikarin nifşeke kû ji kesên

rast pêk tê bînin dinyayê. Nivîsên Pîroz wiha dibêje: "Guneh **bi rêya mirovekî**, mirin jî bi rêya gunehê kete dinyayê. Bi vî awayî **mirin li hemû mirovan belav bû**, lewre hemû guneh kirin. (Romayî 5:12)

## PERESTİNA GUNEHKARAN

> *"**Habîl** bû şivan, **Kayîn** jî cotkar. Roj derbas bûn. Rojekê Kayîn ji mehsûlên axê ji REB re pêşkêşî anî. Habîl jî ji heywanên nûzayî, bi taybetî jî rûnên wan anîn."*
> (Afirîn 4:2-4)

Kayîn bû cotkar, Habîl jî şivanek. Digel kû li derdor û nava wan de bandora gunehê hebû, hê jî bi hişmeta afirîna Xwedê dihatin dorpêçkirin û bi peydakirinên Wî yên dilovan dihatin piştgirîkirin. Hem Kayîn hem kî Habîl gunehkar bûn, lê Xwedê ji wan hez kir û xwest kû Wî nas bikin û bi peresînê nêzî Wî bibin. Lê belê ji bo pêkhatina vê daxwaza Xwedê diviyabû ji pirsgirêka gunehê ya Kayîn û Habîlê re çareseriyêk bibîne. Xwedê pîroz e û *"Yên kû Wî diperêsin divê ruhî û rastî Wî biperêsin."* (Yuhanna 4:24)

Dê-bavê wan ji ber kû tama têkiliya nêzîk a bi Xwedê re stendbûn, ji zarokên xwe re hewisandinên baş dabûn. Kayîn jî Habîl jî fam kirin kû guneh Xwedê dixeyidîne. Ew jî wekî dê-bavê xwe li derveyî huzûra Xwedê hatibûn hiştin. Kû bi Xwedê re xwedî têkiliyekê bûna, diviyabû ev têkilî li gorî rêbazên Xwedê bûya.

Agahiya baş ev bû: Xwedê ji bo Kayîn û Habîl rêyek vekiribû; kû ji Xwedê bawer bikirana û kû di rêya kû Wî saz kiribû de nêzî Wî bibûna, dê pêçandina gunehên wan mumkin bibûya.

Werin em dîsa guh bidin çîrokê:

> *"Roj derbas bûn. Rojekê **Kayîn ji mehsûlên axê ji REB re pêşkêşî anî. Habîl jî ji heywanên nûzayî, bi taybetî jî rûnên wan anîn.** Reb, Habîl û pêşkêşiya wî qebûl kir. Kayîn û pêşkêşiya wî jî red kir."* (Afirîn 4:3-5)

Wekî her çîroka kû vegotina wê baş e, hemû hûrguliyên çîrokê nehatiye dayîn. Çîrok tenê **kirinên** Kayîn û Habîl vedibêje. Di beşeke din a Nivîsên Pîroz tê ravekirin ka çima kirine. Her du ciwan jî xwestin Xwedayê rast biperêsin. Her du jî, *'ji REB re pêşkêşiyek anîn.'*

Kayîn ji fêkî û sebzeyên herî baş ên kû bi keda xwe gihandibûn anî huzûra REB.

Habîl jî berxikek bêguneh û paqij anî û ew kuşt, piştre li ser gurbangehekî kû ji kevir û axê çêkiriye, bedena vê berxikê şewitand.[178]

Gava mirov ji derve lê dinêrî, pêşkêşiya bixwîn a Habîl, mirov heyirî dihişt. Pêşkêşiya Kayîn a kû ji mehsûlên axê pêk dihatin, xweş xuya dikirin û balkêş bûn. Lê Nivîsên Pîroz ev daxuyanî didin:

> ***"Reb Habîl û pêşkêşiya wî qebûl kir, lê Kayîn û pêşkêşiya wî red kir****. Kayîn pir hêrs bû, mirûzê xwe kir."* (Afirîn 4:4-5)

Xwedê çima pêşkêşiya Habîl qebûl kir û çima pêşkêşiya Kayîn red kir?

Habîl ji plana Xwedê bawer kir.

Lê Kayîn jê bawer nekir.

## ÎMANA HABÎL Û BERXİK

Nivîsên Pîroz ji me re dibêje Habîl *bi îman* hat cem Xwedê û didin zanîn ka Xwedê ji Kayîn û Habîl çi Xwestiye.

> *"**Habîl*** [yê kû ji plana Xwedê bawer dike] ***bi saya îmanê qurbane ke ji ya Kayîn*** [yê kû ji plana Xwedê bawer nake]*çêtir pêşkêşî Xwedê kir.* [Habîl] *bi saya îmana xwe wekî kesekî rast ji hêla Xwedê hate ecibandin ...* ***Bêyî îmanê razîkirina Xwedê ne mimkin e."*** (Îbranî 11:4,6)

Îmana kû Xwedê razî dike, îmana kû ji plana Xwedê bawer dike û sitûyê xwe li ber xwar dike, ye.

Dema Adem û Hewa cara pêşîn guneh kirin, Xwedê hewldan û xebatên wan ên ji bo çareseriya pirsgirêka wan a gunehê red kirin. Xwedê li şûna hewldanên wan, heywanê xwe yê qurban ê destpêkê birî û ji bo kû guneh û şerma xwe bipêçin ji wan re ji çermê kinc çêkirin. Xwedê bi kûştina heywanên bêguneh, ji wan re ev tişt hîn fikir: *"Heqê gunehê* ***mirin*** *e, lê diyariya Xwedê jiyana bêdawî ye..."* (Romayî 6:23)



Habîl bi îman nêzî Xwedê bû, yek ji berxikên nûzayî bi dilnizmî û îtaetê pêşkêşî Xwedê kir.

Bînin li ber çavê xwe kû Habîl destê xwe didane ser serê berxikê û bêdeng spasiya Reb dike; digel kû Habîl cezayê mirinê heq kiriye, dê Xwedê xwîna berxika pêşkêşkirî ji bo demekê wekî heqê cezayê gunehê qebûl bikira.

Habîl piştre radihêje kêrê û gewriya heywana narîn bi dirêjkî dibire û gava xwîna kû jiyan dide berxikê diherike, li nebza xwînê dinêre.

Habîl bi kûştina berxikê, rêza xwe ya ji xwezaya pîroz a Xwedê û ji zagona guneh û mirinê re nîşan da. Ji ber kû baweriya Habîl ji plana Xwedê heye, Xwedê ew bexşand û ew rast îlan kir. Habîl ji cezayê gunehê hat rizgarkirin, lewre cezayê gunehê li berxikê hat barkirin. Qurbana Habîl qurbana nuwaze ya kû Xwedê wehd dike kû dê rojekê gunehê dinyayê ji holê rake, sembolîze dike û di heman demê de vê Qurbanê jî nîşan dikir.

Va Xwedê **ji ber vê** *"ji Habîl û pêşkêşiya wî re rêz gir."*

## KARÊN KAYÎN Û DÎN

Em li pêşkêşiya Kayîn binêrin. Kayîn çi qas ciwanekî dîndar bû! Bi keda milê xwe, ji fêkî û sebzeyan tişteke metelhiştî amade kir û anî ber Xwedê. Lê Xwedê, Kayîn û pêşkêşa wî red kir.

Şaşiya Kayîn ne perestina Xwedayekî sexte bû, şaşiya wî ew bû kû ji Xwedayê rast re perestineke sexte pêşkêş kiribû.

Kayîn li şûna kû bi îman nêzî Afirînerê xwe bibe, *bi fikr û kedên xwe* nêzî Wî bû. Xwedê qebûl nekiribû kû dê-bavê Kayîn li gorî fikra xwe bi pelên hêjîr re xwe pêçabûn û niha jî bi heman awayî dê pêşkêşa Kayîn a kû bi têgiha wî hatibû çêkirin qebûl nekira.

Hin kes li ser vê mijarê nîqaşê dikin û vê fikrê pêşkêş dikin: “Lê Kayîn tişta kû di destê wî de bû anî!”

Xweda ji Kayîn tişta kû destê wî de bû nexwest. Xwedê jê xwest kû jê bawer bike û di bingeha cezayê mirinê –xwîna berxikekê- Wî biperêsîne. Belkî berxikeke Kayîn tunebû, lê dikarîbû fêkî û sebzeyên xwe bi berxikeke Habîl re biguheranda an jî dikarîbû li qurbangeha kû xwîna berxika Habîl rijiyaye, nêzî Reb bûya. Lê Kayîn ew qas bifêz bû kû dê tiştek wisa nekira. Xwest kû bi karên destê xwe Xwedê “biperêse”.

Xwedê **ji ber vê**, *‘Ji Kayîn û pêşkêşa wî re rêz negirt.’*

## DEYNÊ GUNEHÊ

REB çima ev qas kategorîk an jî yeqîn tevgeriya? Çima berxika şerjêkirî ya Habîl qebûl kir û fêkî û sebzeyên ter ên Kayîn red kirin?

Sedema redkirina Xwedê ya pêşkêşa Kayîn hêsan bû: cezayê gunehê keda mirov nebû, *mirin bû.* Zagona guneh û mirinê ya kû Xwedê berê ji Adem re dabû zanîn, neguherîbû. Yên kû guh nedabûn zagonên Xwedê, ketibûn bin deynê kû tenê dikarîbû bi MİRİNê bihata dayîn. Dadgerê Adil a Gerdênê, gava li hemberî zagonên Wî tê tevgerîn, destûr nedida kû berdêla wê bi cezayeke ji mirinê kêmtir bê dayîn.

Jidilî, bi keda mirovan baş dimeşe, çi qas be bila bibe, nikarin

deynê gunehê betal bikin.

Em der heqê vê mijarê de mînakeke wiha bidin: bifikirin kû yek ji bankayên mezin ji min re çend mîlyon dolar deyn dide. Li şûna kû ez bi vê perê veberhênaneke bihîkmet bikim, ez vê perê xerc dikim û vir de wê de dikim û teahûdên deynê xwe bi cih naynim. Polîs tê mala min û min digire. Gava derdikevim dadgehê ez ji dadger re wiha dibêjim: "Ez mîlyon dolarên kû deynê min e nikarim di hemû emrê xwe de bidim, lê ji bo jêbirina deynê min planeke min heye. Plana min ev e: Ez ê li şûna kû deynê xwe bi perê bidim, ez ê deynê xwe bi kirinên xwe yên baş bidim. Ez ê her hefte daneke rojekê xwarin nexwim û ez ê bi vê xwarinê zikê feqîrekî têr bikim. Û di heman demê de ji bo kû xwe ji şerma deynê xwe paqij bikim, ez ê rojê çend caran bi awayekî merasîmî xwe bişom. Heya kû deynê min biqede, ez ê van hemû karên baş bidomînim."

Dadger dê qebûl bike kû deynê perê bi tişteke wisa bêmantiq bê dayîn? Qet! Dê Dadgerê hemû rûzemînê jî deynê gunehê bi dua, rojî û karên baş qebûl neke. Ji bo dayîna deynê gunehê rêyeke tenê heye. Deynê gunehê bi **MİRİNê**—*heta hetayê ji Xwedê dûrketin*—divê bê dayîn.

Rêyeke heye kû gunehkarên neçar ji vê *zagona guneh û mirinê ya kû jê filitîn tune ye, bên xilaskirin?*

Hemd ji Xwedê re kû rêyeke wisa heye.

## ZAGONA QURBANÊ

Ez lîstikên kaxezê nalîzim, lê ez dizanim kû hin kart li ber kartên din wekî "koz" tên bikaranîn. Ev kart, li gorî nirxa diyarkirî ya kartekê, kartên kû kêmtir girîng in rahişktirin û li hemberî van kartan her tim têk dibin.

Pirtûkên bi navê Daniel û Ester ê Peymana Kevin, ji kralên kevin ên kû zagonan çêdikin, behs dikin. Ev zagon, *"Li gorî zagona neguher a Med û Persan têne îmzekirin û nayên guhertin."* (Daniel 6:8) Ger kralekî bixwaze zagonekê têk bibe, li şûna kû vê zagonê betal bike, dê zagoneke xurttir derxista, wê demê dê zagona kevin li cem zagona nû ya xurt bênirx bûya.[179]

Bi heman awayî, ji serî de ji bo çareseriya biedalet a Xwedê ya der heqê têkbirina *"zagona guneh û mirinê",* zagoneke xurttir a *"Zagona pêşkêşiya gunehê"* (Leviyî 6:25) an jî di heman demê de *"Zagona qurbana Selametiyê"* (Leviyî 7:11) derxist.

Xwedayê kû piştgirî dide hemû zagonan, *zagona qurbana selametiyê* derxistkû *zagonaguneh û mirinê* ya kû hê berdewam dikir,bênirx bike.

Zagona qurbana selametiyê, hem ji gunehkarên sûcdar re *rehm* da, hem jî di heman demê de li hemberî gunehê *edalet* anî. (kû hûn dixwazin dîsa li vê mijarê binêrin, li beşa 13. binêrin kû der heqê çima divê Xwedê dilovanî û edalet di nav parsengeke nuwaze biparêze de ye.) Zagona qurbanê kû xwîna wê hat rijandin, ji Xwedê re rêyek da kû bêyî cezakirina gunehkaran, gunehê ceza dike. Xwedê mimkinbûna vê wiha rave dike:

> *"Ya kû ji candaran re jiyan dide,* ***xwîn*** *e. Min ew ji we re da kû hûn li qurbangehê gunehê xwe bibexşînin. Lewre xwîn ji dêla jiyanê* ***guneh dide bexşandin****."* (Leviyî 17:11)

Ev zagon ji sê rêgezên bingeh pêk dihat:

1. **XWÎN JİYAN DİDE**—Xwedê got, ***"Ya kû jiyan dide zindîyan xwîn e".*** Zanista modern daxuyaniyên Nivîsên Pîroz kû bi hezar salan e dide, dipejirîne: *canê aferîdeyekî di xwîna wî de ye.* Xwîna baş, hemû elementên pêwîst dihewîne kû jiyan bidome û qirêjayiyên ne saf paqij bibin. Xwîn girîng e; kû xwîna mirov û heywanan tune be ji miriyê ne cuda ne.
2. **GUNEH MIRİNÊ DİXWAZE**—Xwedê di heman demê de ***"Xwîn ji dêla jiyanê guneh dide bexşandin."*** jî got. Peyva *kefaretê* ji peyva *kaphar* a Îbrankî tê û wateya wê *"pêçandin, betalkirin, paqijkirin, bexşandin û lihevhatin"* e.[180] Gunehkar tenê dikarin bi rêya xwîna herikî bihatana paqijkirin û dikarîbûn bi Afirînerê biedalet re li hev bihatana. Ji ber kû cezayê gunehê mirin e, Xwedê digot dikare xwîna qurbaneke pejirandî (jiyana kû ji bo cezayê

hatiye wendakirin) *wekî dayîna cezayê gunehê an jî pêçandina wê* qebûl bike.

## KETINA ŞÛNA WÎ

Rêgeza bingeh a *zagonaqurbana selametiyê,* bi peyvekê dikare bê kûrtasîkirin: **Ketina şûna wî.** Dê heywanekî bêguneh, biketa şûna gunehkarekî û bimiraya.

Reb beriya nifşên hatina Mesîh, ji ezbeta Adem re da zanîn kû dê xwîna berxikek, pezek, bizinek an jî gayek ji bo pêşkêşiya qurban a gunehkaran ji bo demekê webûl bikira. Kevok an jî qumriyek jî dikarî bihata pêşkêşkirin.[181] Ew kes çi qas dewlemend an jî feqîr, baş an jî xirab bibin jî haya wan hemûyan diviyabû ji gunehê wan hebûya û diviyabû ji Xwedê bawer bikirana kû dê bi saya xwîna qurbanê ew bibexşanda.

Diviyabû aferîdeyê darazxwarî *"bêsûv û paqij"*[182] bûya. Diviyabû qet nexweşiya wî, hestiyê wî yê şikestî, di bedena wî de qet cihê birandî an jî xêzik tunebûya. Qurbana kû dê xwîna wê bihata rijandin, diviyabû bi awayekî sembolîk nuwaze bûya. Kesê kû qurban pêşkêş dike *"diviyabû destê xwe dane ser serê heywanê û ew şerjê bikira ... ev **pêşkêşiyeke gunehê ye.**"* Rûnê heywên piştre li ser qurbangehê dihat şewitandin.

Û Xwedê der heqê kêrhatina vê pêşkêşiyê de çi got?

*"Dê gunehê wî kesî bê **bexşandin**."* (Leviyî 4:23-26)

Kesê kû destê danî ser qurbanê, bi vê tevgera xwe sembolîze dikir kû gunehê wî derbasî aferîdeyê bêqusûr dibû. Bi vî awayî hilgirê gunehê, diket *şûnagunehkar* û dimiriya.

Di rêgeza bingeh a *ketina şûnê* de, guneh dihat cezakirin û gunehkar dihat bexşandin. Cezayê mirinê kû ji ber gunehê çêdibû, li şûna mêr an jî jina sûcdar heywanê bêguneh, qurbanê "nuwaze" hildida ser xwe.

*Pêşkêşa qurbana selametiyê* ji gunehkaren re hîn kir kû Xwedê pîroz e û *"bêyî rijandina **xwînê**(cezayê mirinê) dê*

***bexşandin*** *çênebe* (dûrkirina cezayê gunehê).” (Îbranî 9:22)

Xwedê bi rêya qurbankirina heywanekî Edaleta xwe ya li hemberî gunehê tîne cih û ji gunehkarên kû jê bawer dikin re Dilovaniya xwe rê dida. Xwedê wehd kir kû kesên kû bi vê riyê bên dê bereket bikira. Xwedê di heman rojê de, ji gelê xwe yê dema berê re Deh Ferman da û ji wan re got riya kû ji hêla Wî bêne qebûlkirin ev e; divê qurbaneke kû li ser qurbangehê xwîna wê rijiyaye pêşkêşî Wî bikin û nêzî Wî bibin.

> *“Hûn ê* ***ji bo min*** *ji axê qurbangehekê çêkin. Hûn ê pêşkêşiyên xwe yên ji bo şewitandinê û ji bo selametiyê* ***li ser wê pêşkêş bikin. Ez ê bême her cihê kû navê xwe bi bîr tînim û ez ê we pîrozînim.”*** (Ji Misirê Derketin 20:24)

Armanca bingeh a vê xwîna-ji dêla-gunehê ev e; heya kû Rizgarkerê wehdkirî bê xezeba biedalet a Xwedê ya li hemberî gunehê bê nîşandan.

Armanca Mesîh ew bû kû *wateya rast* a zagona qurbana selametiyê bîne cih.

Li gorî têgihîna Xwedê ya li hemberî nirxê ew bû kû jiyana mirovekî ji nirxa hemû hewwanên dinyayê zêdetirbû. Heywan mîna mirov nehatin afirandin. Canê heywanan ne bêdawî ye. Wekî encam, xwîna heywên ji bo betalkirina deynê gunehê yê mirov çi hewce bû *tenê dikarîbû sembolîze bikira.*

Berxika Habîl a şerjêkirî, di Peymana Kevin de di nav qurbanên bêhejmar de ya destpêkê e kû hatiye tomarkirin. Em di çîrokên Peymana Kevin de dibînin kû yên biîman ji bo perestina Xwedê bi xwînên herikî yên heywanên bêgunêh û paqij tên. Di nav van çîrokên bêhejmar ên kû qala heywanên qurban dikin de, yek ji yên din cuda tê nîşandan.



# 20

# Qurbaneke Girîng

Hemû malbat tê der dora wî.

Heywanê kû bi zorî situyê wî tê xwarkirin, li erdê tê dirêjkirin.

Kal û ciwan hemû tev de destê xwe didanin ser pez an jî ser destê bav kû kêr digire.

Piştî derbeke lezelez jiyana heywên li ser axê mîna nebzê davêje.

Pêşkêşiya qurbanê bi vî awayî hatiye cih—heya sala bê dê dîsa bê dubarekirin.

"Di Cejna Qurbanê de" — *Eyd el-Adha* —Misilman bûyereke Pirtûka Pîroz a kû çar hezar sal berê pêk hatiye, nîşan dikin; di vê bûyerê de Xwedê ji bo kû li şûna Birahîm bimire beranekî şandibû.[183] Qur'an kurtasiya vê çîroka klasîk wiha vedibêje: *"Me jê (Birahîm) re* ***qurbaneke mezin*** *da û ew (Îsmaîl)* ***rizgarkir****."* (Sûre 37:107)

Ji bo famkirina temamiya vê çîroka dramatîk, em vegerin pirtûka Afirînê.

## BİRAHÎM

Birahîm[184] B.M nêzî sala 2000an li welatê Urê kû îro wekî Iraq tê zanîn, hate dinyayê. Wekî her kesî kû ji nifşa Adem hatiye, ew jî bi xwezaya gunehê hat dinyayê. Digel kû Birahîm di nav wan kesên kû putan diperêsin mezin bû, bû kesekî kû ji yek Xwedayê rast re îman kir. Birahîm îro li dijî gelek kesan,

baweriya dê-bavê wî çi be bila bibe, wisa nedifikirî kû divê girêdayî baweriya wan bibe.

Birahîm jî wekî Habîl, bi rêya xwîna herikî ya heywanên qurbankirî nêzî Xwedê bû.

Dema Birahîm bû heftê û pênc jina wî bû şêst û pênc salî, REB jê re xuya kir û wiha got:

> *“Welatê xwe, nasên xwe, mala bavê xwe berde, here welatê kû ez ê nîşanê te bidim.* ***Ez ê te bikim neteweyeke mezin û ez ê te pîrozînim.*** *Ez ê te navdar bikim, tu yê bibî çavkaniyê bereketê. Ez ê wan kesên kû te pîrozî dikin, pîrozînim, kesên kû te lanet dikin, lanet bikim.* ***Û hemû gelên serzemînê bi rêya te bêne pîrozandin.”***
>
> (Afirîn 12:1-3)

Xwedê wehd kir kû dê bi rêya Birahîm dê *“neteweyeke mezin”* çêke kû hemû neteweyan rizgar bike. Ev netewe dê *“mezin”* bûya, lê ne bi hejmaran, bi girîngîya xwe dê mezin bûya.

Ji bo pêkhatina vê neteweya nû, Xwedê ji Birahîm û jina wî Seray a kû zarokên wê tune ne re ferman kir kû bila ber bi wî welatê kû ji nifşên wan –digel kû hê qet zarokên wan tunebûn– re wehdkirî ye, ve biçin.

Birahîm ji wehdên Xwedê re kû pêkanîna wan nemumkin xuya dibûn çi bersiv da? Birahîm baweriya xwe bi Xwedê anî û jê re îtaet kir, mala bavê xwe berda û ber bi welatê Kenan ê kû îro wekî Îsraîl tê zanîn, ve çû.

## ÎMANA BİRAHÎM

Piştî kû Birahîm gihîşt Kenanê, Xwedê jê re wiha got: *“Ez ê van axan bidim* ***ezbetate****. Birahîm (Avram) li wir ji Xwedayê kû jê re xuya bû re pêşkêşiyek çêkir.”* (Afirîn 12:7)

Wehda Xwedê, gava şert û mercên wî welatî dihat fikirîn, mirov matmayî dihişt. Lewre li welatê Kenanê gelek komên mirov ên ji hev cuda dijiyan. Birahîm û ezbeta wî dê çawa xwedî vî welatî bibûna? Ezbeta wî û ya jina wî tune bû.

Bînin li ber çavên xwe kû kal û pîrekê ji welatekî dûr ji bo ziyaretê têne welatê we. Dema bêne welatê we hûn ê ji vê kal û pîrê re wiha bêjin: “Rojekê hûn û nifşa we xwedî vî welatî bibin!” Kalik dê bikene û wiha bêje: “Pir komîk e! Ez ne xwedî ezbetekê me jî! Ez mêrikekî kal im; zarokên min tune ne û jina min nikare zarok bîne û hûn ji min re dibêjin kû dê nifşa min zêde bibe û xwedê vî welatî bibe! Hûn nexweş in qey?”

Va ye wehda kû Xwedê ji Birahîm re da wehdeke wisa bû kû mirov heyirî dihişt. Birahîm li hemberî vê wehdê çi kir? Nivîsên Pîroz dibêjin kû *“Ji Reb re **îmankiriye** û Reb jî ev wekî rastî hesibandiye.”* (Afirîn 15:6) Ji ber kû Birahîm ji wehdê Xwedê mîna îmana zarokekî îman kir, Xwedê ev îman rastî qebûl kir. Birahîm piştî mirina xwe dê li Bihuştê bi REB re heta hetayê jiyana xwe berdewam bikira.

Di metna orîjînal a Îbrankî de beramberê peyva *“îman kir”*, *aman* e û biwêja *“Amîn!”* ê ji vê peyvê tê; tê wateya “Bila wisa be!” an jî “Ya kû tê gotin rast e û bawerî jê tê!”

Ji kerema xwe bala xwe bidin vê xala girîng; *Ji Reb re îman kirin,* bihîstina tişta kû Ew dibêje ye û jidil jê bawerîkirin û bersivdayîna “Amîn!” e. Ev îman bi qasî îmana zarokekî kû bi Xwedê re têkilî çêdike saf û bêguman e. Rast qebûlkirina me ya Peyva Xwedê dê bi tevgerên me kifş bibe. Îmana Birahîm bi hilbijartina wî ya rêya rast hat pejirandin; Birahîm ji bo şopandina Xwedê pişta xwe da bavê xwe.

> *“**Birahîm ji Xwedê re îman kir** û bi vî awayî paqij hat hesibandin û ji Birahîm re **dostê Xwedê** hat gotin.”*
> (Yaqûb 2:23)

Birahîm dostê Xwedê bû, lewre ji Peyva Xwedê bawer kir. Lê dîsa ew rewş nayê wê wateyê kû Birahîm di hemû dema jiyana xwe de ji Xwedê bawer kiriye. Xwedê bi zagonî da zanîn kû ew bi awayekî nuwaze rast e, lê Birahîm di çalakiyên xwe yên jiyana xwe ya rojane de ne nuwaze bû. Nivîsên Pîroz guneh û xetayên pêxemberan venaşêrin.

## ÎSMAÎL

Birahîm û Seray li welatê Kenanê wekî koçber jiyan, li konan rûniştin, ji cihekî çûn cihekî din û wisa jiyana xwe domdar kirin. Bi demê ve heywanên nav garana Birahîm zêde bûn.

Ji ser wehda Xwedê kû dê Birahîm bikira neteweyeke mezin, deh sal derbas bibûn. Niha Birahîm heştê û şeş û jina wî jî bibû heftê û şeş salî û hê qet zarokên wan tune bûn. Kû ezbeta wî tune be dê Birahîm çawa bûya nifşeke mezin? Birahîm û jina wî ji bo Wehd bê cih biryar dan kû “alîkarî” Xwedê bikin.

Birahîm û jina wî li şûna kû bimînin li Xwedê kû Plana Xwe di Dema wê de pêk bîne, xwestin kû li gorî hisê selÎm û çanda herêmî tevbigerin. Seray, keça cêrî ya Misirî kû navê wê Hacer e, da mêrê xwe Birahîm; dê Birahîm bi Hacer re raketa û dê bi vî awayî zarokên wan çêbûna. Hacer ji Birahîm re kûrek anî, navê wî Îsmaîl danîn.

Ji ser de sê sal derbas bûn, dema Birahîm bû nod û neh salî, Yê kû Hêza Wî Têra Her Tiştê Dike ji Birahîm re xuya kir û jê re got dê ji jina wî Seray jê re kurekî çêbe:

> *“Birahîm ser rûyê xwe li erdê rûnişt û keniya. Di dilê xwe de got, ‘Mêrekî sed salî dikare xwedî zarok bibe? Serayê nod salî dikare zarok bîne?’ Piştre ji Xwedê re got, ‘Xwezî te Îsmaîl wekî wêrisê min qebûl bikira!’ Xwedê jê re got, ‘Na, lê jina te Sara dê ji te re kurekî bîne, tu yê navê wî Îshaq bikî. Ez ê bi wî û bi nifşa wî re peymana xwe heta hetayê bidomînim.* ***Kû em li Îsmaîl binêrin, min tu bihîstî. Ez ê wî pîrozînim, bi bereket bikim û ezbeta wî çi qas dikare zêde bikim. Dê bibe bavê dozdeh Mîran. Ez ê nifşa wî bikim neteweyeke mezin. Lê belê ez ê peymana*** *xwe sala bê bi te Îshaq yê kû dê Sara bîne dinyayê re* ***bidomînim****.”* (Afirîn 17:17-21)

## ÎSHAQ

Xweda wehda xwe anî cih. Seraya nod salî ji Birahîm re kurekî anî û navê wî kirin Îshaq.

> *"Zarok mezin bû. Gava dev ji şîr berda, Birahîm mihrîcaneke mezin çêkir. Lê Sara dît kû Hacerê Misirî Îsmaîl ê kû ji Birahîm çêbû henekên xwe dike."*
>
> (Afirîn 21:8-9)

Îsmaîl plana Xwedê ya der heqê Îshaq de neeciband; Xwedê ji bo kû rastiya xwe bigihîne cîhanê û rizgariyê bînê dê Îshaq bi kar bianiya. Îsmaîl li şûna kû vê plana Xwedê biecibîne, bi zirbayê xwe re henekên xwe kir. Bêhntengiya kû ji ber vê çêbû ew qas mezin bû kû, Birahîm di dawiyê de neçar bû kû Îsmaîl û Hacer şand. Ji bo Birahîmê kû ji xwe Îsmaîl pir hez dike, ceribandineke pir biêş bû ev.

> *"Lê belê Xwedê ji Birahîm re got, 'Ji bo xwe (Îsmaîl) û cêriya xwe (Hacer) xemgîn nebe ... lewre nifşa te dê **bi Îshaq** berdewam ke.' Dema zarok (Îsmaîl) mezin dibû Xwedê bi wî re bû. Zarok li çolê jiya û bû tîrbaz. Dema li çola Paranê dijiya diya wî jê re jineke Misirî stend."*
>
> (Afirîn 21:12, 20-21)

Wekî kû REB soz da, Îsmaîl bû bavê neteweyeke mezin a kû Xwedê cur be cur bi bereket kiribû. Lê dîsa jî REB ji Brahîm re bi awayekî zelal da zanîn kû dê rizgariya cîhanê bi *"Îshaq re"* pêk bîne.

## ÎSRAÎL

Piştre Îshaq zewicî û nêwîyên cêwî yên bi navê Esav û Yaqûb çêbûn. Xwedê *"Dê ji îro pêve navê te bibe **Îsraîl**"* (Afirîn 35:10) *got* û di dawiyê de ji Yaqûb re navekî nû da. Yaqûb xwedî dozdeh zarokan bû, Xwedê ji van dozdeh kûran kû di dema Mûsa de kalikên dozdeh êla Îsraîl bûn, neteweyeke çêkir. REB nifşên

Birahîm, Îshaq û Yaqûb wekî *"gelê xwe yê bijartî"* bi nav kir.[185]

Xweda çima ew bijartin? Ew ji neteweyên din çêtir bûn? Na. Esas Xwedê ji wan re *"bi hejmare ji wan **kêmtir** in"* got (Dubareya Zagonê 7:7). REB vî gelê Îbranî yê kû zeîf, bêqewet û biçûkxistî bijart, lewre dixwest kû di plana Wî ya rizgariyê de bila tu keda mirov tune be û tu kes pesna xwe nede.

Xwedê ji xebata wisa hez dike.

> *"Ji bo yên kû tiştên dinyayê girîng dibînin hîç bike, yên kû dinya **ne girîng**, **bê esil**, **bê nirx** dibîne hilbijart. **Hingî bila li ber Xwedê tu kes pesnê xwe nede.**"* (Korîntiyên 1., 1:28-29)

## QENALE KE RAGİHANDİNÊ

Xwedê wisa sêwirandibû kû dê bi rêya vê neteweya nû peyama xwe ragihanda çarhawirê serzemînê. Hê radyo û televîzyon tunebûn, Xwedê vê "qenala ragihandinê" afirand, lê belê dê bandora qenala ragihandinê ji ya radyo û televîzyonê zêdetir bûya. Karên biqudret ên Xwedê yên nav vê neteweyê, dê di hemû dinyayê de bihata bihîstin. Mînak, kû em li Nivîsên Pîroz binêrin, em ê bibînin kû ev şahidiya jineke Kenanî hatiye nivîsîn: *"Dema hûn ji Misirê derketin, me **bihîst** ka **REB** li ber we çawa Deryaya Sor zuwa kir… **Xwedayê we REB** hem li jorê li ezmanan, hem li jêrê li serzemînê **Xweda** ye."* (Yeşû 2:10-11)

Xwedê di heman demê de dê ji vê neteweyê *pêxemberên* kû dê *Nivîsên Pîroz* binivîsin jî hilbijarta.

Ya herî girîng jî, Xwedê dê dîsa ji rêya nifşekê, *Nifşeke* kû ji dinyayê re bibe qenala bereketê çêkira. Wekî kû me berê jî dît (di beşa 16. de), ev Nifş, dê ji yekê bakîre, ji bo kû ji keçeke feqîr a Cihû çêbe dê ji ezmanan bihata, dê *Ezbeta jinekê ya wehdkirî* bûya.

Em bipejirînin jî nepejirînin jî ev neteweya kevin qenalqenala ragihandinê ya ji hêla Xwedê ve hatibû çêkirin kû rastiya Xwedê û bereketên Wî yên bêdawî ji her kesî cîhanê re pêşkêş dikir. Û her tişt gava Xwedê ji Birahîm re got terka mala bavê xwe ke û here warê Kenanê dest pê kir.

Du beşên girîng ên peymana mezin a kû Xwedê bi Birahîm re kir, hebûn:

1) *"Ez ê te bikim* ***neteweye ke mezin*** *û ez ê te pîrozînim ..."*
2) *"Û* ***hemû neteweyên serzemînê*** *bi rêya te bêne pîrozandin."*

Hezkirina Xwedê tenê bi komeke taybet re ne bisînor e. Xwedê tenê nexwest Birahîm û Îsraîl bi bereket bike. Dilê wî yê dilovanî, bêriya *"hemû kesên rûzemînê"* dike. Di Peymana Kevin de gelek çîrok hene kû dibêjin, Xwedê ji bo kû ji hemû netewe û komên zimên ên serzemînê re Kerema xwe pêşkêş bike neteweya Îsraîlê ya kû bi hejmaran kêm in û serhişk in, bi kar anî.[186] Armanca Xwedê ya bi rêya vê neteweya kû biçûk tê dîtin ve, bereketkirina hemû neteweyên din ew e kû divê di Pirtûka Pîroz de gava ew her beşa kû REB Îsraîliyan ji wan kesên kû dixwazin wan qirim bikin diparêze tê xwendin, bi bîr bê.

Xwedê piştgiriyê dida wan, lê sedema vê ne ew bû kû Îsraîlî ji neteweyên din çêtir bû, piştgiriyê dida wan, lewre bibiryar bû kû bi *rêya wan* hêza xwe û hişmeta xwe nîşan bide û rizgariyê bîne cîhanê; Îsraîlî ew ***qenal*** bûn kû vê armanca Xwedê pêk bînin. Xwedê dema nifşên Birahîm, Îshaq û Yaqûb diparast, di heman demê de hemû Bereketên kû dixwest pêşkêşî *"hemû mirovên serzemînê"* bike, diparast.

Ya girîngtir ew bû kû navdariya REB Xweda di xetereyê de bû. Wî li ser navê Xwe yê mezin sond dixwar kû dê bi rêya vê neteweya zeîf û biçûkxistî hemû neteweyan bi bereket bikira.[187]

Xwedê wehda xwe dê ji bo rûmeta navê xwe bi hûrbijer û teqez bianiya cih. Kû navdariya navê me an jî rûmeta malbata me di xetereyê de bûya, me yê bi heman awayî tevnegeriya?

## XWEDÊ BİRAHÎM DİCERİBÎNE

Werin em vegerin ser çîroka klasîk a der heqê qurbana mezin û girîng a Birahîm.

Dorhêla çîrokê ev e: Birahîm pir kal bibû. Bi salan bû Îsmaîl şandibû. Tenê Îshaqê Birahîm li malê mabû.

Xwedê dikir ji îmana Birahîm re ceribandine ke mezin bikira. REB Xweda di heman demê de dikir ji cîhanê re hin mînak û pêxemberî nîşan bide der heqê plana xwe ya kû dê zarokên Adem ji cezayê mirin a gunehê rizgar bike de.

> *"Piştre Xwedê Birahîm ceriband. Bang li Birahîm kir, 'Birahîm!'. Birahîm got, 'Ez li vir im!' Xwedê jê re got, 'Rahêle Îshaq, xwe yê yekane, û here herêma Moriya. Li wir li çiyayekî û ez ê nîşanê te bidim xwe wekî pêşkêşiyekî şewitandinê pêşkêş bike."* (Afirîn 22:1-2)

Xweda Birahîm beraliyê çiyayekî kir kû li wir xwe yê yekane bikuje û piştre li qurbangehekê bişewitîne! Çi daxwazeke metelhiştî! Ev daxwazeke wisa bû kû Xwedê tu car ji kesekî nekiribû û dê ji tu kesî nekira. Lê dîsa jî deynê gunehê yê Îshaq –wekî hemû nifşa Adem– hebû, ji ber vê daraza kû der heqê wî de dihat dayîn biedalet bû: mirin.

> *"Birahîm şeveqê rabû. Kerê xwe palan kir. Du xulamên xwe û Îshaq tev xwe birin. Piştî kû ji bo şewitandinê dar qelaştin, berê xwe da cihê kû Xwedê jê re got."* (Afirîn 22:3)

Birahîm baweriya xwe bi Xwedê anî, lê ne hêsan bû. Sê roj kû bi êş derbas bû, bi xwe û her du xulamên xwe re rêwîtî kirin, her gavên wan ew nêzî cihê înfazê dikirin.

> *"Birahîm roja sêyemîn cihê xwe yê kû biçe ji dûr ve dît. Ji xulamên xwe re got, 'Hûn li vir, li cem kerê min bimînin. Ji bo perestinê ez û min biçin wir û em ê bi hev re vegerin.'"* (Afirîn 22:4-5)

Birahîm ji xulamên xwe re got, *'Em ê bi hev re ve vegerin cem we.'*

Kû Îshaq bihata kûştin û li ser qurbangehekê bihata şewitandin, dê Birahîm û wî bi hev re çawa *dikarînvegerin?* Di beşeke Nivîsên Pîroz de bersiva vê tê dayîn. Ji ber kû Xwedê wehd kiriyê dê ji Îshaq neteweyeke mezin çêke, Birahîm bawer kir kû piştî qurbankirina wî dê Xwedê dîsa ew vejîne.[188] Birahîm hîn bibû kû REB Xweda her tim wehdên xwe bi cih tîne!

## XWEDÊ QURBANEKE DİŞÎNE KÛ DİKEVE ŞÛNA ÎSHAQ

*"Birahîm darên qelişandî yên ji bo şewitandinê li Îshaq bar kir. Agir û kêr bixwe girt, û bi hev re meşiyan."*
(Afirîn 22:6)

Dema bav û kûr bi hev re meşiyan, Îshaq bang li Birahîm kir:

*'Bavo!'*

*Birahîm bersiva wî da, 'Kerem ke min!'*

*Îshaq jê pirs kir, 'Agir û dar li vir in, lê* ***berxika pêşkêşiya kû bê şewitandin li kû ye?****'*

*Birahîm got, ' min,* ***dê Xwedê bixwe berxika pêşkêşiyê bide ji bo şewitandinê.****' Her du berdewamê meşê kirin.*

*Dema ghiştin wî cihê kû Xwedê jê re diyar kiribû, Birahîm qurbangehek çêkir. Dar xist ser wê. xwe Îshaq girêda û li ser wan daran dirêj kir. Ji ber kû wî şerjê bike rahişt kêrê xwe.*

*Lê belê milyaketê REB ji ezmanan bang kir, 'Birahîm, Birahîm!' Birahîm bersiv da, 'Va ye ez li vir im!'*

*Milyaket got, 'Tevlî zarok nebe. Jê re tiştek neke. Niha min fam kir kû tu ji Xwedê ditirsî, tê xwe yê yekane ji min texsîr nekir.'*

*Dema Birahîm çavên xwe rakirin û li derdor nêrî, beranekî dît kû li pişt wî disekine û stroyên wî ketine deviyan."* (Afirîn 22:7-13a)

Reb tevlî bû. Dê Birahîm ji cezayê mirinê bihata texsîrkirin!

Birahîm li derdora xwe nêrî û li dûr, li piŝta heman çiyê bala xwe da kû di nav deviyan de tiştek diçe tê. Ev çi bû? An, an… dibe kû bibûya? Erê! Hemd û sena be ji Xwedê re!

*“Beranekî kû stroyên wî ketiye deviyan û bêqisûr!”*

Xwedê li gorî *‘Zagona pêşkêşiyê ya qurbanê’* qurbanek dabû kû bikeve şûna gunehkaran.

> *“Birahîm çû beran anî.* ***Li şûna kurê xwe ew wekî pêşkêşiya şewitandinê pêşkêş kir.”*** (Afirîn 22:13b)



Birahîm çima ji vê daraza mirinê kû li ser wî hukim bibû rizgar bû? *“Li şûna kurê Birahîm”* beran miribû.

Xwedê qurbaneke dabû kû ketibû şûna gunehkaran.

## REB DÊ PEYDA BİKE

> *“Û Birahîm navê wir kir* ***Yahve yire (REB peyda dike).*** *Peyva* ***‘Dê li çiyayê Reb peyda bibe’,*** *ji ber vê îro jî tê gotin.”*
> (Afirîn 22:14)

Birahîm piştî kû li şûna xwe beran kuşt, çima ji wir re navê

*‘REB **dê** peyda bike’* danî? Birahîm çima ji wir re navê *“Reb peyda **kir**”* nedanî?

Birahîm pêxember bi peyvên xwe yên *“REB **dê** peyda bike”* re bûyereke pêşerojê kû dê ji wê rojê nêzî du hezar sal şûn de pêk bê, daxuyan dikir. Lewre Reb ne kû tenê kesekî ji mirinê filitîne, ji bo hemû dinyayê kefareteke bêkêmasî û dawînî bîne dê li ser pişta vî heman çiyê (piştre bajarê Yeruşalimê li vir ava bû) qurbaneke din peyda bikira.

Dema Birahîm bi xwe Îshaq re hêdî hêdî ber bi çiyayê kû dê qurban bihata pêşkêşkirin ve diçûn, ji xwe yê kû bi zorî dimeşiya çi got tê bîra we? Ji wî re wiha got:

> ***“Dê berxika pêşkêşiyê kû dê bê şewitandin Xwedê bixwe bîne.”***

Tişta kû Birahîm qal dikir çi bû? Xwedê *berxikekê* peyda kiribû kû bikeve şûna Birahîm û bimire? Na, Xwedê berxikek peyda nekir. Xwedê *beranek* peyda kir. Naxwe gava Birahîm pêxember gava got dê Xwedê *ji bo wî **berxikek*** peyda ke, xwest çi bêje?

Bersiva metelhiştî ya vê pirsê dê nêzîk de derkeve holê, lê bêrî vê divê çend çîrok jî bên vegotin.



# 21

# Xwîna Kû Bêtir Dirije

Werin em dirust bibin.

Dema mijar rastiya ruhî be, em ji bo fêrbûnê hêdî tevdigerin.

Xwedê vê rastiyê dizane:

*"Heya niha diviyabû hûn mamoste bûna, niha pêdiviyame bi yekî heye kû* ***rêgezên*** *peyva Xwedê ji we re ji nû de hîn bike. Ji we re dîsa şîr pêwîst e, ne xwarinên hişk."*
(Îbranî 5:12)

Ax!

Xwedê bi saya dilovaniya xwe mamosteyê herî bisebr e. Rêgezên bingeh ên kû diviyabû em berê hîn bûna, jê nareve kû dubare bike û dîsa bêje. Xwedê ji bo kû alîkariya me bike, bi sedan çîrokan kû yek ji rastiyên herî girîng bi grafîkî xêz dike, xistiye nav Pirtûka xwe.

*"Bêyî rijandina xwînê bexşamdin nabe."* (Îbranî 9:22)

Bexşandina gunehê, ji hêla Afirînerê me yê kû pîroziya Wî nuwaze ye, tu car wekî mijareke hêsan xuya nekiriye. Xwedê ji roja kû guneh ketiye dinyayê, dest bi hînkirinê kir kû tenê xwîna qurbaneke lihevhatî dikare ji gunehê re bibe kefaret (dikare gunehê bipêçe). Xwedayê kû Dadgerê Adil e, dê gunehê bêyî

cezakirina gunehkaran tenê bi vî awayî darizanda.

REB kedên kesane yên Adem û Hewa yên kû ji bo veşartina gunehên xwe didan, red kir. Heya kû deynê gunehê bi mirinê nehata dayîn, Xwedê dê gunehê nebexşanda. Çîroka Kayîn û Habîl jî ji me re heman dersê da. Me di çîrokên Birahîm û Îshaq de jî heman tişt dît.

Pirtûkên Peymana Kevin ên Leviyî û Ji Misirê Derketin, yên kû pirtûka Afirînê dişopînin, bi çîrokên mêr û jinên kû sitûyê xwe li ber vê zagona qurbanê xwar kirine re tijî ye.[189]

## EZ Ê Jİ SER WE DERBAS BİBİM

Pirtûka Ji Misirê Derketin, wekî kû Xwedê berê wehd kiribû, çîrokeke balkêş a kû Xwedê dê nifşa Birahîm bike netewe, dihewîne.

Wekî kû Xwedê berê ji Birahîm re gotibû,[190] bi rêya bûyerên kû bi awayî xwedayî pêk hatine, nifşa Îsraîlê bûn koleyên kû di bin serweriya firewnên Misirî de bûn. Xwedê wehd kir, kû wext bê dê wan ji koletiyê derxe û Xwedê di nav vê pêvajoyê de, dê "wêneyên" Plana xwe ya kû ji bo zarokên Adem ji êsîriyê derxe çêkiriye, ragihanda.

Çîroka Fisih va ev e.

B.M derdora sala 1490an, REB bi rêya peyva Musa, deh belayên ecêb anîn ser Misirê. Neh nîşaneyên mucîzewî yên sereke –Reb bi van neh belayan re serî li hemberî xwedayên sexte yên Misirê hilda û ew têk birin- nehişt kû Firewn sitûyê xwe li ber Xwedê xwar bike û Îsraîlî biçin.[191] Xwedê li ser vê ji Mûsa re got kû bila ji mirovan re ragihîne kû pêşîn ê her malbata Misirî û Îsraîliyan mehkûmî mirinê bû. Nîvê şevê gava wext bê, dê milyaketê mirinê ji welêt derbas bûya û li her malê pêşîn bikûşta.

Ev agahîyeke xirab bû.

Agahiya baş jî ev bû: Xwedê ji bo kû ji vê belaya mirinê bifilitin, rêyeke çêkiribû. REB ji Mûsa re ferman kir kû bila her malbat *'ji pez an jî bizinên xwe, yê bê bêqusûr, nêr û berxikeke yek salî'* (Ji Misirê Derketin 12:5) hilbijêrin. Piştre gava wext hat, diviyabû berxik bihata kuştin û xwîna wê li rexê xanî û li ser serê

deriyan bihata lêdan. Yên kû xwîna berxikê li rex û li ser deriyên xênî lêdabûn, gava belaya mirinê ji welêt derbas be, kesên kû li wê malê dimînin dê rizgar bûna.

REB wehd kir:

> *"**Dema ez xwînê bibînim ez ê ji welatê we derbas bibim;** dema Misirê ceza dike yê kû mirin belav dike **dê tevlî we nebe.**"* (Ji Misirê Derketin 12:13)

Her tişt li gorî gotina Xwedê pêk hat. Xwedê wê şevê hemû n pêşîn ên kû mane *dibinxwînêde* parastin; yên din hemû mehv bûn. Maleke bê mirî tune bû.

Belê, *li her malê* miriyek hebû.

An *berxikek* an jî pêşîn miribû.

Wê şevê, yên kû xwîn li rex û li ser deriyê xaniyê xwe dan ji zordestî û êsîriyê xilas bûn; koletiya wan bi dawî bû û bûn gelekî azad û razgarkirî.

Berdêla kefaretê ya rizgarbûna wan çi bû?

*Xwîna berxikekê.*

*Zagona qurbanê,* carek din li ser *zagona guneh û mirinê* serkeftî bibû. Di salên piştî vê bûyerê dê Cihû *Fisih* pîroz kirina; Fisih ji hêla Cihûyan dê her sal bihata pîrozkirin lewre Xwedê ew bi rêya xwîna berxikekê rizgar kiribûn.

## XWEDAYÊ KÛ Jİ GELÊ XWE RE RÊBERİYÊ DİKE

Xwedê li şeva pêşîn a Fishê, Îsraîlî ji êsîriya çar sed sih salî ya Misirê rizgar kirin û ew ji Misirê derxistin û birin çolê. Plana Xwedê ew bû kû wan dîsa bihere welatê kû ji Birahîm, Îshaq û Yaqûb û ji nifşa wan re wehd kiribû. Dema rêwîtî dikirin Xwedî jî bi awayekî aşkere tev wan rêwîtî kir û dilê wan rihet bû.

> *"Ji bo kû şev û roj rêwîtî bikin **REB biroj di nav stûneke ewrê de rê nîşan dida** û bişev jî **di nav stûneke êgir de ronî dida wan û rêbertiyê wan dikir.**"* (Ji Misirê Derketin 13:21)

Reb ji gelê xwe yê çolê re tenê rêberî nekir û tenê ronî neda wan, di heman demê de bi rêya Milê xwe yê Biqudret di nav Deryaya Sor de rêyek vekir û ew ji artêşa Firewn kû li dû wan bû xilas kir. Û piştre wekî kû soz dabû Mûsa, ew anîn Çiyayê Sînayê.[192]

Vê neteweya nû kû hejmara wan ji du mîlyonan zêdetir bûn, li pala çiya ji xwe re kamp çêkir. Dê li vê çola ziwa çawa li ser piyan bimana? Xwedayê kû qenciya Wî bêsînor, kerema Wî bêdawî ye, ji wan re ji ezmanan nan, ji zinaran av peyda kir.[193] Îsraîlî di mijara spaskirin, bawerkirin û îtaetkirina Xwedayê kû ew ji êsîriyê xilas kirin de neserkeftî bûn, lê dîsa jî Reb her itm dilsoz bû ji wan re. Gava li hemberî Wî guneh kirin, Xwedê ew darizandin û gava jê re îman kirin ew bereket kirin. REB bi neteweya kû hilbijart re wiha xebitî, ji bo kû bila neteweyên derdorê riya Wî ya rizgariyê bibînin, li ser bifikirin û bizanibin ka ev rê çawa ye. Xwedê di heman demê de xwest kû bila mirov fam bikin kûdikarin Wî bi awayekî kesane nas bikin.

REB piştî kû ji Îsraîl re Deh Ferman û zagonên din dan, ji gelê xwe re ferman kir kû bila cihekî pîroz ê kû wekî *Avahî* an jî *Kona Hevdîtinê* tê binavkirin, çêkin.

## AVAHÎ

> *"**Ji bo kû ez nav wan de bijîm**, bila ji **Min** re cihekî pîroz çêkin. **Avahî û tiştên wê eynî mîna mîkana kû ez ê rê te bidim**, çêkin."* (Ji Misirê Derketin 25:8-9)

Armanca gelê kevin ê Xwedê çi bû kû ev kona taybet çêkirin? Û çima ew qas girîng bû kû ev kon *"eynî mîna mînaka"* kû dê Xwedê nîşan bide, bê çêkirin?

Xwedê sêwirand kû dê bikaranîna vê konê ji bo kû Xwe nîşan bide ka çawa ye û mirov dikare çawa nêzî Wî bibe dê bi awayekî dîtbarî hînê wan bike.

Di Pirtûka Pîroz de der heqê kon û mijarên der heqê konê de pêncî beş hene; ji ber vê ne mimkin e kû ev hemû beş li vir bêne ravekirin. Em ê tenê hin mijarên bingeh nîşan bidin.

## YEKANE RÊ

Xwedê kon sêwirand kû ji dinyayê re hîn bike digel kû xwedî pîroziya nuwaze ye dîsa jî dixwaze bi mirovan re rûne. Lê dîsa jî di navbera Xwedê û mirov de astengeke mezin heye.

Ev asteng GUNEH e.

Li derdora kona taybet a kû hebûna Xwedê ya nav mirovan sembolîze dike, hewşeke mezin a çargoşe hebû. Çepera derdora vê hewşê, ji perdeyên keten ên tenik û ji kûtekên tûnc ên kû ji bo perdeyan hatine çêkirin, hatiye çêkirin. Dirêjiya perdeyan du metre nîv bû—bi vî awayî dê ji derve tu kes hundir nedîta. Xwedê dixwest bila mirov fam bikin kû li derveyî asta Wî ya pîroz in. Va ye agahiya xirab ev bû.

Agahiya baş jî ew bû kû Xwedê rêyeke amade kiribû ji bo gunehkar nêzî Wî bibin. Deriyêkî dîwarê hebû kû ji perdeya ketena tenik a kû ji tayên lacîwerd, mor û sor hatibûn hunandin. Yek rêya gunehkaran kû bi berxik an jî qurbaneke din a xwînê biçin huzûra Xwedê, bi vê riya *yek derî*[194] pêk dihat.

REB ji Îsraîliyan re got bila ji darcêwiyê *qurbangehek* çêkin û bila ser vê qurbangehê bi tûncê bipêçin. Ev qurbangeh diviyabû têkata navbera derî û kona taybet a Xwedê. Yên kû pêşkêşiya gunehê tînin, dê destê daynin ser serê heywanê bêguneh û dê rewşa xwe, ango gunehkariya xwe ya neçar îtîraf bikirana. Piştre dê heywan bihata kûştin û dê bedena wî li ser qurbangehê bihata şewitandin. Xwedê bi rêya vê fermanê ji mirovan re car din digot kû tenê *zagona qurbanê* dikare *zagona guneh û mirinê* têk bibe.[195]

Rêzika Xwedê zelal û net bû: bêyî rijandina xwînê, veşartina gunehê ne mumkin bû. Kû ji gunehê re kefaret nehata kirin, lihevhatina bi Xwedê re (têkiliya rast) ne mimkin bû.

Xwedê di heman demê de ji Musa re gotibû bila sandoqeke bêhempa çêke kû nav û derdora wê ji zêrê xwerû, û ji texteya darcêwiyê bê çêkirin. Navê vê tiştê kû aîdê avahiya Xwedê ye, *Sandoqa Peymanê* bû. Ev Sandoqa Peymanê, textê Xwedê ya ezmanan sembolîze dikir. Lewhayên kevir ên kû li ser Deh Fermanên Xwedê nivîsîne, xistin nav vê sandoqê. Li her du

rexê devgirên sandoqê kû ji zêrê xwerû hatiye çêkirin û navê wê *Devgira Bexşandinê* ye, fîgurên Keruv ên kû ji deqa zêr hatine çêkirin, hebûn. Keruv milyaketên Xwedê ne kû derdora textê Wî yê ezmanê dorpêç dikin. Xwedê ji Musa re got bila Sandoqa Peymanê têxe beşa herî navîn (Cihê Herî Pîroz) a avahiyê.

## CİHÊ HERÎ PÎROZ

Avahiya Xwedê bibû du ode. Odeya pêşî wekî *Cihê Pîroz* û odeya hundirîn wekî *Cihê Herî Pîroz* an jî *Pîroza Pîrozan* hatibû binavkirin. Ev cihê pîroz a hundirîn, *"tenê mînakeke cihê pîroz ê esas, ango **ezmanêesas*** bû." (Îbranî 9:24)

*Cihê Herî Pîroz* Bihuşta kû Xwedê lê rûdine sembolîze dikir. Ev odeya taybet, mîna kûpê hatibû çêkirin—dirêjayî, firehî û bilindahiya odê wekhev bûn. Gava em nêzî rêwîtiya xwe ya Nivîsên Pîroz bibin, em ê vî bajarê ezmanî yê kû dîsa wekî kûpekî hatiye înşakirin û dê rojeke bibe mala hemû biîmanan, bibînin.

Îro gelek kes dibêjin kû katedraleke, avahiya dêrê, mizgeft, sînagog an jî ziyaret cihên pîroz in, û ev der bi gelemperî bi kesên kû plana rizgariyê ya Xwedê red dikin, tijî ye. Pîroza rastî ne li cihekî ye. Pîroziya rastî, tenê bi famkirina bexşandin û rastîdayîna Xwedê dikare bê dîtin.

## PERDE

Dîtbariya derveyî avahiyê xwerû bû: koneke pir mezin a kû bi çermên heywanan hatiye çêkirin. Gava ji *derve* li avahiyê *dinêrîn* qet bandorker nebû, lê hundira wê ew qas xweşik bû kû mirov heyirî dima.[196]

Her du odeyên avahiyê bi pertaleke stûr a kû ji ketena tenik hatiye çêkirin û jê re *perde* dihat gotin, hatibû veqetandin.

> *"**Perdeyeke** kû ji **ketena** tenik û bi tayên **lacîwert, mor, sor** hatine hunandin, çêke; ser wê bi Keruvan re bi hosteyî bixemilîne."* (Ji Misirê Derketin 26:31)

Perde dê mirov ji *Cihê Herî Pîroz* ê kû hişmet û roniya Hebûna Xwedê dihewîne dûr bixista. Fermana kû perde ji her kesî re dida ev bû: ***DÛR BISEKINE hekena TU YÊ BİMİRÎ!***

Ev perdeya taybet standarda rastiya Xwedê sembolîze dikir. Xwedê gava ji Musa re Deh Ferman dabû, ji mirovahiyê re der heqê standarda rastiya Xwe agahî dabû. Lê dîsa jî digel her tiştî ev deh ferman der heqê daxwaza Xwedê nêrîneke bisînor dida. Plana dawînî ya Xwedê, Xwe yê kû dê daxwaza Wî pêşkêş bikira, bişanda serzemînê. Daxwaza Xwedê, NUWAZEBÛN BÛ.

Dê Standarda Xwedê Mesîh bûya. Xwedê perde sêwirand kû em **Wî** bifikirin.

Ev perdeya xweşik ji ketena xwerû hatibû çêkirin û ji safîtiya Mesîh re dibû mînak. Mesîh dê bêguneh; pîroz bûya.

Ketena xwerû bi sê tayên rengîn ên biriqî hatibû hunandin – lacîwerd, mor û sor.

***Lacîwerd*** = rengê ezmanan. Mesîh dê bûya Rebê ezmanan.

***Sor*** = rengê serzemîn, mirov û xwînê.[197] Mesîh dê bedeneke ji goşt û xwînê bigirta kû li şûna gunehkaran bigire, biêşe û bimire.

***Mor*** = tevliheviya rengên şîn û sorê. Mesîh dê Xweda-Mirov bûya. Mor rengeke kû qraltiyê sembolîze dike, ye; Mesîh dê di dilê her kesî kû jê bawer dikin de qraltiya xwe ya ruhî saz bikira. Piştre jî dê li serzemînê bi qraltiya xwe ya fîzîkî hukm bikira.

Çawa kû mor rengek e kû di navbera rengên şîn û sorê de ye, Mesîh jî bi heman awayî ji bo kû navbera Xwedê û mirov de navbeynkarî bike, dê bihata dinyayê.

> *"Lewre yek Xweda û **navbera Xwedê û mirov de yek navbeyn heye**. Ew jî Mesîh Îsayê însan e kû xwe ji bo her kesî wekî fidye pêşkêş dike. Şahidiya kû di dema guncan de tê dayîn, ev e."* (Timoteosê 1., 2:5-6)

## EWRÊ HİŞMETÊ

Piştî kû çêkirina avahiyê diqede û her tişt li gorî plana Xwedê di nav avahiyê de tê sazkirin, Xwedê ji textê xwe yê ezmanan hişmeta Hebûna xwe xist nav ewrekî mezin û şand serzemînê. Vî ewrê hişmetê avahî dagirt.



*"Wê demê ewr Kona Hevdîtinê dorpêç kir û **hişmeta REB avahî dagirt**. Mûsa nekarî têkeve nav Kona Hevdîtinê, Lewre ewr her derê dagirtiye,Hişmeta REB hemû avahî dagirtibû."*
(Ji Misirê Derketin 40:34-35)

Reb, roniya Hebûna xwe ya kû çavê mirov tarî dike, danî Cihê Herî Pîroz a kû di navbera her du Keruvan kû li ser Devgira Bexşandinê ya Sandoqa Peymanê ne.

Xwedê ji bo kû bi gelê xwe re be, bi awayekî dîtbarî hatibû nav gelê xwe.

*"REB serweriyê dike, bila gel ricifin! Di navbera Keruvan de **rûniştiye ser textê** xwe, bila serzemîn biheje!"*
(Mezmûr 99:1)

Afirîner bi hişmeta xwe her derê dagirt û Ewrê xwe danî ser konê, û bi vî awayî ji neteweyêndinyayê re û ji nifşên pêşerojê re derseke girîng dida: Yek Xwedayê rast gunehkaran vedixwîne kû

bi Wî re têkevin têkiliyê, lê vexwandina Wî tenê di şertên diyar de dibe.

## MÎNAKÊN DÎTBARÎ

Avahî, ji kesên kû dixwazin Xwedê û plana Xwedê ya der heqê mirovan de bizanibin, gelek hacetên dîtbarî derxistin.

Vê dîmenê bînin ber çavên xwe.

Ev neteweya kole—dozdeh êla Îsraîlê—ya kû bi fermanên teqez ên Xwedê hatiye rizgarkirin, konên xwe li pala çiya, wekî şikla çarmixê danîbûn. Avahî tam li navendê bû. Li derdora avahiyê dozdeh êl hebûn kû li başûrê sê, li ba sê, li rojavayê sê û li rojhilatê sê êl hebûn.[198] Ji ber ewrê hişmet ê biriqî yê kû li ser wan bû, tu kes nedikarî înkar bikira kû Xwedê ne di navbera wan bû.

Rastiya avahî-kona kû tenê deriyekî wê yê bilind heye, û deriyê kû bi pertala keten a spî hatiye çêkirin, dikarîbû me hînê dersên din ên dîtbar jî bikira. Li aliyê hundirîn a dêrî qurbangehek hebû. Kû gunehkar bi bingeha qurbaneke nuwaze ya sembolîk nêzî Xwedê nebûna, ji mezinahiya Xwedê bêpar diman.

> *"Ya kû jiyan dide zîndeyan, xwîn e. Min ew da we kû* ***hûn li qurbangehê xwe ji gunehê bibexşînin****. Lewre* ***xwîn ji dêvla jiyanê guneh dide bexşandin.****"* (Leviyî 17:11)

Heya kû cezayê gunehekî nehata dayîn, bexşandina gunehê çênedibû. Û mirov gava çi qas guneh dikirin ne kûmimkin bû qurbeneke bînin avahiyê, ji bo vê Xwedê ferman da kû li her rojê salê bila berxikeke bê kuştin û qurbangehê bê şewitandin: her sibe û her êvarê. Kesên kû ji REB û ji plana Wî bawer dikin, dikarîbûn ji van pêşkêşiyên rojane kêf bistandana û kûmimkin bû kû ji têkiliya nûbûyî ya bi Afîrenê xwe re tam bistandana.

> *"Hûn ê* ***birêk û pêk her roj*** *li qurbangehê du berxikên nêr ên yek salî pêşkêş bikin.* ***Yek*** *ji wan sibê û ya****din*** *jî berêvarê pêşkêş bikin. Dê* ***ev pêşkêşiya ji bo şewitandinê***

*li beşa têketin a Kona Hevdîtinê, li huzûra Xwedê ji hêla nifşan ve bi awayekî* ***domdar*** *dê bê pêşkêşkirin.* ***Ez ê ji bo kû bi we re bipeyivim, li wir we bibînim.****"*
(Ji Misirê Derketin 29:38-39,42)

## ROJA KEFARETÊ

Xwedê ji bo kû rastiya xwe zêdetir nîşanê mirovan bide, ji wan re got têketina Cihê Herî Pîroz –odeya taybet a kû ezmanê esas sembolîze dike– tenê bi awayekî dikare bibe. Salê rojekê, ji kesekî kû bi taybet hatiye hilbijartin û wekî kahînê sereke hatiye binavkirin re destûr tê dayîn kû têkeve hundirê vî cihê pîroz. Dê vê *Roja Kefaretê*[199] derbasî hundir a pişt perdê bûya. Dê xwîna berxikekê qurbankirî tev xwe bibira û dê vê xwînê heft car bi Devgira Bexşandinê, ango bi devgira Sandoqa Peymanê werkira. Ger ev kahînê sereke bi awayekî din biçûya huzûra Xwedê, dê wê demê bimira.

Kû ji Wî re û ji dana Wî re wekî zarokekî bawer bikin, Xwedê soz dabû kû dê gunehê Îsraîliyan bi saya vê xwîna werkirî bi salekê bibexşanda.

Armanca sêwirandina konê ya bi hemû hurgûliyên wê, tiştên wê û pêkanînên wê, ev bû: dê ji dinyayê re bi van mînakên zindî bihata ragihandin ka dê gunehkarên sûcdar ji bo gunehên xwe çawa bihatana kefaretkirin û tekiliya wan a bi Afirînerê wan ê kû xwedî pîroziya nuwaze ye dê çawa baş bûya. Kon û her tiştê der heqê konê de Mesîhê wehdkirî û peywira Wî nîşan dikirin.

Reb bi vî awayî, qenala Neteweya xwe ya kû bi sedsalan e hilbijartibû, bi kar anî û ji dinyayeke kû di nav gunehê de wenda bûye re, bi rêya bi sedan wêneyan agahiya gelek wehdên nuwaze da.

## PERESTGEH Û QURBANÊN PERESTGEHÊ

Pêncsed sal piştî kû Mûsa û Îsraîlî ji bo strîna Huzûra Reb ev kon çêkirin, Xwedê Silêman beralî kir kû li şûna *vê kona guhêzbar,* bila *perestgeheke payîdar* çêke. Plana vê avahiya nû

ya kû li Yeruşalimê bû, pir dişiba ya konê, lê ev avahiya nû ji ya kevin mezintir û xweşiktir bû. Perestgeha Silêman bû yek ji perestgeha herî xweşik a dinyaya kevin.

Li roja kû merasîma vekirina konê çêbû, hişmeta Xwedê çawa kû ji bo dagirtina Cihê Herî Pîroz ji ezmanan daket, li roja vekirina perestgehê jî Hebûna bihişmet û roniya neafirandî ya Xwedê ji ezmanan daket û perestgeh dagirt.

> *"Piştî kû Silêman duayê xwe qedand, ji ezmanan agir barî, pêşkêşiyên ji bo şewitandinê û qurbanan xilas kir. Û* ***hişmeta Reb perestgeh dagirt****. Dema perestgeha Wî bi hişmeta Wî hat dagirtin, kahîn nekarîn têkevin perestgehê."*
> (Dîrokên 2., 7:1-2)

Perestgeh li pişta heman çiyê kû hezar sal berê Brahîm li wê li şûna kurê xwe beranekî qurban kiribû, hat avakirin.[200] Ji bo kû vê perestgehê ji Xwedê re nezir bike, Qral Silêman ferman da kû bila 120.000 pez û 22.000 boxe bêne qurbankirin.[201] Ev zêdeyî, hezar sal bi şûn de li tepeyeke nêzî pişta vê çiyê qîmeta bêbiha ya xwîneke hêja ya kû bê rijandin sembolîze dikir.

Bi vî awayî, ji bo kû Adem, Habîl, Birahîm û yên din ji gunehê re kefaret bikin, li qurbangehan bi milyonan qurbanên xwînê yên sembolîk hatin pêşkêşkirin — qurbanên xwînê yên kû bi dawî nabin, bi salan bi awayekî domdar hatin pêşkêşkirin.

Piştre Mesîh hat.



# 22

# Berx

*“Xweda* ***hezkirin*** *e.”* (Yuhannayê 1., 4:8)
*“Xweda* ***mezin*** *e.”* (Eyûb 36:26)

Xwedayê kû ***hezkirin*** *e,* dixwaze bi gelê xwe re têkilî çêke. Mijara xwezaya Xwedê ya der heqê têkiliyên civakî, li beşa destpêkê a Pirtûka Wî tê ravekirin.

Xwedê, Adem û Hewa *“Di xuyanga xwe de afirand”* (Afirîn 1:37) kû ji hevpayiya wan zewqê bistîne. Ev heman mijara[202] *“Xwedê bi me re ye”,* heya beşa dawî ya pirtûka Xwedê ya kû behsa wê demê kû gelê Wî yê rizgarkirî *“dê rûyê Wî bibîne”* û bi Wî re heta hetayê bijîn (Wehî 22:4), berdewam dike.

Xwedayê ***mezin,*** dikare her tiştê kû dixwaze bike:

> *“Xwedayê hemû mirovahiyê yê REB ez im. Tişteke kû ez nekarim bikim heye?”* (Yeremya 32:27)

Yekî yekperest kû jidil be, kû Xwedê bixwaze dikare însanbûna wî qebûl bike. Yê kû Hêza Wî Têra Her Tiştê Dike, kû tişteke hebûya kû nekara çêkira (bêyî lihevnehatina bi Xwe re), dê wê demê Xwedê nebûya.

Pirs ne ev e: Xwedê *dikare* mirov be?

Pirs ev e: Xwedê mirovbûnê *bijart?*

## PERESTGEHA RASTÎ YA XWEDÊ

Hezar pênc sed sal piştî kû Xwedê ji Îsraîliyan re ferman kir ji bo kû ***"bikare nava wan de bijî"*** (Ji Misirê Derketin 25:8) bila perestgeh-koneke bêhempa çêkin, Nivîsên Pîroz ev daxuyanî didin:

> *"Di serî de Peyv hebû. Peyv bi Xwedê re bû û Peyv Xwedê bû... Peyv bû mirov û* ***di nav me de jiya****.* ***Me bilindahiya Wî*** *–bilindahiya yekane kû bi kerem û rastiya kû ji Bav tê re tijî ye– dît."* (Yuhanna 1:1,14)

Ev biwêja kû wekî *"Di nav me de avahî danî- di nav me de jiya"* hatiye wergerandin, ji peyva Grekî ya kû tê wateya *konekê an jî perestgehekê,* zêde bûye. Bi wateya xwe ya rasterast dikare wiha bê wergerandin: *"Di nav me de Kona Xwe Danî."* Nivîsên Pîroz, bedena kesekî wekî *"kon"* an jî *"perestgeh"* a kû tê de can û ruhê wî dijî, rave dikin.[203] Wekî kû em li beşa 16. hîn bûn, bêdawî yê Xwedê wekî bebekekî hat dinyayê. Bedena Wî ya mirov, *"kona"* kû Wîhilbijartibûkû tê de bijî.

Di dema Mûsa de, avahiya kû Xwedê hişmeta Hebûna xwe û roniya neafirandî xistibû tê de, bi çermên heywanan re dagirtîbû. Lê di Kesaneya Îsa de, hişmet, roniya neafirandî û Hebûna Xwedê ji bo kû di çermê mirov de cih bigire hatibû. Ji ber vê xwendekarên Wî dikarîn bibêjin, *"Me bilindahiya yekane kû ji Bav hat dît!"*

Nivîsên Pîroz dibêjin kû Îsa *"ne ya mirov, lê* ***kona perestgeha esas*** *a kû Xwedê danî ye"* ye. (Îbranî 8:2)

Di dema Peymana Kevin de, kona perestgehê û piştre perestgeh, cihê pêşkêşkirina heywanên qurban ên gunehkaran bû kû gunehên xwe bipêçin. Îsa dema zarokekî biçûk bû û dema balixê de, gelek caran çû ziyareta perestgeha Yeruşalimê, lê li tu derê nehatiye nivîsîn kû Ew qurbanek pêşkêş kiriye. Îsa çima qurban pêşkêş nekir? Lewre gunehê Wî tune bû. Îsa, *'Xwe carekê qurban kiribû û ji bo rakirina gunehê"* derketibû holê (Îbranî 9:26). Dê Îsa bûya pêşkêşiya qurbanê û çarmixeke Romayê jî bûya qurbangeh.

Îsa rastiya li piştt sembolan bû.

*“**Xwedê di bedenê de** xuya kir.”* (Timoteosê 1., 3:16)

Îsa rojekê li cem perestgeha Yaruşalimê li ser piyan disekinî; ji komeke mêran a kû li cem Wî kom bibûn re wiha got:

*“ ‘Vê perestgehê hilweşînin, ez ê di nav sê rajan de wê dîsa saz bikim.’ Rayedarên Cihû gotin, ‘Ev perestgeh di nav çil û şeş salan de hat çêkirin, tu yê wê di nav sê rojan de saz bikî?’*

***Lê perestgeha kû Îsa qal dikir bedena Wî bû.** Ji ber vê dema Îsa ji mirinê vejî, hat bîra xwendekarên Wî kû ev gotin gotibû. Ji Nivîsên Pîroz û vê peyva Îsa re îman kirin.”*
(Yuhanna 2:19-22)

Cihû fam nekirin kû perestgeha kû Îsa behs dike, bedena Wî bixwe ye. Wan gotin qey Îsa derbarê avahiya perestgeha nuwaze ya Yeruşalimê de diaxive. Lê belê roniya Hebûna Xwedê û hişmeta Wî êdî li wê Cihê Herî Pîroz ê kû bi destê mirov hatibû çêkirin, nebû.

Hebûna Xwedê niha di *“perestgeha”* bedena Îsa de bû.


Îsa ber bi dawiya peywira xwe ya serzemînê, ji sê xwendekarên xwe re destûr da kû ji vê bilindahiya bihişmet a Xwedê re şahidiyê bikin.

*“Îsa tenê Petrûs, Yaqûb û birayê Yaqûb Yuhanna tev xwe bir û derket ser çiyayekî bilind. Li ber çavên wan dîmena Îsa guherî. **Rûyê Wî mîna tavê biriqî, kincên Wî mîna roniyê sipspî bûn.** Wê demê **ewrekî biriqî mîna siyê hate ser wan,** û dengekî kû ji ewr dihat,*

***‘min ê delal ev e,***
***Ez ji Wî razî me.***
***Guh bidine Wî!’** got.”* (Matta 17:1-5)

Roniya xwerû ya çav tarî dike û biriqî ya Xwedê kû dibû sedem kû milyaketê ncinetê rûyê xwe bipêçin, *di Îsa de* bû.

Wextekî ewrê biriqî yê kû sî dida perestgehê, niha li ser cihê kû Îsa sekiniye sî dida.



Îsa Hebûna Xwedê ya kû li serzemînê bi çavê mirov dihate dîtin, bû.

Ji biriqîna bilindahiya Xwedê re, dengê Bav ê kû ji ezmanan dihat hevaltî dikir:

*"kurê **min ê delal** ev e, Ez ji wî razî me. **Guh bidine Wî!**"*

Xwedê der heqê van peyvên xwe de cidî ye.

Hezar sal beriya kû Xwedê nebibû kurê mirov, Dawud pêxember ev nivîsîn:

*"**Kur maçî bikin** kû hêrs nebe, hekena hûn ê di rêya kû dişopînin de mehv bibin. Lewre hêrsa Wî ji nişka ve pêt dide, bijî yên kû Xwe dispêrin Wî!"* (Mezmûr 2:12)

*"Kur maçî bikin"* tê wateya ***Kur bi rûmet bikin***.

Ez carinan dibînim kû mirov ser û destên rêberên dînî maçî dikin—rêberên dînî jî wekî wan neçar û gunehkar in. Û dîsa dibînim kû bedenên van heman mirovan ji bo kû kesên vedigerin axê birûmet bikin, rêwîtî dikin. Em di vê navberê de li ser zêde bikin kû Xwedê ji dinyayê re ev daxuyanî daye: ***"Her kes çawa kû Bav birûmet dike, bila Kur jî birûmet bike.*** Yê kû Kur birûmet nake, Bavê kû ew şand jî birûmet nake… Lere Bav ji Kur hez dike." (Yuhanna 5:23, 20)

## NÛÇEVAN

Yeşaya yek ji du pêxemberan e kû der heqê nûçevanê taybet ê hilbijartî *"yê kû dê rêya Reb amade bike"* (Yeşaya 40:3) de nivîsî.

Ev nûçevan, pêxember Yehya yê kû Zekeriya bû.[204] Pêxemberên berê, bi bikaranîna biwêja "Xwedê dê Mesîh *bişîne* dinyayê," axivîbûn, lê Yehya pêxember der heqê vê mijarê de xwedî rûmeteke cuda bû, daxuyaniya Yehya pêxember ev bû: "Mesîhê wehdkirî, Reb bixwe *li vir e!*"

> *"Li wan rojan, Îmadker Yehya li Çola Cihûdayê derket holê. Ev daxuyanî dida:* ***'Tobe bikin! Serweriya ezmanan nêzîk e.'*** *Her wiha yê kû bi rêya Yeşaya pêxember tê qalkirin, Yehya ye. Yeşaya wiha gotibû: 'Yê kû li çolê diqîre, dibêje* ***'Rêya Reb amade bikin****, riyên kû dê tê re derbas bibe serûber bikin.'* (Matta 3:1-3)

## TOBE

Peyama Yehya kû mirov ji hatina Reb re amade dikirin, hêsan bû.

***"Tobe bikin!"***

Peyva *tobe,* ji peyva Grekî ya *metanoeo* tê. Ev pey bi du beşan pêk tê: *meta* û *neo.* Wateya beşa destpêkê a peyvê *"tevger"*

an jî *"guherîn"* e. Beşa duyemîn a peyvê, *fikrên bîrûbawerî* nîşan dike. Ji ber vê, wekî bingeh peyva *tobe*yê, *xwedî guherîneke bîrûbawerî; li şûna fikrên şaş, fikrên rast anîn* e.

Em peyva "tobe"yê têxin nav şert û derdorên kû em her roj tê de dijîn: em bifikirin kû ez dixwazim bi otobusê ji bajarekî biçim bajarekî din — em bêjin kû ez dixwazim ji Beyrûtê biçim Ammanê. Ez li otobusa kû difikim rast e, siwar dibim û li palgeha rûdinim, bi xew re diçim. Demek bi şûn de, dema otobus li şahrê lezelez diçe, ez dibînim kû otobus ber bi başûrê, Ammanê naçe, ber bi ba, Stenbolê diçe. Di vê rewşê de divê ez çi bikim?

Du rê hene:

An ez ê ew qas bi fêz bibim kû xetaya xwe qebûl nekim û di otobusêde *bimînim;* di dawiya vê tevgera xwe bigihîjim cihekî şaş.

An jî dikarim xwe nizm bikim û *tobe bikim,* ango dikarim fikra xwe biguherînim û qebûl bikim kû li otobusa xelet siwar bûme. Jidiliya tobeya min, gava ez li rawestgeha din dakevim û siwarî otobusa rast bibim, derdikeve holê.

Tobeya rast yekî ji *xeletiyê vedigerîne* û beraliyê *baweriya rastiyê* dike.

Tobe dikare bi du aliyê perê re bê hevrûkirin.

Aliyekî: **'TOBE KE!'** dibêje.

Aliyê din jî: **'ÎMAN BIKE!'** dibêje.

Her du alî jî parçeyên rastiyê ne:

*"**…bi tobekirinê** vegerîna Xwedê û ji Rebê me Îsa re **bawerkirin …**"* (Karên Şandiyan 20:21)

*Tobe* guherîna fikra we ya der heqê tişta kû hûn ji bo rizgariyê jê bawer dikin e. Îman, tê wateya ji rizgariya kû Xwedê daye re bawerkirin.

Tenê bi tobekirinê, îmana rast dikare hebe.

Peyama pêxember Yehya ya kû bi vê rastiyê re lihevhatî ye, ev wate dihewand: "Ji fikra xwe ya xelet tobe bikin! Qebûl bikin kû hûn ê nekarin xwe xilas bikin û Mesîh-Kral ê wehdkirî yê kû hatiye Bihuştê qebûl bikin! Ew ji bo kû we ji dijminên we

yên herî xirab rizgar bike, hat—kû hûn dev ji baweriya xwe ya bixwe berdin û jê bawer bikin!"

Yên kû li ber Xwedê tevgerên xwe yên biguneh qebûl kirin, ji hêla Yehya li çêm hatin îmadkirin. Sedema Yehya kû wekî *Yehyayê Îmadker* tê zanîn, ev e. Îmadkirina nav avê de nedikarî gunehê bişûşta û nikare bişo. Yên kû bi noqkirina li ava çêm dihatin îmadkirin, bi awayekî *derveyî* wiha digotin: şahîdîkirin û pejirandina bi awayekî *jidil* a peyama Xwedê ya der heqê Mesîh ê kû ji bo paqijkirina yên kû tobe dikin û gunehkarên kû bawer dikin ji rewşa wan a qirêj rizgar bike, hat.

## YÊ HİLBİJARTÎ

Îsa di destpêka peywira xwe ya serzemînê, ji bo kû ji hêla Yehya bê îmadkirin hat Çemê Şeriayê. Pêdiviya Mesîhê bêguneh ji bo tobekirina tu tiştê tune bû, lê wekî îmad, Xwe bi nifşa kû ji bo rizgarkirina wan hatibû, wekhevî kir.

Bûyera kû piştî îmada Îsa çêbû, tu car nayê jibîrkirin. Ev bûyer ji me re dîmeneke din a hişmetî û yekîtiya yekbûyî ya Xwedayê rast û yek, pêşkêş dike.

> *"Îsa çawa kû îmad bû, ji avê derket; wê demê ezman vebûn û Îsa dît kû* ***Ruhê Xwedê*** *wekî kevokekê daket û hat ser Wî.* ***Dengê kû ji ezmanan hat, ' min ê Delal ev e, Ez ji Wî razî me'*** *got."* (Matta 3:16-17)

Wekî roja pêşîn a afirînê, di vê çîrokê de Hebûna Bav, Kûr û Ruhê Pîroz tê diyarkirin. Lê dîsa di vê demê girîng a dîrokê de Xwedê, yekîtiya xwe ya pirjimarî bi awayekî zelaltir diyar dikir. Di rêwîtiya me ya Nivîsên Pîroz de, em niha li cihekî wisa ne kû, em hemû divê li vir bisekinin, çend wêne bigirin û bifikirin.

Vê cihê kû em lê ne bînin ber çavên xwe. ***Xwedê*** (Peyva Wî ya kû bi rêya wî erd û ezman hatin afirandin) di bin ezmanê biriqî û bi dîmena dramatîk, ji ava çêm kû hatibû noqkirin, derdikeve û dimeşe. Di heman demê de ***Ruhê Xwedê*** (*Ruh*ê kû roja pêşîn a

afirînê li ser avê pêl dide) ji esmên dadikeve, li hewayê hêdî hêdî digere û mîna kevokê dadikeve ser Îsa. û di dawiyê de, ji esmên dengê ***Bav Xweda*** tê: *"min ê Delal ev e, Ez ji Wî razî me."*

Sih salên pêşîn Îsa li bajarê Nasirayê, nav malbateke feqîr jiyabû. Li vê demê gava bala tu kesî nakêşe, Bavê li ser Ezmanan her tim li xwe nêrîbû. Û niha em fikra Xwedê ya der heqê Îsa de dibihîzin: ***"Ez ji Wî razî me."***

Xwedê ev biwêj nedikarî ji bo tu kesî kû heya niha hatine dinyayê, bigota. Tenê Îsa –hem hundirîn hem jî ji derve– karî Xwedê di hemû jiyana xwe de razî kir. Kû Bihuştê bû, Ew pîroz bû, paqij bû û xwedî wan wesfan bû kû peywira xwe pêk bîne. Ew Mesîh bû*–Yê Meshkirî–*Bijareyê Xwedê bû. Xwedê Ew ne bi rûnê (kahîn û kral bû rûnê dihatin meshkirin[205]), bi Ruhê Pîroz mesh kir.

> *"**Xwedê Îsayê** Nasirayî **bi Ruhê Pîroz** û bi qudret **meshkir**..."* (Karên Şandiyan 10:38)

Îsa Ew Kes bû kû hemû pêxember der heqê Wî de nivîsîbûn.

## BERXİKÊ XWEDÊ

> *"Yehya roja din dema dît Îsa ber bi wî ve tê, got: **'Va ye, Berxikê Xwedê kû gunehê dinyayê ji holê rakir."***
> (Yuhanna 1:29)

Daxuyaniya pêxember Yehya, pir watedar e.

- ***"Va ye! Berxikê Xwedê…"***
  Yên kû guhdarî Yehya kirin, hinek fam kirin kû berxik tê çi wateyê. Piştî kû guneh kete dinyayê, mirov berxik anîbûn ji bo pêşkêşiya şewitînê.

  Di demeke dirêj a panzdeh sedsalan de, li ser qurbangeha kû ji birincê hatibû çêkirin, her sibe û her êvarê berxik hatibûn qurbankirin. Û niha *Berxikê Xwedê* hatibû! Du hezar sal berê Brahîm ji Îshaq re gotibû: *"min **berxika** ji bo pêşkêşiya*

*şewitandinê, dê Xwedê Bixwe peyda ke!”* (Afirîn 22:8)

Xwedê bi rastî jî berxikek peyda kir kû têkeve şûna Birahîm, lê ev qurban ne *“berxik”* bû. Ev “beran” bû. (Afirîn 22:13) *“Berxika”* kû Brahîm di pêxemberiya xwe de behs dikir, Mesîh bixwe bû. Pêxemberiya Birahîm Îsa nîşan dikir. Îsa ji ber vê wiha got: *“Bavê we Birahîm ji ber kû roja min dîtibû, pir kêfxweş bibû. Dît û kêfxweş bû.”* (Yuhanna 8:56)

- ***“.. yê kû guneh rakir..”***
  Ji dema Adem û pê ve, xwîna heywanê bêguneh, gunehê kesên kû ji Xwedê û ji plana Xwedê bawer dikin wekî sembolîk *pêça.* Dê Ew *gunehê* bi temamî û heta hetayê *rakira.*

- ***“…yê dinyayê…”***
  Qurbanên berê yên kû ji bo gunehê xwîna wan rijiya bi navê *kesekî, malbatekê* an jî *neteweyekê* hatibûn pêşkêşkirin. Lê xwîna Îsa dê mumkin bikira kû deynê gunehê yê *hemû dinyayê* yê berê, niha û pêşerojê*,* dê bi temamî bihata dayîn.

Berxikê Xwedê gunehê dinyayê ji holê radike, gelo ev tê wateyê kû kesên kû têne dinyayê ji hêla Xwedê bixwe têne bexşandin? Na. Ji dema kû guneh kete nifşa mirov, Xwedê her tim xwest kû ji Wî re û ji Dana Wî re bê îmankirin.[206]

*“Hat warê xwe, lê êdî gelê wî ew qebûl nekir.* ***Ji kesên kû ew qebûl kirin û jê re îman kirin re*** *ew maf da kû bibin zarokên Xwedê.”* (Yuhanna 1:11-12)



## SÎ Û SEMBOL

Dema sal derbas dibûn, her berxika bêguneh û paqij a kû ji bo gunehê dihat

qurbankirin, *“tenê **siyeke** tiştên baş ên pêşerojê bû.”* (Îbranî 10:1)

Siyekê divê bi tişta kû siyê derxistiye re neyê tevlihevkirin. Dema hevalekî we ber bi we ve dimeşe û kû hûn li erdê binêrin, dibe kû bêyî dîtina hevalê xwe hûn siya wî bibînin, lê dema hevalê we bê li ber we bisekine, hûn ê li hevalê xwe binêrin û li şûna siya wî, hûn ê bi wî bixwe re bipeyivin, ne wisa?

Qurbanên Peymana Kevin, *siyên* ji hêla Xwedê ve hatibûn sêwirandin û xetên bingeh ên Mesîhê pêşerojê xêz dikirin û daxuyaniya Wî didan.

Berxikê Xwedê Îsa, ev sî avêtin.

> *“Xwîna boxe û nêriyan nikare gunehê **ji holê rake.** Ji ber vê dema **Mesîh** tê dinyayê wiha dibêje: ‘Te qurban û pêşkêşî nexwest, lê te **ji min re bedenek amade kir.** Tu ji pêşkêşiya şewitandinê û pêşkêşiya gunehê razî nebûyî. Wê demê min wiha got [Mesîh]: ‘Wekî kû li tomara Nivîsa Pîroz de ji bo min hatiye nivîsîn, ya Xwedê, va ye ji bo kû daxwaza te pêk bînim hatim, va **hatim!**’... Ji bo kû ya duyemîn bide pejirandin (qurbana xwe), ya destpêkê (qurbana heywanê) ji holê radike. Ji ber vê daxwaza Xwedê, bi pêşkêşkirina beneda Îsa Mesîh a **cara yekem û dawî**, em bûn pîroz.”* (Îbranî 10:4-7, 9-10)

Qurbanên xwîna heywanan tenê sembola daxwaza Xwedê ya dawînî bûn. Heywan di xuyanga Xwedê de nehatibûn afirandin. Nirxa berxikekê bi nirxa mirov re ne wekhev e. Çawa kû hûn erebeyeke model a pêlîstok biherin cem firoşkerê erebeyan û bi nirxa erebeyeke rast nikarin pêşkêş bikin, xwîna berxikekê jî bi heman awayî nikare deynê gunehê mirov bide. Ji bo deynê gunehê yê mirov, nirxeke wekhev an jî ya mezintir dihat xwestin.

Îsa ji bo peydakirina vê Qurbanê hat.

## XWEDÊ PLANKEREKÎ NESERKEFTÎ YE?

Çend sal berê bi doxtorekî felsefeyê re me ji hev re nivîsî. Ji bo daxuyaniya Îsa *"yê kû ji bo gunehê dinyayê rake, hat"* bersiv bide, wiha nivîsî:

> Posteya Elektronîk
>
> Xwedê 2000 sal berê dema hê biryar nedabû kû vê lîstoka pandomîm çêke, kesên kû beriya vê hatin dinyayê û mirin re dê çi bibe? Wisa xuya dike kû Xwedayê Xirîstiyanan planên neserkeftî çêdike û hin tiştan piştre difikire, lewre ji bo mirovan dîtina rêya bexşandina *'gunehê' bi mîlyonan nebe jî hezar salên Wî girt.*

Xuya dibe kû ev zilamê kû êdî najî, wateya pişt bi mîlyonan berxikên kû hatine qurbankirin û bi sedan pêxemberiyan fam nekiriye; fam nekiribû kû hemû berxikên kû hatine qurbankirin û pêxemberiyên kû hatine nivîsîn, li roja Mesîh a kû dê ji cezayê gunehên mirovan ê paşerojê, niha û pêşerojê re tebat bike, tê nîşankirin. Plana rizgariyê ya Xwedê ji destpêkê de, *"ji bo kû li dema niha edaleta xwe nîşan bide, dayîna cezayên gunehên **berê**"* jî dihewand. (Romayî 3:25-26)

Xwedê gunehkarên beriya dema Mesîh, wekî bexşandina gunehkarên îro—bi rêya îmana wehdên Xwedê û dana Wî-, bexşand.


Lê belê cudahiyek hebû.

Gunehên biîmanên kû beriya dema Îsa Mesîh jiyabûn, *veşartî bû.* Heta hetayê *betalkirina* deynê gunehkarekî ya ji pirtûkên nivîskî, tenê dikarîbû piştî kû Îsa xwîna xwe birije û mirinê têk bibe mimkin dibû.

*Berxikê Xwedê Îsa,* beriya kû hate serzemînê, yê kû li qurbangehê qurbanek pêşkêş dike, dişibe karsazekî kû ji bo ji bankayê deyn bistîne têkoşînê dike.

Hevalekî wî yê dewlemend qebûl dike kû ji bo wê deynê mohra hevpar bavêje û bi vî awayî kû karsaz nekare deynê xwe bide, soz dide kû dê ew bide. Dema sal derbas dibin karsaz zêdetir

dikeve tengasiyê, ji bo dayîna deynê û deyn her diçe zêde dibe. Û her sal hevalê dewlemend ê karsaz ji bo kû deynê hevalê xwe yê kû di tengasiyê de ye bigire, neçar dimîne li bankayê senedeke din îmze bike. Yê kû karsazê neserkeftî ji hepsê û ji topavêtinê diparêze çi ye? Tenê senedên ewlehî yên hevalê wî yê dewlemend û ewledar ên kû deynê wî digirin.




Qurbanên heywan ên Peymana Kevin, wekî "senedên ewlehiyê" yên gunehkarekî kû ji hêla Xwedê dihatin qebûlkirin bûn. Tomarkerê gerdûnê yê kû der heqê pejirandina peymanan û muwazenekirina Pirtûkan de xwedî dîrokçeyeke paqij e, wehd kir kû dê xwîna heywanên paqij ji bo gunehê wekî *pêçandinekê* qebûl bike. Lê xwîna heywanê deynê gunehê yê serhevbûyî yê mirov *nedikarî betal bikira.* Xwîna heywanan tenê têra *"**bîranîna gunehan** a ji salê heya salekê"* bû. *"Lewre xwîna boxe û nêriyan gunehan ji holê ranake."* (Îbranî 10:3-4)

Guneh pirsgirêkeke cidî ye kû tenê dikare bi rijandina xwîna Xwedê bê çareserkirin. Berxikê Xwedê Îsa, ji bo dayîna deynê gunehê yê mirovan hat.

**Fikra *we*** çi ye?

Xwedê, "Planên neserftî çêdike gelo, hin tişt piştre tên bîra wî?" An jî Yehya pêxember û alîgirên wî mafdar bûn kû Îsayê Nasirayî wekî *"**Mesîhê** kû Musa di zagona xwe de û di heman demê de pêxember di

pirtûkên xwe de nivîsîn" û *"**berxikêXwedê*** kû gunehê dinyayê radike" qebûl dikirin? (Yuhanna 1)

Xwedayê kû Herî Baş ê plankeran e, tu car planeke Wî ya din tune bû kû gunehê têk bibe. Li gorî nêrîna bêdawî ya Xwedê ya bêyî demê, Wî duh, îro û heta hetayê:

> *"...ji sazkirina dinyayê û pê ve **Berxikê** kû hatiye şerjêkirin e."* (Wehî 13:8)



# 23

# Pêkhatina Nivîsên Pîroz

> *“**Wehdek** ewrekî ye, **pêkhatina** wehdê baran e.”*
> —Gotinên Pêşiyan ên Ereban

Pêxember bi hezar salan plana Xwedê ya şandina Rizgarkerê daxuyan kirin, *“lê **dema wext hat**, Xwedê Xwe şand.”* (Galatyayî 4:4)

Pêxemberên Xwedê *ewrên wehdê peyda kirin.*

Îsayê Nasirayî *barana wehdê bû kû pêk hat.*

Plana Afirîner ne planek bû kû piştre hatibû fikirîn. *“Xwedê ev Mizgîniya der heqê Îsa Mesîh de, **bi rêya pêxemberên xwe** li Nivîsên Pîroz **ji berê de wehd kir**.”* (Romayî 1:2-3)

Nivîsên Pîroz ewr in û Mesîh jî baran e.

## LÎ SER PİŞTA KEREKÎ TÊKETİNA YERUŞALÎM Ê

Mesîh peywira xwe dizanîbû. Pêxember Zekeriya pênc sed sal berê, der heqê yek ji gelek bûyerên kû di rêya çarmixê diçû de wiha nivîsîbû:

> *“Qîrînên dilxweşiyê bike, ey keça Yeruşalimê! **Va ye qralê te! Ew rizgarkerê adil e û dilovan e. Li ker, belê, li dehşik siwar bûye, û tê cem te!”*** (Zekeriya 9:9)

Îsa ev pêxemberî pêk anî. Li hemû Çar Mizginiyan de ev hatiye nivîsîn. Mattayê kû şahid û xwendekarekî Îsa ye, wiha nivîsî:

> *"Dema nêzî Yeruşalimê bûn… Îsa destpêkê du xwendekarên xwe şandin. Ji wan re got, 'Herin gundê li hemberî we. Hûn ê li wir* ***kerekî mê yê girêdayî û dehşikekî bibînin****. Wan ji wir bifilitînin û ji min re bînin. Kû yekî ji we re tiştek bêje, hûn jî bêjin, 'Pêdiviya Reb bi van heye, dê dîsa li we vegerîne'… ev bûyer* ***ji ber kû peyva pêxember pêk bê,*** *çêbû:* ***Va ye Qralê te yê dilovan, li ker, belê, li dehşik siwar bûye û tê cem te.'"*** (Matta 21:1-5)

Bi vî awayî Îsa, Xwe ji neteweyê re wekî Kralê wan pêşkêş kir — lê neteweya Wî, wekî kû pêxember ji berê de gotibûn, Ew red kir.[207]

Mizgînî bi hurgûlî dinivîsin ka piştî kû Îsa li ser pişta ker çû Yeruşalimê, çi qewimî. Îsa ket perestgehê û her kesî kû wê derê ji bo qezenckirina perê bi kar tînin, avêtin derve. Piştre ji firoşkerên kû tirsane û heyirî mane re wiha got: *"Hatiye nivîsîn kû 'Dê ji mala min re mala duayê bê gotin.' Lê we ew kir mala rêbiran!' Piştre dema Îsa li peresgehê bû yên kor û seqet ên kû hatin cem Wî baş kirin."* (Matta 21:13-14)

Îsa çend roj li perestgehê rûnişt û ji mirovan re peyvên rast ên Xwedê hîn kirin. Rêberên Dînî, ji bo kû Wî tawanbar bikin û bikujin pirsên xetere jê kirin. Lê serkeftî nebûn. Îsa bi zanatiya ezmanî bersiva wan da, li ber vê zanatiya Wî heyirî man.[208]

Piştre wext hat.

## WEXT HATİBÛ

Îsa yek Kes e kû yeqîn dizane dê
*kengî* bimire,
*li kû* bimire,
*çawa* bimire,
û *çima* bimire.

> *"Îsa piştî kû ev hemû tişt vegot,* ***ji xwendekarên xwe re*** *got,* ***'Hûn dizanin du roj şûn de Cejna Fishê ye. Dê kurê mirov ji bo kû bê çarmixkirin, dê bê diyarkirin.'***
>
> *Wê demê kahînên sereke û rûspiyên gel, li qesra kahînê sereke ya kû wekî Kayafa hatiye binavkirin, civiyan. Ji bo Îsa bi fendan bigirin û bikujin plan çêkirin. Digotin, 'Bila li vê cejnê nebe kû di nav gel de tevlihevî dernekeve.'* (Matta 26:1-5)

Rêberên dînî yên kû ji wan re xizmetê dikirin, neçar bûn. Hin caran, *'Xwestin kû Wî bigirin, lê tu kes destê xwe neda Wî. Lewre* ***wextê Wî hê nehatibû.****"* (Yuhanna 7:30)

Piştre xwedî wê fersenda kû dixwestin, bûn.

Yahudayê kû xwendekarê Îsa yê ne hundirîn lê derveyî ye, çûm cem kahînên perestgehê û ji wan re pêşniyaz kir kû Îsa bîne û bide destê wan. Kahîn ji bo vê îhaneta Yahuda dayîna sih zêrê zîv qebûl kirin. Ev çalakiya xaîntiya Yahuda bû sedem kû gelek pêxemberiyên Peymana Kevin pêk bê.[209]

Bi vî awayî roja kû Îsa ji xwendekarên xwe re got, ***"Wext hat!",*** hat.

Dema mirina Berxikê Xwedê bû.

## HEFTEYA FİSHÊ

Kûçeyên teng ên Yeruşalimê bi gelê herêmî û biyaniyên kû ji bo ziyareta bajêr hatine re tijî bû. Dengê pezên kû merînî dikirin, boxe û gayên kû qorînî dikirin her derê girt. Kiriyar bi firoşkeran re ji bo heqê berxikekê bazariyê kirin. Hefteya fishê bû. Fisih, parçeyeke pîroziyê ya yek hefteyî bû kû panzdeh sal berê ji hêla Xwedê ve hatibû çêkirin. Fisih ji Îsraîliyan re ev fersend dida: *li paşerojê nêrîn* û bibîranîna wê şeva dîrokî ya kû Xwedê "neteweya xwe ya kû bi wê re nav têkiliyê de bû" ji êsîrî û mirinê çawa xilas kir; wê şevê kalikên Îsraîliyan xwîna berxikê li ser deriyê xaniyê xwe dabûn û filitîbûn. Li gorî nêrîna Xwedê Fisih, di heman demê de *bi hesret li bendemayîna* Mesîh a roja Fisihê

bû kû wateya wê bi awayekî kûrtir pêk bîne.

Lê dîsa jî kêm jî be çend kes fam kiribûn kû dê xwîna Îsa yê Nasirayî wekî Berxikê Fishê bihata rijandin û ji bo pêkanîna sembolîzma berxikên kû ji dema Mûsa ve her sal hatin qurbankirin e. Peywira Mûsa ew bû kû mirovan ji *zordestiya fîzîkî* suxrevanan rizgar bike, li hemberî vê peywira Mesîh ew bû kû mirovan ji zordestiya ruhî ya Şeytên, guneh û mirinê rizgar bike.

Li vir ya ecêb ev e, digel kû rêberên dînî der heqê kûştina Îsa de bibiryar in, *"ji bo kû nav gel de tevlihevî dernekeve, nexwestin di dema cejnê de bikin."* (Matta 26:5) Lê sêwirandibû kû tam di vê dema cejnê de bimire! Diviyabû Berxikê Xwedê di dema Cejna Fishê de bihata şerjêkirin.[210] Her tişt de wekî plana Xwedê pêk bihata.

Kesên kû plana Xwedê red dikin bi awayekî henekî dê der heqê pêkanîna plana Xwedê de rola herî mezin bigirtana!

Haya Şeytên jê tune bû kû –bi tehrîkkirina rêberên dînî kû Îsa bikûjin– malxerabiya xwe amade dikir. Nivîsên Pîroz berevajîkirina van bûyeran bi vê biwêjê rave dikin, *"beriya destpêkirina zemanê rêberên vê demê ev zanatiya Xwedê kû diyar kiribû, fam nekirin; kû fam bikirana dê Rebê bilind li çarmixê nexistana."* (Korîntiyên 1., 2:7-8)

## NAN Û KASİK

Dema şeva kû ji berê de hatibû diyarkirin, hatibû, Îsa û xwendekarên Wî ji bo xwarina Fishê li jorê, di odeyekê taybet de civiyan. Piştî kû xwarina kû ji berxik û pincarên tûj pêk dihat belav kir, Reb qetek nan girt, şikir kir, nanî qet kir, li xwendekaran belav kir û ji wan re got bila ji vî nanî bixwin, *"Vê ji bîranîna min bikin"* (Lûka 22:19) got.



***Nanê qetkirî,*** Bedena Wî ya kû dê ji bo wan bê binpêkirin û cezakirin, sembolîze dikir.

Piştre, kasika kû tê de şeraba kû ji tiriyên pelixandî hatiye çêkirin, da gerandin. Ji xwendekaran re wiha got: *"Ev kasik xwîna*

*peymanê ye kû ji bo bexşandina gunehên gelek kesan hatiye rijandin."* (Matta 26:28)

***Kasik****xwîna rijiyayî ya Îsa sembolîze dikir kû Peymana Nû ya wehdkirî bi awayekî fermî bê destpêkirin.

Ev her du sembola hêsan, peyama pêxemberên Xwedê ya dema niha nîşan dikin: dê Afirînerê me, ji bo nifşa biguneh a Adem biêşa û ji bo Xwîna xwe birêje dê xwe bi bedena mirov niximanda.

Piştî kû Îsa dilê xwendekarên xwe bi wehd û rastiyên[211] nuwaze rihet kir, ew birin baxçeya Getsemani ya kû li nêzîk bû. Îsa li wir deverû xwe dirêjî erdê kir, pir xwêdan da û canê Wî di nav êşeke kûr de bû, wiha dua kir, *"Bavo, kû mimkin e bila ev kasik ji min dûr bê xistin; dîsa jî bila ne daxwaza Min, bila Ya te bibe."* (Matta 26:39)

*Ev kasika* kû Îsa metelmayî dihişt çi bû? Ev kasik, kasika êşê bû kû dê Îsa ji bo gunehê bikêşa. Demeke kin û bi şûn de veqetîneke nedîtî ya kû dê bi Bavê xwe re bijiya û ecêba dojeha kûr kû dê ji bo we û ji bo min bikêşaya.

Piştî kû heman duayê sê caran dubare kir, Kûr jidil sitûye xwe li ber daxwaza Bavê Xwe xwar kir. Wekî kû pêxember Dawud ji berê de da zanîn, Mesîh tişta kû nestendibû, dê dîsa bidaya. *"Ez ê tişta kû min nedizî çawa dîsa bidim?"* (Mezmûr 69:4)

Îsa dê bûya Qurbanê bêkêmasî û dawînî yê kû dê ji bo gunehê bihata dayîn.

## GİRTİN

Îsa piştî kû axaftina xwe ya bi bavê xwe re dikir, qedand, leşkerekî mufreze yê kû ji hêla kahînên sereke, nivîsvan û rûspiyan hatibû şandin, ket hundirê baxçê. Ji bo girtina Wî Kesî yê kû bi kilçan, dar û şûrên xwe bahozan disekinîne, ruhên xirab der dike û miriyan vedijîne, hatibûn.

> ***"Îsa tiştên kû dê bihatana serî dizanîbû,*** *derket pêşî û ji wan pirs kir, 'Hûn li kê digerin?'*
> *Bersiv dan, 'Li Îsayê Nasirayî.'*

> *Îsa ji wan re got, '**Ez im…'** Dema Îsa got **'Ez im'** paş ve çûn û ketin erdê. Li ser vê Îsa dîsa ji wan re got, 'Hûn li kê digerin?'*
> *'Li Îsayê Nasirayî' gotin.*
> *Îsa got, 'Va min ji we re got, **Ez im.**'"*(Yuhanna 18:4-8)

Îsa ji wan kesên kû ji bo girtina Wî hatibûn, Xwe bi Xwedê re wekhevî kir û got, *'EZ IM."*[212] Kû Îsa bi wan re biçe, diyar bû kû dê vê ji bo kû WÎ wisa xwest, bikira.

Dema leşker nêzîk bûn, xwendekar Petrus şûrê xwe kêşa, lê tên karî li xulamê kahînê sereke bide û guhê wî jê ke. Îsa bi keremkirinê guhê zilêm baş kir û piştre ji Petrus re wiha got:

> *"Şûrê xwe têxe cihê wî! Yên kû şûr dikêşin dê bi şûr re bimirin. Hûn dibêjin qey ez nikarim ji Bavê xwe alÎkarî bixwazim? Kû ez bixwazim dê niha ji min re ji dozdeh tûmenan zêdetir milyaket bişîne. **Lê Nivîsên Pîroz ên kû dibêjin divê wiha be, dê wê demê çawa pêk bên?**"*
> (Matta 26:52-54)

Îsa li vir ji her kesî kû ji bo navê dîn hovîtî dikin, çawa dijberiyeke nûker peyda dike! Îsa digel kû dizane dê ev zilam bi wi bikenin, jê re îşkence bikin û Wî bikûjin, li şûna kû ji wan nefret ke û tol hilde, sebr û qencîtî da xwest ji bo wan.

## PÊXEMBER Jİ BERÊ DE EV BÛYER DAN ZANÎN

Piştre Îsa ji kesên kû ji bo girtina Wî hatin, wiha got: *"Çima hûn bi şûr û daran hatin? Çawa kû hûn ji bo rêbirekî hatine. Min her roj li perestgeh hîn dikir, we ez negirtim."* Û Nivîsên Pîroz li van peyvên Îsa vê şiroveyê zêde dikin:

> *"Lê ev hemû **ji bo kû nivîsên pêxemberan pêk bên, hatin nivîsîn"**.*

> *Wê demê hemû xwendekar Ew berdan û reviyan. Yên kû Îsa girtin Ew **birin** cem kahînê sereke Kayafa. Zanayên dînî û rûspî jî li wir civiyabûn."* (Matta 26:55-57)

Yê kû bahoz û pêlan kontrol dike, çima destûr da kû Wî bigrin, girê din û biherin?

Ji ber hezkirin û îtaetkirina Bavê Xwe ev tişt kirin.

Ji van hemûyan re destûr da kû we û min ji daraza bêdawî rizgar bike.

Ji wan re destûr da ji bo tevgerên wan, ji bo kû *"bila Nivîsên Pîroz ên Pêxemberan pêk bên"*.

Bi sedan sal berê pêxember Yeşaya wiha nivîsîbû: *"Wekî **berxikê** kû ji bo şerjêkirinê **têbirin**, devê xwe venekir."* (Yeşaya 53:7)

Birahîm pêxember gotibû, *"Dê **berxika** ji bo şewitandinê Xwedê Bixwe peyda ke."* (Afirîn 22:8)

Û Mûsa pêxember got, *"Piştre kahîn, dê **yek ji berxikên nêr** bigire û pêşkêş bike... dê **berxikê*** nêr li cihê pîroz ê kû pêşkêşiya gunehê lê tê şerjêkirin, şerjê bike." (Leviyî 14:12-13)

Li têzana veşartî ya vir binêrin.

Kahînên kû li qurbangeha perestgehê bi kûştin û şewitandina berxikan berpirsiyar in, ew kes bûn kû Îsa ji bo kûştinê girtin. Lê dîsa jî der heqê ***Berxikê*** kû dikirin qurban bikin de hemû pêxember nivîsîbûn, lê dîsa jî der heqê wî de tiştek nizanîbûn.

## Jİ HÊLA RÊBERÊN DÎNÎ HATE DARİZANDİN

> *"Îsa birin cem kahînê sereke yê berpirsiyar. Hemû kahînên sereke, rûspî û zanayên dînî li wir civiyan."*
> (Markos 14:53)

Rêberên dînî yên Cihû, bi şev, danişîneke derqanûnî çêkiribûn.

> *"Kahînên sereke û endamên din ên Heyeta Bilind, ji bo kû cezayê mirinê bidin Îsa şahidên li şahidên dijî wî digeriyan, lê nedidîtin. Digel kû gelek kes şahidiyên derewîn kirin, şahidiyên wan li hev negirtin.*

> *Piştre kahînê sereke di nav civakê de rabû ser piyan û ji Îsa pirs kir, 'Tu yê qet bersiv nedî? Çi ye ev ên kû li hemberî te şahidiyê dikin?"*
>
> *Lê Îsa dîsa qet deng nekir, qet bersiv neda.*
>
> *Kahînê sereke dîsa jê pirs kir,* ***'Mesîhê Yê Bilind tu yî?'***
>
> *Îsa got, '****Ez im.*** *Û* ***hûn ê bibînin kû Kurê mirov li aliyê rast ê Yê biqudret rûdine û dê bi ewrên ezman re bê.****'*
>
> *Kahînê sereke kincên xwe çirandin û got, 'Êdî çi hewce ye ji bo şahidiyan. We ev dijûn bihîstin!'*
>
> (Markos 14:55-56,60-63)

Kahînê sereke çima hêrs bû, kincên xwe çirandin û Îsa bi dijûnê tawanbar kir? Lewre Îsa got Xwedê ye û Kurê mirov –Mesîhê kû hemû pêxember der heqê Wî de nivîsîn– e. Îsa di heman demê de Xwe bi navê taybet ê Xwedê bi nav kiribû. *"EZ IM!"* Û Îsa ji Nivîsên pêxemberan têgihan girtiye û Xwe Dadgerê hemû serzemînê îlan kiribû: *"Dê bibînin kû Kurê mirov li aliyê rast ê Yê biqudret rûdine û dê bi ewrên esmên ve bê."*[213] Kahînê sereke ji ber vê kincên xwe çirandibûn û ev gotin gotibûn:

> *"'Êdî çi hewce ye ji şahidan re? We dijûn bihîst. Hûn ji vê re çi dibêjin?'*
>
> *Hemû biryar dan kû Îsa cezayê mirinê heq dike.*
>
> *Hinek li ser Wî* ***tû*** *kirin, çavên Wî girtin û bi* ***gulmistan*** *lê dan. 'Dê haydê, pêxemberiya xwe nîşan bide!'* ***digotin****. Nobedar jî Ew xistin navbera xwe û* ***lêxistin****."*
>
> (Markos 14:63-65)

Hefsed sal berê Yeşaya pêxember, êşên Mesîh ên kû dê bi daxwaza xwe bikêşe, da zanîn: *"Min pişta xwe* ***vekir*** *ji yên kû li min* ***xistin*** *re. Min rûyê xwe dirêj kir ji yên kû rihê min jê* ***kirin*** *re.* ***Min ji dijûnan, ji tûkirinan rûyê xwe veneşart.****"* (Yeşaya 50:6)

## Jİ HÊLA RÊBERÊN POLÎTÎK HAT DARİZANDİN

Dema roj derket, kahîn û rêberên dînî Îsa bir cem Pontius Pilatusê kû Waliyê Roma yê Cihûdayê ye. Rêberên dînî ji Pilatus xwestin kû bila ji bo çarmixkirina Îsa hukim bidin. Wê demê Cihû di bin serweriya Împaratoriya Romayê bûn û xwedî rayeya cezakirina mirinê ya sûcdarekî nebûn.

Di dema "darizandinê" de Pilatus sê caran got, *"Ez qet sûcekî nabînim!"* lê qerebalix ji hêla kahînên kû Şeytên ew tehrîk kirin, hatin kişkişandin û dengê xwe zêdetir bilind kirin, ***"Bila bê kuştin, bila bê kuştin! Bila bê çarmixkirin! Wî li çarmixê bixe!"***[214]

Pilatus radestî rêberên dînî bû û Îsa mehkûmî cezayê herî giran a zagona Romayê kir: qamçîkirineke wehşî ya kû bi perçekirina çerm hstî derdikevin holê û piştre jî çarmixkirin.

> *"Û piştî kû Îsa da **qemçîkirin**, radestî leşkeran kirin kû ew li çarmixê bixin.*
>
> *Piştî leşkerên Walî, Îsa bir qonaxa Walî, û **hemû tabûr li ser Wî civiyan**. Ew **tazî kir û xifatanekî sor xist ser Wî. Ji striyan tacek çêkirin û danîn ser serê Wî.** Qamîşekî xistin destê Wî yê rastê. Li ber wî rûniştin ser çokê xwe û **henekên xwe pê kirin**, 'Silav ji te re ya Kralê Cihûyan.'*
>
> *Piştre **tû** kirin ser wî, qamîş girtin û **li serê Wî dan**.*
>
> *Piştî kû wisa **henekên xwe pê kirin**, xiftan ji ser Wî derxistin û kincên Wî lê kirin û **birin kû li çarmixê bixin**."*
>
> (Matta 27:26-31)

## ÇİYAYÊ REB

Bi vî awayî Rebê Bilindahiyê –Bedena wî ya pîroz ya kû bibû dêza goşt û xwîna perçekirî, Serê Wî yê kû taceke ji sitrûyan hildigirt, û li pişta Wî çarmixeke giran a texte– bir derveyî bajêr û bir çiyayê kû du hezar sal berê Brahîm li ser pêxemberiyê kiribû:

***"Berxikê ji bo şewitandinê dê Xwedê Bixwe peyda bike… Dê li çiyayê Reb bê peydakirin."*** (Afirîn 22:8, 14)

Hemû unsûr li cihekî civiyabûn — mirov, usûlên darezandinê, Kes, cih.

Her tişt wekî kû pêxember berê dabûn zanîn, pêk dihatin.

Ji bo karê serdeman wext hatibû.



# 24

# Hemû Hat Dayîn

Çarmixkirinkirin, rêbaza mirinê ya herî zalim bû kû heya niha hatibû sêwirandin û ji hêla dewlet ve piştgirî dihat dayîn. Împaratoriya Romayê, vê cezayê mirinê dida sûcdarên herî xirab.

Em nifşa mirov, dema Afirînerê me hat ji bo ziyareta me, me Ew li çarmixê xist û kuşt.[215]

> *"Du sûcdar jî dihatin birin kû bi Îsa re bên îdamkirin. Dema hatin cihê kû jê re* ***TasaSerî***[216] ***têgotin****, yek ji sûcdaran danîn hêla rastê yê Îsa û yê din danîn hêla çepê, wisa çarmix kirin."* (Lûka 23:32-33)

## HAT ÇARMİXKİRİN!

Çarmixkirin ji bo kû ji qurbanekî re êşa her mezin bidin û cezayê herî xirab a biçûkxistinê bidin, hat sêwirandin. Min heya niha ne fîlm ne jî tabloyek dît an jî dixwaim bibînim kû wê êş û şerma Îsa ya kû li çarmixê dikişand, daye nîşan. Mînak, wênesaz û nivîskarên senaryoyê Îsa her tim di nav qetekî kincan de didin xuyakirin, lê esas rastiya dîrokî ew e kû leşkerên Romayiyan sûcdarên darizandî, bi awayekî sadîst li ser darekî dirêj kirin, girê dan û beriya kû bizmar li dest û piyên wan bidin, kincên wan derxistin û ew tazî kirin.

Mirina li çarmixê şerm û êş dida û mirina qurbanan hêdî hêdî çêdibû.

Îsa ji bo we û ji bo hemû nifşa Adem bi dilxazî li ber vê cezayê –şerm û êş– sekinî. Ev îşkenceya kûr a kû li Îsa dikirin, ji bo kû em cezayê cidî ya kû gunehê me heq dike fam bikin, hat sêwirandin.

Bi sedal sal beriya kû Romayî çarmixkirinê derxistin, pêxember Dawud êşên çarmixê yên Mesîh wiha rave kir:

> *"Garanên xiraban derdora min dipêçe.* ***Dest û piyên min qul dikin.*** *Ez dikarim hemû hestiyên xwe bijmêrim. Çavên xwe ji min venaqetînin. Kincên min di navbera xwe de par dikin, ji bo wan qure dikşînin… 'Pişta xwe ta REB, de haydê bila Wî rizgar bike, kû Jê hez dike, bila alîkarî bike!"* (Mezmûr 22:16-18,8)

Û pêxember Yeşaya ev pêşagahî da:

> *"Ji ber kû canê xwe feda kir dê bi dîtinen xwe razî be. Evdê rast ê Reb, piraniya kesên kû Wî qebûl dikin fihil bike, lewrê Wî sûcên wan hilgirt ser xwe."* (Yeşaya 53:12)

Li parçeya hilbijartî ya kû ji Mizginiyê hatiye girtin, hûn dikarin diyar bikin ka di bingeha wan pêxemberiyan kû me wê demê xwendin de, çend pêxemberiyên pêkhatî hene.

> *"Yek ji sûcdaran danîn hêla rastê yê Îsa û yê din danîn hêla çepê, wisa çarmix kirin. Piştre Îsa got, 'Bavo wan bibexşîne. Lewre nizanin çi dikin.' Ji ber kû kincên Wî di navbera xwe de pay bikin qure kişandin. Gel li wir sekiniye, dinêrîn ka dê çi bibe. Rêvebir henekên xwe bi Îsa re kirin, 'Yên din rizgar kirin, kû Mesîhê Xwedê, Bijareyê Xwedê Ew e, bila Xwe jî rizgar bike.' Leşker jî nêzîk bûn û bi Îsa kenîn.*
>
> *Piştre yek ji sûcdarên kû hatibû çarmixkirin dijûnan da, 'Qey tu ne Mesîh î? Dê haydê, Xwe jî me jî rizgar bike.'*



*Lê sûcdarê din jê re qîr kir. 'Tirsa Xwedê jî bi te re tune ye? Tu jî heman cezayê dikşînî. Her wiha em wekî mafdar tên cezakirin, em berdêla kirinên xwe distînin. Lê vî zilamî tu xirabî nekir.'*

*Piştre got, 'Ya Îsa dema tu serweriya Xwe bigirî, min bi bîr bîne.'*

*Û Îsa jê re got, 'Ez ji te re rastiyê bibêjim, tu yê îro bi min re li bihuştê bî.'*

*Nîvro, dora dozdehan tav tarî bû, heya siseyan tarîtiyek hat li ser hemû welêt."*

(Lûka 23:33-36, 39-45)

## KARÊ QEDANDÎ

Bi sedan salan, qurbanên bêhejmar, ji êşa çarmixkirinê re tebat kirin. P.M sala 70yan de beriya ketina Yeruşalimê, leşkerên Romayê rojê pênc sed Cihû li çarmixê dixistin.[217] Hin qurban beriya mirinê, bi rojan li çarmixê bêhiş diman. Îsa beriya mirinê, li gorî yên din kêmtir êş –şeş saet– kêşa. Ya kû êşên Îsa bêhempa dikir çi bû?

Cudahiyeke girîng e kû pêxember êş û mirina Îsa ji berê de didan zanîn. Cudahiyeke din jî –gelek kes dema li çarmixê de bûn xwînên xwe rijandin– ew bû kû tenê xwîna Reb Îsa *nuwaze* bû. Û niha çîroka kû em dixwînin, der heqê mirina Îsa de dîmeneke din a kû xwedî bêhempayeke dawînî ye, rave dike.

> *"Nîvro derdora dozdehan de tav tarî bû û heya siseyan* ***tarîtî hat li ser hemû welêt."*** (Lûka 23:44)[218]

Îsa sibê saet nehan de li çarmixê hat bizmarkirin. Ji nîvro dozdehan heya saet siseyan tarîtî hat li ser hemû serzemînê.

Çima? Di vê sê saetan de ji çavên dinyayê veşartî, bûyera herî girîng a hemû wextan pêk dihat. Xwedê ji ber kû em di bêdawiyê de bi gunehê xwe re mijûl nebin, niha li gunehê me ango di nav demê de dinêrî.

Di van saetên kû tarîtiya sersirûştî serwer bû, Xwedê li ser xwe yê yekane û rast cezayê kûr û bêdawî ya gunehên me bar dikir. Ji ber vê armancê bû kû Xwedê ji goşt û xwînê pêk dihat.

> *"Ew qurban e kû gunehên me, ne tenê gunehên me, gunehê hemû dinyayê dide bexşandin* [pêşkêşiya gunehê kû xezebê Xwedê dikêşe hundirê xwe]."(Yuhannayê 1., 2:2)

Hefsed sal berê pêxember Yeşaya bûyera van deman ji berê de dabû zanîn:

> *"Ji ber serhildanên me bedena Wî hat qulkirin, ji ber sûcên me Wî tehde kişand. Cezayê kû ji bo selametiya me hewce bû, jê re hat dayîn. Me bi birînên Wî şîfa dît.* ***Reb cezayê me hemûyan li ser Wî bar kir …*** *Wekî berxikekî ji bo şerjêkirinê ew birin ...* ***Reb pelixandina Wî rast dît****, xwest bila biêşe.* ***Kû canê xwe wekî pêşkêşiya sûcê pêşkêş bike …*** *ji ber kû canê xwe feda kir, dê bi dîtinên xwe razî be. Bi rêya daxwaza* ***Reb, Evdê Wî yê rast, dê piraniya wan kesên kû ew qebûl kirin, fihil bike.****"*
>
> (Yeşaya 53:5-7, 10-11)

Di dema van saetên çarmixê kû gerdûn ji hêla tarîtiyê ve hatibû dorpêçkirin de, REB qirêjî û cezayê gunehên me danî ser Xwe yê dilxaz û bêguneh. Em ê tu car baş fam nekin ka navbera Bav û Kur de çi derbas bû, lê tişta yeqîn ev e: bûyera kû pêk hat, bûyera herî mezin a hemû deman bû.

## TENA SERÊ XWE

Dema tarîtiya reş serzemînê pêça, *"Îsa bi dengekî bilind got, 'Eli, Eli, lema şevaktani?' ango,* ***'Xwedê, Xwedê te çima ez terk***

***kirim?'"*** (Matta 27:46)

Îsa dema li çarmixê bû çima bi feryadeke kû dilê mirov dişewitand, qîr kir? Bi vî awayî qîr kir, lewre Xwedê Ew tenê hişt kû cezayê gunehê bikêşe.

Îsa ji bo her kesî, êşa **sê asta veqetînê** ya kû guneh bû sedem, kêşa.

- *Mirina ruhî* ceriband. Xwedayê ser ezmanan Rûyê xwe yê pîroz ji xwe yê li serzemînê da aliyekî. Lewre guneha hemû nifşa mirov dabû Wî.
- *Ji mirina fîzîkî* derbas bû. Îsa dema bi daxwaza xwe mir, Ruh û Canê Wî ji Bedena Wî veqetiyan.
- Di heman demê de *mirina duyemîn* jî dît. Ji bo we û ji bo min êşa dojehê kêşa.

Dojeh ew cihê tarî ye kû Xwedê terka wê kiriye û her kes li wir tena serê xwe hatine hiştin. Dojeh ji tiştên baş bêpar maye. Cihekî wisa ye kû ji Hebûn û hezkirina Bavê Ezmanî cuda bûye. Dema Bêdawî li çarmixê bû, di bêdawiyê de cara destpêkê û dawîn ji Bavê Bêdawî veqetiya. Ji ber kû em tu car vê veqetîna xirab nejîn, Wî jê re tebat kir.

Berxikê pîroz ê Xwedê, bû Barkêşê-Gunehê me: ***ket şûna me.*** Wî şerm, êş, sitrû û bizmaran qebûl kir û hemû giraniya laneta gunehê avê ser milê xwe. Li qurbangeha çarmixê de ji bo gunehê bû *"pêşkêşiyekî şewitinê"* yê tam û dawînî.[219]

## DÎ NAV ÇEND SAETAN DE DOJEH?

Îsa dojeha me girt.

Mirovekî çawa dikarîbû cezayê hemû mirovahiyê bidaya? Îsa çawa dikarîbû di nav çend saetan de êşa bêdawîtiya kû bi ceza re tijî ye, bikêşa?

Sedema van kirinên Wî, ji ber *Kî*bûna Wî bû.

Ji ber *Nasnameya Wî* ne hewce bû heta hetayê cezayê me yê diviyabû me bikêşa, bikêşanda. Tu deynê-gunehê yê Xwedê yê bêdawî yê kû diviyabû Bixwe bidaya, tune bû. Û di heman demê de Ew wekî me bi demê re ne gîrêdayî bû.

Ew ji ber *nasnameya* xwe, di nav demeke bisînor de xwedî qudreteke wisa bû kû dikarîbû *"ji bo her kesî mirin tam bikira."* (Îbranî 2:9)

Reb Xweda çawa kû ji bo afirandina cîhana me ya tevlihev hewcedariya demê nebû (digel kû xwest dinyayê nav şeş rojan de biafirîne), bi heman awayî ji bo rizgarkirina mirovan jî hewceriya demeke diyarkirî nebû (digel kû xwest li çarmixê şeş saet bimîne).

Ji bo Xwedê wext wekî tu tiştê ye.

> *"Ji ezelîtî û heya bêdawîtiyê Xwedê tu yî! ... lewre ji bo te hezar sal wekî rojeke derbasbûyî ye, wekî nobeta şevekê* [wekî peywira panêrkî ya çend saetan] *ye.* (Mezmûr 90:1,4)

## "QEDİYA!"

> ***Piştre** Îsa zanî kû her tişt qediya û ji bo kû Nivîsa Pîroz pêk bê got, 'Ez tî me!' Li wir kasikekê hebû kû bi şeraba tirş dagirtîbû. Singêrekî kû xistibûn nav şerabê, li çiqla catirê xist û dirêjî devê Wî kir. Îsa dema şerab tam kir got, '**Qediya!**' û sitûyê xwe xwar kir, **ruhê xwe teslîm kir.**"*
> (Yuhanna 19:28-30)

Îsa beriya mirina xwe, ev daxuyanî da:

***"Qediya!"***

Ev biwêj ji peyveke Grekî ya *'Tetelestai.'* Hatiye wergerandin. Ev biwêj di cîhana xebat a Romayê pir dihat bikaranîn. ji bo nîşankirina wedandina deynekî dihat bikaranîn. Hin makbûzên kevin ên kû li ser *'tetelestai'* dinivîse, hatine dîtin, wateya wê ***"hemû hat dayîn"*** e.

Biwêja *telestai*yê, di heman demê de ji bo qedandina peywirê bide zanîn dihat bikaranîn. Dema xizmetkarekî li kesê kû ew ji bo peywirekê şandibû vegere û rapor bide, peyva *'Tetelestai'* ya kû dihat wateya ***'Pêywir pêk hat.'*** digot.

Nivîskarên din ên Mizginiyê jî cih dane heman tomarê. *"Îsa **bi dengekî bilind*** qîr kir û nefesa xwe ya dawî da." (Markos 15:37)

Ev biwêj qîrîna serkeftinê bû!

Sembol û pêxemberiyên kû Berxikê Xwedê nîşan didan, pêk hatibûn.

Îsa ***guneha***kû lanet jê re bibû sedem, bi awayekî bandorker têk biribû. Ji bo kû nifşa qirêj, kanc, lanetkirî ya Adem rizgar bike, fidyeya kû Xwedê xwestibû dabû. Xwezaya biedalet a Xwedê û xezeba Wî ya li hemberî gunehê, bi temamî hatibû ragirtin. Zagonên wan pêk hatibûn.

Qediya! Hemû deyn hat dayîn! Peywir bi awayekî serkeftî pêk hat!

> *"Hûn ji jiyana xwe ya vala ji ber tiştên vala yên wekî zêr an jî zîv nefilitîn,* ***ji ber xwîna hêja ya Mesîh a kû dişibe berxikeke bêguneh û paqij, filitîn****. Mesîhê kû beriya afirandina dinyayê tê zanîn, di dawiya serdeman de* ***ji bo kêrî we*** *derket holê."* (Petrûsê 1., 1:18-20)

Bi sedsalan ji bi milyonan heywanên paqij xwîn herikîbû. Lê niha xwîna Îsa Bixwe ji bedena wî ya ji gunehê azad rijiyabû.

*"Xwîna Îsa Mesîh a kû bi awayekî bêsînor hêja ye"* dê gunehê tenê ji bo demekê ***nepêçaya***. Dê tomara gunehê heta hetayê *jê bibira.*

Ev mizginiya peymana pêşîn a Xwedê bû kû ji berê de dabû zanîn.

> *'Rojên kû ez ê* ***peymaneke nû*** *çêkim, tên' dibêje Reb… ez ê sûcên wan bibexşînim û* ***êdî gunehên wan bi bîr neynim.***
> (Yeremya 31:31,34)

Piştre Nivîsên Pîroz ên Peymana Nû ev agahî dide: *"Xwedê bi gotina* ***Peymaneke Nû****, ya pêşîn* ***kevin*** *hesibandiye.'* (Îbranî 8:13) Dê êdî hewcedarî bi pêşkêşiyên gunehê nemaya. Pêşkêşkirina heywanên qurbankirî yên qurbangehê, bi rêya mirina Mesîh a li

çarmixê ji holê rabûye û hatibû betalkirin.

REB Xweda çawa kû qurbana xwe ya *pêşîn* (roja kû Adem û Hewa guneh kirin) pêk anî, dîsa bi heman awayî qurbana xwînê ya *dawî* jî Bixwe peyda kiribû.

Wekî kû Brahîm ji berê de dabû zanîn, Xwedê *'berxika ji bo pêşkêşiya şewitandinê Bixwe peyda kiriye.'* (Afirîn 22:8)

Xwedayê kû Brahîm texsîr kiriye, *" **xwe yê heq** jî texsîr nekiriye, Ew ji bo me hemûyan teslîmê mirinê kiriye."* (Romayî 8:32)

Xwîna rijayî ya Îsa, ***zagona guneh û mirinê ragirt** û **zagona qurbanê** pêk anî."*

Qîrîna Reb Îsa ya *'**Qediya**!'* ne tiştekî metelhiştî ye.

## PERDEYA ÇİRANDÎ

Piştî kû Îsa qîr kir û got, *'Qediya!'* çi qewimî?

> *"Û Îsa bi dengekî bilind qîr kir û nefesa xwe ya dawî da.*
> ***Wê demê perdeya perestgehê ji jor heya binî bû du qet.**"*
> (Markos 15:37-38)

Dîrokvanên kevin dinivîsin kû perdeya perestgeyê bi qasî kefa destê mirov sitûr e û didin zanîn kû ji bo dorpêçkirina perdeyê pêdivî bi 300 zilaman heye û pir giran e.[220]

Sedema kû ev perdeya sitûr û giran kir du qet çi bû? Dema em vegerin beşa 21an, em ê li wir bînin bîra xwe kû Xwedê ferman kiriye bila vê perdeya kû ji bo gelê Wî taybet e destpêkê li konê û piştre li perestgehê bialiqînin. Perde mirov li derveyî wî cihê hundirîn –Cihê Herî Pîroz– ê kû Xwedê roniya Hebûna xwe ya kû çavê mirov kor dike lê bi cih kiribû, dihişt. Ev perdeya kû bi tayên lacîwerd, mor û sor hatibû honandin, yekane yê Xwedê yê kû dê ji Ezmanan bihata Erdê, sembolîze dikir. Peywira wê ya din jî ew bû kû dianî bîra gunehkaran kû ji Afirînerê xwe yê pîroz cuda bûn. Tenê ji kesên kû pîvana rastiya nuwaze ya Xwedê pêk dianîn re destûra têketina avahiya bêdawî ya Xwedê dihat dayîn.

Salê carekê –Roja Kefaretê– ji kahînê sereke yê kû bi taybetî hatiye meshkirin re destûr dihat dayîn kû ji perdê derbas bibe û têkeve Cihê Herî Pîroz. Yek rêya kû kahînê sereke bê wendabûn biçe Huzûra Xwedê ew bû kû di nav kasikekê de xwîna bizineke qurbankirî (ya kû xwîna Mesîh a rijiyayî sembolîze dike) tev xwe bihere. Di heman demê de diviyabû kahînê sereke kinceke dirêj a ji ketenê (ya kû rastiya Îsa sembolîze dike) li xwe ke. Kahîne sereke piştî kû têkeve Cihê Herî Pîroz, diviyabû vê xwînê hef caran (sembolîzekirina tevahiyê) li ser Devgirê Bexşandinê yê Sandoqa Peymanê reşanda. Di nav sandoqê de Zagona Xweda ya kû hemû gunehkaran mehkûmî mirinê dikir, hebû. Lê Xwedê rehm li gunehkaran kir û destûr da kû li şûna wan bila heywanekî bêguneh bimire.

Bi panzdeh sedsalan, perde şahidî kir kû bêyî xwîna Mesîh a herikî ya ji bo pîroziya Xwedê, ji bo gunehê kefareteke mayînde ne mumkin e.

Tenê bêgunehê Xwedê, Yê Bijartî kû perde sembolîze dikir, dikarîbû heqê gunehê bi temamî bidaya. Xwedê ji ber vê dema wext qediya, xwe yê heq û yekane şand kû bila jiyaneke bi awayekî nuwaze îteatê zagonên Wî dike bidomîne û bila heqê cezayê nifşa Adem a kû guh neda zagonê bi dilxazî û bi xwîna xwe bide.

Wê demê kê perdeya perestgehê ji jor heya binî çirand? Xwedê çirand. Bav Xweda bi vê çalakiya xwe ji peyva xwe ya *'Qediya!'* re *'Amîn!'* got.[221]

Xwedê razî bû.

## ÊDÎ PÊDİVÎ BI QURBANÊN GUNEHÊ TUNE BÛ

Dema Îsa li çarmixê qurban bû, kefaret (bexşandina gunehê û bi Xwedê re lihevhatin) pêk hatibû. Qurbana Nuwaze ya kû Ket Şûna me, ji bo guneha dinyayê bi dilxwazî Xwîna xwe rijand.

Êdî gelê Xwedê dê neketiya tengesiya kû her sal qurban pêşkêş dikirin.

Êdî Xwedê dê merasîmên perestgehê an jî kahînên sereke nexwesta.

Qurbana pêşîn û dawîn hatibû pêşkêşkirin. Rastiya li pişt sî û sembolan axivîbû: *'Qediya!'*[222]

Xwedê Bixwe ji kesên kû bawer dikin re wiha dibêje:

*"'Ez ê êdî guneh û sûcên wan bi bîr neynim.' Dema ev bên bexşandin, êdî pêdivî bi pêşkêşiyê tune ye ji bo gunehê. Ji ber vê ya birayên min,* ***bi saya xwîna Îsa êdî em diwêrin ji perdeyê, ango*** *ji rêya nû û zindî ya kû* ***di bedena xwe de*** *ji me re vekir* ***têkevin cihê pîroz****. Kahînê me yê mezin heye kû ji mala Xwedê berpirsiyar e. Naxwe,* ***bi ewledariya îmanê, em jidil nêzî Xwedê bibin.****"*
(Îbranî 10:17-22)

## MİR

Dema Îsa mir, ne tenê perdeya perestgehê bû du qet, di heman demê de erd hejiya û qelebalixa kû tirsa reviya û belav bû:

*"Sitvan û leşkerên kû li benda Îsa bûn, dema zelzele û bûyerên din dîtin pir tirsiyan. 'Bi rastî jî ev Xwedê bû' gotin."* (Matta 27:54)

Piştre leşkerekî Romayî, ji ber kû jê bawer be kû Îsa bi rastî jî miriye, nîzeyek xist tenişta Îsa. ji tenişta Îsa xwîn û av herikî. Ev rewş delîleke tibî bû kû miribû. Çalakiya vê leşkera Romayî di heman demê de gelek pêxemberiyên din pêk anî.

## HAT VEŞARTİN

*"Berêvarê Atamatyayîyek dewlemend ê bi navê Yusuf hat. Ew jî xwendekarekî Îsa bû. Çû cem Pilatus û termê Îsa xwest. Pilatus jî ferman da kû bila bidinê. Yusuf term girt, bi cawa keten a paqij pêça, xist nav gora Wî ya nû kû bi qewartia zinêr dabû çêkirin. Kevirekî mezin gindirand ber gorê û çû."* (Matta 27:57-60)



Pêxember Yeşaya ji berê de dabû zanîn kû gora Mesîh *“dema bimire dê li cem ya dewlemend be”* (Yeşaya 53:9) plana Xwedê bi hemû hurgûliyên xwe pêk dihat. Digel vê, xwendekarên Îsa hê ev plan fam nekir. Bi rastî jî jê bawer kiribûn kû Îsa Mesîh bû kû dê li serzemînê kraltiya xwe çêkira, lê dema mirina Wî dîtin, destûr dan kû hêviyên wan jî bi Wî re bimire. Efendî û Hevalê wan ê delal ê kû mucîze dikirin, hatibû kuştin û veşartin.

Her tişt qediya bû, an jî ew wisa difikirîn.

Xwendekarên Îsa wehda Wî ya kû dê roja sêyemîn vegerei ji bîr kiribûn, lê digel vê çi ecêb e kû, rêberên dînî yên kû mirina Wî sêwirandibûn, wehda wî ji bîr nekiribûn.

> *"Kahînên sereke û Ferîsî li ber Pilatus civiyan, '***Begê me,***' gotin,* ***Em tînin bîra xwe kû Ew ê xapînok, hê dema dijiya digot, 'Ez ê sê roj piştî mirina xwe vejîm.'*** *Ji ber vê ferman bide kû heya roja sêyemîn bila gora Wîbê kontrolkirin. Hekena dê xwendekarên Wî bên, termê Wî bidizin û gel re bêjin, 'Ji mirinê vejiya.' Xapandina dawîdê ji ya berê xirabtir e.' Pilatus ji wan re got, 'leşkeran tev xwebiherin û herin, çawa dixwazin wisa biparêzin.' Ew jî bi leşkeran re çûn, kêvir mor kir û parast."* (Matta 27:62-66)

Deriyê kevir ê gora sar a kû termê Îsa tê de radiket, hat morkirin. Leşkerên bi çek ên Romayî li derdora gorê nobet girtin û ew parastin.

Piştre sibeha Yekşemê hat!



# 25

# Mirin Têkçû

Nivîsên Pîroz, dibêjin Adem ***“miriye”*** (Afirîn 5:5) û bi vî awayî çîroka wî ya rûkala dinyayê bi dawî dibe. Heman tişt ji bo nîjada Adem mirov dikare bibêje. Di beşa pêncemîn ya pirtûka Afirînerê de gorîçeyên wan jî dinivîsînin:

“û ew mir
... ew mir
... ew mir
... ew mir
... ew mir.*”*


Dîroka jin û mêrên kû bi nexweşiya gunehan ketiye wisa ye. Jiyan, mirin û hatin definandin. Ev rewşa ji bo hemû mirovên hevçax û qirnan bi berdewamî mirov dikare bibêje.

Lê belêçîroka mesîh di gorekê de neqediya!

**GORA VALA**

*“Hefteya piştî Roja Şabatê di berbanga rojê de Meryema Mecdeli û Meryema din çûn serdana gorê. Ji nişkave zelzeleyek çêbû. Milyaketekî reb ji ezmanan daket çû ser gorê, kevir da hêlekê û li ser rûnişt. Dîmena wî mîna birûskê lê kincên wî mîna berfê simspî bûn. Nobedar ji tirsan ricifîn, piştre jî mîna miriyan gotin tirp û ketin erdê.*

*Milyaket wiha bang li jinan kir: ‘Netirsin ez dizanim hûn li Îsayê kû hatiye çarmixkirin digerin.* ***Ew ne li vir e;***



***weke kû digot vejiya. Werin cihê kû lê raketiye bibînin.*** *Zû herin ji şagirtên wî re wiha bêji: 'Îsa ji mirinê vejiya. Berî we diçe Celîleyê, hûn ê Wî li wir bibînin.' Niha va min ji we re ev got.*

*Jin bi tirs û kêfxweşiyeke mezin ji gorê bi dûr ketin; bi bazdan çûn xeberê bidin şagirtên Îsa. Îsa ji nişka ve derket pêşiya wan. Got,* ***'silav'****.*

*Nêzîkî Îsa bûn xwe avêtin ber lingên wî û rajerî jê re kirin. Wê gavê Îsa ji wan re got,* ***'netirsin'****. Biçin xeberê bidin birayên min. Bila herin Celileyê, wê min wir bibînin."* (Matta 28:1-7)

Mirinê nikarîbû Mesîh dîl bigirta. ji ber kû tu gunehê Îsa tune bû, Xwedê ew ji mirinê vejand. Îsa tenê bi dayîna cezayê gunehên dinyayê nema, bi xêra wî cezayî serfiraz bû. Wî mirin bixwe têk bir!

Divê kû Şeytan û cin rikrikî bin û ji tirsan lerizîbin.

Rêberên olî ji eyarê xwe derketin û ji ser xwe çûn.

*"Jin [yên kû beriya niha bi keliyekê Rebên xwe yên vejiyabû dîtibûn] hê di rê de bûn hin leşkerên nobedar xwe gihandin bajêr tiştên kû qewimîne ji serkahîn re ragihandin.*

*Hemû serkahîn bi pêşiyan re civiyane piştî şewr û mişêwra xwe pereyekî zêde dane leşkeran û gotin: 'Hûn ê wiha bêjin: 'Şagirtên Wî bi şev hatin dema em di xew de bûn cendekê dizîn birin!' ger ev agahî bi berguhê Walî bikeve em ê li ber wî bigerin wî aş bikin û nehêlin zerar bigihije we.' Bi vî awayî leşketan pere stendin û bi awayê kû ji wan re hatibû gotin, kirin. Ew gotegot hê jî di nav Cihûyan de tê qalkirin."* (Matta 28:11-15)

Dijminên Îsa dizanîbûn gor vala ye. ji bo kû rastiyê veşêrin şaş mabûn, nizanîbûn wê çi bikirina. Ne dixwesxtin mirov bizanibin mirovê kû kuştine vejiyaye.

## MİRİN TÊKÇÛ

Xwedê, li Baxçeyê Adenê Adem di derbarê kû bêîtaetiyê li ber regezê kû Xwedê diyar kiribû bike ***"teqez wê bê kuştin"*** hişyar kiribû. Bersiva Şeytên dijberê bersiva Xwedê bû: *"Teqez **tu yê neyê kuştin!**"* û bi berdewamî û hemû kurê mirov ji riya mirin û têkçûnê ve arasteyî berjêr kir. Mirinê bi hezaran salan jin, mêr û zarok nav lepên xwe yên xedar û bêrehm de gîrt. Piştre Xwedê lingê xwe li ber lingê mirinê xist û ew têkbir û riya kû dihere ber bi jiyana ebedî ve vekir.

*"**Her kes** çawa **di Adem de dimire, her kes di Mesîh de jî digihije jiyanê.**"* (Korîntiyên 2., 15:22)

Duh, xanimeke cîrana me ya pîr ji min re got, 'Di jiyanê de tiştê kû herî zêde ez jê ditirsim mirin e.' Ez gelek kêfxweş im

ji ber kû min behsa ew Kesê Ebedî yê kû miriye û piştre dîsa vejiyaye kiriye!

> *"Zarokên kû Xwedê dane Wî ji ber kû ji goşt û xwînê Îsa ji bo kû yê kû xwedayê hêza mirinê, yanî Îblîs bi rêya mirinê bêkartek bike xwe mîna wan xist halê mirovan. Ev yek ji bo yên ji tirsan mirine di hemû jiyan xwe bila koletî derbas dikin azad bibin, kir."* (Îbranî 2:14-15)

Ka em wiha bihesibînin Îsa tenê bi rêya gunehê me de mir. Lê ji mirinê venejiya. Wê demê hê jî mirin bûya mîna tiştekê kû em jê ditirsin.

Reb Îsa bi têkbirina mirinê re destnîşan kir kû ew ji çeka herî bi hêz ya Şeytên û dijminê kû herî zêde mirov jê ditirse mezintir e. Ji ber kû Îsa mirin têkbiriye. Yên kû baweriya xwe bi wî anîne, ne di vê jiyanê de ne jî an jî di jiyana din de tiştekî kû jê bitirsin tune ye.

Peyama Xwedê gelek eşkere ye. ger hûn Xwedê yê kû derbasî şûna we bû ye û di çarmixê de êş kişandiye û miriye û piştî mirina xwe di roja sêyemîn de vejiyaye bawer bin, ew ê we ji desthilatdariya fetîsok a mirinê azad bike û wê jiyana ebedî bide we.

Mizgîniya kû Xwedê daya dinyayê kû ji hêla guneh ve hatiye dîl kirin ev e.

> *"**Li gorî Nivîsên Pîroz,** Mesîh di ber gunehên me de **mir... Hat definandin** û **li gorî Nivîsên Pîroz roja sêyemîn ji mirinê vejiya.**"* (Korîntiyên 1., 15:3-4)

Îsa Mesîh, ji hemû kesên bawermend re wiha dibêje:

> *"Ji ber kû ez dijîm hûn ê jî bijîn ... metirse! Yê destpêkê û yê dawî ez im. Ez miribûm, lê belê di bêdawiyê de ez zindî me. Amîn. Mifteya mirinê û warê miriyan di destê min de ye."* (Yuhanna 14:19; Wehî 1:17-18)

## ŞEYTAN TÊKÇÛ

Îsa dema kû ket herêma mirinê û piştî sê rojan ji wê herêmê derket, derbasî cihên bilind yê qada şer bû; serfirazî awantaja wî ya kû wê qet jê derbernedaya bû. Şeytan dijminekî têkçûyî ye. Ew û cinên wî digel kû hevşikestî di şer de dikoşin jî dê qet şer qezenc nekin.

Hûn fam dikin ne wisa bê ka çawa pêxemberiya kû Xweda di roja kû Adem û Hewa li Baxçeyê Adenê gunehkar bibûn diyar kiribû, cih tîne? Wekî kû Xwedê xoz û ahd kiriye "Ezbeta Jinê (Îsa) ji hêla mar ve hat birîndarkirin. Lê di esasê xwe de ev birîn bobelata kû wê bê serê Şeytên morkirin.

*" Xwedê bo kirinên Îblîs bi dawî bike derket holê."*
*(Yuhanna 1., 3:8)*

Îsa bi mirin, definandin û vejîna xwe bi gotina *"... tu yê vegerî **axê**"* (Afirîn 3:19) di ser ew laneta kû tê dest nîşankirin serfirazî bi dest xist.

Şeytên bi hezaran salan mirina nîjada mirî ya Adem dîsa vedigerand bi axê, ew pêvajoya mirinê kû dirizand biçûk dît û henekê xwe pê kir. Lê belê niha li dijberî wî yekî kû bedena wî **venedigeriya** axê hebû!

Bedena *Wî* di gorê de gelo çima neriziya?

Karteka mirinê li ser Wî tune bû, ji ber kû ew yê bêguneh bû. Beriya niha bi hezar salî pêxwmber Dawud ev bang kiribû.

*"Tu yê **nehêlî** evdê te yê dilsoz birize."* (Mezmûr 16:10)

Yê pîroz, Şeytan û mirin bo me têk bir.

## DELÎL

Delîlên derbarê vejîna Îsa de pir in û ev delîl bi têra xwe mirov qanih dikin.[223]

Gor vala bû.

Cendek li tu derê nehat dîtin.

Destpêkêjin bûn şahid kû gor vala ye. daxuyaniya Milyaket bihîstin. Îsa bi awayekî zindî dîtin. Dest Wî dan û bi Wî re axivîn. Ger tomarên Mizgîniya ne rasteqîn bûna û qelp bûna ew zilamên kû Mizgînî nivîsandine li gorî wê dê di her warî de destpêkê rê bidina jinan?

Bi tomarşehadeyan hatiye îspatkirin piştî kû Îsa vejiyaye ji hêla gelek kesan ve hatiye dîtin. Di dehan salên piştî bûyera vejînê de bi sedan şahid wê bibin şahid kû bi Mesîhê vejiyaye re meşiyane û bi Wî re axivîne.

Şagirtên Îsa dîtibûn kû êş kişandiye û miriye. Xeyalên şikestî bibûn. Ji ber kû fikreke wan ya xelet kû Mesîh wê qet nemire nebû hêviyan wan şikestibûn. Bi tirs û bi newêrekî vegeriyabûn malên xwe.

Piştre tiştek bû. Îsa bi awayekî zindî dîtin.

Ji nişka ve hate bîra wan kû Îsa ji wan re gotibû ew ê bê çarmixkirin û piştî sê rojan jî dê vejî.[224] Dawiya dawî fam kirin kû gotinên pêxemberan tê çi maneyê.

Ew şagirtên kû destpêkêbi tirs tevgeriyan niha bûne şahidên wêrek yên Mesîh. Piştî vejîna Îsa bi demeke kin Petrûsê aqlê wî tevlihev bibû û tirsiyabû li kolanên Yerûşalim yên dijmin ji kesên kû plan kiribûn Îsa bê çarmixkirin re ev daxuyanî da.

> *"We yê Pîroz û adil red kir… **We Serokê jiyanê kuşt, lê Xwedê Ew ji mirinê vejand.** Em şahidê vê yekê ne… Niha lo birano, hûn jî mîna rêvebirên xwe ji ber nezaniyê wisa tevdigerin. **Lêbelê Xwedayê kû bi devê hemû pêxember ragihandibû kû ew ê Mesîh êşê bikşîne soza xwe bi vî awayî pêk aniye.** Ji ber kû wiha ye ji bo kû hûn ji hemû gunehên xwe pak bibin tobe bikin û ji hemû gunehên xwe pak bibin, tobe bikin û li Xwedayê xwe vegerin."*
>
> ***(Karên Şandiyan 3:14-19)***

Ji bo şagirtên Îsa kû tu zehmetiyên kû ji bo yê kû jiyana ebedî dabû wan nekêşandana tûnebû.

Şagirtên Mesîh (di heman demê de wekî *Xirîstiyan* jî tên bi

navkirin[225]) ji bo kû li ser navê Îsayê Reb bûne şahidên wêrek qerf li wan hatine kirin, avêtine hepsê û hatine tajangkirin, heta gelek ji wan hatine kûştin. Petrûs êşkence xwariye û li gorî zanînên dîrokî yên dinyewî di encamê de serserkî hatiye çermixkirin. Lê belê Petrûs dîsa jî li gel şagirtên din ji ber kû dizanîbû Rizgarker û Rebê wan mirin û dojeh têkbiriye, hemû wê lêdana êşkenceyê bi kêfxweşî qebûl kirin.[226]

Wan dizanîbû Xwedê bexşandin, rastî û jiyana ebedî daye wan. Mirinê êdî wan neditirsand. Ji ber kû dizanîbûn dema kû bedena wan ya fîzîkî bimire giyan û canê ebedî wê li bihuştê *'bi Rebê wan re be.'* (Korîntiyên 2., 5:8)

Niha tu tiştî nikarîbû ew bitirsanda. Peyameke wan ya kû ji dinyayê re ragihînin hebû, ev peyam ji bo wan ji jiyana wan girîngtir bû.

Li jêr ez dixwazim bê ka şopînerekî Mesîh çawa ji girseya qerfkar û şikbar ya bajarê Atînayê kevin peyama xwe ya ragihandiye bi dawî kiriye.

> *"Xwedê niha* ***li her derê tobekirina her kesî*** *emir dike,* ***ji ber kû bi rêya yê kû tayînî dinyayê kiriye roja kû ewê darizîne*** *tespît kiriye***. Bi vejandina wî Kesî ji mirinê, ev yek ji her kesî re teqez kiriye.***"* (Karên Şandiyan 17:30-31)

Encama peyama Pavlûs eşkere û basît bû: Tobe bikin. Êdî bes bifikirin kû hûn ê ji daraza teqez ya Xwedê xelas bibin. Ji bedêla wê jî bi Rizgarkerê xwe yê di rêya gunehên we de Xwîna xwe rijandiye û ji mirinê vejiyaye, bawer bibin.

## DELÎLÊ Bİ ERÊNÎ

Ez û hûn em ê çawa qanih bibin kû Îsa Rizgarker û Darizînerê dinyayê ye? Bersiva wê beriya niha bi demekê me xwend Xwedê, bi "**vejîna Wî ya ji mirinê** nîşaneya **baweriyê** destnîşan kiriye."

Gelo hewce ye kû delîl bên destnîşankirin? Îsa Rizgarkerê tekane ye. gelo ji bo çi em ê di derbarê çarenûsa xwe ya ebedî de bi yekî bawer bibin?

Lê mixabin mirovên li rûkala dinyayê bê hurmetiyê li hember kesên mirî yên di jiyana xwe de li hember peyam û çîroka Xwedê dijberî kirine, nakin. Ji bo çi mirovek ji mirovên kû nikarin mirinê têk bibin û li hember gotina Xwedê derdikevin bawertiya xwe bîne.

Çawa kû pêxemberiyek tê pêkanîn, ji bo kû em bawer bikin, tê îspatkirin kû Pirtûka Pîroz Peyva Xwedê ye, vejîna Îsayî roja sêyemîn û di heman demê de baweriya me jî kû bi tenê Îsa dikare mirov ji mirinê ebedî bike û jiyana ebedî bide me nayê nîqaşkirin.

## Jİ BO HEMÛ MİROVAN RİZGARKER

Nivîsên Pîroz gelekî eşkere ne: peyama derbarê mirin û vejîna Îsa de *"ji bo her kesî li her derê ye!"* divê ev xal bê destnîşankirin, ji ber kû hinek kes ji we re bibêjin Îsa bi tenê ji bo Cihûyan hatiye.

Tu gotin ew qasî ne dûrî heqîqetê ye.[227]

Rast e di hedefa xizmetên Mesîh yên rûkala dinyayê de Cihû hene. Lêbelê sedema kû ew ji vê netewê re hatiye şandin ji bo rizgarkirina hemû dinyayê ye. Beriya niha bi hefsed salî pêxember Yeşaya wehda kû Xwedê dabû xwe tomar kiribû: ***"Ez ê te ji wan re bikim ronahî. Bi awayekî rizgarkirina min li çar aliyê dinyayê belav bibe."*** (Yeşaya 49:6)

Mesîh digel zanîbû ew ê serokên Cihû Wî wekî Qiralên xwe qebûl nekin jî hat dinyayê. Di heman demê de dizanîbû bi rêya vê redkirinê ew ê cezaya guneh bide û wê rizgarkirinê diyarî dinyayê bike.

> *"Ew li dinyayê bû, dinya bi destê Wî çêbû. Lê belê dinyayê ew nas nekir. Hat welatê xwe lê gelê Wî ew nas nekir Destûr da kû* ***hemû kesên*** *îman bi wî kirine bibin zarokên Xwedê"* (Yuhanna 1:10-12)

Îsa Mesîh Rizgarkerê hemû mirovan e. Lê tenê destûr ji bo yên kû li ser navê wî yên kû baweriya xwe bi nasnameya Wî û hewldana Wî ya xelaskirina gunehkaran aniye dê *"bibin zarokên Xwedê."bê dayîn.*

Dostê min Xwedê ji we hez dike û we bi qasî kû ji jiyana xwe bêpar nehêle biqîmet dibîne. Encax digel her tiştî jî, ji bo kû hûn bikin ew ê zorê nede we.

Vê biryarê ji we re dihêle.

*"Ji ber kû Xwedê ew qasî ji dinyayê hez kir xwe yê yekane da. Ji bo kû* ***yên îman dikin*** *bila mehv nebin û bigihijin jiyana ebedî."* (Yuhanna 3:16)

## TEVLİHEVİYA HİŞ Bİ DAWÎ BÛ

Îsa di roja kû ji mirinê vejiyabû bi komek şagirtên hişê wan tevlihev bibûne meşiya û bi wan re axivî; ev şagirt hê jî fam nekiribûn çima hewce bû kû rijandina Xwîna Mesîh û vejîna Wî. Îsa ji wan re wiha got:

*"**Bêaqilno! Hûn di bawerkirina ji tiştên pêxember gotiye de sergêjiyê dikin, dereng tevdigerin!** Ma qey ne hewce bû kû Mesîh van êşan bikşîne û bigihîje berzbûna xwe?*

*Piştre jî bi nivîsên* ***Mûsa*** *û* ***yên pêxemberên*** *din dest pê kir û tiştên di derbarê Wî de di Nivîsên Pîroz de hemû tiştên di* ***derbarê Wî*** *de vegot."* (Lûka 24:25-27)

Piştre axirê hişê wan zelal bibû. Gelo çawa dikarîbûn ew qas kor bûna. Mesîh ne ji bo kû desthilatdariya dijminên xwe yên demdemî bi dawî bike hatibû. Sedema hatina Wî li hember dijminên giyanî yên mîna Şeytên, guneh, mirin û dojehê serfiraz bibe.

Îsa di heman rojê de piştre li Yerûşalimê li odeya jor ya kû wekî mêvan lê diman bi berçavê şagirtan ket. Dest û lingên xwe yê dewsa qulikên bizmaran lê hebû rê wan da. Bi wan re xwarin xwar û piştre ji wan re ev tişt gotin:

*"Dema hê ez bi we re bûm min gotibû,* ***'tiştên di zagonên Mûsa de yên di nivîsên pêxemberan de ji yên di Mezmûran de divê pêk werin'.*** *Û ji niha û pê ve ji bo kû nivîsên pîroz fam bikin hişê wan vekir. Û ji wan*

> *re got: 'Wiha hatiye nivîsandin: Mesîh ew ê êşê bikşîne û roja sisiyan vejî; û ew ê ji bo kû guneh bên efûkirin banga tobeyê li Yerûşalimê bê kirin û li hemû neteweyan bi navê Wî bê belavkirin. Hûn şahidên van bûyeran in."*
> *(Lûka 24:44-48)*

Îsa ji şagirtên û netewan re wiha got, *"Hûn ê derbarê van bûyeran de şahidiyê bikin."* Peyama kû wê şahidan ragihanda gelek eşkere bû: *Rebê ezmanan cezayê gunehan da û li ser mirinê serfiraz bû. Xwedê ji Mesîh û yên kû bi todiyar baweriya xwe (guherîna fikrê) bi çalakiya rizgarkirinê anîne (ji dil bawerî) bûne gelê wê bên efûkirin û bi aramiyê bê xelatkirin.*

## VEXWENDINA WARÊ ARAMİYÊ

Ka em vegerin serî û li ser roja heftemîn ya vejînê bifikirin.

Reb wê rojê çi kir? Xwe rihet kir.

Ji bo çi xwe rihet kir? Xwe rihet kir ji ber kû karê Wî '***qediya…*** *Dema kû gihaşt roja heftemîn Xwedê karê kû dikir qedand.* ***Ji ber karê kû*** *dikir wê rojê xwe riher kir."* (Afirîn 2:1-2)

Tiştekî kû li tiştên Xwedê afirandiye bê zêdekirin tune bû. Karê Xwedê qediyabû. Di heman demê de tiştekî kû li çalakiya rizgariyê Xwedê bê zêdekirin jî tune ye. *"Qediya!"*

Çawa kû Xwedê piştî çalakiya afirandinê xwe rihet kiriye û kêfxweş bûye, ji me jî dixwaze kû em ji ber çalakiya rizgarkirinê yê qediyaye em xwe rihet bikin, kêfxweş bibin. ***"Çawa kû Xwedê piştî kû karê xwe qedand xwe rihet kiriye, yên kû derbasî warê Wî yê aramiyê bûne jî*** *piştî kû karê xwe kirin divê xwe rihet bikin."* (Îbranî 4:10)

Bi deh hezaran dînên dinyayê dibêjin, 'Tiştek neqediya. Vê jî bikin, wê jî bikin! Hinekî din xîret bikin.' Îsa ji bedêla wê yekê dibêje *"Ya hemû mirovên betilî û yên bargiran!* ***Werin ba min, ez ê rihetiyê bidim we."*** (Matta 11:28)

Gelo hûn bi xêra rizgarkirina kû Xwedê ji we re pêk aniye xwe rihet dikin û kêfxweş dibin.

## BÎ REB RE ÇÎL ROJ

Îsayê Reb piştî kû ji mirinê vejiya çil roj bi şagirtên xwe re derbas kir. Di derbarê desthilatdariya Xwedê de gelek tişt fêrî wan kir. Li Wî nêrîn, li bedena Wî ya vejiya pelendin. Bedena Wî li dervî hemû dem û deran mayende û bi îxtişam bû. Hemû bawermendên heqîqî ew ê bibin xwediyê bedeneke mîna bedena Wî.

Şagirt bi Îsayê Reb re meşiyan. Bi Wî re axivîn û bi hev re xwarin xwarin. Bi bîra wan xist kû di demeke nêzîk de ew ê ji ba wan veqete, lê ji bo di demên kû ew ne li ba wan be Bav di dilê wan de bijî, ew ê ji wan re rêberiyê bike û ew ê hêzê bide wan ji bo kû ew ê ji netewên dinyayê re şahidiyê bikin. Piştre rojekê Ew (Îsa) ji bo kû dinyayê bi rastiyeke nuwaze bidarizîne bi şûn de vegere.

Piştî di ser vejîna Îsa re çil roj derbas bû. Îsa li Çiyayê Zeytîn yê li rojhilata Yerûşalimê bi şagirtên xwe civiya. Dema vegera *"mala Bav"* hatibû (Yuhanna 14:2).

## EW BÎRÎN EZMÊN

*"Dema bi wan re bû ev ferman dan: 'Ji Yerûşalimê veneqetin. Li benda pêkanîna soza kû Bav daye û we ji min bihistiye bimînin. Bi vî awayî Yehya bi avê waftîz kir. Lê belê hûn ê heta çend rojan bi* ***Ruhê Pîroz*** *bên waftîzkirin ... Dema kû* ***Ruhê Pîroz*** *dakeve ser we hûn ê hezdar bibin. Hûn ê li Yerûşalimê, li hemû Yahûdayê û Samîriyê û* ***li çar aliyê dinyayê bibin şahidên min.'***

*Piştî kû Îsa ev tişt gotin û ber bi ezmên ve hat birin. Ewrekî ew rahişt û* ***ji ber çavê wan de*** *wenda kir.*

*Di wê kêliyê de du zilamên libas spî ji re xuya bûn. Dema Îsa çû wan çavê xwe vekiribûn li ezmên temaşe dikirin û pirsîn: 'Ya Celîlenîno, çima hûn sekinîne li esmên dinêrin'* ***Îsayê kû ji nava ewr birin ezmanê, çawa wê dît kû derket ezmanan, ew ê bi heman awayî vegere jî."***

*(Karên Şandiyan 1:4-11)*

## PÎROZKİRİNA SERFİRAZİYA Lİ EZMANAN

Bi vî awayî weke kû heman pêxemberan ragihandibû Xwedê "*birin ezmên*."[228]

Beriya bi sî û sê salan Yê kû heyraniya milyaketên Bihuştê bi biçûkdîtina mirovan guheriye vedigeriya malê. Lê niha tiştên derbarê Wî de kû hatibû guherandin heye. Yê kû mirov ji şibandina xwe afirandiye niha şibandina mirov li xwe kiribû.

Nivîsên Pîroz derbarê vegera Xwedayê Bihuştê nakevin teferuatan. Lê dîsa jî em dizanin ev veger bi hişmet e.

Bi Artêşa Milyaketên kû mirov nikare bijmêre û yên ji nîjada Ademî hatine rizgarkirin ew dikarin bînin ber çavê xwe. Hemûyan Ew wekî Xwedê û Rebê Berziyê baş nas dikirin. Lê niha ew ê cara destpêkê ew wekî kurê mirov û Berxikê Xwedê bidîtana.

Hemû kesên Bihuştê çiknefes li bendê bûn.

Bêdengî bi lêdana koroya bi îxtîşan a borazanan û bi qîrîna milyaketekî xera bû: *"Rakin serê xwe Ey derîno! Vebin ey deriyên kevin! Bila Qiralê berz bikeve hundir"* (Mezmûr 24:7)

Derî heta serpiştê vedibûn û şampiyon bi çepikên Bihuştê yên kû li erdê û ezmên qiyamet radikirin Xweda yê yekane, Kurê mirovê kû şer, berx û gotin dabû ser milê xwe –**Îsa**– dikeve hundir. Di nava qelebelixa kû rajeriyê jê re dikin re derbas dibe û ber bi textê bavê xwe diçe. Li xwe dizivire li nîjada hatiye rizgarkirin ya bêhejmar ya Adem nêrî û li cihê xwe rûniştt.[229]

Peywirê xwe bi serfirazî pên aniye.

Yên kû hatine rizgarkirin li ber Wî serê xwe ditewînin û bi yek dengî îlan dikin:

***"Berxikê hatiye destxeniqandin hêja ye kû bê pesinandin."***
*(Wehî 5:12)*

Kî dizane be ka pîrozbahiyek çi qasî bêhempa ye. Ev pîrozbahî wê pîrozbahiyeke kû wê qet bi dawî nebe be.

# 26

# Dîndarî Û Dûrmayîna Ji Xwedê

Dibe kû we ev peyva pêşiyan bihîstibe: “Standarda tamkirina be ka tiştek çma û çawa pêkhatiye her tim 20/20 e.” Standarda “20/20” ji hêla optometrîstên (Berçavkfiroşên rajeya çavên nabînin dipîvin.) ji bo dîtina net hatine tayînkirin. Ger hêza we ya dîtinê 20/20 be pêdiviya we bi bikaranîna berçavkê tune ye.

*Famkirina piştî pêkanîna tiştekî bê ka ew tişt çima û çawa pêkhatiye* elaqa wê piştre nêrîna li tiştekî berê qewimiye re ye. Nêzîkdayîneke wisa destûr dide kû çalakiya em an jî yekî din bike em bibînin. Lê belê piştî kû hasil di mûsil re derkeve û pê ve. Ji ber vê yekê nêzîkdayîneke wisa kêrî me nayê.

Lê dîsa jî dema kû mesele famkirina gelek sedsalan ve çîroka ji hêla Xwedê ve hatiye vegotin û peyama Wî be nêzîkdayîneke wisa fêdeyeke mezin dide. Destûrê dide kû em gelek astengên mezin derbas bikin û rastiyê ji xelatiyê ji hev veqetînin. Ji ber vê yekê Îsa ji şagirtên xwe re wiha got.

> ***“Her şad û bextewar bin kû çavên we dibîne,*** *guhê we dibihîze. Ez rastiyê ji we re bibêjim,* ***gelek pêxemberan gelek kesên di rêya rast de xwestin tiştên kû we dîtiye bibînin,*** *lê belê nedîtin. Tiştên we bihîstin bibihîzin, lê nebihîstin.”* (Matta 13:16-17)

Em wekî yên kû piştî kû cara destpêkê Îsa daket rûyê erdê jiyane, ji ber kû em derfeta kû dîsa vegerin li dîrokê binêrin, îmkana kû em lêgerînê li ser Nivîsên Pîroz ên em pê temam dibin bikin û em îmkana kû bi awayekî eşkere plana nuwaze ya Xwedê dibînin em pir şad û bextewar in!

Niha em di hişê xwe de bi vê ramanê û em babetên kû em di rêwîtiya Nivîsên Pîroz de bûne şahid bi bîr bînin û careke din em vegerin *"Pirtûka Destpêkan."*

## NÊRÎNA PİŞTRE YA Lİ KAYÎN Û HABÎL

Gelekî net e beşa çaremîn ya Pirtûka Afirînê hem Kayîn hem jî Habîl bi pirsgirêkeke guneh hatin dinyayê. Dema kû mezin bûn xwestin kû ji Xwedê re rajeriyê bikin. Lê belê bi tenê rajerîkirina yekî hat qebûlkirin.

> *"REB, Hebîl û tiştê kû wî pêşkêş kiribû qebûl kir. Kayîn û tiştê kû wî pêşkêş kiribû red kir."* (Afirîn 4:4-5)

Piştî kû mirov çîroka Rizgarkerê gunehkaran Îsa guhdar dike bi nêzîkdayîneke piştre ya li gorî Pirtûka Pîroz û bê ka REB çima bi hezaran salan berê bê çima tiştê kû *"Habîl pêşkêş kiriye, **qebûl kiriye** lê çima tiştê kû Kayîn pêşkêş kiriye **red kiriye**"* hêsantir fam bike.

Berxikê kû Habîl destxistibû qirikê Îsayê berxikê Xwedê yê kû di oxira gunehkaran de Xwîna xwe dirijîne destnîşan dike. Mahsûlên axê yên kû Kayîn pêşkêş dike Îsa destnîşan nakin.

Habîl dema kû li bûyera kû wê di demên pêş de pêk bê dinêrî îro em bi rêya mirina Îsa û vejîna Wî li bûyera di rabirdûyê de ji bo me hatiye temamkirin, dinêrin.

> *"Xwîna Mesîh Îsa me ji hemû gunehan **pak dike**."*
> *(Yuhannayê 1., 1:7)*

## ÎMANA KÛ RİZGAR DİKE

Xwedê Habîl çawa kû îro gunehkaran dibexşîne wisa bexşand. Gunehkarek li xwe qebûl dike kû gunehkarî kiriye. Ger bi Reb û rizgarkirina Wî bawer bike tê efûkirin û ji bo wî diyariya heqîqetê ya Xwedê tê bexşandin. Ev rastî ji bo hemû pêxember û bawermendan derbasdar e.

Mînak, wekî em berê fêr bibûn Birahîm, ***"îmana xwe** bi REB **kir** û Reb jî ev yek jê re wekî **heqîqet** nivîsand."* (Afirîn 15:6). Gotina Birahîm *"îmana xwe bi REB anî"* tê wateya kû tiştê kû Xwedê dibêje rast e û baweriya xwe pê tîne. Birahîm baweriya xwe bi gotina Xwedê anî. Tenê îmana xwe bi Xwedê *anî*.

Wekî pêxember Birahîm Qiral Dawud jî baweriya xwe bi soz û ahdên Xwedê anî. Dawud bi dilekî kêfxweş ev tişt nivîsandin: *"Her şad û bextewar be bila ew mirovê kû tê bexşandin û gunehê wî tê veşartin.* ***Her şad û bextewar be mirovê kû sûcê wî ji hêla Xwedê ve nayê hesibandin!"*** (Mezmûr 32:1-2). Dawud di heman demê de ev dilînên xwe yên bi peroş jî nivîsandin: *"Di hemû temenê min de bi tenê ew ê hezkirin û başî min bişopîne* ***ez ê her dem li mala REB rûnim."*** (Mezmûr 23:6).

Gunehên kesên kû beriya Îsa were jiyanê wekî Habîl, Birahîm û Dawud ji ber kû Reb Xwedê re û bi plana wî îmana xwe anîne hatibû nixumandin. Piştre dema kû Mesîh min deynên wan yê guneh ji pirtûkan kû lê hatibûn tomarkirin bi awayekî ebedî hatin betalkirin.

Îro em yê kesên kû piştî dewrana Mesîh dijîne. Mizginiya Xwedê ev e: Bi şertê kû hûn îmana xwe baweriya xwe pê bînin kû Reb Îsa ketiye şûna we û miriye û tiştên kû bi vejîna xwe ya bi serfirazî bînin wê Xwedê gunehê we yên li pirtûkan tomarkirî jê bibe. Ew ê heqîqeta Mesîh li ser hesabê we bihesibîne û ji bo we *"Li mala Reb malekê bi awayekî ebedî"* teqez bike.

Bi şertê kû hûn îmana xwe pê bînin hemû tiştên behskirî û ji wan zêdetir ew ê bibin yê we. Îmanpêanîna bi REB Îsa tê maneya bawerkirina bi wî û hemû tiştên kû ji bo we kiriye. Ji bo kû hûn wateya îmanê çêtir fam bikin bifikirin kû hûn di hundirê odeyeke

kû gelek kursî tê de ne dimeşin. Hinek kursî şikestine. Yên din jî gelekî kevin in û hindik mane bişkên. Lê hinek jê jî gelekî qenc dixuyan. Lê dema kû hûn ji nêz de li wan jî binêrin hûn ê bibînin kû hin hêlên wan î qels bûne hene û hûn ê bigihîjin qeneetê kû nikarin bi wan jî baweriya xwe bînin. Di wê kêliya kû fikra di odeyê de kursiyeke tebût tune ye bi we re çêdibe kursiyeke gelekî rind hatiye çêkirin û tebût bi ber çavê we dikeve. Hûn ê ber bi vê kursiyê ve bimeşin û li ser wê rûnin. Hûn ê îmana xwe bi kursiyê bînin. Hûn ê bi rihetî li ser wê xwe rihet bikin. Hûn baş dizanin kû ew dikare barê we hilgire û ew ê di bin we de neşkê û hûn ê nekevin erdê.

Îsa Mesîh yên di Wî de li karên kû Wî bi dawî kiriye de tu carî hêvîşikestî nake.

## ÎMANA KUJÎNER

Îmana me tenê bi qasî tişta em îmana xwe pê tînin baş e. Her kes xwediyê îmanê ye. Lê herkes bi heman tiştî îman nake.

Habîl îmana xwe bi Xwedê û awayî bexşandin û heqîqeta wî anî.

Kayîn îman bi ramanên xwe û hewldanên xwe anî.

Kayîn û yên mîna Kayîn teşhîs û çareseriya lezdanî derbarê pirsgirêkên guneh de red dikin mirov wan dikare bişibîne wî hokkabazê kû dikir mar bilîze ye di televîzyonê de. Zilam ji hêla kobrayekî mîna zebelehekî hat pêvedan. Lê red kir kû ew derziya panzehîrê ya kû ew ê jiyana wî xelas bikira. Got qey ez bi qasî kû karibim li ber jahra mêr di ber xwe bidim bi hêz im.

Ew zilam bawermend bû. Îmana wî bi hêz bû. Lê îmana wî kêrî tiştekî nedihat. Ji bedêla kû baweriya xwe bi çareseriya kû BIJÎŞK pêşkêş kiribû bianiya, baweriya xwe bi xwe anîbû.

Bedêla vê bijartina xwe bi jiyana xwe da.

Gotina Nivîsên Pîroz eşkere ye. Ji bedêla rizgarkirina Xwedê îman pêanîna hewldanên xwe yê *di rêya Kayîn de rê ve çûn bi zilûmeteke ebedî re rû bi rû mayîn e.”* (Yahûda 1:11-13). Ramana Kayîn ev e: mirovekî dikare başiyên Xwedê bi hewldanên xwe

bi dest bixe. Her daîm li dijî plana rizgarkirina Xwedê derketiye.

Ligel vê yekê jî îro gelek mirov *"ji dil û can di rêya Kayîn de dimeşin."*

## NÊRÎNA MİROV

Rojekê hinek Cihûyên dîndar ji Îsa ev tişt pirsîn: *"Ji bo kû em karên kû Xwedê dixwaze* ***em bikin divê em çi bikin?****"* Îsa got: *"Karê Xwedê ev e, divê hûn* ***îmanê*** *bi kesê kû Wî şandiye* ***bînin****"* (Yuhanna 6:28-29). Van lêkolîneran dixwestin *"kar bikin"*. Îsa ji wan re got ***"îmanê bi Wî bînin."***

Şaşmayîna Cihûyan a piştî bersiva Îsa bi tenê ne ya Cihûyan tenê bû ev şaşmayî di nava mirovên din de jî hebû.

Xwişka min û mêrê wê li herêma çiyayîn a Papua-Gineya Nû dijîn. Ew û yên bi wan re dixebitin bi gelên qebîleyên li cih û warên xewle dijîn re alîkariyên pratîk dikin. Van mirovan hînî Xwedayê rastîn û peyama wî ya jiyana ebedî di nîşeyeke xwe de, sohbeteke xwe û mirovekî li "Axaftina Xwedê" (Papûayî Pirtûka Pîroz wiha bi nav dikin) wiha radigihînin:

> Zilamê kû li dîtina Îsayî derbarê *'Nanê Jiyanê'* de guhdar kir, wiha got: 'Ew tiştê kû tu behs dikî zêde zêde hêsan e. Ji bo kû ez herim Bihuştê û di çavê Xwedê de pîr û pak bimînim xebitîm. A niha tu ji min re dibêjî ji bo kû van tiştan bi dest bixe tenê divê tu tiştekî bikî îmana xwe Îsa bîne?
>
> Min dîsa jî xwest kû bala xwe bidê pê ka Îsa dibêje çi, *'Nanê Jiyanê Ez im'* (Yuhanna 6:35), û piştre hewce bû kû Yuhanna 6:29an dîsa bixwîne: *'Karê Xwedê* ***îman pêanîna*** *we yî bo kesê ji we re şandiye ye.'* Di heman demê de 3:16 jî xwend. ***'Yên bi Wî îman*** *anîne bila mehv nebin bila bibin xwediyê jiyana ebedî.'* Min ji Wî pirsî gelo Xwedê bi qasî kû me rizgar bike bi hêz e an na hewcedariya Wî bi me heye an na.
>
> Zilam keniya, 'Bê guman Ew bi têra xwe xurt e.

Tu hewcedariya Xwedê bi me tune ye.'


'Wê gavê li gorî gotina Xwedê ji bo kû tu herî bihuşta tu hewcedariya Xwedê bi karên te heye?'

Zilam serê xwe xwar kir. Bêdeng bû û kûr û dûr fikirî."

Digel kû Peyama Xwedê gelekî eşkere bû jî, mirovên li rûyê dinyayê ji gelek qebîleyên li herêmên xewle bigre heta yên xwedî çand ên endamê hewra, dêr û mizgeftan- ji dil û can xwe bi wê fikrê ve girê didin. Di roja darizandinê de Xwedê ew ê tiştên baş û xerab yê kirinê têxe sêniyê mêzînê. Ger rajeya karên baş bigihije %51ê ew ê herin bihuştê, ger rajeya karên xirab bigihije %51ê an ji wê rajeyê derbas bike ditirsin kû herin dojehê.

Zêdebûna karên baş ji karên xerab -an jêbirina xenenî gunehan- di dadgehên rûkalî de qet nayên bikaranîn. sîstemeke adaletê yê wiha di dadgeha Xwedayê ezmanî de jî nayê bikaranîn.

Li ser vê mijarê baş bifikirin. Gelo tiştê kû hûn dixwazin bi rastî jî dadgehkirina we yê ji hêla Xwedê û daxwaza we ya kû hûn dibêjin divê li gorî başî û xwefedakirina we be?



Şikir kû ev "teoriya wezinandinê" di pirtûka Xwedê de tune ye.

## STANDARDA XWEDÊ

Xwedê dawa bêhempatiyê dike.

Bi tenê yên kû ji Xwedê diyariyên rastiyê stendine dikarin bi Wî re bijîn. Di roja darizandinê de ger di tomarên we de lekeyek biçûçik jî hebe hûn ê neçin bihuştê. Xwedê heqîqeteke bêhempa ji we dixwaze.

Guneh di çavê Xwedê de bi qasî berateya berazekî kû dirize mirov dikerixîne. Ma gelo mirov berateyeke kû dirize parfum bike ew ê rizandin û bêhnê ji holê rake? Digel vê yekê çi qas merasîmên olî bên li darxistin bila bê li darxistin dê ev yek kirêtbûna me ji holê ranekin. Û ew ê nikaribin bikin kû Xwedê me qebûl bike.

Çawa kû ne mimkin e kû em bi xweşbînî li niqutek jahr di nava çaya xwe de binêrin Xwedê jî li gunehekî tenê jî bi xweşbînî nanêre. Gelo mirov avê li çayê zêde bike ew ê hêza jahrê yê mirov dikuje kêm bike? Di heman demê de hejmara wê me saf û safî nekin û ji darizandina ebedî xelas nekin.

Ger mesele bibe xelasbûna ji deynê gunehan û salihbûna di çavê Xwedê de tu *çareya* me tune ye. Lê şikir ji REB re em ne *bêhêvî* ne. ew ji bo kû em di qatê Wî yê saf û safî û bêhempa de bi awayekî ebedî bijîn hemû hewcedariyê me ji xwe dayê.

## ÎMAN Û KAR

Xwedê ji hemû kesên kû cazayê gunehên xwe daye û îman bi Îsa Mesîh aniye wiha dibêje: *“Hûn bi rêya îmanê (Bi tiştên kû Mesîh ji we re kiriye bawer bibin)* ***bi kerem*** *(Başiya kû nehatiye heqkirin)* ***rizgar bûn. Ev ne serkeftina we ye. diyariya Xwedê ye. Ne diyariya tiştekî baş e ji bo kû kesek pê xwe bibixudîne.”*** (Efesî 2:8-9)

Dê li bihuştê cihê kû mirov xwe bibixundine tune be.

Rizgarbûn bi rêya keremê ye. Rizgarbûn *diyariya Xwedê ye*. Tiştekî bi mînet mirov bistire ne tiştekî kû mirov heq kiribe; *‘ji bo kû tu kes xwe nebixudîne’* ne madalyeyeke mirov bi dest bixiye. Lê dîsa jî tiştekî xembar e. Di vî warî de tevliheviya hişê mirovên oldar berdewam dike.

Posteya Elektronîk

Di îman pê anînê de tiştên herî girîng ev in. Bawerkirina ji Xwedê, kirina başiyê, dûrmayîna ji karê nebaş e. Tiştên kû ew ê me xilas bikin ev in.

Ger rizgarbûna ji darizandina ebedî û mafê jiyanê yê bi Xwedê re bi cehda me bihata bi destxistin, wê demê ma yê çawa fam bikira bê ka em çi qasî zanîbaya ji bo kû em di bihuştê de cihekî bi dest bixim me bi qasî kû hewce ye başî û xirabî kiriye an na? Qet me yê nikarîba teqezbûyîna rizgarkirina xwe bi dest bixista.

Kêm zêde beriya niha bi sê hezar sal pêxember Yûnis wiha destnîşan kiriye: ***"Rizgarkirin ji Reb tê."*** (Yûnis 2:9)

Ji ber vê yekê bila hemû pesinandin para Xwedê bin!

> *"Hûn bi îman pe anîne bi kereme rizgar bûn,* ***ev ne serkeftina we ye, xelata Xwedê ye.*** *Ji bo kû kes xwe nepesinîne* ***ne xelata karên baş e.****"* (Efesî 2:8-9)

Gotina Xwedê eşkere ye. Ji bo kû me ji cezayê guneh rizgar bikin bawerkirina me ya bi karên xwe red kirin, xelata rizgarkirinê ya Xwedê ye.

Di vê rewşê de kirina karên baş û dûrmayîna ji gunehan di kîjan nuqteyê de digihijin hev? Bersiva vê pirsê ayeta piştî vê dide me:

> ***"Ji ber kû em tiştên kû Xwedê çêkiriye ne,*** *ji bo kû* ***tiştên baş*** *yên Wî berê amade kiribûn bikin, em di Mesîh Îsa de hatin afirandin."* (Efesî 2:10)

Cudahiya di navberê de eşkere ye: Em nikarin ***bi rêya*** karên baş *rizgar bibin*. ***Ji bo*** karên baş em ê rizgar bibin.

> *"Xwedayê Berz û rizgarkerê me Îsa Mesîh ji bo kû me* ***ji hemû sûcan rizgar bike*** *ji bo kû me dawerivîne û bike*

*gelekî aydî xwe yê kû **xîret dike kû başiyê bike,** me ji bo xwe feda kir.”* (Tîtûs 2:13-14)

Di destpêka vê pirtûkê de ev şîroveya kû yek ji pêşiyên gund kû ji hevalê min re kiribû, hebû. “Çûna bihuştê tu bi kirinên xwe yên baş heq dikî…”

Gotina Xwedê destnîşan dike kû romana vî zilamî xelet e.

Tu kes çûna bihuştê bi bingeha “karên baş” heq nake. Lê belê dîsa jî kesên kû diyariya Xwedê jiyana ebedî stendine ji bo kû xwe ji xirabiyê biparêzin û ji berzbûna Xwedê û bereketa mirovên din dê *bixwazin* başiyê bikin.

## MÊWE NE KOK E

Karên baş tu carî *nebûne **taleba** rizgarkirinê, lê divê her dem bibin **encameke** rizgarbûnê*. Mînak Îsa şagirtên xwe fêrî vê kir:

*“Ez fermaneke nû didim we. Ji hev hez bikin. Çawa ez ji we hez dikim hûn jî ji hev hez bikin. Ger hezkirina we ya li hember hev hebe her kes wê bi vê yekê zanibe kû hûn şagirtên min in.”* (Yuhanna 13:34-35)

Gelo şertê destpêkê yê rizgarbûnê ev e? Hezkirin û eleqedarbûna mirovan mîna Îsa û ji nêz ve nêzîkbûn e? Na. Ger wisa bûya ji ber kû yê bi tenê û her daîm ji mirovan hez dikir Îsa bû em ê kes nikarîbûna biçûna bihuştê.

Divê hezkirina ji mirov û eleqedarbûna bi wan re di jiyana bawermendên heqîqî de bibe encamek? Teqez. *“**Ger** hezkirina li hember hev hebe her kes wê bi vê yekê **bizanibe** hûn şagirtên min in.”*

Gelê Xwedê îmana xwe bi awayên xwe yên jiyanê destnîşan dikin.[230]

Ji hevderxistina *koka* rizgarkirinê û *mêweya* rizgarkirinê pir girîng e. Yên di Mesîhê de îmana xwe pê anîne divê bi jiyaneke (mêweyeke) pîroz, şêrîn, fêdeker û bi disîplîn bibuhurin û bînin

ziman kû mînetar in ji bo diyariya rizgarkirina (kok) Wî.

Gelê Xwedê ji bo k başbûna Wî ya li hember wan bi dest bixin tiştên baş nakin; tiştên baş dikin ji ber kû Xwedê ew başbûna kû heq nekirine îhsanî wan kiriye.

## DÎNÊ QELP

Kayîn ew kesê kû cara destpêkê dinê "tu bixwe çêke" îcat kiriye. Ji bedêla kû di çerçeweya xwîna birxikeke qurbanê ya ji bo Xwedê nêzîkî meseleyê bibe bi raman û hewldanên xwe nêzîkî meleseyê dibe. Ji ber wê yekê duayên Kayîn Xwedê xeyidand û kerixand.

> *"Yê kû guh nede zagona* ***duayê wan jî kirêt in.****"*
> *(Şîretên Silêman 28:9)*

Zagona Xwedê ji bo kû guneh binuxumîne xwîna hatiye rijandin û berxikê qurbanê an jî qurbaneke guncawî din talep kir. Ji ber kû Kayîn li gorî kû zagon talep dike nehatiye *"duaya wî jî gelekî nexweş û kirêt e"* (çalakiyeke kû mirov jê nefret bike, kirêtkirî, xerabekirî). Dînekî Kayîn hebû hebû lê ev dîn qelp bû. Rêşekiya kû pêşkêş dikir. Rizgarkerê kû hatiye wehdkirin û mirina Wî ya di çarmixê de destnîşan nedikir. Wekî encam:

> *"Reb Habîl û pêşkêşa wî qebûl kir. Lê belê Kayîn û pêşkêşa wî red kir. Kayîn gelekî hêrs bûi mirûzê xwe tirş kir."*
>
> *REB ji Kayîn pirsî tu çima hêrs bû. 'Te çima mirûzê xwe tirş kir. Ger te tiştê rast bikira ma qey min ê te qebûl nekiraya?'* (Afirîn 4:4-7)

REB bi dilrehmî bi Kayîn re axivî û serî li ber plana adil ya Xwedê bitewîne tobe bike dem dayê.

Kayîn hew hêrs bû. Nexwest ew dînê xwe yê bi cehda xwe bi dest xistibû bi xwîna kirêt ya berxê biguherîne. Tiştê kû we bi navê Xwedê bikira li gor dilê wî dixwest wê bikira!

Û ev rêya hilbijart ew bir ber bi kû derê ve?

## DÎNÊ DİJMİN

> *"Kayîn ji birayê xwe Habîl re got, 'Haydê em herin nav zeviyê. Dema kû li nav erd bi hevre bûn* ***Kayîn êrîşî birayê xwe Habîl kir ew kuşt.****"* (Afirîn 4:8)

Ew Kayînê kû ji ber kû berxikek wekî pêşkêşiyeke guneh kuştibe gelekî serbilind bû, ji bo kuştina birê xwe ne serbilind bû.

Kayîn ew ê bingeha pergala polîtîk û dînî ya kû di dahatûyê de ew ê kesên kû serê xwe li ber fermanên kevneşopî û zagonên wî netewînin biçûk bixîne, zilmê li wan bike heta wê wan bikuje, bavêje.

Îro li dinyayê gelek kesên wekî Kayîn dîndar xwedî giravî li ser parastina dînê xwe erîşkar tevdigerin û kuştinan pêk tînin.

Bi van çalakiyên xwe destnîşan dikin kû di derbarê îmana xwe de çi qasî ne cihê baweriyê ne û derdikeve halê kû be ji bo kû pirsgirêkên xwe çareser bikin çi qas hindik baweriya xwe bi Xwedayê xwe tînin.

Zilamekî li Dewletên Yekbûyî yên Emerîka dijî yê kû em bi rêya posteya elektronîk bênavber ji hev re dinivîsin ji me re ev nivîsî:

> Posteya Elektronîk
>
> Ew kesê dawî yê kû li ber çavê me ji Pêxemberê Pîroz re dijûn kir, piştî kû dijûn kir bi sê saniyan de diranê xwe yê pêşiyê daqurtand. Ji ber kû min dizanîbû ew dema careke din dijûnê bike ew ê bi serê zimên bipeyive ez kêfxweş bûm.
>
> Pûtperest ya bila dîn biguherînin ya jî bila bimrin. Nuqte.

Gotin û çalakiyên vî zilamî bi van gotin Reb Îsa re dijberî hev in: *"Lê ez ji kesên kû li min guhdar nakin, van dibêjim:* ***Ji dijminên xwe hez bikin,*** *qenciyê bi kesên kû ji we nefret dikin bikin. Ji bo kesên kû lanet li we dikin başiyê bixwazin. Ji bo yên heqaretê li we dikin dua bikin."* (Lûka 6:27-28) Û dema Îsa di çarmixê de bû yên xwe xistine çarmixê wiha dua kirin: ***"Bavo wan bibexşîne, ji ber kû nizanin çi dikin!"*** (Lûka 23:34)[231]

## KAYÎNÊ KÛ TOBE NEKİRİYE

Ka vegerin çîroka Kayîn. Kayîn piştî kû birê xwe kuşt Xwedê fersendek da Kayîn ji bo kû fikrên xwe yê xelet û ew rêyên xirab dabû ber xwe vegere tobe bike.

> *"REB ji Kayîn pirsî, 'Birayê te Hebîl li kû ye?' Kayîn wiha bersiv da, 'Ez nizanim, ma ez li ber birayê xwe me?' REB got, 'Te çi kir? Xwîna birayê te ji nava axê ya kû devê xwe vekiriye û dixwaze Xwîna biratiyê ye te rijandiye ye.'"* (Afirîn 4:9-11)[232]

Kayîn red kir li mukurhatina gunehê xwe û nêzîkdayîna ber bi Xwedê ve bi xwîna berxekî ji bedêla kû vana bike, *"Kayîn ji huzûra REB veqetiya."* (Afirîn 4:16)

Kayîn qet tobe nekir. Li şûna kû têkeve riya Xwedê Û bejna xwe bitewîne, bi dû fikrên xwe ket. Kayîn bingeha şaristaniyeke bi hêz avêt, lê belê ev şaristanî ne ew civak bejna xwe li ber Xwedê bitewînin.[233] Civaka Kayîn jî nîjada wî jî di rêya xweperestî ya kû xwetêkber bi helkehelk bibeze.

Beşa çaremîn ya Afirandinê di heman demê de çîroka Lemekê kû ji bavê şeşemîn digihaşt Kayîn e. Lemek jî mîna kalikaê xwe bi kibîr, bi ser nefsa xwe de dimirî, kîndar û kujer bû. Gelek kesên zend û hunerê zarokên wî dan destpêkirin. Di gelek waran de xwediyê gelek zanînan bûn, lê Xwedê nas nedikirin.

Mirov tenê *ji rêya rizgarkirinê ya Xwedê venegeriya di heman demê de jî ew jiyana kû Xwedê dixwest jî veqetiyan.*

## MİROVAHİYA KÛ TOBE NEKİRİYE

Piştî kû neh bavan bi Kayîn REB di derbarê nîjadê mirov de nirxandinek wiha dike.

> *"Xirabiyên kû mirov li rûzemînê dike pir in. Bala wan* ***her car li ser xirabiyê ye.****"* (Afirîn 6:5)

Di heyama pêxember Nuh de li rûzemînê de yên baweriya xwe bi afirînerê xwe tînin bi tenê Nuh û malbata xwe bû. Ew rika mirovî kû guh neda gotina Xwedê bû sedema tofaneke gerdûnî. Dîsa ji Xwedê kerem kir vê rêya ji tofanê xilasbûnê da ber mirovan lê ji wê kerema Xwedê tenê heşt mirov îstîfade kir. Ew heşt kesên kû ji peyama Xwedê bawer kiribûn bi tenê Nuh, jina wî û n wî Sam, Ham û Yafet bû (Afirîn 6-8).

> *"**Bi saya serê** îmanê dema kû Nuh derbarê bûyera kû nebûye de hat hişyarkirin ji bo tirsa Xwedê û rizgarkirina xelqê malê keştiyek çêkir. Bi vê dinyê darizand û mîratxurê heqîqet xwe **spartiye** îmanê."* (Îbranî 11:7)

Îro gelek alim digel kû henekên xwe bi beşa tofanê gerdûnîya[234] Pirtûka Pîroz dikin jî *tu ji wan* ji înkar nakin kû gelek cihên îro av lê miçiqîne berê di bin avê de bûn an di kolandinên li çolên mezin û li rezeçiyayan tê kirin de bi milyaran fosîlên aîdê behrê hene. Her çi qas keskesorê wekî nîşaneyeke Xwedê ya kû qet û bila careke din ew ê rûkala dinyayê bi tofanê nerûxîne biçûk bibînin û qîmet nedinê jî lê hebûna keskesorêyî piştî bahozeke baranê înkar nakin.

## MİROVÊN HİŞÊ WAN TEVLİHEVBÛYÎ Û SEWHİLDÊR

Digel kû mirov piştî tofanê bi destpêka nîpînû hatibin pîrozkirin jî, piştî bi tofanê bi çend nifşan ew ê dîsa serî li ber afirînerên û xwediyên xwe serî hildin û bi dû ramanên xwe yên berê bikevin. Ger em mînakekê bidin Xwedê ji mirovahiyê bikin (Afirîn 1:28, 9:1). Lê mirov di kirinên çi de bi biryar bûn? Riyeke tam dijberî Xwede hilbijartin!

> *"Ka werin em **ji xwe re** bajarek ava bikin û **kûleyekê kû digihije ezmanan çêkin bi vî awayî em navê xwe bidin zanîn;** wê demê em ê li rûzemînê belav nebin."* (Afirîn 11:4)

Ka bala xwe bidin vê plana kû mirovan çêkiriye bê çi qasî xwenavendî û serhildêr re. Li şûna kû xwesteka Xwedê bêhempa û ji bo wan baş bişopînin planên bê ka ew ê çawa bi dû a zanyarîbûna xwe kevin û xwe navdar bikin, çêkirin. Belkî jî gotin *"geremkûleyeke kû xwe bigihijîne esmên*" çêkin dê dema kû tofan çêbibe ew ên xwe di ewlehiyê de bibînin. tu cudahî di navbera wan û hin mirovên dîndar, yên hêvî dikin kû ji darizandina Xwedê jiyaneke bihev re lê tenê li cihekî bi dawî kirin.

REB dizanîbû kû planeke wisa ew ê nîjada mirov di demeke kin de birizîne û tune bike. Dê ka em di vê rewşê de binerin bê ka Xwedê çi kiriye û di heman demê de heta heyama dîrokê yê îro, *"Hemû mirovên dinyayê heman ziman bi kar tînin heman gotin bi kar tînin"* (Afirîn 11:1).

> *"REB got, 'hey kû bûne gelek û bi zimanekî diaxivin ji bo kû ramanên xwe pêk bînin wê tu astengan nas nekin.* ***Ka werin em dakevin jêr zimanê wan tev hev bikin ji bo kû tiştekî ji hev fam nekin.' Bi vî awayî REB wan li çar aliyê rûzemînê belav kir*** *û avakirina bajêr sekinand." Ji ber vê sedemê navê* ***Babîl*** *li bajêr hat kirin. Ji ber kû Xwedê zimanê hemû mirovên li wir tevlihev kiribû û ew çar aliyê rûkala dinyayê belav kiribû.* (Afirîn 11:6-9)

Mirov bêyî kû hev fam bikin û barûya xwe temam bikin nîvco hiştin. Wekî berê Xwedê dabû ber wan li çar aliyê rûkala dinyayê belav bûn. *"Ji ber sedemê navê* ***Babîl*** *li bajêr hat kirin." Babîl* tê mana *tevliheviyê.*

Dema kû projeya Xwedê tê redkirin her daîm tevlihevî çêdibe.

## GİRŞEYA XELET

Dersa kû divê mirov ji mirovên zemanê Nuh û ji wan kesên kû hewldanên kû Kûleya Babil înşa bikin ev e.

*Girse xelet bû.*

Digel kû gunehkaran xwe bi rastiya kû bi milyaran kes bi wan re di heman fikrê de ne jî daraza Xwedê bi ser wan de çû. Gelek kes heta roja îro jî difikirin kû ji ber kû fikra wan ya derbarê peyama Xwedê de ji hêla gelek kesan ve tê pejirandin.

Yekî li Brîtanyayê dijî bi posteya elektronîk ev nîşeya jêr şand.

> Posteya Elektronîk
>
> Ger hûn dixwazin ji dojehê rizgar bibin, wê gavê bidin dû dînê kû herî zêde bi lez belav dibe.

Ger belavbûna bi lez an jî hejmaran bikaribin heqîqet îspat bikin wê gavê nîjada Kayîn, mirovên di heyama Nuh de û yên li Babîlê jiyana xwe didomandin divê mafdar bûna. Lê ev mirov hemû jî bi xete bûn - ji binî de bi xeta bûn.

> *"Di deriyê teng re têkevinê. Ji ber kû deriyê kû ber bi tunebûnê ve dibe* ***fireh*** *û* ***pahn*** *e. Yên di vî dêrî re dikevin* ***pir*** *in. Lê belê deriyê kû ber bi jiyanê ve dibe* ***teng*** *e. Rê jî* ***çetîn*** *e. Yên kû vê rêyê dibînin hindik in."* (Matta 7:13-14)

## PLANA XWEDÊ YA KÛ NAYÊ SEKİNANDİN

Ka em vegerin çîroka derbarê malbata destpêkê de û em fêr bibin piştî kû Kayîn Habîl kuşt çi bû.

> *"Adem dîsa bi jina xwe e raket. Hewa kurikek anî. Got* ***'Xwedê ji bedêla Habîlê kû Kayîn kuştiye kurikekî din da min'*** *û navê kurik kir* Şît*. Kurikekî Şît jî çêbû navê wî kir Enoş. Wê gavê mirovan bi navê REB bang wî kirin."*
> *(Afirîn4:25-26)*

Ew pêşnûma û projeya Xwedê ya kû dixwest bibe gelekî kû baweriya xwe bi wî anîne kesî nikarîbû asteng bikira.

Mana navê Şît ev e: *"Ji bedêla wî bexşandin."* Hewa fam kir kû Xwedê ji bedêla Habîlê kû Kayîn ew kuştibû tovek bexşandiye. *Ezbeta jinekê* hatiye wehdkirin bi rêya nîjada Şît bê dinyayê.

Diya Îsa keça azib û xama Meryem jî ji nîjada Şît bû. Meryem di heman demê de wekî Xwedê wehd kiribû ji nîjda Birahîm û Dawud jî dihat. Şeytan ji bo kû plana Xwedê xira bike çi qasî di berxwe bide jî plana Xwedayê REB *"beriya destpêka dinyayê"* çêkiribû di rêya xwe de berdewam dikir.

Tu tiştî û tu kesî ew plan neda sekinandin.

## NAVÊ REB

Şît jî wekî Habîl bi Xwedê û bi rêya bexşandinê ji Wî bawer bû û *"navê REB bang kir."* (Afirîn 4:26) gelê Babîl yê di hemû qirnan de ji bo kû navdar bibin hewldane di vê dinyaya kû mirov tê de dijîn de mirovên mîna Habîl û Şît *yên kû bi navê **REB** bawer dikirin û navê wî bang dikirin* jî jiyana xwe domandin.

Hinek hevalên min ji min re dibêjin kû sed heb navên Xwedê hene. Lê belê ji wan tenê bi nod û neh hebên wan dizanin. Gelo ew navê kêm yên di lîsteya wan de dibe kû yê tê maneya *"REB rizgar dike"* bibe?

Ew nav kîjan nav e?

Erê ev nav **Îsa** ye.

Bawerpêneanîna bi vî awayî –Ka ew kî ye û çi dike– *netewandina* serî ya li ber Xwedê ye.

De ka werin em guh bidin duaya kû Pavlûs ji Cihûyên oldar û serhildêr re kiriye.

> *"Biranîno! Ez ji dil û can bêriya rizgarbûna Cihûyan dikin. Ji ber vê sedemê ez ji Xwedê re laveyan dikim. Ji bo wan ez dikarim bibim şahid kû **ji bo Xwedê bi xîret in,** lê belê ev **ne xîreteke bi zanebûn e. Ji ber kû heqîqeta** kû dibêje fam nakin û **dixwazin heqîqeta xwe belav bikin dixebitin serî li ber heqîqeta kû Xwedê digot serî netawandin.** Lê belê ji bo her yekî kû îman dike bêguneh bibe Mesîh dawiya zagona pîroz e… Encax tu eşkere bi devê xwe bibêjî **Îsa Reb e** û ji dil pê îman bîne kû Xwedê ew ji mirinê vejandiye, tu yê rizgar bibî. Ji ber kû Nivîsa*

*Pîroz dibêje, 'kû yên îmana xwe **pê** anîne ew ê tu carî fedîkar dernekevin.' Ji ber kû cudahî di navbera Cihû û Grekan de tune. Heman Reb rebê hemûyan e. Destê Wî li ber **hemû kesên** kû bang Wî dikin vekiriye. Ji ber kû **hemû kesên kû bi navê Wî bang li Reb dikin ew ê xilas bibin.**"*
(Romayî 10:1-4,9,11-13 [Yoel 2:32])

## Bİ QÎMET E AN BÊ QÎMET E?

Ka em bihesibînin kû çekeke bankeyê yek mîlyon dolarek li ser navê we hatiye nivîsîn. Dema kû mirov li çekê dinêriya tiştekî pir rind dixuya, lê belê bê qîmet bû. Çima?

Ji ber kû di hesabê min yê bankayê de pereyekî kû bi qasî perê çekê bike tune ye!

Baş e. Ger zilamê herî zengîn yê dinyayê li ser navê we çekeke yek mîlyon dolar binivîsand?

Ew ê tu pirsgirêk derneketa. Ji ber kû ew ê perêyê kû ji bo çekê hewce hebûya.

Bankaya kû çeka min îmze kiribû red kiribû ew ê çeka kû mohra mirovê zengîn lê qebûl bikira û pereyê beramberî çekê bidaya.

Dinyaya me tije mirovên kû bi navên cuda nêzîkî Xwedê dibin tije ye. Lê belê di çavê Xwedayê kû xwe ji bo mirov deynê xwe yê guneh bide tu qîmetê wan navan tune ye. Navên bi guneh hatine lewitandin e.

Mîna kû banka beramberiya çekan li ser navê min ya kû min îmze kiribûn û yek mîlyon dolar nedaye Xwedê jî ew ê ji bilî navê ***Îsa*** bi rêza tu navî efû neke û jiyanê îhsan neke.

*"Di tu kesên din de rizgarî tune ye. di bin vî ezmanî de tu navê kû ji mirovan re hatiye bexşandin û **navekî kû me rizgar bike tune ye**."* (Karên Şandiyan 4:12)

Gelo hûn dixwazin kû deynê we yê gunehan ji deftera tomarê ya Xwedê bê jêkirin û rastiya Wî dewlemendiya wî derbasî hesabê we bibe? gelo hûn dixwazin di ser naleta guneh re serfiraz bibin û niha heta dawiya dawî têkiliyeke nêzîk bi afirînerê me re bijîn?

Wê gavê yê kû van tiştan ji we re pêk bîne bi tenê navek e.

*"Wê gavê yên kû* ***REB bi navê*** *Wî gazî dikin ew ê rizgar bibin."* (Yoel 2:32)

*"Îmanê bi* ***Reb Îsa Mesîh*** *bîne tu jî û xelqê malê jî dê rizgar bibin."* (Karên Şandiyan 16:31)

Gelo hûn ji dil bawer dikin kû Reb Îsa Mesîh ji bo kû cezayekî gunehê we bide êş kişandiye, miriye û ceza û gunehê we ji holê rakiriye?

Wê gavê hûn ê ***"rizgar bibin."***



**TENÊ DU DÎN**

Em piştî kû me dît li dinyaya we zêdeyî deh hezar pergalên dînî hene me dît em derketin rêwîtiyê. Lê di esasa xwe de du pergal hene.

- Pergala serkeftinê ya mirov ji we re dibêje divê **hûn xwe rizgar bikin**.
- Pergala serkeftina Xwedayî ya dibêje **pêdiviya we bi Rizgarkerekî heye**.

Heta kû hûn xwe bi xwe hewl bidin xwe xilas bikin ji navan an jî dînên yek jê dibe kû kêrî we bê. Lê belê dema kû we ferq kir kû pêdiviya we bi Rizgarkerekî heye ew ê tenê navek kêrî we bê.

Ew nav ***Îsa*** ye.

*"Hemû pêxember* ***derbarê Wî de*** *şehadetiyê dikin. Bi vî awayî hemû gunehên kesên kû* ***pê*** *îman anîne bi* ***navê Wî*** *tên bexşandin."* (Karên Şandiyan 10:43)

# BEŞ III
# DAWIYA RÊWÎTIYÊ

## BEROVAJÎKIRINA LANETÊ



27 - Qonax 1: Bernameya Xweda Ya Berî Ya Niha


28 - Qonax 2: Bernameya Xweda Ya Niha

29 - Qonax 3: Bernameya Xweda Ya Bê

30 - Beşên Kû Ji Bihuşta Dahatûyê Hatine

Gotina Dawî

Têbinî



# 27

# Qonax 1: Bernameya Xweda Ya Berî Ya Niha

*“Tu yê **îro** bi min re li bihuştê bibî!”*
— Îsa Mesîh (Lûka 23:43)

Beriya niha bi çend deqeyan bataryaya laptopa min hema çi bigire qediyabû an jî miribû. Lê niha bi jiyana nû tê tijekirin pozîsyoneke li ber mirinê dîsa çawa hat ber meqlûbkirin.

Min fîşa kompîtura xwe xist prîza elektrîkê.

Her tim pîlên laptopê, telefona destan, an jî ronîkêndestan ya diqedin ya dimirin –şarja wan diqete– ev rewşa wan heta kû ji çavkaniyeke hêzeke mezintir neyên şarjkirin berdewam dike.

Rewşa nîjada Adem bi awayekî dişibe pîlên diqedin û dimirin. Ji roja kû em ketine malzaroka diya xwe û heta îro ji bo kû em naleta kû gunehan aniye em bi şûn de vegerînin bêyî kû em pê de biçin mirina me dest pê kir.

Beriya kû em dest bi beşa dawiyê ya rêwîtiya xwe bikin ez dixwazim behsa çîroka gerokelên Frensî yê kû rabirdûya wî dimre yê kû bi qasî pîlekê bêhêvî, bikim.

## NEŞAD Û BİDERD

Min û Brunoyê 26 salî me hev di Adara 1987an de nas kir.

Ev mirovê ciwan beriya niha bi gelek salan wateya jiyanê meraq dikir. Di hûndurê xwe de valahiyeke mezin hîs dikir –

nikarîbû ne bi wê baweriya xwe ya Katolîk ya pê mezin bibû û ne jî bi zewqên dinyewî tije bikira.

Bruno dema kurikekî biçûçik bû dît kû yên Xwedê fêr dikin tiştên kû vedibêjin pêk naynin. Di wê dema xwe ya naşîtiyê de çavdêriya dinyayeke bê edalet dît. Dema kû hat hejdeh saliya xwe tiştên kû Bruno dixwest bike ev bûn: derbaskirina dawiya hefteyê ya bi hevalê xwe ya keç re, serxweşbûn û ji bîrkirina şert û mercên xirab yê jiyana me. Dema hevala wî ya keç di qezaya trafîkê de mir, bêhîsîtiya wî ya kû di nav de ditevizî pirtir bû. Li hember Xwedê hêr bû.

Bruno biryar da kû biçe Hindîstanê. Hêvî dikir kû wateya jiyanê di wan ayînên Hindîstanê yekê de bibîne. Bruno piştî we di rêya reş re rêwîtiyeke zor û zehmet û mirov dibetiland bijart û pê ve gihaşt bajarekî qelebalix yê Hindîstan. Li vir neşadiya kû mirov nikare bi peyvên bîne ziman û cehdeke ayînî ya mezin re rû bi rû ma. Ev rewşa kû Bruno jiyaye em bi gotinên wî ragihînin we: “Min dît mirovên li vir digel ayîn û baweriyên xwe ji min neşadtir in.”

Bruno piştî kû li Hindîstinê nêzî salekî derbas kir, gihaşt vê encamê: ger kû dilê wî hebû rastiya nîhaî keşif bike bûya encax wê rastiya Xwedê dikarîbû ji wî re rave bikira. Bi vî awayî jî bi vê duaya kêsan xîtabî Afirînerê xwe kir, “ger Tu heyî, xwe ji min re rave bike!”

Bruno rojekê dema kû li kolanên Kalkûtayê dimeşiya, lewheyeek kû li ser PIRTÛKXANEYA PÎROZ nivîsandî ya li ser deriyê dikaneke ferq kir. Di wê kêliyê de biryar da û kete hûndur û ji peywirdar pirsî, “gelo pirtûkeke we ya bi Frensî heye?” Di dikanê de bi tenê Pirtûka Pîroz a Frensî hebû.

Bruno Pirtûka Pîroz stend û dest bi xwendinê kir.

Dema kû xwend li gelek tiştên kû wî matmayî bihêlin rast hat. Wekî mînak, gelekî di bin bandora destpêkê û duyemîn yên olî di deh fermanan ma: *“Ew ê* ***ji bilî min tu Xwedayê din çênebe.*** *Tu yê ji xwe re tu pûtê kû bişibe zindiyekê çênekî…* ***Tu yê sitûyê xwe li ber pûtan xwar nekî û rajariyê ji wan re nekî.”*** (Ji Misirê Derketin 20:3-5)

Bruno digel kû di bin bandora van fermanan de mabû jî bû şahidê perestgehên hûndurê wan tijî pût û mirovên kû serê xwe li ber wan ditewand. Û dema derbarê dînê kû pê mezin bûye fikirî fam kir kû hin mirovên kû ew jî nas dike jî ji ber kû li ber peykerên Meryem û Ezîzan serê xwe ditewînin û dua dua dikin, bi vî awayî fermanên Xwedê bin pê dikin, sûcdar in.

Bruno di heman demê de di bin bandora vê ayetê de jî mabû: *"Tiştên di Pirtûka Zagonê de nivîsandî wer bibilîne. Ji bo kû tu hemûyan pêk bînî bi şev û roj li wan bifikire.* ***Wê demê tu yê bi serbikevî û bigihîjî armanca xwe."*** (Yeşû 1:8)

Piştî kû qinyata xwe pê anî kû ew rastiya kû lê difikire tenê di Pirtûka Pîroz de heye. Bruno ji Hindîstanê vegeriya Fransayê. Lê li şûna kû xwendina Pirtûka Pîroz berdewam bike ew xist refikê û dîsa vegeriya jiyana ker û kêfê. Lê tiştê kû ev awayê jiyanê dida wî tehmeke tehl û dilekî vîkîvala bû.

Di navberê de çar sal derbas bû.

Bruno dema kû rojekê derbarê jiyana xwe ya bêwate de difikirî ayeteke Pirtûka Pîroz ya kû wehdê Xwedê tê de ne hat bîra wî. *"Hûn ê li min bigerin. Dema kû hûn bi hemû* ***dilxwaziya*** *xwe li min bigerin hûn ê* ***Min bibînin****."* (Yeremya 29:13) Bruno wiha dua kir, "Belê Xwedayê min, ji bo kû ez fam bikim bê ka wehdên te rast in an ne rast in ez ê bi hemû dilsoziya xwe li te bigerim."

Ji bo kû mala wî bandorê li ser wî neke Bruno vê carê biryar da kû derkeve rêwîtiyeke ber bi Efrîkayê ve. Di vê rêwîtiya xwe ya kû bi rêya reş dikir de pirtûka xwe ya Pîroz xwend û dua kir, "Xwedêyo, min bi ber rastiya xwe ve araste bike û ji riyên xerab û xelet bistirîne". Piştî kû Sehra derbas kir gihaşt Senegala Bakûr. Şeva xwe ya destpêkê li bajarê kû ez û malbata xwe lê bûn derbas kir.

Dotir rojê Bruno derket li nava bajêr hinekî li ser xwe geriya. Wekî Kalkûta lewheyeke li ser deriyekî daliqandî bala wî kişand. Li ser wê lewheyê ev tişt hatibûn nivîsîn.

*ECOUTEZ! CAR L'ETERNEL DIEU A PARLE!*

(Guhdar bike! Ji ber kû Xwedayê REB axivî!)

Bruno ket hundir.

Cihê kû ketê ofîsa min bû. Dema serê xwe ji ser karê kû min dikir rakir, min zilamekî mîna çilo û rih dirêj yê kû Pirtûka Pîroz ya berg şîn a gelekî hatibû bikaranîn û biçûk ya ji Hindîstanê kirîbû di destê wî de dît. Ew pirsa destpêkê ya kû ji min pirsîbû hê jî ji kerika guhê min derneketine.

"Tu çi yî, Katolîk an Protestan?"

"Ez tenê Xirîstiyanek im –şopînerê Mesîh–" dema kû Bruno bersiva min bihîst hem şaş bû hem jî memnûn ma. Ji ber kû dema Pirtûka Pîroz xwendibû çavdêriya kû Pirtûka Pîroz qet *behsa Katolîk û Protestan nake, bi tenê behsa Xirîstiyan* –ên îmana xwe bi Mesîh anîne– *dike*. Bruno wê rojê ji min re got kû wê rojê te ji min re bigota ez "Katolîk im" an "Protestan im" min ê tavilê dikan biterikanda. Ji dîn kerixî bû. Rastî dixwest.

Piştî wê rojê bi çend rojan Bruno li ser serê min kir barana pirsan, min bersivên Xwedê yên di Pirtûka Pîroz de nîşanî wî dan. Êvara kû ew ê veqetiya (Dil dikir kû biçe Efrîkaya Başûr) min wî bêmînet kir. "Pirtûka xwe ya careke din bixwîne û tiştên kû Xwedê ji te re kiriye dîsa bixwîne."

Piştî şeş hefteyan ji Bruno nameyek hat ji min û jina min re. Di nameya xwe de digot li nêzî gundekî masîgiran ji xwe re odeyek kirê kiriye bi şertê kû peymana kevin û nû bide ber hev dîsa Pirtûka Pîroz xwendiye û qedandiye.

Di hemû nivîsên Pîroz de Mesîh dîtibû.

Ez dixwazim vê beşê bi gotinên Bruno vebêjim: "Rojekê bi şev dema kû ez tikîtenê bûm wehda Îsa bi awayekî xurt ket dilê min. *'Ya yên hemû kesên betilî û yên bargiran! Werin ba min,* ***ez ê rehetiyê bidim we.'*** (Matta 11:28). Dema kû min jiyana xwe ligel hemû têkçûn, êş û poşmaniyan raçav kir di dilê min de pêvçûneke bihêrs pêk hat. Êdî min dizanîbû. Ger ez Mesîh bişopînim êdî ez ê ne azad bim bo bengîtî û vînên xwe bişopînim. Dawiya dawî ez radest bûmç xwedê çavê min vekir. Min baweriya rêya xwe pê anî kû Mesîh di çarmixê de Xwîna xwe ji bo min rijandiye û *jibomin* ji mirinê vejiyaye. Dilê min, canê min tijî aramî bû. Ez

giriyam û giriyê min nesekinî. Barê giran yê gunehê min bi min re nemabû.” Bruno bi van gotinan berdewam kir: “En somme, je suis né de nouveau!” (Bi kurtasî, ez ji nû de welidîm!)



Bruno li çi tiştê kû lê digeriya dît: dilekî hatiye pirtûpakkirin û wijdan, bi Afirirînerê xwe re têkilî û jiyana ebedî. Êdî fam kir bê ka ji bo çi li rûkala dinyayê ye û bê ka berê wî bi kû de ve ye.

Lêgerîn qediya. Pirtûka Pîroz wiha dibêje:

> *“Ger kesek* ***di Mesîh de be*** *mexlûqatekî nû ye.* ***tiştên kevin derbas bûne her tişt nû bûye.”*** (Korîntiyên 2., 5:17)

Jiyana Bruno hem bi mijarên biçûk hem jî bi yê mezin bi lez û bez veguherî. Wekî mînak, digel kû ji yanzdeh saliya xwe ve cixare dikişand, Reb ew ji wî teb’ê wî xilas kir. Jiyana wî ya dersîncî ya araqvexur û xwe perest bû bîranînek hetîketiyê ya rabirdûyê. Nivîsên Pîroz êdî ji bo wî xwediyê maneyek mezin bûn û kirina duaya ji bo Bruno bi qasî dan û stendina nefesê tiştekî xwezayî bû.

Bruno ji bedêla kû gera xwe berdewam bike, ji bo kû li ser Nivîsên Pîroz bixebite, wextderbaskirina wî yên bawermendên di Mesîh de û bi armanca kû ji bo ji bawermendên din re bê ka Xwedê ji wan re çi kiriye vebêje şeş mehê xwe yê dawiyê li Senegalê ma.

Bruno, bibû aferîdeyekî nû.

Digel kû di ser lihevrasthatina min û Brunoyî destpêkê re bîst sal derbas buye hê jî haya me ji hev heye û em bi ser hev de diherin û tên. “Brunoyê Nû” niha li Fransayê bi hevjina xwe re dijî. Bi Xwedê re dimeşin û çar zarokên xwe bi zanîna Reb û bereketa Wî mezin dikin.

Van tiştên kû ez dibêjim gelo tê wateya jiyana Bruno êdî ji têkoşîn, diltengî û dilêşiyên jiyanê azad bûn? Na, hem ew hem jî

malbata wî bi wî ceribandin û xapînokên wî re rû bi rû dimînin lê ne bêkes in.

Reb bi xwe bi wan re ye.

## BERNAMEYA XWEDÊ YA SÊ GAVÎ

Dibe kû yek wisa difikire: "Deqeyek bisekinin, ger Îsa ji bo me Şeytan, mirin û guneh têk biribe wê gavê bawermendên Mesîh ji di nav de mirov ji bo çi di gelek qadan de hê jî têkoşînê dikin. Dinyaya me çima tijî xerabî û berberî ye? ew rizgarkirin û kamiltiya kû hatiye wehdkirin, ka?

Bersiva van pirsan di heqîqeta plana sê gavî ya dem dirêj a kû Xwedê ji bo mudaxeleyî dîroka mirov bike de ye:

Gav I: Xwedê ew ê gelê xwe ji ***CEZAYA*** guneh rizgar bikira
Gav II: Xwedê ew ê gelê xwe ji ***HÊZA*** *gunehê* rizgar bikira.
Gav III: Xwedê ew ê gelê xwe ji ***HEBÛNA*** *guneh*rizgar bikira.[235]

Li jêr jêgirtineke ji Peymana Nû bi kûrtasî bernameya Xwedê ya sê gavî –rabirdû, niha û dahatû- vedibêje:

> *"Xwedê '**em** ji talûkeya mirina ew qasî mezin* [Gav I] ***rizgar kir; ew ê hê jî rizgar bike*** [Gav II]*; me hêviya xwe bi Wî girêda,* ***ew ê dîsa me rizgar bike*** [Gav III]*."*
>
> (Korîntiyên 2., 1:10)

Beşa ji rêwîtiya me ya di Nivîsên Pîroz de maye dê li ser bernameya sê gavî ya Xwedê ya kû ew ê bandora Şeytên, guneh û mirinê heta û heta têk bibe, hûr bibe. beşa dawî ya rêwîtiya me ji ber kû ew ê hê dîmenên kin yên ji Bihuştê bide mei dê manzarayên nuwaze tê de hebin.

## BEREVAJÎKİRNA LANETÊ: GAV YEK

Dema kû Adem û Hewa li tiştên kû Şeytan gotibû guhdar kirin, hevaltiya xwe ya bi Afirîner û Xwedayê xwe re wekî ceza

wendakirin û lanet li ser xwe de û hem jî bi ser hemû nîjada xwe re anîn. Ji bo çi dinyaya orîjînal û bêhempaji nişka ve veguhezî cihekî kû mirov xwe lê ji Xwedê vedişêrin û dixwazin di rêya kû ji xwe re çêkirine re bimeşin. Êdî jiyan bi bawerî û êşê bi nexweşî û xerabûnê bi xizanî û birçîbûnê bi xemgînî û berberiyê hat biwatekirin.

Guneh lanetek anî, lê dema wext çêbû wekî kû Xwedê ehd kiribû Xwedê yê ebedî ji bo kû nîjada Adem ji Şeytên, guneh û mirinê xilas bike wekî *ezbeta jinekê* ji ezmanan daket rûzemînê.

> *"**Xwedê** di demên kevinar de bi rêya pêxemberan gelek caran bi gelek awayan bang li pêşiyên me kir. **Di vê qirnê de dawiyê de jî bi rêya xwe** yê kû kiriye mîratxurê her tiştî dide berdewamkirin. **Piştî kû ji gunehan pirûpak kir û pê ve li cihên bilind li aliyê rastê yê Xwedayê berz rûnişt."***
>
> (Îbranî 1:1-3)

Reb Îsa ji ber guneh nehatibû lewitandin.

Ew, destnîşan kir kû li ser hemû unsûrên afirînê yên bi gunehan hatiye lanetkirin desthilatdar e. Bi her peyvekê got an bi destlêdaneke xwe kir kû ruhên xirab birevin, çavên kor bibînin, nexweşên cuzamê paqij bibin û mirî bivejin. Ew li ser avê meşiya, bahoz da sekinandin û ji bo kû mirovên birçî têr bibin nan da zêdekirin. Ew, guneh da efûkirin û kir kû dilên birîndar dilxweş û dilrehet bibin.

Û piştre peywira kû divê pêk bîne temam kir.

Ji bo kû bavê xwe berz bike û Nivîsên Pîroz pêk bîne û hemû kesên îmana xwe bi Wî anîne rizgar bike êş kişand, mir û dîsa vejiya.

> *"Mesîh ji bo kû pîrozkirina ji Birahîm re hatibû pêkanîn, bi rêya Îsayê Mesîh ji netewan re pêk anîn û ew ruhê kû ji me re hatine wehdkirin bi îmanê me bistirîne **ji bo me hat lanetkirin û em ji laneta Zagonê rizgar kir.** Ji ber kû wiha hatiye nivîsandin 'hemû kesên kû bi darê ve hatine daliqandin bi lanet in.'"*
>
> (Galatyayî 3:13-14; Dubareya Zagonê 21:23)

## KEREMA KÛ MATMAYÎ DIKE

Îsayê kû zagonên Xwedê bi awayekî nuwaze pêk tîne, ji bo kû yên zagonê îhlal dikin, *"ji bo ji laneta zagonê rizgar bike* (ji bo kû mirov vê yekê karibe bike, îtîatkirineke nuwaze divê), *ji bo me bê lanetklirin"* hat. Îsa ji bo kû me ji wî cezaya ebedî rizgar bike bi daxwaza xwe ew cezayê kû me heq kiribû xist sitûyê xwe.

Reb dema bi çarmixê ve daliqandîbû jî ji bo kû armanca xwe ya ji bo bermeqlûbkirina lanetê destnîşan kiriye.

Îsa di nava du kesên kû li hember dewletê xayîntî kiribûn, yên dizî û kûştin kiribûn hat çarmixkirin. Em guhê xwe bidin axaftina di navbera Reb û wan her du gunehkaran de derbas bûye. Berê her du zilaman jî henekên xwe bi Îsa kirin, dem derbas bû, dilê yekî guherî û tobe kir.

> *"Yek ji sûcdarên di çarmixê de da dijûnan û got, 'Tu ne Mesîh î. De hadê me jî û xwe jî rizgar bike!'*
>
> *Lê te dît sûcdarê din bi Wî re xeyidî û bersiv dayê, 'Ma tu tirsa Xwedê jî bi te re tune ye? Tu jî heman cezayê dikişînî. Her wekî em mafdar in kû me ceza dikin û em bedêla tiştên kû me kirine didin. Lêbelê vî zilamî tu xirabî nekiriye.' Piştre got, 'Ya Îsa dema kû tu ketî bin desthilatdariya xwe min bi bîr bîne.'*
>
> *Îsa jê re got, 'Ez ji te re rastiyê bibêjim, tu yê îro bi min re bê bihuştê."* (Lûka 23:39-43)

Ev her du rêbir hindik mabûn bimrana û biçiyana dojehê. Piştre yek ji wan di saetên xwe yên dawî de pê hisiya kû gunehkar e û baweriya xwe bi Rizgarkerê bê guneh yê li çarmixa ortê hatibû çarmixkirin anî û pê îman kir.

Îsa jê re wehdek kir:

> ***"Tu yê îro bi min re li bihuştê bibî!"***

Ji bedêla kû tu bêdawîtiyê li cihê ji Şeytên û milyaketên Wî yê bêrûmetbûyî re hatiye amadekirin bibuhure tu yê li ba ev

rêbirê hatiye efûkirin ew ê bêdawîtiyê li ba Afirîner û Rizgarkerê xwe derbas bike.

Du cihên çi qasî ji hev cuda û çi pevserbiserkirineke mezin!

Ji bo kû cezaya gunehê bikişîne di wê kêliyê de bi Berxikê Xwedê yê kû Xwîna Wî dirijand bawer dikir gunehê gunehkar ji deftera tomarê bir. Rastiya Îsa li serhesabê wî nivîsand û navê xwe li *Pirtûka Jiyanê ya Berxikê* nivîsand – ew pirtûk navê hemû kesên kû îmana xwe bi jiyana ebedî, heqîqet û efûkirinê anîne di nava xwe de diparêze.

Laneta guneh ji bo vî gunehkarê neçar heta dawiya dawî hat bermeqlubkirin.

## GELO MÊRKUJ TÊN EFÛKİRİN?

Postaya elektronîk a jêr ji yekî kû lêkolînê dike, hat:

> Posteya Elektronîk
>
> **"Îsa (bila selametî li ser Wî be) xwe xist dewsa me û ji bo gunehên me mir"** ez meraq dikim gelo hûn ê bi ronahiya peyva kû beriya niha hat destnîşankirin têgeha edaletê çawa rave bikin. Ev vegotin gelo tê wateya di emrê xwe de ez ê ji tu xetayan mesûl neyêm dîtin. **Mêrkujê** kû li vê dinyayê ji destê edaletê xilas bûye li dinyaya din ji ber kû Îsa cezaya gunehên wî daye ew ê bê azadkirin. Ez di erêkirina vê fikrê de ditengijim. Ez hêvî dikim kû rêya rast bi ber me hemûyan ve bê xistin!

Gelo bi "edaletê" re li hev dikin mirina Îsayî di çarmixê de ya ji bo gunehkaran? Xwedê dikare mêrkujekî jî bibexşîne? Ka werin em bersiva vê pirsa dawî bi şahidiya çend "mêrkujên" hatine efûkirin û veguherîne bidin.

## YAMYAM (MİROVXUR)

Wergêrê Pirtûka Pîroz û antropolog Don Richardson di pirtûka xwe ya bi navê *Mîrên Rûzemînê* de behsa gelê Yalî yê Yamyamên dirinde yên li çiyayê Îrîan Jayayê dijîn dike. Bi

sedsalan ev gel ê li mirovên dijmin yên li gundên dora wan dijiyan îşkence kirin, ew kuştin û erê ew *xwarin*. Tolhildan û tirs awayekî jiyanê "asayî" bû.

Piştre Mizgînî bi wan re birin.

Gelê Yalî û qebîleyên li der û dora wan mizgîniya Xwedayê kû gunehan efû dike û jiyana baş ya di Mesîh de bihîstin. Piraniya van mirovan îman pê anîn. Awayî jiyan û ramana wan hat guherandin. Wekî zarokekî Xweda kû nû welidîne derbarê bê ka çi "asayî ye" de standardeke nû bi dest xistin. Ew kesên kû berê ji hev ditirsiyan û nefret dikirin bûn birayên hev ji bo kû bi dijminên xwe yên kevin re dostaniya xwe xurt bikin "patîkayên bi kalîtetir yên kû gundên Yaliyê nêzîkî hev kirin" çêkirin.[236]

Îro ew mêrkujên kevin li hember kesên kû dixwazin zerarê bidin wan bi dilrehm in. Ji ber kû Ruhê Xwedê dilê wan guherandiye û ew fêrî vî tiştî kirine: *"Li hember hev û du dilbaş û bi dilrehm bin. Çawa kû Xwedê wê di Mesîh de efû kiriye hûn jî hev û du efû bikin."* (Efesî 4:32)

## KEÇİKEKE KÛ HÊVİYÊN XWE WENDA KİRİNE

Emma di nava malbata muhafazeker û tund ya Misilman a li Singapurê de mezin bû. Piştî hevberdana dê û bavê xwe ji ber bêpergaliya jiyana xwe biryar da kû yekî –xwe– bikûje.

Emma bi nêt bû kû xwe ji şaneşîna apartmana deh qat bavêje erdê. Hindik mabû ew plana xwe pêk bianiya ji Xwedayê kû nas nedikir bi hêrsbûn û bêhêvitiyê feryad kir, "ger bi rastî jî tu hebî, vê bi şiklekî ji min re ragihîne!"

Ber bi nêrdewana kû ji çend derencan pêk dihat ve meşiya û li ser derencekekê ji wan pirtûkeke Pîroz hebû! Emma rahişt pirtûkê û bi rev çû odeya xwe rûpelên Pirtûka Pîroz vebûn, di van rû rûpelên vebûn de ev rêzik habûn nivîsîn:



***"Reb şivanê min e, kêmasiyên min tune ne.*** *Min li mêrgên hêşîn di xew re dike, min dibe qeraxa avên aram*

> *hundirê min nû dike. Ji bo xatirê navê xwe di rêyên rast de rêberiyê ji min re dike. Ger ez di geliyê mirinê yê tarî re derbas bibim jî ez jş xirabitê natirsim. Ji ber kû tu bi min re yî. Çoyê te, şiva te baweriyê dide mkin. Tu li ber dijminê min ji min re sifreyê amade dikî. Tu rûn di serê min dide. Kaseya min di ser re dihere.* ***Di hemû temenê min de tenê ew ê başî û hezkirin min bişopîne. Ez ê her tim li mala REB rûnim."*** (Mezmûr 23)

Emma dema ev Mezmûr xwend rastiya Xwedê û HEZKIRINA Wî têr tije bi ser wî de hat. Piştî vê baweriya bi Reb Îsa kû gotibû ***"Ez şivanekî baş im. Ji bo pezên xwe canê xwe didim."*** (Yuhanna 10:11) anî û îmana xwe bi Wî anî.

Emma bû yek ji *"mihên"* Wî.

Emma êdî naxwaze xwe bikuje. Niha hevsereke kêfxweş û diya pênc zarokan e. Armanca jiyana Emma ew hezkirina Xwedayê –HEZKIRINA PIR A XWEDÊ– kû di Mesîh de dîtibû kesên wekî din jî bibînin.

Dema min ev çîrok ji bo kû Emma rastbûna wê bipejirîne şand çîrok bi rêya posteya elektronîk ji min re bi şûn de şand. Li çîrokê peyvên xwe yên derbarê *hezkirina Xwedê* bi tîpên mezin nivîsandibû û lê zêde kiribû Emma. Di nava jinên kû li her derê dinyayê kû dibin çewisendinên mezin de tên kerixandin û gef lê tê xwarin de ew û hezkirina ji bo jiyana rojane di hezkirin û eleqeya Reb ya mirov matmayî dihêle de dibîne.

## MİROVEKÎ DİRİNDE

Di dawiyê de em li ser partîzanê oldar *Saulê Tersûsî* yê kû ji bo navê Xwedê mirovan dikuje, bisekinin.

Saul di zemanê Mesîh de li Asyaya Biçûk (Tirkiyeya îro) li Tarsûsaê hat dinyayê. Saul baweriya xwe pê neanî kû Îsa Mesîh e û Xwedê ye. Piştî kû Îsa vegeriya Bihuştê ne bi tiştekî Saul ji hêla lijneya bilind a Cihûyan ve bo yên Îsa dişopînin bavêje hepsê, qirbaç bike û bikuje, hat peywirdarkirin. Ew di wê baweriyê de

bû kû dema Cihûyên kû ji Îsa bawer kirine bavêje hepsê, qirbaç bike û bikuje ew ji Xwedê re xizmetê dike.[237] Ka em dema kû rojekê Saul û zilamên xwe Xirîstiyanên Cihû digire çi dibe di rêzikên jêr de bixwînin.

> *“Dema kû tibabek rê çû nêzîkayî li Şamê kir, ji nişka ve ronahiyekê ji ezmanan dihat der û dora wî ronî kir. Saul ket erdê bihîst kû deng jê re dibêje, ‘Saul, Saul tu çima zilmê li **Min** dikî?’*
>
> *Saul got, ‘Ya **Mîrê** min, tu kî yî?’*
>
> *Bersiv bi awayê “Ez **Îsayê** kû te zilm lê kiribû” hat. Dema tu li hemberî zextê derdikevî, tu zerarê didî xwe.’*
>
> *Saul ji matmayînê zîq sekinê, bi lerizîn got, ‘Reb tu çi ji min dixwazî ez bikim?’* (Karên Şandiyan 9:3-6)

Fikrên Saul yên derbarê Îsa de guherî. Saul wekî şagirtekî, nivîsên Peymana Kevin tavilê fam kir, Mesîhê kû hemû pêxemberan derbarê Wî de dinivîsand bi xwe ye.

Dijminê mezin bû lehengê mezin.[238]

Saulê kû piştre navê xwe wekî *Pavlus* (tê maneya *“biçûk”*) guherandibû, derbarê xwe de şahidiya vî tiştî dike:

> *“Digel kû demekê ez yekî kû min ji wî re dida* çêran *û ez mirovekî **zalim**, **kusteh** bûm jî li min hat rehmê. Ji ber kû min çi kir ji ber nezaniyê û bêîmaniyê min kir. Lê belê kerema Rebê me bi îman û bi hezkirin bi Mesîh Îsa re heye zêde zêde bû para min. **‘Mesîh Îsa ji bo kû gunehkaran rizgar bike hat dinyayê’** gotineke kû mirov pê ewle bibe û bi her awayî gotineke kû mirov dikare ji dil û can qebûl bike ye. **Ji nav gunehkaran yê herî xirab ez im.”***
>
> (Timoteosê 1., 1:13-15)

## PİSPORİYA MESÎH

Gelo dibe “mêrkuj” bi xwe jî ji hêla Xwedê ve bê bexşandin û guherandin?

Yamyamên Îrîanî, Emmaya Singapurî û Saulê Tersûsî ji hêla Xwedê ve hat efûkirin û guherandin. Heman rewş ji bo ew mêrkujê tobeker yê li nik Îsa hatibû çarmixkirin jî mirov dikare bibêje. Li kû derê dinyayê dibe bila bibe dema gunehkarek ji peyama Xwedê bawer bike –Yên di hundirê girtîgehê de û yên li derveyî wê– ji hêla Xwedê tên efûkirin û guhertin.

Rizgarkirin û guhertina dilê gunehkarên "herî xirab" û "herî baş" qada pispjoriya Mesîh e.

Her tiştê derbarê kerem û dilrehmiya Xwedê de ev e.

Bêguman encamên gunehan heye.

Rêbirê di çarmixê de ji ber sûcên xwe hê jêş êş dikişand. Di emrê xwe de ew aramî û kêfxweşiya naskirina Reb, jiyana ji bo wî, ji bo kesên wekî din wî nas bikin dikariya bi wan re nejiya. Digel her tiştî ji bo kû gunehkarek bê bexşandin û li hember Xwedê bê rastkirin her dem bi heman riyê hatiye kirin: ferqkirina rewşa xwe ya gunehkariyê û bawerîpêanîn, rizgarkirina Xwedê ye.

Bawerîpêneanîna bi Îsa, bi rêbirê tobenekirîbû yê li kêleka Îsa hatibû çarmixkirin re mehvbûn e.

## DİLREHMÎ Û EDALET Bİ HEV RE

Ew kesê kû berî niha bi çend rûpelan we posteya wî ya elektronîk xwendibû ev pirs kiribû: *"'Gelo li gor gotina 'Îsa ket dewsa me û ji bo gunehên me mir' têgeha* ***edaletê*** *rave bike?"* Ehmed berê heman pirs kiribû:

> **Posteya Elektronîk**
>
> Xwedê gelo ne bi qasî kû bê ka çi dixwaze ji mirovan re bibêje û beriya kû xwe yê delal qurban bike û îşkence bike ne mezin e???!

Beriya niha ji gelek caran ve wekî me dîtibû ji ber kû Xwedê di babetên edalet û sedaqetê de mezin e heta kû gunehên mirovan bi awayê kû hewce dike neyê darizandin û cezakirin nikare van gunehan *"jêbibe"*.

Ew mînaka kû di beşa 13. de bibîrbînin ya kû derbarê

dadmendê kû dilrehmiyê îhsen dike ye kû bêyî edaletê pêk bîne.

Xwedê naşibe ew dadmendê xwediyê fikrên seyr. Di kesayetiya Wî de an di navdariya Wî de bi qasî tozeke biçûçîk jî debxek tune ye. Ew dilrehmiyeke kû zerarê bide edaletê qet îhsan nake. xwe jî ji ezmanan daxist rûzemînê ji bo kû li çarmixê bê xistin û ji bo kû di çarmixê de dilrehmî û heqîqeta Xwedê bi awayekî nuwaze bi pêkhênanekê pêşkêş bike, ji bo hezkirina xwe ya mezin şand.

> ***"Hezkirin û dilsozî ew ê bigihîje hev.*** *Ew ê heqîqet û dilrehetî hev du ramûsîne. Ew ê dilsozî ji erdê bilind bibe, heqîqet dê ji ezmanan binêre.* (Mezmûr 85:10-11)

Îsa ji ber kû ji ber me li hember xezeba Xwedê deber dike, Xwedê *"ji ezmanan dikare li jêr binêre"* û ji me re diyariyên xwe yên wekî efûkirin, nuwazebûn û jiyana ebedî pêşkêş bike. Reb Îsa ket dewsa me û *edalet*, *dilovanî* û *kerema* Xwedê pêşkêş kir. Wekî kû berê jî me çavdêriya Wî kiribû:

> *Edalet,* bi destxistina tiştê me heq kiriye,
> *Dilovanî,* bi destnexistina tiştê me heq kiriye,
> *Kerem* jî, bi destxistina tiştê me heq nekiriye ye.

Yên kû baweriya xwe bi Mesîh anîne *tiştê kû tu kesî heq nekiriye* distîne: pakbûna ji gunehan, rastiya Mesîh, di malbata Xwedê de cihek û jiyana ebedî. Yên kû Mesîh red dikin û guh nadin wî ew ê tiştê kû *her kes heq dike* bistîne.

Beriya kû Mesîh were bi hefsed salî pêxember Mîka ev nivîsand: *"Ew ê bi şivê li hinarkên rûyê yê kû rêveberiyê dike* ***xînin****."* (Mîka 5:1). Li ser vê mijarê bisekinin û bifikirin. Rêveberê hemû rûzemînê ji bo kû ji hêla wan gunehkarên nankor bê kuştin ketibû dilgê mirov!

Edalet, dilovanî û kerem bi hev re ahengeke nedîtî pêk anîn.

> ***"Hê em neçar bûn Mesîh di dema kû hatibû diyarkirin de ji hêla xwedênenasan ve hat kuştin.*** *Kes zû bi zû ji*

*bo mirovekî rast namire lê belê ji bo mirovekî baş dibe kû yek mirinê bide ber çavê xwe. Xwedê bi vê yekê dide peyitendin kû ji me hez dike: Hê dema em gunehkar bûn Mesîh ji bo me mir."* (Romayî 5:6-8).

## YÊ ADÎLMAYÎ Û PİRÛPAKKER

Xwedê di gava destpêkê ya plana xwe de ji bo kû gunehkaran efû bike bêyî kû standardên xwe yên nuwaze xira bike rêyek vekir. Xwedê ew kesê kû yên hem ***"adil mayî*** *û hem jî yên îman bi Îsa anîne ji bin* ***tohmetê*** *xilas dike."* (Romayî 3:26).

Xwedê *Adil e,* lewre guneh bi awayê kû hewce dike daye cezakirin.

Xwedê hemû kesên kû baweriya xwe bi Rizgarkerê kû Wî şandiye anîne ji bin *tohmetê* xilas dike.

Roja kû min nema baerî bi hewldanên xwe anî û min bawerî bi Mesîh anî û min pê bawerî anî kû ew ji bo min miriye û vejiyaye adamendê adil dê morê li ser hemû sûcên min yên di deftera tomarê de nivîsandî bike:

### *HATPAKKİRİN!*

*Hak pakkirin,* bi rêya çalakiya zagonî ya Xwedê *rast hatin îlankirin e.*

Xwedê çawa dikare vê yekê bike?

Xwedê dikare vê yekê bike, ji ber kû di çarmixê de cezaya-gunehê min Wî da.

Dema Adem gunehkar bû, Xwedê da zanîn kû hemû nîjada mirov ne rast e. Lê belê ji ber kû Îsa mir û dîsa vejiya Xwedê hemû kesên kû baweriya xwe bi Wî anîne wekî mirovê rast îlan dike.

*"Ji ber kû çawa ji ber mirovekî li peyva wî guhdar nekiribû gelek ji wan hat* ***gunehkarkirin,*** *bi peyva wî guhdarkirina kesekî jî dê gelek ji wan wekî mirovên* ***rast bên hesibandin****."* (Romayî 5:19)

Çawa kû gunehê Adem murderî û mirin afirandiye, mirina Mesîh û vejîna Wî jî pakbûn û jiyan pêk anî.

> *"Çawa kû* ***her kes di Adem de dimire dê her kes di Mesîh de jî bigihije jiyanê."*** (Korîntiyên 1., 15:22)

Dadmendê adil dema kû ji ezmên li rûzemînê temaşe dike, we di *Adem* û gunehkariya wî ya kirêt de dibîne an Xwedê we di *Mesîh* û di wê rastiya Wî ya saf û bêlewt de dibîne?

Dadgeha Bihuştê bijarteyeke sêyemîn nade.

## TENGASİYA DUHÊL A MİROV

Wekî kû di beşa sêyemîn a pirtûka Afirînê hatiye qalkirin, dema Adem û Hewa ji Afirînerê xwe re bêîtaetî kirin, nezanîna duhêl a guneh û şermê anîn ser xwe.

Ji ber ***gunehên*** xwe neçar man xwe veşêrin.

***Şerma*** wan ew rakirin kû tazîtiya xwe bipêçin.

Xwedê ji ber *Edaleta* xwe, pelên hejîran yên kû bi keda xwe ji bo veşartina tazîtiya xwe bi kar anîn, red kir, lê ji ber *Rehma* xwe, ew bi çermên heywanên qurbankirî pêçandin. Xwîna heywanê sembolîze dikir ka ji bo kû ji *gunehê* birevin çi hewce ye, û çermên heywanan jî sembolîze dikirin ka ji bo pêçandina ***şermê*** çi hewce ye.

Em guneh û şerma kalikê xwe hevpar dikin. Em li ber Xwedê gunehkarên qirêj û taziyên ruhî ne. Tişteke pir şerm e lê em ne lihevhatî ne ji bo kû li Huzûra Wî bisekinin. ***Hewcedariya me bi bexşandina Wî û nuwazebûna Wî heye.***

*Tengasiya me ya duhêl* dikare bi du pirsên jêrê bê kurtasîkirin:

1. Em ji guneha kû me ji Afirînerê me vediqetîne, dikarin çawa **xwe paqij bikin**?

2. Ji bo kû em pê re heta hetayê bijîn, em ê çawa nuwazebûnê **li xwe bikin**?

## ŞÎFAYA XWEDÊ YA DUHÊL

Ji bo gunehkarî û kêmasiya rastiya mirov, tenê Xwedê xwedî çareseriyekê ye. bêguneh ê Xwedê, dema li çarmixê Xwîna xwe rijand, ***cezayê me*** *da ser milên xwe*, û ji ber kû Yê kû mirinê feth kiriye ye, *ji me re* ***rastiya Xwe*** *pêşkêş dike*.



*"Xwedê dê yên ji Yê kû Rebê me Îsa ji mirinê vejand bawer dike, fihêlbûyî bihesibîne.* ***Îsa ji bo sûcên me radestî mirinê bû û ji bo fihêlbûna me hat vejandin."*** (Romayî 4:24-25)



*"Kesekî kû di Mesîh de ye, aferîdeyê nû ye; tiştên kevin derbas bûne, her tişt nû ye. Ev hemû ji ber Xwedê ye. Xwedê bi rêya Mesîh em bi xwe re li hev anîn û ji me re peywira lihêvanînê da. Xwedê Mesîhê kû nizanîbû guneh çi ye,* ***ji bo me*** *kir pêşkêşiya gunehê. Wisa kû em* ***bi saya Mesîh bibin rastiya Xwedê."*** (Korintiyên 2., 5:17-18,21)

Dema hûn dev ji baweriya **Xwe** û dînê xwe berdin, û dema hêviya we bibe Mesîh û xwîna Wî ya nuwaze:

1. Dê we ji qirêjiya gunehê paqij bike, û
2. Dê we bi rastiya Xwe ya nuwaze bipêçe.

Rêyeke din a Xwedê tune ye kû guneh û şerma we baş bike.

## BERNAMEYA PEVGUHERTİNÊ YA XWEDÊ

Reb Îsa Mesîh, bi rêya mirin û vejîna xwe *gunehê* me girt û *rastiya Xwe* da me. Bernameya pevguhertinê ya Xwedê wiha ye: ***li hemberî rastiya Wî, gunehê min***.

Yekî çima pêşniyariyeke wisa metelhiştî û mirov heyirî dihêle, red bike?

Rastiya kû mirov xemgîn dike ev e kû, piraniya mirovan redkirina dana Xwedê dipejirînin. Lê belê digel her tiştê, pêşniyara Wî hatiye pêşkêşkirin: her kesî kû diyariya rizgariya Xwedê girtiye, rast hat daxuyankirin. Her kesî kû ev diyarî red kir, berdêla gunehê xwe ne li Arafekê xeyalî û derbasdar, dê li dojeha kû ji bo Şeytan û cinên wî hatiye amade kirin, bidin.

Gelek mirovê dîndar di vê mijarê de israr dikin: "her kes divê berdêla gunehê xwe bide." Yên kû bexşandin û rastiya Xwedê red dikin xwedî vê ramanê ne. Lê dîsa jî ji ber kû deynê vî gunehê heta hetayê ye, dê berdêla wî tu car nekare bê dayîn. Û dema gunehkarên wenda cezaya gunehê xwe di gola êgir de heta hetayê bikêşin, dê tu car rastiya kû ji bo jiyana bihuştê pêwîst e, bi dest nexin. Tenê Xwedê dikare ji gunehkarên neçar re bexşandin û rastiya pêwîst bide kû bi Wî re bijîn.

Sed sal beriya hatina Rizgarker, pêxember Yeşaya der heqê bernameya pevguherîna mezin a Xwedê ev tişt nivîsîn:

*"Em hemû bûn wekî **qirêjan**.*
*Hemû **karên me yên rast wekî cawa qirêj a adetê.***
*Em hemû wekî pezan ji rê derketibûn,*
*Her yekî me vegeriya ser rêya xwe.*
***Dîsa jî Reb cezaya me hemûyan li ser milê Wî kir bar.***
*Ez ê li cem Xwedê kêfxweşiyeke mezin bibînim;*
*Dê dilê min bi Xwedê re coş bibe.*
***Lewre kincê rizgariyê xist ser min,***
***Ez bi xiftanê rastiyê pêçam."*** (Yeşaya 64:6; 53:6; 61:10)

Hûn hê li ber Xwedê dişibin yên *qirêj*? An jî **hûn bi saya xwîna Mesîh hatin paqijkirin**?

Yên kû tazîtiya we dipêçe, *cawên qirêj ên adetê yên rastiya we ne?* An jî *we kincê paqij ê rastiya Mesîh **li xwe kir***?

Her tişt girêdayî bersivdana vê pirsê ye.

*"Kê ji agahiya me **bawer kir**?"* (Yeşaya 53:1)

We ji agahiya Xwedê bawer kir? We hemû tiştên din ên der heqê rastiya Wî de danîn li hêlekê?

**"Jİ BO HÛN BİZANİBİN"**

Peyva Xwedê wiha dibêje: "*Min ev nivîsîn kû bizanibin, hûn ê kû ji navê Xwedê re **îman dikin**, xwedî jiyaneke bêdawî ne*." (Yuhannayê 1., 5:13)

Çend sal berê, bi xanimeke dîndar re der heqê diyariya Xwedê ya jiyana bêdawî de axivîm. Ev xanim, digel kû xwe wekî xirîstiyan bi nav dike, tu car jê bawer nekiribû kû Xwedê bi Mesîh rizgariyê anîbû.

Dema min jê re got, "Ez dizanim kû gava ez bimirim, ez ê biçim bihuştê", hinek hêrs bû û ev bersiv da, "Erê, hûn xwe *ew qas baş* dihesibînin kû hûn dikarin bêjin hûn ê rasterast biçin bihuştê, ne wisa?"

Min got, "Na, ez ê biçim bihuştê, lê ne ji ber kû *ew qas baş im*. Ji ber kû Xwedê *ew qas baş e*. Kû em ji Wî re û ji tiştên kû ji bo me çêkiriye re îman bikin, Ew e ji me re dibêje, "***bizanibin** kû hûn ê xwedî jiyaneke bêdawî bin."*

> *"Lewre heqê gunehê **mirin**, diyariya Xwedê jî li cem Rebê me Mesîh Îsa **jiyaneke** bêdawî ye."* (Romayî 6:23)

## ELÎ ÇAWA ZANÎ?

Min di beşa destpêkê a vê pirtûkê de behsa Elî kiribû kû ji ber kû ji peyama Xwedê bawer kiribû, ji hêla malbata xwe hatibû redkirin.

Dema min ew cara destpêkê dît Elî jî wekî Bruno 26 salî bû. Lê belê dîsa jî Elî ji Brunoyê kû hişê wî li ser kêfê bû, cuda bû û dînê xwe bi dilxwazî pêk anî—bicihanîna duayên rojane wekî diyarkirî, her sal mehekê rojî girtin û ji kesên din re qencîkirin. Lê dîsa jî bêhuzuriyekê hîs dikir kû êş dida mîdeya wî.

Elî şevan nedikarî rakeve û ev difikirî: "Ez peywirên xwe yên dînî pêk tînim—wê demê çima ji bêdawîtiyê ew qas ditirsim? Ax Xwedê, rêyeke tune ye kû bizanibim piştî mirinê ez ê biçim kû?"

Elî ev pirs ji bavê xwe û ji reberên dînî kir, "Ez ê çawa jê

bawer bibim kû dê Xwedê destûr bide kû têkevim Bihuştê?” Her kes wekî tûtî, heman bersiv da: “Tu nikarî bizanî. Tu kes nikare qedera xwe bizane. Tenê Xwedê dizane.”

Bersiva wan têra Elî nekir.

Li malê û li dibistanê ji Elî re ev agahî hatibûn hînkirin: Îsayê Meryem, pêxemberekî rast bû kû ji bakîreyekê hatibû dinyayê. Elî di heman hîn bû kû Îsa xwedê nasnavên wekî Mesîh, *Peyva Xwedê* û *Ruhê Xwedê* ye û pêxemberekî kû mucîzeyan çêdike, ye. Wisa fikirî, “Dibe kû Îsa Pêxember bikaribe bersiva kû ez lê digerim bide min.”

Elî biryar da kû der heqê Îsa de pirtûkek bibîne. Çend hefte bi şûn de em rastî hev hatin. Min eleyeqe germ da Elî û Pirtûkeke Pîroz da wî. Nêzî salek bi şûn de piştî kû lêkolîna Pirtûka Pîroz kir, em binêrin ka çi kifş kiriye:

> “Ez hîn bûm kû hemû pêxember Îsa nîşan didin. Min beşa kû Îsa Bixwe dibêje: ***Rê, Rastî û Jiyan Ez im,*** *Bêyî alîkariya min tu kes nikare bê cem Bav… Ez ji we re rastiyê bêjim, yê kû dengê min dibihîze û ji Yê kû Ez şandim re îman dike,* ***xwedî jiyaneke bêdawî ye. Yekî wisa nayê darizandin****, ji mirinê derbasî jiyanê bûye*.” (Yuhanna 14:6; 5:24) xwend.
>
> Ev û ayetên din alîkarî min bûn kû ew Wî qebûl bikim û fam bikim ka Îsa kî ye: yek Rizgarkerê kû ji mirinê vejiyaye û ji bo rizgariyeke teqez xwîna xwe rijandiye! Min ji ber kû ketiye şûna min û ji bo gunehên min êşaye û miriye, jê re îman kir.
>
> Dema min îman kir, min huzûreke wisa hîs kir kû min berê qet hîs nekiribû. Çi guherîneke mezin! Ez êdî qedera xwe ya bêdawî nafikirim û xem nakim, lewre ez dizanim kû Reb cezayên gunehên min ên kû ez mehkûm kirime, bi tevahî daye. Niha, ez dizanim, ne ji ber başbûna min, ji ber kerema Xwedê ya kû ji Mesîh re daye ez ê biçin bihuştê. Niha ez dixwazim Xwedê di her mijarê de razî bikim, lê ne ji ber kû

> rizgariya xwe bi dest bixim, ji ber kû Xwedê ez xilas kirim û dilê min guherand, dixwazim."

Ji bo Elî laneta gunehê berevajî bibû. Îro ew, hevjina wî û wî ne tenê dizanîbûn piştî mirinê dê biçin kû, di heman demê de dizanîbûn ka ji bo çi hatine cîhanê: naskirina Afirîner — Rizgarkerê wan, jê hezkirin û jê re xizmetkirin û mirovên din jî beraliyê nasîna Wî kirin.

## MİRİN: XULAMÊ YÊ Bİ ÎMAN

Mesîh dema cara pêşîn hat serzemînê, beşa destpêkê a plana sê ast a Xwedê ya kû ji bo berevajîkirina laneta gunehê çêkiribû, pêk anî. Îsa bi rêya jiyan, mirin, veşartin û vejîna xwe dîwara mirinê û gunehê ya kû wisa xuya dibe kû nikare jê derbas bibe, qul kir. Rêbirê li çarmixê, yên hov, Emma, Saul, Eli, Bruno û kesên kû rastiya peyama Xwedê qebûl kirin, ew kes in kû dê ji vê peyamê sûd bigirin.

Mirinê zalim û zordest, ji bo biîmanên Mesîh, bû xizmetkareke dilnizm a kû dê bi fermana Xwedê deriyê bihuştê veke. Nivîsên Pîroz wiha dibêjin: "***Mirina** evdên dilsoz ji bo Reb **hêja** ye*."[239] (Mezmûr 116:15)

Xeyala wê jî ne mimkin bû kû peyva "*hêja*" ji bo diyarkirina "*mirinê*" bihata bikaranîn. Lê hemd ji Xwedê re, em êdî dikarin ev biwêj ji bo kesên kû îman dikin, bi kar bînin.

> *"**Ya mirin, striyê te li kû ye**? Ya mirin ka serkeftina te?... hemd ji Xwedê re kû bi rêya Rebê me Îsa MesÎh em gihandin serkeftinê!"* (Korîntiyên 1., 55, 57)

Laneta paşerojê ya gunehê hatiye berevajîkirin.

# 28

# Qonax 2: Bernameya Xweda Ya Niha

*"Ez ê zagona xwe* ***têxim nava (mêjiyê) wan,***
***Ez ê li ser dilê wan*** *binivîsim."*

—REB (Yeremya 31:33)

Gelek kes li ser *laneta mirîtokî* ya gunehê zêde nasekine, lê gelek kes jî dibin êsîrên tiştên kû wekî *lanetên rojane* yên jiyanê tên binavkirin.

Piraniya hejmara dinyayê di nav tirsa qeza, nexweşî û mirinê de dijîn. Piraniya mirovan xem dikin, ji ber kû xwarin bistînin û deynê xwe bidin têra wan perê wan tune ye. Hin mirov jî ji bextreşî, sêrbazî û nezerê ditirsin, dema kêfxweş bin vê kêfxweşiya xwe bi dengekî bilind nayînin zimên, lewre kû ruhê xirab kêfxweşiya wan bibihîze, difikirin kû dê ji tişta kêfxweşiya wan re zerarê bide. Hin kes ji bo kû ruhên xirab û qeda û belayan der bikin, nivişk çêdikin li ser mala xwe, li ser zarokên xwe û li ser xwe. Gelek kes ji bo parastinê avên xwendî vedixwin.[240] Hemd ji Xwedê re kû kesên ji Xwedê bawer dikin, hewce nabînin tiştên wisa bikin, lewre Ew ji xeyala dijmin an jî ji hêzên xirab ên rastî bi awayekî bêdawî mezintir e. Ji bo bo bi îmaneke tiştek kû jê bitirse tune ye, lewre Reb Îsa, mirin jî tê de li ser her hêzê xwedî rayeyekê ye.

Îsa bi dayîna berdêla gunehê, tenê ji bo berevajîkirina laneta kû li ser *qedera me ya bêdawî* bandor dike nehat, di heman demê

de ji bo berevajîkirina laneta kû li *ser jiyana me ya rojane* jî bandor dike, hat.

## BEREVAJÎKIRINA LANETÊ: QONAX DU

Nivîsên Pîroz wiha dibêjin: "*Berxikên min, hûn ji Xwedê ne û we pêxemberê sexte têk bir. Lewre ya **cem we raserê** ya dinyayê ye*." (Yuhannayê 1., 4:4)

Ev ê di "*Bi îmanê de ye*" kî ye?

Îsa, şeva beriya kû hate çarmixkirin, ji xwendekarên xwe re wiha got:

> *"Ez ê jî ji Bav lave bikim. Ji bo kû **heta hetayê** bi we re be, dê ji we re **Alîkarekî din**, **Ruhê Rastiyê** bide. Dinya nikare Wî qebûl bike. Lewre ne Wî dibîne, ne jî nas dike. Hûn Wî nas dikin. Lewre **Ew di nav we de dijî û dê di nav we de be.***
>
> *Ew ê we sêwî nehêlim, ez ê dîsa **li we vegerim**.*
>
> *Hê dema ez di nav we de bûm min ev ji we re gotin. Lê **Alîkar, Ruhê Pîroz** ê kû Bav dê **li ser navê min** bişîne, dê her tiştê hînê we bike, her tiştê kû min ji we re gotin bîne bîra we. Ez selametî didim we, ez selametiya Xwe didim we. Ez mîna ya kû dinya da we, nadim we. **Bila bêhna we teng nebe û netirsin.**"* (Yuhanna 14:16-18, 25-27)

## ALÎKAREKÎ DİN

Îsa ji xwendekarên xwe re soz da kû piştî vegerîna ezmanan dê Bav ji wan re "***Alîkarekî din**... Ruhê Pîroz*" bişîne.

Peyva *parakletosa* Grekî ya kû bi Îngîlîzî wekî *alîkar* hatiye wergerandin, tê wateya *alîkar, yê dilmînî dide, şîretker* an jî *parêzer*. Peyva *parakletosê*, di Nivîsên Pîroz de hem wekî *Xwedê* hem jî wekî *Ruhê Pîroz ê Xwedê* te bikaranîn. [241] Kur hat kû gunehkaran ji *cezaya* gunehê rizgar bike, Ruhê Pîroz jî hat kû gunehkaran ji *hêza* gunehê rizgar bike.

*Ruhê Pîroz* wekî *Kur* her tim bi Xwedê re bûye. Ji ber vê, li

rêzên destpêka pirtûka Xwedê wekî "*Ruhê **Xwedê***" tê binavkirin. (Afirîn 1:2)

Wekî gelek kesên[242] kû dibêjin "*Alîkar, Ruhê Pîroz*" milyaket Cebraîl an jî pêxemberekî kû dê piştre bê ye, hem ji Nivîsên pêxemberan re hem jî ji gotin û kirinên Îsa re hember derketin e.

Îsa piştî kû li çarmixê mir û dîsa vegeriya jiyanê ji xwendekarên xwe re got, ji bo kû Ruhê Pîroz dakeve jêr û li dilê her kesê kû ji peyama Xwedê re îman dikin avahî çêke, dê derkeve ezmanan. Dê Kur derkeve jor û Ruh daketa jêr. Îsa ji xwendekarên xwe re wiha got: "*Ez ji we re rastiyê dibêjim, çûyîna min ji bo we baş e. Kû ez neçim dê **Alîkar** neyê. Lê **kû ez biçim, ez ê Wî ji we re bişînim.***" (Yuhanna 16:7)

Di dîrokê de heya vê demê, Ruhê Pîroz dem bi dem ji bo kû wan xurt bike, ji wan re rêberiyê bike û wan bi bereket bike, bi biîmanan re bibû. Lê belê dîsa jî hatina Ruhê Pîroz kû her tim bi biîmanan re bijî, piştî kû Îsa pirsgirêka gunehê çareser kir, çêbû.

Reb Îsa bûyereke pir girîng daxuyanî dikir. "*Ruhê Rastiyê... di nav we de dijî û **dê di nav we de be.***" (Yuhanna 14:17)

## HATINA RUHÊ PÎROZ

Piştî kû Îsa ji mirinê vejî, di Nivîsan de ev tomar heye:

> *"Îsa dema bi xwendekarên xwe re bû, ji wan re ev ferman dabû: 'Ji Yeruşalimê veneqetin, bimînin li bendê kû **peyva** kû **Bav da** û we ji min bihîst pêk bê. Her wiha, Yehya bi av îmad kir, lê hûn ê heya çend rojan bi Ruhê Pîroz bêne îmadkirin... **lê dema Ruhê Pîroz bê ser we hûn ê xurt bibin. Hûn ê li Yeruşalimê, li hemû Cihûdayê û li Samiriyeyê û li** çar **aliyê dinyayê bibin şahidên min.**"*
>
> (Karên Şandiyan 1:4-5,8)

Ev peyv, pêncî roj piştî vejîna Îsa, deh roj piştî derketina Wî ya ezmanan, li Roja Pentikost pêk hat.[243]

*"Dema Roja Pentikostê hat, hemû biîman di nav hev de bûn. Ji nişka ve ji ezmanan dengekî mîna yê bayî hat û mala kû lê bûn bi temamî dagirt. Tiştên kû mîna zimanên ji êgir belav bûn û daketin li ser her tiştê.* ***Yên biîman bi Ruhê pîroz hatin dagirtin…"*** (Karên Şandiyan 2:1-4)

Peymana Nû, temamiya bûyera dramatîk a beşa 2. a Karên Elçiyan tomar dike. Xwendekarên Îsa bi rêya hêza Ruhê Pîroz ji biyaniyên kû ji Asya, Erebîstan û ji herêmên din ên dinyayê hatine Yeruşalimê û bi zimanên cuda diaxivin re agahiya baş a Xwedê dan zanîn.

Di wê sê roja kû Ruhê Pîroz daket, sê hezar kes ji peyama Xwedê bawer kir û diyariya wî ya jiyana bêdawî girt. Hejmara biîmanan bi lezayî mezin bû.

Karên Şandiyan dîroka biîmanên pêşîn tomar dike û rave dike ka çawa agahiya baş a Mesîhê zindî li hemû Împaratoriya Romayê ne bi zora şûran, lê bi hezkirina Xwedê û bi hêza Ruhê Pîroz belav bû.

## KESÊN KÛ Jİ BO PEYWİRÊ TÊN GAZÎKİRİN

Bernameya bingeh a Xwedê ya serzemînê a der heqê dema niha de "*ji neteweyên din ji bo navê xwe (aîdê xwe) gelekî derxistin bû.*" (Karên Şandiyan 15:14).

Ruhê Pîroz dema Roja Pentikostê hat, malbateke taybet a biîman a kû wekî *dêr* tê binavkirin jî derxist. *Dêr* di orîjînala Grekî de *ekklesia* ye; tê wateya "civîn" an jî "yên kû ji bo peywirê tên gazîkirin". Îro peyva "dêrê" bi têgînên xelet û bi mezhebên nemimkin tên tevlihevkirin. Yên kû xwe wekî Xirîstiyan bi nav dikin, bi şêwaza jiyana xwe re navê Mesîh bi aşkerayî biçûk dikin. Dikarin xwedî *dînekî* bin, lê bi Xwedê re ne xwedî *têkiliyeke* jidil in. Ev kes bi rêya îmana ji xwîna Îsa re tu car ji xwîna xwe nehatine paqijkirin.

Agahiya baş hemû mirovên li her derê vedixwîne kû ji Xwedê bawer bikin, bila bibin aferîdeyê Wî yê nû û li cem malbata

biîman a kû dê bêdawîtiyê bi Wî re derbas bikin, bibe ewlad.

Yên kû *beriya hatina Îsa* (di dema Peymana Kevin de) ji wehdên Xwedê bawer kirine, beşeke malbata Xwedê ne, lê yên kû tenê *piştî hatina Îsa* ji van wehdan bawer kirine, parçeyeke organîzmaya bi navê “dêr” a kû dijî, ne. Dêr di heman demê de wekî “*bedena Mesîh*” û “*bûk*” jî tê binavkirin.[244] Nivîsên Pîroz, ji her kesî kû ji Reb Îsa Mesîh bawer dikin, wiha dibêje:

> *“Lê hûn ... **hûn gelê heq ê bijartî yê Xwedê ne** kû we ji tarîtiyê ji bo roniya xwe ya metelhiştî hatine gazîkirin kû fezîletên Wî bidin zanîn. Hûn demekê ne gel bûn, lê niha hûn gelê Xwedê ne.”* (Petrûsê 1., 2:9-10)

Beşên destpêkê û duyemîn ên Pirtûka Pîroz rave dike ka Xwedê di serîe de mirovan çawa wekî *gelê xwe yê heq* afirand. Beşa sêyemîn tomar dike ka Adem çawa guneh kir û xwe û hemû nifşa mirovan çawa ji Xwedê dûr xist. Lê dîsa jî Nivîsên kû vê beşê dişopînin, rave dikin ka Xwedê ji bo kû gelê Wî yê qirêj dîsa bibin “*gelê Wî yê heq*” çi kir.

Hûn parçeyeke *gelê heq* ê Xwedê ne? Kû hûn wisa ne, naxwe hûn di qonaxa duyemîn a bernameya Xwedê ya kû ji bo berevajîkirina lanetê amade kiriye de cih digirin.

## RİZGARKİRÎ Û MORKİRÎ

Ruhê Pîroz ji gunehkarekî kû diyariya rizgariya Xwedê girtiye re destpêkê jiyana nû dide. Kesên kû ji xwe û ji keda xwe bawer dikirin, kû êdî ji Îsa Mesîh û çalakiya Wî ya rizgariyê bawer bikin, bi rêya Ruhê Pîroz ji nû ve têne dinyayê.

Îsa wiha got:

> *“Yê ji bedenê tê dinyayê, beden e. Yê ji Ruhê tê dinyayê, Ruh e. Dema ez ji te re dibêjim, **‘Divê hûn ji nû ve bêne dinyayê’** heyirî nemîne ... Lewre Xwedê ji dinyayê ew qas hez kir kû Xwe yê yekane da wê. **Her wiha, bila yên***

> ***kû ji Wî re îman dikin mehv nebin, bila hemû bigihijin jiyana bêdawî.*** *"* (Yuhanna 3:6-7,16)

"*Ji nû ve hatin dinyayê*" çi tişteke xweş e! Dema gunehkarekî wekî ruhî ji nû ve tê dinyayê, ev karê wî yê nav yekîtiya wî ya yekbûyî ye. Ji ber kû *Bav* xwe şand, *Kur* ji bo gunehê Xwîna xwe rijand û *Ruhê Pîroz* bi jiyana nû kete nav yê biîman, jiyana nû mimkin e.

Ruhê Pîroz ji me re tenê jiyana bêdawî nade; Ew, me heya bêdawiyê mor dike, me wekî milkê Xwedê nişan dike û heta hetayê di nava me de avahî çêdike. Di heman demê de Ruhê Pîroz dema wextê me yê ji dinyayê veqetînê bê, me ewledar dike kû em ê bi awayekî ewle biçin mala Bav.

> *"Dema we agahiya rastiyê, Mizgîniya rizgariya xwe bihîst û ji Wî re îman kir,* ***hûn ji bi Ruhê Pîroz ê wehdkirî re di Wî de hatin morkirin … Ruh, ewledariya mîrasa me ye.*** *"*
> (Efesî 1:13-14)

Tu tişt nikare bibe asteng ji bo yekî biîman kû rizgariya bêdawî wenda bike. "*yê kû rizgariya bêdawî* ***ewle dike*** *... Ruhê Pîroz e*."

## EM Jİ BO KÛ DÎSA GUNEH BİKİN HATİN AZADKİRİN?

Carinan ez dibihîzim kû mirov bi awayekî henekî ev pirs dikin: "Baş e, ji bo kû ez ji xwe re li Bihuştê cihek peyda bikim, divê ez jê bawer bikim kû Îsa ji bo gunehên min miriye. Naxwe ez dikarim dîsa guneh bikim, ne wisa?"

Ev vê heman mantiqê bi kar bînin, ger hûn li axeke ziwa bi awayekî neçar wenda bibin, kû yekî we bifilitîne, hûn ê bêjin, "Spas! Ez niha ji bo wendabûnê dîsa azad im!" bêjin?

An jî kû yekî deynê xwe yê li ser we bibexşîne, hûn ê tiştên kû jê bixeyide, bikin an jî bixwazin bi zanebûn bikin?

An jî bifikirin kû we kincên paqij û ûtîkirî li xwe kirine, hûn ê bêjin, "Pir baş e! Niha dikarim biçim li cihekî qirêj û herî rakevim"?

Fikrên wisa ne mimkin in.

Naxwe Adem û zarokên wî çima derbarê guneh û encamên gunehê de wiha bifikirin?

Bersiv bi awayekî xemnak zelal e. Guneh mêjî û dilê me bi awayekî xurt girtiye, wisa kû ev girtin wisa zêde bûye kû dikare me der heqê başbûn û daxwastina gunehê de îqna bike. Fikreke wisa ne nû ye. Di heman demê de Adem û Hewa jî guneh– fêkiya qedexekirî jê kirin– "*ji bo kû zana bibin* ***balkêş***" dîtin (Afirîn 3:6).

Tişta kû divê mirov têgihije ev e: dema gunehkarekî ji peyama Xwedê bawer bike, ***êdî*** çola gunehê *ne wenda ye*. Heqê vê deynê bargiran *hemû hatiye dayîn*. Yê bi îman niha bi rastiya xwerû ya Mesîh *hatiye pêçandin*.

*Ruhê Pîroz* baweriyeke *pîroz* dixe nav dilê zarokekî nûzayî kû guneh ne tişteke baş e, lê tişteke xirab e. Ji gelê Xwedê re zehmetiyê derdixe dema jiyana xwe bi ve beyandina karakter û tevgera *pîroz* a Xwedê berdewam dikin. Zarokên Xwedê yên kû ji nû ve têne dinyayê, wekî endama malbata ezmanî dê bixwazin jiyaneke li gorî rûmeta malbatê bijîn.

Yên biîman guh nadin Ruhê Pîroz û bi şêwaza xwe ya jiyanê Reb birûmet nakin, lê di nav hemû bi îmanên rast ên Mesîh ev Mêvanê ezmanî dijî. Ji ber vê Nivîsên Pîroz ji kesên kû ji bawer dikin re ev şîret dike:

> *"Ruhê Pîroz ê Xwedê* ***xemgîn nekin****. Hûn ji bo roja rizgariyê hatin* ***morkirin****."* (Efesî 4:30).

Bi îmanên Reb Îsa rizgariya kû bi rêya îmanê girtin tu car wenda nakin, lê dikarin wekî bêîmanan bijîn û "*dikarin Ruhê Pîroz ê Xwedê aciz bikin*." Gelê Reb êdî **di nav** dinyayê de be jî êdî *"çawa kû (Ew) ne ji dinyayê ye, ew jî ne ji dinyayê ne."* (Yuhanna 17:16)

Reb Îsa çawa ji tiştên kû xwedê nas nake nefret dike, divê xwendekarên Wî jî bi heman awayî tevbigerin.

*"Naxwe em çi bêjin? Ji ber kû kerem zêde bibe, em berdewamî gunehê bikin? **Teqez na**! Em ên kû li hemberî gunehê mirine, êdî çawa nav gunehê de bijîn?"* (Romayî 6:1-2)

*"**Ji ber vê dilxwaziyên dinyewî yên bedenê** – fuhûş, qirêjî, şehwet, daxwazên xirab û çavbirçitiya kû bi pûtperestiyê di heman nirxê de ye **bikujin**. Ji ber van, xezeba Xwedê tê ser yên kû guh nadin Wî. Berê dema hûn jî bi van re jiyan, hûn jî di vê rê de meşiyan. Lê niha, hêrs, acizî, nêta xirab, van hemûyan ji ser xwe bavêjin. Bila ji devê we tu îftira an jî peyveke bêedeb dernekeve. Derew nekin ji hev re. Lewre we **xûya kevin** bi tiştên xirab re **ji ser xwe avêtin**. Ji bo bigihijin agahiya bêkêmasî, ji bo bibin **wekî Afirînerê** Wî we afirîna nû li xwe kir."* (Koloseyî 3:5-10)

## JİYANA XWEDÊ YA Lİ CEM KESÊ Bİ ÎMAN

*Xwedê* çawa kû ji bo gunehkaran ji *cezaya gunehê* rizgar bike hatiye, bi heman awayî *Ruhê Pîroz* jî ji bo kû bi îmanan ji *hêza rojane ya gunehê* rizgar bike, hatiye.

Em lê binêrin ka Ruhê Pîroz di vê mijarê de çawa dixebite:

Dema kesekî ji Mesîh bawer bike, Ruhê Xwedê ji bo kû di ruhê wî de, di nava wî de bijî tê û di nav wî de serweriya Wî saz dike. Ruhê Pîroz ji yê biîman re xwezayeke nû dide kû *bixwaze* Xwedê razî bike. Ew rewş nayê wê wateyê kû xwezaya wî ya biguheh û xwebîn wenda dibe. Dê xwezaya kevin tenê dema biçe Bihuştê wenda bibe. Yên bi îman di vê dinyayê de nikarin bigihijin asteke bêguneh a nuwaze. Lê dîsa dema nekarin razî bikin, divê xemgîniyke kûr hîs bikin.[245]

Di jiyana her biîmana rast de, di navbera xwezaya kevin (ya kû ji Adem hat girtin) û ya nû (ya kû ji hêla Ruhê Pîroz hat çinandin) de her tim şerekî heye. Ruhê Mesîh ê kû di biîmanê de avahî saz kiriye, ji dilê yê biîman re daxwazake dide Xwedê razî bike. Digel kû Ruhê Pîroz ji gelê Xwedê re guneh "*zewqa*

***demkî***" (Îbranî 11:25) dide, ji wan re hîn dike kû, "*dawiyê tiştên wisa mirin e … lê niha **ji gunehê hatine azadkirin … fêkiyên wan pîrozkirî ye***" (Romayî 6:21-22) Ruhê Pîroz di nav yê biîman de guherînên mezin çêdike.

> *"Zada Ruhê jî:*
> *Hezkirin, dilxweşî, selametî,*
> *sebr, dilovanî, qencî,*
> *girêdayî, başîtî û venêrîna xwe ye.*
> *Zagoneke kû wesfên wisa qedexe dike, tune ye."*
> (Galatyayî 5:22-23)

Dînên kû kedên mirovan bixwe dixwaze, nikarin fêkiyên ruhî çînin. Zagonên dînî tevgera *derveyî* ya kesekî heya cihekî bikare biguherîne, tenê Ruhê Pîroz dikare xwezaya *hundirîn* a biguherîne.

Xwedê dixwaze jiyana we bi serweriya Xwe bi rê ve bibe. Xwedê li şûna kû ji we re lîsteya rêzikan bide kû hûn bişopînin, jiyana Xwe dixe nav we û bi rêya we mirovên din bi bereket dike û bilindahiya Navê xwe dide zanîn.

## LÎSTE AN HEZKİRİN?

Ev çîrok der heqê zilamekî kû jina wî miriye de ye. Mêrebî xanimek digire kû di hefteyê de sê roj bê mala wî paqij bike û cil bişo. Zilam, dema jin tê lîsteyek daliqîne ser sarincê kû tê de karên kû divê bike hatine nivîsîn. Û, belê, zilam heqê wê dide.

Demek bi şûn de zilam evîndarê wê dibe û jê re dibêje kû bila bi wî re bizewice. Jin qebûl dike. Piştî kû dizewicin zilam lîsteya peywiran a ser sarincê radike. Di heman demê de dev ji dayîna heqê wê yê fermî jî berdide. Çima? Lewre xanima kû mala wî paqij dike bûye hevjina wî! Ev jin niha bi dilxwazî malê paqij dike, cilan ji ber kû dixwaze dişo û gelek karên din jî dike kû tu car di *lîstê* de tune bûn. Çima? Lewre ji mêrê xwe *hez dike* û dixwaze wî razî bike û jê re xizmet bike. Ev rêzikên ser sarnicê niha li ser dilê vê *xanimê* hatine nivîsîn.

Xwedê ji bo kesên kû aîdê Wî ne heman tişt dike.

> *"Ez ê zagona xwe têxim **nava (mêjiyê)** wan û ez ê li ser **dilê** wan **binivîsim**. Ez ê bibim Xwedayê wan, dê ew jî bibin gelê min."* (Yeremya 31:33)

Mîna lîsteya ser sarnicê, ***dînê*** mirov peywirên kû divê hûn bikin pêşkêşî we dike, û kû "Xwedê bixwaze", ji we re wehd dike kû dê berdêla keda we înşela li Roja Darizandinê "bê dayîn."

Li dijî vê Reb, di nav dijberiyeke ezmanî de, ***têkiliyeke*** bi xwe re pêşkêşî we dike. Xwedê tenê cezaya we ranekiriye û jiyaneke bêdawî pêşkêşî we nekiriye, di heman demê de kû hûn pêşniyara Wî qebûl bikin, dixwaze bi Ruhê xwe yê Pîroz bê û di nav we de bijî.

Xwedê li şûna kû lîsteyeke kû tê de peywirên kû hûn tu car nikarin bikin hene, bide ji we re wehd dike kû dê *daxwaz* bide kû Wî razî bikin û ji Wî re *bi dilekî hezkirin* xizmetê bikin. Têkiliyeke hezkirinê, ji bo karên baş ji lîsteya rêzikên dînekî û ji zagonên wî motîvasyoneke çêtir derdixe. Lewre:

> *"... **hezkirin**, pêkanîna zagonê ye."* (Romayî 13:10)

Dîn dikare ji we re jiyaneke nû û li Bihuştê cihekî *wehd bike,* lê yê kû bikaribe van pêk bîne tenê Ruhê Pîroz e. Tenê Ruhê Pîroz dikare we bi hezkirin, kêfxweşî, selametî û baweriya bêdawî dagire.

> *"Hêvî, di ber de nahêle, **hezkirina kû bi rêya Ruhê Pîroz ji me re hatiye dayîn, ketiye dilê me.**"* (Romayî 5:5)

## ÎTAETKİRİNA Bİ KÊFXWEŞÎ

Wateya rastiya kû mirov ji Reb û ji mirovan re bi dilekî kû bi hezkirina Xwedê hatiye dagirtin, xizmet dike, bêguman nayê wê wateyê kû fermanên divê îtaet bikin, e. Mînak, Îsa tam dê vegeriya esmên, ji xwendekarên xwe re wiha got:

> *“Li ezman û serzemînê, hemû raye ji min re hat dayîn. Ji ber vê herin,* ***hemû neteweyan*** *wekî xwendekarên min bigihînin; wan bi navê* ***Bav****,* ***Kur*** *û* ***Ruhê Pîroz*** *îmad bikin. Hînê wan bikin kû bila* ***guh bidin hemû*** *fermanên min. Va ye Ez, heya dawiya dinyayê bi we re me.”*
>
> *(Matta 28:18-20)*

*Îsa ji alîgirên xwe re ferman kir kû agahiya rizgariye bila bidin “hemû neteweyan”.* Piştî kû kesekî diyariya Xwedê girt, diviyabû ew hîn bikin kû *guh bide her tiştê* kû Îsa ferman dike. Mînak, Îsa ji xwendekarên xwe re hîn kir kû bila ji dijminên xwe hez bikin û ji her kesê re bi kêfxweşî xizmetê bikin. Azweriya piştgirên Mesîh ew bû kû Xwedayê yek ê rast bê nasîn, jê bê bawerkirin û li her derê dinyayê pesna Wî bê dayîn.

*Îsa ji xwendekarên xwe re di heman demê de got bila biîmanên nû “bi navê Bav, Kur û Ruhê Pîroz” îmad bikin. Li vir li şûna “navên wan” (pirjimar), “bi* ***navê*** *Wî”* (yekjimar) hatiye bikaranîn. yên kû xwe wekî gunehkarên neçar dibînin û yên kû ji agahiya baş a jiyan, mirin û vejîna Îsa bawer dikin dê bi Xwedayê kû Bav, Kur û Ruhê Pîroze re xwedî têkiliyeke bêdawî bibin.

Yên kû ji peyama Xwedê bawer dikin, îmana xwe li çemekî an jî li kurtikeke avê wekî îmad nîşan bidin.

## ÇİMA ÎMAD?

Hewce ye kû yekî biîman ji bo kû ji gunehê bê paqijkirin, bi awayekî merasîmî têkeve bin avê? Na, yê bi îman, jixwe bi saya kirinên xwe yên kû bi rêya mirin û vejîna Îsa kirine, ji hêla Xwedê hatiye paqijkirin û rast hatiye daxuyankirin. Îmada avê, sembola derveyî ya rastiya hundirîn e. Piştî kû carek em ji peyama Xwedê re îman bikin, em divê ji Rizgarker û Mîrê xwe re *îtaet bikin û îmad bibin, lê tişta baş a kû me ji bo têketina bihûştê li hev tîne, ne îmadeke wisa ye.*[246]

Wê demê îmad tê çi wateyê? Îmada avê bi awayekî dîtbarî sembolîze dike kû yekî biîman bi mirin, veşartin û vejîna Reb Îsa wekhev bûye. Îmada avê ji yê bi îmanan re rêyek e kû îmana

xwe ya ji plana rizgarî ya Xwedê bidin zanîn. Av, mirinê temsîl dike. Dema yekî dikeve bin avê dibêje, *"Îsa ji bo gunehên min mir û hat veşartin." Û ew kes dema ji avê derkeve dibêje, "Îsa ji bo min mirin têk bir. Mirin, veşartin û vejîna Wî ji bo min bû, ez ji gunehê hatim paqijkirin, rast hatim îlankirin û ji min re jiyana bêdawî hat dayîn."*

Di vê mijarê de nekevin şaşîtiyê. Qebûlkirina gunehkarekî di huzûra Xwedê de, tenê bi rastiya nuwaze ya Îsa Mesîh û karê Wî yê temamkirî dikare mimkin be. Ez, wekî gunehkarî bexşandî, dizanim kû hete hetayê ez ê bi Reb re bijîm. Lê sedema vê ne kû ez baş im. Ez ê bi Wî re heta hetayê bijîm, lewre *"Ez ne di rastiya kesane ya kû pişt dide Zagona Pîroz de bibim, ez bi xwedîbûna rastiya kû bi îmana Mesîh tê bi dest xistin û* ***piştî*** *îmanê* ***ji Xwedê tê re****, di* ***Mesîh*** *de bibim."* (Fîlîpîlî 3:9)

Dînên mirovan we hîn dike kû hûn li xwe û li kedên xwe binêrin. Mizginiya Xwedê jî, ji we re hîn dike kû hûn li Mesîh û rastiya Wî ya bêqusûr binêrin.

## JÎ BO YÊ BÎ ÎMANAN DARAZ TUNE YE?

Rastiya kû Mesîh ji bo kû gunehkaran ji daraza bêdawî bifilitîne her tişt kiriye, dibe sedem kû di mêjiyan de pirseke din derkeve. Yek ji peyama elektronîk şand ev pirs kir:

> Posteya Elektronîk
>
> Ger Îsa ji bo kû mirovan ji gunehê rizgar bike li çarmixê xwîna xwe rijandiye, ev rewş armanca roja darizandinê ji holê radike?

Na, mirina Îsa ya li çarmixê, rastiya yên bi îmanan kû divê ji Xwedê re der heqê xwe de hesab bidin, ji holê ranake. Nivîsên Pîroz wiha dibêjin: *"Lewre* ***dema darizandinê ya kû Xwedê dê ji gelê malê dest pê bike,*** *hatiye. Ger darizandin destpêkê ji me dest pê bike, dê dawiya yên kû guh nadin Mizginiya Xwedê bibe çi?"* (Petrûsê 1., 4:17)

## DU ROJÊN DARİZANDİNÊ

Nivîsên Pîroz, di pêşerojê de, ji du Rojên Darizane yên kû ji hev yekcar cuda ne, behs dike. Destpêkê, *dê vejîn û daraza rastiyan, wekî dawî jî vejîn û daraza gunehkaran* bibe.[247]

• **Darizîna rastiyan:** *Hûn ê bixwazin* di vê Roja Darizandinê de cih bigrin. Dê ji yên kû li ber *Kursîya Darizandinê ya Mesîh* in, neyê pirskirin kû dê bihuştê an dojehê bêne şandin. Dema li serzemînê dijîn, ji ber kû diyariya rastî ya Xwedê digrin, jixwe dê li bihuştê bibin. Lê belê dîsa jî, dê li gorî nirxa karên xwe, li gorî nirxa Xwedê an dê xelat bistînin an jî têk biçin.Biîmanê kû li gorî daxwaza Xwedê jiyaye, ji mirovên din re bi dilnizmî xizmet kiriye, di ceribandinan de ji Xwedê bawer kiriye, ji peyva Wî hez kiriye û ragihandiye kesên din û bihêvî li benda hatina Reb maye, dê xelat bistîne; lê biîmanê xweperest jî, *"dê zerar bike, dê bixwe xilas bibe, lê dê bibe wekî kû ji êgir derbas bûye."* (Korîntiyên 1., 3:11-15) Pirtûka Pîroz dinivîse kû yên biîman dema Reb biperêsin dê pênc *"tacên"* cuda li ber piyên Wî bêne avêtin û her yek dê ji wan tacan bigrin.[248] *"Em ê **hemû** derkevin ber kursiya darizandinê ya Xwedê ... **Em her yek** dê li ser navê xwe ji Xwedê re hesab bidin."* (Romayî 14:10,12)

• **Darizandina gunehkaran:** *Hûn ê nexwazin* li vê Roja Darizandinê ya kû wekî *Textê Darizandinê yê Mezin û Spî* yê kû mirov ditirsîne, bibin. Ev bûyera kû mirov ditirsîne dê ji hêla kesên kû dema li serzemînê ne ji rizgariya Xwedê bawer nakin û ji ber vê di nav gunehê xwe de dimirin ve bê jiyîn. Dê qet pirs neyê kirin kû dê ev kes biçin bihuştê an dojehê. Her yek digel kû dê li gorî kirinên xwe cezayên cuda bigrin, dê hemû jî mehkûmî gola êgir bibin. *"Mirî li gorî nivîsên pirtûkan, **her yek li gorî kirinên xwe** hatin darizandin. Piştre Mirin û Warê Miriyan li gola êgir hatin avêtin. Va ye ev gola êgir, mirina duyemîn e. Yên kû navên wan li se Pirtûka Jiyanê nehatine nivîsîn, li gola êgir hatin avêtin."* (Wehî 20:11-15)

Agahiya baş ew e kû dê kesên kû ev peyv dixwînin mehv nebin, lewre Reb Îsa ji cezaya gunehê her kesî azad dike.

## ZAROKÊN XWEDÊ

Wekî kû berê hatiye diyarkirin, dema kû hûn ji Reb Îsa Mesîh û ji kirinên Wî bawer bikin, hûn ê bibin yek ji endama malbata Xwedê.

*Êdî Xwedê ji we re dûr xuya neke.*

Dê bibe *Bavê* we.

> *"Ji kesên kû Ew qebûl kir re* ***ew maf da kû bibin zarokên Xwedê … ew ji Xwedê çêbûn***." (Yuhanna 1:12)

> *"Ji ber kû* ***hûn n Wî ne, Xwedê Ruhê xwe yê heq yê kû dibêje 'Abba! Baba!'*** *şand dilê we."* (Galatyayî 4:6)

Dinya bi dînên kû ji mirovan dûr e, merasîman dixwaze, ji mirovan re Xwedayekî kû bi Wî Bixwe re tu têkilî tune ye xêz dike re tijî ye. li hemberî van hemûyan, Xwedayê kû xwe dişîne serzemînê, Xwe wekî Bavekî ezmanî yê kû ji gunehkaran hez dike, daxuyan kiriye. Ji her kesî kû Wî Îsa Mesîh qebûl kirine re wehd dike kû, dê wan paqij bike, dê nuwazebûna Mesîh li wan ke û Ruhê Xwe yê Pîroz bişînê dilê wan.

Belqis Şêxa Pakîstanî di pirtûka xwe ya *Min Wêrî kû jê re bêjim Bavo* (Bi Tirkî wekî "Tanrı Bana "Kızım" Dedi *(Xwedê ji min re got 'Keça Min)* hat wergerandin) de lêkolîna xwe ya kû peyama Xwedayê rast digere, vedibêje. Pirtûka Pîroz bi mehan bi pirtûka dînî ya kû pê mezin bû re hevrû kir û piştre, piştî kû ji Xwedê re feryad kir kû rastiyê rê wê bide ceribandinek jiya. Qala vê ceribandinê ji me re wiha dike:

> Min her du pirtûk jî girtin destên xwe û rakirin jor: min pirs kir, 'Bavo Kîjan? Kîjan pirtûka Te ye?' Piştre tişteke derasayî qewimî. Heya niha qet rastî

> rewşeke wisa nehatibûm. Lewre min di hebûna xwe ya hundirîn de dengek bihîst, ev deng bi min re çawa kû ez di mêjiyê xwe yê hundirîn de peyvan dubare dikim, bi awayekî zelal axivî. Peyv zindî bûn, dilovanî bûn, lê di heman demê de bi raye derketibû holê.
>
> **'Ez di kîjan pirtûkê de wekî Bav derdikevim pêşiya te?'**
>
> Dema min bersiv da min dengê xwe bihîst: 'Di Pirtûka Pîroz de.'[249]

Wekî kû Xwedê Bavê vê xanima Pakîstanî ye, Bavê min e jî. Roja kû min ji peyama Xwedê bawer kir, wekî ruhî ji nû ve hatim dinyayê. Tu tişt nikare bibe asteng kû vê rewşa xwe ya kû endameke malbata Xwedê me, wenda bikim. Îsa wiha got: *"Pezên min dengê min dibihîzin. Ez ji wan re* ***jiyana bêdawî*** *didim; dê* ***tu car mehv nebin****. Tu kes nikare wan ji destê min derxe."* (Yuhanna 10:27-28)

## TÊKİLÎ & HEVPAYÎ

Wê demê kû ez guneh bikin dê çi bibe? Guneha min dê bibe sedem kû ez dîsa ji Xwedê veqetim?

Kû kûrekî ji bavê xwe yê herêmî re îtaet neke, wî ji endamtiya malbatê derdêxin? Na, bêîtaetiya kurekî nabe sedem kû wî wekî nehatiye dinyayê bihesibînin. Têkiliya fîzîki ya ya bi dê-bavê xwe re nikare xirab bibe. Lê ev ji bo girêdana we ya ruhî ya bi Xwedê re jî heman e. Rewşa kû hûn wekî zaroka Xwedê ya kû ji nû ve hatiye dinyayê, tu tişt nikare biguherîne. Kesên kû bawer dikin, *"ne ji toveke mirinokî, lê ji toveke nemir, ango bi peyva zindî û* ***bêdawî (mayînde)*** *ya Xwedê* ***ji nû ve hat dinyayê."*** (Petrûsê 1., 1:23)

Xwedê Bavê we yê ezmanî ye. rastiya Mesîh a kû li we hatiye kirin, dê tu car ji we neyê stendin. Dê Ruhê Pîroz tu car terka we neke.

Hûn heta hetayê di nav ewlebûnê de ne.

*"Ez bawer im kû ne mirin, ne jiyan ..dikare me ji hezkirina Xwedê ya kû di Rebê me Mesîh Îsa de ye veqetîne."*
*(Romayî 8:38-39)*

Tu tevgera min nikare *tekiliya bêdawî* ya kû Xwedê nava min de ava kiriye, xira bike. Lê dîsa jî guneh dê li ser ***hevpayiya*** *rojane* ya min a bi Xwedê re bandor bike.

## CİH & REWŞ

Bifikirin kû bavekî diçe ji xwe re dibêje bila li baxçê bixebite, lê kur li şûna kû gotina bavê xwe bike, bi hevalên xwe re diçe kû futbol bilîze. *Rewşa* wî, wekî bavê xwe neguhere, lê *rewşa* hevpayiya kur ya bi bavê wî re dê ji vê rewşê teqez tesîr bigire! Dema kur vegere malê dê jê bê pirskirin; dê hin peyvên giran bên gotin û dê dîsîplîneke li gorî rewşê bê kirin. Kur ji bo kû dîsa bikare bi bavê xwe re *têkiliyeke nêzîk* bike, dê neçar bimîne kû tevgera xwe ya bêîtaet îtîraf bike.

Ev rewş ji bo kesên kû aîdê Xwedê ne jî heman e. Xwedê dema zarokên wan guneh dikin, wan terbiye dike.

*"min, terbiyekirina REB biçûk nebîne, ji hêrsa Wî bêzar nebe. Lewre Reb* ***wekî bavekî*** *kû ji xwe razî ye, li yê kû jê hez dike hêrs dibe."* (Şîretên Silêman 3:11-12)

Kû em bêne ser hevpayiya me ya rojane ya Xwedê, Pirtûka Pîroz wiha dibêje:

*"Kû em bêjin bi Wî re* ***hevpayiya*** *me heye û em li tarîtiyê bimeşin, em ê derew bikin û li gorî rastiyê tevnegerin. Kû em bêjin gunehê me tune ye, em ê xwe bixapînin, di nav me de rast nabe. Lê* ***kû em gunehê xwe îtiraf bikin, Xwedayê ewledar û biedalet dê gunehê me bibexşîne*** *û me ji hemû xirabiyan paqij bike."* (Yuhannayê 1., 1:6,8-9)

Ruhê Pîroz ê kû di nav wan de avahî saz kiriye, dixwaze kû

zarokên Xwedê ji hemû şêwazên gunehê nefret bikin. Ne girîng e ka guneh çi qas “biçûk” e. Xwedê dixwaze em di jiyana xwe de li ber gunehên kû hin kes dikarin wêkî guneh jî nehesibînin, hestewer bibin.

Mînak, kû ez bi hevjina xwe re bi awayekî hişk bipeyivim an jî bi yekî kû ji min re neheqiyê dike re li dûrî hezkirinê bipeyivim an jî rastiyekê kêm bêjim, Ruhê Pîroz min der heqê gunehê min de îqna dike. Çareserî, ji Reb re *“gunehên xwe îtirafkirin” û ji kesê kû dilê wî şikand efûkirina wî xwestin. Kû ez vê bikim, ez ê bikaribim dîsa tama hevpayiya* nêzîk û şêrîn a Xwedê bistînim.

Hûn cudahiyê fam dikin?

Di Mesîh de ***cihê*** min ê nuwaze, cihekî nuwaze ye, lê ***rewşa*** min a jiyana rojane, ji nuwazebûnê kêm e.

Karê Wî yê rizgariyê, yê kû ***ji bo min*** pêk anî, heya bêdawiyê hat temamkirin, lê karê Wî yê ***di nava min de,*** heya kû ez Wî li Bihuştê bibînim dê berdewam bike.

## EM Jİ BO ARMANCEKÊ HATİN RIZGARKİRİN

Ruhê Pîroz ê Mesîh dixwaze gelê Xwedê şêwaza fikirîn, axaftin û tevgerînê biguherîne. Jê re wiha dibêje:

***“Pîroz bibin, lewre ez pîroz im.”*** (Petrûsê 1., 1:16)

Ew ji gelê xwe re di heman demê de wiha dibêje: *“Bêhiş nebin. Fam bikin ka Xwedê çi dixwaze. Bi şerabê serxoş nebin. Li şûna vê **bi Ruh re tijî bibin*** (teslîmê Ruh bibin, ji hêla Ruh werin kontrolkirin).” (Efesî 5:17-18)

Ruhê Pîroz kesayetiya me binpê nake; li dijî vê, Xwedê me azad dike kû em jiyanên rast û serkeftî yên kû Xwedê ji bo me sêwirandiye di jiyana xwe ya rojane de berdewam bikin. Xwedê me ji bo armancakê rizgar kiriye. Em bi her tiştê kû difikirin, dibêjin û dikin re hatin vexwendin kû Wî bilind bikin.

> *“Hûn dizanin kû we bedena xwe ji Xwedê girtiye û* ***perestgeha Ruhê Pîroz a nava we ye?*** *Hûn ne aîdê xwe ne. Lewre* ***hûn bi berdêlekê hatin stendin. Ji ber vê Xwedê di nav bedena xwe û ruhê xwe de bilind bikin.”***
> (Korîntiyên 1., 6:19-20)

Ji bo kesên wekî me kû ji Mizginiyê bawer dikin, ev rewş çawa dibe rastiyeke kû jiyanê diguherîne! Hebûna kesane ya Xwedê di nava me de dijî! Kû em serê xwe li ber Wî xwar bikin dê jiyanên me navê Wî bilind bike û dê ji mirovên din re bereket bîne.

Der heqê Ruhê Pîroz ê kû ser jiyana mirovan de hê dikare gelek tişt bê gotin.

Ruhê Pîroz dilminiyê dide, xurt dike, rêberiyê dike, ronî dike û perwerde dike.

Ji yên biîmanan re alîkarî dibe kû Nivîsên Pîroz fam bikin.[250]

Alîkarî dibe kû em bi Xwedê re têkilî çêkin û dua bikin.[251]

Ew diyariyên taybet û huner dide kû gelê Wî ji mirovên din re alîkarî bike û wan saz bike.[252]

Hêz dide alîgirên Mesîh kû lihemberderketin çi qas mezin be bila bibe, bila ji bo Wî bixebitin û jê re şahidiyê bikin. Îsa ji xwendekarên xwe re wiha got:

> *“Va ez we mîna pezan dişînim nav guran. Wekî maran biaqil, wekî kevokan saf bibin. Lewre dê we darizînin, dê we li sînagogan bidin ber şelaqan ... Lê dema we darizînin, xem nekin ka hûn ê çi bibêjin. Wê demê dê ji we re bê gotin ka hûn ê çi bêjin.* ***Lewre hûn ê nepeyivin, dê Ruhê Bavê we bi rêya we bipeyive.”*** (Matta 10:16-20)

## VEGERÎNA XUYANGA WÎ

Kû em bi kurtasî bibêjin, Ruhê Pîroz dê pêk bîne kû armanca Xwedê ya kû ji bo mirovan sêwirandibû bi cih bê; ev armanc ev e: xuyanga yek Xwedayê rast bidin hisandin û tama têkiliya bi Wî ra ya kû dê heta hetayê bidome, derxistin.

> *"Wekî vê Ruh jî di bêhêziya me de alîkarî me dike ... Em dizanin kû Xwedê bi yên kû ji Wî hez dikin, ji bo armanca Wî hatine gazîkirin re di her rewşê de ji bo qenciyê amade ye. Lewre Xwedê ji berê de hin kesan diyar kir kû* ***vegerîne xuyanga xwe.*** *Her wiha bila Kur ji nav gelek birayan de yê pêşîn be kû bê dinyayê."* (Romayî 8:26, 28-29)

Xwedê her bûyer û ceribandina jiyana gelê xwe ji bo *"vegerîne xuyanga xwe"* bi kar tîne.

Beşa pêşîn a pirtûka Xwedê, dide zanîn kû mêr û jina pêşîn *"di xuyanga Xwedê de"* hatine afirandin. Mirov kû li hemberî Xwedê gunehkirinê pejirandin, vê xuyanga ji binî de xira kir. Lê dîsa jî dema wext hat, Xwedê xwe yê nuwaze û ezmanî şand dinyayê.

Jiyan, mirin û vejîna bêguneh a Îsa, di asta pêşîn a bernameya Xwedê de cih digirt kû zerara kû ji ber gunehê çêbûye bê sererastkirin. Lê dîsa jî çawa kû me di vê beşê de dît, di plana Wî de ji vê re zêdetir cih hatiye dayîn.

Gunehkarên neçar ên wekî we û wekî me, dema ji agahiya baş a der heqê rizgariyê de bawer dikin, Xwedê ji me re Ruhê Pîroz dide; Ruhê Pîroz, di fikra me de, motîfên me de, gotinên me de û çalakiyên me de pêvajoyê dide destpêkirin kû *em dîsa vegerin xuyanga Wî.* Ev pêvajo asta duyemîn a bernameya Xwedê ye kû laneta gunehê berevajî bike.

Xwedê dixwaze kû zarokên Wî *karakter û tevgera Mesîh* bidin hisandin. Wateya kû divê biwêja *"xirîstiyan"* bide diyarkirin, ev e. Lê dîsa jî çalakiya Ruhê Pîroz ê kû me vegerîne Mesîh, pêvajoyeke wisa ye kû dema em Wî rû bi rû bibînin dê pêk bê.[253]

> ***"Binêrin, Bav ji me ew qas hez dike kû, ji me re zarokên Xwedê tê gotin! Bi rastî jî em wisa ne.*** *Ji ber kû dinya Bav nas nake, me jî nas nake.*
>
> *Birayên min ên delal, em ji niha de zarokên Xwedê ne, lê ji me re nehat nîşandan kû em ê bibin çi. Tenê dema Mesîh xuya be,* ***em dizanin kû em ê di xuyanga Wî de bin.*** *Lewre em ê Wî çawa ye wisa bibînin."* (Yuhannayê 1., 3:1-2)

**Ji bo** her kesî kû ji Wî re îman dikin, çalakiya rizgarkirina Xwedê û ji bo çalakiya transformasyonê ya kû Ruhê Xwedê **di nav** kesên kû sitûyê xwe li ber xwar dikin, pêk tîne, hêza Şeytên tê têkbirin û **di nav** her kesê kû îman dikin de serweriya rastiya kû ji hezkirin, kêfxweşî û selametiyê pêk tê, tê nûkirin.

Em bi jiyaneke kû bi armanc hatiye dagirtin û bi hêvî û bendewariyeke bixîret li benda asta dawî ya bernameya Xwedê ne kû dê Şeytan, guneh û mirinê heta hetayê ji holê rake.

*Îsa vedigere!*

# 29

# Qonax 3: Bernameya Xweda Ya Bê

*“Xwedayê kû selametî dide,* ***dê di demeke nêzîk de Şeytên di bin*** *piyên* ***we de bipelixîne.”*** (Romayî 16:20)

Ev wehda kû ji yên biîmanan re tê dayîn, ji pêxemberiya veşartî ya kû Xwedê roja kû guneh nifşa mirov qirêj kir, tê: *dê ezbeta jinekê serê Mar bipelixanda..*

Dê Afirîner-Xwedayê gerdûnê her tiştê wehdkirî pêk bianiya. Lê dê vê bi rojeva xwe û bi wextê re lihevhatî, çêkira.

## BEREVAJÎKİRİNA LANETÊ: QONAX SÊ

Mesîhê wehdkirî cara pêşîn dema hat, cezaya gunehê xwe hemû da û Şeytên têk bir. Ji bo yê bi îman êdî dojeh ne tiştek e, lê bihuşt teqez e. Wekî encama vê têkçûnê, Şêytên çeka xwe ya delal a sitrû wenda kir. ***Cezaya gunehê*** hat berevajîkirin.

Piştî kû Reb Îsa vegeriya esmên, Ruhê Pîroz, *“Alîkarî”* şand jêrê kû gelê xwe bixurt bike kû di jiyana xwe ya rojane de Şeytan û gunehên wî têk bibin û veguherin xuyanga Wî. ***Hêza gunehê*** hat berevajîkirin.

Lê dîsa jî pelixandina Şeytên a bi temamî û rizgarkirina Xwedê ya gelê xwe ji ***hebûna gunehê,*** tenê dê bi vegerîna Îsa ya serzemînê pêk bê.

## TİŞTÊN PÊŞEROJÊ

Xwedê çawa kû ji pêxemberan re hatina pêşîn a Mesîh ji berê da zanîn, pêxember hatina Wî ya duyemîn jî bi heman awayî ji berê de dane zanîn.[254]

Roja daxuyaniya kû dê li ezmanan olan vede, nêzîk dibe:

> ***"Serewriya dinyayê bû ya Rebê me û ya Mesîh. Ew ê heta hetayê serweriya xwe bidomîne!"*** (Wehî 11:15)

Dema Îsa vegeriya serzemînê, dê kurê mirov tacên bisitrû nexin ser Wî, û dê Wî li ser çarmixê bizmar nekin. Dê navê Wî belasebeb bilêv nekin an jî dê nebêjin Ew tenê pêxemberekî ye.

Dê êdî ji Qral re tiştên wisa bêedeb nekin.

Daxuynaiyên Nivîsên Pîroz pir zelal in. Îsa dema dîsa bê, *"dê her kes çogerî bibe"* (Yeşaya 45:23). Lê beriya kû ev bûyer pêk bê, hê pêxemberiyên din hene kû pêk bê.

## LI EZMANAN KÊFXWEŞÎ

Beriya kû dinya li ber Afirîner-Xwedayê xwe çogerî bibin, bûyereke kû divê pêk bê heye: divê Îsa têkeve na v atmosfera serzemînê kû gelê xwe yê rizgarkirî bibe esmên.

> *"Reb bixwe, dê bi gazîna fermanekê, bi gazîkirina milyaketê sereke, bi boriya Xwedê ji esmên dakeve. Dê destpêkê miriyên aîdê Mesîh vejîn. Piştre em ên kû dijîn, li jiyanê ne, ji bo kû Reb li hewa pêşwazî bikin, bi wan re di nav ewran de bên birin. Bi vî awayî em ê heta hetayê bi Reb re bijîn."* (Selanîkiyên 1., 4:16-17)

Ev sir, ev bûyera metelhiştî dibe kû her gav pêk bê. Dema ev bûyer pêk bê, bedenên mirî yên biîmanan kû can û ruhên wan li bihuştê dijîn, dê bi biîmanên kû li serzemînê dijîn re *"ji bo pêşwazîkirina Reb a li hewa... em hemû bêne birin."*[255] Bi îmanên di Mesîh de, dê di demeke pir kin de veguherin xuyanga

Mesîh. Dê xwedî bedeneke bin kû bi bêdawîtiyê re li hev tê, bi zeman û cih re ne bisînor e.

Piştî kû *"bêne birin"* biîmanên takekesî yên kû dema li serzemînê dijiyan fidakarî dikirin û ji bo bilindahiya Xwedê û ji bo bereketa kesên din tiştan dikirin, dê xelat bigirin.[256] Piştre gelê Xwedê heya bêdawiyê wekî *"pîroz û paqij"* dê jiyana xwe ji bo Şampiyon, *"Zavayê"*[257] bêdawî yê kû jiyana xwe ji bo kû wan ji darizandina bêdawî rizgar bike feda kir, bê pêşkêşkirin.

> *"Em kêfxweş bibin, bicoş in! Em Wî bilind bikin! Lewre deweta Berxik dest pê dike, Bûka Wî hat amadekirin. Ji bo kû li xwe ke jê re kincên keten ên tenik û biriqî hat dayîn; ketena tenik karên biedalet ên pîrozan dide nîşan. Piştre milyaket ji min re got, 'Binivîse!'*
>
> *'Her bijî yên kû ji bo deweta Berxik hatine vexwendin!'"* (Wehî 19:7-9)

Kêfa têkiliyên kû li bêdawiyê bêne kirin, dê bi awayekî bêsînor raserê tiştê serzemînê bin.

## TENGASİYA MEZİN A SERZEMÎNÊ

Ni vê navberê de Nivîsên Pîroz didin zanîn kû dê li serzemînê *"dema tengasiyeke mezin"*[258] bibe; di vê serdemê de Xwedê dê xezeba xwe bîne ser dinyayeke biinyad û dê ji hatina duyemîn a Xwedê rê amade bike. Ev serdem wekî *"ji bo nifşa Yaqûb serdema tengasiyê"* (Yeremya 30:7) tê nîşankirin, lewre ev serdem ji bo neteweya Îsraîlê bînê tobeyê hat sêwirandin.

Di vê serdemê de, dê serweriyeke dinyayê ya bandorker û bihêz a kû wekî *"li hemberî Mesîh" û "Cinewar"* tê gotin, xurt bibe. dê qelebalixên mezin bi awayekî kor, wî û pêxemberê wî yê sexte kû mucîzeyan çêdike, bişopînin. Dê ji her mirovê serzemînê re bê gotin, *"li destê xwe yê rastê an jî li eniya xwe nîşaneyek çêke, yê kû hejmara kû navê cinewar nîşan dide li ser xwe neke, dê ne bikare tiştek bistîne an jî bikare tiştek bifroşe."* (Wehî 13:16)

Dê serê yên kû serî xwarkirinê red dikin, bê jêkirin. Ev Mesîhê sexte dê aşitî û aramî wehd bike, lê li şûna kû van pêk bîne, dê mirovan bixapîne, wan beraliyê hilweşîn û mirinê bike.

## ARMAGEDON

Piraniya pêxemberên Xwedê di Pirtûka Pîroz de der heqê Şerê Cîhanê yê dawî yê kû dema Îsa ji esmên dakeve hê berdewam dike, dinivîsin. Ev xebata dramatîk, li herêmeke fireh a kû ji Çemê Şeriayê heya Deryaya Spî dirêj dibe, li mexeliya Esdraelonê pêk bê. Nivîsên Pîroz di heman demê de vê herêma kevin û qada şer a pêşerojê wekî *Armagedon* a kû tê wateya "Çiyayê komkûjiyê" bi nav dike.

> *"Ev ruhên cinan ên kû nîşaneyên serşirustî dikin. Diçin hemû qralan kom bikin ji bo şer kû dê* ***roja mezin a Xwedayê kû Hêza Wî Têra Her Tiştê dike****, pêk bê. 'Va ye, ez wekî dizan têm! Her bijî yên kû şiyar bimînin ji bo kû tazî negerin û di nav şermê de nemînin!' sê ruhê xirab, qral li cihê kû wekî* ***Armagedon*** *tê binavkirin, kom kirin."*
>
> (Wehî 16:14-16)

Pêxember Zekeriya di heman demê de rewşa dramatîk a bûyerên kû dê hevaltiya Mesîh bikin jî nivisî.

> *"**Va ye roja REB tê!** Ya gelê Yeruşalimê! Milkê kû dê ji te bên talankirin, li ber çavên te bê paykirin. Ez ê hemû neteweyan bînim cem hev kû li hemberî Yeruşalimê şer bikin. Dê bajêr bê b,destxistin, dê mal bên talankirin, dê dest bavêjin namûsa jinan. Dê nîvê kesên kû li bajêr dijîn, bên derxistin, yên din dê li bajêr bimînin."*
>
> *(Zekeriya 14:1-2)*

Dê *"hemû netewe"* Yeruşalim dorpêç bikin. Ev lihevxistin dê bibe komkûjiyeke mîna destanan.

## VEGERA MESÎH

Dema hemû hêvî wenda bin û dema hejmara bajêr a kû hê dijîn cihek nebînin ji bo alîkariyê, dê ji REB re feryad bikin ji bo kû wan xilas bike. Piştre yê kû navê Wî *"Reb rizgar dike" ar dike"* ye, dê ji ezmanan dakeve. Dema neteweya Îsraîlê bibîne kû Rizgarkerê wan ***Îsayê*** çarmixkirî ye, dê heyirî bimîne û şok bibe! lê vê carê dê di nav ruhê tobeyê de û bi êşa can, dê Qralê xwe qebûl bikin.

> *"Ez ê ruhê kerem û lavayê bireşînim ser yên kû li Yeruşalimê rûdinin. Dê* ***li min, ango li yên kû qul kirin*** *binêrin; dê wekî kesekî kû ji bo xwe yê yekane şîn digire, bigirin, dê wekî kesekî kû ji bo xwe yê pêşîn êş dikêşe, êş bikêşin."*
> (Zekeriya 12:10)

Dê çavên kor ên neteweya Cihû di dawiyê de ji hêla ruhî ve vebe û dê bê zanîn kû Îsa berê û her tim Mesîhê yek û rast e û dê ji vê rastiyê bawer bikin.[259]

Bûyera kû dê piştî vê pêk bê, dê wekî şerê herî bandorker ê dîroka dinyayê pêk bê û Îsayê kû *Peyv* e dê tenê biaxive û ev dijmin dê belav bibe.

> *"****Piştre Reb*** *wekî kû di demên şer de dike, dê biçe li hemberî van neteweyan şer* ***bike****. Wê rojê dê piyên Wî, li ser Çiyayê Zeytunê be kû li rojhilata Yeruşalimê ye. Dê Çiyayê Zeytunê li hêla rastê û çêpê bibe du şeq û dê nav de newaleke pir mezin çêbe. Dê nîvê çiyê vekêşê aliyê ba û nivê din jî vekêşe aliyê başûrê.*
>
> *REB dê hemû gelên kû li hemberî Yeruşalimê şer dikin bi vê belayê ceza bike: Dema hê saq in dê beden, çav û zimanên wan birizin..*
>
> *Dê rojeke taybet be, dê rojekê be kû tenê Xwedê dizane. Dê şev jî roj jî nebe. Dê şev ronî be.*
>
> *Reb dê Qralê hemû dinyayê. Wê rojê dê tenê REB, tenê navê Wî bimîne."* (Zekeriya 14.3-4, 12,7,9)

Di dawiyê de, dê pesna yek Xwedayê rast li gorî layiqbûna wî bê dayîn û dê bê rûmetkirin.

## SERWERİYA KÛ DÎSA TÊ XWESTİN

Bi dehan sal berê kû pêxemberiya Zekeriya ya wê demê me xwend hatiye nivîsîn, Xwedê ji pêxember Daniel re bînahiyeke kû dişibe vê pêxemberiyê da:

> *"Min di bînahiyên xwe yên şev de dît yekî kû dişibe* ***kurê mirov bi ewrên esmên*** *ve hat. Ber bi Yê kû ji berê de heye ve çû, çû li ber Wî. Jê re* ***serwerî****, bilindahî û qraltî hat dayîn. Hemû gel, netewe û mirovên ji her zimanî Ew perestin. Serweriya Wî* ***serweriyeke*** *bêdawî ya kû dê tu car neqede, û qraltiya Wî qraltiyeke dê tu car hilneweşe ye."*
> (Daniel 7:13-14)

Peyva *serweriyê* sê car tê dubarekirin.

Dema Xwedê cara pêşîn mêr û jinê afirand, ji wan re got *"**Serweriyê** hemû zindiyên serzemînê bikin."* (Afirîn 1:26, 28) Dema Adem serî li ber Afirînerê xwe rakir, ev serwerî da Şeytên. Lê ev serweriya li ser vê gerdûnê kû *"mirovê pêşîn"* Adem da Şeytan, dê *"Mirovê Duyemîn" Îsa* [260] *dîsa bixwaze.*

Xwedê ji xwendekarê Îsa Yuhanna re bînahiyeke temamker da kû bi pêxemberiyên Zekeriya û Daniel re bi awayekî nuwaze li hev tê:

> *"Min piştre dît kû ezman vebûye, hespekî spî li wir sekiniye. Navê siwariyê wî Disoz û Rast e. Bi edaletî didarizîne, şer dike. Çavên wî mîna êgir e kû disincire. Li ser serê wî gelek tac hene. Li ser wî navek hatiye nivîsîn kû ji xeynî wî tu kes nizane. Xiftanekî kû li xwînê noq kiribûn, li ser wî bû.* ***Bi Peyva Xwedê tê bîranîn.*** *Artêşa ser ezmanan kû ketena tenik, paqij û spî li xwe pêçabûn, siwarî hespên spî bibûn û ew dişopandin. Ji devê wî şûrekî tûj dirêj dibe kû dê hemû neteweyan lêxe.*

> *Dê wan bi darqîtkekî hesin bajo. Dê masaraya kû şeraba Yê kû Hêza Wî Têra Her Tiştê dike çêdike, bixwe bicû. Li ser xiftan û pişta wî ev nav hatibû nivîsîn:* ***QRALÊ QRALAN Û REBÊ REBAN."*** (Wehî 19:11-16)

Dema *Qralê Qralan* vegere, dê gelek milyaket û *"artêşên ezmanan yên kû bi ketena tenik hatine pêçandin"* ênkû bi nifşa rizgarkirî ya Adem pêk hatine, hevaltiya Wî bikin.[261] Raberiyên lutufkar ên hêz û hişmeta Îsa, dê li ber hêz û hişmeta metelhiştî ya hatina wî ya duyemîn biçilmisin.

## SERWERİYA EZMANAN A SER DİLAN

Em bibêjin kû hûn li daristanekê tena serê xwe dimeşin. Ji min re bibêjin ka hûn dixwazin rastî kîjan heywanê bibin? —şêr, an berxik?

Dema Mesîh cara pêşîn hat serzemînê, ji bo gunehkaran rizgar bike wekî *"Berxikekî"* hat, lê dema dîsa vegere, ji bo kû gunehkaran darizîne dê wekî *"Şêrekî"* bê.[262]

Îsa dema cara pêşîn serzemînê ziyaret kir wiha wehd kir: *"Tobe bikin, lewre serweriya ezmanan nêzîk e."* (Matta 4:17) Lê Cihû û netewe, li şûna kû ji fikrên xwe yên şaş tobe bikin û Qralê xwe qebûl bikin, ji bo kû Qralê xwe li çarmixê bixin alîkarî hev kirin. Bi vî awayî, haya wan jê tune bû lê plana Xwedê ya kû ji bo deynê gunehê dinyayê diviyabû Mesîh Xwîna xwe birêta, pêk anîn.

Agahiya baş ev e: kû gûnehkar ji Reb Îsa û ji tiştên kû ji bo wan kir bawer bikin, Xwedê dê serweriya xwe bixe dilên wan û dê wan heta hetayê bike gelê xwe.

Hûn dizanin kû her biîmanê rast ê Mesîh, hê ji niha de welatiyê tescîlkirî yê ezmanan e?

> *"Lê welatê me li ezmanan* ***e****. Em ji wir li benda Rizgarker in, li benda Reb Îsa Mesîh in. Dê ew bi hêza kû dikare her tiştê girêdayî xwe bike, dê bedenên me yên reben biguherîne û bike mîna bedena xwe ya bilind."* (Fîlîpînî 3:20-21)

## SERWERİYA EZMANAN A Lİ SERZEMÎNÊ

Dema Îsa vegeriya serzemînê, dê Serweriya xwe li Yeruşalimê kû dê serzemînê hezar sal li wir bi rê ve bibe, dane. Di dawiyê de, dê Qraltiya Wî bê û *"wekî ezmanan dê li serzemînê jî"* daxwaza Wî bibe (Matta 6:10). Dê xirabî êdî li tu neteweyan de baş xuya neke, lewre *"dê wan bi darqîtkekî hesin bajo."* (Wehî 19:15)

Gelek kes jê bawer nakin kû dê Xwedê wekî fîzîkî vegere serzemînê. Lê digel vê, Nivîsên Pîroz bi awayekî zelal vê mijarê diyar dikin. Çawa kû Xwedê dema cara pêşîn hat bedeneke fîzîkî girt û piştre vejiya, bi bedena xwe ya fîzîkî û bêsînor li esmên hat birin, bi heman awayî dê bi awayekî *fîzîkî* vegere:

> *"We çawa dît kû Îsa ji nav we hat girtin û derket ezmanan, **dê bi heman awayî vegere.**"* (Karen Şandiyan 1:11)

## ŞEYTANÊ GİRÊDAYÎ

Pirtûka Xwedê der heqê serweriya Îsa ya hezar salî de gelek tişt dide zanîn. Tişta kû em dikarin bikin jî, tenê kurtasiya bûyerên bingeh bêjin.

Piştî kû Îsa vegere serzemînê, tişta pêşîn a kû dê pêk bê der heqê wî "marî" ango Şeytên de ye kû nifşa mirov cara destpêkê beralî hilweşînê kir.

> *"Piştre min dît kû milyaketekî ji esmên daket. Di destê wî de mifteya kûrahiyên bêdawî û zincîreke mezin hebû. **Milyaket ejderha –marê kevin ê kû wekî Îblîs an jî Şeytan tê binavkirin– girt û hezar sal girêda. Bi hezar salan, ji bo kû dîsa neteweyan ji rê dernexe,** ew avêt kûrahiyên bêbinî, derî girt û mor kir. Piştî hezar salan, ji bo demeke kin divê bê azadkirin."* (Wehî 20:1-3)

Şeytan hezar sal dê girtî û girêdayî bimîne. Bi girêdayîkirina Yê Xirab û bi serweriya Yê Baş dê *"ji mirovên serzemînê kû ji wan razî ye selametî"* bibe. (Lûka 2:14)

Rêveberiya biedalet a Xwedê ya kû dinya bi hesret li bendê ye, dê bibe rastiyekê.

> *"Dê Xwedayê ezmanan qraltiyeke çêke kû dê tu car hilneweşe ... Û* ***ev qraltî dê heta hetayê bidome."***
> (Daniel 2:44)

## RADESTİYA RAST

Qral Silêman,[263] nêzî sê hezar sal berê, der heqê serweriya Mesîh a pêşerojê kû dê her netewe û her mirov li ber Wî serê xwe bitewîne de nivîsî. Îro gelek kes dibêjin kû radestî yek Xwedayê rast bûne. Lê wê rojê, dê her kes radestî Wî bibe.

> ***"Bila di rojên Wî de*** *rastî belav bibe û geş bibe, çi qas heyv şewqa xwe dide bila selametî zêde bibe!* ***Bila serwerî berdewam bibe*** *ji deryayan heya deryayên din, ji Firatê heya serê serzemînê! Bila qebîleyên çolê çogerî bibin, bila dijmin tozê bialêsin. Bila qralên Saba û Sevayê diyariyan bidin!* ***Bila hemû qral li ber Wî xwe xwar bikin, bila hemû netewe jê re evdî bike! Lewre feqîrê kû alîkarî dixwaze,*** *ketiyê kû piştgiriyê wî tune* ***Ew xilas dike****. Dilê Wî bi feqîr û yê ketî dişewite, canê yên ketî xilas dike. Ji zordestiyê, zorbazî wan azad dike, lewre* ***di çavê Wî de xwîna wan girîng e. Bijî qral!*** *Bila jê re zêrê Sabayê bidin; bila her tim dua bikin ji bo Wî. Bila sibê heya şevê pesna Wî bidin!* ***Bila li welêt gelek genim hebe.*** *Bila li ser çiyayan pêl bide! Bila simbila wan mîna Lubnanê bi bereket be. Bila gelê bajêr mîna giya belav bibe û zêde bibe. Bila* ***navê Qral heta hetayê bijî,*** *heya kû tav hebe bila navê Wî hebe.* ***Bila bi rêya Wî mirov bên pîrozkirin, bila hemû netewe bêjin, 'Bila Ew Her Bijî!'*** *Hemd ji Reb Xwedê û Xwedayê Îsraîlê re! Tenê Ew e kû tiştên nuwaze çêdike. Heta hetayê hemd ji navê Wî yê bilind re!* ***Bila hemû serzemîn bi bilindahiya Wî bê dagirtin.*** *Amîn! Amîn!"* (Mezmûr 72:7-19)

Ev Mezmûr agahiyeke baş dide me kû em der heqê Mesîh de kû *"dê heya serên serzemînê serweriyê bike"* û qraltiya Wî de xwedî têgihiştineke zelal bibin.

## RÊVEBERİYA SERAZA

*"Feqîrê kû alîkarî dixwaze, ketiyê kû piştgîriya wî tune ye Ew xilas dike."* Dê serweriya Mesîh bi temamî li dijî dinyaya îro ya xirabe û tevlihevî derdixe, bibe. Dê cara pêşîn ji gunehê re ji Ketina Peşîn û heya niha azadî û edalet serwerî bike. Dê jiyana her bebek, zarok, mêr û jinê bi nirxa bêdawî bê dîtin û dê her jiyanê re rêz bê girtin. *"Ji zordestiyê, zorbaziyê wan azad dike, lewre di çavê Wî de xwîna wan **hêja ye**."*

Medyaya nûçeyê, der heqê rêberên dînî û polîtîk yên kû navbeynkarî dikin kû çekgirtin kêm bibe de her tim agahî didin. Lê dîsa jî ji ber raye û hêzên wan ên bisînor, ev rêber nikarin aramiya kû dibêjin, pêk bînin. Lê dema ew Kesê kû ba û pêl li ber Wî sitûyê xwe xwar dikin vegere, dê serzemîn di dawiyê de tama edaleta rast û *"zêdeyiya **selametiyê**"* bistîne.

Bi sedsalan hemû qral û serwerên vê cîhanê jiyane û ***mirine***. Lê Nivîsên Pîroz der heqê Qralê qralan Îsa de wiha dibêjin: *"Û Ew dê **bijî**."* Dê serzemîn a kû di bin rêveberiya kurê mirov a kû guneh û mirinê têk biriye de, dê di nav hezar salan de kû di selametiyeke bêhempa û aramiyê de derbas bibe, geş bibe.

> *"Bila hemû qral li ber **Wî** xwe xwar bikin û bi rêya **Wî** mirov bên pîrozkirin; bila hemû netewe bêjin, 'Bila **Ew** her bijî'"* (Mezmûr 72:11,17)

Dê Reb Bixwe ji vê dinyaya westiyayî û acizbûyî re rêveberiya biedalet bîne. Yên kû dê bi Wî re serweriyê bikin, dê tenê zarokên Adem bibin kû xwedî bedenên bilindbûyî û xwezayên pîroz in.

Dê qraltiya Wî ji xirabiyê azad bibe.

> *"Yên kû di nav vejîna pêşîn de bextewar û pîroz in. Rayeya mirina duyemîn tune li ser van. **Dê ew bibin kahînên Xwedê û Mesîh, dê bi Wî re hezar sal serweriyê bikin."***
> (Wehî 20:6)

Dê hemû şêwazên rêveberiyê –monarşî, totalîter, demokratîk, dînî– têk çûne, lê dê rêveberiya Wî têk neçe.

Dê rêveberiya Wî jî wekî Wî serasa be.

## PRENSÊ SELAMETİYÊ

Me berê behsa çend pêxemberiyên der heqê hatina Mesîh kirin. Mînak, pêxember Mîka ji berê de da zanîn kû dê Mesîh li Beytlehemê bê dinyayê. Lê we bala xwe dayê kû di nav pêxemberiya Mîka de di heman demê de ev heye kû dê Mesîh rojekê li hemû serzemînê serweriyê bike?

> *"Lê tu ya Beytlehem Efrata, digel kû tu ni nav qebileyên Yahudayê de ne girîng î, dê yê kû Îsraîlê li ser navê min **bi rê ve bibe**, ji nav te derkeve. **Koka Wî digihije ezelîtiyê, destpêka zemanê. Dê hemû dinya mezinahiya Wî qebûl bike, dê ji gelê xwe re selametî bîne.**"* (Mîka 5:2,4-5)

Yeşaya kû ji dema Mîka bû jî der heqê kû dê bê dinyayê û bêdawî de pêxemberî kir.

Pêxemberiya Yeşaya di heman demê de rêveberiya Kur a li hemû dinyayê jî nîşan dikir.

> *"Lewre dê ji me re zarokekî bê, dê ji me re kurekî bê dayîn, **dê rêveberî li ser milê Wî be.** Navê Wî dê bibe Şîretkerê Nuwaze, Xwedayê Xurt, Bavê Ebedî, Rêberê **Selametiyê.** Dê li ser textê Dawud û welatê wî serweriyê bike. **Dê geşbûna serwerî û selametiya wî neqede.** Dê serweriya xwe bi edalet û rastiyê ava bike. Û dê **heta hetayê** berdewam bike."* (Yeşaya 9:6-7)

Di dawiyê de dê hemû dinya re bi nasnavên kû heq dike xîtabê Xwedê bike. **Navê WÎ:**

*"Nuwaze,*
*Şîretker,*
*Xwedayê Bi hêz*
*Bavê Ebedî*
*Rêberê Selametiyê **bibe**."*

Dê netewe *"ji wê demê **heta hetayê**"* kêfa edalet û selametiyê bikin.

Dê daxwaza Xwedê ya bi mirov re bijî, dê rastî bibe. Heta hetayê.

> *"Wê rojê **dê gelek netewe girêdayî Xwedê bibe, dê bibe gelê Wî** û wê demê **dê Reb nav we de bijî.**"* (Zekeriya 2:11)

Agahiya baş a îro ew e kû Ruhê Mesîh kû di dilê kê de cihê xwe bigire, dikare kêfa hebûn û selametiya Xwedê *jinihade* bistîne.

## DÊ ÊDÎ NEZAN NEBE

Reb cara pêşîn dema hat serzemînê, ni nav mirovan de jiya, piraniya mirovan, di nasîna Wî de serkeftî nebûn. Heya îro gelek kes dîtina Îsa wekî Qralê xwe red kirin. Lê digel her tiştê, serdema zêrîn tê kû dê her kes Wî wekî Kesê kû Ew dibêje qebûl bikin.

> *"Ji Heyva Nû heya Heyva Nû, Ji Roja Şabatê heya Roja Şabatê, dê hemû mirov bên li ber min û **Min** biperêsin,' dibêje **REB**.* (Yeşaya 66:23)

Dê êdî li serzemînê bi hezaran dîn, mezheb û tarîkat tune be. Û di heman demê de, dê tu kes newêre rastiya dîrokî ya Xwedê Îsa înkar bike. Lê dîsa jî dê her kes jê bawer neke, lê dê her kes rastiya der heqê Wî û peyama Wî de bizane.

> *"Lewre av çawa derya tijî dikin, dê dinya jî bi zanyariya Xwedê bê dagirtin."* (Habakkûk 2:14)

## DÊ ÊDÎ ŞER NEBE

Piştî kû Reb li serzemînê serweriyê bike, berberiya navbera Bakûr û Başûr, Rojhilat û Rojava dê li dema berê bimîne. Dê pêvçûnên navbera Îsraîl û neteweyên derdora Îsraîlê bi dawî bibe. Dê tengasiya parzemîna Afrîkayê heta hetayê ji holê rabe. Dê ji bo parzemînên din jî wisa bibe. Şerê sivîl û zordestî dê biqede. Dê li serzemînê selametî, aramî û wateya rast belav bibe.

> ***"Dê gelek gel bê, dê bêjin, 'Dê haydê em derkevin Çiyayê Reb**, em **derkevin** Perestgeha Xwedayê Yaqûb. Bila Ew rêya xwe rê me bide, em jî di rêya Wî de biçin.'*
>
> *REB dê di nav neteweyan de bibe dadger, dê pêvçûna navbera gelan de çareser bike. Dê şûrên xwe bi çakûçan bikutin û dê haletê cotê çêkin, rimên xwe bikin kêra rezvanan. Dê netewe li hemberî neteweyek din şûrê xwe raneke, **dê êdî perwerdehiya şer çênekin."*** (Yeşaya 2:3-4)

Dema mirov yek Xwedayê rast nas bike û Wî biperêse dê selametî û yekîtî navneteweyî bibe.

Dê tevliheviya Babîlê berevajî bibe. Dê dinya dîsa wekî berê bi zimanekî bipeyive:

> *"Ez ê wê demê lêvên gelan pak bikim kû bila hemû bi hev re bi navê min gazî min bikin, milên xwe bidin milên hev û ji min re xizmetê bikin."* (Sefanya 3:9)

## LANET HAT RAKİRİN

Reb ji bo kû aramiya vê hezar salî zêde bike, dê laneta kû ji ber gunehê hatiye serzemînê rake.

Îsa dema cara pêşîn li serzemînê jiya, hêza xwe ya vegerîna lanetê da nîşan. Cinan der kir, seqetan baş kir, şîfa da ji nexweşiyan re, miriyan vejand, ji qelebalixan re xwarin peyda kir û ew xwedî kirin û kontrola xwe ya ser xwezayê da nîşan. Ev çalakiyên Wî delîlên wisa ne kû ew Mesîh û Qral e, dijî vê nikare bê gotin.

Îsa tiştên kû dema cara pêşîn hat bi mînakan peyda kir, dê di hatina xwe ya cara duyemîn de bi awayekî navnetewî peyda bike.

Şeytan û cinên wî gîrêda. Dê seqetî, nexweşî û mirinê kû bi awayekî xwezayî derketine holê, rake. Dê li ser axê êdî sitrû û devî tune be. Dê cotkar êdî ew qas mahsûl peyda bikin kû berê qet wisa çênebûye. Dê "feqîrtî" û "birçîtî" bibin peyvên kevin ên kû qet nayên bikaranîn.

Dê her netewe vê serdema zêrîn a dîroka dinyayê biceribîne.

Qraltiya ezmanê ya kû dema cara pêşîn Îsa hat ji hêla welatiyên serzemînê hat redkirin, dema cara duyemîn bê, dê li her derê dinyayê cih bigire û serweriyê bike.

> *"Dê wê demê çavên kor, guhên ker vebin; dê topal mîna xezalan lotikan bavêjin, zimanê bêzimanan bi kêfxweşî qîrîn bike. Lewre dê li çolan av bifişfişe, dê li beriyan çem biherikin. Dê berxik û gur bi hev re biçêrin, dê şêr mîna dewaran ka bixwe,* ***dê xwarina mar jî ax bibe.*** *Dê li tu derê çiyayê min ê pîroz tu kes zerarê nede, tu kes wenda neke.' wiha dibêje REB."* (Yeşaya 35:5-6; 65:25)

Dê alema heywanan jî êdî bi selametî di nav hev de be, dê vegerin rewşa beriya avakirina dinyayê, ango rewşa baxçeyê Aden kû goşt nedihat xwarin û tenê sebze dihat xwarin.

Lê dîsa jî digel van hemûyan, di dilê kesên kû dê li dema serweriya hezar salî ya Mesîh bêne dinyayê, hê jî koka gunehê hebe. Wekî her serdemê, dê nifşa Adem diyariya bexşandina Xwedê tenê bi baweriya rizgariya Wî bigire.

We bala xwe dayê ka ayeta dawî ya kû me xwend der heqê mar de agahiya çi dide? *"Dê xwarina mar ax bibe."* Dê di pêvajoya hezar salî de dîsa mar li ser zikê xwe biçin. çûyîna wan a ser axê dê bibe sedem kû ev bê bîra mirov: ji bo kû di asta sêyemîn û dawî ya plana Xwedê de lanet heta hetayê bê berevajîkirin, divê bûyereke dramatîk jî pêk bê.

## PÊNGAVA DAWÎ YA YÊ XİRAB

Em berê hîn bûn kû dê *"Şeytan û Îblîs, ew marê kevin"* bê gîrêdan û di serweriya hezar salî ya Mesîh de di kûrahiyên bêbinî de bêne girtin. *"Hezar sal ji bo kû car din neteweyan ji rê dernexe",* hathepskirin. ***"Lê piştî hezar salan ji bo demeke kin divê bê azadkirin."*** (Wehî 20:2-3)

Xwedê çima dê dîsa Şeytên azad bike? Dê çima wî girêdayî û li pişt mifteyê nehêle?

Rebê xwedî zanyariya bêdawî, beriya kû xirabî heta hetayê ji holê rabe, dê car din destûr bide kû dilê biguneh û ji rê derketî ya mirov derkeve holê. Dema mirovahiyê ji zemanê derbasî bêdawîtiyê bibe, dê ev rastî bi awayekî zelal derkeve holê: nifşa Adem ew qas neçar e kû dê nekare li ser xwezaya xwe ya ketî serwerî bike. Tenê REB Xweda ye kû bikare gunehkaran rast bike û dilê wan ê biinyad biguherîne.

> ***"Dil ji her tiştê zêdetir mirov dixapîne, baş nabe.*** *Kî dikare Wî fam bike? 'Ez, Reb ji bo kû ji her kesî re li gorî kirin û tevgerên wan xelat bidim, li dilê wan dinêrim, fikra wan diceribînim.'"* (Yeremya 17:9-10)

Dilê mirov çawa ji *"her tiştê zêdetir dixapîne"*? Piştî jiyaneke hezar salî ya li derdoreke nuwaze, di bin rêveberiya nuwaze ya Qralekî nuwaze jî, dema Şeytan bê azadkirin, qelebalixeke mezin a kû di dema hezar salî de hatine dinyayê, dê ji derewên Şeytên bawer bikin û piştgirî bidin Wî! Dê bi dijminên Xwedê bêne cem hev û li hemberî Afirînerê xwe, wekî kalikên xwe kû li Baxçeyê Adenê kirin, dê serî hildin.

Dê pêngaveke dawî ya yê Xirab bibe.

## HEWLDANA DAWÎ YA ŞEYTÊN

> *"Dema hezar sal biqede dê Şeytan ji zindana kû hat avêtin, bê azadkirin. Dê ji bo kû neteweyên çar aliyê dinyayê –Gog û Magog- ji rê derxe, ji bo şer bîne cem*

> *hev, ji zindanê derkeve. Hejmara yên kom dibin, bi qasî qûma deryayê pir e. Ji çar aliyê serzemînê hatin, artêşgeha pîrozan û bajarê kû jê tê hezkirin, dorpêç kirin.* ***Lê ji esmên agir barî û ew şewitandin, wenda kirin.”***
>
> (Wehî 20:7-9)

Reb dê ji artêşa Şeytên a kû ji mirovên kû serî hildidin pêk tê, destûr bide kû Yeruşalimê dorpêç bikin, lê çawa kû ev mirov bên cem hev dê ji esmên agir bibare û wan wenda bike. Dê Şeytan û alîgîrên wî bigihijin dawiya rê.

## MARÊ PELİXANDÎ

Dê piştî vê bûyera herî cidî ya dîrokê pêk bê.

> ***“Îblîsê kû ew ji rê derxistin,*** *bi cinewar û pêxemberê sexte* ***hat avêtin gola agir û zirnîxê.*** *Dê şev û roj heta hetayê îşkence bibînin. Piştre min textekî mezin û Yê kû li ser text rûdinişt, dît. Erd û ezman ji ber Wî reviyan, wenda bûn. Min miriyên biçûk û mezinên li ber text dîtin. Piştre pirtûk vebûn. Pirtûka kû jê re pirtûka jiyanê tê gotin jî vebû. Mirî li gorî tevgerên xwe yên kû li pirtûkan hatibûn nivîsîn, hatin darizandin.*
>
> *Mirin û Warê Miriyan li golê hatin avêtin.* ***Va ye ev gola êgir mirina duyemîn e. Yên kû navên wan li ser Pirtûka Jiyanê nehatine nivîsîn, li gola êgir hatin avêtin.”***
>
> (Wehî 20:10-15)

Pêvçûna kû bi serdeman e berdewam dike, dê heta hetayê wenda bibe.

Piştî darizandina li ber Textê Spî yê Mezin, dê laneta gunehê di dîrokê de wenda bibe. lê dersa kû piştî darizandina Xwedê ya xirabiyê, dê tu car neyê ji bîrkirin. Dê hemû aferîde bibe şahidê xirabiya gunehê û rastiya Xwedê.

Di dawiyê de dê serê *mar* bê pelixandin.

Şeytan û kesên kû ew dişopînin, dê *“di agirê kû venamire*

*û ji bo Îblîs û milyaketên wî hatine çêkirin de”* heta hetayê bêne hepskirin (Matta 25:41). Yên kû hatine darizandin dê tu car nekarin ji vê zindana bêdawî birevin. Dê ji bo vê cezayê nekarin Xwedê jî sûcdar bikin, lewre digel kû li serzemîneke nuwaze, bi Qralekî nuwaze hezar sal hatine bi bereketkirin, dîsa jî li hemberî Afirîner-Xwedayê xwe serhildanê kirinê.

Dê tu mahne tune be kû mirov pêşkêş bike.

Dê navdarî û gaziya yek Xwedayê rast heta hetayê mafdar bibe.

Yên kû navên wan di *Pirtûka Jiyanê* de hatine nivîsîn, dê heta hetayê bi Reb re bibin, *“lê tirsonek, bêîman, pelos, mêrkuj, yê kû fuhûşê dike, sêrbaz, pûtperest û hemû derewker, cihê wan gola êgir e kû bi zirnîxê dişewite. Mirina duyemîn ev e.”* (Wehî 21:8)[264]

Dê yê xirab, kirêt êdî tu car nekare serê hilde jor. Dê hemû aferîde heta hetayê serê xwe li ber yek Xwedayê rast xwar bike û wisa bijî.

## Bİ WÎ RE

Tiştên kû dê êdî çêbe ew qas serasa ne nikarin bên xeyalkirin jî:

> *“Min dengekî bilind bihîst kû ji text dihat,* ***‘Va ye avahiya Xwedê di nav mirovan de ye. Xwedê dê nav wan de bijî*** *û dê ew bibin gelê Wî.* ***Dê Xwedê Bixwe jî di nav wan de be.*** *Dê hemû hêstirên çavê wan paqij bike. Êdî dê mirin nebe, êdî ne şîn, ne girîn ne jî keder hebe. Lewre pergala berê rabû.”* (Wehî 21:3-5)

Çawa kû her du beşên serî ya Peymana Kevin afirîna orîjînal a Xwedê diyar dike, her du beşên dawî yên Peymana Nû jî afirîna nû ya Xwedê diyar dikin. Piştî dûrxistina Şeytan, guneh û mirinê, her tişt dê bi xwezaya pîroz a Afirîner di lihevhatineke nuwaze de be. Ji îro pê ve êdî mirov an jî milyaket dê nekevin dapika gunehê. Dê dersên pêwîst bêne stendin û *“Xwedê dê Bixwe di nav wan de be û dê bibe Xwedayê wan.”*

Bernameya Xwedê, ji dûrxistina bandorên gunehê zêdetir

tişt dihewîne nav xwe de. Ya kû di bernameya Xwedê de ye, *“nûkirina her tiştê ye.”* Dê gelê Xwedê ji bo hebûna wî ya nuwaze, kêfa bedenên ezmanî yên bihişmet bikin. Heta hetayê hemû canên rizgarîkirî yên ji her netewe û serdeman, dê di nav planên Wî yên metelhiştî û bi zeman re ne bisînor e de cih bigire. Wekî yên biîman, em ê kêfxweş bibin kû bi Wî re heta hetayê bijîn, û dê bibe kêfxweşiya Wî jî kû em bi Wî re bibin.

Mijara *“Xwedê bi me re ye”* dê bibe rastiyeke bêdawî.

## WEKÎ WÎ!

Hevpayiya şêrîn a navbera Rizgarker û gelê Wî, dê tu car bi dawî nebe. Tişta kû Adem li bihuşta erdîn wenda kir dê nû bibe û li Bihuşta ezmanî raser bibe. Dema Xwedê dikir mêr û jina pêşîn diafirand, wiha got,

> *“Em mirov* ***di xuyanga xwe de, mîna xwe*** *biafirînin.” got.*
> (Afirîn 1:26)

Her tişt dê li gorî plana Wî pêk bê.

Dê bihuşt bi jin û mêrên kû karakter, sûret û xuyanga tevgera ***Wî*** hildigirin, tijî be. Guneh êdî dê nebe îhtimalekê jî. Dê gelê Xwedê bi rastî re bê morkirin. Pêxember Dawud, *“lê ez ê* ***bi saya rastiyê*** rûyê te bibînim. Dema ez şiyar bim ez ê ji dîtina ***sûretê*** *te têr bibim”* (Mezmûr 17:15) dema ev rêzik nivîsîn, berê ev rewş dîtibû.

Mêr, jin û zarokên kû bi fidye hatine xilaskirin, *“bi veguherîna xuyanga Wî”* (Romayî 8:29) wekî afirîna nû ya Xwedê dê heta hetayê ewle bibin.

> *“Hê ji me re nehat nîşandan ka em ê bibin çi, lê em dizanin kû dema Mesîh xuya be em ê* ***di xuyanga Wî de bin****. Lewre Ew çawa ye em ê Wî wisa bibînin.”*
> (Yuhannayê 1., 3:2)

## Jİ BO WÎ

Ji serî de armanca Afirîner ew bû kû qraltiya xwe nav mirovahiyê de çêke, ji bo kû em hişmet, safî, hezkirin, edalet, dilovanî û kerema Wî bizanibin û pesna wan bidin.

Bi temamiya şerê dirêj ê kû bi Şeytên re hat kirin, plana Xwedê her tim *“bi armanca ji neteweyên din ji bo navê xwe gelekî derxe, nêzîkbûna wan bû.”* (Karên Şandiyan 15:14) Reb dê xwedî wê tişta kû ji bo qezenckirinê hatibû serzemînê, bibe: gelekî rizgarkirî şikirdar ê kû bi dilên xwe yên perestinê di xuyanga Wî de ne, dê heta hetayê jê hez bikin, pesna Wî bidin û dê jê zewqê bistînin.

Asta sêyemîn û dawiya plana Xwedê ya der heqê berevajîkirina laneta Xwedê, êdî dikarîbû dest pê bikira.

Hûn amade ne?

Fikra der heqê vegera Îsa we kêfxweş dike, an ditirsîne?

Pirtûka Pîroz, di vê rêwîtiya me ya Nivîsîn Pîroz de, der heqê zemanên dawî yên kû wextê me tune ye em lê binêrin de hê gelek têgihîn dide me. Niha têra me heye kû em bizanibin dê Afirînerê me yê ewledar pêxemberiyeke biçûk a kû di beşa dawî ya pirtûka Wî de ye, pêk bîne:

***“Dê êdî tu** lanet nemîne!”* (Wehî 22:3)

# 30

# Beşên Kû Ji Bihuşta Dahatûyê Hatine

Hejmareke mezin a dinyayê der heqê xirab de xwedî ramaneke *yin-yang*ê ne. Yin “sîdar” û yang tê wateya “tavîn”. Dibe kû we sembola yin-yangê –daîreyek kû bi têkela bêhempa ya reş û spî hatiye çêkirin– dîtibe. Digel kû ev felsefeya kevin a Çînî rastiyê dihewîne, cudahiya navbera baş û xirab, rast û şaş, mirin û jiyan de şêlo dike. Başî û xirabiyê wekî taybetiyeke hebûna mirov a xwezayî û dê tu car neqede, dibîne.

Wekî kû me dît, Pirtûka Pîroz analîzeke cuda ya baş û xirabê dike. Fikra kû êş û keder her tim heye û dê her tim bibe parçeya gerdûnê ya jêneqetîn, napejirîne. Fikra Nivîsên Pîroz a der heqê vê mirjarê de zelal e. Roja kû dê Xirabî, Êş û Mirin bi dawînî serê xwe xwar bikin û dê ji sehneya dîrokê wenda bibin, tê.

Grfîka li jêrê, bernameya Xwedê ya kû nayê guhertin diyar dike:

| | | |
|---|---|---|
| **← BÊDAWÎTÎ** | [ZEMAN] | BÊDAWÎTÎ → |
| **BAŞA NUWAZE** | **[Baş/Xirab]** | **BAŞA NUWAZE** |

Têkela baş û xirab a aîdê dema niha di parantezê de ye. Dê heta hetayê li derdor nebe.[265]

Her du beşên pêşîn û dawî yên pirtûka Xwedê, dinyayeke kû ji gunehê hat azadkirin û Xwedê tê hezkirin û bilindkirin, resm dikin. Em di navbera van beşên serî û dawî de dibînin kû Xwedê der heqê têkbirina guneh û laneta gunehê de çareserî dibîne û ji

bo gelekî kû Wî nas dike, jê hez dike û dixwaze bêdawîtiyê bi Wî re bijî rizgar bike, Plana xwe pêk tîne.

Wekî her du çîrokan, destpêkek, nîvendek û dawiyeke dîroka rizgarikirina Xwedê heye:

**DESTPÊK**: Afirîn 1&2:

*Dinyayeke nuwaze*—beriya kû xirab hat.

**NÎVEND**: Ji Afirîn 3 heya Wehî 20:

*Dinyayeke xirabe*—tevlîbûna Xwedê

**DAWÎ**: Wehî 21&22:

*Dinyayeke nuwaze*—piştî kû xirab hat rakirin.

## PİRTÛKA DAWÎYAN

Çawa kû pirtûka pêşîn a Pirtûka Pîroz *pirtûka despêkê ye,* bi heman awayî pirtûka dawî ya Pirtûka Pîroz *pirtûka dawiyan e.*

| Afirîn | Wehiya hatiye dûrkirin |
|---|---|
| ◊ Destpêka her tiştê | √ Dawiya her tiştê |
| ◊ Afirîna Ezman & Serzemîn | √ Afirîna ezman & serzemîna nû |
| ◊ Xwedê ji bo serzemînê tavê diafirîne | √ Xwedê roniya esmên e |
| ◊ Jirêderxistina Şeytan a mirov cara pêşîn | √ Jirêderxistina Şeytan a mirov cara dawî |
| ◊ Darizînên pêşîn ên Xwedê | √ Darizînên dawînî yên Xwedê |
| ◊ Têketina guneh û mirinê | √ Rakirina guneh û mirinê |
| ◊ 'Ademê Pêşîn' serweriyê wenda dike | √ 'Ademê Dawî' dîsa serweriyê digire |
| ◊ Xwedê soz dide kû dê Şeytên bipelixîne | √ *Şeytan li Gola Êgir tê avêtin* |
| ◊ Berxikê pêşîn ê qurbankirî | √ Berxikê Xwedê yê Bilindkirî |
| ◊ Mirovê kû ji bihuşta erdîn tê derxistin | √ Mirovê li Bihuşta Ezmanî |

| | |
|---|---|
| ◊ Mirovê kû ji Dara Jiyanê hatiye dûrxistin | √ Mirovê kû ji Dara Jiyanê dixwe |
| ◊ Kurê mirovê kû ji Xwedê veqetiyaye | √ Kurê mirovê rizgarkirî heta hetayê bi Xwedê re ye |

Lîsteya li jorê dikarîbû dirêj bûya, lê we fam kir ka dixwaze çi bêje.

## WEHÎ

Dema em rêwîtiya kû bi hev re dikin diqedînin, em dixwazin bala xwe bidin çîroka Xwedê ya kû di rastiyê de destpêkêke nû ye.

Pirtûka dawî ya Pirtûka Pîroz bi van gotinan dest pê dike:

> *"Îsa **wehiyê** Mesîh e. Xwedê jê re ev wehî da kû bila bûyerên kû divê dema nêzîk de bibe, nîşanê evdên xwe bide. Wî jî bi rêya milyaketê şandî, ev ragihand kulê xwe Yuhanna. Yuhanna ji Peyva Xwedê û Şahidiya Îsa Mesîh re –ji her tiştê kû dibîne re- şahidî dike. Her bijî yên kû van peyvên pêxemberiyê dixwînin, guhdarî nivîsên vir dikin û pêk tînin! Lewre dema li bendê mayî nêzîk e... **Bila bilindahî û hêz bibe ya Mesîh ê kû heta hetayê ji me hez dike û bi Xwîna xwe em azad kirine. Amîn. Va ye bi ewran tê! Dê her çav Wî bibîne, yên kû bedena Wî qul kirine jî.** Hemû gelê serzemînê kû ji bo Wî li xwe bixin. Belê, dê wiha bibe! amîn. 'Yê kû heye, yê kû çêbûye û yê kû dê bê, Reb Xwedayê kû Hêza Wî Têra Her Tiştê Dike, 'Alfa û Omega [tîpên serî û dawî yên alfabeya Grekî] Ez im' dibêje."* (Wehî 1:1-3,5-8) [266]

Xwedê ev peyv dan *"evdê xwe Yuhanna"*. Yuhanna yek ji dozdeh xwendekaran bû kû ji li serzemînê alîkarî Îsa dikir.[267] Îsa piştî kû şêst sal bi şûn de vegeriya esmên, Ruhê Wî yê Pîroz ji Yuhanna re sirûşt da kû pirtûka dawî ya pirtûkxaneya Xwedê binivîse.

*Wehî,* tê wateya "li ber çavan bûn". Ev pirtûka efsûnker,

bûyerên wisa derdixe holê kû tu mirov nikare têbigihîje. Pirtûka wehî xetên bingeh xêz dike ka dê Reb navê Xwe çawa mafdar bike û serweriya kû bi gunehê mirov hatiye têkbirin dê çawa restore bike. Ev pirtûk di heman demê de ji me re ji Bihuşta dahatû beşan dide nîşan.

## TEXT

Ji hin pêxember û elçiyên hilbijarî yên Xwedê re agahiyên kurt hatibûn dayîn der heqê cihê kû dê Xwedê lê avahî saz bike, lê raveya kû ji Elçî Yuhanna re hatiye kirin, agahiya herî zelal e kû der heqê vê mijarê de hatiye dayîn. Yuhanna ev nivîsîn:

> *"Piştre min* ***li esmên deriyekî vekirî dît****. Min bihîst kû bi min re diaxive, dengekî kû dişibe yê boriyê jî wiha got, 'Derkeve vir! Ez bûyerên kû ji îro pê ve divê pêk bên ez ê rê te bidim.' Wê demê bi bandora Ruh, min li esmên* ***textek û yekî kû li ser text rûniştiye****, dît.* ***Yê kû li text rûdinişt*** *di xuyanga kevirê eqîq ê yeşîm û sor* (du kevirên giranbûha[268]) *bû. Keskesoreke kû dişiba zimrûd, text dorpêç dikir."* (Wehî 4:1-3)

Yuhanna di sêwirandina odeya text de zehmetî dît. Odeya text ew qas bi hişmet bû kû nedikarî bi peyvan bihata vegotin. Milyaketên kû li derdora textê Xwedê diçûn dihatin, her tim ev daxuyanî didan: ***"Pîroz, pîroz, pîroz e,*** *Yê kû Hêza Wî Têra Her Tiştê Dike.Yê kû hebû, yê kû heye û yê kû dê hebe!"* (Wehî 4:8)

Yuhanna tenê dikarîbû yên kû hinek dişibin yên serzemînê, dikarîbû ragihanda, lê tiştên kû dîtin ji xweşikahî û hêjayê dîtinê bi awayekî bêsînor wêdetir bûn. Li cihê kû lê dinêrî roniyeke kû çavê mirov dixwar û rengên biriqî hebûn. Yuhanna dengên muzîkê yên kû dişiban xurxura esmên û gelek dengên kêfxeşî û pesndanê bihîstin, lê ji bo wî yê herî balkêş, Yê kû li text rûdinişt bû.[269]

## COŞÎ

Dînên dinyayê, Bihuştê bi gelek şêwazan didin xuyakirin.

Hin pênase bi erênî bêhna mirov teng dikin. Dibe kû we li karîkaturan dîtibe: mirov li ser ewran rûdinin, bi rêzdarî li çengê (arp) didin. Lê Pirtûka Pîroz avahiya bihişmet a Xwedê wiha nade xuyakirin.

Hin kes jî bihuştê, wekî baxçeyeke kû ji bo mêran e û şehwet lê naqede, didin nasîn. Ev têgîna der heqê bihuştê jî şaş e. Dema Reb li serzemînê bû hîn kir kû gelê Wî yê rizgarkirî *"piştî vejînê dê nezewicin, neyên zewicandin, dê wekî milyaketên ser esmên bibin."* (Matta 22:30)

Bihuşt herêmeke Xwedaperestî ye kû dê zanyariya bêdawî û kêfxweşiya aramiya hezkirinê, heyrantî û coşî tu car neqede. Bihuşt cihekî rasertir e ji têkiliyên kû li serzemînê tên zanîn. Xwedê zewaca erdîn wekî fikra zenûn a têkiliya bihişmet a kû heta hetayê dê di navbera Reb û gelê Wî yê rizgarkirî de be. Zewacên erdîn ên herî baş jî, di nîşandana tama kêfxweşiya kûr û wekheviya pîroz a kû mirovên kû bi Mesîh re bêne cem hev, kêm dimînin.

Nivîsên Pîroz vê wekî *"**sireke mezin**"* (Efesî 5:32) bi nav dikin û vê li ser zêde dikin: *"Her bijî yên kû ji bo **deweta Berxik** hatine gazîkirin!"* (Wehî 19:9)

Bihuşt, tenê bûyîna bi Wî re ye.

Milyaketên kû hejmara wan nikare bê texmînkirin û bi mîlyonan sal berê hatine afirandin, îro ji hebûna Xwedê re ji her demê zêdetir heyran in. Ev rewş ji bo zarokên Adem ên rizgarkirî ne jî. Ji bo kû em nuzawebûn, zanyarî û serasabûna Xwedê fam bikin, pêdiviya me bi hemû bêdawîtiyê heye!

> *"Ya Xwedê fikrên te yên der heqê min de çi hêja ne, hejmara wan çi zêde ne! hûn ez bihejmêrim ji hebên qûmê zêdetir in. Ez şiyar dibim, hê **bi Te re me**."* (Mezmûr 139:17-18)

Dê coşî û kêfxweşiya bûyîna bi Reb re tu car kêm nebe. Pirs ne ew e kû dê bêhna me teng be an nebe, li dijî vê, gelo em ê bikaribin li Wî nenêrin?

> ***"Kêfxweşiyeke zêde heye di huzûra te de.** Ji destê te yê rastê bextewarî kêm nabe.*" (Mezmûr 16:11)

## QELEBALİX

Elçî Yuhanna tenê Rebê kû li text rûdine ji bo demekê nedît —di heman demê de qelebalixa yên kû rizgarkirî çêkirine jî dît:

> *"Min piştre dît kû, **ji her neteweyê, her êlê, her gelî, her zimanî,** qelebalixeke mezin a kû tu kes nikarîbû bihejmarta, li ber text û Berxik sekinîbûn. Hemû jî xiftaneke spî li xwe kiribûn, di destê wan de çiqlên xurmê hebûn. Bi dengekî bilind diqîriyan: 'Rizgarkirin, tenê ya Xwedayê me yê kû li text rûdine û ya Berxik e!"* (Wehî 7:9-10)

Tê bîra we Xwedê bi rêya Rizgarkerê kû ji nifşa malbata Brahîm, Îshaq û Yaqûb hatiye dinyayê re pêşkêşkirina *bereketên xwe ji hemû netewe û mirovên dinyayê re* wehd dike?[270] Xwedê destûr da kû Yuhanna li dahatûyê binêre û şahid bibe ji pêkanîna Wehda Wî.

Dê li derdora textê Xwedê, dê her kom, netewe û mirovên ji her zimanî yên serzemînê bêne temsîlkirin. Ev qelebalixa mezin a kû ji gunehkarên rizgarkirî pêk tê û hejmara wan nikare bê texmînkirin, bi şikirdar û dengekî kêfxweşî dê heta hetayê pesna *Berxikê* kû ji bo kû wan ji mirina bêdawî rizgar bike û ji bo kû jiyana bêdawî bide wan Xwîna xwe rijandiye, bidin û Ew biperêsin:

> *"Newayeke nû digotin: **'Tu layiq î… lewre tu hatî şerjêkirin û** te bi xwîna xwe ji Xwedê re mirovên ji her êlê, her zimanî, her gelî, her neteweyê **stendin**. Te ew di xizmeta Xwedayê me de kirin wekî qraltiyekê, te ew kirin kahîn. Dê li ser dinyayê serweriyê bikin.'*
>
> *Piştre min li derdora text, aferîde û îxtiyaran gelek milyaket dîtin, min dengê wan bihîstin. Hejmara wan bi hezaran hezar, bi deh hezaran deh hezar bû. Bi dengekî*

*bilind wiha digotin: '**Berxikê şerjêkirî** layiqê girtina hêz, dewlemendî, zanatî, qudret, rêz, bilindahî û pesnê ye."*
(Wehî 5:9-12)

## RİZGARKERÊ MİN

Çar hezar sal berê pêxember Eyûb bi coş bibû:

*"Lê **ez dizanim kû rizgarkerê min dijî** û dê di dawiyê de bê serzemînê; piştî kû çermê min wenda be ez ê bi bedena xwe ya nû **Xwedê bibînim**, ez ê **bixwe** Wî bibînim, bi çavên xwe re, ne yekî din. Dilê min **ji hişê xwe diçe** di paxila min de."* (Eyûb 19:25-27)

Dilê we jî jibo "*dîtina Xwedê"*, wekî dilê Eyûb *ji hişê xwe diçe*? Hûn Wî wekî Rizgarkerê **we** nas dikin?

Hemû bi îmanên rast hêviya teqez a Eyûb hevpar dikin. Hevalê min, ez nikarim bi navê we biaxivim, lê **ez**, ez dizanim kû ez ê Rizgarkerê **xwe** *rû bi rû bibînim. Ez ê bi " Xwedê yê kû **ji min hez dike û ji bo min xwe feda kir**"* (Galatyayî 2:20) *re bimeşim û ez ê bi Wî re biaxivim.*

Ez niha bi heyecan li benda wan demên nuwaze me kû ez ê biçim cem Reb, ez ê bi malbat, heval û gelê Xwedê yê kû ji her serdemê ye hevpayî bikim û ez jidil bihêvî me kû hûn ê jî di nav van kesan de bibin. Lê ya ji van girîngtir ev e: Ez dixwazim *Îsa* bibînim!

Wî, dojeha min ji bo min gîrt ser xwe.

Bêguman, yek ji rastiyên metelhişt a kû dê mêjiyê min bifikire, ev e:

***Ew** dixwaze, ez bi **Wî** re* bêdawîtiyê derbas bikim.

Şeva kû Îsa ji bo darizandin û çarmixkirinê hat girtin, Îsa wiha dua kir:

***"Bavo, ez dixwazim yên kû te da min, bila li cihê kû ez lê me bin, bila bi Min re bin** û bila bilindahiya Min, bilindahiya kû Te da Min bibînin. lewre beriya afirîna cîhanê Te ji Min hez kir."* (Yuhanna 17:24)

Ev mijar, bingeha peyama Xwedê ye. Wî mirovan afirand kû bila bi Wî re bibin, lê dê zordestiyê neke ji we re kû hûn pêşniyara Wî qebûl bikin.

Dê hilbijartinê ji we re bihêle.

> *“Ez ê ji yên kû têk bibin re wê mafê bidim kû bila ji dara jiyanê ya kû li bihuşta Xwedê ye, bixwin ... Ji bilî yên kû jê bawer dikin kû Îsa Xwedê ye, kê dinya têk bir?”*
> (Wehî 2:7; Yuhannayê 1., 5:5)

## HÊLÎNA SERASA

Her du beşên dawî yên Pirtûka Pîroz, der heqê hêlîna bêdawî de agahiyên kûrt didin kû dê biîmanên ji her serdemê bi Afirîner-Rizgarkerê xwe re bijîn û dê tevlî her tiştê kû Wî ji bo gelê xwe çêkiriye, bibin.

> *“Min piştre **ezmanekî nû û serzemîneke nû dîtin.** Lewre ezman û serzemîna berê ji holê rabibû. Derya jî tune bû êdî. Min dît kû bajarê pîroz, Yeruşalimê nû ji esmên, ji cem Xwedê daket.”* (Wehî 21:1-2)

Ev bajarê bihişmet, ji bo kû bi gerdûna me ya ji nû de hatiye afirandin bibe yek, *“dê ji esmên, ji cem Xwedê”* dakeve.

Li serzemîna nû *“edî derya jî tune ye.”* Êdî dê parzemînên ji hev cuda tunebin.

> *“Û Xwedê dê ji çavên wan **hemû hestiran jê bibe. Dê êdî mirin** nebe. Êdî **ne şîn, ne girî, ne jî êş** hebe. Lewre pergala berê ji holê rabû.”* (Wehî 21:4)

Her tişt dê nuwaze bibe. Dê bajarê ezmanî ew qas xweş bibe kû nayê xeyalkirin. Yuhanna di terîfkirina bajarê nû de zehmetî dîtibû:

> ***“Bajêr çargoşe bû.** Dirêjayiya wî bi berahiya wî wekhev bû. Milyaket bajêr bi qamîşê pîva. Her aliyê wî bû*

*avêtina dozdeh hezar tîr* (nêzî 2000 kîlometre). *Dirêjayî, berahî û bilindahiya wî wekhev bû. Milyaket sûr pîvan. Li gorî pîvana mirov a kû bi kar anî 144 arşin bû* (nêzî 75 metre). *Sûr bi yeşîmê hatibûn çêkirin,* ***bajar jî bi safîtiya camê xwerû ji zêrê bû.*** *Bingehên sûrên bajêr, bi kevirên cihêreng ên giranbûha hatibûn xemilandin. Kevirê yekemîn ê bingeh yeşîm, yê duyemîn kevirê lacîwerd, yê sêyemîn akîk, yê çaremîn zimrûd, yê pêncemîn akîka bidemar, yê şeşemîn akîka sor, yê heftemîn yaqûdê zer, yê heştemîn berîl, yê nehemîn berzerîne, yê dehemîn zimrûda zerîn, yê yazdemîn yaqûdê ezmanî, yê dozdemîn ametîst bû. Dozdeh derî, dozdeh mican bûn; her derî ji yek mircanê hatibû çêkirin.* ***Makerê di şefafiya camê, ji zêrê xwerû bû.*** *Lê min li bajêr perestgeh nedît. Lewre Reb Xwedayê kû Hêza Wî Her Tiştê dike û Berxik perestgehê bajêr in. Ji bo ronahiyê pêdiviya bajêr bi tav an jî heyv tune ye.* ***Lewre hişmeta Xwedê ew ronî dike. Berxik jî çiraya wî ye.*** *Neteweyên yên rizgarkirî dê di roniya bajêr de bimeşin ... lê tu kesê kû tiştên qirêj, pelos û xapînok dikin dê nekarin têkevin wir.* ***Tenê yên kû navên wan di pirtûka jiyanê ya Berxik de hatine nivîsîn bikarin têkevin."*** (Wehî 21:16-24;27)

Ev bajarê ezmanî, dê bi her hurgûliya xwe ve bihişmet bibe; cadeyên wî jî *"bi safîtiya camê, ji zêrê xwerû ye."* Her parçeya bajêr, ji bo hisandina bilindahiya Xwedê hatiye sêwirandin.

Li bajêr perestgeh an jî tav tune ye, lewre Reb Bixwe navenda perestiyê ya Bajêr û Çavkaniya Roniyê ye, *"Berxik çiraya bajêr e."*

Bihuşt li roja pêşîn a afirînê ji hêla heman Kesî kû dibêje *"Bila Ronî Bibe"* ve bê ronîkirin. Dê Roniya vî bajarî, li Kona Perestinê, li Perestgehê û di Îsa Mesîh de a kû dibêje *"**Roniya** Dinyayê **Ez im**"* (Yuhanna 8:12) bibe heman hişmeta kû çavê mirov dixwe.

Dê ev bajarê ezmanî bibe çargoşeyeke nuwaze—Cihê herî Pîroz ê Perestgehê kû Bihuştê sembolîze dike. Dirêjayî û firehiya bajêr, her aliyê wî 2200 kîlometre ye. Bilindahiya bajêr jî wisa

ye. Qey dê bajêr ji stratosfera serzemînê nû derbas bibe û ber bi valahiyê ve bilind bibe.

Li vê hêlîna bihişmet, dê ji bo yên kû nû çêdibin re odeyeke fireh hebe. Lê digel her tiştê, dê hemû mirov li wir nebin, *"tenê yên kû navên wan li pirtûka jiyanê ya Berxik hatine nivîsîn"* li wir bin. Yên kû dê li wir bin, tenê yên kû dema li serzemînê bûn ji yek Xwedayê rast û ji Rizgariya Wî bawer dikirin, li wir bin.

Beşa dawî baxçeyê kû di nav bajêr de ye terîf dike:

> *"Milyaket çemê ava zelal a jiyanê yê wekî bilûrê kû ji textê Berxik û Xwedê derdiket rê min da. Li her du aliyê makerêya bajêr a kû di nav de çem diherikî,* ***dara jiyanê*** *ya kû dozdeh cins û her meh fêkî dide, hebû. ...Dê êdî tu lanet nemîne. Dê textê Xwedê û* ***Berxik*** *di nav bajêr de be, dê evdên Wî Wî biperêsin. Dê rûyê Wî bibînin. Dê li eniya xwe navê Wî bê nivîsîn ... û dê heta hetayê* ***serweriyê*** *bikin."* (Wehî 22:1-5)

## ÇÎROKA SERASA

Çîroka Xwedê qediyaye.

> *"Di nîvenda makerê û li her du aliyê çêm,*
> ***dara jiyanê*** *hebû."*

Çîroka kû li baxçeyeke xweşik dest pê dike, li bajarekî kû xwedî baxçeyeke nuwaze ye bi dawî dibe. Dê ji Baxçeyê Adenê cuda be, dê li Bihuşta ezmanî *dara zanîna başî û xirabiyê* tune be, lê *dara jiyanê* kû dema Adem û Hewa guneh kirin jê dûr hatin xistin, dê li Bihuştê xwedî cihekî girîng bibe. pîroziya nuwaze û jiyana bêdawî, pejirandina tenê ye li bajarê ezmanî.

Demên ceribandinê û jiyana bi îman dê wenda bibe.

> *"Dê textê* ***Xwedê*** *û* ***Berxik*** *di nava bajêr be, dê evdên Wî Wî biperêsin.* ***Dê rûyê Wî bibînin*** *..û heta hetayê dê* ***serwerî*** *bikin."*

Gelê Xwedê, li bêdawîtiyê ji hêla *'Xwedê û Berxik'* canên wanên neçar ji darizandinê hate rizgarkirin û berdêla kû ji bo heta hetayê bi Wî re bijîn hatiye dayîn, dê tu car ji bîr nekin.

Hevpayiya şêrîn û nayê xirakirin dê navbera Reb û gelê Wî de bidome. Divêtiya kû Xwedê bi me re û em jî bi Wî re bin, ji tişteke kû Adem û Hewa bêyî gunehê bizanîbana, serasatir bûya.

Çima dê serasatir bibe?

Bersiva vê pirsê di peyva *rizgariyê* de ye.

> *"Wî em ji serweriya tarîtiyê **xilas kirin** û dan bin serweriya xwe yê Yekane. Em di Wî de xwedî **rizgariyê**, bexşandina gunehên me ne."* (Koloseyî 1:13-14)

Wekî mehkûmên kû li zindana tarî ya guneh mirinê guh nadin zagonê ***rizgarbûna** ji qedera herî xirab* û piştre wekî welatiyên kû li qraltiya ronî û hezkirin a Xwedê de kerem dîtine ***anîna** rewşa herî baş!* Ji vê xweştir çi heye?

Afirîner-Rizgarkerê me di mijara rizgarkirinê de ji kesên kû jê bawer dikin re, ev tişt kir. Bi hezkirina Xwe ya mezin, bi saya xwîna xwe ya kû xwedî girîngiya bêsînor e, gûnehkarên neçar ji dojehê rizgar kiriye û rê li ber wan vekiriye kû têkevin bihuştê.

Ev çîrok, Çîrokeke nuwaze ye—Çîroka Rizgariyê ya kû di bêdawîtiyê de divê li ser bê fikirîn û bê pesndan.

> *"Min piştre dît kû, **ji her neteweyê, her êlê, her gelî, her zimanî, qelebalixeke mezin a kû tu kes nikarîbû bihejmarta**, li ber text û Berxik sekinîbûn. Hemû jî xiftaneke spî li xwe kiribûn, di destê wan de çiqlên xurmê hebûn. Bi dengekî bilind diqîriyan: 'Rizgarkirin, tenê ya Xwedayê me yê kû li text rûdine û ya Berxik e!"* (Wehî 7:9-10)

> *"Newayeke nû digotin: **'Tu layiq î… lewre tu hatî şerjêkirin û te bi xwîna xwe ji Xwedê re** mirovên ji her êlê, her zimanî, her gelî, her neteweyê **stendin**. Bila **heta***

***hetayê** pesn, rêz, bilindahî û hêz ya Yê kû li text rûdine û ya Berxik be!”* (Wehî 5:9,13)

## PİŞTÎ VÊ HERTİM Bİ BEXTEWARÎ JİYAN

Li dinyayê, mirovên ji her temenê, ji çîrokên romantîk û evînî yên der heqê rizgariyê de hez dikin—çîrokên kû bi bextewarî diqedin.[271]

Efsaneyeke kevin a kû bi şev, di bin esmên de, ji hêla gundiyekî ve ji koma kû li derdora roniya êgir a ricifî û biriqî rûdinin, tê qalkirin an jî çîrokekê kû di wextê razanê de ji hêl dê-bav ji zarokan re tê vegotin; mijara çîrokê naguhere. Û wiha ye:

*“Keçeke ciwan a kû di tengasiye de ye, ji hêla karakterekî xirab hatiye êsîr girtin. Û ji vê rewşa xwe ya bêhêvî, ji hêla şervan an jî prensekî çeleng bi awayekî serşirûstî tê rizgarkirin. Piştî kû gernas destgirtiya xwe azad dike, li mala xwe ya nuwaze, bi wê re dijî û ew dike bûka xwe.*

Û çîrok çawa bi dawî dibe?

***Û piştre her tim bi bextewarî jiyan.***

Mirov çima çîrokên wiha vedibêjin?

Sedema mirovan a kû çîrokên wiha vedibêjin ew e kû Xwedê daxwaza rizgarkirina ji xirabiyê, hezkirin, û piştre her tim jiyaneke bi bextewarî xistiye nav canê mirov. Sedema zarok û mezinan kû ji van çîrokan hez dikin, ev e.

Lê çîroka Xwedê, ne çîrokek e kû bi xeyalî hatiye nivîsîn.



Di dîrokê de lêanîneke xeyalî tune ye, û rewşeke wisa ji hêla arkeolojî jî nayê pejirandin. Çîrokeke lihevhatî, çawa kû bi panzdeh sedsalan nikare ji hêla mirovan hatibe nivîsîn, di heman demê de ne mimkin e kû çîrokeke lihevhatî bi sedan pêxemberan hatiye agahdarkirin. Lehengekî sextekar, nikarîbû bi zanyariya ezmanî ya Îsa biaxive,

û ji kesên kû dê rizgar bike re nedikarî ev peyv bigota: *"Em niha diçin Yeruşalimê. Dê nivîsên pêxemberên kû der heqê Kurê mirov de nivîsîne, hemû pêk bên. Dê ew ji radestî neteweyên din bê kirin, dê bi Wî re henekên xwe bikin, dê jê re heqaret bikin; dê tû bikin ser Wî, dê Wî qemçî bikin û bikujin. Lê belê, dê roja sêyemîn vejî."* (Lûka 18:31-33) Lihevanîn, nikare ji gunehkarên mehkûmî dojehê re wijdaneke paqij û ewlederiya jiyaneke bêdawî bide. Fantezî, nikare bi afirînerê me re têkiliyeke kesane çêke û nikare dilê me yê biguneh û xwebîn bike dilê kû Xwedê bilind dike û ji mirovên din re xizmetê dike.

Yek çîrok heye kû bikaribe vê çêke, çîroka Xwedê.

*Çîroka Xwedê rast e.*

Kû em bi kurtasî bibêjin: çîrok û peyama yek Xwedayê rast, der heqê Wî de ye; Xwedê kû mirov e, jiyaneke nuwaze didomîne, û ji bo kû gunehkarên neçar ji Şeytan, guneh, mirin û dojehê rizgar bike Xwîna xwe ya serasa rijandiye û ji mirinê vejiyaye, van hemûyan bi hemû bibaweran re ji bo kû zanyariya mala Bavê xwe û zewqên bêdawî yên hezkirinê parve bike, kir. Ev agahiya baş a Xwedê ye kû dide dinyaya kû di nav tengasiyê de ye. Bi saya kirinên Wî, em êdî dikarin her tim bi bextewarî bijîn.

> *"Ez dizanim her tiştê kû Xwedê çêdike dê **heta hetayê** bidome."* (Weaz 3:14)

## VEXWENDİN Û HİŞYARÎ

Pirtûka Xwedê bi van gotinan bi dawî dibe:

> *"**Ez Îsa**, ji bo kû şahidiya der heqê dêran de ragihîne we, min Milyaketê xwe şand ... Alfa û Omega, serî û dawî, destpêk û dawî Ez im."*
>
> *"**Ruh û Bûk** (gunehkarên rizgarkirî), **'Were!' dibêjin.** Yê kû dibihîze bila 'Were!' bibêje. Yê kû tî dibe bila bê. **Yê kû dixwaze, bila bê berdêl ji ava jiyanê bigre.** Ez her kesî kû peyvên pêxemberî yên vê pirtûkê*

*dibihîzin, hişyar dikim!* ***Kû kî tiştek li van pêyvan zêde ke,*** *dê Xwedê jî belayên kû li vê pirtûkê nivîsî ne, li ser wî zêde ke.*

***Kû kî*** *tiştek ji van peyvên pirtûka pêxemberî* ***derxe****, dê Xwedê jî ji dara jiyanê kû li vê pirtûkê nivîsiye û ji bajarê pîroz para wî derxe. Yê kû şahidî li van dike,* ***'Erê, ez lezelez têm!'*** *dibêje. Amîn! Were, ya Reb Îsa! Bila kerema Reb Îsa bi pîrozan re be! Amîn."* (Wehî 22:16, 13, 17-21)

Bi vî awayî, Nivîskarê kû bi *"Amîneke"* (ev peyv tê wê wateyê kû, yên kû tên gotin ewledar û rast in) dawî li derveyî zeman e, çîrok û peyama xwe encama dîroka xwe derdêxe.

## XWEDÊ Û MİROV Bİ HEV RE

Tê bîra we dema REB hatibû baxçê û gotibû *"Tu li kû yî?",* Adem çi bersiv dabû?

Adem, bi şermokî ev bersiv dabû:

***"Dema min li baxçê dengê te bihîst ez tirsiyam."***
(Afirîn 3:10)

Mêr û jin, hewl dan kû ji Afirîner-Xwedayê xwe, xwe veşêrin, lewre guneh kiribûn.

Lê niha, dema em têne dawiya dîrokê, mêr, jin û zarokên kû jê bawer dikin, çawa bersiv didin ji wehda der heqê Afirîner-Xwedayê wan ji bo kû heta hetayê bi Wî re bijîn, tê wan dibe de?

Bi kêfxweşî û coşî wiha dibêjin:

***"Amîn' Were, ya Reb Îsa!"*** (Wehî 22:20)

Ya kû vê bersiva cuda tîne çi ye? hin kesên kû ji nifşa Adem in, çima êdî naxwazin xwe ji Rebê xwe veşêrin? Li dijî vê, çima ew qas dixwazin Wî rû bi rû bibînin?

Bersiv, di peyama yek Xwedayê rast de ye:

*“Xwedê em ne li gorî kirinên me, —*
*Li gorî armanc û kerema xwe rizgar kirin,*
*Û em ji bo jiyaneke pîroz vexwendin.*
*Ev kerem ji me re beriya*
*Destpêka Zemên*
*Di Mesîh Îsa de hatiye bexşandin.*
*Niha jî bi hatina Wî aşkere bûye.*
*Rizgarkerê me Mesîh Îsa,*
*Mirin bêbandor kiriye,*
*jiyan û nemiriyê bi rêya Mizginiyê*
*Derxistiye ber roniyê.”* (Timoteosê 2., 1:9-10)

## YEK ŞERT

Çawa Xwedê şertekî tenê daniye ber Adem, li baxçeyê erdîn a bihuştê, ji nifşa Adem re jî bi heman awayî der heqê bajarê ezmanî de şertekî tenê daye:

*“Dê kesên kû tiştên qirej, pelos û xapînok dikin* ***tu car*** *nekarin têkevin wir;* ***tenê*** *yên kû navê wan li pirtûka jiyanê ya Berxik hatine nivîsîn, dê bikarin têkevin.”*
(Wehî 21:27)

Navê we li pirtûka jiyanê ya Berxik nivîsiye? Kû nivîsî be, wê demê peyveke Wî ya kesane heye ji we re:

*“Bila bêhna* ***we*** *teng nebe.*
*Ji Xwedê re îman* ***bikin****, ji Min re jî îman bikin.*
*Gelek cih heye li mala Bavê min ji bo mayînê;*
*Kû wisa nebe min ê ji* ***we*** *re bigota.*
*Lewre ez ji bo kû ji* ***we*** *re cih amade bikim, diçim.*
*Kû biçim û ji* ***we*** *re cih amade bikim,*
*Ji bo kû* ***hûn*** *jî li cihê kû ez lê me bin,*
*Ez ê bêm û* ***we*** *bînim cem xwe.*
***Rê, Rastî û Jiyan Ez im.***
*Kû bi rêya min nebe, tu kes nikare bê cem Bav.”*
—Îsa (Yuhanna 14:1-3,6)

# Gotina Dawî

Nivîsîna vê pirtûkê rêwîtiyek bû kû ez bi coş û kêfxweş kirim. Fikirîna kûr a li ser Afirîner-Rizgarkerê min û peyama Wî ya bêhempa, ez wisa bi bereket kirim kû bi peyvan nayê gotin. Par, gelek sibehan dema beriya derketina rojê şiyar dibûm, dema di hişê min de fikra kû ez ê piştî vê binivîsim wekî firfirokê diçû û dihat, min hebûn û rêberiya Wî hîs kir.

**SPASÎ**

Tevî ez ji zêdekirina lîsteyeke dirêj a navan direvim, di van mijaran de tu şik tune ye: kû piştgiriya bêhnfireh a hevjina min a nuwaze Carol û agahiyên giranbuha yên hevalên bi huner û malbatê nebûna, ev pirtûk nedihat nivîsîn. Berg û xêz xebatên birayê min Dave in. Ez ji we hemûyan re ji dil spas dikim.

> *"Xwedê ne bêedalet e, keda we û hezkirina we ya kû we bi xizmetkirina pîrozan û bi berdewamkirina vê xizmetê ji bo navê Wî nîşan daye, ji bîr nake."* (Îbranî 6:10)

Di heman demê de, ji bo gelek lêkolînvanên Misilman yên kû bi peyamên elektronîk ez der heqê nivîsê de motîve dikirim, spasdar im.

Lê ji hemûyan zêdetir ez ji we re spas dikim ji bo kû hûn di vê rêwîtiya kurt de tevlî min bûn. Rêwîtiyeke *kurt* dibêjim, lewre dikarîbû bibûya rêwîtiyeke mezintir. Di Nivîsên Pîroz de yên kû me di rêwîtiyê de xwend, ji ayetên kû di Pirtûka Pîroz de ne %4 kêmtir in. Ji ber vê, tevî em hatin dawiya rêwîtiya xwe, esas em dikarin bibêjin kû me nû dest bi rêwîtiyê kiriye.

## RÊWÎTİYA KÛ BERDEWAM DİKE

Yek Xwedayê rast, ji bo kesên kû dixwazin fam bikin, peyama xwe pir hêsan kiriye, Ew Bixwe yekbûyî, kûr û bêdawî ye. Her tiştê kû der heqê Wî de divê bê zanîn, ne mirovek ne milyaketek dê tu car nekare têbigihije. Elçî Yuhanna, ev rastî di ayeta dawiya tomarên Mizginiyê da zanîn:

> *"Hê gelek tiştên din hene kû Îsa kirine. Kû ev yek bi yek bihata nivîsîn, ez bawer im pirtûkên kû hatine nivîsîn dê li cîhanê bi cih nebûna."* (Yuhanna 21:25)

Ez dikarim vê bibêjim. Dema min YEK XWEDA YEK PEYAMê nivîsî, zehmetiya min a herî mezin ayetên kû diviyabû min tevlî pirtûkê bikira bûn; min ê kîjan ayetan tevlî bikira, kîjan nenivîsa? Rast e kû Peyva Xwedê bi hişmet û bêdawî ye. Peyva Xwedê ji bo canê mirov tehmxweş e û ew têr dike. Hevalê me yê li Lubnanê jî ev rastî dîtibû, "Ez dibînim kû têrê nake kû em bibêjin 'Min Pirtûka Pîroz xwend' Pirtûka Pîroz pirtûke ke wisa ye kû divê *hertim* bê xwendin." (Ji beşa 7.)

Niha ji ber kû me ev rêwîtî qedand, dibe kû hûn bixwazin vegerin destpêka YEK XWEDA YEK PEYAM û ayetên tevlîkirî ji Pirtûka Pîroz bibînin û her beşa wan ayetên kû cih digirin, bixwînin. Hûn dikarin tişteke ji vê çêtir jî bikin; hemû pirtûkxaneya Afirînerê xwe, bi duaya jêrê, xwe beralî Wî bikin û bixwînin:

> ***"Çavên min veke, Ez mucîzeyên zagonên te bibînim."***
> (Mezmûr 119:18)

Kû hûn bi alîkariya şehadeyan zêdetir delîl û daxuyanî bixwazin, teqez li ser têbiniyan lêkolîn bikin. Û ji kerema xwe re fedî nekin ji bo şîrove û pirsên xwe kû ji min re binivîsin. Peyamên elektronîk yên kû ez neçar bikim pirtûkeke nû binivîsim jî, ez ê bextewar bibim kû ji we peyamek bigrim!

Ez bereketa kevin a 3500 salî ya jêrê dil dikim û ji we xatir dixwazim:

*“REB bila we pîrozîne û biparêze;*
*REB bila rûyê xwe yê ronî rê we bide*
*û bila ji we re kerem bike;*
*REB bila rûyê xwe beraliyê*
*we bike û selametî bide we.”* (Hejmara Li Çolê 6:24-26)

Paul Dan Bramsen
pdbramsen@rockintl.org
www.One-God-One-Message.com

# Têbinî

***"Tişta kû ez nabînim tu hînê min bike."***

(Eyûb 34:32)

**PÊŞGOTİN**

[1] Sahel: Herêma nîv bejî ya kû çola Mezin a Sahrayê ya Afrîkayê ji daristanên bi baran ên tropîkal vediqetîne. Ev şerîta qûm û çîlê, ji Senegalê heya Misirê dirêj dibe.

[2.] Yên *yekxwedayî* ji Xwedayekî bawer dikin – yên *pirxwedayî* ji gelek xweda û xwedawendan bawer dikin, *panteîst (qamûxwedaperestî)*her tiştê wekî parçeyeke Xwedê dibînin, *humanîstên dinyewî* li şûna Xwedê mirov bilind dikin û *ateîst* dibêjin kû Xwedê tune ye.

**BEŞ 1: RASTİYÊ BİKİRE**

[3] Ev biwêj, di YEK XWEDA YEK PEYAMê de, bi veguhezên din ên ji 1000an zêdetir yên kû ji nivîsên pêxemberan hatine çêkirin, ji Pirtûka Pîroz hatine girtin. Carinan, wekî vir, tenê beşeke ayetê tê veguhêzkirin. Temamiya ayeta kû ev biwêj tê de ye, di ayeta 23yan a beşa 23yemîn a Şîretên Silêman de ye, wiha ye: *"Rastiyê bikire, bikire û nefroşe; zanyariyê, terbiyeyê, hiş jî."*

[4] Barrett, David B. George T. Kurian û Todd m. Johnson. *World Christian Encyclopedia: A Comparative Survey of Churches and Religions in the Modern World.* Londra: Oxford University Press, 2201

[5] "Îro Nivîsên Pîroz di 2.403 zimanan de heye; temamiya Pirtûka Pîroz herî kêm ji bo 426 zimanan û Peymana Nû jî ji bo nêzî 1.115 zimanan hatiye wergerandin. Li ser vê, hin beşên Pirtûka Pîroz ligel vê di 862 zimanan de heye. "United Bible Societies, 2007. (www.biblesociety.org.) Di heman demê de: www.wycliffe.org/About/ Statistics.aspx

[6] Foxe, John (ji hêla G. A. Williamson hatiye sererastkirin). *Foxe's Book of Martyrs.* Toronto: Litle, Brown & Company, 1965.

[7] Ji welatekî wekî "neteweyeke Xirîstiyan" qalkirin şaş e, lewre Îsa Mesîh wiha got: *"Qraltiya min ne ji vê cîhanê ye. Kû qraltiya min ji*

*vê cîhanê bûya, alîgirên min ji bo kû ez radestî Cihûyan nebim, dê şer bikirana. Lê belê qraltiya min ne ji vir e."* (Yuhanna 18:36)

[8] Wurmbrand, Richard. *Tortured for Christ -30th Anniversary Edition.* Bartlesvile, OK: Living Sacrifive Book Co.,1998.

[9] *The Way of Righteousness* kû rêzên radyoyê ye, ji bo kû li her derê dinyayê bê weşandin ji bo ji 70yan zêdetir zimanan hatiye wergerandin an jî tê wergerandin. Ji bo xwendina van 100 berheman wekî online: www.twor.com an jî www.injil.org/TWOR

[10] Temamiya ayeta Qur'anê wiha ye: *"Li ser şopa wan pêxemberan, me Îsayê Meryem wekî rastkerê Tewrata li ber Wî şand. Me jê re Încîl da kû tê de rêya rast û nûr heye, Tewrata li ber Wî dipejirîne, ji bo yên kû ji li hember derketina Xwedê xwe diparêzin re beralîkirina rêya rast û şîretek dide."* (Sûre 5:46) Kû wekî din neyê diyarkirin, di orîjînala pirtûka bi Îngîlîzî ya YEK XWEDÊ YEK PEYAM de, wergera bi Îngîlîzî ya Qur'anê ya kû ji hêla Ebdullah Yusuf Elî hatiye çêkirin, hat bikaranîn. *The Qur'an Translation.* New York: Tahrike Tarsile Qur'an, Inc. 2003. (Di wergera Tirkî ya YEK XWEDA YEK PEYAM de, Meala Qur'anê ya kû ji hêla Serokatiya Karên Diyanetê hatiye amadekirin, hatiye bikaranîn.) Nîşe: Qur'an ji beşên kû ji wan re *sûre*tên gotin, pek tê. Numareyên ayetan li gorî wergera Qur'anê diguhere. Ji ber vê, dema li ayetek tê nêrîn, divê li ayeta berê an jî paşî bê nêrîn.

[11] Yê kû di peyva *"Em"* de tê vegotinkirin kî ye? Xwedê, di Qur'anê de bi gelemperî wekî kesê pirjimar ê destpêkê qala xwe dike. Di heman demê de di Pirtûka Pîroz de jî REB ji xwe wekî pirjimar qal dike. Nîşe: Yên kû bi Erebî dipeyivin, peyva Allah bi du awayî bi kar tînin: 1) "Allah" têgînek e kû ji hêla Xirîstiyanên Ereb, yên din ên kû ne Misilman in û ji hêla Misilmanan ji bo "Yezdan" tê bikaranîn. Dema peyva "Allah" wisa tê bikaranîn, ne navê Yezdan ê lihevhatî ye. Di nav yên kû bi Erebî dipeyivin de, tu kom ne xwedî têgîna gelemperî ya *Allah* e. Zêdetir agahiyên der heqê ve mijarê de di beşa 9. de ye.

[12] Di pirtûka YEK XWEDA YEK PEYAM de, peyamên elektronîk ên kû wekî parçeyên hilbijare hatine girtin, ji bo kû nasnameya kesên kû şandine bê parastin, nav nehatine diyarkirin.

[13] Misilman piştî nivîsîn an jî gotina navê pêxemberekî, bi gelemperî ev hevok li peyva xwe zêde dikin: "Bila selametî be jê re/Jê re selat bikin, silav bikin." Misilman piştî kû navê Mihemed dibêjin, ev hevok bi kar tînin: *"Sallahû aleyhî Wesselam";* wateya wê ev e: "Bila dua û selametiya Xwedê li ser te be." Wekî bingeha vê pêkanînê, vê ayeta Qur'anê digirin:

*"Bêguman Xwedê û milyaketên Wî ji Pêxember re selat dikin. Ya yên kû îman dikin! Hûn jî jê re selat bikin, silav bikin."* (Sûre 33:56) Bikaranîna vê hevokê bi Pirtûka Pîroz a kû dibêje *"Carek mirin û piştre darizandin qedera mirovan e"* (Îbranî 9:27) re li hev nayê. Kesekî kû carek bimire qedera wî êdî hatiye diyarkirin. Kesê kû miriye dê bêdawîtiya xwe li kû an jî çawa derbas bike, bi duayan nayê guhertin. (Wehî 22:11).
[14] *(sic)* Bi Latînî beramberê peyvên "bi vî awayî" û "ji ber vê" ye. Tevî di xuyanga de xetayek heye, ji bo nîşandana orîjînala wî kû bi temamî hatiye veguheztin, veguheztineke çapkirî ya kû di nav kevanekan de ye, tê nîşandan. Nîşe: Ji xeynî kûrtasîkirin û sererastkirina kîtandin û rêzimanê (ji bo çêtir bê têgihîştin), veguheztinên peyamên elektronîk ên kû li pirtûka YEK XWEDA YEK PEYAM hatine bikaranîn, çawa hatine girtin wisa hatine pêşkêşkirin. Mînak, di vê peyama elektronîk a taybet a "Ahmed" de, esas tu tîpên mezin tune bûn. Ev rewş hat sererastkirin.
[15] *The Meaning of the Glorious Koran: An Explanatory Translation by Mohammed Marmaduke Pickthall.* New York: Meridian, 1997.
[16] Mînak, Qur'an di Sûreya 40. (Beş), ayetên 70-72an de wiha dibêje: *"Ew, yên kû pirtûk (Qur'an) û tiştên kû me ji pêxemberên xwe re şandin, alastin, dê ew bizanibin. –Wê demê dê ew, li sitûyên wan xeleqên hesin û zincîran ve, di ava kelandî de bên kaşkirin, piştre jî dê di nav êgir de bên şewitandin..."* Di heman demê de:*"Li ser şopa wan pêxemberan, me Îsayê Meryem wekî rastkerê Tewrata li ber Wî şand. Me jê re Încîl da kû tê de rêya rast û nûr heye, Tewrata li ber Wî dipejirîne, ji bo yên kû ji lihemberderketina Xwedê xwe diparêzin re beralîkirina rêya rast û şîretek dide."* (Sûre 5:46) *"Ya yê kû îman dikin! Ji Xwedê, Pêxemberê Wî, pirtûka kû ji Pêxemberê xwe re şandiye û pirtûka kû berê şandiye re îman bikin. Kû kî Xwedê, milyaketên Wî, pirtûkên Wî, pêxemberên Wî û roja axretê înkar bike, dikeve nav xerirîbûneke mezin... wekî kû me ji Nuh û pêxemberên piştî Wî hatin re wehd kir, me ji te re jî wehd kir. Me ji Brahîm, Îsmaîl, Îshaq, Yaqûb, neviyên wan, Îsa, Eyûb, Yunus, Harun û Silêman re jî wehî kiribû. Me ji Dawud re jî Zebûr dabû."* (Sûre 4:136,163) ji bo zêdehiya biwêjên Qur'anê yên wekî van, li rûpela destpêkê a beşa 3. û li têbiniyên kû bi beşê li hev tê binêrin.
[17] Şîretên Silêman 23:23. Gelek kes li şûna "rastiyê bistîne", rastiyê "difroşe", lewre dema li ser Pirtûka Pîroz dixebitin, kû malbat an jî heval wan bibînin, difikirin kû dê der heqê wan de xelet bifikirin. Lê belê, li cîhanê herî zêde Pirtûka Pîroz tê firotin û Qûr'an ji Misilmanan re ferman dike kû ji vê Pirtûka Pîroz bawer bikin.

**BEŞ 2: Jİ HEQ ASTENGİYAN DERKETİN**

[18] Doyle, Sir Arthut Conan. *Treasury of World Masterpieces: The Celebrated Cases of Sherlock Holmes.* R. R. Donnelley and Sons Company, 1981, p. 17. (Cara destpêkê li Brîntaya Mezin di sala 1981an de hat weşandin.)

[19] Romayî 14:1-15:7; Matta 7:1-5

[20] Doyle, r. 16

[21] Hejmara li Çolê 12

[22] Qralên 2., 5

[23] Yunus 4

[24] Li van pirtûkên kû di Pirtûka Pîroz de ne binêrin: Daniel, Ezra, Ester

[25] Yuhanna 4

[26] "The Greatest Journey," *National Geographic Magazine,* Mar. 2006, r. 62

[27] Mezmûr 90:1-12; Markos 8:36; Korîntiyên 2., 4:16-18; Romayî 8:18; Yaqûb 4:13-15

[28] Di dîroka mirov de Xwedê, li serzemînê destûr ji hin bobelotan re daye û/an jî ev bobelot şandine. Di nifşa Nuh de, piştî serdemeke sed salî ya sebr û hişyariyê, Xwedê tofaneke kû hemû li ser hemû cîhanê bandor kir şand, û tenê heşt can jê filitî (Afirîn 6-8). Gelek kes bêje ev tofan efsane ye jî, hem tomarên jeolojîk û hem jî yên fosîlan dipejirînin kû ev tofan pêk hatiye. Di dema Brahîm de, zirnîxa agirdar a kû li ser Sodom û Gomorayê hat barîn, ji xeynî sê kesan her kesî qir kir. Di dema Musa de û piştî dema Musa, Xwedê ji ÎsraÎliyan re ferman da kû neteweyên Kenaniyan qir bikin (Yeşu 1-10). Ev şer bi fermanên taybet ên Xwedê hatin çêkirin û bi gelemperî, di van şeran de yên Îsraîlî heft rojên li dû hev li derdora bajêr meşiyan, piştre wekî hilweşîna sûrên bajarê Erihayê (ji hêla arkeolojiyê tê pejirandin) mudaxeleya mucîzewî ya kû ji esmên hat, pêk hat. Xwedê, beriya kû ev netewe darizand, ji wan re wext da kû ji pûtperestî, bêexlaqî û pêkanînên pelos ên wekî qurbankirina mirovan tobe bikin û bi sedan salan sebir kir û li bendê ma (Afirîn 15:16; Ji Misirê Derketin 12:40), lê wan dîsa jî şahidiya mirovên Xwedê yên wekî Brahîm, Yusuf û Musa biçûk dîtin. Tenê çend kesên Kenanî tobe kirin û ji yek Xwedayê rast ê kû li ser Misirê deh belayên sersirûştî şand û di nav Behra Sor de rêyek vekir, bawer kir. Dema Xwedê Gelê Xwe yê kevin darizand, biedalet û bêalî bû. Mînak, Tevrat dinivîse kû Xwedê Îsraîliyan bi belayek ceza dike (ji ber pûtperestî û zînakirina wan) kû 24.000 Îsraîlî dimirin (Hejmara li Çolê 25-31). Xwedê destpêkê Îsraîl darizand û ancax piştî vê ew li neteweyên bêexlaw û

xirab ên derdor şandin kû, Daraza Wî bi cîh bînin. Tiştek xelet e kû mirov bifikire ev netewe bêguneh in. Li gorî Nivîsên Pîroz didin zanîn kû *"welatê kû ev netewe lê dijîn, gelê kû lê dijî vedirêşe"* (Leviyî 18:25), em dikarin jê bawer bibin ka bêexlaqiya kû kirine çi qas mezin bû. Qencî û sebra Xwedê mezin e, lê xezeba Wî jî bi heman awayî mezin e û daraza Wî jî teqez e.

[29] Sedema Xwedê kû yê xirab di demê de daraz nake ew e kû ji gunehkaran re wext dide kû tobe bikin û rizgariya Wî qebûl bikin: *"Birayên min ên delal, vê ji bîr nekin kû li gorî Reb rojek wekî salekê ye, salek jî wekî rojekê ye. Wekî hin kesên kû difikirin, Reb dereng namîne kû wehda xwe pêk bîne, lê li hemberî we sebir dike. Lewre naxwaze bila tu kes mehv bibe, dixwaze bila her kes tobe bike."* (Petrusê 2., 3:8-9)

[30] Beşên 8,12 û 28-29 ên YEK XWEDA YEK PEYAMê, ji nakokiya der heqê van sê gotinan dibin bersiv.

[31] Matta 7:1-20ê bi Romayî 14 û Korîntiyên 1., 6 re bidin ber hev.

[32] Hin malper hê jî der heqê *"Di Pirtûka Pîroz de 101 Nakokiyên Zelal"* de lîsteyeke dirêj didin, lê dîsa jî çend sal e cih dane mijareke din a bi navê *"Di Pirtûka Pîroz de 101 Nakokiyên kû Nehatine Diyarkirin"*. www.debate.org.uk/topics/apolog/contrads.htm

[33] Ji bo şîrovekirina rast a ayeteke Pirtûka Pîroz du rêzik: 1) Ayetên beriya û piştî ayetê xwendin. 2) Ayetan bi ayetên din re hevrûkirin. Kû em mînakeke bidin, di Pirtûka Dubareya Zagonê de, Musa ji ÎsraÎliyan re ev pêxemberî got: *"Dê Xwedayê we REB ji nav we, ji birayên we pêxemberekî wekî min derxe. Guh bidinê."* (Dubareya Zagonê 18:15) Dema Musa ji Îsraîliyan re got dê Xwedê *"ji nav wan, ji birayên wan"* Pêxemberekî derxe, mebesta Wî çi bû? Hin kes dibêjin Musa der heqê Îsmaîliyan û yên din jî dibêjin der heqê Îsraîliyan de axivî. Naveroka derdorî bersiva rast dide (Mînak, Dubareya Zagonê 17:15, 20; 18:2, 5, hwd.) Ev *"Pêxemberê"* taybet ê kû Xwedê wehd kir kû derxe, kî bû? Gelek kes vê pêxemberiyê bi avakarê dînê xwe li hev tîne, şîroveya rast di ayetên din de bi awayekî zelal hat diyarkirin. Ji bo bersivê li Yuhanna 5:43-47, Yuhanna 6:14 û Karên Elçiyan 6:14 binêrin.

[34] B.M.=Beriya Mesîh / AD= *Anno Domini,* tê wateya *"Di sala Rebê me de." Îro gelek kes di zimanê Îngîlîzî de kurtekên BCE (Beriya Dîroka Hevpar) û CE (Beriya Dîrokê) bi kar tînin û bi vî awayî di xala kû dîrok vediqetîne de tevî hê zayîna Mesîh heye, ji vê kurtekê Mesîh derdixe.*

[35] Kû we berê ji bankayekê deyn stendibe, divê we peymanek îmze kiribe — tomareke zagonî. Di peymanê de berpirsiyariya bankayê

ew bû kû perê kû ji we re wehd dikir bidaya; berpirsiyariya we jî ew bû kû diviyabû di demek şûn de we ew pere bidaya. Di peymanê de kû we li gorî berpirsiyariya tevnegeriya, hûn ê bi encamên ne xweş re rûbirû bimana. Bi heman awayî, Pirtûka Pîroz peymanên kû ji bo mirovahiyê çêdike bi hurgûlî diyar dike—dike kû mirovên wekî we û min ji bereketa Wî ya bêdawî tam bigire. Xwedayê kû bi mirovan re *"peymanek" çêdike, li gorî ayetên Pirtûka Pîroz bêhempa ye.*

[36] Em ê di beşa 5. de li nîşaneyên kalîte yên xwedayî ya Nivîsên Pîroz binêrin. Der heqê Xwedê de, mînakeke xurt a kû beriya pêkhatina bûyerê diyarkirina dîrokê, di beşên 7-12 yên pirtûka Daniel de cih digire. Daniel, B.M di sala 400an de, dîroka împaratoriyên cîhanê ya heya dema Mesîh diyar dike û bûyerên kû dê di demên dawî de pêk bên hê diyar dike. Daniel ev hemû di navbera B.M. salên 600 û 530an de nivîsîn.

**BEŞ 3: HAT GUHERTİN AN HAT PARASTİN?**

[37] Ji referansên Qur'anê yên kû ji Misilmanan re didin zanîn kû nivîsên Pirtûka Pîroz ji hêla Xwedê hatine wehîkirin, mînakên din: Sûre 2:87-91, 101, 136, 285; 3:3-4;4:47, 54, 136; 5:43-48, 68; 6:92; 10:94; 20:133; 21:105; 28:43; 29:46; 32:23; 40:53-54, 70-72; 45:16; 46:12; 57:27, hwd.

[38] Nivîsên Peymana Kevin, bi sedsalan ji hêla civakên Cihû yên hesûd bi pêwendî hatine parastin. Ev civakên Cihû qet destûr didan kû ev pirtûk ango Nivîsên Pîroz a kû dikarîbûn ji bo her yekê wan bimirana, bê guhertin? Di dîrokê de rewşeke mîna vê tune ye kû komeke dîndar (Xirîstiyan) baweriya xwe li ser bingeha pirtûkeke (Peymana Kevin) kû ji hêla komeke din a dîndar (Cihûyên Ortodoks) tê rêzgirtin û tê parastin, ava bike. Tenê ev rastî jî, guherîna Nivîsên Peymana Kevin ne kûmimkin nedikir?

[39] *The Holy Qur'an.* Ji hêla M.H. Şakir hat wergerandin. Tahrike Tarsile Qur'an, Inc., Versiyona elektronîk, 1993.

[40] Metzger, Bruce M. Û Michael D. Coogan. *The Oxford Companion to the Bible.* NY: Oxford University Press, 1993. r.754.

[41] Li têbiniya 37 binêrin.

[42] Heya beriya P.M sala 750yan (demeke ji 100 salan zêdetir a piştî mirina Mihemed) em ne xwedî tomar aîdê Qur'an an jî Îslamiyetê ne kû rastiya wan dikare bê çespandin. http://www.debate.org.uk/debate-topics/historical/the-bible-and-the-quran/the-qurans-manuscript-evidence/

[43] Metzger and Coogan, p.683.

[44] Li vir mînakeke cureya kû di xuyanga de dikare bê guhertin heye kû di tomar destnivîs ên kevin de dikare bê dîtin. Em di Peymana Kevin de, di pirtûa Qralên Duyemîn de vê dixwînin: *"Yehoyakin di hejdeh saliya xwe de bû qral"* (Qralên 2., 24:8). Di vê navê de pirtûka Dîrokên Duyemîn cih dide vê biwêjê: *"Yehoyakin di heşt saliya xwe de bû qral"* (Dîrokên 2., 36:9) Cudahiyên wisa çawa dikarin bên diyarkirin? Hin lêkolînvan dibêjin kû bavê Yehoyakin ew di heşt saliya xwe de girt *şirîkahiya* rêveberiyê û piştî mirina bavê wî, Yehoyakin di hejdeh saliya xwe de dest bi *serweriyê* kir, dibe kû di vê ramanê de xeberê wan be. Lê dîsa jî raveyeke din ev e: ev cudahiya reqeman, dibe kû ji ber nivîsvanên sedsala pêşîn be kû li şûna "18" "8" nivîsîne. Kû ev îhtimal rast be, ev şaşitiya reqemê, dibe kû ji kopyaya destpêkê a nivîsvanî derbasî hemû kopyayên din bibe. kîjan îhtimal rast be bila bibe, ev guherînên wisa li ser peymana Xwedê ya kû daye me de tu bandor nake an jî nikarin biguherînin. Di gelek rewşan de, cilda orîjînal a destnivîsên Pirtûka Pîroz, ji lêkolînvanan re destûr dide kû bi hevrûkirina metnên cihêreng bila biryar bidin ka kîjan biwêj rast e.

[45] Hedîs vê dinivîse: *"Piştre Osman ji Zeyd Bîn Tabît, Ebdullah Bîn az-Zubeyr, Seyd Bîn Al-As û Ebdurehman Bîn Hîşam re ferman da kû destnivîsên xwe yên li ser kopyayên nuwaze, dîsa binivîsin… Wan jî ew ferman bi cih anîn û piştî kû gelek kopya nivîsîn, Osman kopyayên orîjînal dîsa ji Hafsa re şand. Osman ji her eyaletan re ji wan kopyayan şand û ferman da kû hemû destnivîsên parçe an jî malzemeyên din ên Qur'anê yên kû wekî kopyayên qedandî hatine nivîsîn, bişewitînin."* (Hedîs, Sahîh Buharî, VI, no. 510). *(Hedîs* peyvên Mihemed in kû ji hêla hevjina Wî û derdora Wî ya nêzîk hatine ragihandin. Misilman, bingeha piraniya bawerî û pêkanîn xwe li ser Hedîsên xwe çêdikin.

[46] Beriya dîtina Tomarên Deryaya Mirî jî –ji bo erêkirina neguhertina Nivîsên Pîroz- tişta kû divê mirov bikira hevrûkirina Peymana Kevin a îro û Septuagintê (wergera Grekî ya Peymana Kevin a kû B.M. nêzî sala 270yan hat qedandin). Septuagint têrê heye kû bide nîşan Nivîsên Peymana Kevin nehatina guhertin û hatine parastin.

[47] Abegg, Martin Jr., Peter Flint and Eugene Ulrich. *The Dead Sea Scrolls Bible.* San Francisco: Harper, 1999, rûpel xvi.

[48] McDowell, Josh. *A Ready Defense.* Nashville: Thomas Nelson Publishers, 1993, rûpel 42-28. http://www.debate.org.uk/debate-topics/historical/the-bible-and-the-quran/the-qurans-manuscript-evidence/

[49] Nivisên Pîroz ên Peymana Nû, ji çend orîjînalên metnên (Metna Piraniyê, Textus Receptus, Metna Alexandrian) Grekî hatin wergerandin. Di nav metnên Peymana Nû ya Grekî de, li cihê kû guhertinên "girîng" hatine çêkirin, di piraniya wergerên Pirtûka Pîroz de, li kêleka rûpelê nîşeyên der heqê van gûhertinan de hene. Beşên herî dirêj ên kû li ser tên sekinîn, ayetên wekî Markos 16:9-20 û Yuhanna 7:53-8:11 in, her 12 ayet bi temamî di nav vê de ye. Di çend destnivîsên kû di destê me de ye ev beş (Metna Alexandrian) tune ne, lê ev beş di nav yên din ên kû bi sedan in (Metna Piraniyê) hene. Bila di hişê we de be kû *yê kevintir* ne hewce ye ne hewce ye *yê rasttir* be, lewre metnên cihêreng ji kopyayên kevin ên cuda tên. Îhtimal e kû kopyakerê kû bala wî çûye ser tiştek din, bi şaşî ev parçe nenivîsîne. Sedem çi be bila bibe, hemû rastiyên kû li van cihên kû nehatine nivîsîn, hatine fêrkirin, di heman demê de li cihên din ên Nivîsên Pîroz jî têne fêrkirin. Peyama Xwedê, bê bandorkirinê dimîne. Ji ber kû di hin kopyayên kevin de, hin beşên peyama Xwedê yên kû qet nehatine guhertin tê de tune ne, redkirina peyama Xwedê tevgereke zanyarî ye?
[50] Di demên dawî de pirtûkên kû der heqê naveroka Pirtûka Pîroz de mirov biguman bike hatine weşandin û fîlm hatine çêkirin. Hin rexnegîrên Pirtûka Pîroz nakokî, "mizgîniyên alternatîf" nîşan didin. Ev hemû "mizgînî" demeke dirêj piştî dema Mesîh hatine nivîsîn û ji pejirandinên dîrokî bêpar in.
[51] Ev biwêj di heman demê de di van ayetan de jî heye: Matta 11:15; 13:43; Markos 4:9, 23; 7:16; Lûka 8:8; 14:35; Wehî 2:7, 11, 29; 3:6, 13, 22; 13:9.

## BEŞ 4: ZANİST Û PİRTÛKA PÎROZ

[52] Solomon, Eldra Pearl, PhD and Linda R. Berg, PhD. *The World of Biology.* London: Saunders College Publishing, 1955, rûpel 24.
[53] Bucaille, Maurice. *La Bible, le Coran et la science.* Paris: Seghers, 1976. Rûpel 35. Ji bo kû ji pirtûka Dr. Bucaille bibe bersiv, Dr. William Campbell pirtûka bi navê *The Qur'an and the Bible in Light of History and Science* nivîsî. Second Edition: Middle East Resources, 2002. Hûn dikarin nivîsên Dr. Campbell yên der heqê mijara şaşderxistinê yên bi delîl kû bi pûte lêkolîn kiriye û amade kiriye, bi şeş zimanan online bixwînin. http://answering-islam.org/Campbell
[54] Peresendiya biyolojîk dibêjin kû celebên hejmara jiyanê yên wekî kevzên deryayê û meymûnan –dema li bi milyonan nifşan belav dibin-vediguherin hejmara nebat û mirovan. Li gorî peresendiyê, mirov,

meymûn û masiyên golyanê nîjadeke hevbeş hevpar dikin. Rastî ev e kû, ne peresendiya rasthatî ne jî afirÎna bi armanc ji hêla zanista modern nayê çespandin. Her du jî îman dixwazin.

[55] http://www.gma.org/space 1/nav map.html

[56] Ayetên pêvek ên kû çerxa hîdrolojîk dipejirînin: Mezmûr 135:7; Yeremya 10:13; Weaz 1:7; Yeşaya 55:10

[57] www.artsc.wustl.edu/-landc/html/cann; *Newsweek Magazine:* "rêzeke DNAyê… (zanyaran) beraliyê jinekê kir kû em hemû ji wê hatine." *Newsweek,* January 11, 1988, rûpel 46-52.

[58] *Time Magazine:* "Materyala genetîk a der heqê kromozoman de, di kalikê bi navê 'Adem' de bû kû niha di her kesî kû li serzemînê dijî de hevpar e." *Time,* December 4, 1995, rûpel 29. Nîşe: Zanyar dibêjin kû kalikê me yê hevpar bi qasî pîrika me ya hevpar ji dîroka kevin nehatiye. Ev angaşta wan bi Pirtûka Pîroz a kû dibêje em hemû ji Nuh hatine, li hev tê. Lê diya me ya hevpar Hewa ye, lewre sê kur û sê bûkên Nuh hebûn: hemû mirov ji nifşa zarokên Nûh in.

[59] www.mtn.org/quack/devices/phlebo.htm

[60] www.bible.ca/tracks/matthew-fontaine-maury-of-sea-ps8.htmNîşe: Maury dît kû, riyên behran, "bi roniyê ew qas hatine diyarkirin" kû kesekî kû bi keştiyê ji okyanûsê derbas dibe, dikare riya xwe bibîne (Rozwadowski, Helen M. *Fathoming the Ocean.* Cambridge. MA: The Belknap Pres of Harvard University Pres, 2005, rûpel 40). Dawut dema *"riyên deryayan"* nivîsî, ew û gelê Wî tenê Deryaya Spî, Gola Celîleyê, Deryaya Mirî û Deryaya Sor dizanîbûn. *"Rê"* an jî herkên girîng ên van beşên avên kû têne behskirin, tune bûn.

[61] *World Book Encyclopedia* 1986; Stars.

[62] "Li şeveke tarî û bê ewr, bi çavê tazî mirov dikare çend hezar stêrk bibîne. kûMimkin e kû em ew qas pir stêrk bibînin kû em nikarin bi dûrbîn û teleskopên xurt bihejmêrin. Her stêrk tena serê xwe bêhempa be jî, gelek tişt hene kû hemû stêrk bi hev re hevpar dikin" (Cornell University Astronomy website: http://curious.astro.cornell.edu.stars.php). Di heman demê de Pirtûka Pîroz jî diyar dike kû stêrk nikarin bên hejmartin. (Afirîn 15:5; 22:17)

[63] Ramsay, Walter M. *The Bearing of Recent Discovery on the Trustworthiness of the New Testament.* Grand Rapids, MI: Baker Book House, 1953, rûpel 222.

[64] Josephus, Flavious. *Josephus: The Essential Works* (Paul L. Maier, edîtor). Grand Rapids, MI: Kregel Publications, 1988, rûpel 268, 277. Di

pirtûkê de kevirê kû ji Pilatus re diyarîkirin û wêneyên şanoya Herod hene.

[65] Bruce, F.F. *Archaeological Confirmation of the New Testament. (Revelation and the Bible.* Edited by Carol Henry). Grand Rapids, MI: Baker Book House, 1969.

[66] Josephus, Flavius. *Antiquities* 18: 2, 2; 4, 3

[67] Wêneyên der heqê qûtiya defnkirî ya Kayafas û hurgûliyên wan: http://www.kchanson.com/ANCDOCS/westsem/caiaphas.html

[68] Glueck, Nelson. *Rivers in the Deshişk. NY:* Farrar, Strauss & Cudahy, 1959, rûpel 136. Glueck, li kolînên Rojhilata Navîn de pispor bû.

[69] Mormonizm, dînekî ye kû li cîhanê ji hêla bi milyonan kesan tê şopandin. Pirtûka kû Mormon wekî pîroz bi nav kirine, ji Pirtûka Pîroz cuda, ji hêla arkeolojiyê nayê pejirandin. Encama kû Enstîtuya Smithsonian a kû li Washington DC ye, gîhaşt ev e: "Arkeologên Smithsonian di navbera arkeolojiya Cîhana Nû û mijara subje (ya pirtûka Mormonê) de girêdaneke rasterast nabînin" (Martin, Walter. *The Kingdom of the Cults.* Minneapolis, MN: Bethany House Publishers, 1997, rûpel 200202). Di heman demê de der heqê heman mijarê ya beşa 6. de, li têbiniya 91 binêrin. Ji bo nêrîna arkeolojiya hevberkirî ya der heqê Pirtûka Pîroz û Qur'an de, binêrin: http://debate.org.uk/topics/history/bib-qur/contents.htm

[70] Free, Joseph P. And Howard F. Vos. *Archaeology and Bible History.* Grand Rapids, MI: Zondervan, 1992, rûpel 294.

[71] Hem Misilman hem jî Mormon dibêjin, delîla herî mezin a kû pirtûka wan a pîroz ji Xwedê hatiye, ji şêwaza wan a edebî têne diyarkirin. *Malpereke Misilmanan* vê dibêjin: "Qur'ana Pîroz… Qebûya Herî Mezin: çardeh sedsal berê, piştî diyarkirina Qur'anê tu kes bi xweşikayî, rewanbêjî û hişmeta Qur'anê nekariye beşekê jî binivîse." (www.islam-guide.com/frm-chl-2.htm). *Malpereke Mormonê* tişteke mîna vê dibêje: "Pirtûka Qebû ya Mormonê: divê hûn nivîsên xwe wiha binivîsin; piştî salan, cîhana kû bi Îngîlîzî diaxive ji nû ve kifş neke û nede zanîn, helbestên Îbranî binivîsin û wê cureya nivîsê bi kar bînin." (www.greatlakesrestorationbranches.org/newpage34.htm).

[72] Mezmûr 11, beşa herî dirêj a Pirtûka Pîroz e, di Nivîsên Pîroz de xwedî şêwaza edebî ya herî metelhişt e. Mezmûr 119 akrostîşeke alfabetîk e, ji 22 beşan pêk tê û di her yekê de 8 ayet hene. Hemû heşt ayeta her beşê, bi heman tîpa alfabeya Îbranî dest pê dike. Di beşa 1. de, her ayet bi *Aleph*ê (Tîpa destpêkê a alfabeya Îbranî) dest pê dike. Di beşa 2. de hemû heşt ayet bi *Beth*ê (tîpa duyemîn a alfabeyê) dest pê dike, û bi vî awayî bi

temamiya alfabeya Îbranî berdewam dike. Biceribînin kû bi eynî wiha çêkin! Na, neceribînin. Li şûna kû vê biceribînin, Mezmûr 119ê bixwînin û bikevin kûrahiya peyvên vê mezmûrê û li ser bifikirin kûr kûr.

**BEŞ 5: MOHRA XWEDÊ**

[73] Wallenfels, Ronald and Jack M. Sason. *The Ancient Near East.* Volume IV. NY: Charles Scribner's Sons, 2000; û binêrin: Carl Roebuck. *The World of Ancien Times.* NY: Charles Scribner's Sons, 1966, rûpel 355.

[74] "Îskenderê Mezin biştî dorpêçkirineke neh mehî, bajêr vegirt (B.M.), lê bajêr bi temamî wêran nekir. Piştî vê derbê êdî bajarê Sûrê nehat avakirin…" (Avery, catherine B., û Jotham Johnson. *The New Century Classical Handbook.* NY: Appleton-Century-Crofts, Inc., 1962, rûpel 1130.)

[75] Mathews, Samuel W. "The Phoenicians Sea Lords of Antiquity," Washigton, DC: Natioal. *Geographic,* august 1974, rûpel 165. Di heman demê de: L.L.Orlin. Tyre. *Grolier Multimedia Encyclopedia.* JiGrolier Online http://gme.grolier.com/cgi-bin/article?assetid=0297240-0 dikare bi dîroka Îlon 7, 2006 dîsa bê peydakirin.

[76] Afirîn 26:3; 28:15 Nîşe: Welatê kû Xwedê wehd dike bide neteweya kû dê ji Brahîm, Îshaq û Yaqûb bê, ji hêla stratejîk *"dinav neteweyan de"* hat bicihkirin (Hezekiel 5:5). Di heman demê de li ayetên Karên Elçiyan 1:8; 2:5 binêrin.

[77] Josephus, Flavius, *The Complete Works of Josephus.* (William Whiston) Grand Rapids, MI: Kregel Publications, 1967, rûpel 566-568, 580-583, 588-589.

[78] Mînak, di destpêka Şerê Cîhanê yê Duyemîn de, piraniya Cihûyên Elmanyaya Hîtler, nexwestin kû wekî Cihû bêne zanîn. Bi Elmanî peyivîn, wekî Elmanan bacên xwe dan û di Şerê Cîhanê yê Destpêkê de li cem Elmanan şer kirin. Lê belê, Nazî dîsa israr kirin, "Na, hûn Cihû ne!" Di nav çend salan de, şeş milyon Cihû li kampên mirinê hatin qirkirin.

[79] Yeşaya 44:18; Yeremya 5:21; Yuhanna 5:39-47; Korîntiyên 2., 3: 12-16; Romayî 9:11. Nîşe: Nêzî 2600 sal berê, Xwedê ji Hezekiel re rave kir kû dê ji nû ve avakirina Îsraîlê bi sê astan pêk bê. Hezekiel, Îsraîl da ber newalên kû bi *hestiyên ziwa* tijî bûn; dê ev hestî wekî bedenekê *bibin yek* û di dawiyê de *dê ji van hestiyan re jiyan bihata pifkirin.* (Hezekiel 37:1-14)

[80] Beşên Afirîn 37-50yan bi Mizginiyan bidin ber hev. Xwendina kû tê pêşniyarkirin: *Joseph Makes Me Think of Jesus,* by William MacDonald. Grand Rapids, MI: Gospel Folio Press.

**BEŞ 6: ŞAHİDİYA HEVGİRTÎ**

[81] *"Lewre tiştên kû der heqê Xwedê de tên zanîn, li ber çavên wan e: Xwedê hemû daniye li ber çavên wan. Wesfên Xwedê yên kû nayên dîtin –hêza bêdawî û Xwedatiya Wî- dinya hat afirandin û pê ve bi kirinên Wî têne famkirin, bi awayekî zelal têne dîtin. Ji ber vê tu lêborîna wan tune ye"* (Romayî 1:19-20). Kesên kû ne xwedî Nivîsên Pîroz in jî, *"didin nîşan kû di dilê wan de pêwîstiyên Zagona Pîroz hatine nivîsîn. Wijdanên wan dibin şahidên vê. Fikrên wan jî, an wan tawanbar dike an jî piştgirî dide wan"* (Romayî 2:15). Lê dîsa jî piraniya mirovan, li şûna kû zêdetir li rastiyê bigerin, yê sexte an jî şaş dişopînin.

[82] Bi hesabkirina emrên nivîskî yên kû li nifşên kû Pirtûka Pîroz hatine tomarkirin, em hîn dibin kû Adem, bavê Nuh (nifşa nehemîn a piştî Adem) heya kû pêncî saliya xwe derbas nekiriye, nemiriye (Afirîn 5).

[83] *Piştre sêrbaz ji Firewn re gotin, 'Xwedê tevlî vê bûye'* (Ji Misirê Derketin 8:19). Di heman demê de binêrin: Ji Misirê Derketin 12:30-33. Ji bo temamiya çîrokê, Ji Misirê Derketin 5:14 bixwînin.

[84] Musa, beşa pêşîn a Nivîsên Pîroz nivîsî. Lê belê tê zanîn kû pirtûka Eyûb beriya Tewratê (di dema Brahîm de) hatiye nivîsîn, ji ber vê pirtûka Eyûb dibe yek ji parçeyên herî kevin ên wêjeya ne temamkirî. Kû dîrok rast be, wê demê Pirtûka Pîroz nêzî ji 2000 salan zêdetir berê hat nivîsîn.

[85] DeHaan, Dennis. Our Daily Bread, Gulan 6, 2006. Grand Rapids, MI: RBC Ministries.

[86] Hin kes ev pirs dikin: "Xwedê çima ji pêxemberên sexte re destûr bide kû peyamên xapînok bidin zanîn?" Musa di Tewratê de bersiva vê pirsê wiha da: *"Kû ji nav we pêxemberek an jî yekî kû xeyal dibîne derkeve, û kû ji we re nîşaneyek an jî bûyereke metelhiştî ji berê de bêje, kû bêje 'Em berê xwe bidin îlahên din ên kû em nizanin, û em wan biperêsin', nîşaneya kû dibêje û bûyera metelhiştÎ rast derkeve jî, divê hûn peyvên wî pêxemberî an jî yê kû xeyal dibîne, guhdarî nekin. Xwedayê we Reb, we diceribîne ka hûn ji Wî ji dil û bi hemû canê xwe hez dikin an na."* (Dubareya Zagonê 13:1-3)

[87] Qralên 1., 18; Qralên 1., 19:18; Romayî 11:14.

[88] Smith, James E. *What the Bible teaches about the Promised Messiah.* Nashville, TN: Thomas Nelson Publishers, 1993, rûpel 470-474; Di heman demê de: Phililps, John. *Exploring The World of the Jew.* Neptune., NJ: Loizeaux Brothers, 1993, rûpel 80-81.

[89] Taylor, John. "Jones Captivates San Francisco's Liberal Elite," *San*

*Francisco Chronicle,* November 12, 1998.

[90] Smith, Joseph. *Pearl of Great Price.* Joseph Smith – History; 1:15-16.

[91] Pirtûka Pîroz ji hêla dîrok û arkeolojiyê ve tê pejirandin, lê dîrok û arkeolojî pirtûka Mormonê napejirînin. Thomas Stuart Ferguson profesorekî ye kû, ji bo kû ji "pirtûka pîroz" a Mormonan re delîleke pejirandî bibîne, ji bo vê yek armancê li Zanîngeha Brigham Young beşa arkeolojiya Mormonîzmê ava kiriye. Piştî lêkolîneke bîst û pênc salî, beşa arkeolojiya Fergusonê, wekî kû li pirtûka Mormonê tê diyarkirin, nebatên kû li herêmekê şîn bûne (flora), ajalên kû aîdê welatekî an jî dema jeolojiyê (fauna), topografî, erdnîgarî, mirov, perê hesin û delîlên kû derdoran dipejirîne nedîtine. Ferguson ev encam derxistiye kû erdnîgariya pirtûka Mormonê "pevxistî" ye. (Martin, Walter. *The Kingdom of the Cults.* Minneapolis, MN: Bethany House Publishers, 1977, rûpel 200-202).

**BEŞ 7: BÎNGEH**

[92] Di Pirtûka Pîroz de 66 pirtûkên takekesî hene – 39ê van pirtûkan di Peymana Kevin de, 27 jî di Peymana Nû de ye. Dêra Katolîk a Romayê (wekî gelek dêrên Prostestanan, kevneşopên dêrê derdixe ser Peyva Xwedê) di dîrokê de piştre biryar da kû 11 pirtûkên pêvek têxe navbera Peymanên Kevin û Nû. *Apokrifa* an jî *Deuterkanonikal* (Ji ber kû girêdayî Peymana Kevin e lê belê metnên wê yên Îbrankî tune ne, herkes tevlî metnên Pirtûka Pîroz nake û ji hêla hin dêran wekî pîroz têne qebûlkirin), esas di dema navbera Peymanên Kevin û Nû de hatin nivîsîn. Di van pirtûkan de melzemeyên ecêb ên dîrokî û efsanewî hene û Biîmanên Îbranî tu car qebûl nekirin kû ev nivîs ji hêla Xwedê hatine wergirtin û nivîsîn. piraniya Tomarên Deryaya Mirî yên kû di 1947an de hatine dîtin, şîrove ne. lê dîsa jî ev tomar tenê der heqê 39 pirtûkên Peymana Kevin de şîrove dikin, der heqê Apokrifayê de şîrove nakin. Dema Mesîh li serzemînê bû, tim ji Peymana Kevin jê girt, lê der heqê pirtûkên Apokrifayê de tu şîrove nehatin dîtin. Di Peymana Nû de tu jêgir tune ye der heqê Apokrifayê de. 39 pirtûkên Peymana Kevin, ji hêla pêxemberên kû rasterast bi wan re axivî û yên kû Peyva Wî pejirandin, hatin nivîsîn; *"Xwedê jî bi nîşane, mucîze, tiştên cihêreng û bi diyariyên Ruhê Pîroz ên kû Bixwe xwest belav bike re şahidî kir ji vê re"* (Îbranî 2:4). Kû em li Peymana Nû binêrin, biÎmanên kû di dema Mesîh hati serzemînê dijiyan, rayeya elçiyan qebûl kirin û pejirandin kû Nivîsên Peymana Nû bi Nivîs û pêxemberên Peymana Kevin wekhev

in. Heman tişt nedikarî ji bo Apokrifa bihata gotin.
[93] Ayetên Lûka 24:25-48; Yuhanna 5:39-47 bixwînin. Kû hûn bixwazin li çavkaniyên cihêreng ên kû peyama Xwedê wekî kronolojîk pêşkêş dike, li malpera www.goodseed.com binêrin.

## BEŞ 8: XWEDA YEKÎ ÇAWA YE

[94] Hewldanên zanyarên peresendî yên kû dixwazin dîroka peresendiyê derxin holê, bingeha xwe li ser "keda yekbûyî ya der heqê çavdêrî û teorî de" daniye (Loeb, Abraham. "The Dark Ages of the Universe." *Scientific American,* November 2006). Dema bingeha zanînên zanyarên peresendiyan li ser çavdêrî u teorî hatiye avakirin, bingeha zanîna yên kû ji Pirtûka Pîroz bawer dikin, li ser çavdêrî û ravekirinê hatiye avakirin. Rave, wekî kû li beşên 5 û 6. a YEK XWEDA YEK PEYAMê de tê dîtin, xwedî mohreke xwedayî ye. Xwedê rastiya xwe wisa rave kiriye kû, em dikarin *bizanibin* ev rastî rast e.
[95] Ayetên 38:6-7 yên pirtûka Eyûb, didin zanîn kû dema Xwedê serzemîn afirand, milyaket çavdêrî kirin û kêfxweş bûn. Pirtûka Eyûb, pirtûkeke helbestî ye; ji ber vê milyaket wekî *"stêrkên sibehê"* û *"n Xwedê"* tên diyarkirin. Ev her du biwêjên kû li vir hatine bikaranîn, qala hebûnên ji hev cuda nake. Ev diyarkirina duhêl, mînaka şibandinê ye kû taybetiya helbesta Îbranî ye. di heman demê de binêrin: Eyûb 1:6; 2:1.
[96] Ji nîvê zêdetir ê 66 pirtûkên Pirtûka Pîroz qala milyaketan dikin. Mînak: Afirîn: 3:24; 16:7-11; 18:1-19:1; Qralên 1., 19:5-7; Mezmûr 103:20-21; 104:4; Daniel 6:22; Îbranî 1:4-7,14; 12-22; Matta 1:20; 2:13, 19-20; 22:30; 26:53; Lûka 1 & 2; Selanîkiyên 2., 1:7, Wehî 5:11; 18:1;22:6-16, hwd. (pirtûka Wehiyê, peyva "milyaket" an jî "milyaketan" ji 70 caran zêdetir bi kar tîne.)
[97] Dubareya Zagonê 10:14; Korîntiyên 2., 12:2, 4; Yuhanna 14:2; Mezmûr 33:13; 115:3; Qralên 1., 8:39
[98] Vine, W.E., M.A. *An Expository Dictionary of New Testament Words.* Westwood, NJ: Fleming H. Revel Company; 1966, rûpel 229.
[99] Çalakiya Xwedê ya şeş rojî ya afirînê û rojekê bêhnvedanê, ji bo mirovahiyê çerxa zemanê ya kû ji hêla Xwedê tê diyarkirin, ava kir û heya îro li hemû cîhanê tê çavdêrîkirin. *Hefte* wekî kû jiroj, meh û salan cuda ye, ne di astronomiyê de ye. Hefte ji hêla Xwedê muqeder hat dîtin.
[100] Alîgirên teoriya "Teqîna Mezin", dibêjin kû ronî ji tav û serzemînê 9.000.000.000 sal berê hebû! (Loeb, Abraham. "The Dark Ages of the Universe," *Scientific american;* November 2006, rûpel 49.)

[101] Êdî kû hûn dilopeke avê vexwin, dibe kû hûn bixwazin ji Afirînerê xwe re bibêjin 'Spas dikim!' Rast e kû H2O (av) tînayiya me dişkîne û me zindî digire, lê av bi rastî jî mirov heyirî dihêle. Ji nav şileyan av tenê dema diqerise diqebire, bi vî awayî kêmtir zîlal û herikbar dibe. Kuav mîna madeyên din bûya, dema diqerise giran bûya, wê demê dê di binê gol û çeman de noq bibûya. Dê beşeke mezin a avê neheliya û di dawiyê de dê ava me ya xweş bimaya di binî de û dê biqerisiya. Fikra Xwedayê me yê der heqê vê mijarê de pir lihevhatî ye!
[102] Aliyê tarî yê heyvê cara destpêkê, ji hêla sê mirovan ve di 24 Berfanbar 1068an de, dema haleta valahiyê ya Apollo 8 li rêgeha heyvê zivirî, hat dîtin. Çi ecêb e kû, astronot wê rojê ji valahiya navbera stêrk û gerestêrkan de kû ji serzemînê re li ser televîzyonê dihat weşandin, beşa 1. a Afirînê xwendin (Reynolds, David West. *Apollo: The Epic Journey to the Moon.* NY: Harcourt, Inc., 2002, rûpel 110-111.)

**BEŞ 9: TU KES NAŞİBE WÎ**

[103] Mînakên din ên kû Xwedê ji Xwe wekî *"Em", "Ji Me" û "Ji Me re"* qal dike: Afirîn 3:22; 11:7; Yeşaya 6:8 (Nîşe: "Allah" her tim di Qur'anê de pirjimar diaxive. Ayetên Qur'anê yên kû di beşa 3. a YEK XWEDA YEK PEYAM de hatine ragihandin, ev diyar dikin.)
[104] Afirîn 1:1-3. Beşa destpêka Afirînê diyar nake kû Xwedê Yekbûyiya Sêmend e, lê şêwaza sazkirina peyvan, piştre bi ravekirinên Pirtûka Pîroz bi awayekî nuwaze li hev tên. Nivîsên Pîroz, bi awayekî zelal diyar dike kû her sê Kesên Xwedayî jî di çîroka afirînê de kar kirine.
[105] Dema Dawud Qralê Îsraîlê bû, Nivîsên Pîroz vê çîrokê dibêjin: *"Benyamînî li derdora Avnerê civiyan û yekîtiyek* (ehad) *ava kirin û li ser girekî sekinîn"* (Samuelê 2., 2:25). Heman peyva kû ji bo *"REB yek e"* tê bikaranîn, ji bo diyarkirina yekîtiya kû tê de pirjimarî heye tê bikaranîn.
[106] Mînakên din ên Peymana Kevin a kû yekîtiya kompleks a Xwedê dipejirîne: Afirîn 17:1-3; 18:1-33. Xwdê ji Brahîm re wekî beden xuya kir. Rû bi rû rastî hev hatin. Ev ne xewn ne jî bînahî bû. Afirîn 35:9-15; Ji Misirê Derketin 3:1-6; 6:2-3; 24:9-11; 33:10-11. Ji Misirê Derketin 33:11 bi 33:20 re hev rû bikin. Musa bi yek ji Kesên (Kûr) Xwedayî ve rû bi rû axivî, lê destûr nehat dayîn kû bila rûyê Kesê (Bav) din ê Xwedayî bibîne. Tevlihev e, ne wisa? Belê. Xwedê Xwedê ye. li Yuhanna 1:1-18 binêrin. Em ji xeynî têgîna yekbûyiya pirjimar a Xwedê, çend ayetên Peymana Kevin bidin kû wekî rast nayên têgihijtin: Mezmûr 2; Mezmûr 110:1 (bi Matta 22:41-46 re hevrû bikin); Şîretên Silêman 30:4;

Yeşaya 6:1-3 (bi Yuhanna 12:41 hevrû bikin); Yeşaya 26:3-4; Yeşaya 40:3-11; Yeşaya 43:10-11 (Yeşaya 7:14; 9:6-7); Yeşaya 48:16; Yeşaya 63:1-14; Yeşaya 49:1-7; Yeremya 23:5-6; Daniel 7:13-14; Hoşea 12:3-5; Mîka 5:2; Malaki 3:1-2, hwd.

[107] Lûka 15:11-32; di heman demê de Nameya 1. a Yuhanna bixwînin.

[108] Mezmûrê 2. ê kû Pêxember Dawud ji Mesîh wekî *Xwedê* qal dike, bixwînin. Li ser hin nav û nasnavên Kur jî bifikirin. Ew wekî '*Derî'* tê binavkirin, (Yuhanna 10), lê ev nasnav, nayê wê wateyê kû Ew deriyekî texte an jî metal e. Di heman demê wekî *"Nanê Jiyanê"* jî tê binavkirin (Yuhanna 6), lê ev jî nayê wê wateyê kû Ew nanê somin e. An jî *"Xwedê"* nayê wê wateyê kû Xwedê bi yekê re zewiciye û xwedî zarokekî bûye. Beşên 1. 3. û 5. ên pirtûka Yuhannayê bixwînin.

[109] Rojnameya netewî ya Senegalê, *Le Soleil,* mercredi 14 mars 1984: "Bienfaiteur sincere, il considerait ses 2.ooo employes comme ses enfants et partageait leur problemes, leur soucis et leur joie. Le 'Vieux' comme l'appelaient familierement et tendrement son personel, etait un Grand fils du Senegal." (Bi Kûrdî: Xêrxwazekî ji dil bû, 2000 karkerên xwe yên kû li cem xwe didan xebitandin wekî zarokên xwe didîtin, û pirsgirêk, xem û kêfxeşiyên wan hevpar dikir. Ev patronê kû karkerên wî yên kû jê re kêfxweşî û nêzîkahî hîs dikirin û jê re 'kalik' digotin, neviyê Senegalê bû—ji Senegalê bû.)

[110] Wekî Xwedê Bixwe, Ruhê Pîroz jî zehmetî nabîne kû têkeve qaliba me ya pêşdarazî. Yek ji pêxemberên Xwedê kû jê re demeke kûrt Bihuşt hatiye nîşandan, Ruhê Pîroz wekî *"heft meşaleyên kû li ber textê kû heft ruhê Xwedê ye şewitîn"* dibîne. (Wehî 4:5) Pêxemberekî din, wekî Kesekî, heft wesfên kû tenê ji Xwedê hatine, da zanîn: *"Ruhê REB, Ruhê zanyarî û ferasetê, Ruhê şîret û hêzê, Ruhê zanist û tirsa Reb."* (Yeşaya 11:2)

[111] Dema Xwedê li serzemînê bû, ji xwendekarên xwe re ev wehd da: *"Ruhê Pîroz ê Alîkar ê kû dê Bav bi Navê Min bişîne, dê her tiştê fêrî we bike, dê hemû gotinên min bîne bîra we."* (Yuhanna 14:26) Ev gotin, yekîtiya yeqîn a kû her tim di nav Bav, Kur û Ruhê Pîroz de ye, didin nîşan. Wekî Bav û Kur, Ruhê Pîroz jî Hebûnekî Kesane ye *("Ew...")* Der heqê Ruhê Pîroz de ji bo zêdetir agahiyê li beşên 16, 22, û 28an binêrin. Di heman demê de *Name û Karên Elçiyan* ên Pirtûka Pîroz bixwînin û bala xwe bidin rola Ruhê Pîroz kû dilîze.

[112] Mizgînî dinivîse kû Kur ji Bavê xwe re *"beriya avakirina dinyayê bilindahiya min a kû dema ez li cem te bûm xwediyê bûm"* behs dike. Em di heman demê de dibihîzin kû Kur wiha jî dibêje: *"Bavo... beriya*

*avakirina dinyayê Te ji Min hez kir."* (Yuhanna 17:5, 24). Di heman demê de li ayetên Mîka 5:2; Yeşaya 9:6 jî binêrin. Kû em li Ruhê Pîroz vegerin, yek ji nasnavên Wî *"Ruhê bêdawî"* ye. (Îbranî 9:14)

[113] Ji Misirê Derketin 20:22; Îbranî 12:25; Lûka 3:22; 5:24; Yuhanna 1:1-18; 3:16-19; 17:22; Karên Elçiyan 5:3; 7:51; Galatyayî 4:6; hwd.

[114] Biwêja *Allah* a bi zimanê Erebî, bi wateya xwe ya orîjînal beramberê biwêja *Xwedê* ya bi Îngîlîzî ye. Wekî ayeteke Afirîn 1:1: *"Di serî de Xwedê ... afirand"* kû di Peymana Kevin de ye an jî wekî ayeteke Yuhanna 1:1: *"Di serî de Peyv hebû. Peyv bi Xwedê re bû û Peyv Xwedê bû"* kû di Peymana Nû de ye, peyva *Xwedê* peyva *Allah* e kû di zimanê Erebî de tê bikaranîn, wateya wê *Hebûna Herî Raser* e. Girîng e kû mirov têbigihîje, Hebûna Herî Raser ji bo nasînê xwedî navên kesane ye. Tevî gelek kes wisa nafikire, "Allah" ne navê esas ê kesane yê Xwedê ye. Di heman demê de, "Xwedê" jî li dijî fikra gelek kesan, ne navê Wî yê esas ê kesane ye.

**BEŞ 10: AFERÎDEYEKÎ TAYBET**

[115] Guinness, Alma *EABC's of The Human Body.* Nivîskarê Civandî: The Reader's Digest Assosiation, 1987, rûpel 22.

[116] Gates, Bill. *The Road Ahead.* NY: Penguin Group, 1995, rûpel 188.

[117] Dema Pirtûka Pîroz rastiyeke ruhî ya mezintir xêz dike, sîstema bedena lihevhatî ya mirov wiha diyar dike: *"Di rêbertiya Wî de hemû beden, bi alîkariya her girêçikê kêlûn bûye û bi hev ve kelijiye û bi karkirina birêkûpêk a her endamên wê mezin dibe û di hezkirinê de pêş dikeve."* (Efesî 4:16)

[118] Ev raman, ji şîroveya balkêş a John Philips a der heqê Afirînê hat guncandin (Philips, John. *ExploringGenesis.* Chicago: Moody Pres, 1980). Nîşe: Nivîên Pîroz ruh, can û bedenê ji hev vediqetînin. Binêrin: 1. Selanîkî 5:23; Îbranî 4:12-13; Yuhanna 4:24.

[119] Fikra kû Baxçeyê Adenê li herêma Iraqê ye, bingeha xwe li ser agahiya erdnîgari ya kû di ayetên Afirîn 2:13-14 hatine dayîn, ava dike. Nîşe: tevî Nivîsên Pîroz dijî vê dibêje, hin kes Baxçeyê Adenê wekî *baxçeyê bihuştê* difikirin.

[120] Henry, Matthew. *Matthew Henry's Commentary.* Grand Rapids, MI: Zondervan, 1960, rûpel 7.

[121] Adem *(Adamah)* beramberê peyva *mirov*ê ya Îbrankî ye. Tam wateya wê, 'axa sor' e, lewre mirov ji axê hat girtin. Havva *(işşa)* tê wateya *"jiyan"*ê— *"Lewre ew diya hemû mirovan bû."* (Afirîn 3:19-20)

## BEŞ 11: DESTPÊKA A XERAB

[122] *"Ya stêrka biriqî (Lusîfer), berbanê! Tu çawa ketîji ezmanan! Ya yê kû ji ser neteweyan derbas dibe, tu çawa li erdê ketî!"* (Yeşaya 14:12). Di vê ayetê de navê "Lusîfer"ê tê wateya "hilgirê roniyê" û di metna Îbrankî de tune ye. Peyva Îbrankî ya *helel* ya kû tê wateya "yê dibiriqe", wergereke Latînî ye. Yeşaya 14 û Hezekiel 28 ji me re mînaka zagona şîroveya duhêl dide. Ev beş, di xuyanga de qralên erdîn nîşan didin. Yeşaya dema ji *"Qralê Babîlê"* behs dike, Hezekiel *"Prensê Sûrê"* dinivîse. Dîsa jî biwêjên kû di her du beşan de ne jî, tenê ji bo mirovan nayê sepandin. Dema di bin roniya ayetên din xebatek tê kirin (Lûka 10:18; Eyûb 1:6-12); Wehî 12:10; Petrûsê 1., 5:8 hwd) tê famkirin kû ev beş şîroveyên der heqê ketina Şeytên de ne—bandor û kesê pêşkar ê kû li pişt van qralên xirab e.

[123] Wehî 12:4

[124] Matta 10:28; 23:33; Markos 9:43-48

[125] Wehî 20:10-15

## BEŞ 12: ZAGONA GUNEH Û MİRİNÊ

[126] Pirseke kû her kes dike: Ji bebek û zarokên kû dimirin re çi dibe? Dê ji ber xwezaya gunehê ya aferîşa xwe, bêne darizandin (Mezmûr 51:5; 58:3)? Dê Xwedayê biedalet ya rast bike (Afirîn 18:25). Xwedê kesekî kû hunera wî ya famkirinê tune ye, nadarizîne. Ew kesan, bi zanînên wan û kû der heqê lêgerîna rastiya Xwedê de ked bidin, wan bi tiştên dibe kû *bizanibin* berpirsiyar dike (Romayî 2:11-15; Mezmûr 34:10; Yeşaya 55:6). Kesekî dema bi qasî bikaribe li ber Xwedê bijareyên exlaqî bike bigihije, êdî berpirsiyar e (Dubareya Zagonê 1:39; Yeşaya 7:16; Samuelê 2., 12:23; Matta 18:10; Timoteosê 2., 3:14-17). Tenê Xwedê dizane kesekî kengî ji guneh û bijareyên xwe berpirsiyar e. Rewş çi be bila bibe, peyama kû Xwedê ji her yekî me re dide, ev e: *"Va ye wext niha ye, roja rizgariyê va ye niha ye."* (Korîntiyên 2., 6:2).

[127] Wehî 20:14-15; 2:11; 21:8; Matta 25:46

## BEŞ 13: DİLOVANÎ Û EDALET

Di vê beşê de têbinî tune ye.

## BEŞ 14: LANET

[128] "Pîton û marên boxe … di bin çermên wan de lingên wan ên kû dişibe girêkê û li ser girêkan jî penceyên wan ên biçûçik û bi qasî nîv înçê

(1.27 cm) hene kû zikê xwe yê kû nêzî zotikê ye hişk girtine. Esas ev girêk ne ling in, nîşana hestiyên lingê jor (ran an jî hestiyê qorikê) ne. marên nêr hê jî paşpanîk bi kar tînin—lê tenê dema cilwe dikin an jî şer dikin bi kar tînin- ne ji bo meşê. Lingên marên din tune ne." www.wonderquest.com/snake-legs.htm (wêne hene). Hin kes vê rastiya biyolojîk ji bo hîpotezên xwe yên der heqê peresendiyê de, wekî piştgirî şîrove dikin. Tişta kû em dixwazin bêjin ev e: anatomiya van maran bi Nivîsên Pîroz ên kû bi hezaran sal berê nivîsîne, li hev tê.

[129] Di heman demê de: Wehî 20:2; Lûka 10:18 û Korîntiyên 2., 11:3, 14: *"Wekî kû mar Hewa bi xasûktiya xwe xapand." "Şeytan xwe wekî milyaketê roniyê nîşan dide."*

[130] Ji Misirê Derketin 29:7; Samuelê 1., 10:1; Qralên 2., 9:6; Mezmûr 45:7

[131] Beşa 18. sê sedem pêşkêş dike ka Xwedê plana xwe ya rizgariyê çima girt. Yek ji zewqa xebata Nivîsên Pîroz wekî kronolojîk ew e kû, kifşkirina plana rêza bûyeran a kû dema Xwedê gunehkaran ji Şeytan, guneh û mirinê rizgar dike, ye. Xwedê bi bikaranîna Zanyariya xwe, plana xwe di pêvajoyekê de rave kir: *"rêzik li ser rêzikê, hinek ji vir hinek ji wir."* (Yeşaya 28:10)

[132] Di rêza çîrokê ya komîk a bi navê "Tu ji vî re jîr dibêjî?" de, *Time Magazine* têgîna Sêwirînerekî Biaqil (Xwedê) biçûk dibîne: "Mijara kalbûnê, bi awayekî ferasettir û rûmettir nedihat çareserkirin? Mînak: Mirovên kalik li şûna kû biqirmiçin û kêrî tu tiştê neyên, nedikarîn bi awayekî helbestî wenda bûna?" (Handy Bruce and Glynis Sweeny. *Time,* July 4, 2005, rûpel 90) di heman demê de li beşa *Neither Intelligent* a pirtûka bi navê *Improbability of God,* ev tê gotin: "Ji bo aferîdeyekî kû ev qas xirab û biqusûr hatiye sêwirandin, dikare ji yê kû Sêwirîna Biaqil pêşkêş dike, egoyeke mirov a bifêz û ji xwe zêde bawer dike, hebe? (Bruce and Frances Martin in *The Improbability of God* by Michael Martin and Ricki Monnier, Amherst, NY: Prometheus Books, 2006, rûpel 220)

## BEŞ 15: AİZİYA DUHÊL

[133] ABC News, May 20, 2006; http://abclocal.go.com/ktrk/story?section=nation world&id=4189656

[134] Xweşûştinên merasîmî parçeyeke zagona Peymana Kevin bûn (li pirtûka Leviyî binêrin). Armanca van merasîman ew bû kû gunehkaran hînê qirêjiyên ruhî yên li ber Xwedê bikin. Ji ber kû Xwedê bi rêya Mesîh paqijiyeke tam û rastî dîtiye, Xwedê êdî merasîmên bi vî awayî naxwaze. Beşên Karên Elçiyan 10 û Koloseyî 2 bixwînin. Heya îro gelek dîn, merasîmên derveyî yên der heqê paqijî de tînin zimên û li ser van merasîman pir disekinin. Ji Misilmanekî kû li Londrayê dijî, ev

peyama elektronîk hat ji min re: “Xirîstiyan jî tê de, yên kû ne Misilman in hemû qirêj in. Misilman paqij in û nêzî Xwedê ne, lewre xwe dişon.”
[135] Xwedê piştî kû ferman bi devkî dan zanîn (Ji Misirê Derketin 20), Musa gazî çiyê kir û du lewheyên kevir danê kû bi destê xwe fermanan nivîsiye li ser (Ji Misirê Derketin 24:12; 31:18). *“Lewheyên kevir Xwedê çêkiribûn, nivîsên qewartî yên li ser, nivîsên Wî bûn.”* (Ji Misirê Derketin 32:16)
[136] Binêrin: Lûka 18:9-14; Efesî 2:8-9.
[137] Mesîh yek Kes e kû hemû zagonên Xwedê pêk aniye û dikare bêje, *“Ya Xwedayê min, ez bi pêkanîna daxwaza Te zewqê distînm, Zagona te di kûrahiya dilê min de ye”* (Mezmûr 40:8). Zagon Wî nîşanê me dide. *“ji bo kû em bi îman pak bibin, heya hatina Mesîh Zagon bû perwerdekarê me.”* (Galatyayî 3:24) Der heqê gunehê mirov de, pêşnumaya çareseriya Xwedê, di Romayî 3:20-27an de bi awayekî xurt tê diyarkirin.

## BEŞ 16: EZBETA JİNEKÊ

[138] Çawa kû her kes di Adem de dimire, dê her kes di Mesîh de bijî.” (Korîntiyên 1., 15:22); di heman demê de beşa 5. Romayî û ayetên Galatyayî 4:4-5 jî bixwînin.
[139] Neo-birth Pregnancy Care Center www.neobirth.org.za/development.html
[140] *“Beytlehem Efrat“* navê kevin ê Beytlehemê bû kû bajarê li başûrê Yeruşalimê ye (Afirîn 35:16-19; 48:7). Qral Dawud wekî nifşa xwe ya kû ji Wî mezintir bû, li Beytlehemê hat dinyayê (Samuelê 1., 16:1, 18-19; 17:12). Cihûyên kû li roja Îsa dijiyan, ji ber kû Îsa li Celîle Nasirayê mezin bû (Yuhanna 7:41-42) serê wan tevlihev dibû.
[141] Ji bo referansên Pirtûka Pîroz li lîsteya pêxemberan a beşa 5. binêrin.
[142] Der heqê wateya Mesîh de, ji bo zêdetir agahiyê li mijara beşa 14. a kû di bin sernava DU “TOV”ê de ye binêrin.
[143] Afirîn 1:2. Divê Ruhê Pîroz ê Xwedê bi Cibraîl neyê tevlihevkirin. Milyaket Cibraîl Hebûneke kû hatibû afirandin bû. Ruhê Pîroz nehatiye afirandin, Ruhê Xwedê Bixwe ye kû her tim çalak e. Li beşên 9 û 28an binêrin.
[144] Matta 13:55-56; Lûka 8:19; Yuhanna 7:3-10.
[145] Pêxember berê dan zanîn kû dê Mesîh ji bakîreyekê bê dinyayê: Yeşaya 7:14; Mesîh dê bûya nifşeke kû ji xêza Brahîm, Îshaq, Yaqûb û Yahuda tê. Afirîn 17:18-21; 26:3-4; 28:13-14; 49:8-10; Mesîh dê ji nifşa qraliyeta Qral Dawud bihata: Samuelê 2., 7:16; dê li Beytlehemê bihata dinyayê: Mîka 5:2.
[146] Matta 2. Qral Hirodes, ji fikra hatina “qralekî” din hesûdî kir û ferman da kû bila zarokên kur ên du salî an jî biçûktir ên Beytlehemê û

derdora wê bêne kuştin, bi vî awayî hewal da kû Îsa bikuje. Li pişt van hemû bûyeran Şeytan hebû. Armanca Şeytên ew bû kû *Ezbeta Jinê* ya kû “serweriya wî!” dagir dike, qir bike. Lê Xwedê di hewldanên Şeytên ên kuştina Îsa de, Yusuf hişyar kir û jê re ragihand kû bila Meryem û wê yî biçûk bigire û ji bo veşartinê bihere Misirê, bi vî awayî ji Şeytên re bû asteng. Di heman demê de pêxember jî ev bûyer ji berê de dabûn zanîn (Matta beşa 2; Mîka 5:2; Hoşea 11:1; Yeremya 31:15). Piştî mirina Qral Hirodes, Yusuf, Meryem û Îsayê zarok, vegeriyan Nasirayê kû Îsa li wir mezin bû û bû xortek.

**BEŞ 17: DİBE KÛ EV KES KÎ BE?**

[147] Jayyusî ji Salma Khadrayê hatiye guncandin. *Tales of Juha.* Interlink Books. Northampton, MA, 2007, rûpel 19.

[148] Li jêrê navê hin nivîskarên dîrokê yên kevin hatine dayîn kû der heqê Îsayê Nasirayî de referans didin, lê bi Pirtûka Pîroz eleqa wan tune ye: Takitus, dîrokvanê Romayî (P.M. 55-120) (Tacitus 15:44); Josephusê Cihû yê dîrokvan (P.M. 37-101)(*Antiquities* 18:3); Talmud, şîroveya hêrisên der heqê Tewrat de *(The Babylonian Talmud.* Sanhedrin, 43a); Grekekî bi navê Lusian *(The Death of Pereguire,* rûpel 11-13, *The Works of Samasota,* ji hêla H.W. Fowler û F. G. Fowler hatiye wergarandin, 4 cilt. Oxford: Clarendon Pres, 1949; Suetonius (P.M. 69-12), sekreterê sereke yê Împarator Hadrian (*Claudias,* 25). Nîşe: J. Oswald Sanders wiha nivîsî “Parastina Mesîhê Pirtûka Pîroz wekî kû tenê nifşa xeyaleke mirov e û ne xwedî rastiyeke dîrokî ye, mizginî di warê wêjeyê de dikirin mucîzeyeke mezin, wekî Mesîhê kû di warê dîrokê de wisa ye. Ernest Renan da zanîn, ji bo derxistina Îsayekî pêdivî bi derxistina Îsayekî heye. J.J.Rousseau dibêje, kû çend kes ji bo nivîsîna çîroka vê biryar bidin û kesekî şêwaza çîrokê çêke, ev zêdetir nefesîh dibe.” (Sanders, J. Oswald. *The Incomparable Christ.* Moody Press. Chicago, 1971, rûpel 57).

[149] Matta 13:55-56. Îsa li Nasirayê mezin bû (Matta 2:22-23; Lûka 2:51-52), li cem bavê xwe yê legal Yusuf wekî dartraşekî xebitî (Markos 6:3). Dilovaniya Îsa, ne ji ber kû Xizmetkarekî dilovan, lê ji ber kû lehengekî kû feth dike dixwazin, xeyidand.

[150] *“Îsa dema dest bi peywira xwe kir emrê Wî di sihan de bû. Digotin qey Yusuf e”* (Lûka 3:23).

[151] Îsa her tim ji xwe wekî *“Beniadem”* qal kir; ev nasnavê Mesîh bû û wateya wê “ Mirovahiyê” bû (bi Grekî: *Anthropos)* Çi nasnavekî

serasa! Bila kêfa bê jî neyê jî em n mirovahiyê ne (xizm).” Lê di rewşa Xwedê yê bilindbûyî de, Wî, *kurê mirovê* pejirand û xwe bi nifşa mirov re kir yek. Bi vî awayî ev nasnav, bi qasî mirovahiya Îsa derdixe pêş, Xwedatiya Wî jî derdixe pêş, lewre Xwedê mudaxaleya kû li mirovahiyê dike, nîşan dike. Van ayetan bixwînin: Daniel 7:13-14; Matta 8:20; Lûka 5:24; 22:69-70; Yuhanna 5:27; 13:31; Wehî 1:13-18; 14:14.

[152] Mînak, ev ayeta (Lûka 4:4) Peymana Kevin a kû Îsa vediguhêze, ji Tewrata Musa hatiye girtin: Dubareya Zagonê 8:3.

[153] Ji ber guneha mirov, Şeytan bi rastî jî bibû *“serwerê vê dinyayê”* û *“serwerê hukumrana hewayê, ango ruhê bandorker ê li ser mirovên kû guh nadin”* (Yuhanna 12:31; Efesî 2:2). Xwedê ji bo restorekirina serweriya kû mirov ji ber gunehê wenda kiribûn, hatibû, lê Wî ev bi şêwaza Şeytên çênekir. Bi şêwaza Xwedê çêkir.

[154] Mezmûr 110 û Mezmûr 2; Matta 21:41-46

[155] Qur’an: 19:19; Tezat: 48:2; 47:19

[156] Qur’an: 19:19; 3:45-51; 5:110-112: 19:19

[157] Qur’an: 4:171

[158] Mezintirîn gunehê di Îslamiyetê de *“şirk”* e (Bi erebî beramberê peyva *yekîtî*yê). Şirk, tiştekê an jî yekê bi Xwedê re wekhev dîtin e.

[159] Bala xwe bidin nasnavên kû ji Mesîh re hatine wehdkirin: *Nuwaze* = Nasnaveke kû tenê ji bo Xwedê tê bikaranîn, wateya wê *“derasayî”* ye. Şîretker = Mesîh dê bûya *Kesanîkirina Zanatiyê. Xwedayê Qedir* = Dê Xwedê Bixwe bedena mirovekî bigirta. *Bavê Ebedî* = Ew ê bûya *Xwediyê Bêdawîtiyê. Mîrzayê Selametiyê* = Ew ê ji gunahkaran re aşitiya bi Xwedê re, aramiya hundirîn û di dawiyê de jî *aşitiya gerdûnî* bianiya.

[160] Pêxember Dawud ji berê de got kû dê REB wekî Kesekî bê serzemînê: *“Va ye hatim! Li tomara Pirtûka Pîroz ji bo min hatiye nivîsîn.”* (Mezmûr 40:7) Malaki pêxemberiyek kiribû kû dê Xwedê ji bo amadehiya hatina *“REB”* ji berê de nûçevanekî bişanda (Malaki 3:1).

[161] Daketina Xwedê ya asta me, ji hişmeta Wî re zerar dide? Bifikirin kû hûn û hevalekî we der heqê du rêberekên ruhî yên kû pir rêz tên girtin, dipeyivin—Navên yek van rêberan bila bibe Omer û yê din jî Harun. Hevalê we ji we re wiha dibêje: “Harun bi erebeyên pêlîstok dilîze, lê Omer nalîze.” Wekî kesekî kû ji Harun re pir rêz digre, hûn dibêjin: “Qet! Bila leyîstina bi erebeyên pêlîstok re ji Harun dûr be!” Bizaveke wisa di serî de dikare maqûl û rast xuya bibe. Piştre bifikirin kû çîrok wiha berdewam dike: zarokên biçûk ên Omer û Harun hene û kêfa van zarokan pir tê dema bavê wan wekî wan li erdê rûdine û bi wan

re dilîze. Dema Harun bi zarokên xwe re bi vî awayî wext derbas dike kêfxweş dibe, lê Omer ev tişt nake, lewre difikire kû wiha bike dê rêza kû jê re tê girtin biçûk bixe û dema em van hîn bibin em ê çi bifikirin? Ji van her du zilaman kîjan bav, mirov û rêberê herî baş e? Omer an Harun? Bi heman awayî, dema mirov dibêjin "Xwedayê kû Hêza Wî Têra Her Tiştê Dike kû li serzemînê wekî mirov xuya ke dê ji hişmeta Wî re zerar bide" dibe kû nêta wan baş be, lê bi van gotinên xwe li şûna bilindkirina hişmeta Xwedê, ji hişmeta Wî re zerar didin.

[162] Yuhanna 13 ji me re vedibêje kû Îsa lingên xwendekarên xwe dişo – lingşûştin karê xizmetkarekî ye! Xwendina Mizgîniyê, bi Xizmetkarê dawînî yê kû Reb Bixwe ye re rasthatin e.

[163] Matta 14; Markos 6; Yuhanna 6.

[164] Ger Îsa bixwesta bigota tenê beriya Brahîm hebû, diviyabû bigota, "Beriya jiyadîkbûna Brahîm Ez hebûm." Lê Wî got, "Beriya jidayîkbûna Brahîm Ez heme." Der heqê YHVH de li beşa 9. binêrin (Ji Misirê Derketin 3:14).

[165] Peyva "perestinê" ya kû ji bo kesên kû Îsa diperêsin tê bikaranîn, bi peyva ji bo yên kû Xwedê diperêsin tê bikaranîn, heman e (ayeta Matta 8:2 bi ayeta Wehî 7:11 hevrû bikin). Di her du rewşê de jî peyva "perestinê" ji peyva *proskneo*ya Grekî tê û wateya wê, "bi heyranî xwe deverû li erdê dirêjkirin, perestin" e.

[166] Ger hûn hê jî der heqê guhertina Nivîsên Pirtûka Pîroz de xwedî ramaneke nehatiye çespandin in, beşa 3. a "Hat Guhertin, an Parastin?" dîsa bixwînin.

[167] Lewis. C.S. *Mere Christianity.* NY: Macmillan-Collier, 1960, rûpel 55-56.

[168] Kû hûn dixwazin der heqê yekîtiya yekbûyî ya Xwedê dîsa xwedî agahî bin, beşa 9. bixwînin.

[169] Gelek kes der heqê rûyeke din a vê çîroka Îsa û zilamê dewlemend de dudilî dibin. Zilamê ciwan bi bez hat cem Îsa û ev pirs kir: *"Mamosteyê Baş, ji bo gihiştina jiyana bêdawî divê ez qenciyeke çawa bikim?"* (Matta 19:16; Markos 10:17; Lûka 10:25). Pirsa zilamê ciwan ji qelebalixê re baş xuya kir, lê ji bo Reb ne baş bû. Îsa dizanîbû kû ev zilamê dîndar hê jî tênegihijtiye rastiyên bingeh ên der heqê pîroziya bêsînor a Xwedê û gunehkariya dawînî ya mirov. Ev zilamê kû ji rastiya xwe bawer dike, fikirî kû dikare rêya têketina bihuştê bi dest bixe; bawer dikir kû dê bi awayekî baş bibe. Ji zarokekî kû di nav kefa destê wî de çend perê hesin hene, ji zilamê herî dewlemend ê cîhanê dipirse, "Ji bo milkê te wekî mîrat bistînim divê çend heb ji van peran bidim te?" ne cuda bû.

Îsa ji pirsa vî zilamî re çawa bersiv da? Îsa Tewrat û Deh Ferman anî bîra wî, armanca Wî ew bû kû ji zilamê dewlemend re bide nîşan kû tu car nikare bi hêza xwe standarda rastiya nuwaze ya Xwedê têr bike. Ji bo kesên kû difikirin *"bi qenciyê"* dikarin jiyana bêdawî bi dest bixin, *"jiyana bêdawî"* tune ye.

[170] Îsa di heman demê de wiha got: *"Bila bêhna we teng nebe; ji Xwedê re îman bikin, di heman demê de ji Min re jî îman bikin ... Rê, Rastî û Jiyan Ez im ... Kû bi rêya min nebe, tu kes nikare bê cem Bav – Yê kû ez dîtime, Bav jî dîtiye. Tu çawa dibêjî, 'Bav rê me bide?' Tu bawer nakî kû Ez di Bav de, Bav di Min de ye? Ji min re îman bikin, Ez di Bav de me, Bav jî di Min de ... Qet nebe ji ber van karan îman bikin."* (Yuhanna 14:1, 6, 9, 11)

[171] Yeşaya 53:1; Yuhanna 12:28; Lûka 1:51; Di heman demê de binêrin: Yeşaya 40:10-11; 51:5; 52:10; 59:16; 63:5; Yeremya 32:17.

[172] Xwedê hêz da du pêxemberên bi navê Îlyas û Elîşa kû bila kesekî mirî dîsa vegerînin jiyanê, lê tu pêxember xwe wekî Çavkaniya Jiyanê nîşan neda. Tenê Îsa karî bigota *"Vejîn û Jiyan Ez im."*

[173] Mesîh beriya kû bê serzemînê li esmên bû. Dema Lusîfer ji esmên hat derkirin, Ew li wir bû. Ji ber vê ji xwendekarên xwe re got, *"Min dît kû Şeytan wekî birûskê ket ji esmên"* (Lûka 10:18).

## BEŞ 18: PÊŞNÛMAYA BÊDAWÎ YA XWEDA

[174] Îbranî 11:6; Yeremya 29:13; Yeşaya 29:11; Matta 11:25; 13:13-14; Lûka 8:4-15; Yuhanna 6. Piraniya rastiyên Xwedê, ji bo tenê ji bo kesên kû li Wî digerin, bi zanebûn û bi awayekî nediyar tê aşkerekirin. Dê Xwedê mirovan neçar neke kû guh bidin rastiyên Wî, fam bikin û jê bawer bikin. Yên *dilxwaz* dê rastiya Wî kifş bikin. *Dilxwazên der heqê korbûnê de jî* dê rastiyên Wî kifş nekin.

[175] Tevî bi sedan salan beriya pêkbûna bûyerê hatine nivîsîn, we bala xwe da kû çend pêxemberî di demên berê de hatine nivîsîn? Ji planên Xwedê re asteng nabe. Dema Afirîner dibêje dê tiştek pêk bê, qebûl bikin kû ew tişt çêbûye. Di heman demê de sedema kû Mesîh wekî *"ji avabûna dinyayê û pê ve Berxikê şerjêkirî"* (Wehî 13:8) tê binavkirin, ev e.

[176] Mezmûr 2. Li cihekî din ê Nivîsên Pîroz Mesîh (hatina Wî ya duyemîn), ji kevirekî mezin ê kû ji esmên dadikeve tê şibandin kû dê kesên kû serê xwe li ber plana rizgariyê ya Xwedê xwar nakin, parçe parçe bike (Daniel 2:34-35; û Matta 21:42-44).

[177] Ji bo peyvên din ên Petrus beşên Karên Elçiyan 2-5, ayetên Karên Elçiyan 10; Petrusê 1., 1:10-12; 2:21-25; 3:18 bixwînin. Di heman

demê de li ser vn peyvên kû ji hêla elçî Pavlus hatine nivîsîn, bifikirin: *“Daxuyaniya der heqê çarmixê de, ji bo yên kû dê mehv bibin tewş e lê ji bo me yên kû bifilitin hêza Xwedê ye. ‘Zeîfbûna’ Xwedê ji hêza mirov xurttir e. Xwedê ji bo kû yên xurt bide şermê, yên kû dinya wan zeîf dihesibîne, hilbijart”* (Korîntiyên 1., 1:18, 25, 27).

**BEŞ 19: ZAGONA QURBANÊ**

[178] Habîl çawa zanî kû divê van hemûyan bike? Xwedê jê re gotibû. Îbranî 11:4 ji me re vedibêje kû Habîl *“bi îman”* qurban aniye. Habîl ji ferman û wehda Xwedê re îman kiribû. Piştre Nivîsên Pîroz dê zagonên hurgûlî yên der heqê qurbanê kû Xwedê ketiye şûna mirov de bidaya zanîn kû berê demeke dirêh Habîl bi îtaet pêşkêş kiriye. Mînak, beşa Afirîn 4, ji me re hîn dike kû Habîl *“Yê kû destpêkê hatiye dinyayê “* tîne (Bi Ji Misirê Derketin 13:12-13 bidin ber hev). Habîl ji *“keriyê xwe”* berxikek anî (Leviyî 5:6). Habîl *“rûnên wan”* pêşkêş kir (Leviyî 3:16). Di ayetan de nehatiye diyarkirin kû Habîl berxika xwe li ser qurbangehê pêşkêş kiriye; lê tê hesibandin kû wisa kiriye – wekî kû biîmanên piştî wî tên wisa dikin. Afirîn 8:20; 12:7; 13:4, 18; 22:8-9; Ji Misirê Derketin 20:24-26; hwd.

[179] Daniel 6; Ester 3:8-15; 8:7-17

[180] Strong, James. *The Exhaustive Concordance of the Bible.* NY: Abingdon-Cokesbury Pres, 1948, rûpel 57. Afirîn 6:14 *(“rûber”)* bi Leviyî 5:18 *(“kefaret”)* bidin ber hev. *Kaphar*ê(kefaret) kû peyva Îbrankî ye, di van ayetan de tê bikaranîn.

[181] Leviyî 5:7

[182] Nivîsên Pîroz dibêjin kû ji 50yan zêdetir qurban divê *“bêqusûr”* bin. Mînak, *“ger yekî bixwaze ji bo pêşkêşa şewitînê dewar, ango pez an jî berxik pêşkêş bike, divê pêşkêşa wî bêqusûr û nêr be.”* (Leviyî 1:10).

**BEŞ 20: QURBANEKE GİRÎNG**

[183] *Eyd el-Adha* di Îslamiyetê de cejna herî girîng a salê ye. Ev cejn ji bo bîranîna Xwedê kû ji Brahîm re li şûna qurbankirina xwe beranek şandibû, tê pîrozkirin. Li gorî baweriya Misilmanan, kû li qurangehê hatibû dirêjkirin ne Îshaq, lê belê Îsmaîl bû – a rast Qur’an tu car diyar nake kû ev kur Îsmaîl û Pirtûka Pîroz bi aşkere dibeje kû ev kur Îshaq e. Qurbana eydê, ji hêla hemû Misilmanên cîhanê tê bicihanîn. Ev qurban di heman demê de, di pêkanîna Hecê ya kû li Mekkeyê ye, wekî merasîmekê tê kirin. Rêwiyên Hecê piştî duaya Eydê kû sibehê tê kirin,

xwîna heywanekî (bi gelemperî pez an jî çêlek) dirêjin û rêwîtiya Hecê diqedînin. Piraniya Misilmanan difikirin kû ev merasîm ji wan re "ji nû ve zayîn" dide û kû van merasîman bêkêmasî temam bikin ji gunehên xwe têne paqijkirin. Lê Misilman dîsa jî qebûl dikin kû ev merasîm ewledariya rizgariyê nade, lewre piştî qedandina Hec û qurbana Eydê, gunehên kû dikin dîsa li ser hev kom dibin. (Di vê mijarê de ji bo hînbûna nêrîna Pirtûka Pîroz, beşên Îbranî 10 û Yuhanna 3 bixwînin.)

[184] Navê Brahîm berê Avram bû, min di YEK XWEDA YEK PEYAM de ji ber kû cihê me tune bû ev beşa çîrokê rave nekiribû. Ji bo hînbûna temamiya çîroka der heqê Brahîm de, li beşa Afirîn 17 binêrin, beşên Afirîn 11-25 bixwînin; di heman demê de beşên Romayî 4, Galatyayî 4 û Îbranî 11 bixwînin.

[185] Dubareya Zagonê 7:6-7; 14:2

[186] Em çend mînak bidin der heqê Xwedê de kû neteweya Îsraîlê ji bo bereketkirina qelê kû ne Cihû ye bi kar aniye: Naomiya keça Brahîm e, ji du jinên Moavî yên bi navê Orpa û Rut (Rut) û pêxember Îlyas ji jineke jinebî ya Sarefatî (Qralên 1., 17; Lûka 4:26) re bûn bereket. Yunus bi dilxwazî nebe jî, ji Nînovayiyan re peyama rizgariyê ragihand (Yunus). Qral Silêman ji Qraliçeya Erebîstanê Saba re bû bereket (Qralên 1., 10; Lûka 11:31). Daniel gelê Babîlê bi bereket kir (Daniel 1-6). Ester û Mordekay ji Împaratoriya Pers re bereket anîn (Ester)…

[187] Afirîn 12:2-3; 22:16-18; Îbranî 6:13-20; Yuhanna 4:22; Karên Elçiyan 1-10 hwd.

[188] *Dema Brahîm hat ceribandin, Îshaq wekî qurbanekî bi îman pêşkêş kir. Brahîmê kû wehdan girtibû, dikir xwe yê delal qurban bikira. Lê Xwedê jê re gotibû, 'Dê nifşa te bi Îshaq berdewam ke.' Brahîm fikirî kû Xwedê dikare miriyan jî vejîn e, her wiha Îshaq bi awayekî sîmgeyî ji mirinê dîsa wergirt."* (Îbranî 11:17-19).

## BEŞ 21: XWÎNA KÛ BÊTIR DİRİJE

[189] Min di Peymana Kevin de dest bi jimartina çîrokên qurbanê kirin, lê piştî gihaştina çîroka dusedan, min êdî nehejmart. Çar peyvên wekî *"Xwîn", "qurban", "pêşkêş",* û *"qurbangeh"* di Pirtûka Pîroz de ji 1400 caran zêdetir hene.

[190] AfirÎn 15:13-14. *"Reb ji Avram re wiha got, 'Vê baş bizanibe kû dê nifşa te li welatekî biyanî, li xerîbiyê bijî. Dê çar sed sal bibe kole û zilm bibîne. Lê ez ê neteweya kû dê nifşa te bike kole, ceza bikim, piştre dê nifşa te ji wir bi milkeke mezin derkeve.'* Pêkhatina wehda Xwedê di

ayetên Ji Misirê Derketin 1:1-12; 12:35-41 hatiye tomarkirin. Planên Xwedayê me yê serwer her tim pêk tên.

[191] Ji Misirê Derketin 5-11

[192] Demeke berê, Xwedê li Çiyayê Sînayê di nav deviyê kû dişewitî de ji Musa re ev wehd kiribû: *"Tu guman neke, ez ê bi te re bibim. Û delîla kû min tu şandiyî dê ev be: Dema we gel ji Misirê derxist, hûn ê li vê çiyê min biperêsin."* (Ji Misirê Derketin 3:12)

[193] Ji Misirê Derketin 13-17; *"Zinar qelaşt, av jê viziqîn, li axa bejî wekî çemekî herikî."* (Mezmûr 105:41)

[194] Ji Misirê Derketin 28:9-19; Piştre Mesîh dema li serzemînê bû wiha got: *"Derî Ez im. Kû kesekî bi rêya min têkeve hundir dê bifilite"* (Yuhanna 10:9). Her hêmana nav konê Kesayetî û karê Wî nîşan kir.

[195] *"Divê destê xwe deyne ser pêşkêşê û ew li devê deriyê Kona Civînê şerjê bike. Kahînên kû ji nifşa Harun tên dê xwînê li her derê qurbangehê birêjin... Dê n Harun, li ser pêşkêşa şewitînê kû li ser êzingên kû li qurbangehê dişewitin e, van bişewitîne."* (Leviyî 3:2, 5)

[196] Kona Civînê mînakeke Rizgarkerekî kû dê ji esmên bê serzemînê da nîşan. Ji bo kesên kû vî Rizgarkerî nas dikin *"Ew ji serî heya binî bedew e"* (Newaya Newayan 5:16) – wekî nava Kona Civînê. Ji bo yên kû Wî nas nakin jî *"ji bedewiyeke kû dilê me dikêşa bêpar bû"* (Yeşaya 53:2-3) –wekî derveyî Kona Civînê.

[197] *Adem (Adamah)* di Îbrankî de beramberê peyva "insan" e û rasterast wateya wê "axa sor" e, lewre Xwedê bedena Adem ji axa erdê şêwand.

[198] Li Çolê Hejmar 3:23-39

[199] Leviyî 16; Îro Cihû roja Kefaretê wekî *Yom Kippur* bi nav dikin, lê bi vî awayî Roj ji şêwaza xwe ya orîjînal bêpar dimîne, lewre êdî ne perestgeh, ne kahîntî û ne jî berxikên qurbanê yê Cihûyan mane. Sembola îro ya Cihûyan, dîwarekî ye kû ji yekê zêdetir wateya wî heye –Dîwarê Rojavayî- Dîwarê palpiştê kû ji bo firehkirina herêma perestgehê li hêla Hirodesê Mezin hatiye sazkirin. Cihû her roj li ber vî dîwarî disekinin û ji bo hatina Mesîh –jixwe hatiye- dua dikin! Wekî kû pêxember ji berê de dan zanîn, neteweya Cihû bi awayê ruhî kor e (Yeşaya 6:10; 53:1; Yeremya 5:21; Hezekiel 12:2; Korîntiyên 2., 3:12-4:6). Dê çavên Cihûyan rojekê vebe kû bizanibin Îsa (Yeşu) ew Kes e kû sembolîzmên perestgeh, kahîntî û qurbanan pêk tîne (Îbranî 8-10; Efesî 2). Dê dîwarê korîtiya ruhî hilweşe (Efesî 2:14; Romayî 9-11). Di beşa 5. a vê pirtûkê de, nivîs û têbiniyên di bin sernavê PÊXEMBERIYÊN DER HEQÊ GELEKÎ DE bixwînin.

[200] Ayeta Dîrokên 2., 3:1 bi ayeta Afirîn 22:2 bidin ber hev. Ev cih li cihê Kûbeya Kevir de ye kû Misilman di sedsala heftemîn de saz kiribûn.
[201] Dîrokên 2., 7:5

## BEŞ 22: BERXİK

[202] Di Pirtûka Pîroz de yek ji nasnavên REB İmmanuel e, rasterast wateya wê *"Xwedê bi me re ye"* (Yeşaya 7:14; Matta 1:23)
[203] Korîntiyên 2., 5:1-4; Korîntiyên 1., 6:19; Petrusê 2., 1:13-14; Efesî 2:21
[204] Yeşaya 40:3-9; Malaki 3:1; Lûka 1; Yuhanna 1
[205] Di temamiya Pirtûka Pîroz de, Xwedê kengî yekî ji bo kahîn an jî qraltiyê bipejirîne, yekî wekî pêxember rayedar ew bi rûnê mesh dikir da kû bide nîşan ew kes ji hêla Xwedê ji bo peywireke taybet hatiye bijartin. Xwedê xwe bi Ruhê Pîroz mesh kir. Di Nivîsên Pîroz de rûn bi gelemperî ji bo sembolîzekirina Ruhê Pîroz tê bikaranîn. Nîşe: Çawa kû sê Kesê Xwedayî di nav karê *afirînê* de bi hev re bûn, bi heman awayî Bav, Kur û Ruhê Pîroz jî di karê *rizgarkirinê* de bi hev re bûn.
[206] *"Dê rastî bi îman bijîn"* (Habakkuk 2:4). Qurbanê kû Îsa ji bo pêşkêşkirinê hat, dê *"ji bo rakirina gunehê dinyayê"* têrê bikira, lê tenê yên kû bawer dikirin kû ev qurbana Îsa ji bo wan e, dê ji vê keremê sûd girtina. Ev rastî dikare bi rêya bernameya me ya radyoyê ya bi navê "Rêya Rastiyê" ya Senegelaê bê resmkirin (www.twor.com; www.lesprophetes.com). Di piraniya bernameyên radyoyê de ji guhdaran re kopyeyeke Pirtûka Pîroz bêheq tê pêşniyazkirin. Kesên kû dixwazin, dikarin ji me re binivîsin û kopyeyeke Pirtûka Pîroz bêheq bistînin. Ev pêşniyaz ji bo bi milyonan kesan kû îstasyona me ya radyoyê vedikin heman e? *Belê. Hemû*guhdarên kû ji me re dinivîsin, ji bo kû kopyeya Pirtûka Pîroz bixwazin dinivîsin? *Na.* Piraniya guhdaran ji vê pêşniyaziyê sûd nagirin. Bi heman awayî, Xwedê, bi rêya qurbana xwe ya kû bi temamî têrê heye, ji bo bexşandin û jiyana bêdawî daye. Lê dîsa jî tenê beşeke biçûk a nifşa Adem, pêşniyaza Xwedê qebûl dike. Binêrin Lûka 14:15-24.

## BEŞ 23: PÊKHATİNA NİVÎSÊN PÎROZ

[207] Yeşaya 53; Mezmûr 22. Di heman demê de li ayetên Daniel 9:24-27 ên kû xetên bingeh ên plana Xwedê ya ji bo serdeman çêkiriye, binêrin. Beşeke tam plana Xwedê wiha bû: *"Mesîh dê bê kûştin û dê kesê kû piştgirî bide Wî tune be."* (Daniel 9:26)
[208] Matta beşên 21-25.

209 Rastî îxanetê hat: Binêrin Mezmûr 41:9; Zekeriya 11:12-13 û Matta 26:14-16; 27:3-10.
210 Dema Cihû cejna Fishê ya salanî pîroz dikin, Îsa dê yên biîmanan ji xezaba Xwedê ya hemberî gunehê rizgar bikira û dê bûya qurbanê Fishê dawÎ û serasa. *"Lewre Berxikê me yê Fishê Mesîh ji bo me hat qurbankirin."* (Korîntiyên 1., 5:7)
211 Mizgîniya Yuhanna, beşên 13-17.
212 Peyvên Îsa yên kû ji kesên ji bo girtina Wî hatibûn re gotibûn, hêsan bûn: *"EZ IM."* Biwêja *"Ez Ew im",* ji hêla wergêrên Îngîlîz wiha hatiye wergerandin; lê peyva *"Ew"* di metna Grekî de tune ye. Îsa diyar dikir ka Kî ye: Yê kû Bixwe Çêbûye, yê kû ji esmên hatiye *"EZ IM."* Îsa dema got *"EZ IM",* sedema rêberên dînî û leşkeran kû ketin paş, ev peyva Îsa bû.
213 *"Di bînahiyên şev de min dît yekî kû dişibe kurê mirov, bi ewrên esmên hat!"* (Daniel 7:13) Nîşe: Kevineşopiyek bû kû kesekî ji bo nîşandana şîn û hêrsa pir, kincên xwe diçirandin. Çi ecêb e kû, di zagona kû Xwedê ji Musa re da ev biwêj hebû: *"Ji nav kahînên din, serkahînê kû rûnê Meshê li ser serê wî tê rijandin û ji bo kû kincên taybet li xwe ke tê pejirandin, dê porê xwe belav neke, kincên xwe neçirîne."* (Leviyî 21:10). Kayafa bi vê çalakiya xwe (Matta 27:65; Markos 14:63) wekî serkahîn xwe bixwe dîskalîfiye kir. Îsayê kû ji bo bedena xwe wekî qurban pêşkêş bike hatiye serzemînê, bû serkahînê nû yê bêdawî. Yê kû bikaribe mirovê gunehkar bi Xwedayekî pîroz li hev bîne, tenê Ew e (Îbranî 2:17; 3:1; 4:14-16; 7:26; 8:1; 9:11,25; 10:19-22).
214 Yuhanna 18:38; 19:4,6; Yuhanna 19:15; Lûka 23:21

## BEŞ 24: HEMÛ HAT DAYÎN

215 Kû we hê beşên 8-9 û 16-17 ên YEK XWEDA YEK PEYAM bi temamî tênegihiştiye, dibe ev biwêj ji we re wekî çêr xuya be. Min bihîst kû hin kes bi tinazî ev dipirsin: "Wê demê dema 'Xwedê' di malzaroka bakîreyekê û li çarmixê bû, kî bi gerdûnê eleqedar dibû?" Ev pirs dide nîşan kû der heqê Nivîsên Pîroz û Xwedayê kû ew dan de nêrîneke biqusûr heye. *"Îsa ji wan re bersiv da, 'Ji ber kû hûn Nivîsên Pîroz û quweta Xwedê nizanin, hûn dixelitin.'"* (Matta 22:29). Ji ber kû Xwedê her tim wekî yekîtiya-sêmend a yekbûyî hebû, ne pirsgirêk e kû di heman demê de hem li serzemînê hem jî li esmên be. Ger tav dema nav valahiya navbera stêrk û gerestêrkan de ye û di heman demê de germahî û roniya wê li serzemînê bi me re ye, Afirînerê vê tavê jî çima

di heman demê de hem li esmên hem jî li serzemînê nebe?
[216] *Kranion* peyvekeGrekî ye û beramberê peyva Golgotayê Îbrankî ye, wateya wê *cihê qoqê serî* ye (Matta 27:33; Markos 15:22; Yuhanna 19:17). Ev gira kû Îsa lê hat çarmixkirin, li derveyî Yeruşalima kevin e û wekî qoqê serî yê tazî bajêr dorpêç dike, ev gir parçeyeke wî çiyê ye kû Brahîm lê li şûna xwe beranekî pêşkêş kir.
[217] Dîrokvan Josephus, der heqê hin bûyerên kû beriya ketina Yeruşalimê ya P.M. di sala 70an de, ev nivîsîn: "Leşkerên Romayî her roj pênc sed Cihû girtin; na, carinan zêdetir Cihû girtin… leşker Cihûyên kû bi xezeb û rik digirtin li çarmixê bizmar dikirin, yekî bi awayekî, yê din bi awayekî cuda û hemûyan dû hev li çarmixê bizmar kirin; yên kû hatin çarmixkirin ew qas pir bûn kû, ne ji bo çarmixan ne jî ji bo bedenên kû dê bihatana çarmixkirin cih tune bû." Josephus di heman demê de nivîsî, "destpêkê hatim qamçîkirin û piştre bi îşkeceyên cihêreng tehde dîtin" (Josephus, *Antiquities* 11:1, rûpel 563)
[218] Cihû zemên ji saet 6.00ê sibê û pê ve hesêb dikirin. *"Dema Îsa li çarmixê xistin saet neh bû* (6.00+3 saet=9.00)*, û nîvro saet ji dozdehan* (saeta şeşemîn) *heya sêyan* (saeta nehemîn) *tarîtî hat li ser hemû welêt."* (Markos 15:25, 33)
[219] Afirîn 8:20; 22:2-8; Ji Misirê Derketin 29:18. Biwêja *"pêşkêşa şewitînê"*, di Peymana Kevin de 169 car derbas dibe. Îsa bû ji bo gunehê bû pêşkêşa şewitînê ya dawî. Markos 12:33; Îbranî 10:6-14. Nîşe: Dema Reb Îsa li çarmixê aliqî bû, ji bo kû fam bikin ka Xwedê çima pişta xwe da Wî Yeşaya 53 û Mezmûr 22 bixwînin. Dawud di heman Mezmûrê de ji berê de da zanîn kû dê Mesîh bigota, *'Xwedayê min, Xwedayê min, Te çima ez terk kirim?'* (Mezmûr 22:1), Dawud ji me re vedibêje ka Xwedê çima pişta xwe da xwe. *"Tu pîroz î!"* (Mezmûr 22:3). Xwedê nekarî li Îsa binêre, lewre pîroziya Wî serasa ye û *"nikare li xirabiyê binêre"* (Habakkûk 1:13). Di van saetên kû tarîtî hukm dikir de, Xwedayê Kurê mirovê bêguneh wekî kû Ew e yê gunehkar, dema li Wî didan li cihê xiraban, êşa kû diviyabû ew bikêşana, dikêşa. Îsayê Berxikê pîroz ê Xweda, (bêyî gunehkarekî) bû Hilgirê gunehê. Nivîskarekî stranan vê bûyerê pir xweş anîbû zimên: "Ev çi sireke mezin e! Yê nemir dimire! Kî dikare vê plana Wî ya ecêb fam bike?" ("Hezkirina Metelhişt", Charles Welsey, 1707-1788)
[220] Edesheim, Alfred. *The Life and Times of Jesus the Massiah.* 1883, rûpel 614.
[221] Beşên Îbranî 9-10 bixwînin. Nîşe: Wekî kû di YEK XWEDA YEK

PEYAMê de hatiye diyarkirin, bilindahiya Xwedê ya kû demekê li Cihê Herî Pîroz ê kon û perestgehê cih girtibû êdî ne li pişt perdê bû. Bilindahiya Xwedê niha di Îsa de bû.
[222] Yuhanna 19:30-37

**CUTUBKA 25: DHIMASHADA OO LAGA ADKAADAY**
[223] Matta 28; Markos 16; Lûka 24; Yuhanna 20-21; Korîntiyên 1., 15. Not: gelek kesên kû ji bo îspatkirina Îsa kû nevejiyaye derketine rê, di dawiyê de bi delîlên teqez pirtûk nivîsîn kû Îsa bi rastî jî ji mirinê vejiyaye. Mînak, Morrison, Frank. *Who moved the Stone?* Grand Rapids, MI: Zondervan, 1987; McDowell, Josh. *Evidence that Demands a Verdict.* Nashville, TN: Thomas Nelson, Inc., 1993; Strobel, Lee. *The Case for Christ.* Grand Rapids, MI: Zondervan, 1998.
[224] Îsa tenê negot dê "roja sêyemîn vejî" (Matta 16:21), lê wiha jî got: *"Çawa kû Yunus sê roj sê şev di zikê wî masiyê mezin de ma, Kurê mirov jî sê roj sê şev dê bimîne di paxila erdê de"* (Matta 12:40). Gelek kes bi awayekî mafdar li ser vê mijarê nîqaşê dikin: Kû Îsa şeva Înê hatiye veşartin û heya sibeha Yekşemê maye di gorê de, naxwe ev wext tam ne sê roj e. Lê dîsa jî, wextê kû Îsa ma di gorê de, li gorî şêwaza axaftina Cihûyan bi hejmarên gilover tên diyarkirin. Dema ji beşeke rojê tê qalkirin, ew roj çi qas wexteke biçûk be jî, dîsa jî wekî tam rojekê tê qalkirin (Mînak, Matta 27:63-64; Afirîn 42:17-18; Samuelê 1., 30:12-13; Ester 4:16-5:1). Li vir ramaneke din jî heye: Nivîsên Pîroz nanivîsin kû Îsa roja Înê hatiye çarmixkirin. Niha gelek kes dê biqîrin, 'Ev nakokiyek e!' lê di Pirtûka Pîroz de ravekirinên baş hene kû van tiştên kû wekî nakokî xuya dikin, çareser dikin.
[225] Karên Elçiyan 11:26; 26:28; Petrusê 1., 4:16
[226] Karên Elçiyan 5:41 *"... Ji ber kû ji bo navê Îsa layiqî heqaretê bûn, kêfxweş bûn."* Patrus avêtin gîrtîgehê û lêdan: Karên Elçiyan 5; di heman demê de binêrin Karên Elçiyan 12. Îsa ji berê de da zanîn kû dê Petrus wekî şehîdekî bimire: Yuhanna 21:18-19
[227] Hin kes gotinên Îsa kû ji jineke ji neteweyeke din re gotiye digirin: *"Ez tenê ji bo pezên wendayî yên gelê Îsraîlê hatim şandin"* (Matta 15:24), lê ew ji we re nabêjin kû Îsa ji bo başkirina keça vê jinê pêş ve çûye! (kû hûn bixwazin der heqê xizmet û dilovaniya Îsa ya kû ji kesên ne Cihû ne re nîşan daye de zêdetir mînak bibînin, li van ayetan binêrin: Matta 12:41-42; 21:33-43; Lûka 9:51-55; 10:30-36; 17:11-19; Yuhanna 4; Yuhannayê 1., 2:1-2; Lûka 24:45-48.)

[228] Mezmûr 68:18; 110:1; Mezmûr 24.
[229] *"Piştî kû Îsa ji Gunehan pakbûnê pêk anî, li bilindahiyê li hêla rastê Xwedayê mezin rûnişt. Lewre em ji ber Wî ji gunehên xwe pak bûn."* (Îbranî 1:3). *"Her kahîn her roj li ser piyan dimîne û karê xwe dike û qurbanên kû tu car nikarin gunehan rakin her tim pêşkêş dikin. Lê Mesîh piştî kû qurbaneke ji bo gunehê pêşkêş kir kû dê heta hetayê derbasdar be, li hêla rastê Xwedê rûnişt."* (Îbranî 10-11-12) Di heman demê de li Îbranî 8:1; 12:2 û Wehî 3:21 binêrin.

## BEŞ 26: DÎNDARÎ Û DÛRMAYÎNA Jİ XWEDÊ

[230] Yaqûb 2:18; Matta 5:13-16; Îbranî 11
[231] Xwedê ji rayeyan re destûr dide kû gelên xwe biparêzin û di heman demê de ji wan re berpirsiyarî dide kû bila *"şûr", "yê kû xezeba Xwedê li ser wan ên kû xirabiyê dikin dibarîne û bi vî awayî ji bo tolhildanê ji Xwedê re xizmetê dike."* bi kar bînin. (Romayî 13:1-4; Afirîn 9:6), şîdeta Xwedê ya ji bo belavkirina rastiyê bi mînak û hewisandinên Îsa re li hev nagrin. Îsa wiha got, *"We bihîst kû tê gotin, 'Hûn ê ji cîranê xwe hez bikin, ji dijminê xwe nefret bikin.' Lê ez ji we re dibêjim, ji dijminên xwe hez bikin, ji bo yên kû ji we re zulm dikin dua bikin, wisa kû hûn bibin n Bavê ezmanan. Lewre Ew tava xwe hem li ser xiraban hem li ser qencan derdixe; barana xwe hem li ser rastan hem li ser xwaran dibarîne. Kû hûn tenê yên kû ji we hez dikin, hez bikin, dê çi xelata we hebe? Erkdarên bacê jî wisa nakin? Kû hûn tenê ji birayên xwe re silavê bidin, hûn bi vî awayî zêdetir çi dikin?"* (Matta 5:43-47). Qur'an jî tam dijî van gotinan bi van biwêjan dibêje: *"Yên ji ehlê Pirtûkê kû ji Allah û roja axretê re îman nakin, yên kû tiştên kû Allah û pêxemberên Wî heram dibînin, heram nabînin û yên kû dînê heq Îslam ji xwe re nakin dîn re sitûyê xwe xwar bikin û heya kû bi destê xwe Cizye bidin bi wan re şer bikin"* (Qur'an Sûre 9:29).
[232] *"Fermana kû em ji serî de dibihîzin ev e: Em ji hev hez bikin. Em wekî Kayînê kû aîdê Şeytên e û birayê kuştiye, nebin. Kayîn çima birayê xwe kuşt? Lewre ên kû wî kirin xirab, ên birayê wî rast bû, ji ber wê kuşt"* (Yuhannayê 1., 3:11-12). Her du hêzên dehfdêr yên kû bûn sebeb kû Kayîn birayê xwe bikuje Şeytan û hesûdî bû (bi Matta 27:18 bidin ber hev).
[233] Divê ji qaqiboyên klasîk ên şikber re çawa bersiv bê dayîn? "Kayîn jina xwe ji kû dît?" Beşa 5. a Afirînê bersiva vê dide. *"Kur û keçên"* din ên Adem û Hewa hebûn (Afirîn 5:4). Wisa xuya dibe kû Kayîn bi xwişka

xwe re zewicî – wê demê di vê zewacê de tu fikareyên xirab tunebûn bû ji hêla genetîk de. Piştre Xwedê dê zewacên wisa qedexe bikira. Û piştî kû hat kuştin çi bû ji Habîl re? Bedena Habîl vegeriya axê, lê ruh û canê wî çû bihuştê, lewre Xwedê gunehên wî bexşandiye û wî di bingeha îmanê de rast dabû zanîn. Îbranî 11:4

234 Mûsa û pêxemberên din, tofana gerdûnî ya dema Nuh û pişpişîna qalika rûzemînê ya ji hêla jeolojîk de dane zanîn: Afirîn 7 & 8; Mezmûr 104:6-8; Eyûb 22:16; Matta 24:339; Petrûsê 2., 2:5-6.

## BEŞ 27: QONAX 1: BERNAMEYA XWEDA YA BERÎ

235 Her beşa Pirtûka Pîroz bi şêwazên cuda bi yek ji van sê mijaran re girêdayî hev e: 1. Xweda çi kir? II. Xweda çi dike? III. Xwedê êdî dê çi bike? Bi rêya têgînên teolojîk, ev sê mijarên Pirtûka Pîroz wiha tên tesnîfkirin: 1) *Fihêlbûn* = Dema hûn ji Mizgîniyê bawer dikin, Xwedê we rastiya nuwazeya *rewşa* we îlan dike (Romayî 35). 2) *Pîrozbûn* = Xwedê ji we re kû hûn bi îman in, ji ber kû rast bijîn jiyana we nexş dike. (Romayî 6-8 û 12-15) 3) *Berzkirin = Hûn ê li bihuştê hem di rewş hem jî di pêkanîna xwe de rastiya nuwaze bibin.* (Wehî 21 & 22)

236 Richardson, Don. *Lords of the Earth.* Oxnard, CA: Regal Books; 1977, rûpel 354. (Pirtûkeke çîrokê ya Don Richardson a der heqê yamyamekê kû biîman dibe, vê pirtûkê bixwînin. *Peace Child.* Oxnard, CA: Regal Books, 1975.)

237 Karên Şandiyan 26:9-11; 7:58-60; 8:1-3; 9:1-2

238 Karên Şandiyan 9:1-31; di heman demê de li beşên Karên Şandiyan 11; 13-14; 16-28 binêrin (di beşên Karên Şandiyan 22 û 26an de Pavlûs ji me re qal dike ka çawa tobe kiriye). Di heman demê de Galatyayî 1:13,23; Fîlîpînî 3:6; Korîntiyên 1., 15:9; hwd.

239 Di nav têqînên Pirtûka Pîroz de “pîroz” ji bo Xwedê hatiye *veqetandin;* Yê kû ji şêwaza bexşandin û rastî ya Xwedê bi rêya îmanê re ji hêla Xwedê *pîroz hatiye bangewazkirin* Kevineşopiya yên mirî, kesên diyarkirî “xistina nav lîsteya yên pîroz” û bi vî awayî wan wekî “yên pîroz” nîşandan, yekcar li dijî hînkirina Pirtûka Pîroz e (binêrin Dubareya Zagonê 33:2-3; Mezmûr 30:4; Şîretên Silêman 2:8; Daniel 7:21-27; Matta 27:52; Karên Şandiyan 26:10; Efesî 1:1; 2:19, hwd).

## BEŞ 28: QONAX 2: BERNAMEYA XWEDA YA NİHA

240 Tişta kû bala gelek kesan nakişîne, dema rêbazên wisa bi kar tînin ji bo xwe parastinê, bi dijmin re di heman refê de cih digirin. Dubareya Zagonê

18:10-14; Yeşaya 47:13; Karên Şandiyan 19:19; Galatyayî 5:19-21.
[241] Yuhannayê 1., 2:1; Yuhanna 14-16
[242] Di beşa 1. de me posteyeke elektronîk a kû me ji Ehmed girtibû ragihandibû, Ehmed ev nivîsîbû: "Di orîjînala Pirtûka we ya Pîroz de û di Peymana Kevin de der heqê hatina Mihemed de pêşagahî hene, niha jî… qalkirina madeya xirabe ne hewce ye."
[243] Wateya peyva pentikostê *pênciyem* e. Pentikost, pîrozkirina Peymana Kevin a Îsraîliyan e kû ji Xwedê re ji bo bereketên Wî spasî dikin (Leviyî 23:16). Xwedê ji serî de sêwirand kû bereketa nîhaî di vê Roja Pentikostê de bişîne rûzemînê: Ruhê xwe yê Pîroz!
[244] Korîntiyên 1., 12:27; Efesî 4:21; 5:25-32; Wehî 19:7-9; 22:17; Yuhanna 3:29
[245] Yuhannayê 1., 1:8-10; 2:1-2; Romayî 6-8
[246] Dema hûn ji fikrên xwe yên şaş tobe bikin û ji Reb Îsa Mesîhê kû ji bo gunehên we miriye û piştre dîsa vejiyaye bawer bikin, *"hûn ji Mesîh Îsa re tên îmadkirin"* (Romayî 6:3). Ev îmada we bi avê nabe (îmada avê piştre tê), lê hûn bi Ruhê Pîroz re îmad dibin (Romayî 6:1-5; Karên Şandiyan 1:5; Korîntiyên 1., 12:13). *"Ji tiştekî re hatin îmadkirin"* tê wateya "bi tiştekî re yekbûn, wekhevbûn." Dema hûn îman dikin, hûn dibin parçeyeke mala Xwedê ya kû ji *"yên kû bi Wî yê bêguneh hatine yekbûn"* pêk hatiye (Romayî 6:5). Rewşa we ya nû, bêdawî di Mesîh de ye.
[247] Karên Şandiyan 24:15; Lûka 14:14; Yuhanna 5:28-29; Daniel 12:2; Wehî 20:6,11-15; Wehî 22:12
[248] Korîntiyên 2., 5:10. Di Nivîsên Pîroz de ji herî kêm pênc tacên kû dê yên bi îman bigirin tê qalkirin (kûpa/xelat): Korîntiyên 1., 9:25; Petrûsê 1., 5:4; Yaqûb 1:12; Selanîkiyên 1., 2:19-20; Timoteosê 2., 4:8. Ev tac ne ji bo bilindahiya me, dê ji bo bilindahiya Wî (Wehî 4:10) bibe. Reb dê karên kesên rizgarkirî kû ji bo navê Wî û ji bo bilindahiya Wî kirine, ji bîr neke (Matta 10:41-42; Îbranî 6:10).
[249] Şêx, Belqis. *I Dared to Call Him Father. New York:* Fleming H. Revell Company, 1978; rûpel 53.
[250] Yuhannayê 1., 2:27; Yuhanna 4:14; 14:26; 16:13; Yeremya 31:33-34; Efesî 4:21
[251] Di navbera duaxwendina wekî mekanîk û temaskirina bi Xwedê re û ji duayê me re bersiv stendin, cudahiyeke mezin heye. Romayî 8:26-27; Efesî 6:18; Yuhannayê 1., 5:14-15; Yuhanna 14:13-14; 15:7; Fîlîpînî 4:6-9
[252] Romayî 12; Korîntiyên 1., 12; Efesî 4
[253] Korîntiyên 2., 3:18; Fîlîpînî 1:6; 3:20-21

**BEŞ 29: QONAX 3: BERNAMEYA XWEDÊ YA DAHATÛYÊ**

254 Piştî çend rûpelan, em ê çend ayet bixwînin kû ji Peymana Kevin pêxemberên kû hatina Mesîh a rûzemînê ya cara duyemîn ji berê de didin zanîn û bûyerên kû bi vegerîna Wî pêk bên ji berê de didin zanîn, bixînin. Hin beşên kû em ê lê binêrin ev in: Zekeriya, beş 14; Daniel 7:13-14; Mezmûr 72 û Yeşaya 9:6-7.

255 Selanîkiyên 1., 4:13-18; Korîntiyên 1., 15:51-58

256 Binêrin beş 28; sernav: DU ROJÊN DARİZÎNÊ

257 Ayeta Efesî 5:27 û ayetên derdora vê ayetê bixwînin. Ev mijara girîng di beşa 10. a YEK XWEDA YEK PEYAM de heye. Nivîsên Pîroz her tim Reb wekî *"Zava"* gelê Wî jî wekî *"Bûk"* didin nîşan. Zewac – bi şêwaza îdeal- ji bo kû plana Reb Xwedayê kû bi gelê xwe re heta hetayê dê zewqa têkiliya ruhî bistîne ji me re fikreke henase bide, hatiye sêwirandin (Yeşaya 54:5; 62:5; Mezmûr 45; Newayên Newayan; Hoşea 2:16, 19, 20; Matta 9:15; 25:1-13; Yuhanna 3:29; Korîntiyên 2., 11:2-3; Efesî 5:22-33; Wehî 21:2,9, 22:17).

258 Matta 24:21; Wehî 7:14; Pênaseya bêkêmasî ya Tengaiya Mezin di beşên Wehî 6-19 de heye.

259 Romayî 11:26-27. Nîşe: Ev bûyer, di çîroka Yusûf a kû di Afirîn 37-45 de ye, heye. Dirûvên metelhiştî hene!

260 Korîntiyên 1., 15:45-47; Romayî 5:12-21. Ji têgînên wekî *"Ademê Pêşîn"* û *"Ademê Dawî"* di heman demê de di beşa 16. a YEK XWEDA YEK PEYAM de tê qalkirin. Gunehê Adem çawa bû sedem kû hemû mirov bimirin, bi heman awayî rastiya Îsa û xwîna Wî ya rijayî ji bo kesên kû îman dikin re jiyana bêdawî nû dike.

261 Selanîkiyên 2., 1:7-10; Wehî 19:6-14; Yahûda 14; Zekeriya 14:5

262 Yeşaya 53:7; Yuhanna 1:29; Wehî 5:5; Selanîkiyên 2., 1:5-10; Yuhanna 3:17-18; 12:47; Daniel 9:24-27; Yeşaya 53 bi Zekeriya 14 bidin ber hev. Di heman demê de li ser dijîtiyên navbera têgînên *"tengasî"* û *"bilindahî"* ya kû di van beşan de ye bifikirin: Lûka 24:25-26; Petrûsê 1., 1:10-12; Îbranî 2:9; Fîlîpînî 2:5-11; Mezmûr 22; hwd.

263 Sernava Mezmûra 72. wiha ye: *Mezmûreke Silêman.* Ev Mezmûr her çi qas bi gotinên *"Duayên Dawudê Îşay li vir diqede."* (Mezmûr 72:20) bi dawî dibe, dibêjin qey Silêman ev Mezmûr nivîsiye. Ev ayet di dawiya beşa duyemîn a pênc-pirtûkên Mezmûrê bi nîşaneyan tên nîşankirin. Dawud nivîskarê destpêkê a beşa duyemîn a Mezmûran bû.

264 Heta hetayê dê kî bê darizandin? *"Yên tirsonek û yên bawer nakin,"* ango, ji ber kû ji gotin û kirinên malbat û hevalên xwe ditirsin, dê tu car

ji peyama Xwedê bawer nekin. Dema Îsa li rûzemînê ye, guhdarên xwe bi awayekî zelal hişyar kir, *"Ji yên kû bedenê dikûjin lê nikarin canê bikûjin, netirsin. Ji Xwedayê kû can jî bedenê jî di dojehê de mehv dike bitirsin… nebêjin kû ji bo aşitiyê bînim rûzemînê, hatime! Ne aşitî lê ji bo şûr bînim hatim. Lewre ez hatim kû veqetîn têxim navbera bav û kûr, dê û keç, bûk û xwesû. Dijminê mirov dê bibe gelê wî yê malê. Yê kû ji diya xwe an jî bavê xwe ji min zêdetir hez dike, ne layiqê min e."* (Matta 10:28, 34-37).

**BEŞ 30: BEŞÊN KÛ JI BİHUŞTA DAHATÛYÊ HATİNE NÎŞANDAN**

[265] Matta 13:24-30. Ev şibandina Îsa îlan dike kû tevliheviya qencî û xirabiyê tenê dê di demeke bisînor de bibe.

[266] Zêdehiya beşa destpêkê a Wehî pênasîneke nefsbiçûkî ya Reb Îsa dide nîşan – ji portreya Îsa ya kû di pirtûk, fîlm an jî piraniya dînan de tê dîtin, porteyeke Îsa ya pir cuda.

[267] Markos 3:14-19; Yuhanna 19:26-27; Yuhanna ev pirtûkên Pirtûka Pîroz jî nivîsîn: *Mizgîniya Yuhanna; Yuhannayê 1.; Yuhannayê 2.; Yuhannayê 3. û Wehî.*

[268] Rengên cuda yên kevirê yeşîmê hene. Kevirê eqîqê bi gelemperî soreke biriqî û nîv zebloq e. Dema kevirê eqîqê li roniyê tê girtin rengê wê kûr dibe û zêde dibe.

[269] Binêrin ka kî li ser text rûniştiye. Yeşaya 6ê (bînahiya kû li beşa 15. a YEK XWEDA YEK PEYAM de hatiye pêşkêşkirin) bi Yuhanna 12:36 re bidin ber hev.

[270] Afirîn 12:2-3; Matta 1. (ji bo zêdetir agahiya der heqê wehdên kû Xwedê ji Birahîmre dane li beşa 20. a pirtûka YEK XWEDA YEK PEYAM binêrin.)

[271] Mînak, çîroka klasîk a Sinderella a kû cara pêşîn li Çînê hatiye vegotin, di heman demê de li welatên wekî Ewrûpa, Emerîka, Îranê kevin, Iraq, Misir, Kore, Hindîstan hwd. tê nasîn. Her welat li gorî xwe xwedî wersiyonekê ye, lê mijar her tim wek hev in. Hesreteke rizgariyê û jiyana bêdawiyê li her derê cîhanê di dilên her kesî de hatiye bi cihkirin. Silêman ev nivîsî: *"Xwedê her tiştî di wextê de baş çêkir. Têgîna bêdawiyê xist dilên mirovan; dîsa jî mirov nikare karê Xwedê ji serî heya binî fam bike."* (Weîz 3:11)






**www.One-God-One-Message.com**

**www.king-of-glory.com**

**www.rockintl.org**

Relief Opportunity & Care for Kids

ROCK INTERNATIONAL

Resources Of Crucial Knowledge